Amed Tîgrîs
Yildiz Çakar

# Amed

Erdnîgarî
Dîrok
Çand











Institut kurde de Paris


Institut kurde de Paris


Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque

Institut kurde de Paris


Li Tirkiyê Amed
Çewlik
Muş
Xarpêt
Meletiye
Semsûr
Piran
Hênê
Licê
Pasûr
Hezro
Karêz
Gêl
AMED
Riha
Çinar
Mêrdîn
Balafirgeh


LEJANT

Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê
Çand: 40

**AMED ERDNÎGARÎ DÎROK ÇAND**

Amed Tîgrîs & Yildiz Çakar

Lêhûrbûna nivîsan: Ali Çiftçi, J. Îhsan Espar, Lal Laleş û Hesenê Metê
Organîzatorê karên pratîk: Baki Kaymak
Pergala rûpelan: APEC
ISBN: 978-605-87650-5-4

**Çap**
Atalay Matbaacılık San. ve Tic. Ltd.Şti.
Büyük Sanayi, 1. Cadde, Elif Sok. No:7/236-337
Tel: 0312 384 41 82 İskitler/ Ankara
Sertifika No: 15689

**Serokatiya Daîreya Çand û Tûrîzmê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê**
Cadeya Elazixê Avahiya Xizmetê ya Şaredariya Bajarê Mezin AMED
Tel: 0 412 223 49 42 Fax: 0 412 229 30 52
e-poste: kultur@diyarbakir.bel.tr web:www.diyarbakir.bel.tr www.turizm.diyarbakir.bel.tr

© Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê
Her cure mafê weşanê aîdî Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ye.
Bêyî destûra Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê bi tu awayî beşek jê yan jî bi tevahî nayê weşandin an jî zêdekirin.

Amadekariya Çapê
WEŞANXANEYA LIS
LÎS
© 2012 LİS BASIN YAYIN ORG. REK. SAN. TİC. LTD. ŞTİ.
Kooperatifler Mah. Öğretmenler Sokak Feray Apt. No: 1 Yenişehir / Diyarbakır
Telefon / Fax: 0 412 228 97 76
Web: www.wesanenlis.com e-mail: wesanenlis@yahoo.com

Institut Kurde de Paris

LIV. KL. 3438
03/10/2017
1530 TIG AME

# AMED

erdnîgarî | dîrok | çand

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
*Bibliothèque*
Reçu le 03/10/2017


Institut kurde de Paris


Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# Naverok


Çend gotin ....................13
Pêşgotin ....................15
Erdnîgariya Amedê ....................16
Kurtedîrok ....................19
Bedena Amedê ....................51
Avasazî ....................70
Mizgeft û medrese ....................87
Dêr û perestgeh ....................98
Koşk û qonax .................... 102
Av û kaniyên kevn .................... 109
Çemê Dîclê .................... 121
Pire .................... 143
Ewliya û efsane .................... 149
Rewşa demografî û civakî .................... 154
Şaredarî .................... 161
Parlamenterên Amedê .................... 171
Cilûberg .................... 196
Xwarin .................... 204
Ax û çandinî .................... 209
Rez û pez .................... 216
Serçavî û bîrên petrolê .................... 225
Medya .................... 228


Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

# Çend gotin

Bajar neynika mirov, giyanê civakekê, nasnameya neteweyekî ne. Ji ber vê yekê, vegotina bajarekî bi hemû awayan nihêrîna li neteweyekê, li civakekê, li jiyanekê û bê guman li erdnigarî û siruştekê ye. Ji ber vê yekê jî, ne hêsan e ku mirov behsa dilê Mezopotamyaya Jorîn, Ameda rengîn bike. Bi sedan salan e gelek nivîskar, gerok, rewşenbîr û zanyarên mîna Mar Yaşûa, Ebu'l-Ferec, Îbnu'l Ezraq el Fariqî, Ebûbekr-i Tihranî, Seyfedînî Amedî, Vakîdî, Evliya Çelebî, Elî Emîrî, Albert Gabriel behsa bajarê xwediyê dîrokeke zêdeyî 9000 salan kirine. Digel ku bajarê me yê qedîm, paytextê ezîzê ber dilê însanên me, ji bo bi sedan çîrok, helbest û romanan bûye çavkaniya best û peyxamê û bi sedan nivîskaran helbest, çîrok û roman li ser wî nivîsandine jî, ez bi xwe her roj bi çîrokeke, bi razeke vî bajarî dihisim. Bi baweriya ku kîjan mirovê ku riya wî bi bajarê Amedê dikeve, bîranîneke ku wê qet ji bîr neke, çîrokeke ku wê her dem kêfxweşiyê bide, di dil û bîra xwe de dineqişîne û diçe. Heta ku ev bajarê xwediyê sûran li ser piyan be, heta ku ev bajarê kela berxwedanê, warê aştiyê û qûça mirovahiyê li ser piyan be, ew ê hê gelek tiştan li mîrasa cîhanê zêde bike û ew ê hê bêtir bibe hêlîna hezkirin û azadiyê.

Di vê xebatê de, tevî navend û navçeyên Amedê movikên bajêr ên dîrokî, civakî berhemên kevnar ên dîrokî û tûrîstîk, xweza û erdnîgariya bajêr û bê guman çand û hunera bajêr, navdar û niştecîyên bajêr, bi vegotineke şêrîn, henûn û fesîh hatine vegotin. Ev berhem dê bike ku hemû xwendevan, niştecî û ziyaretvanên bajarê me hinekî din Amedê ji nêzîk ve, lê vê carê bi zimanê bav û kalên xwe, bi şîrê dayîk û dapîrên xwe, nas bikin. Taybetmendiyeke vê berhemê ya mezin ew e ku cara yekem dîroka bajarê Amedê bi zimanê wê, bi zimanê wê yê ku bi sedan salan e di binê zextan de ye, qedexe ye, hatiye nivîsandin. Ev yek dê ji bo nivîsandina dîroka vê axa pîroz jî bibe ezmûneke giranbiha.

Amed bi navçe û gundên xwe ve şûnwarekî wisa ye ku dîrok û mirov di nava hev de dijîn. Mirov bi awayekî xwezayî bi dîroka bajêr re dijî. Ji ber ku ev ba-

←Derê Romê/Derê Rihayê
Foto: Nejat Satıcı



Institut kurde de Paris

jar bi hemû îhtişama xwe, bi sûrên xwe, bi Mizgefta Mezin a ku Heremî Şerîfa pêncemîn e, bi Dêra Sûrp Giragos, bi Medreseya Mesûdiyeyê, bi Pira Dehderî bi çemê Dîcle re dijî. Bê guman tiştê ku nişteciyên vî bajarî dike xwedî şexsiyet, xwedî rûmet, seqaya vî bajarê qedîm e.

Amed bajarekî wisa ye ku mazûvaniyê ji hemû mirovahiyê re dike. Gava ku mirovek di çar deriyên wê yên mezin, di derê Çiyê, derê Mêrdînê, derê Rihayê û derê Dîcle re dikeve nava bajêr, Amed, çawa do, ew ê îro jî bi pirçandiya xwe, bi pirzimaniya xwe, bi Newroza berxwedana xwe, bi Xizir û Îlyas, bi çîrçîrok û kevokên aştiyê, bi îlm û alimên xwe pêşwaziyê li wan bike. Mirov dema li kolanê bajêr digere xwe di tunela dîrokê de hîs dike. Di kêliyekê de mirov gelek dem û dewranan dijî. Amed di nava îro pêşerojê de pirayeke qewîn e.

Amed Tigrîs û Yıldız Çakarê bi tehb û sehbeke mezin ev berhema giranbiha amade kirine, ez destxweşiyê didim wan. Mala wan ava be ku dîroka bajarê min ê qedim ê kela berxwedanê bi zimanê dayîka me nivîsandin.

Osman Baydemir
*Serokê şaredariya Bajarê Mezin ê Amedê*

Institut kurde de Paris

# Pêşgotin

Li ser parezgeha Amedê heta niha bi kurdî, bi awayekî hûr, kûr, berfireh û bi zanistî berhemeke berbiçav tune. Berhemên ku hene jî bi tirkî û zimanên din in. Ew jî nîvçe, perçe û bervejî ne. Bêplan, bêserûber, dubare û kopyayên hev in. Ji rastiya zanyariya dîrokî, etnografî, erdnîgarî û civakiya amediyan gelek dûr in. Bîhn, çêj û rengê dîrok, çand û wêjeya Amedê ji wan nayên. Piraniya van berheman bi ziman, çav, armanc û perspektîva bîrdoziya bîyaniyan bi awayekî fermî hatine nivîsandin. Karl Ludwing dibêje: Dema dîroknivîsek bûyeran nerast binivîse, yên din jî heta dawî li ser riya wî dimeşin.

Li hember vê dîroka înkar, derewîn û bervajî, me dest bi xebateke weha kir. Di destpêkê de em komeke mezin bûn, lê di nav kar de em herdu bi tenê man.

Me herduyan jî kar di nav xwe de plan û dabeş kir. Di nav kar de em rastî gelek zor û zehmetiyên çavkaniyan hatin. Çavkaniyên nivîskî bersiva xebata me nedan û pêwîst û hewcedariya me bi çavkaniyên jîndar ên berfireh û cuda ma. Me serî li sazî, komele û kesên ji herêm, bajarok, gund û mezreyên cuda cuda da û alîkarî û piştgirî ji wan xwest.[1] Bi vê metoda han me kar bi plan û rêxistin kir.

Ev berhem encama xebata me ya sê salan e. Xebateke bi bergeh, piralî û berfireh e ku navend bi hemû gund û mezreyên xwe ve, navçe bi gund û mezreyên xwe ve ji aliyên dîrok, erdnîgarî, etnografî, avasazî, civakî, polîtîk, olî, efsane, zargotin, cihên suriştî û turîstîk, nifûs, ziman û çandê ve di nav de cih girtine. Bi awayekî zanistî û kurterastî di van mijaran de agahdarî û zanîn hene. Ya herî girîng ev e ku hemû nav û termên dîrokî, cografî, çandî, civakî, pîşeyî, orjînal û bi kurdî ne. Ji vî aliyî ve em bawer dikin ku ev xebateke pêwîst e.

Mirov dikare bi hêsanî bêje, ev bi kurdî ansîklopediyeke parezgeha Amedê ye. Em hêvî dikin ku her amedî dê xwe, malbata xwe, bajar û gundê xwe di vê ansîklopediyê de bibîne. Xwedî li gencîniya xwe ya dîrokî, çand û civakî derkeve.

Amed Tîgrîs & Yıldız Çakar

[1] Lîsteya kesên alîkar di dawiya pirtûkê de ye.

# Erdnîgariya Amedê

Amed li bakurê Kurdistanê di navbera 37°30 - 38°43 hêlîpan û 40° 37-41° 20 hêlîlaran de ye. Navenda bajêr ji deryayê 650 metre bilind e. Mezinahiya qada axa parezgeha Amedê 15.355 $km^2$ ye. Li gor statistîkên sala 2010an nifûsa navendê 834.854, gundên wê 51..517 û navend bi gundên xwe ve 886.371 e. Nifûsa parezgeh a Amedê bi hemû bajarok û gundan ve bi giştî 1.528.958 e.

Tixûbên parezgeha Amedê li rojhilat bi bajarê Êlih (Batman), li bakurê rojhilat bi Mûş, li bakur bi Çewlik û Xarpêt, li bakurê rojava bi Meletiye, li rojava bi Semsûr û Riha û li başûr jî bi Mêrdînê ve ye. Li bakur zîncîra çiyayê Torosan, li rojava çemê Ferad û çiyayê Qerecdaxê (Kaşyarî)[2], li başûr çiyayê Mêrdînê û li rojhlat jî çemê Êlihê tixûbên parezgeha Amedê yên siruştî ne.

*"Diyarbekir şîr û şekir!"*

Wek parezgeh ji rojava heta rojhilatê bakurê Amedê çiya ne. Çingûş, Çêrmûg, Erxenî, Gêl, Pîran, Hêne, Hezro, Licê û Pasûr li herêmên çiya ne. Di nav van bajarokan de, bakurê Erxenî, Gêl, Karaz û Farqînê çiya û başûrên wan jî deşt in. Bismil, Çinar û gundên navendê li deştê ne. Ji navenda Amedê bi qasî 50 km bi her ali ve deşt e û axeke bi ber û berhamdar e. Bi tenê aliyê rojavayê navenda Amedê Qerecdax e. Herêma Qerecdaxê ji bo çandiniyê nedestdayî û guncav e, lê ji bo heywan xwedîkirin gelek kêrhatî ye.

## Di dîrokê de navên ku li Amedê hatine kirin

Tê gotin ku di dema Hûriyan de bi navê Amîda keçikek hebûye û seroka bajêr bûye. Hinek jî dibêjin keçikê navê xwe ji bajar girtiye. Lêbelê wek dokumenteke nivîskî cara yekem di dema desthilatdariya serdarê Asûriyan Adan-Nînarî bz (berî zayînî/berî mîladê) 1310-1281 de li ser qevda şûr Amîd hatiye nivîsîn.[3] Ev nivîsa dîrokî ya yekem e. Dîsa bz di navbera salên 800-762an de, di nameyên waliyên Asûriyan de navê bajêr gelek caran Amîd derbas dibe.

Arsaklı di pirtûka xwe ya Agathangelosun de ku pz. di sala 305an de nivîsiye, "Navê bajêr Amîd e", dibêje. Dîroknivîsê Romî Amianus Marcellius di sala 359an de behsa Amîda dike. Tê gotin ku hukimdar Dara (Darab) ev bajar ava kiriye. Gotina "Darabkerd" yanî Dara çêkirî û ev nav ji wî maye. Romî di sala

[2] Şevket Beysanoglu, *Diyarbakır Tarihi*, cilt 1, s.25, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür ve Sanat Yayınları-2003
[3] *Diyarbakır ve Yaşam, Tarih Boyunca Diyarbakır İsimleri*, sayfa 21, sayı:2,



Institut kurde de Paris




Nexşeya Amedê.
Nejat Satıcı

349an de dema bedena Amedê tamîr kirine navê bajar guhêrine û demeke kurt jê re gotine Augusta. Piştre dev ji vî navî berdane û dîsa Amîda gotine. Di *Zafernameyê* de navê Amedê Kela Reş e.

Ji sed sala 8an ve heta sedsala ku em tê de ne, jê re gotine Qara Amîd. Bi taybetî di serdema Artûkî û Aqqoyunîyan de Qara Amîd gotine. Di serdema Xelîfe Omer de ku artêşa Ereban herêma Amedê dagîrkirine, ji tevahiya herêma bakurê Dîclê re gotine Diyar-i Bekir. Yanî herêma ku di bin desthilatdariya Bekir de ye. Piştre bi tenê ji navenda bajêr re gotine Diyar-i Bekir. Di 15.11.1937an de Mustafa Kemal hatiye Amedê. Gotiye, "Ji vir bi şûn de divê navê Diyarbekir bibe Diyarbakır."[4]

Ew diçe Enqerê û 25 roj paşê ango di 10.12.1937an de, bi biryara hukimetê navê bajêr dibe Diyarbakır. Lêbelê Kurd heta îro hem Diyarbekir û hem jî

Institut kurde

[4] Şevket Beysanoglu, *Diyarbakır Tarihi, cilt 1*, s.6, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür ve Sanat Yayınları-2003

Amed dibêjin. Bi kurdî û kurtî navê bajar ê herî kevn û orjînal Amed an Amîd e. Di van sed salên dawî de Kurdan di nav wan navên kevn de wekî alternatîv Amed hilbijartine û pejirandine.

## Girîngiya aborî, erdnîgarî û stratejî ya wê ya dîrokî

Amed wek bajar û parezgeh li bakurê Mezopotamyayê xwediyê axeke bi xêr û ber e. Deşta Amedê û yên derdorê ambara tene ne.

Di dema xwe de çemê Dîclê hem ji bo avdanî û hem jî ji bo çûnûhatinê di navbera bajarên Amed, Heskîf, Cizîr, Musil, Bexda û Besrayê de roleke mezin lîstiye. Bi kelekan li ser Dîclê ji Amedê heta Musil, Bexda û Basrayê bar û barxane birine. Di nav van bar, serbar û barxaneyan de ji darên spîndar bigre heta titun, mantîn, pûşî, gelek xwarin û tiştên din hene.

Artêşên li herêmê çek û malzemeyên lojîstîk li ser Dîclê heta Bexda û Basrayê birine.

Bajar tim li herêmê navenda berhemdarî û bazirganiyê bûye û îro jî weha ye.

Bajar li ser riya hevrîşim û bazirganiyê li cihekî girîng e. Ewropa û Asyayê, Afrîka û Asyayê bi hevdu ve girê dide.

*"Jina rind hertim belayê serê gund e!"*

Amed ji bo artêşê cihekî stratejîk û girîng e. Hîn îro jî artêşa ku Amedê bigre, dikare bi hêsanî herêmê bike bin kotrola xwe. Artêşên dagîrker her dem Amedê wek parezgeh, bargeh, ambarên zexîre, lojîstik û lewazimê bi kar anîne û tînin.

Di serdema me de av, bendav, çavkaniyên enerjiyê, maden, petrol li yên berê zêde bûne. Ji ber van sedem û taybetiyên xwe Amed dem dem di navbera xwedî û dagîrkeran de û dem dem jî di nav dagîrkeran de bi xwe bûye qad û meydana şer û cengan.

Di dîrokê de wek bajar û herêm tim ketiye ber êrîş, talan, kuştin, şewitandin, tofan û bobelatan. Koçkirin, kuştin, girtin, şewat, birçîbûn û xela bûne çarenûsiya amediyan.

Bedena Amedê ya şaheser, bêhemba şahid û sembola wan sal û rojên reş, bêbext, bêbav, bêwijdan û bûyerên dijwar û giran e.

Institut kurde de Paris

# Kurtedîrok

Dîroka Amedê ya reş beşek jê li ser kevirên reş ên bedena wê kolandî ye. Dîroka bajarê Amedê ya herî kevn ne zelal e. Kes nizane ka bajar kengî û ji aliyê kê ve hatiye avakirin. Wek dokumenteke dîrokî li aliyê Derê Çiyê li ser dîwarê herî binî nivîsekî bizmarî hebûye ku 3.000 sal bz hatiye nivîsandin. Ev diyar dike ku bedena beşa Serayê (Îçkale) 5.000 sal berî niha hatiye çêkirin. Wê demê Seray wek şatoyekê bi serê xwe bûye. Şatoyeke biçûk û li derdora wê kele hebûye. Lê gelek dîrokzan di wê baweriyê de ne ku dîroka avakirin û çêkirina bajêr ne ev e, ji vê dîrokê kevintir e. Bi kêmasî xwedî dîrokeke 10 hezar salan e.

Amedî ji dîwarê ku li derdora bajarê Amedê hatiye çêkirin re "B*eden*" dibêjin. Ev beden di heman demê de çarenûs û lênûsa dîroka Amedê ye. Dîrokeke zindî û berbiçav e. Dîrokên gelên din li ser çerm, papîrûs û kaxiz hatine nivsandin, lê dîroka Amedê li ser kevirên reş hatiye kolandin. Loma çarenûsiya amediyan jî bi hezar salan e ku reş bûye. Beden ne bi tenê ji bo parastina bajêr hatiye çêkirin, herweha ji aliyê nivîs, motîv, peyker û huner ve jî berhemeke dîrokî, nemir û hêja ye. Dîrokeke zindî û dîtbar e. Ji aliyê dîroka bawermendiyan ve jî berhemeke berbiçav û girîng e. Beden wek dokument, peyman û kitêbên pîroz e. Ji aliyê din ve rûreşiya dagîrkeran e. Ev beden nîşana zilm û zorê ye, xwîndar e.

*"Bêxweda be, lê bêxwedî mebe!"*

Her destılatdarê ku Amedê bi dest xistiye, bîr û baweriyên xwe yên olî û netewî bi hunereke bilind, bi nivîs û sembolên xwe li ser kevirên dîwar ê bedena Amedê daye kolan. Xwestine bi vê hêzê, xof û mezinahiya xwe bidin xuyakirin. Piştî ku dagîrker bi şûn ve çûne, şopên wan ên bi xwîn li ser kevirên bedenê mane. Ji bo ku vê dîroka bi xwîn veşêrin, xwediyê bajêr înkar û îmha bikin, ji wê demê ve heta niha çi ji destên wan hatiye kirine û hîn jî dikin.

Wek ku zanyar û dîrokzanekî Ewropî dibêje, *"Ji bo xelkek felaketa herî mezin ew e ku dîroka wan ji aliyê dijminê wan ve hatibe nivîsîn."* Bi rastî ev gotin ji bo me Kurdan di cihê xwe de ye û ev ji şer, lêdan, êşkence û dagîrkeriya axê xerabtir e. Ev dagîrkerî atomîzekirina mejî ye.

Arkeolog û dîrokzanan pêşî texmîn dikirin ku cara yekem şaristanî li başûrê Mezopotamyayê dest pê kiriye. Ji ber vê yekê li wir dest bi lêkolînên arkeolojîk kirin. Pêşî rastî şaristaniyên Akad û Babilan hatin û gotin: "Ev li cîhanê

Institut kurde de Paris

şaristaniya yekem in." Piştre derket holê ku berî Akad û Babîlan, Sumer hebûne. Vê carê arkeologan lêkolîn û lêgerînên xwe li ser Sumeran hûr, kûr û berfireh kirin. Li bakurê Mezopotamyayê qet haydar nebûn, bala wan nedikişand û nefikirin ku li wir jî dest bi lêkolînan bikin. Lêbelê di van 40-50 salên dawî de, giraniya lêkolînên xwe dan bakur. Dîtin ku bi rastî şaristaniya li bakurê Mezopotamyayê ji ya başûr kevntir e.

Arkeologan bi metodên zanyarî li herêma Amed û derdorê wê lêkolînên hêja kirin û gelek encamên berbiçav bi destxistin. Derxistin holê ku di serdemên neolotîk û paleolîtîk de mirov li herêma Amedê dest bi jiyana civakî kirine û şaristanî ava kirine. Yek ji wan jî li Erxeniyê di nav axa gundê Hîlarê, Qotê Berçem (Çayönü) e. Ji zanîngeha Chicago Beşa Rojhilat Prof. Dr. Robert J. Braidwood û ji zanîngeha Stanbulê ji Fakulta Edebiyatê, beşa Prehistoriya Prof. Halet Çambel di salên 1964an de li Qotê Berçem bi xebatên xwe yên arkeolojîk ji bin erdê şopa gundekî serdema Neolotîk derxistin. Li ser encama van xebatên xwe yên arkeolojîk bi nivîskî raporeke dûr û dirêj belav kirin. Di vê rapora xwe ya zanyarî de diyar kirin ku 7250 sal berî zayînî mirovan cara yekem li Qotê Berçem mal û xanî ava kirine, çandiniya genim kirine, di firnê de nan pijandine. Heywan xwedî kirine. Bin malên xwe kolane û miriyên xwe di bin malên xwe de veşartine. Ango goristana wan di bin mala wan de bûye. Maden bi dest xistine û ji madenê alet û alav çêkirine. Herweha di vê lêkolîna arkeologan de, ne bi tenê aliyê madî û teknîkî, ji aliyê civakî û olî ve jî gelek berhem bi dest xistin û dîroka tarî ronî kirin. Gelê wê serdemê bi roj û hîvê bawer kirine. Av, ax, hewa û agir pîroz dîtine. Ev ji wan re çar tiştên bingehîn bûne. Di civata wê demê bawermendiya Ezoterîm (batinî) hebûye. Arkeolog û lêkolînvanên dîrokî texmîn dikin ku ev şaristaniya yekem ku li Qotê Berçem hatiye avakirin, ji Subartuyan ku ji wan re Sabî jî dibêjin, maye.[5] Di vê serdemê de Xweda û Xwedawendên herî mezin Roj, Hîv û Agir bûne. Di nav wan de ya herî mezin Roj e û jê re Şamaş gotine. Hîv ruyê wê jin e û jê re Sîn gotine. Herweha gerekstêrk jî pîroz hatine dîtin û qebûlkirine. Sîstema rojên hefteyê jî ji " *şem*" an jî ji "*Şamaş*" hatiye. Şemî, yekşem, duşem, sêşem, çarşem û pêncşem. Roja înê li derê sîstemê maye. Ev sîstema rojan hema hema di hemû zimanê Hînd-Ewropî de weha ye. Monday, sunday, saturday û hwd. Ev bîrûbwerî ji dema Subariyan heta dema Hûrî, Mîtanî, Medan heta ku artêşên Ereban hatine Kurdistanê dom kiriye. Divê neye ji bîrkirin ku di navberê de agirperestên Zerdeştî jî hene.

[5] Müslüm Üzülmez, *Makam Makamı Çiçegi ve bülbül*, Tıtız Yayınları, s. 34, 2010



Qilê Berçem
Foto: Melike Dara Gönül

Wek tê zanîn li herêma Amedê ji serdema keviri ve gelek nawis û şikeft hene.[6] Arkeolog texmîn dikin ku ev nawis û şikeftên Hîlar (Erxenî), Hasûnê (Farqîn), Biriqleynê (Licê), Gêlê, Hênê, Heskîf (Hasankeyf), Darê (Mêrdîn) û yên herêma Nemrûd û Rihayê jî di serdema Neolîtîk û Paleolotîk de ji aliyê Sûbarî, Hûrî û Mîtaniyan de hatine kolandin. Bi kêmasî ev nawis xwedî 15.000-20.000 salan in. Sûbarî, Hûrî û Mîtanî ji heman nîjadî ne û bav kalên Kurdan in. Ew xelkên binecihê herêmê yên herî kevn in. Mirovên wê serdemê ji bo ku xwe ji serma û ji heywanên kovî biparêzin nawis çêkirine. Ji wê serdemê heta îro li herêma Amedê 3579 nawis û şikeft mane. Ji wan 1161 nawis û 2418 jî şikeft in.

Herweha di van salên dawî de lêkolînên ku li herêma Qerecdaxê hatine destpêkirin dîroka hezar salan zelaltir dike. Ji zanîngeha Pennsylvania Dr. Patrick McGovern dibêje ku "Li cîhanê cara yekem li derdora Qerecdaxê mey (şerab) hatiye çêkirin. Dîsa li herêma Qerecdaxê cara yekem çandiniya genim hatiye kirin û navê wê *Einkorn*" e.[7] Arkeolog li Farqînê nêzîkî Pira Mala Badê

[6] Xaniyên ku ji kevir hatibine kolandin re nawis dibêjin. Bı tirki dibêjin taşmezar. Nawis û şikeft ne yek in. Şikeft xwezayî ne û ji aliyê mirovan ve nehatine kolandin.

[7] Dr. Hatice Bilgiç, *Anadolu Uygarlıklarının izinde bugdayın kökleri*, Bugday dergisi 27.04.2004

Institut kurde de Paris

li devera çemê Halan rastî cihekî dîrokî hatin. Piştî lêkolîn û lêgerînan cihê şaristaniyeke ji bin erdê derxistin ku xwedî dîrokeke bz 11 hezar salan e. Heta niha ciyê herî kevn e. Ji Qotê Berçem kevintir e, lêbelê teknîka Halan ji ya Qotê Berçem paşvetir û prîmîtîvtir e. Lê hezar mixabin çemê Halan ket bin Bendava Batmanê.

Em ê bi rêza dîrokî hêz û desthilatdarên ku ji destpêkê heta niha Amed û herêma wê ava kirine, dagîrkirine, birêvebirine bi kurtî binivîsin.

## Sûbarî û Sûbartû

Gotî Kurdên herî kevn in û Agirî (Araratî) ne. Gotî di nav xwe de dibin sê beş: Lolo, Kasî û Sûbarî.[8] Sûbarî bz di navbera salên 4.500-4.000î de, di navbera Gola Wanê, çiyayê Zagrosan, çemên Dîclê û Feradê de jîyane. Ji welatê wan re Sûbartû û xelkê re jî Sûbarî gotine. Hinek cîranên wan navê *"Sûbîr"* li wan kirine. *Şereş* Paytextê Sûbariyan bûye. Xelkê herî kevn û binecihê herêmê ne. Ev serdema Sûbariyan ji aliyê dîrokzan û arkeologan ve hewqas ne zelal e. Sûbarî, Hûrî, Mîtanî, Nayîrî (Naîrî), Medî (Madî) ji heman nîjadî ne. Mirov dikare bêje Sûbarî bav û kalên van hemûyan in. Yên din her yek şaxek ji Sûbariyan in.

Serdema wan serdema Neolotîk e. Piraniya nawis û sarincên ku îro li Kurdistanê hene di dema wan de hatine kolandin. Gund û bajarên ji nawis û şikeftan di dema wan de dest pê kiriye û Hûrî û Mîtaniyan ji wan wergirtine.

## Hûrî

Hûrî bz di navbera 4000-1500an de li herêmê desthilatdar bûne.[9] Hûrî di navbera Amed, Xarpêt, Meletiye, Riha û herêma Serhedê de jiyane. Pıştre di dema împaratoriya xwe de Kenan yanî Filistîn û İsraîla îroyîn xistine bin desthilatdariya xwe. Di destpêkê de Mîtanî di nav Hûriyan de bûne û piştre herduyan li gel hev federasyoneke hevpişk ava kirine. Di wan serdeman de li rojavayê wan jî Hatî (Hîtît) hebûne. Herweha Hatî jî beşek ji wan in. Hemû bavkalên Kurdan in. Her yek eşîreke serbixwe bûye.[10]

Eşîreta Hûrî li bakur li herêma Amedê û Mîtani jî li başûr ji Serêkaniyê (navê wê demê Vaşşûkanî bûye) heta Nisêbîne bûne. Sumeran ji wan re Hûrî û Misiriyan jî Harî gotine. Di Tewratê de jî navê wan Hûriyat "Horît" e. Ewropî niha jî Horît dibêjin. Hûrî bi zimanê Babîlî Şikeft e. Ango xelkê şikeftê.

---

[8] Ekrem Cemîlpaşa, *Diroka Kurdistanê bi kurtebirî*, r.45

[9] Gwi Mukriyani, Ferhengi Kurdistan, Enstituya Kurdî liAmedê-2010

[10] Cigerxwîn, *Tarixa Kurdistanê*, cilt 1.



Institut Kurde de Paris

## Mîtanî

Bz di salên 1.500an de federasyona Hûrî û Mîtaniyan bûye du beş. Berê desthilatdariya Hûriyan sist û ya Mîtaniya xurt bûye. Mîtanî ji başûr heta Kenan û Misirê sînorên xwe berfireh kirine. Ji rojava ve heta sînorên Hatiyan çûne. Di navbera wan û Hatiyan de peyman pêk hatine. Piştre Hatî hem bi qiralê Misirê û hem jî bi qiralê Asûriyan re peyman çêkirine û bi hev re êrîşî Mîtaniyan kirine û desthilatdariya Mîtanîyan hilweşandine.[11] Bz ji rojhilat ve tixûbê Mîtaniyan heta gola Wanê bûye. Tê gotin ku peyva *"Mîr"* ji Mîtaniyan maye. Di navbera salên 1304-1273an de qiralê Asûriyan Salmanassar-I êrîş biriye ser Mîtaniyan. Tila (Wêranşehîr) û Amedê ji Mîtaniyan girtiye[12]. Mitanî ji desthilatdariyê ketine û di nav Nairiyan (Nêrbîyan) de ji dîrokê rabûne.



Nameya qıralê Mîtani Tuşrata ji bo qiralê Misirê Amenhotepê III (bz 1370)

Mîtanî di warê mîmarî, bijûndarî, perwerde, huner, teknîka leşkeriyê de gelek pêşketî bûne. Bedena hundir ku jê re dibêjin *Sera* 3000 bz ji aliyê Hûrî-Mîtaniyan ve hatiye çêkirin.

Hûrî-Mîtanî Arî ne. Hinek arkeololog dibêjin Mîtanî û Hûrî heman xe!k in, lê Mîtanî arîstokratên Hûriyan in. Dibêjin ku navê wan Matanî bûye. Matanî di nav demê de bûye Mad û Mad jî di nav demê de bûye Med. Sûbarî, Hûrî, Mîtanî, Hatî û Medî heman xelk in. Di van lêkolînên salên dawî de zelal bûye

[11] Birgit Brandau & Harmut Schickert, *Hititler Bilinmiyen bir dünya ımparatorlugu*, Arkadaş yayınları s. 157

[12] http://viransehir.meb.gov.tr/1024/viransehir/tarihce.htm

Institut kurde

ku zimanê wan zimanê Hînd-Ewropî yên herî kevn in.[13] Warê wan ê herî kevn jî di navbera Gola Wanê û Zagrosan de bûye.

Di van salên dawî de arkeologan li vê herêmê çend wêneyên ku li ser hestiyan çêkirine, dîtine. Ji wan wêneyan yek jî wênaya hespek ku di wê demê de hatiye çêkirin. Herweha di nivîseke dirêj ku di dema Mîtaniyan de, li ser hesp û perwerdeya hespan hatiye nivîsîn jî ji bin axê derxistine. Ev nivîsa ku li ser kevir kolandiye ji du tabletan pêk tê. Ev tablet 1350 sal bz. hatiye nivîsîn. Navê nivîskarê wê Kîkkûlî ye. Kîkkûlî bi zimanê Mîtanî nivîsiye. Ew di vê nivîsa xwe de li ser teknîka perwerdeya hespan radiwestiyaye. Kîkkûlî bi xwe di dema Mîtaniyan de serperwerdekarê hespan bûye. Piştre Qiralê Hatiyan Supîlîlîuma bz di sala 1345an de Kîkkûlî birîye û ji xwe re kirine serperwerdekarê hespan. Hespên Hatiyan ji bo şer perwerde kiriye. Hatî pêşî êrişên ser Mîtaniyan dikin û Mîtaniyan ji navê radikin û Piştre jî êriş dibin ser Misirê.[14]

## Serdema Asûriyan

Bz. heta sala 1380î Asûrî tim di bin êrîşên Babîlî û Mîtaniyan de bûn. Di nav Babîlî û Mîtaniyan de, li dij Asûriyan hevkarî hebû. Ji jor ve Mîtanî û ji jêr ve jî Babîliyan erîş dibirin ser welatê wan.

Berî zayînî di sala 1380î de Asûr-Ûballît bû qiralê Asûriyan. Asûr- Ûballît artêş bi rêk û pêk kir, bi Hatiyan re peymaneke çêkir. Herduyan bi hev re êrîşeke mezin û dijwar birin ser Mîtaniyan. Dewleta Mîtaniyan tar û mar kirin. Asûrî xurt bûn. Salmanazerê Yekem di sala 1260an de herêma Amedê bi giştî dagîr kir. Piştî 50-60 salan herêm di bin dagîrkeriya Asûriyan de ma. Di sala 1200ê bz de Muşkîniyan derbeyeke mezin li Asûriyan xist. Herêm ket bin desthilatdariya Muşkînî, Nehrî û Kurxiyan. Ev hersê bir (beş/ eşîr) jî ji Sûbariyan in. [15]

[13] Birgit Brandau û Hartmut Schickert, *Hititler,* Arkadaş yayınları, s. 29, Ankara-2004

[14] Kîkkûlî pêşî hespê hêdî hêdî dimeşîne, germ bike û piştre dest bi meşa dirêj û pît dike. Di meşên dirêj de, pêşî bi galopî, bi rewanî û di dawî de jî bi loqî hespê perwerde dike. Li gor Kikkûlî divê perwerde bi qasî şeş mehan dom bike. Rojê sê-çar caran êm bide hespê. Kikkûlî bi perwerdeyeke ser û ber û sîstematik hem, ji aliyê laş, hêz û derûnî ve hespê amade dike. Jê re înterval idman dibêjin. (Kaynak: *Bydıgi Forum)* Dema hesp xwêdan bide divê cilekê bavêjin ser û demeke dirêj wê birçî bihêlin. Herweha hesp nexweş nakeve û kilo dide. Heta ji bo zeyifbûnê cureyeke gîha didinê. Ev teknik îro jî ji bo perwerdeya hespan tê bikaranîn. Di vê meqaleya Kikkûlî de gelek gotin û term hene ku di kurdiya îroyîn de ji ji bo hespan tê bikaranîn. Ji wan terman yek ji "tera" ye. Kîkkûlî gotina "tera" ji bo pêşbirik an jî bezê bi kar aniye. Piştî 4.000 salan hîn îro ji kurd gotina "terad" bi kar tînin. "Min hespê xwe rakir teradê. Tu çı teradan didî xwe lo!"

[15] Di Tewratê de navê Mûşkiyan "Maş" derbas dibe. Li gor Ekrem Cemîlpaşa Navê Mûşa îroyî ji dema Mûşkiyan ve maye. Gundê Licê ku navê wê îro jî hîn Korxa ye, ji dema Kurxiyan ve maye. Nivîsên qiralê Asûriyan Tîglatpîleser ku li ser zinarê şikefta Brikleynê daye kolandin hîn îro ji hene û di vê mijarê dokumentên dîrokî ne.

Institut kurde de Paris



Nigarê qiralê Asûriyan li kela Gêlê
Foto: Aşkın Zaman

Institut kurde de Paris

## Serdema Nehrî û Kurxiyan

Bz di salên 1190 de Nehrî Kurxî li herêmê dibin desthilatdar. Nehrî û Kurxî her yek ji bireke Mîtaniyan e. Mirov dikare bêje berdewamiyên Mîtaniyan in. Bz di navbera salên 2000-1119an de herêm ket bin deshilatdariya wan. Bi taybetî Nehrî li herêmê xurt bûn ji çemê Zê heta çemê Diclê, Ferad û Xarpêt, Dersim û çiyayên Torosan fermandariya xwe berfireh kirin. Heta sala 1116an herêm di bin destê van mîran de ma. Tîglatpîleserê Yekem bû qiralê Asûran. Wî arteşeke mezin û xurt ava kir. Asûrî carek din derketin qada şer.

## Serdema Tîglatpîleserê Yekem

Bi qasî sed sal piştre, bz di sala 1116an de Tîglatpîleserê Yekem bû qiralê Asûriyan. Tîglatpîleser biryar da, welatê ku Asûriyan berê ji Nehrîyan girtibû bi paş

ve bigre. Bi artêşeke mezin ber bi bakur ve kete ser riya şer. Berê artêşa xwe da rojhilatê Amedê erîşî Prensên Kumux, Muşkî û Nêrbiyan kir. Qiralê Kurxiyan Kîllî- Teşûbî dîl girt. Xelkê wan ber bi bakurê Licê niha bi herêma ku wê demê jê re *Şîrîşa* digotin ve ber bi çiyê ve reviyan. Tîglatpîleser heta çiyayê Korxa û Şikefta Brikleynê bi pey wan ket û gelek ji wan di bin şûr de derbas kir. Piştre vegeriya kela Gêl û Urhan (Erxeniyê), herdu kelan bê şer dagîr kir. Encama vî şerê xwe yê barbar li ser zinarê Biriqleynê daye nivîsandin û peykerên xwe li ser zinarê Biriqleynê daye kolandin. Nivîsa ku hîn îro jî li ser zinarê Biriqleynê heye Kurdiya wê weha ye.

Nivîs-1
*'Dagîrkerê welatê Naîrî*[16]
*Qiralê her çar aliyê cîhanê, qiralê Asûr*
*Yê bi hêz, qiral Tîglatpîleser*
*Min ji welatê Tûnnî, Dayanî, Kîrxî heta deryaya mezin girt."*

*Nivîs-2*
*"Bi alîkariya began, xwedanên mezin Aşûr, Şamaş*
*Qiralê welatê Asûr kurê Mutakkîl-Nusku kurê qiralê Aşûrê-Reşî*
*Ez qiralê Asûr Tîglatpîleser*
*Deryaya mezin a welatê Amarrû*
*Û ji deryaya welatê Naîrî*
*Cara sêyem e ku ez diçim welatê Naîrî."*[17]

Bz di sala 1116an de herêma Amedê bi giştî ket bin destê Tîglatpîleserê Yekem. Piştre carek din dewleta Asur jar bû û hêzên Asûriyan ji herêmê bi paş ve vekişiyan. Di şûna wan de mîrê Bît-zamanî herêmê bi rêve bir.



Pereyê ku li ser navê Qiralê Diyarbekir hatiye derxistin.

[16] Bi kurdî Nehrî ye û di nav demeke dûr û dirêj de bûye Nêrib. Îro li herêma Hênê bi navê Nêribê pênc gund hene: Nêriba Axan, Nêriba Culegan, NêribaYusufan, Nêriba Melikan û Nêriba Aliyan.
[17] Amed Tigris, Licê r. 208

## 900-825 Bîtî

Qiralê Asûriyan Tîglatpîlserê Yekem dimire desthilatdatiya Asûran jar û belav dibe. Heta wê demê di navbera Hatî û Asûriyan de peymaneke dostane heye. Piştî mirina Tîglatpîserê Yekem prensen Hatiyan yek bi yek dibin desthilatdariyên biçûk û serbixwe. Di wê demê de li herêma Amedê jî valahiyeke desthilatdariyê peyda dibe. Bîtîyên ku tê gotin bi eslê xwe Samî ne bz. di salên 900î de ji başûr ve ber bi bakur tên û li herêma Kurdistanê çend mîrîtî ava dikin. Mîrîtiya Bîtiyan jî li herêma Amedê dibin xwedî desthilatdar. Mîrîtiyeke biçûk e û heta sala 825an dom dike. Amed bi qasî 76 sal di bin fermandariya wan de dimîne. Di vê serdema wan de avahî û guhartin ne diyar û zelal in.

## 825-653 Serdema Ûrartûyan

Amed du car dikeve bin destê Ûrartûyan. Navê Ûrartûyan ê orjînal Bîaînîlî ye. Cîranên wan navê Ûrartû li wan kirine. Piştî mirina qiralê Asûriyan Salmazerê Sêyem, dewleta Asûriyan sist û belav dibe. Di wê serdemê de Ûrartû li herêma Wanê desthilatdar in. Ûrartuyî hêdî hêdî ber bi rojava ve tên û herêma Amedê ji Asûriyan digrin. Desthlatdariya Amedê vê carê dikeve destê Ûrartûyan. Hinek dîrokzan dinivîsînin ku Ûrartû bav û kalên Ermeniyan in.

## 653-625 Serdema Îskîtiyan

Îskîtî di navbera çemên Tûna û Volgayê jîyane. Desthilatdariya wan bz di navbera salên 653 û 62an de bûye. Tê gotin ku welatê wan ê yekem Trabzon bûye û ji wir li derdora Deryaya Reş, Qirim, Tûna û Volgayê belav bûne. Îraniyan ji wan re Saka, Ereb Eskîzî û Yunaniyan jî Îskîtî gotine. Derayaya Reş û herêma Serhedê demeke dûr û dirêj ketiye bin desthilatdariya Îskîtiyan. Xelkekî şerker û talanker bûne. Wek Moxolan ku cihê dagîrkirine talan û wêran kirine. Îskîtî ne Tirk in, Qafqasî ne.[18] Hinek dîroknas dibêjin dikarin Tatar bin. Li herêmê bi qasî 28 salan desthilatdar bûne. Demeke heta Misirê jî desthilatdariya wan hikum kiriye. Kurdistan jî demeke kurt ketiye bin desthilatdariya wan. Di şerê Med û Asûriyan de alikariya Asûrîyan kirine, lê bi ser neketine.

Herodot dibêje ne Îranî ne. Gelekî xwedî çand in. Bi taybetî di warê karê destiyê zîv de, çêkirina û mêzekirina diranan de, di cebrandina şikestin û ji cihderketine organên laşê mirov de gelek pêşketî bûne.

[18] Şevket Beysanoglu Diyarbakır tarihi cilt-1 rûpel 81.

Institut kurde de Paris



Temsîla qiralê Medan

Institut Kurde de Paris

## 625-550 Serdema Medan

Medî an jî Madî ji Îranê heta çemê Kizil, Îraq û Sûriyeya îroyîn împaratoriyeke mezin ava kirine. Împaratoriya Medya sîstemeke federasyonî û paytexta Medan bajarê Akbatan bûye. Medan xwe xelkeke arîstokrat û esîl didîtin. Bi çavekî biçûk li cîranê xwe Persan dinêriyan. Tê gotin ku gotina Pers ji parsekiyê hatiye. Pers ne xelkê binecih ên Îranê ne ji rojhilat ve koçber hatine û li Îranê bi cih bûne. Nêzîkî sedsalekê herêma Amedê di bin desthilatdariya Medan de maye. Wek Sûbarî, Hûrî û Mîtaniyan Medî jî Arî ne û beşek ji wan Kurd in. Lêbelê li gor dem û eşîreta wan navê wan hatiye guhertin. Nehrî, Lolo, Gotî û Kasî jî Kurd in. Di navbera çiyayê Zagros, Gola Wanê ji rojava ve heta Anatoliyê, Îraq û Sûriye îroyîn dem bi dem bi sedsalan hukum kirine. Di sala 550an de ji aliyê prensên Persan ve împaratoriya Medan hatiye hilweşandin. Zimanê Medan nêzîkî kurdî û farisî ye.

## 550-331 Serdema Persan

Medan tu fersend nedane Persan. Pers ji bakur û rojavayê Îranê ber bi başûr ango ber bi Zagrosan ve çûn û bi cih bûn. Qiralê Persan Kuraşê Duyem miroveki fenker bûye. Keys li qiralê Medan Astagiyanî anîye û ew têk biriye. Piştre axa Medya xistiye bin destê xwe û bz di sala 550an de herêma Amedê jî ketiye bindestê Per-

san. Desthilatdariya Persan li herêma Amedê carcaran qut bûye, lê hemû li ser hev 220 salan dom kiriye. Herweha demeke dirêj Rojhilata Navîn, Anatolî û heta Trakiyayê ketiye bin desthilatdariya Persan. Bz di sala 330an de Îskenderê Mezin berê xwe da rojhilat, li herêma Behra Spî zora qiralê Persan Dara (Daryus) birîye û heta Nînovayê daye peyî Dara û li wir jî careke din artêşa Dara tar û mar kiriye Heta Îranê ew şopandiye. Fermandarên Dara bi xwe Dara kuştiye. Îskender dawî li desthilatdariya Persan anîye. Herêm ketiye bin destê artêşa Îskender.

Ji dema Îskender ve heta serdema Osmaniyan Amed wek bajar û wek parezgeh di dîrokê de bûya qada şer û pevçûnên Rûm û Îraniyan. Li ser Amedê şerê herdu împaratoriyan bi sed salan dom kiriye. Di navberê de desthilatdariyên din hatine û çûne. Ev herdu alî mayende mane. Li ser axa Amedê şer, talan û wêrankirin domandine. Piştî ku osmanî hatine Anatoliyê vê carê şer di navbera Îranî û osmaniyan dom kiriye.

## 331-140 Serdema Îskender û Seleukos

Îskenderê Mezin û qiralê Persan Darayê Sêyem bz di sala 333an de li Îssos a Hetayê şerekî dijwar dikin. Ji Darayê Sêyem re Darayê Madî jî dibêjin. Darayê Madî ji eşîreta Key Kubadê Kurd e. Artêşa Dara şikest û Anatolî û Kurdistan ketin bin desthilatdariya Îskender. Îskender heta Îran û Hîndistanê çû. Hemû herêm ket bin desthilatdariya wî. Di sala 323an de Îskender mir û desthilatdariya wî belav bû. Piştî mirina Îskender serdar û fermandarên wî imparatotiyê di nav xwe de dikin sê perçe.[19] Ji fermandar Antîgonos re Yewnanistan û Balkan, ji Pêlolêmêos re Misir û ji Seleukos re jî perçeya herî mezin beşa Asyayê dikeve. Her weha bajarê Amedê jî dikeve bin desthilatdariya Seleukos. Hem di dema Îskender û hem jî di dema Seleukos de ji derî wêrankirin û talankirinê mirov tu tiştekî din li herêma Amedê nabîne.

## 53-226 (bz) Serdema Aşkanî û Tîgranê Mezin

Navê Partiyan ê rastî Aşkanî ye û avakarê dewleta Aşkaniyan Aşek e. Tê gotin ku Aşek bi xwe Kurd e û dewleta wî ji Kurd û Persan pêk hatiye. Ew bi xwe neviyê Darayê Madî ye. Ewropî "Parthe", Ereb, Ecem û Tirk dibêjin "Fursî". Partî Îranî bûne û Hemedanê ji xwe re kirine paytext. Piştre bi rojhilat ve heta Pakistan, başûr ve heta Mezepotamyayê û bi rojava ve jî heta Anatoliyê çûne û girtine bin desthilatdariya xwe. Berî zayînî di sala 140î Med û Seleukosan jî têk

[19] Alf Henrikson & Björn Berg, *Alla Tider*, s.90



Nexşe: Ji ansiklopediya swêdî, Världshistoria.


birine û Amed jî ketiye bin desthilatdariya Aşkaniyan. Heta sala 85-84an Amed di bin desthilatdariya wan de maye.

Tîgranê Mezin ermenî bû. Ew di dema desthilatdariya bavê xwe de, bi dîlîtî ketibû destê Partan. Ew bi mirina bavê xwe re vegeriya welatê xwe. Pêşî bi Partan re ket şer û beşek axa xwe ji wan bi paş ve girt. Artêşa xwe bi rêk û pêk kir û di salê 93an de Kapadokyayê wergirt û di 85an de jî berê xwe da Mezopotamyayê. Erbîl, Nînova, Musil, Amed dagîr kir. Di sala 77an de bajarê Meyafarqîn û Keleyeke li Tûr Abidîn ava kir. Di sala 69an de bi artêşa Romayê re ket şer û di şer de bi ser neket. Amed û herêmên derdorê careke din ketin bin destê Romê. Desthilatdariya Tîgran 16 sal dom kir.

## 226-395 Serdema Sasanî - Romiyan

Li herêmê şerê di navbera Aşkanî, Ûrartû, Sasanî û Romiyan de dom dikir. Herêma Amedê jî di navbera wan de dest diguhêre. Ardeşêrê Babekî ku ew ji neslê Key Kubbat bû, ji Persan nefret dikir. Qiralê wan dikuje û di sala 226an dikeve bin destê Ardeşêr ku qiralê Sasaniyan bû. Ardeşîr ji Partan hez nedikir û ji ber ku Part ji çanda Helenan hez dikirin. Ardeşêr hestên persîtiyê xurt kir û ola Zerdeşt kir ola fermî. Piştî Ardeşêr şerê di navbera Roma û Sasaniyan de dom kir. Di sala 297an de carek din Sasanî têk çûn û Amed ket bin destê Romiyan.

Institut kurde de Paris




Kirokiya bedena Amedê:
Ilustrasiyon:
Albert Gabriel, 1930
1. Dewra yekem Sera (İçkale)
2. Bedena dewra duyem
3. Bedena dewra sêyem

## 395-639 Serdema Sasanî, Romî/Bîzansiyan

Qiralê Romê Constantiosê Duyem ji bo ku bajar ji ber êrişên Sasaniyan biparêze, di sala 349an de dest bi çêkirina bedena Amedê kir. Tê gotin ku cara yekem pz di sed sala yekem de beden hatiye lêkirin, lê di vê mijarê de dokumeteke berbiçav tune. Di dema Constantiosê Duyem de beden di ser cadeya Gaziya îroyîn de ji Derê Mêrdînê heta Derê Çiyê tê çêkirin. Aliyê rojava cadeya Gazî ya îroyî tune bû. Wê demê nifûsa bajêr 20.000 bûye.[20]

Di sala 395an de Împaratoriya Romayê perçe bû. Roma wek xwe ma û Stanbul jî bû Bizans. Bîzans li ser malê Romaya Rojhilat rûnişt. Her çendî bi aweyekî fermî nebe jî, çemê Feradê di navbera Împaratoriyên Bîzansî û Sasaniyan de bû tixûbê xwezayî û siyasî. Aliyê Rojavayê Feradê ket bin desthilatdariya Bîzansê û Rojhilatê jî ket bin desthilatdariya Sasaniyan. Piranî û giraniya axa Kurdistanê ket bin desthilatdariya Sasaniyan. Wek berê jî me destnîşan kiribû, ji destpêkê ve axa Anatoliyê û Kurdistanê tim di nav herdu împaratoriyan de bûye qada şer, ketiye ber kar û êrîşên talan, wêran, kuştin û şewtandinê. Wek qertalên ku li ser leş şer bikin, tim di navbera herdu împaratoriyan de şer hebûn. Di çend salan

[20] Ernest Honingman, *Bizans devletinin dogu sınırı* (wergera Fikret Işıltan), r.2-1970

de carekê desthilatdarî hatiye guhertin. Piştî damezrandina Bîzansê vê carê li ser heman axê şer di nava Bîzansî û Sasaniyan de dom dike.

Protop di pirtûka xwe ya "Şerê Farsan" de dinivîse ku qiralê Sasaniyan Kobad der û dor li Amedê digire. Êrîşên dijwar dibe ser bedenê, lê demeke dûr û dirêj nikare bikeve hundir. Kobad li der, li çend cihan bircên taybet dide çêkirin.[21] Ji yên bedena bajêr saxlemtir û bilintir ava dike ku nav bajêr bibîne ka rewş çi ye. Bi mencenîqan kevir, sersot û qitorên agir ên bi zîft davêjin nav bajêr. Zerareke mezin dide bedenê û qulên mezin di bedenê de vedike. Şewat û kuştin li nav bajêr dest pê dike. Kes nikare ji malên xwe derkeve der. Romî li dij van bircên taybet ên Sasaniyan perîşan dibin. Romî piştre planeke çêdikin. Ji hundirê bedenê ve di bin erdê de heta bin wan bircên Sasaniyan erdê dikolin û tunelekê çêdikin. Binê wan tijî teqemenî dikin û agir berdidin û bi ser leşkerên Kobat re tînin xwarê. Wek ku erdhejeke mezin û bi hêz çêbe. Bi sedan leşkerên Kobad di bin xurbên bircan de dimînin û dimirin. Kobad êdî bawerî tîne ku nikare bi hêz û şer Amedê ji Bîzansiyan bigire. Li riya dek û dolaban, fen û fûrtan digere. Kobad dev û dest ji dorpêçana bajêr bernade. Piştî ketina beden û mirina leşkerê xwe 93 roj paşê di tuneleke ku di bin erdê re diçe bajêr dibîne û di wê tunelê re leşkerên wî dikevin nav bajêr. Ew di meha yekem a 503an de bajar ji Romiyan digire.

## 639-984 Serdema Sê Xelîfeyan

Di sala 637an de Xelîfe Emerê Bîn Xetap artêşa xwe şand ser Sasaniyan. Di navbera padîşahê Sasaniyan Yezgird (Yezdîgurd) û Xelîfe Emer de gelek gengeşe û gotûbêj hene. Padîşahê Sasaniyan Yezgird di şer de tê kuştin. Êdî Faris nikarin xwe ji nû ve birêxistin bikin û li dij artêşa Ereban şer bikin. Neçar dimînin û Îslametiyê qebûl dikin.

Wek tê zanîn Dewleta Sasaniyan li ser pişta Kurdan hatibû avakirin. Piştî belavbûn û teslîmbûna Farisan, Kurdan dev ji Zerdeştiyê bernedane û li dij artêşên Îslamê li ber xwe dane. Gelo di wê demê de bajarê Amed û Meyyafarqîn di bin desthilatdariya kê de bû? Li gor hinek dîrokzanan Amed di wê demê de di bin destê Meryema Dara de bû. Li gor hinekên din jî, di bin desthilatdariya Fermandarê Romê Antak de bû.[22] Lê kîja dibe bila bibe, xûyaye ku desthilatdariyeke xurt tune. Li ser vê yekê Ereb bi 8.000 leşker di 639an de der û dor li

[21] Ş. Beysanoglu û çend kesên din nivîsîne ku bedena duyem çêkirine, ev ne rast e. Çima bedena duyem çêkin. Ne mumkun e ku di demeke hewqas kurt de bedeneke weka ya niha li derê vê bedene were çêkirin. Karê 20-30 salan e. Dîsa ne mumkun e ku bedeneke 5 km dirêj binê wê vala bikin û biteqînin. Bi tenê li çend cihan qûleyên bilind çêkirine. Ev di serdemên cuda de gelek caran weha qûle hatine çêkirin. (Nivîskar).

[22] Heman berhem r.154

Institut kurde de Paris

bajarê Amedê digrin. Di navbera artêşa Ereb û amediyan de şerên dijwar derdikevin. Ereb artêşa xwe li çar cihên stratejîk ên bajêr bi cih dikin. Îyaz Bîn Ganem dibe Serokê bereyê Derê Mêrdînê, Muaz Bîn Cabal dibe Serokê Derê Çiyê, Xalid Bîn Welîd dibe Serokê bereyê Derê Çem û Seîd Bîn Zayd jî dibe Serokê bereyê Derê Romê. Artêşa Îslamî ji çar aliyan ve erîş dibin ser bajêr. Dikin nakin bi ser nakevin. Beden destûrê nade. Şerê dorpêçana bedenê bi qasî 5 mehan dom dike. Li gor gotinan rojekê leşkerên Xalid Bîn Welîd dinêrin ku kûçikekî di kanalîzasyona bajar de derdikeve derê bajêr. Xalid Bîn Welîd, di bin serokatiya kurê xwe Silêman de 80 leşkerên xwe yên herî şerker bi şev di cihê kelaya qul re dikevin hundirê bajêr, nav Serayê. Deriyê Fetîh ji hundir ve vedikin û artêşa Ereban dikevin hundirê bajêr. Ew 80 kes tên kuştin lê bi asoya 27ê gulana sala 639an de deriyê bajarê Amedê ji artêşa Îslamê re vedikin û bajar dikeve bin destê Artêşa Ereb. Seroka bajêr Meryema Dara di tunela bin Serayê de derdikeve derveyê bajar, direve û rizgar dibe. Wek her dem ku bajar dest diguhere û careke din bi sedan mirov tên kuştin. Artêşa Ereb gund, bajar talan û wêran dikin. Serdarê Artêşê Îyaz Bin Ganem dêra Toma dike mizgeft. Her mêrê ku Îslamê qebûl neke çar misqal zêr xarac lê dibirin. Xalid Bîn Welîd zilm û xerabiyê li xelkê dike û tê gotin ku di hemamê de mey vedixwe. Piştre giliya wî li cem Xelîfe Emer dikin. Bi fermana Emer ceza didin Xalid Bîn Welîd û dest didin ser mal û mulkê ku di xenimetê de wî ji bo xwe komkiribû.[23]

Herweha nivîskarê Kurd Ekrem Cemîl Paşa jî, ji bo wan kirinên Xalid Bîn Welîd ên ku li Kurdan kiriye gelek tiştên xerabtir û girantir nivîsiye. [24]

## A) Serdema Emewiyan

Şerê li ser xelifetiyê di navbera Elî û Muaviye de dom dike. Aliyê Elî Bexdayê û yên Muaviye jî Şamê ji xwe re dikin paytext. Piştî kuştina Elî Muaviya dibe xelîfe û Dewleta Emeviyan îlan dike û bajarê Şamê ji xwe re dike paytext. Amed jî dikeve bin desthilatdariya Emewiyan. Emewî waliyê xwe dişînin Amedê. Walîyê Emewî dest bi talan û xûgîtiyê dike. Heta wê demê her kesî bi zimanê xwe dinivîsand. Xelîfe Evdilmelîk cara yekem zimanê gelên din qedexe dike û wan mecbûr dike ku zimanê fermî tenê bi erebî be.[25] Şerê li ser xelîfetiyê bû şerekî xwîndar. Xelîfe li pey xelîfe hatin kuştin. Misilman bûn du parçe.

[23] Şevket Beysanoglu, Anıtları ve Kitabeleri ile Diyarbakır Tar'ı:i cilt 1, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Yayınları 2003. s. 160.
[24] Ekrem Cemîlpaşa, *Dîroka Kurdistanê bi kurtebirî*, r.154
[25] Mükrimin H. Yınanç, *Diyarbakır mad.* c.3.r 606



Derê Romê, 1930

Institut kurde de Paris

Piştî ku artêşa Ereban Amedê dagîr dikin, qebîleya Bekir Bîn Welîd tê li ber ava çemê Dîclê bi cih dibe. Ereb ji ber qebîleya Bekir Bîn Welîd, navê Bekir li Amedê dikin. Ereb gotina "diyar" jî di wateya "war" de bi kar tînin. Herdu gotin tên ber hev û dibe *"Diyarê Bekir."* Di demeke dûr û dirêj de herdu gotin dibin yek û dibe Diyarbekir.

## B) Serdema Abbasiyan

Di şerê xelîfetiyê de vê carê pismamê Hz. Muhammed di sala 750î de Abbas Bin Avdultalîb qezenc dike û dibe xelîfe. Abbas Dewleta Emewiyan ji binî ve hildiweşine. Abbasî ji bo ku nav û şopa Emewiyan ji dîrokê rabikin, metodên herî barbar, li dijî mirovahî û misilmantiyê bi kar tînin. Li Şam, Kinnasrîn û ciyên din ên ku Emewî jiyabûn û goristanên Emewiyan ên ku hebûn xera dikin. Gorên mezinên Emewiyan vedikin, hestiyen wan hûr hûr dikin û dişewitînin. Wek nimûne gora Xelîfeyê Emewîyan Hîsam ku li El Rûsefa bû, vedikin; pêşî hestiyên laşê wî didin ber qemçiyan û piştre dişewîtinin. Abbasî di 25.06.750an de 80 kesên ku ji Emewiyan bûn, ji bo lêborînê li Ebû Futrûşê kom dikin. Ji bo wan sofreyeke zîyafetê amade dikin. Bi destpêkirina zîyafet û şahiyê re bi şûr serê hemûyan difirînin.[26] Bi navê xwe Dewleta Abbasî ava dikin. Abbasiyan gelek walî şandine Amedê. Li herêma Kurdistan û Amedê di nav Romî û Abbasiyan de gelek şer derketine, lê bi ser neketine. Her ku çûye desthilatdariya Abbasiyan li herêma Amedê sist bûye. Waliyê Abbasiyan yê herî dawî li Amedê Îsa Bin Şêx Selîlê Şêxanî bûye.

## C) Malbata Şêxaniyan

Bi belavbûna desthilatdariya Abbasiyan re malbata Şêxanî bi serê xwe bûye destlilatdarî Amedê. Di navbera salên 869-899an de bi serê xwe Amedê birêvebirine. Dîrokzan ji vê serdemê re dibêjin Serdema Şêxaniyan.

## D) Serdema Hamdaniyan

Ji waliyên Abbasiyan yek jê jî Ebû Heyca Evdela Bin Hamdan bû. Ew waliyê Musil û Cezîrê û birayê wî Husên jî Serdarê Bexdê bû. Piştî mirina Ebû Heyca Evdila lawê wî Nasirdewle Hesen bû walî. Amed ket bin destê Nasirdewle Hesen. Nasir Dewle herêma Amedê spart birayê xwe Seyfuldewle. Bîzansan di sala

[26] Dogan Bariş ANF, 15 Agustos 2010

952an de erîşên dijwar birin ser herêma Amedê, herêmê talan û wêran kirin. Lê artêşa Bîzansan nikaribû bikeve nav bajarê Amedê. Seyfuldewle herêm ji destê artêşa Bîzansan rizgar kir. Di sala 956an de Nasirdewle heta Anatoliyê artêşa Bîzansan pekand. Navenda Dewleta Seyfuldewle her çiqas li Helebê bû jî, ew her li Farqînî ji xwe re wek navenda duyem dihesiband. Malbata wî tim li Farqînê bû. Li Helebê mir, lê li ser wesiyeta wî laşê wî birin li Farqînê veşartin. Her çiqas bi devkî bê gotin ku Malbata Hamdaniyan bi eslê xwe Farqînî ne û Kurd in, ne rast e. Hamdanî malbateke ji Emîrên Ereb in û berdewamiya Abbasiyan in.

## 980-984 Serdema Dîlemiyan

Dîlem navekî cografîk e. Dikeve navbera Gola Qezwîn, Ezerbeycan û Bakurê Kurdistana Îranê. Hinek kes Deylem dibêjin, ev ne rast e. Rastî Dîlemî ye. Navê xanedaniya wan jî Pewe ye. Avakarê Dewleta Dîlemiyan Elî Îmad El Dewle ye. Di serdema Dîlemiyan de, xelîfeyê Bexdayê Mistafî Bîllah e. Maez El Dewle di bin serokatiya Ebû Şûcayê Peweyî de artêşeke giran dişîne ser Bexdayê û bajar ji destê xelîfe digre û digehişe payeya Emîr El Umera.[27] Pêşî bajarê Dilê digrin û piştre êrîş dibin ser Amedê. Waliyê Hamdaniyan ê li Amedê bajar dihêle û direve. Amed bi qasî çar sal di bin desthilatdariya Dîlemiyan de dimîne. Li Îraq û Îranê heta Selçûqî tên desthilatdarî di destê xanedanên Peweyî de ye. Dîlemî Kurdên dimilî ne.[28]

## 984-1085 Serdema Merwaniyan

Damezrenêrê Dewleta Merwaniyan Bad Bîn Dostik e. Merwanî Kurd in. Dewleta Merwanî Dewleta Kurdan e. Serdema Merwniyan sed û salek dom kiriye. Bi piranî Farqîn paytexta Merwaniyan bûye. Merwaniyan carnan Amedê jî ji xwe re kirine paytext. Gelek sal hukimet di navbera Amed û Farqînê de seyar hatiye û çûye. Padîşahê Merwaniyan Entax û Mêraniyê ji xwe re wek havîngeh bi kar anîne. Di dema Padîşahtiya Nasruddewle de dewleta Merwaniyan dema xwe ya hingivîn û herî baş derbas kiriye. Merwaniyan giraniyê dane ser avadanî, şênkirin û avakirina Farqîn û Amedê. Gelek pire, medrese, îmaretxane ava, çê û tamîr kirine. Pira Dehderî ya li Amedê ku niha jî heye berhemên wan e. Tê gotin ku Pira Malabadê jî di dema wan de hatiye çêkirin. Hinek çavkanî dibêjin, di dema Artûkiyan de hatiye çêkirin. Bedena Amed û Farqînê di dema

[27] Ekrem Cemilpaşa, *Diroka Kurdistan bi kurtebirî*, weşanên Enstîtuya Kurdî ya Brukselê, r. 160
[28] Cegerxwin,Tarixa Kurdistan-2, r.18, weşanên Roja Nû



Institut kurde de Paris

Merwaniyan de hatiye tamîrkirin. Li Amedê gelek birc wek birca Merwaniyan ku li bakurê Derê Çem e, birca Derê Çiyê û birca Derê Mêrdînê birca Keçikê di Serdema Merwaniyan de hatine tamîrkirin û hêzkirin.

Padîşahê Merwaniyan Nasrûddewle xwediyê kêf û zewqê bûye. Çar jinên wî yên bi mehr û 360 cariyeyên wî hebûne. Li ku navê cariyeke rind an jî hunermend û dengbêjekî baş bibihîst diravê dinyayê dida û ew dianî seraya xwe. Xwediyê zewq û sefayeke bêtixûb bû.[29] Wek tê zanîn ji wê demê ve li Farqînê govend, stran, kêf û vexwarin heta îro wek kevneşopî dom dikin. Padîşahê Merwanî di nav kêf û şahiyê de xenî bûbû, lê Selçûqî li herêmê her ku diçû xurt dibûn û êrîşên dijwar dibirin ser bajar û bajarokan. Der û dor li Merwaniyan teng dikirin.

## 1085-1093 Serdema Selçûqiyan

Tuxrûl Begê Selçûqî di sala 1070an de avêt ser bajarê Bexdayê û ew bi destxist. Xelîfe li Bexdayê jî wek Padîşahê Merwaniyan di nav kêf û zewqê de bû. Desthilatdariya Dîlemenîyan hilweşand. Melîkşah çav berdabû dewlemendiya dewleta Merwanî û dixwest dest bide ser mal û gencîniya dewleta Merwanî. Di sala 1084an de, di bin Serokatiya Fahrudewlede artêşeke mezin şand ser bajarê Farqînê ku wê demê Paytextê Merwaniyan bû. Padîşahê Merwaniyan ji bo parastina xwe hevkariyê ji hukimdarê Musil, Heleb û El Cezîrê Şerefûldewle xwest. Herduyan di nav xwe de peyman çêkirin ku li dij Selçûqiyan şer bikin. Şerefuldewle xeber ji serdarê Selçûqiyan re dişîne ji bo ku dozê bi awayekî aştîyane çareser bikin. Selçûqiyan pêşniyaza wan qebûl kirin. Merwanî û hevalbendên xwe ji fermandarê Selçûqî bawer kirin. Lêbelê fermandarê Selçûqî ew xafil kirin û di nîvê şevê de avêtin ser kona Şerefuldewle û artêşa wî tar û mar kirin. Leşkerên Tirk gotine, *"em nehatine ku bi Ereb û Kurdan re li hev bikin, em hatine xenîmet û talanê..."*

Dîlên ku ji artêşa Şerefûldewle girtin, serdaran bi deh, xelkê normal bi pênc û jin û zarokan jî li ber derê Amedê bi panoteke firotin.[30]

Artêşa Selçûqiyan bi rojan kirin û nekirinin nikaribûn bikevin nav bajarê Amedê. Bi mehan li derdora bajêr man, rez û bexçeyên derdora bajêr şewitandin. Di nav bajêr de birçîbûn û xelayê dest pê kir. Aramiya xelkê bajêr nema. Serdarê Selçûqiyan li dek û dolaban geriya. Ji aliyekî ve Melîkşah gaziyê Padîşahê Merwaniya kir û bir paytexta xwe Îsfexanê û got, *"Were bila Meyya-*

[29] Şevket Beysanoglu, *Diyarbakır tarihi cilt1*, s.210
[30] Heman pirtûk r. 239

*farqîn ji te re be, cihên din jî bide me..."* Ji aliyê din ve bi riya mirovên xwe dubendî xistin nav xelkê bajêr. Gotin di destê xirîstiyan û musewiyên nav bedenê de xwarin pir e, lê nadin xelkê misilman. *"Em jî wek we misilman in. Em bikevin hundir em ê malê wan bidine we... "* Ji aliyê olî ve xelkê nav bajêr li dij hev rakirin. Çend roj paşê misilmanên nav bajêr serî rakirin. Avêtin ser mal û dikanên xirîstiyan û musewiyan. Derketin ser bedenê û gaziyê artêşa Selçûqiyan kirin ku dê ji wan re deriyên bajêr vekin. Artêşa Selçûqiyan di 4ê gulana 1085an de ket nav bajêr û dest bi talan û wêranê kirin. Lêbelê Farqînê heta dawiya meha tebaxê li ber xwe da. Dema Amed ket, vê carê Şahmelîk ji padîşahê Merwaniyan Mensûr re got, *"Êdî ew peymana me derbas nabe."* Ji wê demê re Serdema Selçûqiyên Mezin dibêjin. Serdema Selçûqiyên Mezin kurt bû 8 sal dom kir.

Dewleta Selçûqî di nav wezîr û emîrên Selçûqiyan de hat parvekirin. Amed di navbera salên 1093-1097 ket bin desthilatdariya Selçûqiyên Şamê ku bavê emîrê wan Sadr bû. Çar sal paşê Sadr mir û birayê wî Înal bû Emir. Di dema Înalan de, di sala 1116an de baran nebarî. Zevî hişk bûn. Bi sedan kes ji birçîbûn û nexweşiyê mirin. Hinek ji vê demê re Serdema Înalan dibêjin. Ev ne rast e. Desthilatdariya Selçûqiyan her berdewam e. Vê carê serdar û fermandarên Selçûqiyan li ser desthilatdariyê bi hev ketin. Malbata Nîsanan ji malbata Înaliyan re wezîrî dikir. Di sala 1138an de Emîr Nîsan bi darbeyeke leşkerî desthilatdariyê ji malbata Înalan girt û bû emir heta sala 1142an Amed di bin desthilatdariya Nîsanan de ma. Di sala 1142 an de ji Atabegiyan Zengî dest da ser karîna Amedê. Piştî desthilatdariya Selçûqiyên Şamê Artûkî li Amedê bûn desthilatdar.

## 1183-1232 Serdema Artûkiyan

Artûkiyan Amedê ji xwe re kirin Paytext. Ne bi tenê Artûkî herweha Merwanî, Înalî, Nîsanî û Aqqoyiniyan jî Amedê ji xwe re kirine paytext. Amed di dema Osmaniyan de jî Mîremîraniya Kurdistanê bûye û eyaleta Osmaniyan a herî mezin bûye. Artûkî begitiyeke Tirkmenan e. Di sala 1957an de, li Kela hundir li girê Amîda *(Bêxêrê)* di kolaneke de xerabeyên seraya Artûkiyan derketiye. Sereya Melîk Salîh Nesreddîn Mahmûd (1200-1222an) e. Bi serayê re hemzeke şeşgoşe jî derket holê. Artûkî li Amed, Heskîf, Mêrdîn û Xarpêtê bûne xwedî desthilatdariyê. Piştre Artûkiyên Amed û Heskêfê û yên Mêrdîn û Xarpêtê bi salan bi serê xwe mane. Di serdema Artûkiyan de jî wek Merwaniyan girîngî dane mîmarî û avakirina navenda bajar û parezgeha Amedê. Di wê serdemê de gelek kela, îmaretxane, pire, medrese, mizgeft, weqif û nexweşxane hatine

Foto: Nejat Satıcı →


Institut kurde de Paris

çêkirin. Sê pireyên mezin û dîrokî di serdema Artûkiyan de hatine çêkirin. Yek ji wan pira li ser çemê Zeynikan (Ambarê) ya kevn bû ku niha nemaye. Du, Pira Mala Badê ku di serdema Merwaniyan de ji keviran hatibû çêkirin, Artûkiyan ew baş restore kirine. Ya sêyem jî pira Xabûrmanê ye.

## 1232-1240 Sedema Eyyûbîyan

Avakarê dewleta Eyyûbiyan Selhedînê Eyyûbî ye. Selhedînê Eyyûbî Kurd e û ji herêma Şedadan ji bajarê Dûwînê ye. Di dema Selçûqiyan de, bi malbatî koçberî Başûrê Kurdistanê bûne.[31] Malbata Eyyûbiyan di nav dewleta Fatimî ya Erebî de cihekî xwe yê payebilind hebû. Selehadîn jî di nav dewlete Fatimî de hem serleşker û hem jî wezîr bû. Di sala 1171ê dema ew wezîr bû, Xelîfê dewleta Fatimî Adîdî bi Xaçparêzan re peymana aştiyê mor kir. Wezîr Selhedîn vê yekê qebûl nekir, xelîfe ji ser text xist. Dewleta Eyyûbiyan îlan kir û dest bi şerê Xaçparêzan kir. Di şerê Xaçparêzan de qehremaniyên bêhempa bi dest xist. Artêşa Xaçparêzan şikand û bajarê Qudûsê ji destê Xaçparêzan rizgar kir. Ew bû qehremanê Îslamê. Di şer de, bi hezaran leşkerên Xaçparêz dîl girt, bi dadwerî û xweşbînî ew nekuştin. Ji ber van sedeman Siltan Selhedîn li cîhanê bû sembola padîşahekî dadmend û dilovan. Di heman demê de, di cîhana Îslamî de jî bû padîşahekî efsanewî. Dewleta Eyyûbî di demeke gelek kurt de, ji Misirê heta Erebistan, Sûriye û Kurdistanê kir bin desthilatdariya xwe. Herweha Farqîn û Amed jî di sala1232an de ketin bin desthilatdariya dewleta Eyyûbiyan. Dema serleşkerê dewleta Eyyûbiyan Melîk Kamil Amedê girt, bedena duyem (cotbeden) a ku li derê vê bedena niha heye xera kir û bi kevir û malzemeyên wê bedena niha mehkem kir.[32] Hîn îro jî di navbera Derê Çiyê û Qerqezê Fîsê de xerabeyên cotbedenê hene.

Padîşahê Selçûqî yên Anatoliyayê erîşên mezin û dijwar bir ser Amedê; lê kir nekir nikaribûn Amedê ji destê Eyyûbiyan bigre. Bi salan şer dom kir.

Piştî mirina Selhedîn di sala 1250an de dewleta wî belav bû û di şûna Eyyûbiyan de dewleta Memlûkî hat avakirin.

Institut kurde de Paris

[31] Ramazan Şeşen, *Selahattin Devrin de Eyyubiler Devleti (569-589/1174-1193)*, İstanbul 1983. s.47
[32] Şevket Beysanoğlu, *Diyarbakır Tarihi-I* s. 353

## 1240-1257 Serdema Selçûqiyên Anatoliyayê

Selçûqiyên Anatoliyayê xurt dibûn û tim çavê wan li dagîrkirina bajarê Amedê bû. Di dawî de leşkerekî giran şandin ser Amedê û di sala 1240î de bajêr ji destê Eyyûbiyan girtin. Lê nikaribûn Meyyafarqînê bi destbixin. Salek piştre carek din bi artêşeke giran û mezin avêtin ser kela Farqînê, bi mehan şer û dorpêçan dom kir. Selçûqî bi serneketin û bi paş ve vegeriyan. Di nav malbata Selçûqiyan de şerê desthilatdariyê dest pê kiribû. Bira li hember bira serî hildabû. Ji aliyê din ve Moxol ber bi Anatoliyayê dihatin. Dewleta Selçûqî qels ket. Emîrê Eyyûbiyan ê Meyyafarqînê Melîk Kamîl di sala 1257an de avêt ser Amedê û bajar ji destê Selçûqiyan bi paş ve girt.

## Moxol û talan û wêrankirina Amed û Meyyafarqînê

Bi destxistina Amedê re li Baxdayê Hulagû xeberê dişîne ji Melîk Kamil re ku Amed û Meyyafarqînê bi şûn ve bide siltanê Selçûkluyan Kiliç Aslanê IVem. Ger nede dê artêşeke giran bişêne ser Meyyafarqînê. Hulagû dema bêbersiv ma, di navbera salek de amadekariya xwe kir û di bin serdariya lawê xwe Yesmû de artêşê şand ser Meyyafarqînê. Artêşa Moxolan derdor li Meyyafarqînê girt. Eyyûbiyên Meyyafarqînê du salan li ber xwe dan. Piştî du salan li bajêr birçîbûn û xelayê dest pê kir. Bajar ne ji ber şer, ji ber birçîbûnê di nîsana sala 1259an de ket destê Moxolan. Moxolan bajar tar û mar kirin.[33] Bi sedan jin zarok negotin kuştin. Melik Kamil girtin û birin Baxdayê cem Hulagû. Hulagû serê wî da jêkirin, li dar xist û li kuçeyên Bexdayê wek îbretî alem gerand.

Piştî girtin û wêrankirina Meyyafarqînê Artêşa Hulagû berê xwe da kela Amedê. Artêş hîn negihiştibû Amedê. Mîrê Amedê Seyfuddîn Îbn Mucellî deriyên kelê ji artêşa Hulagu re vekir. Artêşa Hulagû bê şer û qir ket nav Amedê wek Meyyafarqînê bajar wêran û talan kir. Li ku bûya dê Meyyafarqîn û Amedê ji nexşeyê xera bikira.

## 1401-1507 Serdema Aqqoyûniyan

Ji ber barbariya Tîmur û Moxolan li herêmê xelk ji Tirkan gelek eciz bûbû û heta nefret dikirin. Aqqoyûnî li herêmê desthilatdariyê girtin destê xwe. Bi farisî "Ak" spî û "koyûn" jî mîh e. Osmanîyan ji wan re "Boz Ûlûs" digotin. Di ala (bayraqa) wan de ji ber ku wêneya mîhê hebû û dema yek bimira peykera mîhan dikirin

[33] Heman berhem, s. 365

gorên wan. Loma navê Aqqoyûniyan li wan kirine. Îranî ji wan re Bayindirdirêj dibêjin. Hesenê Dirêj di sala 1423an de li Erxeniyê ji dayik bûye. Kurê Mîr Elî ye. Piştî mirina bavê wî birayê wî yê mezin Cîhangîr dibe mîr. Hesen birayê xwe ji ser text dixe û ew ji Amedê bi dûr dixe. Piştre desthilatdariya xwe bi hêz û fireh dike. Ji Îranê heta Anatoliyê tixûbê dewleta xwe berfireh dike.

Bi împaratoriya Rûm a Trabzonê re têkiliyên xwe xweş û geş dike. Bi keça împarator Katerîna Despîna re şû dike û herdu dewlet li dij Osmaniyan berê şer durust dikin. Hesenê Dirêj di sala 11.08.1473an de li Otlikbeyligê bi padişahê Osmaniyan Fatih re şer dike. Artêşa Hesen û Împatarotiya Trabzonê têk diçin. Hesen vedikişe Îranê. Di serdema Aqqoyûniyan de li herêma Amedê gelek xan, hemam, pire, kanî, rê, mizgeft, medrese hatine avakirin. Di serdema Aqqoyûniyan de, bi tenê li navenda Amedê 12 mizgeft û mescîd hatine çêkirin.

## 1507-1515 Serdema Safawiyan

Gelên Îran, Kurdistan û Rojhilata Navîn ji 100 salan bêtir di bin zordestî, çewisandin, talan û êrîşên Selçûqi, Tirkmen, Moxol û Tataran de derbeder û perperîşan bûbûn. Tatar û Moxol êdî ber bi Qafqasya ve û Selçûqî jî ber bi Sûriya îroyîn ve çûbûn. Di şûna Selçûqiyan de vê carê Tirkên Osmanî li Anatoliyayê dewleta Osmanî ava kiribû. Li Bakurê Kurdistanê ji Wanê heta Amed, Dersim û Mereşê di bin desthilatdariya Aqqoyûniyan de bû. Di vê demê de li Rojhilatê Kurdistanê li herêma Geylan Şex Îsmaîl xwedî tarîqatê bû. Miroveki zîrek û ciwan bû. Mirûdên xwe yên Kurd li derdora xwe civand û artêşeke mezin amade kir. Cara yekem êrîşê ser Gurcistanê kir û paytextê wan dagîr kir. Piştre di sala 1500î de êrîş bir ser Aqqoyûniyan û padîşahê wan Elwend Mîrza kuşt. Şêx Îsmaîl piştî vê bûyerê êdî bû Şah Îsmaîl. Ji rojava ve Amed, Riha, Mereş, ji Rojhilat ve Xoresan, ji başûr ve Bexdayê da ser dewleta Safawiyan. Di sala 1501ê de jî Tebrîz ji Tirkmenan girt û ji xwe re kir paytext. Îran û Kurdistan ji destê Tirk û Tirkmenan rizgar kir.

Şah Îsmaîlê Kurd, ol û mezheb bi ser netewetiyê ve girt. Şîîtiyê kir mezhebê fermî ya dewleta Safawî. Piştre êrîş bir ser mîrîtiyên Kurd ên Senendej û Kirmanşahê û desthilatdariya wan bi darê zorê ji wan girt.[34]

Zana û mezinê Kurdan yek jê Îdrîsê Bedlîsî bû. Amed mîrêmîrantî bû. Mîritiyên din bi Amedê ve girêdayî bûn. Mîrê mîranê Amedê jî di bin fermandariya Safawiyan de bû. Safawî zêde serdestiyê li Kurdan dikirin. Dijberiyên di navbera sûnî û şîîyan de her ku diçû xurtir û zêdetir dibûn. Îranî şîî û Kurd

[34] Ekrem Cemîlpaşa, *Dîroka Kurdistanê bi kurtebirî* r. 203



Institut kurde de Paris

jî sûnî bûn. Şah şîîya li gelek bajar û keleyên Kurdan bi cih kir. Birêvebirî û serdariyê dida destê şîîyan. Heta şîîyên Qaçar tîne li herêma Amedê û li gelek cihên din bi cih dike.[35] Mîr û xelkê Kurd ji polîtîka şîîtiya Şah İsmaîl û zordestiya wî gelek eciz bûn. Di wê demê de berdevkî û serokatiya mîrîtiyên Kurdan İdrîsê Bedlîsî dikir. Li Anatoliyê Siltan Selîm bi darê zorê bavê xwe ji ser text daxistibû xwarê û derketibû sertextê padîşahtiyê. Siltan Selîm ji bo ku pêşeroja textê xwe saxlem bike hemû bira û biraziyên xwe dabû kuştin. [36]



Miniyatura Kela Amedê: bi destê Matrakçi Nasuh Efendi, di dewra Qanûnî Sultan Suleyman de hatiye çêkirin

Siltan Selîm çav berdabû axa Kurdistanê ya bi xêr û bêr. Nerazîbûna mîrîtiyên Kurdan fersend dît û li gel wan têkilî danî. Bi riya İdrîsê Bedlîsî bi wan re têkilî germ, geş û nerm kir. Mîrên Kurdan qanih kir û derket sefera rojhilat ku bi Şah İsmaîl re şer bike. Di sala 1514an de li Çildêranê herdu artêş hatin hember hev. Kurdan bi Siltan Selîm re li dijî Şah İsmaîl şer kirin. Artêşa Şah İsmaîl şikiya. Di navbera Siltan Selîm û Şah İsmaîl de peymana sînor hat morkirin. Cara yekem Kurdistan hat perçekirin. Rojhilatê Kurdistanê ket bin desthilatdariya Safawiyan. Dîsa bi pêşnîyaziyên İdrîsê Bedlîsî salek piştî şerê Çildêranê ango di sala 1515an de, di navbera Osmanî û mîrîtiyên Kurdan de peymaneke pêk hat. Hemû mîrîtiyên Kurdan di bin Mîrêmîraniya Amedê de ket bin desthilatdariya Osmaniyan. Lê wek di nav de jî diyar e, di nav xwe de xwediyê statuyeke otonom bûn.

[35] Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname*, weşanxaneya Apcê, r.270-
[36] Nejat Kaymaz, Kurulustan Lale Devrine Osmalı İmparatorlugu s. 62



Dimenek ji bedena kevn, 1909-1911

## 1515 Serdema Osmaniyan

Piştî serketina şerê Çildêranê, Îdrîsê Bedlîsî li ser navê Mîrîtiyên Kurdan ji Yavuz Selim re pêşnîyazî dibe ku ji vir bi şûn de ew dixwazin bac û leşker bidin Osmaniyan û Mîrîtî û Mîrêmîraniya Amedê ya Kurdan li ser Osmaniyan bin. Yavuz ji xwe li benda pêşniyaziyeke weha ye û di cih de pêşniyaziya wî dipejrîne.

Îdrîsê Bedlîsî ji bo Mîrêmîraniya Amedê Biyikli Mehmed Paşa pêşnîyaz dike. Yavuz li ser vê pêşniyaziya Îdrîsê Bedlîsî di 04.11.1515an de Biyikli Mehmed Paşa bi paya Mîrêmîranê Kurdistanê wezîfedar dike. Amed carek din dibe navenda Mîrêmîranê Kurdistanê. Osmanî di sîstema nû de 24 sencexan didin ser Amedê. Ji aliyê satatuyê ve birêvebiriya Kurdistanê dikin sê beş. Ji wan 24 sencaxan 11 sencex xwedî statuyeke bilind ên hevbeş in. 1-Amed (navend), 2-Xarpêt, 3-Axçeqele, 4-Erxenî, 5-Çemîşgezek, 6- Heskîf, 7- Sêrt, 8-Sancar, 9-Siwêreg, 10-Farqîn, 11-Nisêbîn. Ji derî vana 8 sencexên din jî statuya wan hinek ji yên 11 sencaxan kêmtir û tengtir in. Ew jî ev in: 1-Entax, 2-Portûk (Pertek), 3-Tercil, 4-Cebexçûr, 5-Çêrmûg, 6-Saxman, 7-Heleb/Keleb, 8-Mîhranî. Piştî şerê Çildêranê pênc mîrîtî, li derî vê peymana di navbera Mîrêmîraniya Kurdan û Osmaniyan de bi riza dilê xwe beşdarê desthilatdariya Osmanî dibin. Ew her pênc mîrîtî jî ev in: 1-Gêl (Egil), 2-Palo, 3-Cizîrê, 4-Hazo (Kozluk) û 5-Darahênê (Genc).[37] Ji derî van sencexan gelek serokeşîr û kes hene ku xwedî ax û kesên çekdar in, ew jî di nav birêvebiriya Mîrêmêriya Amedê de cihê xwe digirin.

Di sala 1529an de sencexên Musul, Ane û Deyrî Rahle jî didin ser Amedê. Di deftera Tahrîra sala 1540î de sencexên Xerzan, Mêrdîn, Riha, Harran, Bêlecûg, Sirûc, Melezgird, Kurdikan û Îmadiyeyê jî didin ser Mêrêmîraniya Amedê. Mîremîraniya Kurdistanê di karê xwe yê hundirî de serbest e. Bi tenê bacê dide

37 *Türk Ansiklopedisi, Diyarbakır maddesi*; 1286 ve 1288 tarihli "Diyarbakır Salnameleri".

Institut kurde de Paris



Dîmenek ji bedena kevn, 1909-1911

Stanbulê. Di dema şer an jî dema pêwîstî hebe leşker jî dide artêşa Osmanî, lê di kar û barê xwe yên din de azad e. Biyikli Mehmed Paşa heta dimire li Amedê paşatiyê dike. Gora wî li bexçeyê Mizgefta Fatîh Paşa ye.

Peymana di navbera Mîrîtiyên Kurdan û dewleta Osmanî de ku di dema Yavuz da hatibû diyarkirin herweha di dema Mahmûdê Duyem de jî dom kiriye. Piştî 304 salan di sala 1819an de sîstema birêvbiriya siyasî ya împaratoriya Osmanî tê guhertin. Paytext Stanbul bû û xwedî desthilatdariyeke navendî bû.[38] Nîvserxwebûniya Mîrayetiyên Kurdistanê ji binî ve hejiya. Sîstema Osmanî ji aliyê civakî, aborî û sîyasî ve her ku çû aloz bû. Di sala 1839an Fermana Tanzîmatê, di sala 1856an de bi Fermana İslahatê û di sala 1876an de jî bi guhertina Meşrûtiyeta Yekem re sîstema Osmanî kete bin birêvebiriya Ittîhat-Terakkiyan. Bi Meşrutiyetê re Osmanî sîstema wilayetan tîne û Amed cara yekem dibe parezgeheke Osmanî. Dawî li otonomiya Mîrîtiyên Kurdan tê.

## Serdema Komara Tirkiyê

Di şerê Cîhanê yê Yekem de Osmanî û hevkarên xwe têk çûn. Paytext Stanbul ket destê Îngilîz û hevalbendên şer. Gelek eyaletên Osmanî hatin dagîrkirin. Di 19 gulana 1919an de Mustafa Kemal di ser Derya Reş re derket Samsûnê. Piştre ji wir çû Erzerom û Sêwasê bi nûnerên Tirk û Kurdan re kongre li darxist. Di van kongreyan de soz û peyman da ku piştî rizgarbûnê wê mafê otonomoyê bide Kurdan. Di sala 1921ê de qanûna bingehên a yekem amade kirin û di vê qanûnê de mafê Otonomiya Kurdistanê hat qebûlkirin, lê tucar nekete pratîkê. 23ê nîsana 1923an de li Enqere li ser bingehê dewleta Osmanî Komara Tirkiyê hat avakirin. Parlamento civiya û Parlamenterên Kurdistanê û Lazistanê jî beşdarê Parlamentoya Enqerê bûn. Li Lozanê Kurd xapandin û ji bo ku Kurd statuyeke sîyasî

[38] Rıfat Dag, Sayılarla *Diyarbakır, Diyarbakır Ticaret ve Sanayi Odası*, s.50-199

Institut kurde de Paris

bi dest nexin asteng derxistin. Mustafa Kemal û hevalbendên xwe piştî ku bûn xwedî hukim, polîtîka Îttîhat-Terakkî şopandin. Mafê otonomiyê pêk neanîn. Rewşenbîr û siyasetmedarên Kurdan li ser vê rewşê di sala 1923an de li Erzeromê rêxistina Azadî (Kurd Îstîklal Cemiyetî) damezirandin. Serokê rêxistinê Mîralay Xalidê Cibrî bû. Kesên wek Seyîd Ebdulqadir, Îhsan Nûrî Paşa hebûn. Azadî di 23 bajaran de bi rêxistin bû, yek ji wan jî li Amed bû.[39] Komiteya Amedê ji van kesan pêk dihat. Cemîl Paşazade Ekrem (Serok), Dr. Fûad, Evdilqadir Beg, Dr. Nazim Beg (Dersimî), Mistefa Beg (Bînbaşi), Adnan Beg (Qeymeqam) û Eliyê Licî (Fehmiyê Bîlal).[40] Sal bi ser re neçû rejîmê siyasetmedar û rewşenbîrên Kurd ên endam û ne endamên Azadiyê yek bi yek girtin û piştre serokên wan li Bedlîsê bi dar ve kirin. Azadî bêserokatî û bêxwedî ma. Şêx Seîd neçar ma û ji bo rewşa nû binirxîne, telesiyeke bike û encamekê bigre, derket nav gel.

## Şerê Şêx Seîd

Wek tê zanîn Şêx Seîd bi mirûdên xwe ve ji Xinûsê diçe Çewlikê, Darahênê, Licê, Hêne û Pîranê. Dewlet li Pîranê provakasyonekê derdixe û ji bêgavî û neçariyê di 8ê Sibata sala 1925an de li Pîranê serîhildan dest pê dike û nûçeya wê digehîje Enqerê. Du roj piştre di 10ê Sibatê de, şêx Tahîrê birayê Şêx Seîd bi Komîteya Licê re dest didin ser Postexaneya Licê. Di 16ê mehê de Şêx Seîd ji Pîranê vedigere Hênê û roja 16ê mehê li gundê Serdê civîneke dîrokî çêdike ku ev civîn qedera serhildana wî tayîn dike. Nûçeya bûyer û serhilana Pîranê, li Hêne, Licê, Darahênê, Farqîn, Çebexçûr û Xarpêtê belav dibe û li van deran jî alîgirên Şêx Seîd dest didin ser dem û dezgehên dewletê.

Di roja 20ê sibatê de Şêx Seîd ji gundê Serdê diçe gundê Tilê ku ji wir jî here navenda Licê. Li Tilê Mele Mehemed Şerîf, ji Şêx Seîd re dibêje ku 'êvar e û bi şev neçe Licê.' Şêx Seîd bi heyeta xwe ve di roja 21ê sibatê de diçe navenda Licê. Şêx Seîd ji 8 kesan Konseya şer ava dike. Ev konseya rêxistina herî bilind e û hemû rêxistin û komîteyên din di bin biryar û dîrektîvên wê de dixebitin.

Endamên konseya şer ev in:
1. Şêx Seîd (Serok)
2. Fehmiyê Bîlal Efendî (Sekreter)
3. Seîd Begê Medragî

[39] Müş Hesenan Eşireti Notis-Facebook
[40] Malmîsanij, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir'de Kürt Ulusçuluğu* (1900-1920). S.46-48

Institut kurde de Paris



Şêx Seid li hewşa girtîgeha Amedê, 1925

4. Şêx Îsmeîl
5. Reşîd Axayê Têrkî
6. Salih Begê Hêneyî
7. Sidîqê Pîranî
8. Mele Mistefayê Licî

Komîteya şer di pênc bereyan de dest bi şer dike:

1. Bereyê Bakur û Bakurê Rojhilat. Qada şer Mûş û Varto ne. Serdar şêxê Melikan şêx Ebdullah e. Di bin serdariya wî de Xalid Begê Hesenanî, lawê şêx Seîd Elî Rîza û Xelîlê Xeto ne.
2. Bereyê Xarpêtê, serdar şêx Şerîf e.
3. Bereyê Erxeniyê, serdar şêx Evdirrehîm e û Şewqî Begê Erxenî alîkarê wî ye.
4. Bereyê Farqînê, serdar şêx Şemsedîn e.
5. Bereyê Amedê ji Rojhilat ve Heqî Beg û ji Rojava ve Emê Faro ye.

Di bin serdarî û fermandariya Emê Faro de, ji Darahênê û gundên wê, gundên herêma Dimbilyan a Licê, Sîwan, Hênê û gundên wê bi qasî 3000 çekdarên siwarî û peya amade û kom dibin. Emê Faro bi van hêzên xwe yên çekdar ve di Hêne û deşta Amedê derbasî rojavayê çemê Dîclê dibe û ber bi Amedê ve dimeşe. Hedefa wî Derê Çiyê ye.

Serdar û Fermandarê Hêzên Licê Heqî Beg e. Ew ji Licê û gundên Licê bi hezaran siwarî û peyayên çekdar berhev dike. Cara pêşî li deşta Fîsê rastî leşkerên dewletê tên û di navbera wan de şerekî dijwar derdikeve. Di demeke gelek kurt de, hêzên dewletê derbeke mezin û dijwar dixwin û yên mayî xwe radestî hêzên Kurdan dikin. Vê carê hêzên dewletê riya xwe diguherin û dixwazin di ser Mehmediyan û Zoxbirînê re ber bi Hezanê ve herin Licê. Li van herdu cihan derbên mezin û xedar dixwin û bi paş ve ber bi Amedê ve dikşên. Hêzên Kurd di ser Karazê re ber bi Amedê ve dimeşin û li gor plan û stratejiya şer dê Pira Dehderî û Derê Mêrdînê divê bigirtana. Li nêzîkî Amedê hêzên Farqînê û yên Licê tên cem hev û dibin hêzeke xurt û mezin. Di navbera wan hêzên dewletê de şerekî giran û dijwar derdikeve. Siwariyên canfîda dajon ser top û mîtralyozan. Hêzên dewletê nikarin li ber xwe bidin û bi paş ve vedikişin nav bajêr. Ew top û tifingên xwe di hundirê bedenê de bi cih dikin. Hêzên Kurdan pira Dehderî derbas dikin û nêzîkî li Derê Mêrdînê dikin.

Hêzên Emê Faro û şêx Evdirrehîm ku serfermandariya bereyê Maden-Ergenî Gêl û Pîranê dikin li derê bedenê digihine hev û dibin hêzeke mezin. Ji Derê Çiyê heta Derê Rihayê derdor li bendenê dipêçin. Hêzên wan û yên Cepha Licê-Farqînê li ber birca Westa (Heft Birayan) digihên hev. Di roja 29ê sibata 1925an hêzên Kurd ji her alî ve derûdor li bajêr dipêçin. Kurd êrîşên dijwar dibin ser top û makîneyên hêzên dewletê yên li hundirê bedenê û bajêr. Hêzên din di vî şerê top û mîtralyosan de, bi ser dikevin û destkeftîyên mezin bi dest dixin. Bi tifingên kurmancî top û makînên cengê ji leşkeran digrin. Di

dawiya şerekî dijwar de, di rojên 7 û 8ê adarê de leşkerên Şêx Seîd di navbera Derê Mêrdînê û Derê Rihayê de dikevin hundirê bajêr û dest didin ser gelek cebilxane. Lêbelê di demeke kurt de rastî berxwedaneke mezin û dijwar tên, piraniya wan di nav bajêr de tên kuştin. Yên mayî jî, ji nav bajêr vedikşîn û derdikevin derveyî bedenê. Li Derê Mêrdînê, herêmên goristan, Hewsel û pira Dehderî bi guleyên topan ku ji ser bedenê davêjin, bi sedan alîgirên Şêx Seîd tên kuştin.

Artêşa Tirk di Xeta Fransawî re leşker dikşîne Mêrdînê û di riya Mêrdînê re xwe digijine alîkariya hêzên xwe yên nav bajarê Amedê ku dor li wan hatiye pêçan. Hêzên Şêx Seîd li hember wan top, tank, balafir û leşkerên dewletê bêgav dimînin û xwe ji bajêr û derdora bajêr bi paş ve vedikişînin. Li Derê Mêrdînê gelek Licî şehîd dikevin loma heta îro ji wê goristanê re goristana Liciyan dibêjin.

Di 27ê adarê de hêzên herêmên Licê, Farqîn û Darahênê bi paş ve, ber bi çiyayên Licê û Hênê ve, yên Pîran, Maden û Erxeniyê jî ber bi bakur vedikişin. Aliyê Kurdan têk diçe. Heta 8ê nîsanê leşkerên Tirk hemû herêmên Pîran, Hênê, Darahênê û Cebexçûrê digirin bin kontrolê. Di 14ê nîsanê de jî Şêx Seîd dikeve destê hêzên Tirkan.

Fermandarê artêşa Tirk Bînbaşî Alî Hayder li herêmê bi cehş û sîxuran re gund bi gund bajarok bi bajarok û mal bi mal digerin û ew kes û malbatên ku giliya wan hatine kirin, kom dikin. Hinekan ji wan li wir dikujin û çendekan jî dişênin dadgeha Îstîqlalê ya li Amedê. Ji wir jî hinekan dişênin Elezîzê. Yên ku dişênin Amed û Elezîzê piraniya wan bi paş ve venagerin. Mele Mistefa û çend Liciyên din li Amedê û Heqî Beg û çendên din jî li Elezîzê bi dar ve dikin. Şex Seîd bi 47 hevalên wî ve di 29 hezîranê de li Amedê bi dar ve dikin.

Piştî girtin û bi darvekirina Şêx Seîd, yên mayî teslîm nabin. Li herêmên Licê, Hêne, Darahên, Pasûr, Pîran û Paloyê bi komên çekdar yên biçûk bi şerê çekdarî didomînin. Li herêmên wek Biriqleyn, Çewtela, Lîs, Cibir, Faso, Arşîk, Fîs, Şela Heydan û li gelek herêmên din dest bi çalakiyan dikin. Leşkerên dewletê car caran, û cih bi cih darbeyên dijwar û xedar ji hêzên Kurd dixwin. Darbeya herî dijwar û mezin di sala 1927an de li herêma çiyayê Lîsê ku nêzîkî gundê Pêçarê ye hêzên Kurd Yekîna (Alaya) Jendirman a Sayyar a San dixe kemînê bi sedan leşker û serleşkeran dikujin û esîr digirin. Yuzbaşî Alî Hayder terfiyên xwe jêdike dikeve axûrek û xwe vedişêre ku nekeve destê hêzên Kurd. Dilê jineke gundî bi halî wî dişewite û dibêjê "Bila nekûjin guneh e" û hema kurtana (cilika) kerê davêje ser. Piştre ji wir derdikeve xwe digihîne Licê. Vê

Institut kurde de Paris

carê dadgeha Îstîkilalê ya Diyarbekirê Ali Hayder ceza dike ji ber ku nikaribûye şer îdare bike û zerareke mezin daye artêşê. Serokerkaniya Tirkiyê Albay Mustafa Mûglali ji Elezîzê dişîne Licê.

Berpirsiyariya sîyasî didin Mufetişê Giştî Abîdîn Ozmen û fermandariyê jî didin Mustafa Mûglali ku bi navê Bicar Tenkil Harekati di 7 Cotmeh-17 mijdar 1927an de (Operasyona Tolgirtinê) plan bike û pêk bîne. Ji ber ku çend meh berê li çiyayê Lîsê ku dikeve bakurê gundê Pêçarê yekîna San a Jandarmeyên Seyyar ji aliyê hêzên Kurd ve tar û mar bûbû. Ji bo wê navê "Operasyona Tolgirtinê" lê dikin.

Qada operasyona Pêçarê, ji başûr ve Hezro, Farqîn, ji rojhilat ve Pasûr, ji bakur ve çemê Mûradê ji rojava ve ji Gêlê heta Palo û dîsa vedigere çemê Mûradê. Lêbelê navenda operasyonê Sêgoşeya Pasûr, Licê û Darahênê ye ku çiyayên Licê wek Biriqleyn, Şaxûr, Adem, Lîs, Koz, Cibir in. Li Pêçarê dest bi operasyonê dikin. Hemû gundiyan berhev dikin, dibin li newala Solesenê. 43 kesan ji nav wan derdixin û yek bi yek gulebaran dikin û dikujin. Agir berdidin gund, xaniyan bi pez û dewaran ve dişewitînin.

Hemû gundên herêma Dimbilyan, gundiyan derdixin meydana gund, jin û zarok ji nav wan cihê dikin û mêran didin ber devê mîtralîyozan û dikujin. Agir berdidin xani û malên wan. Jin û zarokên mayî carek din dişênin surgûnê. Li herêma Dimbiliyan 22 gund û gom tên şewitandin. Loma xelkê herême şerê Şêx Seîd û salên şewatê dikin du beş û dibêjin "pêşî şer bû û di salên dawî de jî dewletê dest bi kuştin û şewtandina, mirov, heywan û însanan kiribû..."

Institut kurde de Paris



Başûrê bedena Amedê
Foto: Mehmet Masum Suer

## Bedena Amedê

Berî ku em behsa bedena Amedê ya dîrokî bikin, divê em hinek behsa taybetiyên kevir ên Amedê yên balkêş bikin. Amed bi kevirên volkanîk ên bazalt hatiye avakirin. Bazaltên reş û spî. Li navend û derdora wê mirov bi qasî nîv metre bikole ji bin axê kevirên volkanîk derdikevin. Li hinek cihan zinarên yekpare ne. Qerecdax bi xwe volkanîk bûye û vemiriye.

Kevirên Amedê ji aliyê rengan ve reş û spî ne. Lêbelê kevirên reş bêtir in. Ji ber vê yekê jî ji Amedê re gotine '*Amîda Reş*'. Fransiyan ji bo Amed û amediya gotine "*dilê reş, kevirê reş û kûçikên reş*"[41] Bi rastî di zemanê berê de li Amedê kûçikên reş û mezin gelek bûne.

Du cure kevirên Amedê hene. Kevirê mê û nêr. Ji kevirê rû qulqlî re yê mê û yê rû dûz re jî nêr dibêjin. Kevirên nêr bêtir di çêkirina dîwaran de tên bikaranîn û kevirên bazalt ên reş in. Yên mê di stûn, bin hewşan, serder, pencere û

[41] Fransiyan demek ji bo Amed û Amediyan weha gotine. D Lamec Saad, *Seyahetnamelerde Diyarbekır*, s. 155 (ç. M. Şefik Korkusuz), Kent Yayınları, s. -2003

Institut kurde de Paris



Kela hundir
Foto: Melike Dara Gural

di kemeran de tên bikaranîn. Ji ber ku kevirên nêr ji yên mê xurtir û saxlemtir in. Kevirên mê jî ji bo qulqulî ne di dema lêkirina dîwaran de dikevin nav hev û baştir bi hevdu digrin. Bin hewşên xaniyên kevn bi kevirên mê çêkirine. Havînan dema hewş dişon av di nav qulikên wan de dimîne û hewş û derûdor henik dibe.

*"Dilê reş kevirê reş û kûçikê reş"*

Di zemanê berê de yek ji kana kevirên mê lî başûrê Pira Dehderî li aliyê rastê bû. Kevirbiran bi piranî di mehên zivistanê de li wir çêdikirin û piştre danîn di hewş û eywanan de bi cih dikirin.[42]

Taybetî û balkêşiya kevirên reş ên Amedê di beden û bircên Amedê de xwe dane nasîn û îspat kirin. Li ser wan dîrok û serpêhatiyên hezar salan hatine kolan, nexşkirin û nivîsandin. Ev bajar, beden û avahiyên şaheser bi van keviran li seranserê cîhanê navûdeng dane.

[42] Abdulsettar Hayati Avsar, Şeyhmus Diken Diyarbakir diyarım, yetirmişem yanarım. S. 270

Institut kurde de Paris

## Kele û bedena hundir

Hemû dîrokzan hemfikir in ku cara pêşî bz bajêr ji aliyê Hûriyan ve hatiye çêkirin. Cara pêşî Hûriyan li cihê heri asê û startajîk li ser Qerqezê Fîsê (Efsûs) kela Serayê li derdora girê Amîda kelê ava kirine.[43] Ku bi tirkî îro ji vê kelê re dibêjin Îç Kale. Bi kurdî dibêjin Seraya Amedê. Di serdema Hûriyan de Sera yan jî Kela Hundir ne wek a îro mezin, lê gelek biçûk bûye. Gelek caran bedena Keleyê hatiye guhertin.

Li gelek herêmên Amed û Kurdistanê ji dema Hûriyan ve heta niha hejmareke mezin nawis mane. Li herêmên, Pasûr, Licê, Hêne, Pîran, Gêl, Farqîn, Erxenî û cihên din ji serdema Hûriyan ve bajarên ku ji nawisan hatine kolandin hene. Ango ji kevir mal û xanî hatine kolan. Hûrî-Mîtanî bav kalên Kurdan in.[44] Lê hezar mixabin ew nivîsên Hûriyan heta niha nemane. Kele ji roja avakirina heta salên 1985an cihê birêvebiriya bajêr bûye.

## Bedena der

Romî pz di 53an de li herêmê bûne xwediyê desthilatdariyê. Piştî zayînî di sala 504an de bûyereke mezin rûdaye. Kele di destê îraniyan de bûye û Romiyan êrîşên dijwar û mezin birine ser kelê. Serdarê Amedê yê Îranî Kavad bûye. Kavad zordarekî mezin bûye. Romiyan kirine nekirine nikaribûne Kelê bigrin. Romiyan ji aliyê Zinarê Fisê ve dest pê kirine teht kolane û ber bin kelê ango Serayê ve şikeft çêkirine. Dar û ber ji herêmê kom kirine, kirine şikeftê û agir berdanê. Tehtê Fîsê hinek jê terikiye û aliyê der ve dîwar herifîye. Îranî li hundir pêhesiyane ku Romî ji der ve binê Fîs û Serayê qûl dikin û agir dadidin. Bi ser wan re kevir gêr kirine û cihên ku zerar dîtine tavilê tamîr kirine. Romî bi ser neketine. Ji ber tirsa ku dê carek din Romî bin erdê qul bikin, tunel vekin û werin hundir; Îraniyan ji aliyê hundir ve li derdora bedene hendek kolane û tije av kirine. Dema ku carekê din Romî bikolin dê av dakeve jêr hem ew dê di bin de bifetisin û hem jî dê ew pê bihesin ka li kîjan alî dikolin. Wê demê dikarin tedbîra xwe bigrin.[45] Kavadê Îranî ji Romiyan gelek ditirse. Ji ber ku ew zilmkar e, dibêje dê xelkê bajêr bi dizî bajêr teslimê Romiyan bike. Hemû zilamên li bajêr li anfiya Serayê kom dike û dikuje.

[43] Gotina "efsûs" wek gelek peyvên kevn an ji qedim di zimanê rojane de naye bi kar anîn, lêbelê di hinek hevokên baneşanî de hîn îro jî di zimanê kurdî û farisî de bi kar tê. wek mînak: Hezar efsûs, sed efsûs. Ev wêje derbasî osmanî ji bûye û îro jî di nav entelên Tirkan de dibêjin "hezar efsus" an jî "sed efsus". Tirk di şûna "yazık, eyvah" de bi kar tînin. Hevokên wek "hezar efsus" û "sed "efsus" di dema osmaniyan de di edebiyatê de hatine bikaranin. Ji ber ku di wê demê de zimanê osmanî bi pirani û girani bi farisî bû an jî gotinên farisî bi kar danin. Herweha tê texminkirin ku peyvên "Efes" û Tersûs" ji ji peyva "efsûs" hatine afrandin. Di kurdî de wateya wê ya duyem ji he ku tê wateya qerqez, bilind, cihê tirs û xofê. Hem Fisa Amedê û hem jî Fisa Licê herdu ji bilind in. Dema mirov li jêr dinêre, xof dikeve dilê mirov û .irov dibêje "hewar!"

[44] Ekrem Cemîlpaşa *Dîroka Kurdistan Bi Kurtebirî*, Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Brukselê-1995

[45] Şevket Beysanoglu, *Diyarbakır Tarihi, cilt-1*, s. 122

Institut kurde de Paris

Bi tenê jin û zarok dimînin. Ji ber ku jin ji wan re nan û xwarinê amade dikin, dest nadin wan. Demek şûn ve li nav kelê êdi xwarin kêm dibe. Kavad vê carê êdî nan nade zarok û jinan jî. Di navbera salên 504-505an de êdî li nav kelê ceh û genim namîne. Çarox û meşkên ku hene wan jî dixwin û diqedînin. Piştre dest pê dikin yên xurt yên zeyif dikujin û goştên wan dixwin. Kesî wehşeteke weha nedîtiye.

16 birc di nav bedena Serayê (bedena Hundir) de hene. Mîmariya wan jî cuda ne. Hinek ji van bircan çar, hinek şeş û hinek jî heşt goşe ne. Çar deriyên kela Serayê hebûne: Derê Serayê, Derê Fethê, Derê Oxrûn û Derê Kupê. Derê Fetîh û Oxrûnê derdikevin derveyî bajêr û Derên Sera û Kupê jî derdikevin nav bajêr. Di hundirê bedena Serayê de, du dêr, Kela Wêran, Seraya Artûkiyan, mizgeft, Kaniya Şêr û sarinc hene.

Ji serdema Roma û Persan şûn ve Sera bûye cihê birêvebiriya bajêr. Hemû dem û dezgehên dewletê li wir bûn. Walî, paşa û karmendên payebilind li wir dijiyan. Girtîgeh û dadgeh jî li wir bûn. Di van çend salên dawîn de dewlet ji nav Serayê derket. Niha restore dikin û dê bikine xizmeta turîzmê.
Li ser dîwarên herêma Derê Çiyê bêtir nivîs, wêne û sembolên Roma û Bizansiyan hene. Bedena Serayê ji aliyê Hûriyan ve, lê bedena bajarê mezin çend cara ji aliyê Împaratorê Romayê Constantinusê Duyem ve pz di navbera salên 346-349an hatiye çêkirin. Ew beden ne ev bedena ku niha li dora bajêr heye. Wê demê aliyê rojavayê bedenê ji Derê Mêrdînê hata Derê Çiyê bûye. Bedene aliyê rojava di şûna cadeya Gazî ya îroyîn de, ji Derê Mêrdînê heta Derê Çiyê bûye. Ji wir jî heta Zinarê Fîsê, Derê Dîclê û heta Derê Mêrdînê bûye. Ango nîvê bajarê kevn ê îroyîn di nav beden de bûye. Li aliyê rojavayê cadeya Gazî beden tunebûye. Wê demê bajarê Nisêbînê di bin desthilatdariya Persiyan û Amed jî di bin desthitdariya Romiyan de bûye. Xelkê Nisêbînî xirîstiyan û Şemsî (Agirperst/ Rojperest) bûne. Di navbera Şemsî û xirîstiyanên Nisêbînê de şerekî dijwar derketiye. Xirîstiyanên Nisêbînî dibêjin "Bajar ket bin desthilatdariya Persiyan û Persî jî Şemsî ne, êdî em naxwazin xirîstiyan li Nisêbînê di nav Şemsiyan de û di bin desthilatdariya Şemsiyan de bimînin. Romî xirîstiyan in, em dixwazin bar bikin herin Amedê bin desthilatdariya Romiyan..."

Li ser van daxwaz û bûyeran di navbera deshilatdarên Persî û Romiyan de peyman tê îmzakirin û li gor wê peymanê ji Nisêbînê hejmareke mezin xirîstiyan (hinek çavkanî dinivîsin 40.000) tînin li taxa Elî Paşa ya niha li derveyî bedenê bi cih dikin. Nisêbîniyên li derveyî bedenê, li taxa Elî Paşa, vê carê bûne hedefên artêşên ku girtine ser bajêr.

Institut kurde de Paris



Bajarê mijûlatê bedenê

Rêvebiriya bajêr neçar maye piştî 20 salan yanî di navbera salên 365-367an de bedena ji aliyê rojava, ji Derê Mêrdînê heta Derê Çiyê xera kirine. Ji bo ku koçberên Nisêbîni bigrin nav bajêr, ji Derê Mêrdînê heta Derê Romê beden hatiye çêkirin. Vê carê ji Derê Mêrdînê heta Derê Romê û ji wir jî heta Derê Çiyê bedeneke wek cureyeke ji masiyên çemê Dîclê hatiye lêkirin. Herweha ji wê rojê bi şûn ve bedena Amedê şiklê xwe yê îroyîn girtîye.

Amed bi qasî 250î salan di bin desthilatdariya Romî û Bizansiyan de maye. Ji ber şerên dijwar Romî û Bizansiyan bedena Amedê di 166 salan de temam kirine. Niha her kesê ku li bedenê dinêre, dibêje ev çi şaheser e, Lêbelê kes nabêje ku ev çi xwîneser e? Bi hezaran kole û kesên azad di çêkirina vê bedenê de mirine, kuştine. Di kelekela havîna Amedê de, bi xwêdan, xwîn û hestiyên wan ev beden û birc hatine çêkirin. Ev beden û birc bi qasî muhteşemiya xwe, herweha dîwarên zilm û wahşetê ne. Gelo serên çendik û çend kurên bavan li ber vê bedenê hatine jêkirin? Ev ne dîwar û bircên şaristaniyê ne, dîwar û bircên wehşet, barbarî û zilmê ne. Dîwar û bircên dagîrkeriyê ne. Xwezî zimanê vê beden û van bircan hebûna û behsa serpêhatiyên xwe bikirana! Hinek nivîskarên amedî dinivîsin ku, *"bajarê Amedê ji 33 şaristaniyan re malovanî kiriye. Mozayika şaristaniya Mezopotamyayê ye..."* Mirov dikare ji van nivîskaran bipirse, gelo ev dagîrker ji bo avakirina şaristaniyê hatine bajêr girtine an ji bo talan û wêrankirinê?

Institut kurde de Paris



Cotbeden.

## Cotbeden û cuav

Gelek dîroknas dinivîsin ku ji bilî bedena niha bedeneke din jî hebûye. Herdu paralelên hev hatine çêkirin. Di navbera herdu bedenan de 15-16 metre navber hebûye. Ev bedena duyem ji serê Fîsê heta Derê Çiyê, Derê Romê û heta Derê Mêrdînê paralelê bedena niha bûye. Ji Derê Mêrdînê heta Derê Dîclê û Serayê tune bûye ji ber ku ew cih bilind û qerqez in. Bilindiya dîwarê duyem ku niha tune 10 arşin (6.80 cm) bûye.[46]

Heta çend sal berê jî cih bi cih mirov rastî xerabeyên wê bedene duyem dihatin. Lê hezar mixabin niha êdî xerabeyê wê bedena ya duyem bi tenê hinek li serê Fîsê û hinek jî li Derê Mêrdîne mane. Ev bedena duyem ji bo ku bedena yekem a ku niha heye biparêze hatiye çêkirin. Cihê ku erd rast e û zêdetir dikare ji der ve êrîşên giran û dijwar werin ser bajêr hatine çêkirin. Di navbera herdu bedenan de jî cuaveke (xendeqeke) 15 arşin (10 m) hebûye. Ev cûka avê ji bo du sedeman çêkirine. Dijmin dema ji der ve tunel bikola û bixwesta biketa hundirê bajêr, wê demê av dadikete jêr û yên hundirên bajar û bedenê jê haydar

[46] Şevket Beysanoglu, *Diyarbakır Tarihi, cilt 1*, s. 280

dibin. Sedemê duyem, dema xendeq hebe nikarin zûtir êrîş bînin ser beden û bircan. Nobedar zû bi wan dihesin. Siltanê Eyyûbiyan Melîk Kamil di sala 1231ê de bedena duyem a der xera kiriye, kevir û alevên wê biriye bi ya niha ku heye bilintir û mehkemtir kiriye.[47]

Berê çar deriyên bedena Amedê hebûne. Li bakur Derê Çiyê (Xarpêtê), li başûr Derê Mêrdinê (Tilê), li rojhilat Derê Dîclê (Çem), li rojava Derê Romê (Rihayê). Ji êvarê heta sibê her çar derî bi deriyê hesin hatine girtin. Heta sibê ketin û derketina nav bajêr tunebû. Di ketina hundir de wek ku mirov here welatekî din dergehvan li nasname û pasaportê dinêriyan.[48] Herweha Amed bi salan dewletbajarekî bi navûdeng bû. Piştre beden xera kirine û deriyê Cot û Tek lê hatine zêdekirin û beden bûye şeş derî. Li herêma Derê Çiyê nivîseke ku bi latînî li ser dîwar kolane beşek jê weha ye:

*''Diyarbekir çi xweşwar e*
*Bi ro germ e, bi şev sar e*
*Bedena Diyarbekirê bilind e*
*Dîcle bi ser re zarezar e...''*

*"Di pêşengiya împaratorê neşikestî û qehreman Velantinianus de û di bin birêvebiriya wî ya dîndar de dewlet hat damezrandin. Em tim ber bi serkeftinê ve diçin..."* (Nivîsa li ser tehtê xera bûye û beşeke jê nehatiye xwendin.)

Nivîs û motîvên Abbasiyan bêtir li ser kevirên Derê Mêrdînê hene. Ji van nivîsan yek jê ev e ku tê gotin muhendîsê amedî projeya vê bircê çêkiriye. Lê rastî wî bircê çênekiriye, restore kiriye û hinek beşan lê zêde kiriye. Wergera wê weha ye:

*"Bi navê Xwedê dest pê dikim, bi emîrê misilmanan Îmam Cafer-El Muqtedir di bin birêvebiriya Yahyayê kurê Îsheqê Cercerî û muhendîsê amedî kurê Cemîl Ehmed de hatiye çêkirin..."*[49]

Li vir li ser dîwarê dema Romiyan û Bîzansiyan qat lê hatiye zêdekirin. Ji ber ku beden her ku dest guhertiye, li ser hatiye lêkirin an jî cihên ku di şer de zerar dîtine, xera bûne hatine restorekirin.

Merwaniyan bi qasî 100 salî bajarê Amed û Farqînê bi rêve birine. Ji ber ku Merwanî di serdema wan de Amed û Farqîn û heta herêm bi giştî ji aliyê mîmarî, çand û çandiniyê ve gelek bi pêş xistine. Mervaniyan bedena Amedê

---

[47] Canan Parla, *"Surları ve Türk Dönemi Dokusuyla Diyarbakır kenti"* 38.

[48] Peterman di sala 1853an de tê Amedê û di sala 1865an de biranînên xwe dinivîse. H. Petermann dinivîse ku ber lezandine ku hin deriyên bedenê nehatine girtin û bi sorahiya êvarê re ketin nav bajêr. Dibêje ku "em çend deqîqe jî dereng bimana, êdî deri dihatin girtin û dê em heta sibehê li deri bedenê bimana heta sibehê bi tîrêjên tavê re deriyên bajêr bihatana vekirin."
H. Petermann, *Seyahatnamelerde Diyarbekir*, s. 125 bincrin.

[49] *Anıtları ve Kitabeleri ile Diyarbakır Tarihi*, Diyarbakır Büyükşehir Beliediyesi Kültür ve Sanat Yayınları, 2003, cilt 1, s.169

Institut kurde de Paris

tamîr kirine û li hinek cihan jî lê zêde kirine. Mizgeft, kanî, kanalên avê, çarşî, medrese û pire çêkirine. Di serdema Merwaniyan de pira Amedê ya Dehderî û pira Malabadê ku her yek di warê huner û mîmariyê de berhemeke dîrokî û şaheser in hîn îro jî bi heybet li ser piyan in. Li Amedê Mizgefta Mezin restore û beş lê zêde kirine, li Farqînê û li Entaxê mizgeft û pire çêkirine. Mescîda Merwaniyan a li Derê Çiyê îro wek galerî tê bikaranîn. Li ser deriyê wê yê hundir ev nivîs heye:

*"Mescîdên Xwedê bi tenê kesên ku baweriya wan bi Xwedê û roja axiretê heye, nimêj dikin, zekata xwe didin û kesên ku ji derî Xwedê ji tu kesî natirsin tije dikin."*

Di serdema Artûkiyan de gelek mizgeft birc û minare hatine çêkirin û hinek cihên bedenê lê hatine zêdekirin. Berhemên Artûkiyan ên herî hêja Medreseyên Zinciriye û Mesûdiye ne.

Li aliyê rojava di navbera Derê Hîndî Baba û Derê Çiyê de nivîs û nîgarên (fîgurên) Eyûbiyan jî hene. Herweha li gelek cihan mirov rastî nivîsên dema Abbasiyan, Selçûqiyan û desthilatdarên din ên ku Amedê dagîr kirine jî tê. Bedena Amedê wek lênûsa (deftera) bîranînên sîyasiyan e. Kê Amedê dagîr ki-

Derê Romê (Ruhayê)
Foto: Nejat Satıcı



Institut kurde de Paris




Birca Keçikê
Foto: Nejat Satıcı

riye, navê xwe û desthilatdariya xwe li ser kevirên bedenê daye kolandin.

Di serdema Osmaniyan de jî her paşayeke wan li ser navê xwe mizgeftek daye çêkirin. Çend ji wan navên xwe li taxan kirine. Wek taxên Elî Paşa, Husref Paşa, İskender Paşa, Fatîh Paşa... Di dema komarê de jî navên xwe li kolanan kirine. Gazî cadesi, Inönu cadesi, İsmetpaşa cadesî, Ziya Gökalp cadesi...

Bedena Amedê ya dîrokî bi qasî 5 km dirêj e. Ji rojhilat û rojava 1.700 m û ji bakur û başûr 1.300 metre ye. Bilindiya bedenê 10-12 û firehiya wê jî 3-5 metre ye. Riyeke fireh li ser bedenê heye ku qûle û bircan bi hev ve girê dide. Ev rê bi dîwarekî 70 cm bilind tê parastin. Dema ku kesekî ji qûle an birceke here ya din, ev dîwar wî diparêze.

## Bircên bedena Amedê

Pêşî 72 bircên bedena Amedê hebûne. Ev jî ji ber ku 72 şagirdên (haveriyên) Îsa hebûne, weha çêkirine. Di demeke dûr û dirêj de 10 bircên din jî çêkirine û hejmara bircan gehiştiye 82an.[50] Hinek birc gilover, hinek çargoşe û hinek jî pirgoşe ne. Bircên herî mezin û dîrokî birca Keçikê (Keçî),[51] Şagird (Ulu Be-

[50] Şevik Korkusuz, *Seyahatnamelerde Dıyarbakır*, s. 19
[51] Bi kurdî bi çûk. Bi zimanê xelkê kiçik an ji keçik, qicik jî tê gotin. Tirkan Kiçî kirine Keçi. Li Şevket Beysanoglu *Dıyarbakır Tarıhı cilt* 1, s.228an binêre.

Institut kurde de Paris



Hundirê Birca Keçikê
Foto: Nejat Satıcı

den/Evli Beden), Westa (Heft Biran) û ya Nûr in. Piraniya bircan sê tebeq in. Tebeqeyên binî wek depo û axur, sarinc, mexzen, tebeqa duyem û sê yem ji bo şervan û depo hatine amade kirin. Li ser her bircî teraseke heye ji bo ku ji dûr ve rewşa herêmê bibînin û kontrol bikin.[52] Lê birca Şagird û ya Westa çar tebeq in.

## Birca Keçikê

Li Derê Mêrdînê li aliyê çepê ye û li bexçeyên Hewselê û Dîclê dinêre. Di nav de birca herî kevn û mezin yek jê jî birca Keçikê ye. Ji ber ku beden cara pêşî ji Derê Mêrdînê di cadeya Gaziya îro re heta aliyê rojhilat di navbera salên pz 346-349an de hatiye çêkirin. Wê demê ji Derê Mêrdinê heta Derê Romê û Derê Çiyê beden tune bûye. Ango bedena aliyê rojava ku niha birca Şagird û Westa di navbera salên 365-367an de hatine çêkirin. Birca Keçikê didestpêkê pîrozgeha Mecûsiyan bûye. Cara pêşî di dema Pers û Romiyan de hatiye çêkirin. Piştre her ku bajêr dest guhertiye, lê hatiye zêdekirin û restorekirin. Di dema Merwaniyan di navbera salên 1045-1058an de ji aliyê Ehmed Merwanî ve restoreyeke

[52] Orhan Cezmi Tuncer ji daye ser rê û rêçika Beysanoglu û dinivîse ku "yên ku birca Ez û Tu çêkirine Yakup û bavê xwe Îbrahîm in û di serdema Artûkiyan de çêkirine. Di çêkirina bircê de bav û law ketine pêşbirikê. Ev ne rast e. Li ser van bircan nîgarên Romê hene. Ev birc di serdema romayiyan de hatine çêkirin. Yakup û Îbrahim dikarin cihê xerabe tamir bikin. Orhan Cezmi Tuncer, Diyarbakır Camileri. S. 340 binêre.

mezin dîtiye û hinek ciyên wê lê hatine zêdekirin. Di van salan de Merwaniyan navê xwe li ser nivîsine. Navê wê yê rastî birca Keçikê ye. Keçikê kirine 'Keçî'. Tebeqa binî pir mezin û fireh e. 11 stûnên mermer ên bilind hene. Tê gotin ku di dema xwe de tuneleke di navbera vê bircê û bedena hundir û Serayê de hebûye. Di dema şer û rojên teng bi kar anîne. Niha jî beşekê wê tunelê maye. Ev birc niha hatiye tamîr û paqijkirin. Ji turîstan re vekiriye. Niha li vir civîn û semîmerên çand , hunerê û kokteyl tên amadekirin.




Birca Westa

## Birca Westa

Birca Westa (Yedîkardeş) li Rojavayê birca Şagird e. Di navbera herdu bircan de heft bircên din jî hene. Lêbelê mirov heybeta van herdu bircan ji dûr ve dibîne. Ji vê herêma herdu bircan re amedî bi tirkî 'Ben û Sen' dibêjin. Ango Ez û Tu. Plan û mîmariya herdu bircan wek hev e. Hem ji aliyê hundir û him jî ji aliyê der ve digîhîn hev. Li aliyê der kevirên ku bi karanîne, ji estetîk û planê ve wek hev in. Wêne û nîgarên herdu bircan jî nêzîkî hev in, qertalê duserî û herdu şêrên dûvmar jî wek kopiya hev in. Diyar e ku di heman demê de hatine çêkirin. Ev jî di dema Romî û Persiyan de hatine avakirin. Lê piştre wek bircên din ên bajêr her ku dest guhertiye, hatiye tamîrkirin û li ser wan hatiye zêdekirin. Dagîrkeran nav û pesnên xwe li ser kolane. Dîsa wek birca Şagird Ara Altun, Basri Konyar û şagirdên wan Şevket Beysanoğlu îdîa

Institut kurde de Paris



Ben û Sen

Institut Kurde de Paris

dikin ku ev birc jî ji aliyê Artûkiyan ve hatine çêkirin. Tu têkiliyên van bircan û Artûkiyan bi hev tune. Artûkiyan jî wek dagîrkerên din navê xwe li ser kolane. Li ser van herdu bircan efsaneyeke weha heye ku herdu birc navê xwe yên rastî li gor vê efsaneyê girtine û piştre Tirkan nav guhertine.

Efsane weh ye:

Di demekê de hukimdarê Amedê xwestiye du bircan bide çêkirin. Hukimdar ji bo bircan du şert danîne ber dîwarbendan. A yek divê zexm bin û ya duyem jî divê birc bi hunereke mezin were hunandin, xweşik û bi estetîk bin. Hukimdar plana van her du bircan çêdike û bangî westeyan dike. Ferman dide: "Gidî, degidî demeke zûtir çêkin!" Westa gazî şagirdekî xwe yê baş dike. Heta hinek dibêjin ku şagird bi xwe kurê westa bûye. Westa dest bi çêkirina birca Westa û şagird jî dest bi çekirina birca Şagird dike.[53]

Herdu bircan jî navê xwe ji westayên ku ew çêdikin digrin. Dema herdu bircan temam dikin, westa, şagirdê xwe digire û diçe huzûra hukimdar û dibêje, *"Hukimdarê min birc temam in."* Hukimdar bi heyeta xwe ve diçe li bircan digere ka kîjan saxlem û xweşik hatiye çêkirin. Piştî gerê hukimdar û heyeta

[53] Di sed sala 19an de demeke dûr û dirêj zilamên ku bê mal û malbat bûne û li birca Westa mane û razane. Dewletê jê re "Ulubenden" an "Evlibeden" gotine. Di dokument û tapûyên herêma bircê de jî nav "birca Şagird" derbas dibe. Wek nimûne di tapûyê weqfa Îskender Paşa de ku di navbera salên 1550-1564 de hatiye amade kirin "birca Şagird" dinvîse. Şevket Beysanoglu, *Diyarbakır Tarihi*, cilt-1, s. 314

Birca Şagird ➤
Foto: Nejat Satıcı

xwe biryar didin ku birca Şagird ji ya Weste zeximtir û spehîtir e. Li ser vê yekê, westa pir xemgîn dibe û xwe ji birca xwe davêje xwarê û dimire. Piştre şagird jî xwe ji ser birca xwe davêje xwarê û ew jî dimire. Riwayeteke din jî tê gotin ku her du westa êdî bawer dikin ku nema dikarin ji van herdu bircan xweşiktir û zeximtir berhemeke din çêbikin, loma xwe dikujin.

## Birca Şagird

Birca Şagird (Evlibeden) û birca Westa (Yedikardeş) li bedena başûrê Amedê ne. Birca Şagird li rojavayê birca Westa ye. Birca Şagird li cihê ku dîwarê bedena başûr û rojava dibin yek hatiye avakirin. Ew wek stûneke mezin û bilind herdu dîwarên bi hev ve girê dide. Beden wek masiya panik a çemê Dîclê ye û birca Şagird jî wek duvikê wê yê jorîn û ya Westa jî wek duvikê wê yê jêrîn e. Herêma Serayê jî wek serê masî ye. Birca Şagird di nav 82 bircên Amedê de birca herî mezin, fireh e. Ji aliyê mîmarî û estetîkî ve jî ya herî spehî ye. Navê bircê yê orjî-



Institut kurde de Paris



Birca Nûrê
Foto: Nejat Satıcı

nal "birca Şagird"[54] e. Aliyê derve ji kevirên bazalt û hundirê wê ji kevir û acûr (tûxleyan) hatiye çêkirin. Birc çar tebeqe ye. Gilover û çapa wê 25.50 metre ye.

Di deriyekî teng de mirov dikeve hundirê tebeqa erdê. Li navê eywaneke mezin heye. Derdora wê bi kumbet e û jûrên cihê hene. Di her jûrî de berqazên (mazgal) devteng hene. Tebeqa binî ji bo depo hatiye çêkirin. Di nav jûran de ji bo çûn û hatinê riyên teng hene. Tebeqeyên jor ji bo zêrevan, parêzvan û şervanan hatiye amade kirin.

Ji aliyê der ve bi hunereke mezin hatiye çêkirin. Di çêkirina wê de estetîk, huner û zanîn dîyar û zelal in. Li ser kevirên bazalt wêneya qertelekî duserî heye. Di ber de jî zerqeyeke heye. Li rast û çepê jî wêne yên du şêran hene. Berê herdu şêran bi hev ve ye û qertel di nav wan de ye. Dûvê her du şêran jî wek serê mar in. Wêneyên herdu şêran jî zêde ne baş û bi estetîk in, qebe ne. Tarîxa çêkirina vê bircê ne dîyar e. Kengê û ji aliyê kê ve hatiye çêkirin, kes nizane. Lê nivîseke li ser keviran ku di sala 1208an de melikê Artûkîyan melîh Salih li ser navê xwe bi mîmar Îbrahim Bîn Cafer daye çêkirin, heye. Ji ber vê nivîsa li ser dîwar nivîskarên Tirk dinivîsin ku birca Şagird û ya Westa ji aliyê Artûkiyan ve

[54] Di weqifnameya mala İskender Paşa ku di navbera salên 1550-1564an de hatiye amadekirin û di gelek tapûyên taxa Alî Paşê de ku di destê wan de hene de navê bircê "birca Şagird" hatiye nivîsandin. Herweha birca ku jê re dibêjin "Yedikardeş" jî "birca Westa" ye. Li gor çiroka ku dibêjin yekî westa û ya din jî şagirdê wî çêkiriye û ya şagird ji ya Westa baştir hatiye dîtin. Varyanteke din ji weha ye: Tê gotin ku piştî çêkirina birca Şagird, Hetf bira di bircê de li dijî dijmin şerekî dijwar dane, ji ber vê yekê navê birca Heft Biran lê kirine. Yanî navê yekem nîne yê duyem e. Li Şevket Beysanoglu, Diyarbakır Tarihi-1 s. 314, dip not 2.

hatine çêkirin. Ev ne rast e. Rastî ev e ku ne Artûkiyan çêkiriye, Artûkiyan di wê demê de restore kirine. Ev teorî û îdea bêbingeh a nivîskarên wek Ara Altun, Basri Konyar û şagirdên wan Şevket Beysanoglu ne ku Amedê wek bajarekî Selçûqî, Artûkî û Osmaniyan didin nasandin. Ev hersê nivîskar dinivîsin ku "nîgarên şêr û qertelê duserî yên Selçûqiyan in." Li seran serê cîhanê hemû arkeolog, dîrokzan û zanyar hemfikir in ku nîgarên qertelê duserî, şêr û xaça gama sembolên serdema Sumer, Hatî, Hûrî , Mîtani û Asûriyan in. Bi taybetî qertelê duserî di dema Hatiyan de sembola hêz û karînê bûye û îro jî di muzeyan de heye. Ev sembol/nîgar berî ku xirîstiyanî here Ewropa ji Mezopotamyayê birine Ewropa û ji wir jî li dinyayê belav bûne. Di dema xwe de ji Mezopotamyayê heta Misir û Hîndistanê jî çûne.

Qertel standartên lejyonên Romayê ye. Di dema Roma, Bizansê de li ser dîwarên beden û qesra û piştre di dema xirîstiyanê de li ser deriyê dêr û manastiran li ser keviran kolane. Heta Rûsyayê çûye. Misilman peyker û nîgaran çênakin, li gor wan heram e, kufarî ye. Heman wêne/nîgar li ser dîwarê Mizgefta Mezin jî hene ku ji dema Persiyan û Romiyan ve mane. Ev jî dide dîyar kirin ku birca Şagird û Westa, ne di dema Artûkî yan de, di dema Pers û Romiyan de hatine çêkirin. Ma Romayiyan cara pêşî bedenê bê birc çêkirine? Lê rastiyek heye ku li Amedê her ku desthilatdarî hatiye guhertin, her kesî nav û nivîsên xwe li ser birc û dîwarên bedenê nivîsîne. Heta hinek ji wan restore kirine, lê zêde û kêm kirine. Birc û bedena Amedê ji bo dagîrkeran bûye textê propaganda, halan û pesindayînan.

## Xerabkirina bedenê

Waliyê Amedê Nizamettîn di sala1930/1931 bi behaneya ku beden nahêle bajar hewa bistîne û gelek germ e, ferman dide ku bedenê xera bikin ku bajar hênik bibe. Li herêma Derê Çiyê û Derê Mêrdînê bi dinamîtan dest pê dikin û bedenê xera dikin. Walî ji xelkê re jî dibêje: *"ji xwe re keviran bibin, xanî lêkin."* Di sala 1932an de Prof. Dr. Albert Gabriel ji Fransê ji bo lêkolîneke arkeolojîk

Derê Çiyê, 1931



Institut kurde de Paris



tê Amedê. Dema xerakirina bedenê dibîne vedigere Enqerê û diçe gilînameyek dide Wezareta Perwerdeyê ku xerakirina bedenê zûtir rawestînin. Hukimet li ser wê gilînameya Albert xerakirina bedenê radiwestîne û beden ji mirinê rizgar dibe, lê birîndar û seqet dimîne.[55]

## Sembolên li ser dîwar û bircên Amedê

Li ser birc, dîwarê bedenê, xaniyên kevn, dêr û pîrozgehên Amedê gelek sebmolên heywan, nebatî û tiştên din hene. Yên ku heta niha mane û hatine tespît kirin ev in: Qertal, şêr, bizin, ga an conga, hesp, mar, dûvpişk, xaça gamayî, gul, çek, cureyên mêwa, zad, roj û stêrk... Li ser her deverek wêne û nîgarên cuda hene. Wek nimûne, li ser dîwar û bircên Derê Mêrdînê şêr hene û dûvên wan mar in. Ji bilî wan nîgarê nefel û gelek nebatan hene. Li birca Şagird û Westa du şêr li hember hev hene û qertelê duserî di nav wan de ye. Li ser bircên Derê Çiyê jî du şêr û di nav wan de ga heye. Herweha li Derê Çiyê wêne û nîgarên kûçik, mar û nebatan gelek in.

Hîn di serdema Neolotîk de mirovan xeyal û nîgaşên mezin û kûr kirine. Ango berî serdema dîrokî mirovan bûyerên ku gengeşe kirine, pîroz dîtine, kirine efsane û wêneyên wan li ser kevir û zinaran kolane. Xwestine weha xwe ji hêzên xeybane biparêzin. Bi van sembol, nîgarê wêneyan li wan hêzên xeybane bandor bikin, hêvî û daxwazên xwe bi cih bînin. Hinek ji van sembolan jî kirine sembolên serkeftinên xwe yên komî, netewî. Mijarên mîtolojîk ra û koka xwe berdane dîroka mirovan a giştî. Weha bûye ku bi hezar salan berê ji van sembolan hinek bûne cîhanî li gelek cih û welatan belav bûne. Hinek jî herêmî mane, li gor erdnîgarî, rewşa civakî û prosesa dîrokî tên guhertin. Piştî gelek salên dûr û dirêj her wêneya heywan, tişt û nebatan bûne sembolên cihê cihê. Sembolên ku li ser beden, birc û avahiyên Amedê hene, em ê dîrok, wate û di dema xwe de sembolên kîjan gelî bûne, dîyar û zelal bikin.

## Sembola qertalê duserî

Di dema Sumeran de li Lagaşê ev sembol hebûye. Wê demê wek "Balindê Firtone" hatiye zanîn. Piştre li Akad û Misirê jê re "Teyrê *Sîmir*" (Anka) gotine. Herweha qertelê duserî li ser dîwarê paytexta Hatiyan Hattûşa jî hebûye. Lêkolîner

[55] *Taşlar ve Düşler Diyarbakır*, Diyarbakır Büyükşehir Belediye Başkanlıgı, sayfa 43 Kültür ve Sanat Yayınları-2004

Institut kurde de Paris



Nîgarên li ser dîwarê Derê Çiyê.

û arkeolog destnîşan dikin ku di qertalê duserî de, di laşekî de mêranî û jinîtî bûne yek û sembola ariyan e.[56]

Piştî ku xirîstiyanî li ser rûyê erdê belav bûye, xirîstiyanên Ortodoks qertelê duserî ji xwe re kirine sembol û li ser dêren xwe xistine. Qertelê duserî bûye sembola Bizansan.[57] Niha jî sembola Parlamentoya Almanyayê ye. Ya herî girîng di serdema Împaratoriya Romayê bûye sembola fermandarên Romiyan ku piraniya wan ji herêma Arnawidê (Albanyê) bûne. Di şerê Osmanî û Bîzansan de jî qertalê duserî sembola artêşa Bizansan bûye. Niha alaya (beyreqa) Arnawidê zemînê wê sor e û qertelê duserî li navê ye. Arnawid bi xwe tê wateya Welatê Qertelan. Welatê çeleng û lehengan. Çend wateyên qertela duserî hene:

1. Sembola pêşeroj û paşarojê ye.
2. Sembola hebûna ezelî û ebedî ye.
3. Li ser rojava û rojhilat hêzê Xwedayî yê desthilatdarî ye.
4. Qertalê edetî jî sembola hêz, qehremanî û azadiyê ye.

## Sembola şêr



Sembola şêr jî cara pêşî li Rojhilata Navîn hatiye dîtin. Şêr sembola hêz û qehremaniyê ye. Di dema Persan de li bexçeyên qiral û malmezinan de peykerên şêran hebûne. Piştre derbasî Ewropa bûye. Dema ku xirîstiyanî derketiye holê, xirîstiyanan wê ji xwe re kirine sembola Îsa. Ji ber ku xirîstiyan bawer dikin ku Îsa kurê Xwedê

[56] Ahmet Dursun 374.blogen.com
[57] Ahmet Ümit, İstanbul Hatırası,s.458

Institut kurde de Paris

ye, loma xwedî hêza manewî ya herî mezin e. Herweha Romî di serdema xwe de serayê xwe bi kevirên mermer çêkirine û li hewş, bexçe û ser riyan heykelên şêran bi cih kirine. Wateya hêzeke mezin danê. Îro jî li bexçe û parkên bajarên Ewropiyan peykerên şêran hene.

## Sembola ga

Ga sembola hêz û xebatê ye. Di dema Sumeran de peykerên gayê ku serê wî wek mirovan in çêkirine. Laş ga ye û serî serê mirov e. Di heman demê de ev peykerên qiralê wan bûne, nîşan bidin ku qiral çiqas bi hêz e. Ji heykela ga ya Meopotamyayê kopyeke niha li pêş şaredariya Bajarê Mezin ê Amedê ye. Ga hewqas bi hêz e ku di mîtolojiyê de cîhan li ser qiloçê wî ye. Dema xwe dilivîne cîhan diheje û erdhej, felaket û karesat çêdibin. Li Ewropayê jî saksonî, îrlandî, skoçî, danîmarkî, norveçî, swêdî kumên bi qiloç dane serê xwe. Hêzbûna xwe bi wan qiloçan dane xûya kirin. Îro jî di maçên futbolê de kumên bi qiloç didin serê xwe.

Institut kurde de Paris

## Sembola dûvpişkê

Bajarê Amedê çawa bi beden, zebeş û çemê Dîclê bi navûdeng e; herweha bi germahî û dûvpişka xwe ve jî bi navûdeng e. Di zemanê berê de, li malên Amedê yên kevn gelek dûvpişk hebûne û bi mirovan ve dane. Bi taybetî bi zarokan ve dane. Wek tê zanîn ji aliyê rengan ve li cîhanê dûvpişkên reş, sor, kej, şîn, zer û spî hene. Li Amedê dûvpişkên reş, gewr û spî hebûne. Dûvpişka Amedê ya spî gelek bi navûdeng e. Gerokên Ewropî li ser wê heta niha gelek nivîs nivîsîne. Dûvpişka spî zêde ne bi jehr e. Lêbelê dîsa jî ji bo mirovan bive (talûke) ye.

Dûvpişk zêde ji bin çarderên derî û qulên dîwaran hez dikin. Carnan dikevin nav ferê solan (pêlavan) jî. Dema mirov lingê xwe bixwe nav solê, bi lingê mirov ve dide. Di nav sembolên Amedê de dûvpişk jî heye. Li ser bedena Amedê li gelek cihên cuda motîvên dûvpişkan hene. Berê li ser berikên şalwarên Amedê motîvên mar û dûvpişkan çêdikirin. Mar û dûvpişk sembola bajarê Amedê ne û mar jî wek tê zanîn sembola Kurdên Zerdeştî û Êzîdî ne. Sembola emaneta ku bi zehmet tê parastin. Di heman demê de sembola, defîne, biryardarî û berxwedanê ye.

## Sembola xaça gamayî

Li Derê Çiyê li ser kevirên bedenê gelek nîgarên cihereng hene. Yek ji wan jî xaça gamayî ango xaça serxwar e. Navê "gama" ji Yewnanî tê. Yewnaniyan ji formê tîpa "r" re "gama" gotine û ev nav ji wir maye.



Li gor arkeologan ev xaça gamayî ji dema Sumeran ve heye û dîroka we digihe 4000 sal berî mîladê. Piştre derbasî Hîndistanê bûye û navê xwe ji du gotinên sanskrîtî girtiye. "su" û "astî" bi sanskrîtî "su" tê wateya "baş" û "astî" jî tê wateya "hebûn". Herdu dema dibin yek gotin, tê wateya jîyaneke baş û bextewar. Sembola pirparî û oxirê ye. Herweha xaça gamayî di nav Ariyan de, ji Hîndistanê heta Kurdistan û Ewropayê bûye sembola Ariyan. Di destpêka xirîstiyaniyê de, li ser kevirên goran jî xistine. Çar milê xaça gamayî hene. Her yek xwedî wateyek e. Milên xaçê sembolên tîrôjên rojê ne. Wate û nîşana roj û pêşerojên şad û serketî ne.[58] Her yek hêzeke kozmîk temsîl dike: Agir, av, hewa û ax. Xwariya sere xaçê jî şev, tarî, bive û bêyomiyê temsîl dikin. Ji vê xaça serxwar re svetîka jî dibêjin. Svetîka li ser cihê pîrozgehên Hînduîzmê jî hene. Ji bo *svetîka* sembola Ariyan e, Hîtler ji xwe re ew kir sembola nasîyonalîzma Alman û got "Nîjadê Arî yê herî durist, pak û serbilind em Alman in."[59]

[58] Prof. Mehmet Aydın, *Ansiklopedik Dinler sözlügü*. S.241

[59] Hinek kesên nijadperest niha li vê sembola ariyanî xwedî derdikevin û dibêjin "a Tirkên Asya Navîn e." Ne bi tenê ji svetikayê re her weha ji sembola qertalê duserî, şêr û gelek sembolên din jî dikin malê Selçûqiyan.



## Avasazî

Hema hema di her malê de hewşeke mezin li hewşê bîr û hemzeke biçûk hene. Di hewşên mezin de mirov dikare darên wek hêjîr, hinar, mêw, tû, selwî û çinar jî bibîne. Di guldankên seramîk de gul û şînahî hene. Di van 30-40 salên dawî de piraniya xaniyên kevn xera kirine û di şûna wan de xaniyên ji tuxle, pîrket û keviran lêkirine. Mîmariya bajarê kevin xera, talan û xopan kirine. Niha li Amedê 280 xaniyên weha kevn mane.

Dema mirov qala xaniyên Amedê bike divê pêşî behsa hewşê bike. Ji ber ku taybetiya herî girîng hewş e. Xaniyên Amedê bê hewş tune ne. Eywan, jûr (ode), pişgeh, hemam jî taybetiyên xaniyên Amedê ne. Di xaniyên Amedê de, jûr bi qasî hewşê ne girîng in. Ji ber ku jiyan pirtirin di hewşê de derbas dibe. Ev yek jî wek kewneşopeke di xaniyê Amedê de xuya dike.

Mirovên vê herêmê li gor jiyana xwe ya rojane û demsalan xaniyên xwe ava kirine. Di hewşekê de aliyê havînê û aliyê zivistanê bi taybetî hatine çêkirin. Xaniyên zivistanê yek qat û yê havînê jî du qat in. Xaniyê zivistanê pala xwe dide xaniyê havînê ku berê wî li bakur e, ji bo zivistanê xwe ji sermê biparêzin. Xaniyê havînê jî pala xwe dide yê zivistanê ku berê wî li başûr e. Piranî xaniyên Amedê bi kevirên reş hatine çêkirin. Text û tuxle ne taybetiya vê heremê ne.

Li taxa Savaşê li kuça Goçmen (17.ADA,197, parsel 11) xaniyekî Amedê bi taybetî û mercên xwe yên kevnare heta îro hatiye parastin. Li taxa Goçmenler

Institut kurde de Paris



Ji avasaziya Amedê xaniyek.
Foto: Nejat Satıcı

Institut kurde de Paris

di deriyê hejmara 17an de dema mirov dikeve hundir (aliyê çepê) du tuwalet hene. Her çar aliyên hewşê girtine. Li aliyê başûrê rojhilat bîrek heye. Hewş 155 $m^2$ ye. Ji aliyê rojhilat ve eywanek û çar pencere li vê hewşê vedibe ku jûrek tê de ye. Yeq qat e. Ji bo ku di bin vê odê de mahzene çêbikin qatê diwêr ji hewşê 1.04m. hatiye bilindkirin. Ketina odê ji eywanê ve du derence ne. Derenceya bi text ku bi aliyê rojhilat ve têkiliya wê heye vedibe, nemaye.

Aliyê başûrê hewşê 1.04 m hatiye bilindkirin û di bin vê baskê de mahzenek hatiye çêkirin. Aliyê bakur yê eywanê jûreke mezin heye ku pênc pencerê wê bi aliyê hewşê ve vedibin. Ev alî jî yek qat e. Aliyê başûr kîler, li navîna wê bi du çavîn eywanek û li aliyê bakur navdêra çûyîn û hatinê hene. Qata ser bi seranser jûreke mezin e û şeş pencerê wê li aliyê hewşê mêze dikin. Derenceya li aliyê bakur ber bi rojava ve ye û di navbera wan de pireke biçûk ava dike. Aliyê wê yê ku li taxê dinêre, aliyê rojava bi keviran hatiye hunandin, diwêr piranî bi bexdadî hatiye çêkirin û du pencere li vî aliyî hene.

Aliyê bakur, li vê baskê piştî pêjgehê bi rêzê ve hemam û rojhilatê wan du jûr hene. Jûr li aliyê hewşê pênc pencere û bi deriyekî ve tê girêdan. Ev xanî bi taybetiya xwe wek qonaxeke spehî ye. Deriyê wê yê der, pir xwerû ye. Ji bilî kevirê reş û spî nexşên cuda jî hene. Ne tenê nexş her çar baskên ku di hewşê de, lihevhatina avahî xweşikbûneke suriştî û dewlemendîbûneke bêhampa dide avahiyê.

Li aliyê bakur li ser deriyê odê, dîroka 1903 heye. Li baskê başûr li ser pencera odê 1899 nivîsiye. [60]

## Kuçe

Kuçên Amedê gelek teng in. Xanî gelek nêzîkî hev in. Hinek kuçe rast in û hinek jî xwaromaro, fetlometlo wek labîrantan in. Ji ber ku dora bajêr beden e û erd gelek kêm e. Pêwist bûye ku xaniyan biçûk û kuçeyan teng çêkin ku zêde cih negirin. Kuçe bi kevirên doşirme ne. Hinek kuçe bi hevdu ve girêdayî ne û mirov dikare derbasî kuçeyên din bibe. Hinek jî heta derekê diçin, diqedin û dernakevin ser kuçên din. Ji kuçeyên weha re kuçekor (kuçeçıkmaz) dibêjin.

Kuçeyên Amedê teng û nepenî ne. Navên kuçe û pêxwasên Amedê li gel hevdu tên bikaranîn. Taxa Xançepekê sembola kuçe û pêxwasên Amedê ye. Pêxwas û tolazên amedî di van kuçeyan de halanan li xwe hildidin, kêrên xwe bi dîwaran re dikşînin û bi zarekî argoyî dipeyivin. Doza pacerê û xûgiyê li xelkê dikin.

Di zemanê berê de şaredariyê nehiştiye ker, hiştir û hesp bê hevsar werin Amedê. Heger bê hevsar hatibana ceza li xwediyê wan dihat birîn. Dibêjin memûrên şaredariyê karwanekî girtine ku hevsarê hespên wî tune bûne. Wê demê li navenda Amedê kî bi kurdî bipeyiviya cezayê pere lê dihatin birîn. Karwan xwestiye xwe bi tirkî piparêze ku ceza lê nebirin.

*"Efendî, efendî, min qurbandir!*
*kuçe tengdir, bar pir qebedir*
*min hevsar kişand çirt û qetîdir*
*ma sûcê min feqîrî li vir nedir."* [61]

Piraniya xaniyan bi şaneşîn in. Şaneşînên kevn ji text hatine çêkirin. Xaniyên kevn yek an du tebeq in.

Berê di piraniya xaniyên Amedê de, baweriya wan çi diba bila biba, di sifirneyê wan ê pêşî de roja heştgoşe hebûye. Ew sembola roja Zerdeşt bûye. Ev temsîliya Xwedawenda rojê Sîn e. Tê gotin ku her şev Xwedawenda rojê Sîn di çemê Feradê

[60] Orhan Cezmî Tuncer, Diyarbakır Evleri. S. 314
[61] Xwestiye bêje, efendî ez bi qurban, kuçe teng bû û bar qebe bû min hevsarê kespên xwe kişand û hefsar qetî, ma sûcê min çi ye?

Ji Ameda kevn kuçeyeke kevn. →
Foto: Melike Dara Günal



Institut kurde de paris

de xwe dişo. Tê malên Amedê pîroz dike û diçe ava çemê Dîclê vedixwe. Di berbanga sibê de hildikişe ser çiyayê Amedê yê herî bilind.

Li herêma Derê Mêrdînê Kuçeya Şemsiyan heye. Li wir wêneyeke satorê heye ku tê wateya bêyomiyê. Ev ji dema Romayê ve maye.



## Şeqşeqên derî

Li Ameda kevn derî û toqmaqên deriyan xwedî taybetmendiyên xwe yên girîng in. Amedî ji toqmaqên deriyan re dibêjin şeqşeq. Avasaziya bajêr rengîn û dewlementir dikin. Di wan de huner û felsefe hene. Bîr û bawerî û efsane hene. Şeqşeqên derî çend cure ne. Piranî di şiklê çûkê de ne. Lê yên di şiklê destê jinan de jî, di rêza duyem de ne. Toqmaq du perçe ne. Yek li bin û ya din jî li jor e, herdu hev temam dikin. Hinek cihên lêdan du ne. Yek dengê xurt "*teq-teq*" û ya din dengê "*tiq-tiq*" der dixe. Dema *teq-teq* ji derî were, xwediyê malê dizane yê ku li derî dide zilam e. Na, dema tiq-tik were, ew jin e. Xwediyê malê li gor wê dengî dilive û derî vedike an nake. Gelo çima piraniya toqmaqan di şiklê çûkê de ne? Hem pratîk e û hem jî çûk sembola nûçeya xêrê ye.

Ne tenê şeqşeqên derî, ji bo parastina wê malê gelek sembol li ser derî hatine çêkirin. Li gor demên xwe van sembolên li ser derî xwedewendayên parastinê bûne. Ji van sembolan şêr, qertel, hwd. Li gor baweriyan ew sembol parastina wê malê û wan kesên ku di malê de dijîn, dikin. Hîn jî li avahiyên kevn wek çandek ji van sembolên parazgehên deriyan dîtin mane.

## Hemam

Li gor salnameya Amedê hejmara 1900î wê demê li Amedê 8 hemam, 24 mizgeft, 21 mescîd, 11 dêr, 6 tekîya, 20 xan, 3 pirtûkxane, 11 medrese, 13 kanî, 5 dibistanên seretayi, 10 dibistanên subyanan, 9 dibisatên xirîstiyanan, 2 dibistanên bîyanî, dibistaneke mamosteyan, dibistaneke kar û hunerî, amadeyiyek, ruştiyeke leşkerî, ruştiyeke mulkî, dibistaneke cihûyan, şaredariyek, çapxaneyek, nexweşxaneyek û çarşiyeke sergirtî hebûne.

Institut kurde de Paris



Hemama Paşê

## Hemama Deva

Hemama Deva nêzîkê Derê Merdînê li ser cadeya Gazî ye. Li Amedê hemama herî mezin e. Hemama Deva li gor texmînan di navbera salên 1520-1540an de hatiye avakirin. Pêşî navê wê hemama Kebîr (hemama Mezin) bûye û piştre xelkê navê hemama Deva lê kirine. Li gor gotinên gotinbêjan dibêjin ku hemam hewqas mezin bûye ku hêştirek ketiye nav hemamê û lê gerînê bi zor û bela dîtine. Ji wê rojê bi şûn ve, jê re gotine hemama Deva. Kumbeta wê ji 21 kevîran hatiye hunandin û çapa qubeya wê 14 m ye. Qube heştgoşe ye. Di kemera wê de heşt pencere hene. Di beşa cilderanînê de rojinekê heye û hewaya germ di wir re diçe der ku mirov zêde xwêdan nede.

Di beşa serşûştinê de berê li navê mermereke mezin hebûye ku mirov li ser rûne, lê niha ew tune û di şûna wê de beton heye. Di vê beşî de hemû kumbet in. Di sala 1711an hatiye tamîrkirin û helbestvan Hamî di helbesteke xwe de daye xuyakirin. Di sala 1930an de Mudûrê Weqfan yê herêmê hemam firotiye.

Niha cadeya Gazî fireh dikin, lê xaniyê hemamê dikeve ser rê û naye xera kirin. Şaredarî dixwaze ji nû ve restore bike.

## Hemama Paşê

Hemama Paşê di navbera salên 1564-1567an hatiye çêkirin. Jê re hemama Behrem Paşa jî dibêjin. Li gor agahiyên Evliya Çelebî, Paşê li Erebistanê gelek hemam dîtine û xwestiye ku li Amedê jî wek wan hemaman hemameke mezin çêbike. Loma ji Gaze û Qudsê dîwarbend aniye Amedê. Di heman demê de ji wir bi barên hêştiran mermer û kevir anîne û hemam çêkirine: Çar eywanên wê hene. Li herdu aliyan jî pencere di nav kemberan de hatine çêkirin. Qubeya wê heştgoşe, mezin û li ser qasnaxeke saxlem hatiye avakirin. Rojina navê jî heştgoşe û hundir baş ronî dike. Qube ji aliyê derve, bi tuxlan wek konî hatiye çêkirin. Salona der dirêj û biçûk e. Jûr bi kember in û di nav de saloneke mezin heye. Di nav wê de sekûyeke rûniştinê çêkirine. Di her jûrê de du cirnikên bi moslix hene. Li cem cirnikan kursiyên ji kevir 35-40 cm bilind hene ku mirov dikare li ser wan rûne. Her ku restore kirine, zerar dane mîmariya hemamê. Piştre, di navê de avdestxane çêkirine, dîwar hatine lêkirin, derî û pencere hatine vekirin.

## Hemama Melîk Ahmed Paşa

Wek ji navê wê diyar e, li herêma Melîk Ahmedê ye. Ew û xana Melîk Ahmed bi hev ve ne. Di sala 1564an de dest bi çêkirina wê kirine û sê sal dom kiriye. Di çêkirina dîwarê wê de kevirên bazalt ên birî û buxran bi karanîne. Taybetiya vê hemamê çargoşe ye. Çar eywan û her eywanek çend jûrên wan ên biçûk ku wek serşok hatine bikaranîn, hene.

## Hemama Çardaxî

Weha tê guman ku çêkirina hemama Çardaxî (Çardakli Hamami) û ya hemama Deva di heman salan de ne. Mîmariya wê zêde ne baş û bê plan e. Bi kevirên bazalt û yên adî hatine çêkirin. Li cihê cilgûhertinê du salonên wê hene. Wek hemamên din kumbeta wê jî heye. Taybetiya wê şeş eywan û şeş jûrên wê hene. Eywan du tebeq in. Yên jûran qube kumbet in û yên din rast in.

## Xan

Ji bo ku Amed li Kurdistan û Rojhilata Navîn li ser riya hevrîşim û bazirganiyê bûye û di zemanê berê de bûye navenda kirîn û firotinê. Di heman demê de

Xana Hesen Paşa. →
Foto: Nejat Satıcı

Institut kurde de Paris

bajar navenda berhemdariyê jî bûye. Jî gelek karwanên xwedî bar û barxane, ji Şam, Heleb, Riha, Mereş, Qonya, Trabzon, Musil, Erzorum, Bedlîs, Wan û Tebrîzê hatine û çûne. Di dema xwe de çendîn hejmar xan û hemam hebûne. Li gor Salnameya Diyarbekirê di destpêka salên 1900an de, li Amedê 20 xan hebûne. Mixabin heta niha wek avahî sê xanên mezin ên dîrokî mane. Xana Hesen Paşa, xana Qazanciyan û xana Delîlan.

## Xana Hesen Paşa

Xana Hesen Paşa li hember mizgefta Mezin, li aliyê dinê rê ye. Li ser cadeya Gazî ye. Xan ji aliyê Waliyê Amedê Wezîrzade Hesen Paşa ve di navbera salên 1572-1575an de hatiye çêkirin. Dergehê wê mezin, hesin û bi kember e. Li hewşa wê şadirvaneke şeş stûnî heye. Xan sê tebeq e û ya herî binî cihê hespan, herdu tebeqeyên din jî wek ciyê rûniştin û hotelê hatiye bikaranîn.


Di sala 1612an de gerokê Polonî Sîmeon li xanê maye û di seyahetnameya xwe de nivîsiye ku avahî qaygîr e. 500 hesp dikare li xanê bihewin. Li qada bin erdê du axurên wê yên fireh û hemzeke wê ya mezin hebûne.



Institut kurde de Paris



Xana Delîlan



Ewliya Çelebî jî dibêje: "Xana Hesen Paşa wek keleyeke biçûk e û gelek saxlem hatiye çêkirin." Xan îro ji aliyê şaredariyê û Wezareta Turîzmê ve bûye wek cihekî turîstik. Hewşa wê wek çayxane û pastexane û tebeqên din jî wek resturan tên bikaranîn. Alavên turîstîk lê tên firotin. Sê deriyên wê hene. Yek deriyê mezin e û li ser cadeya Gazî ye, deriyê din jî diçe çarşiya Zêran û yê sêyem jî ji paş ve diçe nav bajêr.

## Xana Delîlan

Li taxa Derê Mêrdînê li ser cadeya Mezin e. Xan di sala 1527an de ji aliyê waliyê Amedê Husrev Paşa ve hatiye çêkirin. Di demên berê de kesên ku diçûna Hîcazê li wê xanê diciviyan. Rêberên ku heciyan dibirin hecê jî li xanê diman; ji ber vê yekê jê re gotine "Xana Delîlan." Xana Delîlan bi tenê ne xan bûye, herweha mizgeft û medreseyekê wê jî hebûye.

Di nav xanê de hewşeke mezin a çargoşe û di nav hewşê de jî şadirwaneke mezin heye. Li her alî ji bo heywanan axur û ji bo rêwiyan jî jûrên razanê hene.

Ji sala 1987an vir ve xana Delîlan wek otel û resturan tê bikaranîn û navê Karwan Saray lê kirine. Niha oteleke turîstîk e.

## Çiftexan

Çiftexan, li başûrê xana Hesen Paşa li hember Mizgefta Mezin, li taxa Dabanoglu ye. Pêşî du xan li kêleka hev bûne, loma Çiftexan gotine. Di sala 1940î rê teng kiriye, beşek jê xera kirine û bi ser rê re berdane. Kes nizane kengê hatiye çêkirin. Tê texmîn kirin ku di sedsala 16an de hatiye çêkirin. Bi kevrên reş hatiye çêkirin. Hewşeke wê ya mezin heye. Demekê wek borsa bi karanîne. Niha tebeqa binê wek depo û dikan tê bikaranîn û ya jorîn xera û vala ye. Di salên 1800î de yek ji xanên mezin yên Amedê bûye.

## Xana Qeyseriyê

Di çend dokumentan de navê vê xanê tê gotin. Di Weqfiya Îskender Paşa de ku di 22ê Cotmeha 1565an de navê vê xanê cara yekem derbas dibe. Tê texmîn kirin ku cihê vê xanê nêzikê mizgefta Îskender Paşa û Hemama Nû bûye. Di Weqfiya sala 1577an de dinivîse ku 12 jûr, avdestxanek, çar dikanên wê hebûne. Kes nizane ka ev xan kengê xera bûye.

## Xana Îbrahîm Paşa

Li taxa Salos bûye ku nêzîkî Hemama Deva bûye.[62] Dîroka çêkirina wê ne diyar e. Di beyana Îbrahîm Paşa de 5ê edara sala 1816an de diyar dike ku xana bazirganiyê bûye. Wek dîroka avakirina wê dîroka xerakirina wê jî kes nizane.

## Xana Îpekê

Ev xan li çarşiya Penbecileran bûye. Çarşiya Penbecileran dikete rojavayê Mizgefta Îskender Paşa. Li gor Weqfiyan, Xana Îpekê malê Hacî Mistefa Çelebî bûye. Di vê xanê de 54 jûr, dikanek û axur hebûne. Tê texmîn kirin ku di destpêka salên 1900î de xera bûye.

## Xana Qazanciyan

Xana Qazanciyan (Suluklu Han), li nav çarşiya Mast û Hesingeran e. Li gor gotinan di sala 1683an de, ji aliyê Mehmûd Çelebiyê Hêneyî û xuşka wî Atîke Xatûn ve hatiye çêkirin. Ji ber ku di kaniya hewşa xanê de ji bo tedawiya hinek nexweşiyan zelû xwedî kirine, jê re gotine xana Suluklu (zêlû, zîro.) Navê wê yê rastî xana Qazanciyan e. Xaneke sê tebeqî û di her tebeqê de 18 jûr hebûne. Tebeqeya binî wek axur bikaranîne. Tê gotin di bin vê xanê de riyeke (tuneleke)

[62] www.varvak.com/diyarbakir-hanlari



Xana Qazanciyan
Salên 1900

hebûye ku tê de çûne Serayê û hatine. Heta ji girtîgeha Serayê mehkûm di vê tunelê de derxistine. Niha xaniyekî yek tebeq e û di van salên dawî de hatiye restorekirin. Wek çayxane tê bikaranîn.

## Xana Titunê

Ev xan li taxa Evdal bûye. Di Weqfiya Îbrahîm Paşa de navê xana Titun derbas dibe ku ji aliyê Îbrahîm Paşa ve hatiye avakirin. Dîroka avakirinê tune, lê tê texmînkirin ku berî salên 1810n hatiye avakirin. Li aliyê rastê heft û aliyê çepê heft jûr hebûne. Du axur, kadin û li aliyê çepê hemam û kulxan hebûne. Niha li cihê wê xanî lêkirine.

## Xana Cedîd

Di Weqifiya Behram Paşa de ku di sibata 1569an de dinivîse Behram Paşa li pişt mizgefta xwe xanekê daye çêkirin. 33 jûrên xanê hebûne. Wek avakirin, dîroka xerabûna vê xanê jî ne diyar e.

## Xana Melek Ehmed Paşa

Melek Ehmed Paşa di sala 1591ê de nêzîkî Derê Romê maleke mezin daye çêkirin. Dîlawer Paşa di dema desthilatdariya xwe de vê malê kiriye xan û wek qişleya leşkeriyê bi kar anîye. Îro kes nizane cihê wê xanê li ku ye.



Institut kurde de Paris



## Xana Rustem Paşa

Rustem Paşa di navbera salên 1539-1542an de waliyê Amedê bûye. Di dema walîtiya xwe de daye çêkirin. Ev xan li herêma Derê Nû li aliyê rastê bûye. Niha cihê wê ne diyar e.

Ji derî van xanan, li Amedê heta niha bi tenê navê 10 xanan hatine tespîtkirin ku ji derî nav û dîroka wan di derheqê wan de tu agahdarî tune. Mirov dikare navên wan weha bi rêz bike: Xana Borekçiyan (1799 nêzîkî Mizgefta Mezin bûye), xana Îsheq (1817), xana Sîpahî (1842), xana Xalid Axa (1842), xana Şewketlû (1723), xana Defterdar (1844), xana Elaca (1676 nêzîkî Derê Nû bûye), xana Îskender (1842), xana Qereqaş (1800 nêzîkî çarşiya Palançiyan bûye), xana Nû, xana Çopê û xana Zincîr (1837 di nav Serayê de bûye).

## Çarşiya Şewitî

Çarşiya Şewitî di navbera mizgefta Mezin, Balikçilarbaşi, Melîkahmed û cadeya Bexdayê ku ji Derê Çiyê diçe Derê Mêrdînê de ye. Jê re Bazara Sîpahiyan jî dibêjin. Li aliyê rojhilatê wê riya Bexdayê xana Hesen Paşa, çarşiya Zêran, çarşiya Dartiraşan,

çarşiya Hesingeran, çarşiya Mastfiroş û çarşiya Masîfiroşan hene. çarşiya Şewitî, çarşiya Amedê ya herî kevn, herî bi lebat, zîndî û ya herî mezin e. Ji ber ku ev çarşi çend car şewitiye, navê çarşiya Şewitî lê kirine. Şewata herî mezin di sala 1115an bûye û mizgefta Mezin jî li gel wê şewitî ye. Şewata duyem di sala 1894, ya sêyem jî di sala 1914an de û ya dawî di sala 1940î de bûye.[63] Ji ber ku kuçeyên bajêr teng bûne gelek xanî, dikan û çarşî şewitîne, bûne rejî û xwelî. Di dema şewatê de çarşiya Şewitî, mizgefta Mezin, bedesteniya Mezin, çarşiya Qesaban, çarşiya Zêran, xana Hesen Paşa, herêma Melik Ahmedê tev şewitîne.

Niha jî hema hema her tişt li çarşiya Şewitî tên firotin. Îro lodên titun û çaya qaçax, bastêx û benî, simaq û toraq, kiras û derpê, şal û saqo, sol û şimik, qumaş û caw, kursî û textêrazan, palgeh, radyo, televîzyon, sarincok û qersok, telefon, manqar û çaydan, şûjin, bijûjin û heta ta û derzî çi bixwazî lê tên firotin.

Ji berê ve cilûbergê û zimanê esnafên çarşiya Şewitî bi kurdî ye. Bi kurdî dipeyivin û bi kurdî diqîrin.

## Bazar û çarşiyên kevn

Ji çarşiyên sergirtî yên ku cehwer, qumaş, zêr û zîv lê tên firotin re bedestenî tê gotin. Li Amedê bedesteniya herî mezin di sedsala 16an de hatiye çêkirin. Ev nêzîkî çarşiya Qesaban a berê bûye. Di şewata sala 1894an de zerareke mezin dîtiye. Piştre hatiye tamîrkirin. Di şewata sala 1914an de ji binî ve şewitiye. Tê gotin ku hewşeke wê ya mezin hebûye û li derdorê hejmarek dikan hebûne.

Gerokên ku di sedsala 16an de hatine Amedê behsa çarşî û bedesteniyên Amedê kirine. Yê ku herî baş navê wan çarşiyan daye yek ji wan Evliya Çelebî ye:

*"Bazara Hesen paşa, Bazara Sîpahî, Bazara Ataran, Bazara Zêran, Çarşiya Ahengeran, Bazara Çîlîngeran, Bazara Cewahîran, Bazara Bezazan..."*

### Çarşiya Zêran

Çarşiya Zêran li nav bajarê kevn li ser cadeya Gazî (Baxdatê) ye. Li kêleka xana Hesen Paşê û li hember Mizgefta Mezin û Çarşiya Şewutî ye. Çarşiyeke sergirtî ye û di navê de gelek dikanên zêran hene. Deriyek wê diçe nav xana Hesen Paşa, yek tê ser cadeya Gazî û yek jî diçe çarşiya Hesinger, çarşiya Mast û çarşiya Dartiraşan. Berê vir çarşiya Hesingeran bûye. Ji ber ku li ser riya herî mezin û li nav bajêr bûye, hesingeran birine, pişt wê li nav bajêr ji rê dûrxistine û cihên wan

[63] Şeyhmus Diken *Diyarbakir Diyarim, Yitirmisim* Yanarım, r. 64.



Çarşiya Zêran
Foto: Nejat Satıcı

kirine çarşiya Zêran. Di hunerê zêr û zêrîngeriyê de Amed li herêmê bi navûdeng e. Ji Bexdayê heta Şam, Heleb û Stanbulê navûdengê têlkar û zêrîngerên Amedê hebûn û hîn jî hene. Pîrê têlkarî û Zêrîngeriyê Ehmed Çelebî bûye ku li ser daxwaza Padîşahê Osmaniyan Mûradê Çarem ji Îmamê Azam re turbe çêkiriye û şandiye Bexdayê. Hîn îro jî navûdengê bazinên Amedê yên taybetî hene.

## Çarşiya Hesingeran

Dema hesinger li cihê çarşiya Zêran bûn, cihê wan ê niha çarşiya Mast bû. Dema cih gûhertin hatin li pişt çarşiya Mast bi cih bûn. Li wir xana Qazanciyan jî heye. Di dema xwe de çarşiyeke gumreh û kêrhatî bû. Piraniya hesingeran Ermenî bûn. Piştî fermana Ermeniyan her ku çû kar kêm bû Ermeniyên ku ji mirinê filitîbûn jî hêdî hêdî ji Amedê bar kirin. Bi pêşketina teknîka çandiniyê jî karê hesingerî kuşt. Berê li vê çarşiyê bivir, das, dasok, mer, melhêb, gîsin, nal û nalbendî, bismar, keskî û gelek aletên din ên çandinî û kar dihatin çêkirin. Ev alav û meslek bi demê re ji navê rabûn. Heta sala 1986an li vê çarşiyê bi tenê Ermeniyek mabû: Minco. Minco jî ji Amedê bar kir û êdî Ermenî li vê çarşiya bav û kalan a dîrokî neman. Niha li çarşiyê 12 dikanên hesingeran mane. Ji wan şeş li ser hesinên sar û şeş li ser hesinên germ kar dikin.

## Çarşiya Genim

Bi xana Hesen Paşayê ve ye. Hewşeke wê ya mezin heye û ser wê bi qubeyan girtî ye. Her aliyên wê bi rewakan in û li pişt wan mexzen û embar hene. Kes dîroka çêkirina çarşiya Genim nizane, lê tê texmîn kirin ku berî sedsala 16an hatiye çêkirin. Niha ne wek çarşiya Genim bi kar tê, lê hîn jî wek çarşî heye.

## Bazara Eşêfçiyan

Bazara Eşêfçiyan di dîroka Amedê de cihekî xwe yê girîng heye. Bi piranî jinên ku di bexçeyên Hewselê de dixebitin an jî ji gundên nêzîkî bajêr mêwe, sebze, hişênayî û giyayên xwe yên şîn sibehê zû tînin bazara Eşêfçiyan. Bazara Eşêfçiyan gelek caran cih guhertiye. Ya herî kevn kes nizane li ku bûye. Heta berî sala 1959an bazara Eşêfçiyan li meydana Kayê bû. Danê sibê gundiyan bi xeraran ka dianî li meydana Kayê difrotin. Bazara Kayê heta nîvro dihat girtin. Piştî nîvro jî vê carê jinên eşêfçî dihatin li wê meydanê sebze, mêwe, hişînahî û giyayên xwe difrotin. Di sala 1959an de dema cadeya Melik Ehmed xera kirin û ji nû ve mezin û fireh çêkirin, Bazara Kayê û ya Eşêfçiyan ket ber û jî cihê wan êdî nema.[64] Ji wê bi şûn ve eşêfçî li nêzîkî Balikçilerbaşi li meydaneke biçûk tiştên xwe firotin. Eşêfçî ji wir jî bar kirin û niha Bazara Eşêfçiyan di navbera cadeya Melîk Ahmed û Bazara Penîrçiyan de li kuçeke teng de ye.

*"Kuro dîno ez çûme*
*Diyarbekira şewitî bi kevirên birî*
*Xelka delal heyîr û mehirê mal û milkê dinê*
*Ez aşiq û maşûqê keçika eşêfçî me*
*Eman lêlê, ez bengî me, ez sewdalî me.."*

Tiştên Bazara Eşêfçiyan hem teze û hem jî erzan in. Ji ber ku jin û keç di bexçeyên Hewselê de di nav bexçeyên xelkê de eşêf dikin, di şûna destmiza xwe de sebze û şînahî digrin û tînin li bazarê difroşin. Ji ber vê yekê navê "Eşêfçî" li wan kirine. Berê li Bazara Eşêfçiyan giyayê şîn û pelên daran jî dihatin firotin. Xelkê nav bajêr li hewşên xwe berx xwedî dikirin. Giya, qalkên petêx û zebeşa dida wan. Di payîzê de serjê dikirin, qeliya zivistanê amede dikirin. Bi her hawî ev bazar giringiya xwe ji bo gelê vê heremê heye. Li ser keçikên eşêfçiyan gelek stran hatine gotin.

[64] Mehmet Mercen, Bilinmiyen Diyarbakir.com

Institut kurde de Paris

# Mizgeft û medrese

## Mizgefta Mezin

Mizgefta Mezin ku bi erebî Camî Kebîr û bi tirkî jî Ulu Camî dibêjin, bi kêmasî bi qasî avakirina bajêr û bedenê xwedî dîrokeke dûr û dirêj e. Di heman demê de şahesereke mezin û nemir e. Mirov dikare bêje ji bo dîroka teolojî jî berhemeke girîng û berbiçav e. Cara yekem ji aliyê Hûriyan ve hatiye avakirin. Navê wê Pîrozgeha Bakireyan a Mezin bûye. Pîrozgeha Bakîreyan niha di bin erdê de ye. Deriyê mizgefta îroyî yê rojava ku jê re dibêjin deriyê Zîncîriyê, mirov di wir re dikare here tebeqa jêrzemînê. Di wir re riyeke bi dizî heye. Li bin hewşa mezin stûnên ji mermer ên mezin û dirêj hene. Li jêrzemînê av gol bûye. Li wir avahiyeke orjinal heye ku jê re dibêjin pîrozgeha Xwedawend a Mezin an jî Bakîre. [65]

Herweha di bin qeytirmeya heman deriyê mizgeftê de Stêrka Sîyon ango stêrka Pêncgoşe heye. Di derbareyê Stêrka Pêncgoşe de Dan Brown weha dinivîse: *"Sembola Stêrka Pêncgoşe gelek kevn e. Dîrok û çîroka wê heta berî mîladî 4000 salan diçe. Bingehê xwe ji parestina suriştê digire. Wateya wê gundiyê ku ji dînê xwe re sadiq e. Çîroka şeytan jî di vir de heye. Di zemanê berê de mirov dinyayê du nîv texmîn dikirin. Nîv jin û nîv mêr. Ango sembola jin û mêr bû. Mêr Xwedê û jin jî Xwedawend bû û herduyan balansa hezbûnê çêdikir û diparast. Dema di navbera jin û jangê (mêr) de balans çedibû aheng û ronahî dihatin dinyayê. Bêbalansî kaûs diafrandin. Stêrka Pêncgoşe Venûsê temsîl dikir. Venûsa ku spehiya Xwedawendan bû. Dînên kevn li gor dezgehê suriştê bû. Xwedawenda Venûs û Stêrka Venûs heman tişt in. Navekî wê yê din Asterte ye. pîrozî û him jî ya sîhîrbaziyê ye."*[66] *Asterte û Stêrk yek in. Xwedawend bi şev li asîman bû û xwediyê erd û asîman bû. Stêrka Pêncgoşe di gelek çandan de xwedî wate ye.*

Tê texmîn kirin ku 1300 sal berî niha ev pîrozgeh dest guhertiye. Cuhiyan ji Hûrî-Mîtaniyan girtine û kirine havra. Dîsa diwarên vê herêmê yên aliyê rojhilat û başûr berhemên Cuhiyan e.

*"Şeb û şekir çûn Diyarbekir,*
*şekir sekinî, şeb behsa xwe kir!"*

Ji van rolyefan yek heye ku gelek balkêş e. Di çarçika wê ya yekem de "Deriyê Zayînê", di çarçika duyem de "Dara Mazî" di çarçika sêyem de "Gustîlk"

[65] Fethi Suvari, *Günlük gazetesi* 16 Şubat 2010 14 sayfa
[66] Dan Brown, *Da Vinci Şifresi*, s.110, 19 basım Altın kitaplar, Istanbul, 2004

Institut kurde de Paris


Institut kurde de Paris



Mızgefta Mezin

û di çarçika çarem de "Diyagrama Pîrozgehê" û di çarçika pêncem de jî "Deriyê Mirinê" heye. Bi zanîna dîrokî dara mazî sembola Kurdan e. Ksenophon di Vegera Deh Hezaran de behsa dara mazî ya Kurdan dike. Û bi latînî ji dara mazî re Cardius dibêjin. Gustîlk jî di mîtolojiya Kurdan temsîliya yekîtiyê dike.

Piştre bajar her ku dest guhertiye, desthilatdaran hem li gor baweriya xwe û hem jî wek avahî guhertine. Her xwediyê olek navê pîrozgeha xwe lê kiriye. Bi dorê re: Pîrozgeha Mezin a Hûriyan, Pîrozgeha Bakîreyan, Pîrozgeha Şemsiyan, Pîrozgeha Jupîteran, kenîşte. Di dema desthilatdariya xirîstiyanan de pîrozgehê veguhestine û kirine dêr. Navê Mar-Toma (Saint- Thoma) lê kirine. Di sala 639an vê carê Amed ketiye destê artêşa Îslamê. Serokê Artêşê Ereban Îyaz pêşî beşek ji dêrê kiriye mizgeft. Û piştre bi temamî veguhestiye mizgeftê. Navê Camî Kebîr lê kirine.

Tê gotin ku di serdema xirîstiyanan de cihê mizgeftê bilind bûye. Di dema xwe de bi 4-5 derencan mirov hildikişiya jor. Lê îro cihê mizgeftê weha ji rûyê erdê nizm e ku mirov bi 10 derencan dadikeve hewşa mizgeftê.[67] Di sala 1115an erdhejeke mezin çêbûye û şewateke dijwar derketiye. Bajar û avahiya wê şewitîne û

[67] Şeyhmus Diken, *Diyarbakır dıyarım, yitirmişem yanarım*, İletişim yayınları, s. 279

Institut kurde de Paris

xera bûne. Hinek dibêjin di heman salê de erdhej jî çêbûye. Piştre mizgeftê ji nû ve tamîr kirine. Stûnên kevn ên ku di erdhejê de ketine û zerar dîtine ji bin axê deranîne û bi wan ji nû ve ava kirine. Loma dema mirov bala xwe dide stûnên ku îro hene; hinek ji wan şikandîne, hinek hatine pîne kirin. Nîvê hinekan reş û nivê hinekan jî spî ne. Di vê mijarê de ya herî balkêş û diyar mîmariya hewşa mizgeftê tevlihev e. Mîmariya wê ya Îslamî ya sedsala 12 an e, lê stûn û qeyntirme karakterên mîmariya Helenî û Romî ye. Weha xûya û diyar dike ku piştî erdhejê alavên kevn bi kar anîne. Û cihê mizgeftê jî li gor derdora wê gelek çal e. Di dema erdhejê de cûm bûye, daketiye. Tê gotin ku di wê demê de li derdora avahiya mizgeftê, bedeneke mezin hebûye di wê bedenê de jî 365 stûn hebûne.

Mizgefta Mezin ji kevirên reş hatiye çêkirin. Ji derî kevirên reş bi qasî 200 stûnên yekpare ku ji kevirên bazalt in, hene. Li ser her stûnê jî kembereke mezin heye. Li hinek cihan li ser kemberên mezin kembereke biçûk jî bi cih kirine. Serê wan bi qûbe ne û bi awayekî hunermendî hatine neqşandin.

Di hewşa mezin de kaniyeke bi çend çirik heye. Ava ku tê kes nizane serçaviya vê avê li ku ye û ji ku tê. Li ser kaniyê şadirwaneke mezin heye.

Wek dîwarê bedenê dîwarê hewşa mizgeftê jî bajar her ku dest guhertiye, desthilatdariyên ku hatine nav, sembol û motifên xwe li ser kolane. Mirov hîn îro jî motîv, rolyef û nivisên Hûrî-Mîtanî, Urartî, Persî, Romî, Sasanî, Emevî, Abbasî, Merwanî, Nisanî, Artûkî, Selçûqî û Osmaniyan dibîne.

Romiyan girîngiyeke mezin dane vê pîrozgehê. Ji ber wê yekê, li hewşa wê 43 stûnên mermer daçikandine.

Deriyê rojhilat ji aliyê der ve du rolyef li hember hev hene ku gaziyê mirov dikin. Du totem li wir hene. Yek jê ya ga ye û ya din jî şêr e. Wek tê zanîn ev herdu sembol sembolên Yekîtiya Hûriyan in ku avakarê bajarê Amedê ne.

Mizgefta Mezin di cîhana Îslamê de ya pêncan e. Avahiya pîrozgeh tê pejrandin. Ji dema ku kirine mizgeft heta niha gelek caran wek avahî jî guhertine. Di sala 1115an de mizgeft bi tevahî şewitîye. Nêzî 200 stûnên kevir û kumbetên kevir zerar dîtine û hilweşiyane. Bi piştre jê erdehejeke mezin çêbûye û zerareke mezin daye mizgeftê.[68] Di sala 1117-1118an de ji nû ve restore kirine û beş zêde kirine. Çar aliyên mizgeftê her yek ji bo mezhebek hatiye avakirin, lê niha du beş hene. Yek ji bo henîfî û ya din jî ji bo şafihiyan e. Di dema Merwaniyan de beşa Şafihiyan lê hatiye zêdekirin.

[68] Orhan Cezmi Tuncer, *Diyarbakır Camileri-Mukarnas, Geometri*, Orantı, S. 38, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür ve Sanat Yayınları-1996

Institut kurde de Paris



Medreseya Zînciriye
Foto: Ji arşiva Şaredariyê

Li hewşa mizgeftê saeta rojê heye. Hinek dibêjin El Cezerî saeta rojê çêkiriye û hinek jî dibêjin na, ji serdema Romiyan ve heye. Li aliyê rojava avahî du tebeq e. Sê deriyê hewşê hene. Deriyê rojhilat derdikeve aliyê cadeya Bexdayê (Gazî), çarşiya Şewitî û xana Hesen Paşa. Deriyê herî mezin ev e. Deriyek li aliyê bakur û yek jî li rojava ye.

## Mesûdiye û Zîncîrîye

Du medreseyên mizgefta Mezin hene. Yek jê Mesûdiye û ya din jî Zînciriye ye. Medereseya Mesûdiye li aliyê bakur e û di korîdora mizgeftê de rê diçe medresê. Ya Zînciriye jî li aliyê rojava li der e. Di dema Eyyûbîyan de Amedê ji bin desthilatdariya Nîsaniyan digrin. Li gor gotinanDi Pirtûkxaneya medrese ya Zînciriye û Mesûdiyê de 1.040.000 pirtûk hebûne. Nîsanî van pirtûkan diyariyî Qadî Fazil kirine. Qadî Fazil ji wan pirtûkan 70 barên hêştiran bar kiriye û şandiye Misirê. Wê demê li Qehîreyê 125.000 pirtûk hebûne. Bi van pirtûkên Amedê û yên Qehîrê bingeha zanîngeha Ezher saz kirine.[69] Medreseya Mesûdiye di dema xwe de li herêma Kurdistanê û Anatoliyê medreseya herî mezin bûye ku bi awayê zanîngehê kar kiriye. Heta hinek kes dibêjin ku zanîngeha yekem bûye. Di dema xwe de li medreseya Mesûdiyê li gel olî, dersên atsro-

[69] Mehmet Yalar, Eyyubilerde İlim ve Ulema, Uluslararası Selahattinė Eyyubi sempozyumu, 1996. S.269. ve Reşat Şeşen, Selahattın Devri Eyyubiler Devleti.s. 267 Mehmet Yalar, Eyyubilerde İlim ve Ulema, Uluslararası Selahattinė Eyyubi sempozyumu, 1996. S.269. ve Reşat Şeşen, Selahattin Devri Eyyubiler Devleti.s. 267

Institut kurde de Paris

nomî, bîyolojî, felsefe, tip, fizîk û metamatîkê jî hatine dayîn.

## Minara Çarling

Mizgefta Qasim Paşa jî dibêjin. Li serê Balikçiyan û li ser riya Dêra Nû ye. Mizgeft yek qubeyî ye. Di sala 1500i de ji aliyê Hesen Xanê Aqqoyûnî ve hatiye çêkirin. Bi kevirên reş û spî yên birî hatiye çêkirin. Minare li ser çar stûnan hatiye avakirin. Di bin de qelas hene. Qelas hinek riziyane. Ger qelas tam birizin dibe ku minare bikeve. Tê gotin ku minare temsîla Îslamê û her çar stûnên wê jî temsîla çar mezheban dikin. Di nav gel de baweriyeke weha heye ku mirov heft caran di nav lingên wê de derbas bibe, daxwazên mirov bi cih tên. Xirîstiyan îdîa dikin ku yekem car ew quleya zengilê dêrê bûye û misilmanan piştre beşa serê wê xera kirine û kirine minare.

## Mizgefta Melek Ehmed

Mizgefta Melek Ehmed li taxa Melek Ehmed ę. Li ser heman cadê di navbera Balikçilerbaşî û Derê Rihayê de ye. Melek Ehmed bi xwe ji Amedê ye, wî di navbera salên 1587-1591ê de çêkiriye. Deriyê Mizgeftê xwedî taybetiyeke balkêş e. Dîwarên hundir bi qasî metreyeke bilind bi çîniyan hatiye



Minara Çarling
Foto: Melike Dara Günal

çêkirin. Minarê ji mizgeftê cuda hatiye çêkirin. Heta nîvê minarê du derence hene û piştre herdu dibin yek. Mirov di van herdu derencan de hevdu nabîne. Çîniya mozaîk bi hunereke destî bi awayekî şerîdî li derdorê hatiye hunandin. Ev huner û şêwe di mizgeftên Amedê yên din de tune ne.

## Mizgefta Safa

Mizgeft li taxa Melek Ahmed Paşa ye. Dikeve bakurê rojhilatê Mizfgefta Melek Ahmed Paşa. Bi qasî 150 metreyî ji Mizgefta Melek Ahmed Paşa dûr e. Mizgefta Parli jî dibêjin. Mizgeft di dema Aqqoyûniyan de hatiye çêkirin. Di sedsala 15an de Hesenê Dirêj li ser daxwaza şêx Cuneytê Kurê şêx Îbrahîmê Safî, mizgeftê daye çêkirin. Şêx Îbrahîmê Safî kalê Şah Îsmaîl bûye.

Institut kurde de Paris



Minara Safa
Foto: Nejat Satıcı



Mizgefta Safa di dema xwe de berhemeke tekane û bêhempa bûye. Bi taybetî çêkirina minareyê hunerê karê destî pir balkêş û hêja ye. Minare ji nebatiyên bîhndarên derdora Amedê hatiye strandin. Ji bo ku rengên wê ji tîrojên rojê zerar nebînin kalanê (qilifê) minarê bi tenê rojên înêyan hatine hilanîn.

## Mizgefta Behram Paşa

Mizgefta Behram Paşa li taxa Suleman Nazîf e. Mizgeft di salên 1546an de ji aliyê Behram Paşa ve hatiye çêkirin. Pênc qubeyî ye. Ne bi tenê mizgeft e, herweha qonax û hemama wê jî hebûne. Ji aliyê mîmarî ve hêja ye. Minareya wê li ser qerqeşûnê hatiye çêkirin. Plana Mîmar Sînan e. Mîmar Sînan berê ve plana xwe li Stanbulê li du ciyan bi kar anîye.

## Mizgefta Hezretî Umer

Li ser kevirekî wê Mescîd-î Şeddat hatiye kolan. Ji ber vê yekê ji mizgeftê re jî Mizgefta Umerê Şaddad dibîjin. Li Derê Mêrdînê li ciyê ku du rê hevdu dibirin, bi bedenê ve çêkirine. Tê texmîn kirin ku di navbera salên 1150-1151ê de ji aliyê Hîbetullah Gurganî ve wek mescît hatiye çêkirin û herweha mîmarê wê ne dîyar e. [70]

## Mizgefta Îskender Paşa

Îskender Paşa 14 salan li Amedê walîtî kiriye. Navê taxeke Amedê jî taxa Îskender Paşa ye. Li heman taxê mizgefteke bi navê Mizgefta Îskender Paşa heye. Mizgeft di sala 1551ê ji aliyê Îskender Paşa ve hatiye çêkirin. Bi ekola Mîmar Sînan e. Şopa mîmariya Osmaniyan di vê mizgeftê de xwe dide diyar kirin. Li pêş mizgeftê şadirwaneke bi hunerî heye. Mizgeft ji pênc beşan pêk tê. Stûn gelek sade ne û bi kemberan bi hev ve girêdane. Minareya wê ji kevir e, şerefeyeke wê heye û gilover e.

## Mizgeft û Medresa Qerqeşûnî

Mizgefta Qreqeşûnî (Kurşunlu) li bakurê rojhilatê bajêr, li başûrê Sereyê ye. Sê navên vê mizgeftê hene: Mizgefta Qurşûnî, Fatîh Paşa û Mizgefta Biyikli Mehmed Paşa. Biyiklî Mehmed Paşa li Kurdistanê mîrêmîraniyê Osmanî yê pêşîn e. Û herweha ev li Amedê mizgefta Osmaniyan a yekem e. Di sala 1516an de mizgeft çêkiriye. Ji ber ku kumbetên wê bi qerqeşûn hatine qab kirin, vî navî lê

[70] Hinek çavkanî dinivîsin ku di dema Înaliyan de hatiye çêkirin.

← Mizgefta Behram Paşa
Foto: Nejat Satıcı

kirine. Ji kevir û malzemeyên cur be cur çêkirine. Qubeya mezin bi qubeyên din ve hatine hunandin û girêdan. Mizgefteke mezin e. Mizgeft, medrese û hemam bi hev re hatine çêkirin. Medrese û hemam xera bûne, lê mizgeft hatiye parastin û îro jî wek mizgeft tê bikaranîn.

## Mizgeft û Medresa Hadim Alî Paşa

Di nav xelkê de bi tenê dibêjin Mizgefta Alî Paşa. Li taxa Alî Paşa nêzîkê bedenê ye. Waliyê Amedê Hadim Alî Paşa di navbera salên 1534-1537an de daye çêkirin. Di sala 1769-70î de ji bo Şafihiyan mescîdeke biçûk çêkirine. Mizgeft bi mîmariya Sînan hatiye çêkirin. Li vê mizgeftê li aliyê ji bo Şafihiyan beşeke biçûk heye. Li ali rojavayê medrese û li aliyê bakur jî cihekî çargoşe heye ku ev cihê zikrê ne. Qubeya wê ji kevirên reş û spî hatiye çêkirin.
Minareya wê li derî xanê, li aliyê bakurê rojhilat hatiye çêkirin, gilover û şerefeyeke wê heye.

## Mizgefta Nebî

Mizgeft li taxa İnonî ye. Di navbera cadeya Bexda û İnonî nêzîkî Derê Çiyê ye. Jê re Mizgefta Pêxember jî dibêjin. Di dema desthilatiya Aqqoyûnan de di sala 1530î de ji aliyê Hecî Huseynê Qesab ve hatiye çêkirin. Ji ber ku di nivîsa li ser dîwarê wê dê 'Kaal en Nebî' heye xelkê navê 'Nebî' an jî Pêxember' lê kiriye. Qubeya mizgeftê ji kevirên reş û spî yên birî hatiye çêkirin. Di sala 1927an de mizgeft zerar dîtiye û di 1955an de minareya mizgeftê ketiye; lê orjînala wê wek xwe li cihê îro hatiye danîn.

## Mizgefta Hezretî Silêman

Mizgeft di nav Serayê de ye. Mizgefta Hezretî Silêman di navbera salên 1155-1169an de ji aliyê Ebul Qasimê Nîsanî ve hatiye avakirin. Hz. Silêman kurê Xalid bîn Welîd e. Di dema destxistina Amedê de, ew û hevalên xwe di Deriyê Fetihê re dikevin nav bajêr û tên kuştin. Wî bi 27 hevalên wî ve li wir vedişêrin. Gora wan li hewşa mizgeftê, li aliyê başûr e. Di dema Osmaniyan de turbeyên wan careke din hatine çêkirin. Dîwarê derveyî mizgeftê du cih sor in. Dibêjin ev xwina wan eshabeyan e. Êvarên pêncşeman jin diçin ziyaretê, dia dikin. Dibêjin jina ku zarok jê re çênebe sê pêncşeman li pey hev here, ziyaretê û dia bike, xêr û xêratan bide, dibe xwedî zarok. Keçên ku negiştine miradê xwe, herin dia bikin, diayên wan qebûl dibin û digehin miradê xwe.

Institut kurde de Paris

Di van salên dawî de vê carê xwendevanê amadeyî û zanîngehan ji bo azmûnê (îmtîhanên) qezenc bikin, diçin dia dikin û sedeqeyan didin. Êvarên pêncşem û înêyan derdor dibe wek mehşerê. Piraniya parsekan jî li derdora mizgeftê ne. Xelkê din jî li derdora mizgeftê maseyan datînin, weke bazareke mezin li ser erebokan tiştan difroşin.



Mizgeft û ziyareta Hz. Silêman



Dêra Mar Petym
û mizgefta Şêx Matar
Foto: Nejat Satıcı

## Dêr û perestgeh

Li gor gelek çavkaniyan berî Îslamê li Amedê 13 û li gor Salnameya Diyarbekirê ya sala 1900î li navenda bajarê Amedê 11 dêr hebûne.[71] Berî Îslamê xelkê navenda Amedê ji aliyê olî ve şemsî (Rojperest an agirperest) û zerdeştî bûne. Şemsîtî berî bawermendiya zerdeştiyê ye, lê herdu bawermendî jî ji heman olê tên. Di wê demê de Kurd û Îranî şemsî û zerdeştî bûne. Piştî ku hinek ji xelkê navendê bûne cihû, wan perestgehên şemsî û zerdeştiyan kirine kenîşte. Dema ku xirîstiyanî hatiye vê carê jî kenîşte veguhestine dêran. Û dema ku Îslamiyet qebûl kirine dêr jî veguhestine mizgeftan. 13 dêrên ku berî Îslamiyetê hebûne, ev in:

### Dêra Meryema Qadîm a Suryanî

Li rojavayê bajarê kevn e. Di navbera mizgeft a Lalebegê û Bazara Şeytan de ye. Dêra Suryaniyan a Qedîm e. Dergeheke wê yê Romî û mîmariya Bîzansî heye. Gelek caran hatiye restore kirin. Di sala 1700an de cara dawî tamîreke mezin dîtiye û heta îro maye. Dêra ortodoks e.

[71] Şevket Beysanoglu, *Diyarbakır tarihi, cilt 1*, sayfa 131

Institut kurde de Paris

## Dêra Mar Petyun

Dêra Mar Petyun Keldanî katolîk e. Dêreke biçûk e. Jê re dêra Nastûrî jî dibêjin. Li kolana Dera Nû ye. Dîroka çêkirina vê dêrê ne dîyar û zelal e. Niha ji aliyê Keldanî yên Katolîk ve tê bikaranîn.

Ev dêr jî wek piraniyana avahiyên li Amedê bi kevirên reş û spê hatiye çêkirin. Bi kevirên spî kemer wek zûlên baklawayê li ser çar beşan hatiye bi cih kirin.

## Surp Giragos

Dêra Surp Gîragos, dêra Ermeniyên ortodoks e. Nêzîkê minareya Çarling li nav taxê ye. Dîroka vê dêra ezîm ne diyar e. Li gor gelek çavkaniyan heta salên 1515-1516an li taxê li cem dêra Surp Teotoras hebûye. Ev dêr bi mizgefata Fatîh Paşa ve bûye. Di navbera salên 1515-1516an ku cara yekem Amed ketiye bin desthilatdariya Osmaniyan, Paşayê Osmaniyan dêra Surp Teotoras veguhestiye û kiriye mizgeft. Lê di heman salan de li goristana Dêra Surp Teotoras dêra Surp Gîragos hatiye çêkirin. Cara yekem gerokê Polonî Simeon di 1610-1615an de behsa Dêra Gîragos kiriye. Du car şewitiye. Şewata duyem di sala

Dêra Surp Gîragos
Foto: Nejat Satıcı





Institut kurde de Paris

1880î de bûye. Carek din hatiye restore kirin û hinek beş lê hatine zêdekirin. Di dema xwe de 3000 kes dikaribûne têde îbadet bikirana. Ji aliyê mîmariyê ve şahesereke mezin e. Heta çend salan berê dewletê vê dêra dîrokî û cihê pîroz kiribû depoya leşkeriyê. Di van salên dawî de, ji bêxweditiyê xera bûbû. Niha ji nû ve restore dikin.

## Dêra Mar Gevergîs

Di nav Kelaya Serayê de ye. Bi jor ve li çemê Dîclê dinêre. Dîroka wê ne dîyar e, lê bi stîla Bîzansî hatiye çêkirin. Kes nizane ji bo kîjan mezhebî bûye. Dêra nasuriyan e. Ji ber ku artêş, edliye û girtîgehê bi salan Serayê ji xwe re kiribûn cihê xebata birêvebiriya dewletê, kes nikaribû ne îbadet û ne jî zîyaret bikira. Niha hem leşkeriye û hem jî edliye ji vir barkirine û valakirine. Dezgehên turîzm, wezareta çandê û şaredarî li gel hev Serayê bi tevahî restore dikin. Dêr niha tê restore kirin.

## Manastira Qirxleran

Li nêzîkî pira Dehderî li serê girê Qirxleran bi heman navî manastireke hebûye. Manastira Qirxleran di sedsala San de ji aliyê Metropolîtê Amedî Mar Yuhanna ve hatiye çêkirin. Niha manastir nema ye, lê cih bi cih qûçên xerabe yên wê xuya dikin.



Dêra Mar Gevergis
Foto: Nejat Satıcı

Institut kurde de Paris

# Koşk û qonax

Berê li Amedê ya kevn du cure koşk hebûne: Koşkên rezan û yên havîngeh. Di demê de her aliyê Amedê rez û bexçe bûne. Di nav rezan de koşk hebûne ku li gelek cihan ji van xaniyên rezan re bûtik, xecîg û kergeh jî dibêjin. Koşkên rezan wek navê li ser e, li nav rezan avahyên du tebeq bûne û pencereyên jî gelek zêde bûne. Niha ne rez û ne jî koşk mane. Yek du ji wan wek nimûne ji nû ve çêkirine û li cihên din diparêzin.

Cureyên duyem koşkên wek havîngeh hatine bikaranîn. Ev curekoşk li başûrê Amedê li derdora çemê Dîclê û piranî jî li nav baxeçeyên Hewselê hatine avakirin. Koşkên arîstokrat û dewlemendên Amediyan bûne. Taybetiya koşkên havîngeh, eywaneke wan ê çargoşe heye û bi piranî berê eywanê ber bi bakur ve ne. Hemzeke biçûk di nav eywanê de heye û av bi misêwa diherike. Ji wir ji bi cuheke biçûk diçe hewza mezin ku li pêş koşkê çêkiriye. Hemza biçûk ji bo hênikbûna eywanê û sarbûna sebze û mêweyan çêkirine. Ya mezin dema ava wê tije dibû pê bexçe av didan. Ji derî avdana bexçe mirov dikare tê de melavaniyê jî bike. Piraniya van havîngehan di dema Merwanî û Artûkiyan de hatine çêkirin. Avasaziya koşkan ne wek a xaniyên bajêr in. Plana hundir girîng negirtine hemû huner û spehibûnê dane ser dîtbariya der ve. Heta niha ev çar koşkên li jêr, bi tenê li ser piyan mane.

## Koşka Seman

Koşka Seman (Şemûn/Gazi Köşkü) li herêma Derê Mêrdînê, li derî bajêr, li aliyê cepêyê çemê Dîclê ye. Ew di navbera goristana Derê Mêrdînê û Pira Dehderî de li milê çepê, di nav bexçan de ye. Li ciyekî bilind e û bexçeyên Hewselê û çemê Dîclê jê ve xuya ne. Koşka Seman di sedsala 15an de, di serdema Aqqoyûniyan de hatiye çêkirin. Mulkiyeta vê koşkê ya Sûryaniyan e û navê wê yê orjînal jî Koşka Şemûn e. Ji Şemûn bûye Seman.

Di sala 1917an de Mustafa Kemal dema bûye fermandarê artêşê û hatiye Farqînê demekê li vê koşkê maye. Di sala 1937ande şaredariya Amedê bi 3.500 lîrayî koşkê kiriye, restore kiriye û navê koşkê "Gazi Koşk" lê kiriye. Ev koşk niha wek muzeyê ye. Di nav hemû koşkên Amedê de koşka herî mezin, spehî û li ciyekî seyrangeh e.

Institut kurde de Paris



Koşka Seman (Gazî)
Foto: Melike Dara Günal

## Koşka Berdepirê

Dîroka avakirina koşka Berdepirê (Erdebîlê) baş ne diyar e, lê tê gotin ji 800 salan bêtir e. Hinek çavkani jî dibêjin koşk xwedî dîrokeke 1500 salan e. Navê koşkê bi kurdî ye û hatiye kurt kirin. Berdepir yanî koşka li ber pirê.[72] Ji xwe koşk li aliyê rojavayê pira Dehderî li qûntarê kaş e û di nav bexçeyeke mezin de ye. Li başûrê Koşka Seman e. Herdu gelek nêzîkî hev in. Di navberan wan de çend bexçe hene. 30 berecot (donim) ereziyê wê heye.. Jê re koşka *Erdebîl* jî dibêjin. Ji ber ku nav bi kurdî ye bi zanebûn gotina Erdebil bi kar anîne ku navê orjînal were ji bîrkirin. Plana vê koşkê jî wek koşkên din e. Niha malê wekfê ye û wek restoran dane bi kirê. Havînan û bi taybetî êvar û şevan cihê bîhnvedan û kêfê ye. Ev koşka

[72] Ber deriyê Pirê, bûye berdepirê. Li ber pira Dehderi ye.

Institut Kurde de Paris


Institut kurde de Paris

dîrokî, seyrangeh û havîngeha spehî bi salan bêxwedî û xera bûbû. Cara yekem di serdema Aqqoyûniyan de koşk hatiye restore kirin. Weqfa Alîkarî, Danasîn û Çanda Amedê di sala 2008an de cara duyem koşkê restore kiriye û ew ji tunebûnê rizgar kiriye.

## Qonaxa Mala Cemîlpaşa

Qonaxa Mala Cemîlpaşa di sala 1887an dest bi avakirinê kirine û salekê paşê qediyaye. Qonaxa Mala Cemîlpaşa ji kevirên reş ên bazalt hatiye çêkirin. Lêbelê ji bo estetîk û xweşikbûnê hinek kevirên spî jî bi kar anîne. Ji bo ku bandora kevirên reş werin şikandin, di navberê de cis û kils jî bi kar anîne. Qonax li gor avahawaya (klîmata) Amedê hatiye çêkirin. Beşek jê wek havîngeh û beşa din jî wek zivistangeh hatiye çêkirin. Wek hemû qonaxên din li vê qonaxê jî selamlix û heramlix hene. Ji selamlixê deriyekî mezin diçe der û yek jî diçe heramlixê. Di quncikan de dar bi kar anîne. Erd Xoresanî ye. Dolap û derî ji darêgûz in. Bexçe û hemzeke mezin hene. Ji bo mêvanan gelek jûr hatine çêkirin. Ji bo hespên mêvanan jî axûr û kadîn hene û ji hev cuda ne. Xaniyekî din li kêleka qonaxê çêkirine ku ev jî ji bo kesên ku di qonaxê de kar û xizmetê dikin, e. Li wir ji bo 40-50 kesan cihên cuda hene. Ji bo perwerdeya zarokan, wezîfedaran, nanpêjan, xizmetkran cihên cuda çêkirine.



Qonaxa mala Cemil Paşa
Foto: Nejat Satıcı

Institut kurde de Paris



Koşkek ji Amedê
Foto: Nejat Satıcı

Institut kurde de Paris

Mala Cemîlpaşa Amedî ne. Malbateke xanedan û paşa ne. Di dema xwe de li herêmê malbateke xwenda, zana û xwedîgotin bûne. Di nav Malbata Cemîlpaşan de kesê naskirî wek Ehmed Cemîlpaşa ku di navbera salên 1837 û 1902an de jiyaye. Cemîlpaşazade di destpêka tevgera netewî de tim wek Mala Bedirxaniyan xwedî hest û helwesta kurd bûne. Osmanî û paşayên Amedê li dij Mala Cemîlpaşazade bûne, ji ber van taybetî û sedeman Cemîlpaşayan şandine surgûnê. Bi taybetî Ekrem Cemîlpaşa ji salen 1912an ve heta mirina xwe di xebatên rewşenbîrî û kurdperweriyê de roleke mezin lîstiye. Li Stanbulê di nav avakirina rêxistina Hêvî de cih girtiye. Di sala 1918an de li Amedê bûye serokê Kurdistan Cemîyetî. Di dema şerê şêx Seîd de çar sal hatiye girtin. Piştre derbasî Sûriyê bûye û li wir heta mirina xwe li surgûnê mane. Ekrem Cemîlpaşa bi Qedrî Cemîlpaşa re rêxistina Hoybûnê ava kirine. Herdu jî li Suriyê çûne ser di-

lovaniya xwe. Di sala 1936an de dewletê ji ber xebatên van herdu Cemîlpaşayan hemû endamên malbatê girtine, kirine trênê û surgûnê Anatoliyê kirine. Malbatê li Anatolyiyê li 17 bajarên cuda belav kirine ku nikaribin bi hevdu re têkilî dayinin. Dewletê dest daya ser qonax, gund û malên wan. Pêşî qonaxa wan kirine depoya leşkeriyê û piştre jî kirine dibistan. Navê Îsmet Paşa li dibistanê kirine. Dibistaneke taybet e, bi tenê zarokên ku bi nexweşiya Trahomî ketine çûne wê dibistanê. Malbata Cemîlpaşa 11 sal paşê ji surgûnê bi paş ve vegeriya Amedê.[73] Dewletê piraniya malê wan bi paş ve nedaye. Tirkên ku ji Trakiyê anîne li hinek gundên wan bi cih kirine. Niha qonax tê restore kirin.

## Koşka Cîhannûma

Koşka Cîhannûma (Koşka Kaws) li qûntara çiyayê Qirxlara bû. Li aliyê ceberê çem bû. Di zemanê berê de çiyayê Qirxlara bi dar û ber û cihê mesireyê bûye. Derdora çiya hemû rez û bexçe bûne. Ji ber ku çemê Dîclê di derdora çiyayê Qirxleran de qewîs dibe, ji koşka Cîhannûman re Koşka Kaws jî gotine. Heta 30-40 sal berî niha jî hin xerabeyên koşkê hebûn. Koşk ji aliyê defînegeran ve hatiye talankirin. Xelkê kevirên wê jî nehiştine û birine. Niha xerabayên wê jî nemane. Cih û zeviyên koşkê pêşî di destê Mala Şêxanan de bûye û piştre derbasî Mala Guranî bûye. Di dawî de zanîngeha Dîclê axa herêmê îstîmlak kiriye.

## Qonaxa Îskender Paşa

Qonaxa Îskender Paşa, li cem Mizgefta Îskender Paşa ye. Li gor agahdariyê Reşîd Îskender Paşa, Îskender Paşa di sala 961 (h) de pêşî mizgeftek li ser navê xwe daye çêkirin.[74] Piştre dest bi çêkirina qonaxê kirine. Qonax bi mîmariyeke taybetî hatiye çêkirin. Haramlix û selamlixa wê hene. Paşa êvaran li selamlixê mêvanên xwe yên taybet qebûl kiriye û heta nîvê şevê di her babetî de, li gel wan sohbet kiriye. Heta damezrandina Komara Tirkiyê jî ev selamlix dom kiriye. Qonax heta niha çend car hatiye restore kirin û niha li ser piyan e.

## Koşka Bekir Efendî

Koşka Bekir Efendî (Kuşdili Köşkü) li nav bexçeyên Hewselê ye. Li aliyê rojhilatê riya Derê Mêrdînê ku diçe Pira Dehderî ye. Koşkeke ne pir kevn e. Li gor nivîsa li ser koşkê, ew di sala 1322ê hîcrî de çêkirine. Li gor salnameya mîladî

[73] Mehmet Mercan, Diyarbakirgrubu.blogspot.com
[74] Reşid İskenderpaşa, *Beylerbeyi Gazi İskender Paşa*. Ankara, 989. S.28

Institut kurde de Paris



Koşkek ji Amedê
Foto: Nejat Satıcı

di 1904an de koşk bi kevirên bazalt hatiye lêkirin û wek xerc jî kils bi kar anîne. Xanî weke tîpa "L" hatiye lê kirin. Li tebeqeya jêrîn cot eywan, metfax û ciyê çayxane jî hene. Ji jûra çay bi pêlikan mirov hildikişe tebeqa jorîn. Di nav eywanê de kanî heye. Ava kaniyê bi selebek ji wir diçe hemza nav bexçe. Ji bo ku havînan eywan hênik bibe sîstemeke weha çêkirine. Li tebeqeya duyem du jûr û avdestxaneyek heye. Li ser wê jî teraseke heye ku di şevên havînê de cihê raketinê ye. Niha bexçeyê koşkê wek rastoran tê bikaranîn.

Institut kurde de Paris

## Koşka Ereb

Koşka Ereb (Agulu) ji Derê Mêrdînê bi qasî 3 km dûr, li milê rastê bi qasî 200 metreyî ji rê dûr û di nav bexçeyên Hewselê de ye. Li qûntara çiyê ye û berê wê bi çemê Dîclê ve ye. Jê re Koşka Agulu jî dibêjin. Mîmarî û taybetiyên wê wek koşkên din in. Koşk du tebeq e. Kembera wê bi kevirên reş û spî hatine çêkirin. Dîwarên din jî bi kevirên bazalt çêkirine. Di nav bexçeyeke mezin de ye. Di eywana koşkê de kaniyeke xwezayî heye. Ava wê pêşî tê hemza eywanê piştre bi cuyeke biçûk diçe hewza mezin a nav bexçe. Rast û çep du tebeqe ye. Li tebeqa jêrin jûrek, xwaringeh (metfax) û kîler hene. Li tebeka jorin jûr û avdestxaneyeke biçûk heye. Niha koşk bêxwedî û vala ye.

# Av û kaniyên kevn

## Kaniya Arbedaş

Dema mirov ji Derê Serayê derkeve û li ser destê çepê vegere li bin dîwarê bedena hundir, li aliyê der kaniyeke heye. Navê vê kaniyê Arbedaş e. Ava wê ji nav Bedena Hundir tê. Di zemanê berê de kaniyeke bi navûdeng bûye. Sê çirikên Arbedaş hebûne. Li ber her çirikek jî cirneke mezin danîne. Ava wê gelek xweş û tenik bûye. Xelkê taxê ji wir bi kûz û elban av birine malên xwe. Yên ku kerên wan hebûne bi tenekeyan dagirtine birine li çayxane, xawarinxane û li meqamên resmî belav kirine. Ji wan kesan re saka digotin. Ava zêde ya ku di cirn û kurnan de diciviyan, jinan li ber hiriyên xwe şûştine, kelepaçe û ser û piyan şûştine û çêkirine. Çermên heywanan jî anîne li wir li keviran xistine û av li wan kirine. Piştre li ser keviran zuwa kirine û koşkaran birine firotine solbendan.

Niha kanî zûwa bûye, cihê çirikên avê lê bûn hin ji şil in û av ji wan diniqute. Bi tenê lewheya ku navê kaniyê divîsîne li ser dîwarê wê heye. Mirov qet bawer nake ku ev kaniyeke weha bi navûdeng bûye.

## Ava Haram

Ava Haram li nêzîkî Derê Romê li herêma Sîmarê bû. Ava kanlîzasyonên bajêr bû û servekirî bû. Ji vê Ava Haram û yên din gelek nexweşî çêdibûn. Di dema şaredariya Mehdî Zana de serê Ava Heram hatiye girtin. Piştre li herêmê avahî hatin çêkirin. Berê ava Haram weha bi navûdeng bûye ku li ser stran jî gotine.

## Ava Anzelê

Anzele (Ayn-î Za'rua) di nav bedenê, di navbera Derê Romê û Xarpêtê de ji bin tehtekî yek parçe bi xûrt û gurr derdiket. Gerokên ku berê hatine Amedê behsa ava Anzelê jî kirine. Di nivîsên xwe de destnîşan kirine ku di wê demê de, li nav bedene sê avên mezin, xurt û gurr hebûne. Yek ji wan Anzele ye û navên yên din negotine. Evliya Çelebî di Seyahatnameya xwe de behsa van hersê avan dike û ji yekê re dibêje gola Masiyan. Wek gola Îbrahîm Xelîl a Rihayê di vê golê de jî bi hezaran masî hebûne, ew pîroz dîtine û dest nadine wan. Di heman demê de ava wê şîfa û ji bo gelek nexweşiyan derman bûye. Nexweşên ku di ava wê de melevanî bikira rehet bûne. Ava van kaniyan bi kanaleke mezin çûye mizgefta Elî Paşa û ji wir jî çûye hemama Derê Mêrdînê. Beşek jê jî bexçeyên taxa Elî Paşa pê

Institut kurde de Paris

hatine avdan. Lê di van sedsalên dawî de herdu jî çikiyane û bi tenê Anzele maye. Dar, ber û bexçeyê ku li bajêr hebûne, bi wê avê avdane. Heta Padîşahê Merwaniya jî dibêje; "Li ber ava wê pênc aş digeriyan. Heta 35-40 sal berî niha jî ev çavî hebû û li ser selexane çêkiribû. Jinan li ser Anzeleyê xalî, xalîçe kinc û hiriyên xwe dişûştin. Ji bo pakiya hawirdorê bûbû talûke. Niha Anzeleya dîrokî êdî nemaye. Li cihê wê beşek jê xanî lêkirine û beşek jî avahiya agirkuja (îtfaîya) şaredariyê heye.

## Ava Hamrewadê

Hamrewad dikeve rojavayê Amedê û 14 km ji navenda Amedê dûr e. Nêzîkê riya Siwêregê ye û dikeve qûntara Qerecdaxê. Di nav tixûbên gundê Gozeliyê de ye. Aveke xweş û sivik e. Sefra û belxemê paqij dike. Tê gotin ku ji ber ava Hamrewadê rengê amediyan sorik e. Bejna amediyan ne dirêj û ne jî kin in, lê bi hêz û dîlbaz in. Zû bi zû nexweş nakevin.[75] Padîşahê Osmaniyan Qanûnî Siltan Silêman di sefera xwe ya Bexdayê de tê Amedê û li wir nexweş dikeve. Çend roj li Amedê dimîne û ava Hamrewatê vedixwe û baş dibe. Qanûnî ferman dide ku vê ava Hamrewadê bînin bajêr. Hinek çavkanî dibêjin di sala 1543an



Ji Anzelê dimeneke kavn

[75] Şeyhmus Diken, *Çiyaye Qerecdagê bêje ez çiya me*, bianet





Institut kurde de Paris

û hinek jî dibêjin na di sala 1535an de ava Hamrewadê anîne Amedê. Ava Hamrewadê di cûyeke (kanaleke) mezin de anîne nav bajêr.[76] Li hinek cihan di ser kemberan de anîne. Ava Hamrewadê kirine gumguman û bi karwanan re şandine Stanbulê ji Îbrahîm Han re jî.

Di sala 1930-1935an de Waliyê Amedê Nîzamedîn kanala avê ya ku dema Qanûnî çêkiribû, digre û vê carê ava Hamrewadê di boriyê hesin de aniye bajêr.[77]

Berê Amediyan av dikirin Xezne û kûzan (ceran). Malbatên dewlemend avê dikirin kûpan moslixên kûpan hebû û taseke zencîrkirî bi kûpê ve girêdida. Malên din jî ava Hamrewadê li mala xwe dikirin kûz û tasê dida devê kûzê.

Bajar her ku çû mezin bû û nifûs zêde bû, di sala 1972an de vê carê ava Gozeliyê bi boriyên beton anîn û li derî bajêr 9000m3 depoyeke mezin çêkirin û ji wir av dan bajêr.

Di salê 1990î de dewletê zor da gundiyan gund û navçeyan valakir. Xelkê barî navenda bajêr kir û bajar mezin bû. Ava bajêr têr nekir. Di sala 2001ê de şaredariyê bi projeyên mezin ava bendava Dîclê di tesîsên nûjen de sefand û bi standardên Ewropî av da bajêr.


Kembera ava Hamrewadê, salên 1900î

[76] *Basri Konyar, Dıyarbekir Yıllıgı Ankara 1936, s. 207, 211-212*
[77] Şevket Beysanoglu, *Anıtları ve Kitabeleri ile Diyarbakır Tarihı - cıld 2, s. 564*

# Bexçeyên Hewselê

Bexçeyên Hewselê li aliyê Derê Mêrdînê ji bin aşan dest pê dike. Di zemanê berê de bexçeyên Hewselê mezin û berfireh bûye. Ji rojhilat ve ji binê Zinarê Fîsê ber û berê çem heta Derê Mêrdînê, pira Dehderî, koşka Seman, Ben û Sen, Şehîtlika îro, Derê Romê û Derê Çiyê berfireh û mezin bûye. Çar aliyên bedenê bexçe û rez bûne. Qada bexçeyên Hewselê îro gelek biçûk bûye. Niha qada bexçeyên Hewselê 317 hektar maye. Bexçeyên Hewselê bi qasî beden û pira Dehderî xwedî dîrok, çîrok, serpêhatî û bi navûdeng e. Qada axa bexçeyên Hewselê berê avrêya (deltaya) çemê Dîclê bûye ku bi hezar salan çem cihê xwe guhertiye, ax û sîlika çem şûna wê dagirtî ye. Loma îro axa bexçeyên Hewselê aluviyon e. Ji bo çandiniyê ya herî bi kêrhatî û bi ber e. Ji jor ve 60-80 cm axa bi ber e.

Hewsel tê wateya darên Mêweyan ên pir û gurr. Bi kurdî ji bexçeyên pir û gurr re hewsel dibêjin.[78]

Berê li bexçeyên Hewselê hem çandinî û hem mêwe û mêwevanî dihat kirin. Bexçeyên Hewselê bi ava kanalîzazyonên bajar dihatin avdan. Ji ber wê jî sebze û hêşinahiyên bexçeyên Hewselê ji bo bijûndariyê bive bûn. Lê ji demê berê ve, li Derê Mêrdînê, li bin birca

[78] Li biniya Licê ji bi navê bexçeyê Hewselan ciyeke heye. Navê newalê ji newala Hewselan e.



Baxçên Hewselê



Institut kurde de Paris

Keçikê çend hemz li pey hev çêkiribûn. Ava kanalîsazyona bajêr dihat hemza pêşî, li wir pingar dibû, disefiya û diçû ya jêrtirê xwe. Li wir jî weha dibû û diçû ya din. Bi vê sîstemê av ji pîsîtiyê dihatin sefadin û piştre diçûn ser aş û bexçeyan. Heta van salên dawî hîn jî aş hebûn.Dihat gotin ku ev sîstem bi qasî bedenê kevn û bi temen bûye. Niha ew hemz nemane û li cihê wan xanî çêkirine.

Li bexçeyên Hewselê her cureyên zebze û hêşînahiyan dihat çandin. Firingî, îsot, balcan bamiye, fesûlye, xiyar, pîvaz, bexdenûs, xes, gulkelem, cureyên pincaran û bi taybetî marolên bi navik. Her roj jinên eşêfçî sebze û mêweyên Hewselê danîn li bazara Eşêfçiyan difrotin. Li bexçeyên Hewselê darên wek gûz, behîv, încas, zerdelî, gilyaz, vîşne û tûwan jî hebûn. Hejmara darên tûwan zêdê bûn. Pelên darên tûwan didan qozeyan û ji qozeyan hevrîşim bi dest dixistin. Amed di dema xwe de bi qutnî, pûşî û hevrîşimê xwe li Rojhilata Navîn bi navûdeng bû.

## Qoze û hevrîşim

Di dema Osmanî de, li herêmên wek Bursa, Xarpêt û Amedê qoze xwedî kirine û ji berhemên wan hevrîşim çêkirine. Di wê demê de, di bexçeyên Hewselê de hejmareke zêde darên tûwan hebûne. Bi taybetî cureyên ku amediyan ji wan re digotin qera hubur. Qera hubur heta van salên dawî jî dianîn li çarşiyê difrotin.

Karê hevrîşim û pûşî li Amedê ji sedsala 16an dest pê kiriye. Lêbelê di sala 1888an de li Bursayê dibistana qoze û hevrîşim ava kirine û ji Almanyayê mamoste anîne Amedê. Di destpêka Komara Tirkiyê de, di sala 1913an de, li Xarpêtê Ermeniyek Darul Harir Mektebi (dibistana qoze xwedîkririn û hevrîşim) vekiriye. Herweha çend sal piştre li Amedê jî heman dibistan hatiye vekirin. Demekê sê karxanê hevrîşim li Amedê hebûne.[79] Karê qoze û hevrîşim di destê Ermeniyan de bûye û piştre misilmanan dest avêtiye vî karî. Kesên ku bi karê qoze û hevrîşim ve mijûl bûne wek malbat vî karî kirine. Mêr, jin û zarok hemû bi hev re kar kirine. Ku misliman an jî Kurdên ku bi karê qoze û hevrîşim ve mijûl bûn ji wan re "Eşêfçî" digotin. Piştî demeke ku dema qoze dihat û dimir, tayên ben ji navê derdixistin û dibirin bi dolaban dirêsan. Ji ber vî karî li bajêr gelek dolaprês hebûne. Loma li ser dolabê gelek stran hatine gotin.

Ji qoze derdixistin û dibirin boyaxê. Boyax jî ji qaşlê dar û nebatiyan çêdikirin. Bazirgan ji bajarên din bazirganiya boyaxê û hevrîşim dikirin. Çend

[79] Zübeyde Kırmızı Amî-i Nur, r. 46.



Institut kurde de Paris

cureyên hevrîşimê çêdikirin. Mantîn, mantînê gulgulî, atlas, qutnî, gezî, canfes, xakî û gelek cureyên din hebûne. Pûşiyên jinan jî ji hevrîşim bû. Li nêzîkî mizgefta Behram Paşa dezgeha pûşiyan hebû ku çêdikirin. Qumaşên hevrîşim li Amed û bajarên din difrotin. Di ser Helep û Stanbulê re difrotin welatên Ewropayê jî.

Niha li bexçeyên Hewselê ne darên tûwan mane û ne jî xwedîkirin û çêkirina hevrîşim. Abdülssettar Hayati Avşar Amîdî yek ji wan kesan e ku ji Dibistana qozexwedîkirin û çêkirina hevrîşimê dîploma girtiye û di dema xwe de pisporê vî karî bûye. Ew di vê mijarê de weha dibêje: *"Di nav van cureyan de giranî li ser karê pûşî bû. Ber û dirêjiya pûşiyan standard bûn. 90,100, 120,140 û 160 cm bûn. Rengên wan jî: sor, spî, tûrabî, almastî, kesk û reş bûn. Ji yên pir reg re jî heftreng digotin. Çend sedemên wendabûna vî pîşeyî hene.*

> *"Vinvina dolabê*
> *Lê kafirbavê*
> *Ez birçî me*
> *Li ber dolabê!"*

*Yek dema Tirkiye qanûna cilûbergan derxist jinan êdî kofî avêtin, şar û pûşî girênedan. Wê demê jinan çarşefa mantîn li xwe dikirin, niha manto derket. Çarşeva mantîn ji holê rabû. Bazar sar bû. Sedemê duyem, li Amedê bi piranî Ermeniyan vî karî dikir. Piştî ferman û koçkirina Ermeniyan ev pîşe li Amedê nema..."*[80]

Ji derveyî van, ji hevrîşim pêştemalên kirşan, çarşavên alavan ên rengîn çêdikirin. Gezî dikirin enterî, heta zilaman jî li xwe dikirin. Xerx hebûn jinan li serê xwe girê didan. Marûke çêdikirin ku qumaşeke bi qelîte bû. Birman hebû pîjameyên mêran jê çêdikirin. Çarşevên şermos, qumaşeke pirqokî bû. Gundiyê herêmên Pasûr û Hezroyê jê secade û xalîçe çêdikirin. Ev kar ji sedsala 16an heta dawiya salên 1960an ji dê û bavan dewrê zarokên xwe kirin.

Di van salên dawî de, ji ber mêş, heşere û nexweşiyan mêwekarî qediya. Niha li Hewselê zêde darên spîndar tên çandin. Dîsa di zemanê berê de piraniya hişinahî û sebzeyên Amedê ji bexçeyên Hewselê dihatin. Zebeş, petêx (qawind), firngî, îsot, balcan, xiyar, kundir, lehane, gulkelem, pîvaz, sîr, îspenax, bexdenûs, pirpar, dêjnik, fasûlye rihan û gelek cureyên din li bexçeyên Hewselê dihatin çandin û dianîn li bajêr difrotin. Ji ber ku bexçeyên Hewselê li ber ava aş û kanalasîzyonan dihatin avdan hişînayî û sebzê êdi nayê kirin.

Bexçeyên Hewselê bi piranî malê kesan e. Lêbelê hinek malê weqf û xezîneyan jî hene. Ji sala 2005an ve proje hatine amadekirin ku ava paqij bînin ser

[80] Hb r. 45,46-47 binêre.

Bexçeyên Hewselê, lê heta îro encameke berbiçav nehatiye bi destxistin.

Di zamanê berê de, di demsalên havînê de xelkê bajêr, ji ber germahiya havînê ji nav bedenê derdiketin derve û diçûn nav bexçeyên Hewselê. Li Hewselê çend bexçeyên bi navûdeng hebûn. Bexçeyê Alî Balî, Kûş Dîlî, Cîn Alî ku Bexçeyê Evdoyê Dimilî bû. Bexçeyê Wehap Axa, Savacak, Gogsi Guzel ûhw... Li bexçeyên Hewselê gelek kanî jî hebûn. Di nav wan de Kaniya Keran û Kaniya Mehkûman navdar bûn.[81]

## Şahî û ahengên li ber çem û bexçeyên Hewselê

Di zamanê berê de bexçeyên Hewselê ne tenê cihê çandiniya sebze û mêwan bûye. Herweha cihê bîhnvedan, şahî û şadiyê jî bûye. Dilistana stran û muzîka coş û rengemeqamî bûye. Stran û muzika çend gel û çend zimanan. Em di vî warî de carek din guh didin Abdülssettar Hayati Avşar Amedî ka çi dîtiye, çi bila ye, çi xwendiye û nivîsiye.

*"Li ber çemê Dîclê li Bexçeyê Bagî, di salê de heft heşt meh bi gotin û enstumentên muzîkê aheg û şahî bû. Ud, tembûr, santûr, qanûn, çartarî, şeştarî, berbûtî, çeng, rebab, muzîkar, nefir, bilûr, beleban, ney û bi enstrumenên din heta berbangê lêdidan. Ziyafet û ahengên muzîkî, li meclisan, hemaman, nav rezan, qonaxan,*

[81] Şeyhmus Diken, Diyarbakir Diyarim. s. 67, hevpeyvina ku bi Musa Tutka re kiriye binêre.



Dicle, Hewsel û Beden



Institut kurde de Paris



Kepir/holikên ber Dîclê

*koşkan, mesîreyan li ber ava çemê Dîclê, li nav bexçe û bostanan pêk dihat. Muzîkjen jin û mêr bûn û carnan heta destê sibê bi çoş û şadîmanî lêdidan û distriyan.*

*Li holik û kepirên devê çem ahengên weha dihatin amadekirin û yên ku didîtin û dibihîstin heyran diman, xwediyên kul û keseran, evîndar û nexweşên bêşîfa mest dibûn. Kul û keserên xwe ji bîr dikirin. Li her derên bexçe û bostanan meşale û find pêdixistin. Di fanosên kaxez û camîn de find pêdixistin û li ser textê taybetî bi cih dikirin û ber didan ser ava çemê Dîclê. Li ser avê di dilerizîn, dipispisîn û diherikîn. Ji aliyekî diçûn aliyekî din. Li ser Dîclê dibûn wek strêrkên asîmanan. Li ser avê bi naz û nazenîn direqisîn. Di rastiya xwe de strana Çayda Çira Yaniyor ne strana xarpêtiyan e, ya amediyan e. Dibûn nûr û nûrenîn. Nexme û ahengên weha li darê dinyayê kêm dihat dîtin. Di şevereşê de ronahî dida û dibû wek şevên Newrozê…"*[82]

Niha li bexçeyên Hewselê ew huner û eserê berê nemane. Bi tenê li aliyê koşka Seman cihê mesîre hene, çayxane û restoran dixebitin. Havînan di demê germ de xelk bi malbatî li nav wan bexçeyan pîknîkê dikin.

Di zemanê berê de ne bi tenê bexçeyên Hewselê herweha herêma Derê Çiyê û bi taybetî herêma Rezan ku îro bi tirkî dibêjin Bağlar li wir jî hemû rez û bexçe bûne û di demê germ de xelkên bajêr li wan deran pîknîk kirine. Niha li wir dar û ber û heşînahî nemane bi tevî ji bêtonê bûye bajarekî yekpare.

[82] Zübeyde Kırmızı, *Amidi-Nur*, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Yayınları. S.131

Institut kurde de Paris

# Çemê Dîcle

## Nav û wateya Dîclê

Di serdema kevn de Ereban ji çemê Dîclê re Dîjla, Faris û Kurdan Tîgra, Rûsan Tîr û Yunanan jî Tîgrîs gotine. Îro jî hemû Ewropî ji çemê Dîclê re, Tîgrîs dibêjin. Koka gotinê yek e, lê her gelî li gor zimanê xwe bi lêv kiriye. Gotina Dîclê xerabkirina Tîgra ye. Lêvkirina "Dîcle"ya îroyîn nêzîkî bilêvkirina erebî ye. Wateya Tîgra, bi tîj û hêz diherike û mezin e. Ji xwe Botî, Cîzîrî, Mêrdînî û heta li hinek deverên Başûr hîn îro jî ji Dîcleyê re dibêjin Ava Mezin an Çemê Mezin.

Du milên Dîclê hene. Serçaviya milekî wê ji çiyayên Master û Sarê tê ku nêzîkî gola Hezarê ye. Ev mil ji Madenê ve tê. Li wir navê wî çemê Madenê ye. Avareş jî dibêjin. Çemê Madenê ber bi Pîranê ve tê û di rojavayê Pîranê de ber bi başûr ve diherike.

Milê Dîclê yê duyem jî, ji herêma Dimbilyan a Licê dize û tê di bin çiyayê Briqleynî de derdikeve. Di serdema Antîk de ji vê tunelê re gotine "Guhê dinyayê." Yanî dawiya cîhanê. Jê re dibêjin çemê Dîbnî. Piştî tunela sirûştî ya Biriqleynê ber bi rojavayê Hênê û rojhilatê Pîranê ve diherike. Herweha çemên Maden û Biriqleynê nêzîkî Bajarê Gêlê dibin yek. Piştre Ava Fûrtaxsê (Devegeçidi) tê ser. Dîcle îro di nav bajarê Amedê de, ber bi Bismilê ve çeng dide. Nêzîkî Bismilê ava çemên Reş û Ambarê tên ser. Piştre ava çemên Mûsiyan, Batman, Xerzan û Botanê tên ser û hîn xurtir û bi hêztir dibe. Di Heskîfê re, ber bi Cizîrê ve diçe û dadikive Başûrê Kurdistanê. Ji Musilê şûn ve ava Zêyê Mezin û Zêyê Biçûk tên ser. Ji Zêyê Biçûk re Avaşîn jî dibêjin. Ji herêmen Lolan, Şemzînan û Geverê jî çemeke têrav tê ser Zêyê Biçûk ku jê re dibêjin Ava Hayatê. Ya herî dawî jî ji Zagros û herêma Îranê ava çemê Diyalê dikeve ser ava çemê Dîclê. Dîcle ji aliyê dirêjbûnê ve çemê Kurdistanê yê duyem e lê piştî ku derbasî Iraqê dibe ji aliyê debiya avê ve çemê Kurdistanê yê herî pirav û mezin e.

*"Berçem berçem diçûme*
*Benîştê xwe dicûme*
*Dayê sûcê min çi ye?*
*Xelk aşiqê min bûye."*

Dîcle ji serî heta dawî 1900 km dirêj e. Di di nav tixûbên Tirkiya îroyîn de dirêjiya Dîclê 523 km ye. Bi tevî, 600 km di nav axa Kurdisanê re derbas dibe. Li başûr bajarê Bexdayê Dîcle û Ferad dibin yek û êdî jê re Yekava Ereb (Şat-ul Arab) dibêjin.

Qada (hewza) Dîclêyê, ji %12 li nav tixûbên Tirkiyê (38.280 km$^2$), %2 Suriye (6380 km$^2$), %54 Îraq (172260 km$^2$), %34 Îran û welatên din e. Bi giştî qada avdaniya Dîclê 319000 km$^2$ ye.

Institut kurde de Paris

## Dîcle di Tewrat û Încîlê de

Di Tewratê de behsa afirandina Adem û bihuştê tê kirin û navê çar çeman derbas dibin. Navê yê sêyem Dîcle ye. Di Tewratê de wiha tê gotin:

*"... Xwedê ber bi rojhilat ve, li Adenê bexçeyek ava kir û Ademê ku afirandibû li wir bi cih kir. Û Xwedê dareke xweşik a mêweyan a çêjdar di nav bexçe de çikand. Ji bo avdana bexçe ji Adenê çemek derket. Ew çem di nav xwe de bû çar çem. Navê yekê Pîşon e; zêrên ku tê de ne li hemû herêma Havîlayê belav dibin. Û zêrên vê herêmê baş in. Li wir zîvên spî û kevirên aqûd jî hene. Navê çemê duyem Gîhon e; hemû çûk li wî welatî ne. Û navê çemê sêyem Dîcle ye; yê ku di ber Aşûr de diherike, ew e. Û çemê çarem jî Ferad e...."* [83]

## Dîcle û mîtolojî

Di derbarê çemê Dîclê de sê mîtolojî hene. Ya yekem: Tê gotin ku Xweda emir daye pêxember Danyal û jê re gotiye ava ku ji şikefta Biriqleynê derdikeve, bi gopala xwe jê re xêzek bikişîne bila di şûna xêzê de biherike û here. Pêxember Danyal emir bi cih aniye û asaya xwe li serçaviya çemê ku ji şikefta Biriqleyê û heta Kendava Îranê diçe, dikşîne. Av di cihê gopalê de diherike û dibe çemê Dîclê. Lêbelê ev xêz weha hatiye kişandin ku dema ava çem zêde û bilind bibe, ji bo ku zerarê nede xelkê xizan ên ku li derdora çem dijîn, av bikaribe ciyê xwe biguhêre. Loma

[83] Tekvin 2: 8-14



Dicle û Beden
Foto: Gültekin Tetik



Institut kurde de Paris



çemê Dîclê tim ciyê xwe diguhere.

Ya duyem: Amedî bawer dikin ku ava Dîclê raste rast diçe bihuştê. Xweda û firîşteyên (melekên) xwe li bihuştê ne. Li ser bingeha vê baweriyê jin û keçên amedî êvara cejna qurbanê li ser kaxez daxwaz û gilînameyên xwe dinivîsin û diçin ser pira Dehderî. Dest bi dueyan dikin û nameyên xwe yên amadekirî di pirê re davêjin jêr. Name bi avê re diçin bihuştê. Nameyên ku bi avê re bi rê dikin, di demeke nêzîk de digihên destê Xweda û daxwaz û dueyên wan qebûl dibin.

Ya sêyem: Li gor vê efsaneyê, Dionysos şikil guhertiye û bûye piling. Dema tê ber çem Nymphayê Asyayî ji Dionysosê dibêje. Divê di çem re derbas bibin. Dionysos ew dike hemêza xwe û di çem re derbas



Institut kurde de Paris

dike. Wê demê laşê wan temas dikin û ew ji Dionysos ducanî dimîne. Piştre ji wan zarokek çêdibe û ji ber Medan navê Medos li zarok dikin. Ew çemê ku Dionysos û Nympha jê derbas bûne re di wateya "piling" de navê Tîgrîs lê dikin.[84]

## Dîcle, şaristanî û çand

Wek tê zanîn berê dîrokê û di destpêka dîrokê de cara yekem li bakur li herêma Subartû, Hûrî-Mîtaniyan şaristanî ava kirine. Li başûrê Mezopotamyayê jî Sumeran, piştre Akad û Babîliyan şaristanî ava kirine. Li derdora çemê Dîclê û şaxên wê û Feradê bajar ava kirine. Wek bajarên Ûr, Ûrûk, Babîlon. Amed, çand, wêje, hûner, teknîk, cot û cebar, çandinî li wir destpêkiriye. Heywan li wir hatiye xwedî kirin. Di vê avakirina şaristanî û çandê de rola çemê Dîclê û Feradê mezin e. Dîcle şaxê jiyana şaristanî û çandê ye.

[84] Ewropî ji cureyê pilingên Kurdistanê re Tigris dibêjin.



Dicle li herêma gundê Entertê

## Dîcle, zebeş û petêx

Zebeş sembola Amedê ye. Li her derê Amedê çandiniya zebeşan tê kirin. Li bajarê Amedê zeviyên ku sebze lê tê çandin bi giştî 25.273 hektar e. Li van zeviyan bi giştî 514.000 ton sebze bi dest dikeve. Ji wê 276.000 ton zebeş in. Bi zanyarî hatiye tespîtkirin ku zebeş ji bo gurçik û îdrarê gelek baş e. Herweha hazmê jî hêsantir dike. Li Amedê li sê cihên cuda çandiniya zebeşan tê kirin:

1. Li zeviyên bejî diçînin. Zebeşên hûr çedibin, lê çêjdar in.
2. Li devê çem û newalan diçînin.
3. Li devê çemê Dîclê diçînin. Zebeşên herî bi navûdeng ên devê çemê Dîclê ne û ji ber vê yekê em ê behsa yên devê çem bikin.

Li cîhanê zebeşên herî mezin û çêjdar, li Amedê li ber çemê Dîclê tên çandin. Di meha nîsanê de ava Dîclê hêdî hêdî diçike, kêm dibe. Li keviyên çem qûm û sîlik dimînin. Ev ax aluvyon e. Di navbera 15-30ê meha nîsanê de, êdî zebeşvanên amedî di nav wê aluvyona çem de dest bi kolana çalikên zebeşan dikin. Çalikên xwe 140-150 cm fireh û 40-60 cm jî kûr dikolin. Armanca kûrayiya çalikan a 40-60 cm ew e ku binê wê bigihe sewiya avê. Di navbera du çalikan de jî 50 cm navber dihêlin.

## Borexane û qoxî

Çend sembolên Amedê hene: Beden, Zebeş, Dûvpişk, Kevok û Şerbeta Sûsê. Li Amedê kevok yek ji bo dema vala û întresê û yek jî ji bo aboriyê ku qoxî berhev bikin û bifroşin. Berê li gelek taxên Amedê li hinek malan kevok xwedî dikirin. Ji kesê ku kevokan xwedî dikin re *"Kevokbaz"* dibêjin. Bi nîv tirkî û nîv kurdi jî dibêjin *"Kûşbaz."* Kesê ku kevokan xwedî dike li ser xanî ji wan re holikên taybet çêdikin. Û rojê çend car kevokên xwe difrinin. Li navenda Amedê gelek cureyên kevokan hebûn. Goştê kevokên Amedê jî bi navûdeng e. Çêja goştê kevokên Amedê heta welatê dereke jî çûye. Tavernier di sala 1680î de hatiye Amedê û di sala 1682an de li ser gera xwe pirtûkeke biçûk nivîsîye. Di wê pirtûka xwe de dinvîse ku "lezeta goştê kevokên Amedê li tu cihî tune[85] Li ser hinek dîwar û bircên Amedê wêneyên kevokan hatine kolan. Kevok hîn 3.000 sal bz ji dema Sumeran ve sembola xweşikîyê bûye. Dîsa li ser kilîm, heqîb, gore, perde, destmal û hdw. motîvên kevokan çêkirine. Şeqşeqên (toqmaqên) deriyên malên Amedê jî di şiklê kevokan de bûne. Li ser kevokan stran jî hene. Wek "*Ez kevok im leylim lê..*" Di heman demê de kevok hem çûkeke pîroz û hem jî xweşik

[85] Şevket Beysanoğlu, Diyarbakırım 1, s.211



Boraxane li Tilelo

e. di wêja kurdî de keçikên dilber û xweşik dişibînin kevokê. Em werin ser mijara kevokên ku ji bo qoxî tên xwedî kirin.

Li gundên derdora çem ji bo kevokan, ji kerpîçan xaniyên bi taybet çêdikin. Ji van xaniyan re borexane dibêjin. Ji ber ku bi kurdî ji kevokên mezin re bore dibêjin, loma ji xaniyên wan re jî borexane dibêjin. Borexaneyên gundên Tilelo û Şerabiyê bi navûdeng in. Di her aliyên borexaneyan de, bi dehan qulik hene ku bore di wan qulan de diçin hundir û derdikevin der. Di hundirê wan borexaneyan de jî lîsên ango ciyên ku bore (kevok) vedinişin text danîne. Kevok di wan borexaneyan de zîrç dikin. Ji zîrçên kevokan re qoxî dibêjin. Ev kevok bi taybetî ji bo qoxî tên xwedî kirin. Di her borexaneyek de salê di navbera 2- 4 tonan de qoxî tê ber hev kirin. Di zamanê berê de ev qoxî bi tenê ji bo zebeşên ber çem dihatin kom kirin; herweha difrotin herêmên din û Rojhilata Navîn jî. Îro borexane hema hema nemane û qoxî jî weha kêm bûye ku êdî bi tenê têra zebeşên ber çemê Amedê nake. Hîn îro jî li gundê Tilelo çend borexane hene. Pêşî dendikên zebeşan li ciyekî din wek bexçe an li malê dikin nav axê û şîn dibin û dibin şitil. Şitlên zebeşan dibin di wan çalên (koncalên) amadekirî yên ber çem de, yek bi yek datînin. Roja diduyan qoxi, qûma hûr û ziblê li navhev dixin û dikin ber şitlan. Cara yekem ji bo her çalekê bi qasî du kîloyan koxî û axa ku li nav hev xistine û kirine wek xerc dikin çalê. Qoxî divê di bin çalê de bigihe avê. Qoxî di avê de zûtir dihele û şitlên zebeşan bi ava wê dimijin. Ji vê qoxiya cara pêşîn re permist dibêjin. Ji bo ku

qoxiyê bi permist davêjin nav konçalê, vî navî lê kirine.

Qoxiya cara duyem 10 roj piştî qoxiya cara yekem tê dayîn. Piştî 10 rojan ava ku gihiştibe koka şitilê divê çikiya be û dakeve jêr. Vê carê qûma der û dorê hêdî hêdî tê kolan, kok û rahên şitilê derdixin der. Cara duyem qoxî dikin ber kokên şitilan. Armanc kok him avê vexwin û him qoxî di nav avê de bihelin û şitil adana xwe bigrin. Av çiqas biçike û berjêr dakeve kok û reh jî hewqas berjêr û kûr diçin.

Bi payîzê re êdî zebeş mezin dibin û digihên. Zebeşên Amedê yên ku li ber çemê Dîclê tên çandin her yek ji 50-60 heta 70 kîlo ye. Di van salên dawî de hem kîloya zebeşên Amedê kêm bûne û hem jî çêja wê xera bûye. Xwedî, di nav zebeşan de kepir çêdikin û bi roj û şev di bin wan kepiran de li zebeşên xwe dinêrin. Gundên ku zebeşên herî baş lê tên çandin ev in: Şahaban, Simaqî, Ferî, Tepe û çendên din in.

Çar cureyên zebeşên Amedê hene:

**Zebeşa spî**, silindirî û dirêj e. Zebeşa ber çem a avî ye. Qalik spî û hundir pembe ye. Mezin e û heta zivistanê dimîne.[86]

**Zebeşa belek** a ber çem û avî ye. Qaşlê wê kesk zûlî ne. Dendikê wê reş û gir in. Zebeşa belek zû nabuhûre, dikare heta serê salê bimîne. 50-60 kîlo heye.

[86] Ji gundê Entertê mamoste Beşir Dogan û xanima wî Pakîze Dogan navên masiyên ku di Dîclê de dijîn, zebeş û petêxên ku li ber çemê Dîclê tên çandin, yek bi yek bi taybetiyên wan ve ji bo me vegotin. Ew bi xwe wek malbatî bi salan di nav vî karî de bûne.



Keçik û zebeş



Institut kurde de Paris

**Zebeşa reş**, reşê vekirî ye. Zebeşa avî ya ber çem e. Mezin e û heta zivistanê dimîne.
**Zebeşa bejik**, navê wê ser e, ev ne avî ye. Biçûk û şîrîn e. Heta zivistanê dimîne. Dendikên wê yên herî mezin û baş in. Li ber çemê Dîclê petêx (qawin) jî tên çandin. Ji wan re dibêjin avî yên ber çem. Çandinî û mêzekirina petêx û zebeşên berçem wek hev in. Ji ber vê yekê em ê behsa çandinî û xwedîkirina petêxan nekin bi tenê cure û taybetiyên wan jî binivîsin.
**Boçxwar** (kulihî), avî ye û dirêj e. Qaşlê wê spî û nava wê li ser zeriyê ye. Şîrîn wek hingiv e. 10-15 kîlo heye. Heta serê salê dimîne.
**Zerik,** zûlî zûlî (xetxetî) ye û zer e. Loma jê re *zerik* dibêjin. Aviya berçem e. Heta zivistanê dimîne. Ben bi pê ve girê didin û bi bin qatî (banî) ve didalqînin, weha heta zivistanê dikare bimîne. 10-12 kîlo heye.
**Azayî,** qaşlê wê bi piranî zer e û xalên heşîn lê hene. Şiklê wê gilover e. Zû çêdibin. Di dawiya meha tebaxê de derdikevin. Temenkin in û dikarin hefteyeke bimînin. Zû dibuhrin û xera dibin. Divê di navbera hefteyek de were xwarin. Her yek jê 10-12 kîlo tê.
**Herbercinî**, wek boçxwaran in. Dereng çêdibin. Pir şîrîn in. Meheke du mehan dimînin. 10-12 kîlo giran in. Li gundê Herbecin û Simaqiyê tên çandin. Navê xwe ji gundê Herbercinê girtiye.
**Havîngeh,** gilover in û ji der ve qaşlê wan kesk in. Bi goşt in. Avî ne. Her yek jê 10-12 kîlo tê. Di hefteyekê de dibuhre û xera dibe.[87]

## Li ser Dîclê hatûçûn û bazirganî

Li ser çemê Dîclê dîroka hatûçûnê (komunîkasyonê) û bazirganiyê gelek kevn e. Heta serdema Sumeran diçe. Li gor arkeolog û lêkolînêran di dema Sumeriyan de, li ser Dîcle û Feradê kelek û qeyîk çêkirine û bi riya avê di nav bajaran de mal birine û anîne. Di navbera bajarên Kîş, Lagaş, Nîpûr, Aşxurê de riya avê bi kar anîne. Di serdema Asûriyan de jî, di navbera Amed, Nînova û bajarên din de li ser Dîclê hatinûçûyîn û bazirganî hebûye. Hîn îro jî li Başûrê Kurdistanê li qeraxê Dîclê xerabeyên bajarên qedîm Nînova û Nemrûdê hene. Di vê mijarê de di dîroka Heskîfê de nivîseke gelek balkêş heye û beşek ji nivîsê weha ye:

*"Ji dûr ve li ser avê qeretûnên reş xuya kirin. Dema nêzîk bûn ku qefleya kelekan e. Gelek kelek li pey hev dihatin. Ji Diyarbekir derketibûn ser avê, mirov nedizanî ka*

---

[87] Ji derî petêxên avî yên ber çem li herêma Amedê petêxên bejik jî hene. Ew jî sê cur in.
1. Hesoçerko, hundirê wê spî ye. Pir şêrîn e. Dendikên wê zer in. 3-4 kîlo tê.
2. Azohiyên bejik jî hene. Pir şirîn in. 3-4 kîlo tên. Bêtir li Tilhemê tên çandin.
3. Sihoyi (Sihêdî), deq lê ne. Rengê hundir wek rengê gizêrê ye. Dendik zer e. 2-3 kîlo tê. Zû dibuhêre.

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Rêwîtiya li ser ava Dîcleyê ji Amedê heta Basrayê



Li ser Dîcleyê kelekên êzingvanan

*ev çend roj in ku li ser avê hatine û niha gehiştine Heskîfê. 52 ta (çewal) genim û ceh li kelekan bar kirine. Dê bibin Mûsilê û ji wir jî bibin Basrayê. Sal 1726 an jî 1727 e. Osmanî bi xanedanên Safawî yên Îranê re di şer de ye. Ji leşkerên herêmê re, bi vê riya avê alîkariya zexîre dişênin.*

*Parezgeha Diyarabekirê ji bo parezgeha Basrayê embara zexîre ye. Û pêdiviyên herêma Basrayê bi riya Dîcle re tên temîn kirin. Kar û barê rê gelek dem digire. Pêşî meşkên kelekan sîpariş dikin. Kelekvanî ji demeke zû ve li vê herêmê tê kirin. Ji bo ku rêwitî ber bi çûyîna avê ve ye, palkêş zêde zehmetî nabînin. Bi tenê dema herikîna îstîkameta çem tê guhertin û dema di bin piran de derbas dibin, palkêş divê hemû hêz û hunerên xwe bi kar bînin. Di Heskîfê re gelek kelekvan derbas dibin. Carnan ji Heskîfê jî kelekên zexîre beşdarî karwanê van kelekan dibin. Helbet ev tiştên ku bi kelekan dibin bi tenê ne zexîre ne. Carek ji bo ku li Bexdayê di îmaretxanên barûtê de bi kar bînin 200 kelek bi darên hevirsan bar kiribûn. Ji bo çêkirina qalibê topan ax, hesin, tel û qele ji Diyarbekir bar dikirin û dibirin Basrayê. Herweha dîsa ji Heskîfê jî çend kelek beşdarî wan bûn..."*[88]

[88] Atlas 70 (Ocak 1999), s. 102-115.

Niha jî li ser Dîcle ji Yekava Ereb heta nêzîkî Bexdayê keştîyên mezin û ji wir jî heta Musilê keştiyên biçûk li ser Dîclê diçin û tên. Heta 30-40 berî niha ji derdora Pîranê êzing li ser kelekan dikirin û êzingvan li ser siwar dibûn çend kesan bi daran kelekê birêve dibirin. Gelek meşk dinepixandin, dar li ser wan girê didan û piştre bi tonan êzing û daran li ser wan kelekan dikirin û ber dida ser avê û danîn Amedê. Piştre ku tekelên erebeyan derketin vê carê di şûna meşkan de tekerlek bi kar anîn. Gelek tekerleken traktor û kamyonan ên kevn bi hev ve girêdidan, bar li wan dikirin û berdida ser avê.

## Dîcle û avedanî

Bi taybetî li Mezopotamya Jêrîn avên Zêyê Mezin û Biçûk û Diyalê digre û asta ava Dîclê zêde dibe. Yek jî Dîcle di herêmeke serberjêr de diherike; ava wê bi hêz e. Di mehên zivistan û biharan de Dîcle har dibe, ji ciyê xwe derdikeve û zerarê dide herêmên derdora xwe. Ango guhdariya Danyal nake. Loma hîn ji serdema Sumeriyan ve jê re li çareseriyê geriya ne. Sumeriyan 3.000 sal bz li

Dicle li herêma Gêlê
Foto: Ahmet Dogru



Institut kurde de Paris

pêşiya çemê Dîclê bend çêkirine. Li gor dîtin û agahdariyên arkeologan di wê serdemê de du wezîfeyê wan bendavan hebûne. Di demsalên zivistan, bihar û payîzan de ji bo ku pêş li rabûna avê û laserê (lehiyê) bigrin bend û dîwarên bilind û mezin çêkirine. Havînan jî zevî û bexçeyên xwe av dane.

## Dîcle û masî

Di demên berê de, di çemê Dîclê de gelek cureyên masiyan hebûn. Piştre her ku ava Dîclê hat qirêj kirin û bi dînamîtan masî hatin kuştin, gelek cureyên wan qediyan an jî kêm bûn ku mirov îro nikare bibîne. Hezar mixabin ku heta niha kesî li ser cureyên masiyên ku di Dîclê de hebûn û hene lêkolîneke zanyarî nekiriye û encamê nenivîsiye. Me hewl da ku li ser cureyên masî yên ku di çemên Dîclê de hene lêkolînekê bikin, em bi rojan lê gerîn, lê mixabin me encameke baş bi dest nexist.

Ji serçaviya Dîclê heta ku Dîcle û Feradê digihên ser hev, bi sed kilo metreyan erdnîgariyeke mezin û dirêj heye. Li gor germ û sermahiyê li bakur û başûrê çemê Dîclê cureyên masiyan jî tên guhertin. Li bakur herêma Amedê av sar e. Masiyên ava sar hene. Li başûrê herêma Musilê av germ e û li gor hewaya wê cureyên masiyan jî tên gûhertin. Li gor zanîna gundiyên navenda Amedê ku ew li derdora çemê Dîclê dijîn û cureyên masiyên Dîclê nas dikin, ev curemasî di ava Dîclê de hene.

**Benî:** Biçûk e û bi qeflan digere. Bi pûl e.

**Berrad:** Zêde ne mezin e. Nava wê reş wek qetranê ye. Masiyeke bêqelîte ye.

**Cer:** Goştê wê wek siringê ye. Di çemê Dîclê de cureyên herî mezin cer û sûre ne. Cer jî wek sûre-7-8 kîlo heye.

**Çirçirik:** Guhên wê tûj in. Dikare destê mirov biçirîne loma jê re dibêjin çirçirik. Masiyeke serîşonik e. Ne mezin, nîv kilo ye.

**Dîb:** Zirav û dirêj e. Wek sûr e. Nîv kilo heye.

**Faran**: Wek goştê berxê ye û goştê masiya faran nerm e. Ji aliyê mezinahî û giraniyê ve ew jî wek siringê 4-5 kîlo ye.

**Kermasî:** Hûr e di nav kevir û qelşan de ye. Rengê wê wek avê ye.

**Marmasî:** Wek navê xwe nîv masî î nîv mar e. Zirav û dirêj e. Goştê marmasiyê ji hinek nexweşiyan re derman e.

**Panik:** Wek nave xwe pan e, lê biçûk e. 100-150 gram heye.

**Rîxok:** Ji xwe nav li ser e. Wek berradê nava wê reş û wek rêx e. Ev jî wek berradê bêqelîte ye. Ji mecbûrî goştê berrad û rîxok tê xwarin.

**Siring:** Goştê siringê spî, sert û çejdar e. Mirov dikare bêje masiya herî baş a çemê Dîclê ye. Giraniya siringê di navbera 4-5 kîloyan de ye.
**Sûre:** Goştê wê sor û sert e. Di navbera 7-8 kîloyan de ye.
**Şebot/ Şabûd:** Bi latînî nave wê tor Grypus e. 20-25 cm dirêj e. Kurd û Îranî vê masiyê ji bo xwarina Newrozê jî çêdikin.
**Zûl:** Biçûk e. Bi qasî 20 cm-35 cm dirêj e. Ji bo ku biçûk e, di wateya perçeyê de jê re zûl dibêjin. Wek zûla zebeşê, zûla betêxê.. Wek hamsiyê derya reş e.
**Zîvîn** (Chalcalburnus mosullensis) e û bi tenê di çemên Dîcle û Feradê de hene. Lêkolînerekî ewropî di sala 1843an de masiya zîvîn tespît kiriye û yek bi yek hejmartine.
**Mezopotamya** (Silurus triostegus) jî bi tenê di çemên Dîcle û Feradê de hene. Loma Navê "masiya Mezopotamyayê" lê kirine.
**Mirwarî** (cyprinidae) jî di çemê Dîclê de curek masî ye. Pûlen wê ji bo ku wek mirwarî (încî) diçirise jê re dibêjin mirwarî. Niha di van salên dawî de cureyên masiya mirwarî di gola Wanê de jî hatine dîtin. Lêkolîner dibêjin ciyên ku çem tên ser ava golê, li delavên wan çeman masiyên mirwarî hene.
**Devmezin** (qspius vorox), ji bo ku çav biçûk û dev mezin e, jê re gotine masiya devmezin. Masiyeke çemên mezin e û ew bi xwe jî mezin e. Mezinên wan 12 kîlo ne û dikarin 20-25 sal bijîn.

Li Bakur piştî çêkirina bendavan, dewletê tov û çêlikên masî yên ziretê (sûnî) avêtin nav ava bendavan. Niha ji 20 cureyî bêtir masî di nav ava bendavên ku li ser çemê Dîclê hatine çêkirin de hene. Di nav cureyên masî yên çêkirî de cureya ku hejmara masiyên wê herî zêde ne masîpank (cyprius carpio) e. Bi tirkî navê aynali sazan lê kirine.

Institut kurde de Paris



Foto: Hanyeh Ghaffari

## Sêlên avî

Sêlên avî li cîhanê bi tenê li çemên Dîcle û Feradê hene. Ewropî jê re dibêjin *Rafetus Euphraticus.* Ango reqê Feradê. Ewropiyan cara pêşî di sala 1802an de li çemê Feradê li ser sêlên avî lêkolîneke biçûk kirine. Jiyan û taybetiya wan nivîsîne. Ji ber vê yekê jî navê Reqên Feradê li wan kirine. Lê heta niha li ser sêlên Dîclê lêkolîneke berbiçav nehatiye kirin. Gundiyên derdora çemê Dîclê ji van cureyên reqên avî yên mezin re *sêlên avî* dêbêjin. Sêl û req ne yek in. Req biçûk in û sêl mezin in. Ji ber ku pan û mezin in ji wan re sêlên avî dibêjin. Sêl û req bi hev re dijîn. Lê komên wan cihê ne. Her cure bi koma xwe re dijî. Niha zanîngeha Dîclê dixwaze di vî warî de lêkolînekê bike. Tê gotin ku sêlên avî yên Ferad û Dîclê jî ne yek in. Sêlên avî yên Dîclê ji niha ve bala lêkolîner û turîstan dikşînin.

Qalikên sêlên avî nerm in û ew wekî malbata *Trionychidae* di ritam û reşikên binê golên çem de dijîn. Sêlên avî li çemê Dîclê li derdora gundên Şahaba, Tilham û Tepê mane. Bi çêkirina bendav û qirêjkirina ava çem re her ku diçe neslên sêlên avî kêm dibin. Ji ber ku nefesa xwe ji hundirê dev û çermê xwe digrin, ew di bin avê de demeke dûr û dirêj dikarin bimînin.

Pozê sêlên avî wek yên fîlan in û carnan di nav avê de bi tenê pozê xwe derdixin der û nefesê digirin. Zivistanan jî ji bin avê dernakevin û xwe di bin ritam û reşika çem de vedişêrin heta biharê. Serê sibê û aliyê êvaran dema tav û germahî be, ji nav avê derdikevin qeraxê avê û xwe didin ber tavê. Hêkên xwe li qerexê avê di nav qûmê de vedişêrîn. Çêlik dema ji qalikê hêkê derdikevin, di cih de dikevin nav avê. Dirêjiya sêlên avî di navbera 50-70 cm de û giraniya wan jî 20-25 kîlo ne. Stuyê wan zû dizivire, dev mezin û çenik pir bi hêz e. Gelek çalak û êrîşkar in. Hey-

Sêlên avî li herêma gundê Tepê ►


Institut kurde de Paris

wanên avê dixwin. Bi taybetî dijminên masî, beq û kurmikan in. Sêlên avî xwedî jiyaneke komjîn in û wek kûsiyên din ji 100 salan bêtir dijîn.

## Dîcle û bendav

GAP, bi tirkî kurtkirina Guneydogû Andolu Bolgesi Projesi (Projeya Herêma Anadoliya Başûrê Rojhilat) e. Projeya ku çend bendav li ser çemên Ferad û Dîclê tên çêkirin. Di salên 1970î de dest bi vê projeyê kirin û di salên 1980î de ev proje hat berfireh kirin. Axa van neh bajaran ketine ber projeya GAPê: Amed, Batman, Dîlok (Antep), Kilîs, Mêrdîn, Semsûr (Adiyeman), Sêrt, Riha û Şirnex. Di proja GAPê de çêkirina 22 bendav, 19 santralên hîdroelektîk ku 1,7 mîlyon hektar zevî dibin avî. Maliyeta wê bi giştî 32 mîlyar dolar hatiye plan kirin. Dema hemû santralên enerjîyê bixebitin, dive bi hêza 7476 MW di sale de 27 mîlyar kilowatt/saet enerjî bi dest bikeve. Piraniya enerjiya ku ji van bendavan bi dest dixin û dibin metropolên Tirkiyê.

Li gor dewletê armanca vê projeyê ji aliyê aborî, civakî û çandî ve ji gelê herêmê re alîkariyê bikin û herêmê bi pêş bixin. Li gor dewletê dema standartên jiyana gelê herêmê baş û bilind bibe, pirsgirêkên civakiyên herêmê jî çareser dibin.

## Bendava keça Qiral

Bendava Keça Qiral ji Amedê 80 km dûr e. Bendava Keça Qiral li ser ava çemê Madenê ye. Ava çemê Madenê di rojavayê Pîranê re tê ser Dîclê. Di sala 1998an de dest bi avakirina bendavê kirin û di sala 2000î de dest bi



Bendava Keça Qiral
Foto: Aşkın Zaman

Institut kurde de Paris



DSI

wergirtina enerjiyê kirin, lê kanal hîn nehatine çêkirin. Armanca vê bendavê destxistina enerjiyê ye. Avadanî di pileya duyem de ye. Li gor plansaziyê dê 650.000 hektar li ber ava Bendava Keça Qiral û Bendava Dîclê werin avdan. Niha 56 hektar tên avdan û armanc 130 hektar e. Bilindiya dîwarê Bendava Keça Qiral 113 metre ye. Baresteya bendavê 1517 $hm^3$ û qada golê 1300 $km^2$ ye. Qada avadaniyê ne diyar e. Hêza enerjiyê 94 mw e û salê 1466 wh berhema enerjiyê dide. Ji %80 ava vexwarina Amedê ji bendava Keça Qiral tê.

## Bendava Dîclê

Bendava Dîclê li bakurê Bendava Keça Qiral li ser çemê Dîclê ciyê ku çemê Dîcle û çemê Dibnê digehin ser hev û nêzîkî qezeya Gêlê ye û ji Amedê 50 km dûr e. Di sala 1986an de dest bi avakirina wê kirine. Dîwar 87 metre ye. Qada golê 2400 $km^2$ û baresteya wê 3.120.000 $m^3$ e. Di salê de 298 mîlyon kwh enerjî dide û 126080 hektar zevî li ber bên avdan. Di 25 cotmeha 1997an de av gol bûye û di dawiya salê de înşeat qediyaye.

Ji sala 2007an ve li ser Bendava Dîclê ferîbot heye. Ev ferîbot ji Qezeya Gêlê di navbera 5 gund û gelek mezreyan de sefer dike.



Bendava Diclê
Foto: Aşkın Zaman

Institut kurde de Paris



## Bendava Fûrtaxşê

Bendava Fûrtaxşê li bakurê Amedê ye û 30 km ji Amedê dûr e. Bendav li ser çemê Fûrtaxşê (Devegeçîdî) hatiye çêkirin. Bendav di navbera salên 1965-1972an de hatiye çêkirin. Bilindiya dîwarê wê 32,80 metre ye. Baresteya wê 202,32 $hm^3$ e û qada avê jî 3214 $km^2$ ye. Li ber 10.600 hektar avdanî tê kirin. Şaredariya Amedê der û dora bendavê kiriye cihê pîknîkê

## Bendava Reşanê

Bendava Reşanê (Göksu) li herêma Çinarê li ser çemê Reş di navbera salên 1987-1991ê de hatiye çêkirin. Baresteya wê 1.632.000 $m^3$ e. 52 metre ji sewiya avê bilintir e. Qada wê 3.90 $km^2$ e. Li ber bendava Ava Reş 3.582 hektar zevî tên avdan.

## Bendava Silîvanê

Bendava Silîvanê li bakurê Silîvanê di navbera Farqîn, Pasûr û Licê de li herêma çiya ye. Li pêş çemên Sarim, Şekiran û Entaxê tê çêkirin. Di 7ê gulana 2008an de îhaleya wê hatiye kirin. Bendava Silîvan bendaveke avadaniyê ye. Bi amadebûna wê re dê deştên Silîvan, Bismil û Amedê bibin avî.

Ji derî van bendavan niha li nêzîkî Kerboranê li ser Dîclê bendava Germavê (Ilisu) û li herêma Cizîrî jî plan kirine ku bendava Cizîrê çêkin. Bi çêkirina bendava Germavê re bajarê dîrokiyê Heskîfê binav dibe, şaristanî û çanda 15.000-20.000 diikeve bin avê.

Institut Kurde de Paris



Pira Dehderi
Foto: Nejat Satıcı

# Pire

## Pira Dehderî

Navê pira kevn a dîrokî ya Amedê Pira Dehderî ye. Ji bo deh çaviyên wê yên avê hene, jê re gotine Pira Dehderî. Pira Dehderî, li derî bajêr, li aliyê başûr, ji Derê Mêrdînê 3 km ji bajêr dûr e. Dirêjiya pirê 180 metre û firehiya wê jî 7,5 metre ye. Pir ji kevirên bazalt ên birî hatiye çekirin. Bi kevirên sêgoşe li hev hatine siwar kirin. Di lengerên pirê de dîwarên taybetî hatine çêkirin. Pir du beş e. Beşa aliyê rojhilat û beşa aliyê rojava. Di nav van herdu beşan de stûneke bi taybetî heye û ev stûn herdu beşan bi hev girê dide. Ji bo şîpa avê bi hêz li aliyê rojavayê pirê dixe, dîwarê vî alî stûr û çaviyên wê firehtir hatine çekirin. Gelek dîrokzan û bi taybetî ji wan dîrokzanan Niebuhr dinivîse ku pira Amedê bi qasî dîroka bajêr kevn e. Lêbelê ev Pira Dehderî ya ku niha hîn jî heye ne ya herî yekem e, ev di dema Merwaniyan de hatiye çêkirin an jî hatiye tamîrkirin.

Institut kurde de Paris

Dîrokzan M. Van Berchem û Albert Gabrîel dinivîsin ku di dema antîk de ev pir hebûye, lê her cara ku hêzên ku dor li bajarê Amedê pêçane û xwestine bajar bigrin, pira ku hebûye xera kirine. Piştre dema ku bi paş ve vekişiyane pir ji nû ve hatiye çekirin an jî hatiye tamîrkirin. Yanî di her şerê ser Amedê de, pira Amedê ji dijmin re bûye hedefa yekem. Wek tê zanîn di sala 974an de çaxa ku împaratorê Bîzansî Juannes Tzîmîsces dor li Amedê pêçabû, pir hilweşandibû. Nivîsa ku di sala 1065an de li ser dîwarê pirê hatiye kolandin û heta îro jî hîn heye û destnîşan dike ku pir ji aliyê Padîşahê Merwaniyan Nîzamûldewle ve hatiye çêkirin, weha ye:

"Ji bo rehmet û xêra Xwedê qezenc bike, emîrê me yê hêja, efendiyê me (...)[89], nîzama dîn, hêzdarê dewletê (...) Îzetê Îslamê (Xwedê emrê wî dirêj bike, serkeftina wî ezîz bike û jê re hîdayet bike(...) ji bo çêkirinê emir daye, dirav serf kiriye. Ev jî (...) di bin berpirsiyariya qadî Ebdul Hesen Evdulvahîd de û ji aliyê westayê dîwaran Sacerê kurê Ubeyd ve di sala 457an de hatiye çêkirin."[90]

Belê, me di beşa Dîcle û mîtolojiyê de jî behs kiribû ku çemê Dîclê ji bo amediyan pîroz e. Xelk bawer dike ku ava Dîclê raste rast diçe bihuştê.

[89] Cihên (....) nivis nehatiye xwendin.
[90] Şevket Beysanoglu, Anıtları ve Kitabeleri ile Diyarbakır Tarihi, s.221, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür ve Sanat Yayınları 2003



Pira Dehderi
Foto: Selim Kaya

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

## Pira Fûrtaxşê

Pir li herêma Xelîlwêran e. Xelîlwêran dikeve bakurê Amedê û li ser riya Amed û Erxeniyê ye. Li ser çemê Fûrtaxşê ye û ji Amedê 20 km dûr e. Dirêjiya pirê 97,93 m û firehiya wê jî 5,00 m ye. Heft derî an jî çaviyên wê hene û ya herî mezin heft metre ye. Ev pir gelek caran hatiye çêkirin û xera kirin. Ya herî dawî li ser kevirên pireyê nivîsiye ku di sala 1218an di dema hukimdarê Artûkiyan Melîk Salih Nasireddîn Mahmûd de hatiye çêkirin. Ji kevirên reş ên Amedê bi awayekî kemberî hatiye çêkirin. Pir di sala 1972an de hatiye restore kirin. Niha şaredariya Amedê li nêzîkî pirê cihê pîknîkê çêkiriye.

## Pira Reş

Pira Reş nêzîkî bajaroka Çinarê li ser çemê Reş (Kara Köpru) ku li ser riya Amed û Mêrdînê ye. Ji Amedê 18 km dûr e. Di sedsala 17an de, di dema Siltan Mûradê Çarem de, bi giştî hatiye tamîrkirin û hinek cihên wê hatine çêkirin. Dirêjiya pirê 73.70 m û firehiya wê jî 5,65 metre ye. Şeş çaviyên wê hene ya herî mezin 8,90 m metre ye. Ji kevirên birî hatiye çêkirin. Kemerên wê gilover in. Ev jî wek pireyên din ji ber şer û laseran gelek caran zerar dîtiye û hatiye restorekirin. Niha xera bûye, lê hinek cihên pirê li ser piyan in. Pireyeke nû di ber re çêkirine. Li ser çemê Reş bendaveke biçûk hatiye çêkirin. Li herêma Textê Silêman gelek şikeft hene. Li dorê dar û bexçe ne. Havînan xelk ji Amed, Çinar û gundên nêzîk ji bo pîknîkê diçin wir.



Pira Reş
Foto: Nejat Satıcı

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

## Pira Farqînê

Ev ji bakurê rojhilatê Amedê li ser Çêmê Dîclê ye. Li ser riya Amed û Farqînê ye û ji ber ve yekê ev nav lê kirine. Ev pire di sala 1975an de hatiye çêkirin.

## Pira Falkultê

Pira Fakultê li bin Qerqezê Fîs ye û diçe zanîngeha Dîclê. Ev di sala 1986an de hatiye çêkirin.

## Pira Kabiyê

Pira Kahbiyê li jêrê Pira Dehderî, li ser çemê Dîclê ye û di sala 2009dan dest pê kirine û di sala 2010an de qedandine. Ji ber ku di ber gundê Kahbiyê de derbas dibe, jê re dibêjin Pira Kahbiyê. Berê ev rê di ser Pira Dehderî de diçû. Ji ber ku Pira Dehderî ya dîrokî ye û rîskeke mezin heye ku xera bibe, ji ber vê sedemê Pira Dehderî ji trafîkê re hatiye girtin û li başûrê wê Pira Kahbiyê çêkirine.

Pira Fûrtaxşê
Foto: Melike Dara Gün



Institut kurde de Paris



Ziyareta Sari Saltûx
Foto: Nejat Satıcı

Institut kurde de Paris

## Ewliya û efsane

### Sari Saltûx

Navê wî yê rastî Elî ye. Ji weliyê Saltûxan e. Li Amedê ji dayik bûye, lê roja ji dayik bûna wî ne diyar e. Bavê Elî li Amedê bi bazirganiyê ve mijûl bûye û miroveki dewlemend bûye. Elî li dikanê alîkariya bavê xwe kiriye. Tê gotin ku rojekê ji rojan Îbrahîm Gulşenî di çarşiyê re derbas bûye. Li ber dikanê çavên wî bi Elî ketiye. Elî dîtiye û bi cezbê ketiye. Piştre çûye Mescîda Reş û bi Îbrahîm Gulşenî re sohbet kiriye û bûye mirûdê wî. Ji wê rojê bi şûn ve, jê re gotine "Elî Efendî." Piştre ku bavê wî dimire, ew dixwaze here Misirê Îbrehîm Gulşenî zîyaret bike. Dema diçe Rihayê dibihîse ku Îbrahîm Gulşenî dê here Stanbulê û ew jî ji Rihayê diçe Stanbulê. Li Stanbulê hevdu dibînin. Gulşenî ji sadikbûna wî, navê Sadiq li navê wî zêde dike. Êdî jê rê dibêjin "Sadiq Elî Efendî." Ew di sala 1553an de, li Amedê diçe ser dilovaniya Xwedê. Wî li ber mescîda Derê Romê defin dikin. Niha jî gora wî ziyaretgeh e.

### Ziyareta Sultan Sûca

Ziyareta Sultan Sûca li herêma Derê Mêrdînê li hember Xana Delîlan e. Li ser riya Gazî û Elî Paşayê ye.



Ziyareta Sultan Sûca
Foto: Nejat Satıcı

## Yunûs pêxember

Di Quranê de gelek caran navê Yunûs pêxember jî derbas dibe. Serpêhatiya wî û masiyê binavûdeng e. Li gor pirtûkên dînî Xwedê Yunûs pêxember piştî Îlyaz wek pêxember dişîne. Qewmê Yunûs ji pûtan re sejde dibûn. Xwedê ew şandiye ku ji pûtan re îbadet nekin û bi yekîtiya Xwedê bawer bikin. Li gor teologan ew bz di sedsala VIIan de li Nînovayê hatiye dinê. Tê bawer kirin ku demeke Hz Yunûs li navenda Amedê li şikefta Qerqezê Fîsê jiyaye. Evliya Çelebî di Seyahatnameya xwe de dinivîse ku ew ji ber xelkê bajarê Mûsilê hatiye Amede û li wir heft sal di şikefta Qerqezê Fîsê de jiyaye.[91]

## Efsaneya Xwedawenda Rojê: Sîn

Tê gotin ku her şev Xwedawenda Rojê Sîn diçe xwe di çemê Feradê de dişo. Piştre tê Amedê, yek bi yek wêneyên li ser deriyan dinêre ka wêneya rojê li ser deriyê wan heye an na. Yên ku li ser deriyê wan wêneya rojê hebe, wan maliyan pîroz dike û piştre diçe ava çemê Dîclê û vedixwe.[92] Di berbanga sibê de diçe pişt çiyayê Amedê yê herî bilind û xwe li wir vedişêre. Li wir li benda tarî û zelametiya şevê dimîne.

[91] Evliya Çelebi, *Diyarbekir -2*, s. 244
[92] Ev efsane ilhama xwe ji ola Zerdeşt digire. Ji ber ku girêdayiya Xwedawenda Sîn bi ola Zerdeşt ve heye.

## Hz. Îlyas

Di Tewratê de ciyekî mezin dane Hz. Îlyas. Herweha di Quranê de jî navê Hz Îlyas derbas dibe. Tê gotin ku Hz Îlyas di dema Qiralê Îsraîl Ahab de (bz 874-853) de jiyaye. Qiral pûtperest bûye û Hz Îlyas li hemberî wî derketiye. Ji aliyê xelkê Amedê ve tê bawer kirin ku ew li Amedê jiya ye. Li navenda Amedê li taxa Hesîrliyê sînagogekê heye û dibêjin li wir gora wî heye. Di heman demê de li Gêlê jî gora Hz Îlyaz heye. Di sala 1848an de cihûyê bi navê Benyamîn di seyahetnameya xwe de dinivîse ku li navenda Amedê hîn 250 malbatên cihû hene.[93]

## Efsaneya Qerecdaxê

Li gor gotinên gotinbêjan li serê Qerecdaxê ejdehayekî reş û mezin hebûye. Agirê ku ji devê wî derketiye her derê şewitandiye. Heta kevirên li çiya şewitaniye û reş kiriye wek tenî. Rojek ji rojan ji asîman zincîrekî xurt û dirêj dadikeve ser Qerecdaxê û dikeve stûyê ejdeha. Ejdeha ber bi asîman ve hilkişe. Piştî hilkişîna ejdeha aramî û xweşî tê herêma Qerecdax û Amedê.

## Efsaneya bedena Amed û Xarpêtê

Tê gotin ku du bira hebûne û herdu jî dîwarbendên navûdeng bûne. Ji wan yekî bedena Amedê û yê din jî kela Xarpêtê çêkiriye. Xercê bedena Amedê bi kirêc û spîka hêkê û ya Xarpêtê jî bi kirêc û şîr strane û çêkirine. Ji ber van taybetî û huneriya herdu birayan heta roja qiyametê bedena Amedê û keleya Xarpêtê êdî xera nabin. Hîn jî herdu bira ji çend salan carek ji gorê radibin û dipirsin. " Hîn bedena Amedê xera nebûye?" Birayê din jî pirsa kela Xarpêtê dike ku heye an na.

## Efsaneya Şeytan

Şeytan ji bo fitne û fesadiyê hatiye Amedê. Xelk berdaye hevdu. Şer, pevçûn, talan, dizî hatiye heta qirikê û amedî perperîşan bûne. Li ku be dê xelk qira hevdu bîne. Wek tê zanîn li nav û derdora bajêr ewliya gelek in. Ewliyayên amedî di nav xwe de civiyane ku ji fesadiya Şeytan re çareseriyekê bibînin û xelkê ji vê aloziyê rizgar bikin. Piştre ewliyayekî Şeytan girtiye ew kiriye şiklê zincîr û biriye li ser Deriyê Kela Hundir (Serayê), li jor li aliyê rastê daliqandiye. Piştî vî karî dîsa wek berê aştî û aramî ketiye nav bajêr.

[93] Ali Melek ve Abdullah Demir, *Dini Değerleri ile Diyarbakır*, sayfa 38, Diyarbakır İl Müftüliği Yayınları-2009

Institut kurde de Paris

# Muze

## Muzeya Arkeolojiyê

Di sala 1934an de, di Medreseya Sincariyê de muzeya pêşîn hatiye vekirin. Di sala 1985an de muze derbasî avahiya nû bûye. Avahiya nû li ser cadeya Xerpêtê ye. Di vê muzeyê de gelek berhemên dîrokî hene. Ji demên kalkolitik û neolîtîk gelek alav di vê muzeyê de cih digrin. Ji serdemên Asûrî, Ûrartû, Helen, Roma, Bîzans, Artûkî, Aqqoyûnî û Osmaniyan gelek berhem di vê mûzeyê de têne parastin.

## Muzeya Çandê

Di sala 1973an de ji aliyê Wezareta Çandî ve mala Helbestvan Cahit Sıtkı Tarancı hatiye kirîn û ev der kirine muze. Ev xanî ji bo xaniyên kevn ên li Amedê nimûneyeke baş û berbiçav e. Helbestvan Cahit Sıtkı Tarancı di vî xaniyî de ji dayik bûye. Di vê muzeyê de alavên taybet yên Tarancı û pirtûkên wî tên raçavkirin.

Institut Kurde de Paris



Muzeya Cahit Sıtkı Tarancı



Muzeya Serayê
Foto: Nejat Sat...

## Muzeya Ziya Gökalp

Ev muze ji xaniyê nivîskarê amedî Ziya Gökalp e. Ev xanî jî bi çêkirina xwe kevneşopiya avahiyên Amedê dide der. Ziya Gökalp di vî xanî de ji dayik bûye û ciwantiya xwe li wir derbas kiriye. Di sala 1956an de xanî kirine muze. Di vê muzeyê de tiştên taybet ên Gökalp wêne, pirtûk û gelek berhemên wî hene.

## Muze û Pirtûkxaneya Ahmet Arif

Muze û pirtûkxaneya Ahmet Arif li nav bajarê kevn nezîkî muzeya Cahit Sıdkı Tarancı ye. Muze di kuçeyeke teng de ye. Ev xaniyê muzê berê qonaxeke bi navûdeng bûye û dîroka avakirina wê 120 sal e. Heta niha Weqfa Huner û Çanda Amedê li vir bû. Wezareta Çandê vê qonaxa dîrokî kirî, restore kir û di meha gula 2011an de wek Muze û Pirtûkxaneya Ahmet Arif vekir. Muze û Pirtûkxaneya Ahmet Arif xwedî hewşeke mezin û şeş jûran e. Jûrek jê pirtûkxaneye ye û di pirtûkxaneyê de 2.236 pirtûk hene. Taybetiya vê muzeyê ji muzeyên din ev e ku di nav wê de pirtûkxaneyek heye.

## Rewşa demografî û civakî

Berî desthilatdariya Osmaniyan di derbareyê rewşa bajêr a etnîkî, olî û civakî de statîstik tune ne. Bi tenê di dema Pers û Romiyan de çend hejmar di dest de hene ku ew jî ne rast in. Ji dema Osmanî ve heta niha jî ji bo navend û parezgeha Amedê tucar statîstîkên zanistî û rastî nehatine çêkirin. Bi zanebûn statîstikên xirîstiyan û misilmanan dane. Ji bo ku hejmara xirîstiyanan kêm nîşan bidin, wan li gor mezhebên wan hejmartine. Misilmanan jî ne li gor etnîkî û bi tenê misilman nivîsîne. Xirîstiyanan perce kirine û li gor mezheb nivîsîne, lêbelê misilmanan li ser hev nivîsîne. Ji bo ku hejmara kurdan ne diyar be û hemû misilmanan tirk hesibandine. Em dixwazin bi kurtî di demên berê de rewşa demografiya nav bajêr destnîşan û diyar bikin.

1518 cara yekem nifûsa bajarê Amedê dîyar dibe. Ji ber nexweşiya kolerayê nifûs ji 2/3 kêm bûye. Lê dîsa jî li navenda bajêr 12.500 kes hebûne. Di sala 1540an de cara duyem hejmara nîşteciyên bajêr hatine hejmartin. Di navbera 22 salan de nifûsa xelkê bajêr %50 zêde bûye.

Di adara 1754an nexweşiya kolera û di sala 1790î de nexweşiya taûn, di meha 11an a sala 1894an de dîsa nexweşiya kolerayê û di sala 1916an bi hezaran kes ji nexweşiyê mirine.

Li gor hejmartina sala 1518an nifûsa navenda Amedê weha ye.[94]

| tax | misilman malbat | ezeb | xirîstiyan malbat | ezeb | cihû malbat | ezeb | giştî malbat | ezeb |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Derê Romê | 990 | 23 | 202 | 16 | - | - | 592 | 39 |
| Derê Mêrdînê | 146 | 32 | 254 | 57 | - | - | 400 | 89 |
| Derê Diclê | 344 | 22 | 554 | 48 | - | - | 398 | 70 |
| Derê Çiyê | 340 | 30 | 55 | 6 | - | - | 395 | 36 |
| Giştî | 1.220 | 107 | 1.065 | 127 | 28 | 3 | 2.285 | 234 |

Li gor hesabê wê demê her malbatekê ji pênc kes hatiye hesibandin û nifûsa bajêr 12.500 bûye.

[94] Orhan Cezmi Tuncer, *Diyarbakır camileri*, s.14 Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi, Kültür ve Sanat Yayınları-1996

Institut kurde de Paris



Ji salên 1900î li Amedê, ji çepê ve jineka kurd a amedî, jineka xirîstiyana amedî (bi çarşef) û jineka kurd a paloyî

Institut kurde de Paris



Ji salên1900î li Amedê ji çepê ve kurdekî amedî, xiristiyanekî amedî û kurdekî paloyî.



Qehwexaneya Nêrgelekêşan, 1909

Li ser navenda Amedê di Salnameyên Diyarbekir de, li gor salan gelek statîstîken nifûsê hene. Di sala 1757an kulî derketine û hemû şînahî, pelên dar û beran xwarine. Xelayeke mezin çêbûye. Bi xelayê re nexwşiyeke mezin û dijwar derketiye. Ji çaran yekê xelkê bajêr mirine.[95] Di statîstîkên sala 1869an de nifûsa navenda Amedê û hejmara xanî, avahî, sazî, cihê kar û herwekî din weha ne:[96]

| Nav | Mêr | Jin | Gişti |
|---|---|---|---|
| Misilman | 4781 | 5033 | 9814 |
| Ermeni | 4005 | 3679 | 7684 |
| Suryani | 841 | 767 | 1608 |
| Keldani | 508 | 468 | 976 |
| Rom | 204 | 156 | 360 |
| Protestan | 318 | 332 | 650 |
| Cihû | 143 | [illegible] | 280 |
| Gişti | 10,800 | 10.572 | 21.372 |

[95] Sestini,1 781-1782 *Seyahatlerde Diyarbekir*. S. 67
[96] *Salnemeya Diyarbekirê* .



Dîmenek
ji Ameda kevn

Dîsa li gor hejmara Salnameya Diyarbekirê ya sala 1869an li navenda bajêr nav û hejmara xanî, koşk, pire, mizgeft, dêr, karxane û cihên din weha hatine nivîsîn:

"Qonaxeke parezgehê û harema wê, qonaxeke hukimetê ya leşkeriyê, 4.229 mal, 1840 dikan, 31 mexaze, 76 ambarên keresteyan, 8 xan, 12 hemam, 34 qehwexane, 28 aş, 8 dingên birincê, 24 dingên savarê, 36 firin, 159 axur, 288 erese, 2 jûrên bekçiyan, du kadîn, 1 gusûlxane, 12 bezirxane, 4 meyxane, 2 selexane, kirêcxaneyek, midmanxaneyek (sendoqa kefaletê), 2 sabûnxane, 2 dîrekxane, mezîlxaneyek, postexaneyek, cisxaneyek, 7 qulix (qereqo) 29 debaxane, 4 jûrên debaxaneyan, xişirxaneyek, atolyeyeke şûşeyan, 2 patrîkxane, yek tîmarxane, demgaxaneyek, 21 boyaxane, islaxaneyek, 6 dezîxane, tahmîsxaneyek muvakitxaneyek, teraziyeke avê, xêretxaneyeke avê, 15 mizgeftên hanefiyan, 4 mizgeftê şafihiyan, 2 erseyên mizgeftan, 30 mescît, 11 tirbe, darul kureyek, 5 tekya, 6 medrese, dibistaneke ruştiyê, 11 dibisatanên îslamî, 3 dibistanên ermeniyan, dibistaneke protesaniyan, dibistaneke roman, dibistaneke romên katolîk, dibistaneke keldanî, dibistaneke suryanî, dibistaneke cıhû (yawîdî), dibistaneke zeptiyan, depoyeke polîsan, depoyeke redîfan (ekseriye), 8 deriyên kelê, 167 mexzenên bircan, 13 dêr, hewreyeke cihûyan, 9 cihê kurm û kêzikan, 11 koşk, 149 zevî, 308 bexçe, 22 bexçeyên spîndaran, 85 golên cemedê, 17 qeşaxane, 24 bostan, 7 rez, atolyayeke sifirê, xaneyeke bacê, 8 goristanên Îslaman, 4 goristanên xirîstiyanan,

goristaneke cihûyan, du îskeleyên êzingan li ber çemê Dîclê hene."

Rast e, Amed mozayîka ol û neteweyên cur be cur bûye. Lê dem dem di navbera gel û oldan de komkujiyên gelek nexweş û mezin çêbûne. Bi taybetî di dema Osmaniyan de, li ser xirîstiyan û cuhiyên ku li navenda Amedê bûne komkujiyên mezin pêk anîne. Yên ku heta niha hatine tespîtkirin ji derî komujî û koçkirina Ermeniyan a sala 1915an, di sala 1895an de li navenda Amedê bûyer derketine di navbera 300-1200î de xirîstiyan hatine kuştin.

Li gor Şemseddîn Samî ku di navbera salên 1889-1898 nivîsiye nifûsa Amedê li derdora 35.000an e. Ji wê 20.000 misilman û 15.000 jî xirîstiyan û cihû ne. Nifûsa Ermeniyan li derdora 8.500î û ya cihûyan li derdora 300î ne.[97] Nivîskar di derheqê bajarê Amedê van agahdariyan jî dide:

Li bajarê Amedê 28 mizgeft, 32 mescît, 9 medrese, amadeyiyeke sivîl û yeka leşkerî, dibistaneke navîn û yeka seretayî, bi qasî 20 dibistanên zarokan (Ev ne zalal e. Gelo dibistan seretayî û yên zarokan ne yek in? -nivîskar), 7 pirtûkxane, 5 tekiye, 11 dêr, 19 dibistanên xirîstiyanan, 19 xan, çarşiyeke mezin a sergirtî, 8 hemam, li nav bajêr li der 130 kanî, herweha di 430 malan de jî kanî hene.

Wek di gelek çavakaniyên nîviskî de diyar dike û kesên ku di van 80-90 salên dawî de bixwe li Amedê jiyane û bi çavên serê xwe dîtine, hejmara cihûyan gelek kem bûye. Ji derî Kurdan tim giraniya Ermenî û Suryaniyan li nav bajêr hebûne. Senet û cihên kar bi girani di destê Ermenî û Suryaniyan de bûye. Karên wek, hesingerî, kevirbirî, sifir û sefarî, zêringerî, dîwarbendî, kulavvanî, dartiraşî kirine.

Kurd, Ermenî, Suryanî, cihû û xirîstiyanên ku li navenda Amedê jiyane û senatkar bûne ji aliyê aborî ve çîna (sınıfa) navîn temsîl kirine. Birêvebirên bajêr çîna dewlemend û serdest bûn. Bi taybetî piştî dagîrkeriya Tirkmen û Tirkan, paşa, karmendên payebilind û desthilatdarên dewletê ji çîna dewlemend bûn. Her paşayek dema hatiye Amedê wek yên pêşengên xwe teqez xanek, kaniyek, hemamek, weqfek, medreseyek an jî mizgefteke li ser navê xwe daye çêkirin. Heta navê taxa ku lê rûdiniştiye navê xwe lê kiriye. Wan desthilatdaran xan, hemam, bexçe û gundan li ser xwe û malbata xwe tapû kirine. Dema tayîna wan derketiye bajarekî din mal û milkên xwe li Amedê hiştine. Heta nîvê malbata xwe li gel xwe nebirine û ew li ser mal û milkên xwe hiştine. Wek malbatên Îskenderzade, Muftuzade Şeref (Uluğ), Yasînzade (Ekinci), Tîgrel, Pirinççîzade û yên din.

Piştî fermana Ermeniyan Pirinççizade Feyzî, Muftuzade Şeref (Uluğ), Yasîn-

[97] Şemseddîn Sami, *Tarihte Ilk Türkçe Ansiklopedi'de Kürdistan ve Kürtler* (M. E. Bozasla'nin çevirisi). s.91

zade Şevkî (Ekinci), Cemilpaşazade Mustafa, Pirinççizade Sıdkı (Tarancı), Suleyman Nazîf, Ziya Gökalp, Zülfi Tigrel û malbatên wan dest dan ser gund û malê Ermeniyan.[98]

Cihû kêm bûne û karê bazirganiye kirine. Di sala 1948an de dema dewleta Îsraîl hatiye avakirin û çend malên ku hebûne jî bar kirine û çûne Îsraîlê.[99]

Li Amedê kêmbûna nifûsê bi çend sedeman ve girêdayî ne. Yek çend caran şewat derketîye. Du, di sala 1803an de Serhildana Abdurrahman Paşa, piştre di 1833an de Mîr Muhamed, di 1840î de Bedirxan Beg, di 1855an de Yezdan Şêr, di 1880î de Şêx Ubeydullah û di sala 1925an de jî serhildana Şêx Seîd pêk hatiye. Di van serhildanan de dewletê polîtîkayeke bi dizî û vekirî rê li ber Kurdan girtiye ku neyên li nav bajêr bi cih bibin. Yên ku berê li nava bajêr jî bûne koçber kirine. Piştî avakirina Komara Tirkiyê li nav bajêr axaftina bi kurdî û li xwekirina cilûbergên kurdî hatine qedexekirin.




Kolana Hunerê
Foto: Nejat S ıtıcı

[98] Malmisanij, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir'de Kürt Ulusçulugu (1900-1920)*. S.46-48
[99] İhsan Biçiçi, *Milliyet Gazetesi 24 mart 2004 çarşamba*



Baxçê şaredariya kevn, 1937

# Şaredarî

Şaredariya Amedê di dema Osmaniyan de, di sala 1865an de bi navê '*Şehremanetî Diyarbekir*' hatiye avakirin. Di Salnamaya Diyarbekirê de (1882) Şehremînê Diyarbekirê Abdûllatîf Efendî ye. Cigirê şehremînê jî Osîb Efendî yê Ermenî ye. Di heman demê de Karabet û Migirdîç Efendiyan jî azayên meclisa şaredariyê û Bijîşk Bedros Efendî jî bijîşkê sereke ye.

Di sala 1880an de, li Ameda kevn, li nav kelê (bedenê) li aliyê rojhilat û rojava ve du şehremîn hebûne. Ji Derê Mêrdînê heta Derê Çiyê rojhilatê cadeya Bexdayê xirîstiyan, rojavayê cadeya Bexdayê jî şaredarê wê misilman bûye. Li rojhilat cigir misilman e û li rojava jî cîhgir xirîstiyan e.[100]

Di sala 1922an de ji aliyê hukimeta Enqerê ve qanûneke tê derxistin, li gor vê qanûnê li hemû bajaran şaredarî tên avakirin. Di sala 1984an de cara yekem li bajarên Stanbul, Enqere û Îzmîrê sîstema şaredariyên bajarên mezin tên avakirin.

Di 28.12.1993an de hukimetê biryarnameyeke sîstema şaredariyê Amedê jî guhert. Amed jî wek Stanbul, Enqere, İzmîr û bajarên mezin ên din ket nav sîstema şaredariya bajarê mezin.

Di navbera salên 1994-2004 mezinbûna qada şaredariyê 26 hezar hektar berfireh bû. Di sala 2004an de bi qanûna 5216 qada şaredariyê berfirehtir bû û 110 hezar hektarî derbas kir. Ji vê rojê bi şûn ve, li navenda Amedê Şaredariya Ba-

[100] www.diyarbakir.bel.tr/documentviewer.aspx?id=25

jarê Mezin, Şaredariya Surê (Bajarê kevn), Şaredariya Rezan (Bağlaran), Şaredariya Bajarê Nû (Yenî Şehirê) Şaredariya Peyasê (Kayapinarê) hatin damezrandin. Her çar şaredarî jî li ser Şaredariya Bajarê Mezin in. 82 tax bi şaredariyê ve hate girêdan. Piştî sala 1922an şehremanetî dema dibe şaredarî, ji wê demê heta niha navê şaredarên Amedê yên ku hatine tespîtkirin ev in:

**1922-1925 Mantinci Hüseyin Efendî**

**Şeref Uluğ** (wekîl) di sala 1892an de li Amedê ji dayik bûye. Navê wî Abdûrrahman Muftuzade Şeref Uluğ e. Di navbera salên 1923-1927an de sê car bûye parlamenter. Du car li ser navê Rihayê û cara dawî jî li ser navê Amedê bûye parlamenter. Di navbera salên 1933-39an de bûye şaredar. Di qirkirina Ermeniyan a li herêma Amedê de rola wî jî hebûye.[101] Ew di sala 1976an de miriye.

**Nazim Önen** (Seyfûllah Nazim Önen) di sala 1887an de li Amedê hatiye dinê. Du dewre di navbera salên 1939-1944an de bûye şaredar. Di partiya DP de hatiye hilbijartin û bûye parlamenter. Di navbera salên 1946-1950î de bûye parlamenterê Amedê. Demekê çûye MP û piştre serbixwe maye. Ew di sala 1967an de miriye.

[101] Malmisanij, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir´de Kürt Ulusçulugu* (1900-1920). S.46-48



Avaluya Şaredarıya Mezın


T.C.
DİYARBAKIR
BÜYÜKŞEHİR BELEDİYESİ



Institut kurde de Paris



Mêvanxana Şaredariyê

Institut kurde de Paris

**Ömer Adil Tigrel** li Amedê hatiye dinê. Xwendina wî ne diyar e, lê Mustafa Kemal di navbera salên 1916-1917an de dema li Amedê û Farqînê fermandarî kiriye, di notên xwe de nivîsiye ku "Adil Tîgrel qeymeqam bûye û dostekî wî yê herî baş bûye.[102] Di Qetlîama Ermeniyan malbata Tîgrel, Pirinççioğlu, Suleyman Nazîf û Ziya Gökalp roleke mezin lîstine. Hatiye îdea kirin ku Ermenî dane kuştin û dest dane ser malên wan. Bi daxwaza İngilîzan padîşah wan surgûnê Maltayê kirine. Çend sal paşê dema Komara Tirkiyê tê avakirin Mustafa Kemal paye dide wan. Hinek kiriye parlamenter, hinek walî, hinek qaymeqam û hinek jî şaredar. Di navbera salaên 1935-1949an de bûye şaredar. Adil Tîgrel mirovê Suleyman Nazîfê ê herî nêzîk e. Suleyman Nazîf di meqaleya xwe ya *Gene İran-i Viran* de dinvîse ku: "Ez ne Kurd im, Tirk û Tirkmen im. Ez ji neslê Aqqoyûnûyan im. Ji Eşîreta Hindi Baba me."[103]

## 1940-1945 Abdulkadir Cizrelioğlu

**Vehbi Dabakoğlu** di navebra1945-46an de wekîltiya serokê şaredariyê kiriye. Cûnta Kenan Evren di sala

[102] Ş. Beysanoglu, *Mustafa Kemal Atatürk'ün Diyarbakır'daki Kafkas Cephesi Komutanlıgı*, www.maxihayat.net/maxiforum/ataturkun-hayati

[103] Mehmet Mercan, 27 Agustos 2010, bilinmiyendiyarbakir.com

1981ê de bi navê Danişma Meclîsî (Meclîsa Şêwrê), mecliseke ji leşker û dosten leşkeran damezrand. Vehbi Dabakoğlu jî wek nûner an jî parlamenterê Amedê hilbijartin û birin meclîsa cûntayê.

**Nuri Onur** (Mehmet Nurî Onur) di sala 1909an de li Amedê hatiye dinê. Di navbera salên 1950-57an de bûye şaredarê Amedê. Di lîsteya DP de hatiye hilbijartin û di Parlamentoya Tirkiyê ya yazdehem de di navbera salên 1957-1960an bûye parlamenterê Amedê. Di sala 1983an de miriye.

**Adil Tekin** (wekîl) di sala 1910an de li Pasûrê hatiye dinê. Pîşeyê wî wênekêşî ye. Bi navê Foto Dîcle studiyeke wî hebû. Wêneyên Amed û herêmê ya wê demê hema hema hemû berhemên wî ne. Di navbera salên 1952-1954an de bûye wekîlê şaredarê Amedê.

**1956-1958 Sezayi Demiray** (wekîl)
**1959-1960 Îhsan Koçak**
**1962-1963 Namik Kemal Şenturk** (walî û serok)

**Felat Cemiloğlu** Dema ku Namik Kemal Şentürk walî bûye 8 meh (1963) wekîltî kiriye). Felat Cemiloğlu di sala 1928an de li Amedê ji dayik bûye. Bi malbatî di sala 1937an de ew şandine surgûnê. Li Stanbulê Bazirganî û aboriyê xwendiye. Demeke serokatiya Oda Bazirganî ya Amedê kiriye. Di 12 îlonê hatiye girtin û êşkenceyên nedîtî lê hatine kirin.

1963-1973 Nejat Cemiloğlu
1973-1977 Okay Kalfagil

**Mehdi Zana** di sala 1940î de li Farqînê hatiye dinê. Li Farqînê dibistana seretayî xwendiye û dest bi terzîtiyê kiriye. Di sala 1963an de bûye endamê TIP (Partiya Karkerên Tirkiyê). Piştre ji TIPê dest berdaye û bi hinek kesên din re Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK) ava kirine. Gelek caran hatiye girtin. Di sala 1978an de serbixwe bûye Namzetê serokatiya şaredariya bajarê Amedê û bi serketiye. Heta sala 1980î wek şaredar kar kiriye. Bi hatina cûnyata leşkeriya 12ê îlonê hatiye girtin û di girtîgeha Amedê de maye. Li girtîgeha Amedê êşkence û lêdanên herî giran dîtiye. Mehdî Zana yek ji berxwedêrên zîndana Amedê ye. Bi giştî 16

sal di zîndanê de maye. Piştî derketina ji zîndana Amedê de(1991) derketiye. Di dawî de hatiye li Swêdê bi cih bûye. Di sala 2004an de carek din vegeriyaye Amedê. Di demeke kurt de ji ber xebat û ramanên xwe carek din ceza lê birîne. Ew neçar maye û dîsa vegeriye Swêdê.

**1980-1981 Albay Feyyaz Uzumcu** (wekîl-12 îlon 1980)
**1981-1984 Muhsin Akar** (cîgirê walî)

**Nurettin Dilek** di sala 1952an de li Zinicirnikê hatiye dinê. Muhendisê Ziraetê bûye. Di navbera salên 1984-87an de bûye şaredarê Amedê. Di lîsteya ANAPê de hatiye hilbijartin. Di navbera salên 1987-1991an bûye parlamenterê Amedê.



Avahiya Şaredariya Sûrê
Foto: Melike Dara Günal

Institut kurde de Paris

**1987-1989 Mehmet Baydur** (pêşî wekîl û piştre jî esil)

**Turgut Atalay** di sala 1949an de li Licê hatiye dinê. Ji dibistan seretayî heta amadeyiyê li Amedê xwendiye. Di sala 1970î de zanîngeha Enqerê Akademiya Bazirganiyê qedandiye. Di sala 1980 li Fransê staj kiriye. Di sala 1982an de wek muşawîr li Qibrîsê kar kiriye. Di sala 1989an de li Amedê bûye şaredar.

**Ahmet Bilgin** li Amedê hatiye dine. Ji fakulteya huqûqê mezûn e. Di gelek zanîngehan de mamosteti kiriye û hîn dike. Bi gelek zimanan dizane. Di beşa Huqûqa Osmanî û Îslamê de prof e. Di navbera salên 1994-1999an de bûye şaredarê Amedê.

Di hilbijartina şaredariyan a sala 1999an de, Kurd cara yekem bi rêxistinî beşdarî hilbijartinên şaredariyên Amedê de bûn. Ligel hemû asteng, çewsandin, tirsfirandin, xûgî, hîle, xurde û sextekariyên sîstemê, Kurdan hemû şaredariyên navenda bajêr bi dest xistin. Ji vê hilbijartinê bi şûn ve, Kurd li xwe û bajarê xwe xwedî derketin. Birêvebiriya bajarê xwe girtine destê xwe. Hilbijartina şaredariyan a sala 1999an ji bo Amediyan bû mîlad.

**Feridun Çelik** di sala 1966an de li Pasûrê hatiye dine. Hemû xwendina xwe li Amedê temam kiriye. Ji zanîngeha Dîclê ji beşa Huqûqê mezûn e. Demek parêzgerî kiriye. Di birêvebiriya HEP, DEP û HADEPê de cih girtiye. Serokatî û sekreteriya beşa Amedê kiriye. Di navbera salên 1999-2004an de bûye Şaredarê Bajarê Mezîn.

**Cezayir Serin** di sala 1951ê li Licê hatiye dinê. Dibistana seretayî xwendiye û pîşeyê wî terzîtî ye. Di hilbijartina nîsana 1999an de bû namzetê serokê belediya Bajarê Kevn (Sur Içi Belediyesî) û di hilbijartinê de qezenc kiriye. Di navbera salên 1999 û 2004an serokatiya şaredariya Sûrê kiriye.

**Cabbar Leygara** di sala 1963an de li Amedê hatiye dinê. Li Amedê heta lîsê xwendiye. Piştre li Zanîngeha Dîcleyê beşa huqûqê xwendiye. Di sala 1990î de bûye endamê meclisa HEPê. Di HEP-DEP-HADEPê de kar kiriye. Di navbera salên 1999-2004an de bûye şaredarê Rezan. Li Amedê parezeriyê dike.

**Mehmet Can Tekin** di sala 1962an de li Pasûrê, li gundê Hertayê hatiye dinê. Amadeyî xwendiye. Di sala 1999-2004an de bûye serokê şaredariya Peyasê. Niha karmend e.

**Remzi Azizoğlu**
Di sala 1952an de li Farqînê hatiye dinê. Li zanîngeha Dîcleyê beşa Tipê qedandiye. Di navbera salên 1999-2004an de bûye şaredarê Bajarê Nû (Yenişehîrê). Herweha di navbera salên 2009-2010an de seroktiya giştî ya KURDÎ-DERê kiriye. Niha wek doktor kar dike.

**Osman Baydemir** di sala 1971 li gundê Şêxkendikê hatiye dine. Dibistana seretayî, navîn û amadeyiyê li Amedê xwendiye. Li zanîngeha Dîclê huqûq xwendiye û çend sal parêzerî kiriye. Di Komela Mafê Mirovan, Baroya Amedê, Komeleya GÖÇ-DER û Alîkariya Însanî û gelek dem û dezgehan de cih girtiye. Di sala 2004an de bûye Şaredarê Bajarê Mezin. Cara duyem hatiye hilbijartin û niha jî şaredarê Bajarê Mezin e.

**Abdullah Demirbaş** di sala 1966an de li gundê Sîsê ku li ser Licê ye hatiye dinê. Dibistana seretayî, navîn û amadeyiyê li Amedê xwendiye. Di sala 1987an de li zanîngeha Firatê ji beşa Sosyolojiyê mezûn e, lê bûye mamostê felsefê. Li Mêrdîn û Amedê serokatiya Eğitim-Senê kiriye. Di sala 2004an de bûye serokê Şaredariya Sûrê. Ji ber projên pirzimanî dewletê ew ji kar girtiye. Di hilbijartina 2009an carek din ji bo serokatiya şaredariya Sûrê hatiye hilbijartin.

**Firat Anlı** di sala 1971ê de li Amedê hatiye dinê. Ji dibistana seretayî heta zanîngehê li Amedê xwendiye. Ji zanîngeha Dîclê beşa huqûqê mezûn e. Di HADEP, DEP û partiyên berdewama wan de kar kiriye. Serokatiye partiyê ya Amedê kiriye. Di sala 2004an de bûye şaredarê Bajarê Nû (Yenişehirê). Ji ber raman û xebata xwe gelek caran hatiye girtin.

**Zülküf Karatekin** di sala 1965an de li Tonakrakê hatiye dinê. Tonakrak mezreya gundê Herîdan a Pîranê ye. Dibistana seretayî li gundê xwe û ya navîn û amadeyiyê jî li Amedê xwendiye. Di sala 1986an de li zanîngeha Selçûkê beşa muhendisî û mîmariyê qedandiye. Di sala 1998an de bûye serokê Yekîtiya Muhendîsan. Di sala 2004an de bûye serokê Şaredariya Peyasê (Kayapinarê).

Institut kurde de Paris

Di dewreya duyem de carek din hatiye hilbijartin. Piştî hilbijartina 2009an bi hevalên xwe yên sîyasî ve hatiye girtin.

**Yurdusev Ozsokmenler** di sala 1953an de li Çanakkele hatiye dinê. Li zanîngehê beşa antrepoloji-etnolojiyê mezûn e. Di HADEPê û Keskê de kar kiriye. Di rojnameyên cuda de rojnamevanî kiriye. Di navbera salên 2004-2009an de bûye şaredara Rezan.

**Yuksel Baran** di sala 1969an de li Amedê hatiye dinê. Dibistana seretayî, navîn û amadeyiyê li Amedê xwendiye. Ji zanîngeha Marmarayê beşa rojnamevaniyê mezûn e. Li Amedê di Komela Çand, Alîkarî û Piştgiriya Koçberên Mexdûr de kar kiriye. Di sala 2009an de bûye Seroka Şaredariya Rezan (Bağlaran).

**Selim Kurbanoğlu** di sala 1970î de li Amedê hatiye dinê. Ji dibistana seretayî heta Zanîngehê li Amedê xwendiye. Li zanîngeha Dîclê beşa huqûqê mezûn e. Di sala 1992an de dest bi parêzgeriyê kiriye. Di nav partiyên HEP, DEP, HADEP û DTPê de kar kiriye. Di meclisa şaredariyê de xebitiye. Di sala 2009an de bûye şaredarê Bajarê Nû (Yenişehirê).

Institut kurde de Paris

# Parlamenterên Amedê

## Parlamenterên dema Osmanî

**Zülfü Bey** (Mehmet Zülfü Tigrel) Di sala 1876an de li Amedê hatiye dine. Xwediyê gund û endamê dadgeha Amedê bûye. Di parlamentoya Osmaniya duyem de bûye parlamenterê Amedê. Di parlamentoya Osmaniya dawî jî wek parlamenterê Amedê hatiye hilbijartin, lê ji ber sedemên ku li Amedê wî, Fevzî û Arif Pirinççizade, Ziya Gökalp, waliyê Amedê û hinek derdorên din di qetlîama Ermeniyan de roleke mezin lîstine, hukimeta Stanbulê wî û hevalê wî Ziya Gökalp girtine û sirgûnê Misirê kirine. Piştre şandine Maltayê. Dema meclîsa Komara Tirkiyê dadimezrandine wî û hevalê wî kirine parlamenterê Amedê. Li ser navê şêwirmendiyê Zülfü Tigrel di heyeta Îsmet Înonî de birine Konferansa Lozanê û li dij Kurdan dane axaftin. Ew di sala 1940î de miriye.[104]

**Ziya Gökalp** di sala 1877an de li Çêrmûg/Alosê hatiye dinê. Di Parlamentoya Osmaniyan a Duyem de bûye Parlamenterê Erxeniyê. Sosyolog û nivîskar bûye. Pêşî li ser Kurd, çand û zimanê kurdî nivîsiye. Piştre ku Îttihad-Tarakivanan wî û mala xalê wî Pirinççîzade (Pirinççioğluyan) kirine parlamenter û birine Stanbulê, wî dev û dest ji kurdî berdaye û bûye teorîsyenê Îttihad- Tarakivanan. Di dema komkujiya Ermeniyan de, li Amedê bi mala xalanên xwe Fevzî û Arif Pirinççizade, Zülfü Tigrel, waliyê Amedê û hinek xanedanên din ên Amedê re rol lîstine, propoganda kirine û dest dane ser mal û milkên Ermenıyan. Ji ber van sedeman hukimeta Osmanî ya dawî ew û hevalê wî Zülfü Tigrel sirgûnê Misirê kirine. Piştre birine Maltayê. Heta damezrandina Komara Tirkiyê li sirgûnê mane. Dema ku Mustafa Kemal û Îttihad-Tarakî desthilatdariyê girtine dest xwe, careke din herduyan jî li ser navê parlamenterê Amedê birine Parlamentoya Enqerê. Ew di sala 1924an de miriye.

**Arif Efendi** di sala 1878an de li Amedê hatiye dinê. Karê bazirganî û çandinî kiriye. Di sala 1908an de bûye parlamenterê meclisa duyem a Osmanî ku li Stanbulê bûye. Ew di sala 1909an de miriye.

[104] 1. Yasama Dönemi 1920-1923, *TBMM albumu* s. 50

**Ibrahim Efendi** Di sala 1864an de hatiye dine. Ruştiye xwendiye. Di sala 1908an de li ser navê Erxeniyê Niyazi Bey wek parlamenter hatiye hilbijartin. Lê Meclisa Stanbulê parlamenteriya Niyazî Beg qebûl nekiriye û di sala 1909an de di şûna wî de Îbrahim Beg hatiye hilbijartin. Li ser navê Erxeniyê bûye parlamenter.

**Fevzi Bey** (Pirinççioglu / Pirinççioglu) li Amedê di sala 1878an de hatiye dinê. Bi çandiniyê re mijûl bûye. Bavê wî parlamenterê meclisa Osmanî bûye. Piştî mirina bav di şûna bavê xwe de 10ê tebaxa 1909an de ew bûye parlamenterê Amedê yê meclisa Osmanî. Di sala 1933an de miriye.

**Arif Beg** (Pirinççizade/ ) li Amedê hatiye dinê. Ji Amedê ji malbateke naskiriye û xwedî gund e. Bavê wî Fevzî Beg (Pirinççizade) e. Li Stanbulê bûye Parlamenterê Meclîsa Osmanî. Ew di 6ê gulan1909an de miriye.

**Rüştü Bey** (Bulduk) Di sala 1874an de li Paloyê hatiye dinê. Hakimî kiriye. Bûye mebûsê meclisa Osmanî ya çarem. Di sala 1924an de miriye.

Diyarbekir, 190[illegible] 1911



Institut kurde de Paris

## Parlamenterên dema komarê

Ji destpêka Parlamentoya Tirkiyê heta dema pirpartîtiyê, parlamenter ji aliyê xelkê ve nehatine hilbijartin, di dema xwe de Mustafa Kemal parlamenter hilbijartiye. Hilbijartin çênebûye. Xelkê bi dengê xwe wan parlamenteran hilnebijartiye û wek nûnerê xwe neşandiye Parlamentoya Enqerê. Piştî wî jî ew sîstema antîdemokratîk her dom kiriye û heta niha jî ev ji binî ve nehatiye guhetin û dem dem dom dike. Ji ber vê yekê piraniya parlamenterên ku hatine hilbijartin Îttîhat-Terakkî ne û kesên derdora wan in. Bi tenê navê parlamento û sîstema hilbijartinê li ser e, lê têkiliyên wê û sîstema parlamenterî, demokrasî û hilbijartina azad bi hev nîne.

### Parlamentoya Tirkiyê ya yekem: 1920-1923[105]

**Haci Şükrü Bey** (Aydındağ) di sala 1883an de li Stanbulê hatiye dinê. Serleşker bûye û di sala1935an de miriye.

**Fevzi Bey** hem di dema parlamentoya Osmanî de û hem di dema Komara Tirkiye bûye parlamenter. Ji bo otobîyografiya wî li dema osmanî binêre.

**Hamdi Efendi** (Abdulhamit Çinton) di sala1871ê de li Amedê hatiye dinê. Mamoste bûye, di sala 1928an de miriye.

**Kadri Ahmet** (Abdulkadir Kadirî Kürkçü) di sala 1882an de li Amedê hatiye dinê. Serleşker bûye, di sala 1952an de miriye.

**Kadri Bey** (Mehmet Kadri Üçok) di sala 1881ê de li Amedê hatiye dinê. Mulkiye xwendiye. Ew di sala1958an de miriye.

**Mustafa Akif Bey** (Tutenk) di sala 1875an de li Amedê hatiye dinê û mamoste bûye. Ew di sala 1952an de miriye.

**Zülfü Bey** hem di dema parlamentoya Osmanî de û hem di dema Komara Tirkiye de bûye parlamenter. Ji bo otobîyografiya wî li dema osmanî binêre. Di Serdema Meclisa Yekem û Duyem de li gor sîstema siyasiya wê demê, Erxeniyê bi serê xwe parlamenter şandine meclisê.

Institut kurde de Paris

[105] Me vê listeya parlamenterên Amedê ji malpera. www.tbmm.gov.tr/TBMM_A, girt

## Parlamentoya Tirkiyê ya Duyem: 1923-1927

**Cavit Bey** (Abdulkadir Cavit Ekîn) di sala 1895an de li Amedê hatiye dinê. Katibî kiriye. Ew di sala 1976an miriye.

**Feyzi Bey** (Pirinççioğlu) li Amedê di sala 1879an de hatiye dinê. Li hember meslekê wî bazirgan nivîsîne. Di sala 1933an de miriye.

**Dr. Ibrahim Tali Bey** (Îbrahim Ethem Öngören) di sala 1875an de li Stanbulê hatiye dinê. Doktorê leşkeriyê ye û di sala 1952an de miriye.

**Mehmet Bey** (Mehmet Nuri Budak) di sala 1887an de li Hezro hatiye dinê. Ezayê mehkemê û xwedî gund bûye. Ew di sala 1925an de miriye.

**Şeref Bey** (Abdurrahman Şeref Uluğ) di sala 1892an de li Amedê hatiye dinê. Berî were hilbijartin mamoste bûye û di sala 1976an de miriye.

**Ziya Gökalp** hem di dema parlamentoya Osmanî de û hem di dema Komara Tirkiye bûye parlamenter. Ji bo otobîyografiya wî li dema osmanî binêre.

**Zülfü Bey** (Mehmet Zülfü Tigrel) cara sêyam hatiye hibijartin. Ji bo otobîyografiya wî li dema Osmanî binêre.

## Parlamentoya Tirkiyê ya sêyem: 1927-1931

**Dr. Ibrahim Tali Bey** (Ibrahim Ethem Öngören) di sala 1875an de li Stanbulê hatiye dinê. Doktorê leşkeriyê bûye. Ew di sala 1952an de miriye.

**Ishek Refet Bey** (Ishek Isıtman) di sala 1811 de li Entebê hatiye dinê. Berî bibe parlamenter mamoste bûye. Ew di sala 1946an de miriye.

**Kazim Paşa** (Mehmet Kazim Sevüktekin) di sala 1877an de li Stanbulê hatiye dinê. Berî hilbijartinê serleşker bûye. Ew di sala 1949an de miriye.

**Mithat Bey** (Ahmet Mithat Karabalık) di sala 1878an de li Stanbulê hatiye dinê. Berî were hilbijartin parêzer bûye. Ew di sala 1953an de miriye.

Institut kurde de Paris

**Rüştü Bey** (Mehmet Rüştü Bekit) di sala 1882an de li Kostencê hatiye dinê. Berî hilbijartinê katibî kiriye. Ew di sala 1955an de miriye.

**Zekai Bey** (Aziz Zekai Apaydın) di sala 1878an de li Bosnayê hatiye dinê. Berî hilbijartine qaymaqam bûye. Di sala 1947an de miriye.

## Parlamentoya Tirkiyê ya çarem: 1931-1935

**Kazim Paşa** (Mehmet Kazim Sevüktekin) cara duyem hatiye hilbijartn.

**Zekai Bey** (Aziz Zekai Apaydın) di sala 1878an de li Bosnayê hatiye dinê. Berî hilbijartine qaymaqam bûye. Di sala 1947an de miriye.

**Zeki Mesut Bey** (Mustafa Zeki Aslan) di sala 1887an de li bajarê Aydinê hatiye dinê. Profesor bûye. Di sala 1984an de miriye.

**Zülfü Bey** (Mehmet Zülfü Tigrel) cara çarem hatiye hibijartin. Ji bo otobîyografiya wî li dema Osmanî binêrin.

## Parlamentoya Tirkiyê ya pêncem: 1935-1939

**Mustafa Zeki Aslan** cara duyem hatiye hilbijartin.

**Zekai Bey** (Aziz Zekai Apaydın) di sala 1878an de li Bosnayê hatiye dinê. Berî hilbijartine qaymaqam bûye. Di sala 1947an de miriye.

**Rüştü Bey** (Mehmet Rüştü Bekit) cara duyem hatiye hibijartin. Ji bo otobîyografiyê li parlamentoya sêyem binêre.

**Tevfik Bilge** (Mehmet Tevfik Bilge) di sala 1865an de li Manastirê hatiye dinê. Berî ku were hilbijartinê mamoste bûye. Ew di sala 1940î de miriye.

**Ibrahim Tali Öngören** (Ibrahim Ethem Ongoren) di sala 1875an de li Stanbulê hatiye dinê. Berî ku were hilbijartin doktorti kiriye. Ew di sala 1952an de miriye.

**Huriye Öniz** di sala 1887an de li Stanbulê hatiye dinê. Berî ku were hilbijartin mamoste bûye. Ew di sala 1950î de miriye.

Institut kurde de Paris

**Kazim Paşa** (Mehmet Kazim Sevüktekin) cara sêyem hatiye hilbijartin.

**Zülfü Bey** (Mehmet Zülfü Tigrel) cara pêncem hatiye hibijartin. Ji bo otobîyografiya wî li dema Osmanî binêre.

**Şeref Aykut** (Mehmet Şerefettin Aykut) di sala 1873an de li Bagdayê hatiye dinê. Berî ku were hilbijartin parêzerî kiriye. Ew di sala 1939an miriye.

## Parlamentoya Tirkiyê ya şeşem: 1939-1943

**Mustafa Zeki Aslan** cara sêyem hatiye hilbijartin.

Rüştü Bey (Mehmet Rüştü Bekit) cara sêyem hatiye hilbijartin, li parlamentoya sêyem binêre.

**Tahsin Cahit Çubukçu** di sala 1901ê de li Amedê hatiye dinê. Berî ku were hilbijartin xwediyê rojnameyeke bûye.

**Ahmet Şükrü Emel** di sala 1898an de li Stanbulê hatiye dinê. Berî ku were hilbijartin doktorî kiriye. Ew di sala 1970î de miriye.

**Ibrahim Tali Öngören** (Ibrahim Ethem Öngören) cara duyem hatiye hilbijartin.

**Kazim Paşa** (Mehmet Kazim Sevüktekin) cara çarem hatiye hilbijartin.

**Veli Necdet Sungutag** (Ali Necdet Sungutag) di sala 1887an de li Amedê hatiye dinê. Berî ku ew were hilbijartin katip bûye. Ew di sala 1969an miriye.

**Zülfü Bey** (Mehmet Zülfü Tigrel) cara şeşem hatiye hibijartin. Ji bo otobîyografiya wî li dema Osmanî binêrin.

## Parlamentoya Tirkiyê ya heftem: 1943-1946[106]

**Rüştü Bey** (Mehmet Rüştü Bekit) cara çarem hatiye hilbijartin.

**Osman Ocak** (Osman Nuri Nakipoğlu) cara sêyem hatiye hilbijartin, li paralentoya heftem binêre.

[106] Wek tê ditin heta niha Partî tune bû. Êdî kemalîstan partiya xwe CHP ava kirine. Serdema Yek partiyê dest pêdike.

Institut kurde de Paris



Dîmeneke nû ji bajarê kevn
Foto: Melike Dara Günal

**İbrahim Tali Ongoren** (İbrahim Ethem Ongoren) cara sêyem hatiye hilbijartin.

**Kazim Paşa** (Mehmet Kazim Sevüktekin) cara pêncem hatiye hilbijartin.

**Kemal Sedele** (Mehmet Kemal Sedele) di sala 1902 li Xarpêtê hatiye dinê. Berî hilbijartinê bazirganî kiriye. Li ser navê CHP hatiye hilbijartin. Ew di sala 1960î de miriye.

**Şeref Ulug** (Abdurrahman Şeref Ulug) demeke bûye cigirê şaredarê Amedê. Di paralamentoya heftem de bûye parlamenter. Ji bo otobîyografiya wî li lîsteya şaredaran binêre.

## Parlamentoya Tirkiyê ya heştem: 1946-1950

**Fazil Ahmet Aytaç** (Fadil Ahmet Aytaç) di sala 1884an li Stanbulê hatiye dinê. Nivîskar bûye. Li ser navê CHP hatiye hilbijartin. Ew di sala 1967an de miriye.

**Vedat Dicleli** di sala 1912an de li Amedê hatiye dinê. Huqûq xwendiye. Li ser navê CHP hatiye hilbijartin. Ew di sala 1975an de miriye.

**Cavit Ekin** (Abdulkadir Cavit Ekin) di sala 1895 an de li Amedê hatiye dinê. Li maliyê mudur bûye. Li ser navê CHP hatiye hilbijartin. Ew di sala 1976an de miriye.

**Fevzi Kalfagil** di sala 1910an de li Amedê hatiye dinê. Mamoste bûye. Li ser navê CHP hatiye hilbijartin. Ew di sala 1996an de miriye.

**Osman Ocak** (Osman Nurî Nakîpoğlu) cara duyem hatiye hilbijartin, li parlamentoya heftem binêre.

**İhsan Hamit Tigrel** di sala 1890î de li Amedê hatiye dinê. Mamostetî kiriye. Li ser navê CHP hatiye hilbijartin. Ew di sala 1985an de miriye.

**Şeref Uluğ** (Abdurrahman Şeref Uluğ) cara duyem di lîsteya CHPê de hatiye hilbijartin. Ji bo otobîyografiya wî li lîsteya şaredarên Amedê binêre.

## Parlamentoya Tirkiyê ya nehem: 1950-1954[107]

**Yüsüf Kamil Aktuğ** di sala 1883an de li Amedê hatiye dinê. Xwedî gund e. Di partiya DP de hatiye hilbijartin û bûye parlamenter. Ew di sala 1952an de miriye.

**Ferit Alpiskender** (Abdurrahman Ferit Alpiskender) di sala 1909an de li Amedê hatiye dinê. Li gumrikê katib bûye. Di partiya DP de hatiye hilbijartin û bûye parlamenter. Ew di sala 1989an de miriye.

**Yüsüf Azizoğlu** di sala 1917an de li Farqînê hatiye dinê. Tip xwendiye û doktorî kiriye. Cara yekem di partiya DP de hatiye hilbijartin û bûye parlamenter. Piştre bûye damezrevanê û Serokê Giştiyê YTP (Partiya Nû ya Tirkiyê ye). Carek din di partiya YTP de hatiye hilbijartinû bûye Wezîrê Tenduristiyê. Yüsüf Azizoğlu di sala 1970î wefat kiriye.

[107] Tirkiye derbasi sistema pirpartî bûye. Xelk ji rejîma CHP gelek êşiya ye. Wek ku di hilbijartinan de jî diyar dike di vê hilbijartina parlamentoyê de hemû parlamenterên Amedê ji partiya DP (Dekokrat partisi) hatine hilbijartin

**Mustafa Remzi Bucak** di sala 1912 li Siwêregê hatiye dinê. Huqûq xwendiye, parêzerî kiriye. Di partiya DP de hatiye hilbijartin û bûye parlamenter. Ew di sala 1985an de miriye.

**Mustafa Ekinci** di sala 1904an de li Amedê hatiye dinê. Xwedî ax û bazirganî kiriye. Di partiya DP de hatiye hilbijartin û bûye parlamenter. Bûye serbixwe û çûye partiya HP. Di sala 1958an de miriye.

**Nazim Önen** (Seyfullah Nazim Önen) di sala 1887an de li Amedê hatiye dinê. Li Amedê du dewre bûye Serokê Şaredariya Amedê. Di partiya DP de hatiye hilbijartin û bûye parlamenter. Piştre çûye MP û piştre serbixwe maye. Xwedî ax û gund bûye. Ew di sala 1967an de miriye.

**Kamil Tayşi** di sala 1899an de li Îbradî hatiye dinê. Tip xwendiye doktorî kiriye. Di partiya DP de hatiye hilbijartin û bûye parlamenter. Ew di sala 1962an de miriye.

## Parlamentoya Tirkiyê ya dehem: 1954-1957

**Fikri Arığ** di sala 1923an de li Mîdyatê hatiye dinê. Doktor bûye. Di lîsteya partiya DPê de hatiye hilbijartin.

**Yüsüf Azizoğlu** cara duyem hatiye hilbijartin. Ji bo otobîyagrofiya wî li lîsteya parlamentoya nehem binêre.

**Mustafa Ekinci** cara duyem hatiye hilbijartin. Ji bo otobîyografiya wî li lîsteya Parlamentoya nehem binêre.

**Ragıp Karaosmanoğlu** (Ragip Selimgil) di sala 1910an de li Akhisarê hatiye dinê. Di şaredariyan de kar kiriye. Di lîsteya DP de hatiye hilbijartin, bûye serbixwe û piştre derbasî HP bûye. Di sala 1965an de miriye.

**Eyyüp Şahin** di sala 1892an de li Aydinê hatiye dinê. Bazirgan bûye. Di lîsteya DP de hatiye hilbijartin. Di 1954an de miriye.

**İhsan Hamit Tigrel** cara duyem hatiye hilbijartin.

Institut kurde de Paris

**Halil Turgut** di sala 1909an de li Pasûrê hatiye dinê. Mamoste bûye. Di lîsteya DP de bûye parlamenter. Di sala 1992an de miriye.

**Mehmet Hüsrev Ünal** di sala 1919an de li Amedê hatiye dinê. Huqûq xwendiye û parêzerî kiriye. Di lîsteya DP de hatiye hilbijartin. Di sala 2001ê de miriye.

## Parlamentoya Tirkiyê ya yazdehem: 1957-1960

**Fikri Arığ** cara duyem hatiye hilbijartin. Ji bo otobîyografa wî li lîsteya paramentoya dehem binêre.

**Tahsin Cahit Çubukçu** di sla 1901ê de li Amedê hatiye dinê. Rojnamevan e. Di lîsteya DP de hatiye hilbijartin.

**Sezai Demirağ** (Mustafa Sezai Demirağ) di sala 1916an de li Amedê hatiye dinê. Bazirganî kiriye. Di lîsteya DP de hatiye hilbijartin. Di sala 1978an de miriye.

**Nuri Onur** (Mehmet Nuri Onur) di sala 1909an de li Amedê hatiye dinê. Xwedî ax û şaredarî kiriye. Di lîsteya DP de hatiye hilbijartin. Di sala 1983an de miriye.

**Kamil Tayşi** cara duyem hatiye hilbijartin.

**Hamit Zülfü Tigrel** di sala 1905an de li Amedê hatiye dinê. Tip xwendiye û doktorî kiriye. Di lîsteya DP de hatiye hilbijartin. Di sala 1962an de miriye.

**Halil Turgut** di sala 1909an de li Pasûrê hatiye dinê. Mamoste bûye. Di amadeyiya DP de bûye parlamenter. Di sala 1992an de miriye.

**Hüseyin Ülkü** di sala 1894an de li Niğdê hatiye dinê. Doktorê leşkeriyê bûye. Di lîsteya DP de hatiye hilbijartin. Di sala 1986an de miriye.

**Mehmet Hüsref Ünal** di sala 1919an de li Amedê hatiye dinê. Huqûq xendiye û parêzerî kiriye. Di lîsteya DP de hatiye hilbijartin. Di sala 2001ê miriye.

Institut kurde de Paris

## Cûntaya 27ê gulana 1960î

Di 27ê gulana 1960î de leşkeriyê dest da ser meclisê û meclisê girt. Serokwezîr Adnan Menderes, wezîrê karûbarê derve Fatih Rüştü Zorlu û wezîrê maliyê Hasan Polatkan bi dar ve kir. Cûntaya leşkerî Meclîsa Damezrandinê (Kurucu Meclisi) ava kir. Ji her bajarek kesekî hilbijart û bir Enqerê Meclîsa Damezrînê. Bi qasî du salan bi vê meclisê Tirkiyê birêve birin. Li ser navê bajarê Amedê jî leşkeran Vefik Pirinççioğlu hilbijartin û birin meclîsa xwe. Di sala 1961ê hilbijartina parlamentoyê çêbû û dawî li wê meclîsa cûntayê hat.

## Parlamentoya Tirkiyê ya duwazdhem 1961-1965

**Adnan Aral** di sala 1927an de li Erxeniyê hatiye dinê. Dozgerî û parêzgerî kiriye. Di lîsteya YTP de hatiye hilbijartin û piştre bû serbixwe. Di sala 1979an de miriye.

**Şeyhmus Arslan** (Şeyhmus Aslan) di sala 1911an de li Bismilê hatiye dinê. Xwedî ax û demeke dirêj bûye şaredar. Di lîsteya CHPê de hatiye hilbijartin. Di sala 1973an de miriye.

**Yüsüf Azizoğlu** cara sêyem hatiye hilbijartin. Ji bo otobîyagrofiya wî li lîsteya parlamentoya nehem binêre.

**Hilmi Guldoğan** di sala 1921ê de li Çinguşê hatiye dinê. Mamosteyê matematîkê bûye. Di lîsteya CHPê de hatiye hilbijartin.

**Recai İskenderoğlu** (Ali Recai İskenderoğlu) di sala 1926an de li Amedê hatiye dinê. Xwedî gund e û huqûq qedandiye û parêzerî kiriye. Di lîsteya YTPê de hatiye hilbijartin. Di sala 2000an de miriye.

**Vefik Pirinççioğlu** di sala 1909an de li Amedê hatiye dinê. Mufetişê maliyê bûye. Di lîsteya CHPê de hatiye hilbijartin. Di sala 1983an de miriye.

**Alp Doğan Şen** di sala 1920î de li Îzmirê hatiye dinê. Serokê Rêxistina Xwendekaran bûye. Di lîsteya APê de hatiye hilbijartin. Di sala 2005an de miriye.

Institut kurde de Paris

## Parlamentoya Tirkiyê ya sêzdehem 1965-1969

**Aydın Turgut Arduç** di sala 1924an de li Îzmirê hatiye dinê. Parêzer bûye. Di lîsteya APê de hatiye hilbijartin. Di sala 1966an de miriye.

**Yüsüf Azizoğlu** cara çarem hatiye hilbijartin. Ji bo otobîyagrofiya wî li lîsteya parlamentoya nehem binêre.

**Metin Cizreli** (Nedim Metin Cizreli) di sala 1931ê de li Amedê hatiye dine. Di lîsteya CHPê de hatiye hilbijartin. Mîmar e.

**Hasan Değer** di sala 1920î de li gundê Bulukan hatiye dinê. Muteahîtiyê kiriye. Di lîsteya APê de hatiye hilbijartin. Demek bûye serbixwe. Piştre derbasî CHP bûye. Di sala 1995an de miriye.

**Tarık Ziya Ekinci** di sala 1925an de li Licê hatiye dinê. Berî ku were hilbijartin doktorî kiriye. Di lîsteya TIPê (Turkiye Işçi Parisi/Partiya karkerên Tirkiyê) de hatiye hilbijartin.

**Abdullatif Ensarioğlu** di sala 1935an de li Gêlê hatiye dinê. Xwediyê gund e. Di lîsteya APê de hatiye hilbijartin. Di sala 1984an de miriye.

**Recai İskenderoğlu** cara duyem hatiye hilbijartin. Ji bo otobîyografiya wî li lîsteya parlamentoya duwazdhem binêre.

**Ahmet Bilgin** di sala 1900î de li Antakyayê hatiye dinê. Dermanfiroş bûye. Di lîsteya MPê de hatiye hilbijartin. Di sala 1985an de miriye.

## Parlamentoya Tirkiyê ya çardehem 1969-1973

**Yüsüf Azizoğlu** cara pêncem hatiye hilbijartin. Ji bo otobîyagrofiya wî li lîsteya parlamentoya nehem binêre.

**Hasan Değer,** cara sêyem hatiye hilbijartin. Ji bo otobîyografiya wî li lîsteya parlamentoya sêzdehem binêre.



Institut kurde de Paris

**Behzat Egilli** di sala 1925an de li Amedê hatiye dinê. Huqûq xwendiye û parêzerî kiriye. Di lîsteya APê de hatiye hilbijartin. Di sala 1993an de miriye.

**Abdullatif Ensarıoğlu** cara duyem hatiye hilbijartin.

**Necmettin Günenç** di sala 1923an de li Hêne hatiye dinê. Di lîsteya APê de hatiye hilbijartin. Bazirgan û bi çandiniyê re mijûl bûye. Di sala 1993an de miriye.

**Sebahattin Savcı** di sala 1925an de li Hezro gundê Zoxbirînê hatiye dinê. Fakulteya Zireatê xwendiye. Di meclisa 12an de bûye Parlamenterê Gümüşhanê. Di lîsteya APê de hatiye hilbijartin. Di sala 1975 de li Amedê senator hatiye hilbijartin û heta 1980 senator maye. Di sala 2007an de miriye.

**Nafiz Yıldırım** di sala 1937an de li Erxeniyê hatiye dinê. Doktorî kiriye. Di lîsteya YTPê de hatiye hilbijartin û piştre îstifa kiriye û bûye serbixwe.

## Parlamentoya Tirkiyê ya pazdehem 1973-1977

**Hasan Değer** cara duyem hatiye hilbijartin. Ji bo otobîyografiya wî li lîsteya parlamentoya sêzdehem binêre.

**Abdullatif Ensarioğlu** cara sêyem hatiye hilbijartin.

**Recai İskenderoğlu** (Ali Recai İskenderoglu) cara sêyem hatiye hilbijartin. Ji bo otobîyografiya wî li lîsteya parlamentoya duwazdehem binêre.

**Halit Kahraman** di sala 1922an de li Hezro hatiye dinê. Mudurê kana rejiyê ya Hezroyê bûye. Di lîsteya MSPê de hatiye hilbijartin. Di sala 2000î de miriye.

**Bahatin Karakoç** di sala 1933an de li Bismilê hatiye dinê. Parêzerî kiriye. Di lîsteya CHPê de hatiye hilbijartin. Di sala 1987an de miriye.

**Mahmut Kepoğlu** di sala 1923an de li Farqînê hatiye dinê xwedî gund bûye. Du car di lîsteya APê û cara dawî jî di lîsteya ANAPê de hatiye hilbijartin. Di sala 1988an de miriye.

**Mahmut Uyanık** di sala 1940î de li Farqînê hatiye dinê. Dibistan seretayî xwendiye û bi ziraetê ve mijûl bûye. Di lîsteya CHPê de hatiye hilbijartin.

## Parlamentoya Tirkiyê ya şazdehem 1977-1980

**Halil Akgül** di sala 1947an de li Licê hatiye dinê. Karsazî û şaredarî kiriye. Di lîsteya CHPê de hatiye hilbijartin. Di sala 1993an de miriye.

**Mehmet İskan Azizoğlu** di sala 1939an de li Babaeskî hatiye dinê. Di lîsteya CHPê de hatiye hilbijartin. Dibistan navîn xwendiye û bi karê ziraetê ve mijûl e.

Cadeya Gazi



Institut kurde de Paris

**Eşref Cengiz** di sala 1936an de li Amedê hatiye dinê. Xwedî ax û gund bûye. Serbixwe hatiye hilbijartin. Derbasi CHP bûye. Ji wir jî îstîfa kiriye dîsa bûye serbixwe û piştre jî derbasî AP bûye.

**Abdullatif Ensarioğlu** cara sêyem hatiye hilbijartin.

**Mehmet Yaşar Göçmen** di sala 1941ê de li Rihayê hatiye dinê. Li daîre Sû işleriyê de mudûr bûye. Di lîsteya MSPê de hatiye hilbijartin.

**Bahattin Karakoç**, cara duyem hatiye hilbijartin.

**Mahmut Kepoğlu**, cara duyem hatiye hilbijartin.

## Cûnteya 12ê Îlona 1980î û Meclîsa Şêwrê

Di 12ê îlona 1980î artêşa Tirkiyê dest da ser Meclîsa Tirkiyêye û Kenan Evren bû Serokê Cûntayê. Parlamentoyê girt. Piştre Cûnta Kenan Evren di sala 1981ê de bi navê Danışma Meclîsî (Meclîsa Şêwrê), mecliseke ji leşker û sivîlên dostên leşkeran ava kir. Wek nûner ji her bajarekê du kes hilbijartin. Ji Amedê jî leşkeriyî Vehbî Dabakoğlû û Ahmet Sarp hilbijartin û birin Enqerê Meclîsa Şêwrê. Heta sala 1983an vê Meclîsa Şêwrê Tirkiyê birêvebir. Vehbî Dabakoğlû di sala 1910an de li Amedê hatiye dinê. Mamostetî û demek jî bûye Cîgirê Şaredarê Amedê. Di sala 2001ê de miriye. Ahmet Sarp di sala1931ê de li Licê hatiye dinê. Muhendis e. Demeke şêwrimendiya Silêman Demirel kiriye.

## Parlamentoya Tirkiyê ya hevdehem 1983-1987

**Mahmut Altınakar** di sala 1926an de Gozelşêxê hatiye dinê. Huqûqê xwendiye û xwedî gund e. Di lîsteya MDPê de hatiye hilbijartin, îstifa kiriye, bûye serbixwe û piştre jî derbasî DYPê bûye.

**Şeyhmus Bahçecî** di sala 1951ê de li Çêrmûgê hatiye dinê. Muhesebetî kiriye. Di lîsteya HPê de ketiye meclîsê, piştre îstîfa kiriye û derbasî SHPê bûye.

**Özgür Barutçu** di sala 1934an de Amedê hatiye dinê. Parêzerî kiriye. Di lîsteya ANAPê de ketiye meclîsê. Di sala 2010an de miriye.

**Cevdet Karakurt** li Zimmikitirbî hatiye dinê. Bazirganî kiriye. Di lîsteya ANAPê de hatiye hilbijartin.

**Kadri Narin** di sala 1941ê de li Tîyaxsê hatiye dinê. Di sendîqan de xebitiye. Di lîsteya HPê de ketiye meclisê. Derbasî SHPê bûye û ji wir jî çûye DSPê.

**Hayrettin Ozansoy** di sala 1915an de li Kutahyayê hatiye dinê. Elçî bûye. Di lîsteya HPê de ketiye meclisê, îstifa kiriye û çûye SHP û ji wir jî îstifa kiriye bûye serbixwe. Di sala 1987an de miriye.

**Ahmet Sarp** di lîsteya MDPê de hatiye hilbijartin. Piştre îstifa kiriye û demeke serbixwe maye û piştre çûye DYP. Ji bo otobîyografiyê li meclîsa 12ê Îlonê binêre.

## Parlamentoya Tirkiyê ya hejdehem 1987-1991

**Abdulkadir Aksu** di sala 1944an de li Amedê hatiye dinê. Memûrê mulkiye bûye. Walîtî kiriye. Cara yekem di lîsteya ANAPê de hatiye hilbijartin. Cara duyem istîfa kiriye serbixwe maye. Derbasî RPê bûye carek din îstîfa kiriye û bûye serbixwe û piştre derbasî FPê bûye. Di dawî de çûye AKP. Di serdema AKP de bûye wezîrê kar û barê hundir.

**Fuat Atalay** di sala 1952an de li Stanbulê hatiye dinê. Ji malbata mîrên Licê ye. Muhendisê avahiyan e. Di lîsteya SHPê de hatiye hilbjartin.

**Ferit Bora** di sala 1944an de li Hêne hatiye dinê. Li Hêne Serokatiye Şaredariyê kiriye. Di lîsteya DYPê de hatiye hilbijartin.

**Hikmet Çetin** di sala 1937an de li Licê hatiye dinê. Pisporê Plansaziyê ye. Ew çend car bûye parlamenter, lê li ser navên bajarên din hatiye hilbijartin. Bûye wezîr û alîgirê serokwezîr û di nav salên 1997-1999an de bûye serokê parlamentoyê. Di lîsteya SHPê hatiye hilbijartin.

**Nurettin Dilek** cara duyem hatiye hilbijartin.

**Mehmet Kahraman** di sala 1943an de li Hezro hatiye dinê. Parêzer bûye. Di lîsteya SHPê de hatiye hilbijartin. Îstifa kiriye û bûye serbixwe û bi paş ve vegeriye SHP.

Institut kurde de Paris

**Mahmut Kepoğlu** cara sêyem hatiye hilbijartin.

**Salih Sümer,** di sala 1951ê de li Bismilê hatiye dinê. Heta dibistana amadeyiyê xwendiye û dest bi bazirganî kiriye. Di lîsteya SHPê de hatiye hilbijartin. Îstîfa kiriye, bûye serbixwe û derbasî HEPê bûye. Ji wir jî îstîfa kiriye dîsa serbixwe maye. Çûye DYP û demeke kurt bûye wezîrê dewletê.

## Parlamentoya Tirkiyê ya nozdehem 1991-1995

**Mehmet Hatip Dicle** di sala 1955an de li Amedê hatiye dinê. Muhendisê avahiyan bûye. Di lîsteya SHPê de hatiye hilbijartin. Îstîfa kiriye bûye serbixwe. Derbasî OZEPê bûye. Bûye serbixwe û carek din derbasî HEPê bûye. Bûye serbixwe û derbasî DEPê bûye. Carek din bûye serbixwe.[108]

**Mehmet Salim Ensarioğlu** di sala 1941ê de li Pîranê hatiye dinê. Di lîsteya DYPê de hatiye hilbijartin.

**Ahmet Fehmi Işıklar** di sala 1941ê de li Rihayê hatiye dinê. Sendîqavan bûye. Di lîsteya SHPê de hatiye hilbijartin.

**Mehmet Kahraman** cara duyem hatiye hilbijartin.

**Salih Sümer** cara duyem hatiye hilbijartin.

**Mahmut Uyanık,** cara duyem hatiye hilbijartin.

**Sedat Yurtdaş** di sala 1961ê de li Erxenî/Cingişî hatiye dinê. Parêzer e. Di lîsteya SHPê de hatiye hilbijartin. Îstîfa kiriye bûye serbixwe. Derbasî OZEPê bûye. Bûye serbixwe û derbasî HEPê bûye. Bûye serbixwe û derbasî DEPê bûye. Carek din bûye serbixwe.

**Leyla Zana** di sala 1961ê de li Farqînê hatiye dinê. Amadeyî qedandiye û rojnamevanî kiriye. Di lîsteya SHPê de hatiye hilbijartin. Îstîfa kiriye bûye serbixwe. Derbasî OZEPê bûye. Bûye serbixwe û derbasî HEPê bûye. Bûye serbixwe û derbasî DEPê bûye. Carek din bûye serbixwe

[108] Partiya wan her ku ji aliyê dadgeha bilind ve, ji sedemê ku kurdayetiyê dikin ve tê girtin, ew û hevalên xwe dibin serbixwe û piştre derbasi partiya nû dibin. Ew partî jî tê girtin derbasî yeka nû dibin. Piştre Hatip Dicle digrin û davêjin zindanê.

## Parlamentoya Tirkiyê ya bîstem 1995-1999

**Abdulkadir Aksu** cara duyem hatiye hilbijartin.

**Muzaffer Aslan** di sal a 1935an de li Bismilê hatiye dine. Bazirganî kiriye. Di lïsteya ANAPê de hatiye hilbijartin.

**Ferit Bora** cara duyem hatiye hilbjartin.

**Mehmet Salim Ensarıoğlu** cara duyem hatiye hilbijartin.

**Sacit Günbey** di sala 1952an de li Madên e hatiye dine. Doktorî kiriye. Di lîsteya RPê hatiye hilbijartin. Îstîfa kiriye bûye serbixwe û derbasî FPê bûye.

**Seyyid Haşim Haşimi** di sala 1956an de li Cizîrê hatiye dine. Cotyarî kiriye. Di listeya RPê de hatiye hilbijartin bûye serbixwe û derbasî FPê bûye.

**Ömer Vehbi Hatipoğlu** di sala 1953an de li Hezro hatiye dine. Mamostetî kiriye. Di lîsteya RPê de hatiye hilbijartin, bûye serbixwe û derbasî SPê bûye.

**Yakup Hatipoğlu** di sala 1937an de li Hêne hatiye dine. Weîz bûye. Di lîsteya RPê de hatiye hilbijartin. Îstifa kiriye bûye serbixwe û derbasî FPê bûye.

**Sebgatullah Seydaoğlu** di sala 1955an de li Hêne hatiye dinê. Di Endustriya Tirkiyê ya Şîr de (Turkiye Süt Endustrisi) de kar kiriye. Di lîsteya ANAPê de hatiye hilbijartin.

**Salih Sümer** cara sêyem hatiye hilbijartin.

## Parlamentoya Tirkiyê ya bîstûyekem 1999-2002

**Osman Aslan** di sala 1954an de Erxenî/Kotekan hatiye dinê. Li Sigortayê berpirs bûye. Di lîsteya FPê de hatiye hilbijartin. Piştre îstîfa kiriye, bûye serbixwe û ji wir ji çûye AKPê.

**Nurettin Atik** di sala 1948an de li Amedê hatiye dinê. Bazirganî kiriye. Di lîsteya DYPê de hatiye hilbijartin.

**Nurettin Dilek** cara sêyem hatiye hilbijartin.

**Mehmet Salim Ensarioğlu** cara sêyem hatiye hilbijartin.

**Abdulbaki Erdoğmuş** di sala 1958an de li Darahênê hatiye dinê. Muftîtî kiriye. Di lîsteya ANAPê de hatiye hilbijartin.

**Sacit Gunbey** di sala 1952an de li Madenê hatiye dinê. Doktorî kiriye. Di lîsteya FPê de hatiye hilbijartin. Îstîfa kiriye, bûye serbixwe û ji wir jî çûye SPê.

**Seyyid Haşim Haşimi** di sala 1956an de li Cîzîrê hatiye dine. Cotyarî kiriye. Di dîsteya RPê de hatiye hilbijartin. Bûye serbixwe û derbasî ANAPê bûye.

**Ömer Vehbi Hatipoğlu** cara duyem hatiye hilbijartin.

**Sebgatullah Seydaoğlu** cara duyem jî di lîsteya ANAPê de hatiye hilbijartin.

**Abdulsamat Turgut** di sala 1965an de li Yolbaşiyê hatiye dinê. Karsaz bûye. Di lîsteya DSPê de hatiye hilbijartin. Îstîfa kiriye, serbixwe maye û piştre çûye YTPê.

## Parlamentoya Tirkiyê ya bîstûduyem 2002-2007

**Aziz Akgül** di sala 1956an de li Golbaşiyê hatiye dinê. Li zanîngehê mamostetî kiriye. Di lîsteya AKPê de hatiye hilbijartin.

**M. İhsan Arslan** di sala 1948an de li Sasonê hatiye dinê. Karsaz û rojnamevantiyê kiriye. Di lîsteya AKPê hatiye hilbijartin.

**Osman Aslan** cara duyem di lîsteya AKPê de hatiye hilbijartin

**Mesut Değer** di sala 1959an de li Amedê hatiye dinê. Parêzerî kiriye. Di lîsteya CHPê hatiye hilbijartin. Berpirsê CHPê yê Amêdê ye.

**Mehmet Mehdi Eker** di sala 1956an de li Bismilê hatiye dinê. Hekim-Veterenerî kiriye. Di lîsteya AKPê hatiye hilbijartin. Piştre bûye wezîrê ziretê.

Institut kurde de Paris

**Muhsin Koçyigit** di sala 1951ê li A. Balaxorê hatiye dinyayê. Mamostetî kiriye. Di lîsteya CHPê de hatiye hilbijartin. Îstîfa kiriye bûye serbixwe û ji wir jî çûye ANAPê.

**Ali İhsan Merdanoğlu** di sala 1963an de li Bismilê hatiye dinê. Xwedî erd e. Di lîsteya AKPê de hatiye hilbjartin.

**Cavit Torun** di sala 1951ê de li Çêrmûgê hatiye dinê. Mamosteyê îmamxetîbê bûye. Di lîsteya AKPê de hatiye hilbijartin.

**Mehmet Fehmi Uyanık** di sala 1951ê de li Farqînê hatiye dinê. Dibistana seretayî xwendiye. Bi ziraetê ve mijûl bûye. Cara yekem di lîsteya CHPê de hatiye hilbijartin. Cara duyem jî di lîsteya SHPê de hatiye hilbijartin. Bûye serbixwe, çûye OZEPê, serbixwe, HEP, serbixwe.

**İrfan Riza Yazıcıoğlu** di sala 196ê de li Amedê hatiye dinê. Karsaz bûye. Di lîsteya AKPê de hatiye hilbijartin.

## Parlamentoya Tirkiyê ya bîstûsêyem 2007

**M. İhsan Arslan** cara duyem hatiye hilbijartin.

**Kutbettin Arzu** di sala 1955an de li Amed/gundê Baxteriyê hatiye dinê. Muhendîs e. Di lîsteya AKPê de hatiye hilbijartin.

**Osman Aslan** cara sêyem di lîsteya AKPê de hatiye hilbijartin.

**Akın Birdal** di sala 1948an de li Nîgdeyê hatiye dinê. Muhendisê ziraetê ye. Serbixwe hatiye hilbijartin. Derbasî DTPê bûye. DTP hatiye girtin, serbixwe maye. Piştre derbasî BDP bûye.

**Selahattin Demirtaş** di sala 1973an de li Paloyê hatiye dinê. Parêzerî kiriye. Serbixwe hatiye hilbijartin. Derbasî DTPê bûye. DTP hatiye girtin, serbixwe maye. Piştre derbasî BDP bûye.

**Mehmet Mehdi Eker** cara duyem hatiye hilbijartin û bûye wezîrê kiştûkalê.

**Gultan Kişanak** di sala 1961ê de li Elezîzê hatiye dinê. Rojnamevanî kiriye. Serbixwe hatiye hilbijartin. Derbasî DTPê bûye. DTP hatiye girtin, serbixwe maye. Piştre derbasî BDP bûye.

**Abdurrahman Kurt** di sala 1968an de li gundê Axwêrana Biçûk hatiye dinê. Muhendîsê avahiyan e. Di lîsteya AKPê de hatiye hilbijartin.

**Ali İhsan Merdanoğlu** cara duyem hatiye hilbijartin.

**Aysel Tugluk** di sala 1965an de li Elezîzê hatiye dinê. Parêzerî kiriye. Serbixwe hatiye hilbijartin. Derbasî DTPê bûye. DTP hatiye girtin, serbixwe maye. Piştre derbasî BDP bûye. Ji ber axaftin û çalakiyên wê Dadgeha Qanûna Bingehîn a Tirkiyê parlamenteriya wê îptal kiriye.

## Parlamentoya Tirkiyê ya bîstûçarem 2011

**Leyla Zana** cara duyem li Amedê serbixwe hatiye hilbijartin. Ji bo jiyana wê li dewra 19em binêrin.

**Emine Ayna** di sala 1968an de li Amedê/Pîranê hatiye dinê. Heta amadeyiyê xwendiye. Di dewreya 22.yem de bûye parlamenterê Mêrdînê. Vê carê li Amedê serbixwe hatiye hilbijartin.

**Mehmet Hatip Dicle** cara duyem li Amedê serbixwe hatiye hilbijartin. Ji bo jiyana wî li dewra 19em binêrin.

**Nursel Doğan** di sala 1958an de li Bursayê hatiye dinê. Heta fakulteya muhendîsiye xwendiye, lê neqedandiye. Li Amedê serbixwe hatiye hilbijartin.

**Altan Tan** di sala 1958an de li Mêrdin/Midyatê hatiye dinê. Muhendîsê avasaziyê ye. Nivîskar e. Li Amedê serbixwe hatiye hilbijartin.

**Şerafettin Elçi** di sala 1938an de li Cizîrê hatiye dinê. Fakulteya huqûqê qedandiye. Parêzgerî kiriye. Di sala 1977an de ji Mêrdinê bûye parlamenter û

Institut kurde de Paris

demekê bûye wezîrê avasaziyê. Niha ew serokê giştiyê Partiya Demokrasî û Hevkariyê ye. Vê carê li Amedê serbixwe hatiye hilbijartin.

**Mehmet Galip Ensarioğlu** di sala 1966an de li Amedê hatiye dinê. Ji zanîngeha Dîclê beşa birêvebiriya pîşeyî mezûn e. Demekê bûye serokê Yekîtiya Karsazên Amedê. Ew di lîsteya AKPê de hatiye hilbijartin.

**Mine Lök Beyaz** di sala 1963an de li Enqerê hatiye dinê, lê bi eslê xwe amedî ye. Mîmar-muhendîs e. Di lîsteya AKPê de hatiye hilbijartin.

**Mehmet Süleyman Hamzaoğulları** di sala1975an de li Amedê hatiye dinê. Ji fakulteya tipê mezûn e. Di lîsteya AKPê de hatiye hilbijartin.

**Cuma İçten** di sala 1973an de li Çewlik/Darahênê hatiye dinê. Bazirgan e. Di lîsteya AKPê de hatiye hilbijartin.

**Mehmet Mehdi Eker** cara sêyem di lîsteya AKPê de hatiye hilbijartin, du dewrên dawî wezîrê kiştûkal e.

## SENATORÊN AMEDÊ

Di navbera salên 1961-1980î de li Tirkiyê li gel parlamentoyê senato jî hebû. Senatorên Amedê ev in:



Dimeneke şevê ji Dicle Kentê
Foto: İnan Kılıç

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

**Selahattin Cizrelioğlu** di sala 1924an de li Amedê hatiye dinê. Parêzer e. Di sala 1966an de di lîsteya AP de bûye senator û piştre di 1973an de derbasi CHPê bûye. Di sala 1974an de di qebîne ya Bulent Ecevît de bûye Wezîrê Tenduristiyê. Di hilbijartina senatoya 1975an de di lîsteya CHPê de hatiye hilbijartin û heta sala 1980î dom kiriye û derbasî CHPê bûye.[109]

**Sebahattin Savcı** cara yekem ji bo parlamentoyê û cara duyem jî ji bo sanatoyê hatiye hilbijartin. Ji bo otobîyagrafiya wî li lîsteya parlamentoya çardehem binêre.

**Mehmet Azmi Erdoğan** di sala 1919an li Licê hatiye dinê. Hûkûq xwendiye û parêzerî kiriye. Di 15ê cotmeha 1961ê de di lîsteya YTP de bûye senator. Ji partiya xwe îstîfa kiriye bûye serbixwe û di sala 1973an de jî derbasî APê bûye.

Institut kurde de Paris

[109] Cumhuriyet senato üyelerinin özgeçmisi, cilt-D


Institut kurde de Paris

Nimûneyek ji
cilûbergên Amediyan
Foto: Ahmet Doğru



Nimûneyek ji cilûbergên jınên Amedî

# Cilûberg

## Cilên jinan

**Kofî,** derdora kofiyê çoxa ye, ji hevdayê hevrîşim tê çêkirin. Tarek heye ev ji textik an ji teneke ye. Li ser tar feseke bi gulik heye. Porê jêkiri bi kofiyê ve têkirin û gulikan bi serê wan ve ber didin. Pêşî li serî dolbendeke spî û piştre şar li ser tê girêdan. Li ser wê jî pûşiyên rengîn tên alandin.

**Fesa jinan,** du cure fesên jinan hene. Fesa fînî û fesa kofiyê. Herdu jî ji kulav tên çêkirin ji serî heta navikê dirêj in. Fesa fînî di navê de qasnak tune û bêsaçbağî ye. Jinên bi temen didin serê xwe. Fesa kofiyê, bi gulike, gulikên hinekan cot û hinekan jî çil in. Ya keçan e. Bi gulikan ve perik, morikên şîn, pûlikên zîvîn û nivîştan tê xemlandin.

**Çît** ji tul tê çêkirin, spî û çargoşe ye. Jin serê xwe pê dipêçin. Hinek jin derdora wê çîn (oye) dikin, pûlik û cixcixanan pê ve dikin. Ji yên weha re dolbend dibêjin.

**Heftreng** (çarreng/şaer), zemînê wê reş û xêzên durengîn di nav de hene, çargoşe ye. Pêşî sêgoşe dipêçin û piştre li ser hev zirav zirav qat dikin û piştre li derdora kofiyê dipêçin.

**Pûşî,** hevrîşim e û reng reng e. Bi piranî bi rengên zindî ne. Ji serê bi paş ve tê ser enîyê li ser kofiyê girêk tê lêxistin. Pûşiyên Amedê li cîhanê bi navûdeng in. Li Amedê hem pûşî û hem jî çarşev li tevne dixistin. Yên ku karê pûşîtiyê dikirin Suryanî bûn û li taxa Lalebegê dijîyan. Di sala 1940î de 270 malbatî jiyana xwe bi karê pûşîvaniyê dikirin. Yên ku çarşevên matîn jî çêdikirin Ermenî bûn.[110] Piştî qetlîamê Ermeniyên mayî jî koçber kirin. Suryanî jî koçber bûn û

[110] Şeyhmus Dikin, Diyarbakir diyarim yitirmişem yanarim. r.43

çûn. Ji aliyê din ve di dema komare de bi derketina qanûna cilûbergan ev meslek jî mirin. Qoze ku dikirin ta an hevda li bin birca Westa û Şagird kargehên wan hebûn . Ew hatin girtin. Di heman demê de pûşî li nav bajêr di malan de dihatin çêkirin. Ew kar jî êdî qediya.



Nimûneyek ji cilûbergên jın û mêrên Amedi

**Fistan**, mil û bejn dirêj in, dawa wê çiqir çiqir e. Ji qumaşê qedîfe ye. Fistanê ser cilan e. Amedî jê re enterî jî dibêjin.

**Sêperçe**, pêş û kêlekên wê vekirîne. Piranî ji qumaşê qedîfe ne. Rengîn e hem jî rengên germ û jîndar in. Li ser desenên wan gul hene. Di ser cilan de tê li xwe kirin. Li gor kar û demsalan tê bi karanîn.

**Qutik**, huçkên wê kin, heta enîşkê ye, loma navê qotik lê kirine. Yanî qot e. Bi piranî ji qedîfe tê çêkirin. Bi ser cilan de tê li xwe kirin. Pêş bi qomçikan naye girtin, vekirî ye. Bi sîmên zer nexşkirî ye.

**Derpê** deling fireh in, lê devdeling teng in. Qumaşê bi desen an bi gul in. Berê deling bi doxin û devdeling jî bizmikî bû, lê niha bi lastîk in.

**Pişt** (Axabenî), piranî rengê zer tê tercîh kirin. Zirav zirav tê lefandin û li tê pêçan.

**Pêştemal**, ji bo ku cil qirêj nebin, didin ber xwe. Bi gelemperî rengê tarî hildib jêrin ku zêde qirêj xuya neke.

**Goreyên hirî**, ji livayê berxan tê çêkirin. Heta bin saqê (çokê) dirêj e. Motîvên li ser engîn in. Nerm û germ in.

**Yemeniya bi biçik**, ji çerm e. Rengîn e. Rengên spî, gewr û reş hene. Pêşiya wê girtîye û paşî bi boçik e. Mirov bi boçika wê digre û dikşîne.

Ji bo jinan ev aksesuwarên govend û dîlanê hene:
Şirik, eyûb, guhar, xizme, hemalî, gerdane (kolye), beşîbirlîk, mercan, qeytan-pank (kordon), karîbar, bazin, kemer, xirxal, bazbend

## Cilên mêran

**Kumê tiftik,** ji pûrtê hêştir û bizinên kej tên çêkirin. Ser guhê wê dirêj in. Dikşînin serê xwe û pûşî li ser tê girêdan. Serkêşê govendê bi aliyê rastê ve û yê paşî jî bi aliyê çepê ve kumê xwe xwar dikin.

**Kefî,** çar goşe ye û serê wê bi gulik e. Bi pirani reş û spî ye an jî sor û spî ye. Li serî tê girêdan. Sêgoşe ji eniyê li aliyê serî tê pêçan. Jê re cemedanî jî dibêjin.

**Îşlik,** ji qumaşê sade yan jî şiftokî çêdikin. Bêberik û bêstûkurk e. Pêş û hûçikên wê bi qomçik in.

**Êleg,** piranî ji qûmaşê qabardîn tê çêkirin. Li pêş çend berikên wê hene û bêhustûkurk û bê hûçk e. Li pişt li herdu aliyan ben hene û dema li xwe dikin bi hev ve tên girêdan, li beşnê teng dibe. Pirani qumaşê şalwar û êleg ji hev in. Yên çilpişkok jî hene.

**Şalwar,** ji qumaşê qabardîn tê çêkirin. Li her kêlekê berîkê wê heye. Navrana wê fireh û daketî ye. Devdeling teng in. Li jor cihê doxînê heye û cihê herdu serên doxînê li pêş e. Benê doxînê ji rîsên rengîn e. Serê doxînê bi gulik in û li pêş tên girêdan û dikin bin şalwar. Berê li ser berikên şalwarên Amedê motîvên mar û dûvpişkan hebûn, lê niha ev nemane. Mar û dûvpişk sembola bajarê Amedê ne û mar jî wek tê zanîn sembola Kurdên Zerdeştî û Ezîdî ne.

**Kefiya piştê,** çargoşe ye û dora wê bi gulik e. Renga reng e. Bi sêgoşeyî tê pêçan û gulikan dikin navê li ser hev qat dikin û li ser şalwar didin pişta xwe. Di zamanê berê de kefiyên ecem jî bi kar anîne.

**Gorê hirî,** ji hirî û bi taybetî ji livaya berxan tê çêkirin. Dirêj heta bin saqê ne. Motîvên reng reng li ser in. Ji bo mêran ev aksesuwarên govend û dîlanê hene: Hemalî, bazbend, kosteka saetê, zincîrê saetê, destmal.

## Govend û lîstik

Her govend an jî lîstikeke xwedî çîrokeke dîrokî ye. Bi qasî dîroka gelê xwe kevn e. Her yek xwedîyê serpêhatiyeke jîyanê ye. Bingeh û naveroka xwe ji jîyana herêmê girtine. Mijara her lîstikeke Amedî evîn, hezkirin, hêvî, nefret, xeyal, xemgînî, kar, şîn û şahî, qehremanî û qeleşî hene. Her yek mijar û naveroka xwe ji jîyanê girtîye. Ji ber ev herêm berî dîrok û piştî dîrokê û heta niha bûye qada şerên dagîrkeran. Xelkên herêmê tim di bin metirsîyê de jiyaye. Talan, lêdan, çewsandin û kuştin di jiyana wan de bûne bûyerên rojane. Ji ber vê yekê lîstikên herêma Amedê hem bûne sembol û şanoya van bûyeran û hem jî bûne sembola yekîtî, hevkar û parastinê. Lîstikên gelêrî awêneya gelê xwe yê bi hezar salan in. Berhmên madî û manevî ne. Kûrahiya xwe ji ax û dîroka gelê xwe û rengê xwe jî, ji cografya xwe girtine. Ji ber vê yekê lîstikên her bajar, her bajarok xwedî taybetiyên serbixwe ne û nûansên biçûk di nav lîstikên wan de hene. Lîstikên Amed, Semsûr, Culemêrg, Mûş. Xarpêt, Çewlik û her wekî din cihê cihê ne. Taybetmendiyên cogrefîk li ser lîstikan hene û bandor hiştine. Zimanî lîstikan aheng, rîtim û hereketên wê ne.

Formên lîstik û govendên Kurdan bi giştî çar in: 1. Rêza rast heye. Govendger bi destên hev digrin, mil mil û li ser rêzeke rast govendê digrin. 2. Du rêzên rast



Dîmenek ji pêşbirika govendên Amedê.

Institut kurde de Paris



Şaredar Osman Baydemir
xelatên komên govend ên serketî dide.

li hember hev dilizin. 3. Nîv helqe ye. 4. Tam helqe ye.[111] Amûrên van lîstikan piranî def û zirne ne. Di hinek lîstikan de ribab jî bi kar tê. Di navê de jî dilînînin û distirin.

## Govend

Di vê herêmê de lîstika ku herî pir tê lîstin govend e. Govend bi şiklê xwe du cure tê lîstin. Govenda jinan û govenda mêran. Li gor jin û mêran ritma lîstik û rengê lîstikê diguhere. Ev lîstik jin û mêr bi hev re jî dilîzin. Orjinala govendê li ber def û zirnê tê girtin. Li ber stranan jî tê girtin. Rîtim jîndar e, kêf û şahî heye. Dikevin milê hev, milê çepê tê ser yê rastê. Dest dikevin nav a hev û tilî di nav hev de tên derbas kirin.

[111] Ahmet Alınca, ahmetalinca@hotmail.com



Institut kurde de Paris

**Delîlo**

Ev lîstik jî bi jin û mêranan ve tê lîstîn Di dawetan de govend û delîlo yên herî bêtir tên lîstin. Ji ber ku rîtmên wan gelek hêsan e, her kes dikare bilîze. Bi çar gavên bi pêş ve û bi çar gav bi paş ve tên avêtin. Jin û mêr bi tiliyên hev ya biçûk wek xelekek dirêj li hev asê dikin û li ber def û zirnê dilizin. Di van salên dawî de şûna def û zirne enstrûmenan girtine. Carnan li ber strana Delîlo jî digrin. Ev lîstik temsîliya berhem û xebatên kolektîv e. Piştî bi destxistina kar û xebatê keyf û şahî ye.

**Sêling**

Ev jî cureyeke govendê ye. Xelkê nav bajêr ji vê cureyê govendê re çaçan jî dibêjin. Bi sê gavên li cihê xwe, sê gav bi pêş û sê gav bi paş ve tê avêtin. Lîstikeke bi coş e. Di vê lîstikê de gotin dibe wek dirûşmeyek û tê berz kirin.

**Çepik**

Ev lîstik ji navê wê jî diyar e ku bi çepikan tê lîstîn. Lîstika çepikan bingeh û naveroka xwe ji şer û pevçûn digre. Du kes tên hember hev û dest bi şer dikin. Piştre hemû lîstikvan du-du şer dikin û dibe şerê komî. Di lîstika çepik de amedekarî, êrîş, şer û meş hene. Di lîstika çepikê herweha centilmenî jî heye. Carnan zilam û zilam, jin û jin şer dikin. Di dawiyê de li hev tên û dest bi şahiyê dikin.

**Giranî/Haranî**

Di Giranî de nîgarên nazik, nazenîn û bi ahengî hene. Evîndarî û benginî heye. Di nav lîstika Giranî de strana Esmerê heye. Def û zirne radiwestin, lîstikvan dest pê dikin strana Esmerê dibêjin. Dema diqede dîsa bi def û zirnê dom dikin.

**Keşe**

Lîstikeke tenê ji aliyê mêran ve tê lîstin. Govendeke giran e. Bi şiklê xwe dişibe delîlo. Lê ji delîlo hêdîtir tê lîstin. Bi lîstika keşeyê xirîstiyan ku serxweş bûye û delîlo lîstiye henekê xwe dike. Keşe serxweş e û nikare bi delîlo bilîze. Dema bi pêş ve diçe lingê xwe yê rastê davêje. Bi tiliyên kelînçekê bi destê hev digrin û destê heta asta ber serê xwe bilind dikin. Pêşî rast, piştre çep, dîsa lingê rastê davêjin lingê çepê bi pêş ve davêjin, carek din lingê çep bi paş ve vedigerin. Hereketên dest ber bi erdê ve dadikevin. Her gava ku davêjin xwe bi pêş ve xwar dikin.

Institut kurde de Paris

**Papûre**
Lîstikvan destê xwe davêjin ser milên hev helqe girê didin û lîstik bi lingê restê dest pê dike. Lingê rastê li erdê dixin lingê çepê bi aliyê çepê ve dubare davêjin. Papûr tê wateya riya çêkirî. Hemû bi hev re rê vedikin. Sembola koletîvîzmê ye.

**Pez û Gur**
Ev çîroka şivanekî Kurd e. Yek dibe şivan, yek kûçik, yek dibe gur û yên din jî dibin pez. Dema dibe şev pez dixe mexel û şivan radikeve. Kûçik li pez xwedî dernakeve. Heta ji gur re alîkarî dike ku were pez bixwe û ew jî çend gepên ku ji ber gur dimîne dixwe. Şivan dinêre ku her şev gur tê û pezeke wî dixwe. Li kûçikê xwe dide, ranakeve û li benda gur dimîne. Gur tê û bi tifengê gur dikuje. Bi kûçikê re dixeyde û çend pînan lê dixe. Piştî ku gur dikuje hemû radibin, bi şadî û şahiyê li dar dixin.


**Teşî û bêrî**
Li bêriyê lîstika evîndaran e. Keç diçin bêriyê. Li riya bêriyê teşî dirêsin û stranan dibêjin. Li bêriyê dest bi govendê dikin. Piştre dest pê dikin pezên xwe didoşin. Vê carê xort tên bêriyê. Ew jî dest bi strana dikin û govendê digrin. Piştre keç û xort tên li gel hev govend digrin.

**Şûr û mertal**
Wek navê wê li ser e, lîstikeke ku temsîliya şer dike. Lîstikvan dibin du kom. Di destekî her serokê komê de çovek û di destê din de jî fereke sol heye. Çov temsiliya şûr û sol jî temsiliya mertalê dike. Hevalên wan jî bi pezogurkî bi pişta hev digirin, rêz dibin û li peyî pêşengê xwe diçin. Di nav tirs û panîkê de li benda şer in. Def û zirne lê dikevin. Herdu kom li hember hev pan dibin. Bi awirên tûj li hev mêze dikin. Li benda êrişan e ka dê serokê kîjan komî ji wan pêşî êriş bike. Ev lîstik kêm caran tê lîstin. Di şiklê vê lîstikê de lîstikeke herêmî heye ku ew jî 'avare' ye. Di vê lîstikê de jî şûr tê bikaranîn.

**Duling**
Bi du lingan tê lîstîn. Rîtimê vê jî bi du lingan e. Taybetiya dulingê lingê çepê du car li ser hev li erdê dixin û bi paş ve vedigerin. Dengê defê kurt e û li gor rîtiman e.



Institut kurde de Paris




Krokiya listika birê

### Yekling

Di ritimê vê de jî lingek derdikeve pêş. Yek rêz an jî dû rêz dikarin li hember hev jî bilîzin. Lîstikeke bi liv û çalak e.

### Lîstik û pêşbirika Birê

Ev Lîstik ne ya govend û dîlanê ye, lîstike netewî ya Kurdan a sprorê ye. Li her herêmên Kurdistanê tê lîstin. Ji bo ku li der tê lîstin bi piranî di demsalên bihar û payizan de, li ser bêderên gund dilîzin. Birê her çiqas lîstika xortan be jî, carnan keç jî li gel xortan dilîzin. Lîstik ji aliyê du koman ve tê Lîstin. Her komeke ji heft (7) kesan pek tê, hemû 14 kes dikin. Heta niha rêzake nivîskî ya vê lîstikê tune bû. Di sala 2010 Şarederiya Amedê ya Mezin ji bo lîstikê rêbazeke nivîskî amade kir û lîstikê di avahiya sporê de da lîstandin. Ji vir bi şûn ve, dê ev lîstika Birê bi awayekî fermî ji aliyê şaredariyê were amade kirin.

Rêbaz:

Lîstika her dewreyî 25 xulek (deqîqe) e. Herdu ali ji bo dorê şilî û zuwa davêjin. Aliyê ku qezenc bike, dikeve êrîşê û yên din jî dagê (qelê) diparêze. Yên ku dagê diparêzin derdora dagê belav dibin. Yên êrîşkar jî ji dûr ve dixwazin di navbear wan de bazdin, çiv bidin xwe û herin dagê hêl bikin. Dema êrîş dikin heger zêrevan destê xwe li kê bidin, ew ji lîstikê derdikeve. Hejmara wan kêm dibe. Na ku êrîşkar di nav du an çend zêrevanan de bazde û dest lê nekeve. Ew zêrevanên ku di nav wan re bazde, dikeve. Ji êrîşkeran yek derbas be û here dagê bigre, lîstik diqede.

# Xwarin

Xwarinên Amedê gelek in, lê em ji wan yên herî bi taybet û balkêş bi awayekî berfireh dinivîsin û yên mayî jî bi kurtî li jêr nav û malzemeyên wan pêşkêş dikin.

**Kutlik** →

- du pîvazên hişk
- sê kevçî rûn
- goştê hûrkirî
- kevçiyekî biçûk xwê
- îsota reş û ya sor (hûr)
- kevçiyekî biçûk kişnîş
- nîv qedex gûzê hûrkirî.



Ji bo hevirê kutlikê:

- qedexeke avê savar ji bo kutlikan
- şûşeyeke avê danê hûr
- kevçike biçûk xwê
- kevçiyekî biçûk îsota sor ya hûr
- kevçiyekî biçûk kişnîş
- av li gor hevirê wê

Çêkirina wê:

Qalikê pîvazê hişk qaş bikin û bişon. Piştre hûr hûrî bikin. Di taweki de heta rengê pivazê vediguhêze, sor bikin. Piştre goştê hûrkirî bera ser pîvazan bidin. Dawî xwê, îsota reş û ya sor, kişnîş û nava gûzan berdin ser. Piştî çend deqeyan tawa xwe daynin ciheke hênik ta ku goştê kutlikan sar bibe.

Ji bo hevirê kutlikê jî, dan û savara kutlikê berdin ser siniyê. Xwê, îsota sor, kişniş, îsota reş berdin ser dan û sawarê. Qedex û nivek av berdin ser û baş lihevxin. Piştre tişteke bavêjin ser siniyê û heta hevirê we hilbe, bisekinin.

Bi qasî hêkeke perçeyek ji hevirê xwe bigrin û bi tiliyên xwe hevirê xwe vekin. Şiklê hevirê we wek hêka ku hûndirê wê vala be û piştre goştê ku amadeye têxin nava wê û devê kutlikên xwe bigrin. Deh qedex av bikelînin û xwê têxin

Institut kurde de Paris

nava avê. Piştre kutlikên xwe bavêjin nava ava kelandî. Dema kutlikên we bi ser avê ketin, wan ji nav avê derxin.

Ên ku bixwazin baharatan li gor dilê xwe dikarin cur be cur têxin nav vê xwarinê. Li gor hinek hêreman piştî kutlik dikelin di nav hêkan de jî diqelînin.



**Meftûne**

- 1 kg goştê berxikan
- 1.5 kg balcanê reş
- 1 kg firingî
- 3 kevçî simaq
- 2 qedex av
- xwê û îsota sor

Çêkirina wê:
Pêşî goştê xwe bişon û têxin nav qûşxaneyekê û bidin ser agir. Piştre balicanê reş hûr bikin. Qalikê firingiyan rakin û hûr hûr bikin. Firingî û balicanên xwe têxin ser goştê ku di qûşxanê de pijiyane. Piştre xwê û îsota sor jî bikin nav. Dawî ava simaqê berdin. Bi agirekî kêm bila bikele. Piştî kelê bi germ an sar dikare were pêşkeş kirin.

Li vê herêmê meftûne bi du cureyan tê çêkirin. Yek bi kundirên tirşikê û yek jî bi balicanê reş. Ger bi kundir were çêkirin, balcanên reş nakeve nav û ger bi balcanê reş were çêkirin, kundir nakeve nav tirşikê. Li gor daxwazê ye.



**Dolme û sarme**

- pelê mêwan
- îsotê gilover ya ji bo dolme
- balcan
- xirtik
- goştê berxa (divê hûr hûr be)
- birinc
- du firingî
- qevdek bexdenûs
- nîv qedeh rûn
- rûnê dûv
- du serî pîvaz

- îsota reş û ya sor
- rîhan û nane
- ava firingî û ya îsotan
- simaq

Çêkirina wê:
Di nava teyfikekê de birinca xwe bişon û pîvaz, bexdenûs, rîhan, nane, firingî li ser hev hûr bikin. Piştre goştê xwe û rûnê dûv (ên ku bixwazin dikarin hinek dan di nav rûnde sor bikin) ava îsot û firingiyan jî bike nav. Piştre xwê, îsota reş û ya sor hemûyan baş lihev bixin.
Îsota gilover, balcan, xirtik û pelên rezan (lehane û li gor daxwazê hwd.) dagirin. Di nav qûşxaneyeke mezin de ava simaqê jî berdin ser û bidin ser agir. Piştî kelê mirov dikare bi mast, û hwd serwîs bike.

**Ciger**



- ciger
- xwê
- îsota sor
- îsota reş

Çêkirina wê:
Ciger bi cetî cetî tê hûrkirin û bi hemû baharatan ve tê amade kirin. Piştre li gor daxwazê ciger bi şîşîkan ve li ser agir tê pijandin. Cigera Amedê xwedî taybetiyeke mezin e. Kesên mêvan an ne mêvan li vî bajarî ku ciger nexwaribe hema hema tuneye. Li her taxê Amedê cihê cigerpêj hene. Li Amedê xelkê bajêr taştê ya xwe bi cigerê dikin. Serê sibehan zû li kuçeyan cigerpêjên seyar hene. Xelk li ber wan dikeve dorê.



**Mehîr**

- dan
- hêk
- xwê
- mast
- nahne an kereng (li gor daxwaza mirov)

Çêkirina wê:
Pêşî danê xwe bikeline, piştre di taseke mezin de mastê xwe bi avê hêdî hêdî ron bikin. Hêkê bi xavî bike nav. Piştre xwê bike û li ser agirê kêm hêdî hêdi bikelîne. Heta kelandina mehîre divê bi heskeke were tevdan. Li gor daxwazê nane an jî li gor demsala wê kereng di nav de be, tama wê xweş dike. Mehîra ojînal ne bi mast, bi dew tê çêkirin.



**Tirşik**

- goşt
- firingî
- balcan
- sîr
- xwê
- îsota sor
- îsota reş

Çêkirina wê:
Pêşîn di qûşxaneyekî de goştê xwe sor bike, piştre palcan, îsot û firingiyên xwe berde ser. (hemû divê werin hûrkirin). Piştî wê çend serî sîr û xwê, îsota sor û reş berde nav. Li ser agirê kêm hêdî hêdî heta were çêkirin. Kesên bixwaze dikare ne di qûşxanê de, herweha di dêzikê de jî çêbike. Ger çend cureyên din li vê xwarinê zêde be, wê çaxê mirov dikare bibêje guveç jî.

Institut Kurde de Paris

**Kelepaçe:** Ser û pêyê berxik an ya pezan, hûr û rodiyên wan, xwê, sîr, (ji bo hûr û rodiyan birinc, ava isot û ava firingiyan, xwê û li gor daxwazê çend cure baharat.)
**Turlî:** Goştê berxikan, xirtik, balcan, îsot, firingî, fasûlyê şîn, pîvaz, ava îsot û firigiyan, xwê û rûn.
**Çirtme:** Xirtik, pîvazê hişk, xwê, rûn, îsota reş û ya sor.
**Helîse** (babaqanûç): Balcan, hêk, sîr, rûn û xwê.
**Şorba Nîska**: Nîskê sor an yê şîn, xwê, îsota sor, nehne û av. (li gor daxwazan gêzer û kartol jî tê bikaranîn)
**Nanê Sêlê:** Arvan, av, xwê, rûn.
**Patîle:** Arvan, av, xwê, rûn, penêr an torak an goştê hûrkirî, pîvazê hişk û cureyên baharatan.
**Çorek:** Arvan, şîr, hêk, rûn, hevîrtirş, xwê, rişrişk, mehlep, kûncî û cureyên baharatan.
**Nanê Bihêk:** Nan, hêk, rûn.

**Çend şîranî**

Qedeyifa hûnandî ya bi gûz, fistik û bi qeymak: Qedeyifa têl bi têl, (li gor daxazê gûz, fistik an qeymak) şekir, rûnê nivîşk, av.

**Helawa arvan:** Arvan, şekir, av, rûn.
**Şilekî:** Arvan, av, rûn, xwê, şekir, gûz.
**Devşewitî:** Dims, nan, rûnê nivîşk û av.

Institut kurde de Paris



Deşta Amedê û bendava Fûrtaxşê (Devegeçidi)
Foto: Nejat Satici

Institut kurde de Paris

## Ax û çandinî

Deştên Amedê yên bi xêr û bêr di dîrokê de bûne belayê serê Amedê û av ji devê dagîrkeran birine. Loma Amed tim bûye qada şer. Artêşên Roma, Pers, Ereb û Osmanî bi berhemên deşta Amedê xwedî bûne. Di vî warî de dokumenta dîrokî ya herî balkêş û berbiçav deftera bacan (tahrîra) a destpêka serdema Osmanî ye. Li gor Deftera Tahrîra sala 1564an ji tene, mêwe û heywanan baca salane ku wek akçe ji Amediyan girtine weha ne:

Ji genim 2.259.990, akçe, ceh 355.894 akçe, pembo 144.300 akçe, çeltûk 44.764 akçe, bostan 50.342 akçe, rez 2.070 akçe, hingiv 9.220 akçe, heywan 295.000 akçe bac dane dewleta Osmanî.[112]

[112] Prof. Dr. Muzaffer Arıkan, Prof.Dr.Refet Yinanç, Prof.Dr. Mesut Elibüyük, Yrd.Doç. Dr. Yilmaz Kurt, Diyarbekir Vilayeti Mufasal Tahrir Defteri, cilt -1 Ankara



Herêma gundên Tepe û Tilham.

Institut kurde de Paris



Îro qada parezgeha Amedê bi giştî 15.355 $km^2$ ye. Ji vê axê 1.535.00 hektar dikare li ser çandinî were kirin. Lêbelê heta niha ev beş hemû nehatiye çandin. Ya ku heta niha çandinî li ser hatiye kirin 779.762 hektar e. Yên mayî beyar û bêxwedî mane. Li gor lêkolîna DSI ya sala 2009an li parezgeha Amedê 695.923 hektar dikare çandinî lê were kirin û ev jî ji %60ê axa Amedê dike. Ji vê 114.662 hektar tê avdan. Li gor muduriyeta ziretê ya bajarê Amedê ev axa ku dikare çandinî lê bêkirin, çar beş in. Ev beşkirina axa çandinî li gor cure û berhemdariya axê ne. Beşa yekem ku axa herî baş û berhemdar e, 144.146 hektar e. Yên din jî weha ne. Cureya duyem 209.237 h, cureya sêyem 148.150 h û cureya çaram 199.414 h e. Serokê TSO (Odeya, Senayî û Bazirganiya) Amedê Galip Ensarıoğlu di konferansa "*Firsatlar Diyarin´da*" dibêje ku: "*Heger teknîka nûjen a avdanê tam were bi kar anîn, wê demê dikare ji %57 axa Amedê bibe avî...*"[113]

Axa parezgeha Amedê ji 1/3 deşt e û bi piranî derdora çemê Dîclê û çemên din ên ku tên ser Dîclê. Dîcle ji Gêlê şûn ve, di naverast û deştan de derbas dibe. Li bakur çemê Fûrtaxşê, li bakurê rojhilat çemê Zeynkan/Hev (Ambar)[114], li rojhilat çemê Mûsiyan (Pamuk), li başûr çemê Reş, Lûgus, Stewrê û li rojava di navbera Amed û Siwêregê de çemê Hawarê hene.

Şeş deştên mezin di nav tixûbên parezgeha Amedê de ne. Ji van her şeş deştên mezin ên du ji wan bi tevî di nav tixûbê navenda Amedê de ne û çar din jî beşek ji wan dikeve nav tixûbê axa navendê û beşek jî dikevin nav tixûbên navçeyan. Wek nimûne di navbera Amed û Bismil, Amed û Çinar, Amed û Erxeniyê, Amed û Farqînê de ne. Ev şeş deştên mezin ku bi ber û bereket û ambara tene ne (dexlûdan) in, ev in:

**Deşta Amedê**, di navbera deşta Kilkî û deşta Qaraxanê de ye. Deşta herî mezin a Amedê ye. Mezinahiya wê 400 $km^2$. Axa wê

---

[113] www.kobiden.com

[114] M. E. Borzaslan di Ansiklopediya xwe de dinivîse ku navê çemê Ambarê, çemê "Zeynkan" e. Lê Şevket Beysanoglu jî çemê "Hev" dinivîse. Beysanoglu, Diyarbakır Tarihi, cilt 1. Sayfa 260 binêre.

Institut kurde de Paris

jib o zad û tene gelek kêrhatî ye. Berê bêtir çandiniya genim, ceh, nok, nîskan dihatin kirin. Niha, beşek jê avî ye. Bi genim û ceh re pembo, û misir jî tê çandin.

**Deşta Gewran**, dikeve navbera navenda Amedê û Erxeniyê û piraniya axa deştê dikeve nav tixûbên bajaroka Erxeniyê. Deşta Gewran 15.000 hektar e. Berê deşteke bejî bûn û bi tenê dexl û dan dihatin çandin. Piştî çêkirina bendava Fûrtaxşê û Dîclê piraniya vê deştê bûye avî. Bi çandina genim û ceh re di van salên dawî de giranî dane ser çandina pembo.

**Zincîredeşt ên li ber** çemê Dîclê, ev deşt li derdora çemê Dîclê û çemên din ên ku tên ser Dîclê wek zincîre ne û hev temam dikin. Dikeve rojhilatê Amed û çemê Dîclê, Zeynikan (Ambar), Mûsiyan û heta deştên Farqîn û Bismilê didin ber xwe. Mezinahiya van zencîredeştan 6000 hektar e. Ev zincîredeştên derdora çemê Dîclê û yên xwedî axa bi herî ber û bikêrhatî ne. Axa wan alîwînyon e. Di van salên dawî de gelek cihên van zincîredeştan bûne avî. Genim, ceh, nok, nîsk, pembo, tutin, misir, zebeş, petêx û hwd. tên çandin.

**Deşta Kilkî**, di navbera Amed û Çinarê de ye û di nav axa Çinarê de berdewam e. Mezinahiya wê 25.000 hektar. Berê bejî bû, bi tenê dexlû dan dihatin çandin. Niha bejek jê avî ye. Li başûrê Çinarê Bendava Reş (Göksu) çêkirine û ji Dîclê cihên din û avdanî tê kirin. Li vê herêmê piraniya çandiniyê dîsa genim û ceh in.

**Deşta Behremkî**, di navbera Amedê û Bismilê de ye. Piraniya axa deşta Behremkî dikeve nav tixûbên Bismilê. 18.000 hektar e. Mirov dikare bêje axa deşta Behremkî ya herî bi ber û berhemdar e. Beşa derdora çemê Dîclê alîwînyon e. Niha li vê deştê çandina pembo û misir dikin. Herweha zebeşên Amedên yên bi navûdeng li vê deştê li ber ava Dîclê tên çandin. Ji aliyê ber û kêrhatina çandinê ye axa herî baş li vir e.

**Deşta Qerexanê**, ji navenda Amedê dest pê dike diçe heta Qerecdaxê. 10 000 Hektar e. Deşteke volkanîk e. Bi kevir û berên volkanîk tije ye. Deşteke bejî ye. Zêde ne bi ber e. Li hinek derê wê çandiniya genim, ceh, nok û nîskan tê kirin. Berhemên sala 2008an di destê me de hene. Lê mixabin di sala 2008an de baran nebarî û berhemên cot û cebariyê gelek kêm bûn. Li gor ve bûyera hiş kayiyê dîsa encam gelek bilind e.



Gundê Çaroxî - Arepyenice

53.000 malbat bi çandinî ve mijûl in û aboriya xwe bi hatina çandiniyê dikin. Di her malbatekê de 5 kes hebin nêzîkî 300.000 kesan dike ku debara wan li ser çandiniyê ne.

Li deşta Amedê, Bismil, Farqîn, deşta Gewran pembo tê çandin. Li Tirkiyê nîvê berhemên pembo li Kurdistanê ye.[115] Li Kurdistanê jî Riha yekem û Amed duyem e. Li parezgeha Amedê bi giştî 50.518 hektar çandiniya pembo tê kirin. Li ser riya Amed û Rihayê fabrîkayek a pembo heye. Qada fabrîkê li ser 160 hezar hektar e. Di fabrikê de 500 karker kar dikin. Di vê fabrikê de Marka Puma jî tê çêkirin.

[115] Dr. *Çetin Karademir Bolgemizde pamuk tarımının mevcut durumu, sorunları ve çözüm önerileri,* Diyarbakır Ticaret Borsası Borsa 21, sayı 30, Kasım Aralık 2009 ocak 2010, s. 35

Statîstîkên sala 2008an weha ne.

| Navê berheman | sal | Zeviyên cotkirî (de.) | berhemdarî (ton) |
|---|---|---|---|
| genimê makarne | 2008 | 1733600 | 156121 |
| genimê nan | 2008 | 1881000 | 204992 |
| ceh | 2008 | 949700 | 70987,50 |
| nîsk | 2008 | 685381 | 27568,47 |
| nok | 2008 | 122583 | 13287,32 |
| misir/gilgil | 2008 | 71365 | 71294,30 |
| celtûk/birinc | 2008 | 15233 | 6829,45 |
| pembo | 2008 | 462218 | 193374,20 |
| kolza | 2008 | 70 | 24,20 |
| berbero ji bo rûn | 2008 | 20200 | 1898 |
| kuncî | 2008 | 3075 | 155 |
| fesûliye | 2008 | 2279 | 1750 |
| tutin | 2008 | 26650 | 3668,25 |
| gilgil (Slajlık) | 2008 | 32144 | 114905,50 |
| colik (polke) | 2008 | 16000 | 10495 |
| nefel | 2008 | 5745 | 6286,90 |
| fîx | 2008 | 49400 | 24160 |
| kizin | 2008 | 11260 | 3206 |
| firingî | 2009 | 22109 | 66196 |
| balcan | 2009 | 7546 | 19129 |
| arû (xiyar) | 2009 | 9360 | 23520 |
| îsot | 2009 | 9421 | 12639 |
| pîvaz | 2009 | 1684 | 2505 |
| sîr | 2009 | 470 | 280 |
| petêx | 2009 | 19870 | 56691 |
| zebeş | 2009 | 47040 | 210001 |

Li gor salan makîne û alavên çandiniyê

| Nav alavan | 2005 | 2006 | 2007 | 2008 | 2009 |
|---|---|---|---|---|---|
| traktor | 8.621 | 8.687 | 8.762 | 8.749 | 8389 |
| kotana traktorê | 7.691 | 7.727 | 10.071 | 8.649 | 9257 |
| kultivator | 8.134 | 8.172 | 8.198 | 8.205 | 8614 |
| diskaro | 1.368 | 1.381 | 1.300 | 1397 | 1376 |
| mibzer (hebûbat) | 1.524 | 1.552 | 1.561 | 1.589 | 1697 |
| kombîne (mînzer) | 1.113 | 1.134 | 1.150 | 1.154 | 1125 |
| giyadirûn | 432 | 440 | 440 | 492 | 506 |
| motopomp (el-termîk) | 1.972 | 1.992 | 887 | 893 | 858 |
| romork | 8.333 | 8.376 | 8.445 | 8.458 | 8157 |
| pembodirûn | - | - | 60 | 65 | 65 |
| genimdirûn ( biçer) | 110 | 115 | 117 | 141 | 143 |



Çandinıya pembo ji deşta Diyarbekirê
Foto: Ahmet Dogru

## Berhemdariya mêweyan

Di zemanê berê bêtir li navçeyên bakurê Amedê ku li herêmên çiya ne mêwe hebûn, lê di van salê dawî de êdî li navçeyên deştê jî berhemdariya mêweyan tê kirin. Qadên rez û bexçeyan mezin û berfireh dibin. Li gor statîstika TUİK a sala 2009an li navçeyên Amedê rewşa qada mêwedariyê li jêr e.

| Navçe | Qada berhemdariyê (da) |
|---|---|
| Bajarê Nû (Yenişehir) | 359 |
| Bismil | 2920 |
| Çêrmûg | 40550 |
| Çinar | 6874 |
| Çingûş | 29370 |
| Erxenî | 36850 |
| Farqîn | 17884 |
| Gêl | 13875 |
| Hezro | 8901 |
| Hêne | 17010 |
| Karaz | 470 |
| Licê | 36247 |
| Pasûr | 17990 |
| Peyas | 302 |
| Pîran | 26821 |
| Rezan (Baglar) | 28 |
| Sûr | 781 |
| Giştî | 257232 |

Çavkani: TUİK 2009

Institut kurde de Paris

# Rez û pez

Li navçeyên, Pasûr, Licê, Hêne, Pîran, Gêl, Erxenî, Çêrmûg, Çingûş, Karaz, Hezro û Farqînî gelek rez hene. Rez û rezvanî li van herêman her ku diçê bi awayên nûjen tên xwedî kirin. Tirî û berhemên ji tiriyê li Amedê tên firotin û gelek gundî debara xwe bi rez û rezvaniyê dikin. Ji tirî, şîre, doşab (dims), eqîd, bastêx, kesme û benî (meşlûl) çêdikin. Dema Ermenî li herêmê hebûn, mey (şerab) jî çêdikirin, lê ku Ermenî li herêmê neman û çûn, mey jî bi wan re bar kir û çû. Niha li herêma Erxenî, Çêrmûg, Çingûşê dest bi rezvaniya modern kirine. Herweha li deşta Amedê jî şirketên Fransî û amediyan di warê rezvaniya modern dixebitin. Ev şirket li devera gundê Qerebaşê li ser 80 berecot erezî 20.000 mêwên fransî yên meyê çandine. Dest bi çêkirina fabrîkaya meyê kirine. Dê 300 dê karker di fabrîkê de bixebitin. Navê meya ku çêbikin Şato Mezopotamya ye û bifroşin derî welêt.

Li herêmê Tirî û bastêxa Gêl, Erxenî û Çermûgê, beniyên Licê yên kefê bi navûdeng in. Li herêma Amedê navên cureyên tirî:

**Taannebî:** Eraqê wê pir xweş e.

**Vankî (Vengî):** Hebûbên(libikên) wê hur in. Ji yên hişk eraq tê çêkirin

**Vankiya Sor:** Hebên wê gilover in.

**Hesenî**: Spî ye.

**Tiriyê Reş**: Tiriyê mey e û li herêma Erxeniyê zêde ye.

**Heftber**: Salê çend caran tirî digre loma jê re heftber dibêjin.

**Mezrûmî:** Spî ye hem ji bo şire û hem jî dibe mey.

**Balcanî:** Reş e û hebên wî mezin in. Di rengê balcanê de ye. Loma jê re balcanî dibêjin.

**Rezaqî:** Tiriyê çûkan

**Şekirî:** Şîrîn e.

**Şamî:** Ji bo mewijan e.


**Şîre:** Ji bo bastêx û beniyan e.

**Gergerî:** Ji bo dimsê (doşab, mote) ye.

**Qirpok:** A xwarinê ye û postê wê sert e. Dema mirov dixwe dike qirpe qirp.

**Omerî**: Ji cureyek tiriyê herêma Omeriyan.

Institut kurde de Paris



Rezek li Gêlê
Foto: Aşkın Zaman

## Darîstan

Niha piraniya axa parezgeha Amedê deşt, qerac û li herêmên bakur jî hinek çiyayên zilût hene. Dar û ber gelek kêm in. Di dema Vegera Deh Hezaran a li Kurdistanê, Îskenderê Mezin û Împeratoriya Roma û Bîzansê de tê gotin ku li herêma navendê ya Amedê daristanên mezin û gurr hebûne. Ji ber sedemên şerên giran û dijwar ku li herêmê qewimîne, guhertina avhewayê, şewat û birina dar û beran niha piraniya herêmê bûye qerec, çol û zilût in.[116]

Di serdema Osmanî di salên 1800an de li derdora bajarê Amedê êdî daristan nemane. Dewletê qanûnameyeke derxistiye û kiriye rê ku kî 15-20 bar êzîng bide dewletê ew ji leşkeriyê muaf dibe. Xelkê Amedê heta Qerecdaxê çûne û ezing anîne. Ji ber vê yekê Qerecdax rût û zilût bûye.[117]



Zevî û daristan li Gêlê
Foto: Aşkın Zaman

Di sala 1870î de ji bo ku riya navbera Amed û Siwêregê çêkin, Waliyê Amedê yê wê demê Kurt Ismail Paşa 25 km ji Qirxalî (Pirincikê) şûn ve dar û beran daye birîn û rê vekiriye.[118]

Dîsa di heman pirtûkê Hüseyin Abdioglu dibêje ku:

*"Li gor gotina kalên min li Qerecdaxê gelek daristanên gurr hebûne. Havînan xelk diçûn li wir kepir çêdikir û kon vedigirtin. Heta weha qelebalix dibû ku bezazan li wir dikan vedikirin."*

[116] Şemseddin Sami (wergera M. Emin Bozarslan), *Tarihdeki İlk Türkçe Ansiklopedide Kürdistan ve Kürtler*, sayfa 95, Deng Yayınları, Istabul- 2001 behsa vê mijarê dike.
[117] Şeyhmus Diken, *Diyarbakir diyarim, yitirmişem yanarim*, Iletişim Yayınları, s. 282
[118] A. Bilal Altunboga, *Diyarbakir folklorundan Kesitler*, s.30

Institut kurde de Paris



Herweha ji bakur ve ji Seyrantepe, Fûştax û Gêlê, ji aliyê rojhilat ve ji Qirxleran, Qehbî, Kitirbil, Tilelo, çemê Zeynikan, Qadiyan û gelek cihên din hemû rez, bexçe, bi dar û ber bûne. Tê gotin ku serokê Eşîreta Milî û Serokleşkerê Alaya Hamidiyan Îbrahîm Paşayê Milî bi leşkerên xwe ve daristan dane ber agir û şewitandine."

Cihên bi dar û devî li bakurê rojhilat, bakur û bakurê rojava ne. Ji rojhilat ve Pasûr, Licê, nîvê Farqîn. Hezro, Karaz, Hêne, Pîran, Gêl û Erxenî, Çêrmûg, Çinguş çiya û naverastên bi dar û ber in. Navenda Amedê û bajarokên din li deştê ne û bê dar û ber in. Rûerd û axa Amedê bi giştî ji %37 çiya, %32 deşt, %29 navrast û girik û %2 jî zozan in.

Li gor potansîyel cureyê bikaranînê jî axa Amedê weha ye:

Axa ku ji bo çandiniyê destdide 801 834 hektar e. Ji wê 683.437 hektar tê çandin ku ji %45 dike. Çayir û mêrg 230. 000 hektar ( %25). Dar û devî 384 662 hektar ( %23.) Li Amedê 322 gundên ku di nav daristanê de ne hene. Eraziyên din 85 703 hektar ( %5). Ji van 680 964 hektar avî ne. Bi tevî: 1 535 444 hektar (%100).[119]



## Girên dîrokî

Di nav van deşt û naverastên Amedê de gelek girên dîrokî hene. Heta niha bi qasî ku hatiye tespît kirin, di nav tixûbên parezgeha Amedê de ji 4 hezaran bêtir gir hene. Bi kurdî gir, girik, qele, kortik, gaz, til an jî tepe dibêjin. Li başûrê Amedê wek herêmên Bismil û Çinarê bêtir tepe û li bakurê Amedê jî bêtir gir dibêjin. Piraniya van gir an jî tepeyan li herêmên deşt û naverastan in. Li deşta Amedê, Çinar û Bismilê gelek in. Piraniya van giran nêzîkî çem û newalan in. Ev girikên han şûnwarên şaristaniyên kevn in. Bi taybetî berê gund an bajar bûne. Piraniya wan bi hezar salan berî zayînî hatine avakirin. Xaniyên wan ji axê bûne û xanî gelek di nav hevdu de bûne. Ji ber sedemên erdhej, karesatên din ên suriştî, talan û wêraniya şer xera bûne û bûne girikên ji axê. Axa wan repisîne û bi demên dûr û dirêj bûne gir. Gir ji bo

[119] Rıfat Dag, *Diyarbakır Ticaret ve Sanayi Odaları*, Sayılarla Diyarbakır, s. 24-199

Institut kurde de Paris

agahdariyê jî bi kar anîne. Îro kîjan ji wan were kolandin ji bin axa wan girikan xanî û avahî derdikevin. Di van salên dawî de arkeologan di hinek giran de lêkolînên arkeolojîk kirin û hîn dom dikin. Dîroka 10 hezar salan derxistin holê. Me di beş ê gundan de gir li ku ne û taybetiyên wan çi ne yek bi yek rêz kirine. Lê hezar mixabin defînekar gelek girikan xera kirine û zerareke mezin dane dîroka hêrêmê. Her girek dîrokek e. Gelek gund navên xwe ji girên nêzîkî xwe girtine.[120]



Girê Gozelê-Çinar
Foto: Ji arşiva şaredariyê

## Qerecdax

Qerecdax dikeve aliyê rojavayê Amedê. Ji navenda Amedê dest pê dike. Navê xwe jî *qerec* digre. Di kurdî de *qerec* cihê bilind, axa bêber ku debir û çandinî li wir nabe. Qerecdax di navbera Amed, Siwêrek û Mêrdînê de ye. Çend navên wî hene. Navê herî kevn Kaşyarî ye. Qada Qerecdaxê gelek berfireh e. 30 km dirêj û 14 km berfireh e. Taybetiyeke Qe-

[120] Ji wan 4 hezar girên dîroki yen li Amedê çend nimûne: Tilelo, Axçaqele, Axtepe, Tepe, Tepecûk, Girê Izêr, Tepê Baravan, Girê Talihî, Girbelek, Kortepe, Tilham, Tilşam, Tiltapan, Tilmîn, Tilik, Tilêlek, Heygecuk, Tirbespî, Tiletin, Tilê, Tihuzûr, Pîrhuseyn, Tuşhana, Kerx, Kefercin, Wersil, girê Feynterê, Telhum, Termil, Zengîgil, Giryan, Siltantepe, Melkî, Cimşîd, Purnak, Patrik, Qaziztepe, Qazûxtepe, Goktepe, girê Dadimê, Arpatepe, Boztepe, Çayirtepe, Çoltepe, Esentepe, girê Cano, Girikê Hecî Fîraz, Goztepe, Seyrantepe, Girên Ziyaretê, girê Seletê, Matarê, Kenan û girê Kerxa Kîkan, Çorapa, Tepecûk, Batil, Şiira, Kortik, Qeretepe, Xincika, girê Pomaxê, girê Şixre, girê Colû, Tilereb, Gewrek, girê Herbetalê, girê Şînko, Giregûs, Terbîle, Named, Hato, Salkor, Ziyar, Xarmantepe, Simaqî, Heqiyan, Tiqadî, Qûçakera, girê Mezre, girê Qilicbaba, girê Mego, girê Cedelî, girê Pîrehmedê, girê Qalxana, girê Qocalî, Şêxsiwar, girê Tayan, girê Lexeri, girê Xidiran, girê Sosinê, girikê Bervanê, girê helda, girê Hesendeliya, girê Mezrika Hêvo, girê Omera, Girkovî, girikê Boto, Girbilok, Malê Gir, Girkinyat, girê Delûcan, girê Şelbetin, girê Laboyn, girê Brehîm, girê Tercilê, Girdikan, Girsalat, girê Qetînê, Girîmark, Girêsonê, girê Goman, girê Zerekê, Banegirsê, Girşot, girê Şêxmalan, girê Himbilê, Tilgaz, Tilolûg, girê Abasiyê, girê Şahabana, girê Tahli, girê Asbeka, girê Dêmi, girê Zêra…



recdaxê jî ev e ku mirov bilindbûna wê ferq nake; her ku diçe bilind dibe. Qerecdax volkanîkê vemirî ye. Cihê herî bilindê wê Mêrgemîr e ku 1957 metre bilind e. Lê gelek cihên wî yên dol û asê jî hene. Her der kevirên bazalt ên reş in. Lı Qerecdaxê gola Hestiya heye. Gola Hestiya Delavê pez û dewarên gundiyên derdorê ye.

Evliya Çelebî di salên 1650an de di Seyahetnameya xwe de dinîvîse ku Qerecdax bi dar û ber bûye. Lê hezar mixabin niha rût û zilût e. Bi tenê li herêma Bedro dar û devî mane. Di mehên biharê de kerengê çiya derdikevin û li Amed, bajar û bajarokên derdorê difroşin. Li ser kerengê çarîneke weha heye ku Şeyhmus Diken berhev kiriye:

*"Kereng digihîje li kaşan*
*Xwarina bergîr û wehşan*
*Kereng li çi digere*
*Li mala wezîr û paşan!"*

Colek pezê mor ►

Institut kurde de Paris

Tê gotin ku bi qasî 250 cureyên gul û giyayên endemîk li Qerecdaxê hene. Ji 36 salan vir ve ye ku Qerecdax bûye cihê lêkolînên zanyarî. Arkeologan tespît kirine ku 11.000 sal berî niha genimê yekgûşî (einkorrn) li vir hatiye çandin. Ji ber ku erd serberjêr û kevir e, çandinî nabe. Bêrê li hinek herêmên çiyê ris (birinc) dihat çandin û birinca Qerecdaxê bi navûdeng bû. Niha ew jî nema ye. Qerecdax çêrgeha pez û dewaran e. Hêştir û konên reş ên koçerên Qerecdaxî bi navûdeng in.

## Xwedîkirina pez û dewaran

Berê parezgeha Amed û yên cîran ji aliyê xwedîkirina pez û dewar ve gelek dewlemend bûn. Çandinî û xwedîkirina pez û dewar paralel dimeşiyan. Hem goşt hem jî heywanên zindî hewqas pir bûn ku gelek caran difrotin dewletên Sûrîye, Iraq û yên din ên Rojhilata Navîn. Herweha şîr û berhemên ji şîr gelek zêde, dewlemend û bi qelîte bûn. Şîr, mast, tomast, rûn toraq û dew li parezgeha Amedê her zêde bûn. Penîrê Amedê yê *kezî* (hunandî) li cîhanê bi navûdeng e. Herweha mastê gamêşên wê jî kêr lêxî naye birîn. Li navenda Amedê çarşiya Mast û Penîr bi serê xwe bûn. Îro jî çarşiya Penirvanan li nêzîkî hemama Deva li ser cadeya Gazî ye. Rewşa pez xwedîkirin di van 30-40 salên dawî de her ku çû xerabtir bû. Çend sedemên vê hene.



Li parezgeha Amedê senayî tune an jî gelek kêm e, hîn jî debara xelkê ji %65 li ser çandinî ango cotyarî û heywan xwedî kirinê ye. Heywan xwedî kirin bi metodên kevn e. Cure û cinsên heywanan jî yên herêmiyên hezar salan in. Berî ku makîneyên wek traktor û genimdirûnê werin herêma Amedê li gundên deştê bêtir heywan dihatin xwedî kirin. Wê demê ciyê çêrê gelek bûn. Dema makîne ketin nav zeviyan xwediyên erdan bi taybetî axayên gundan her derî cot kirin û ciyên çerê nema. Gundî yên deştê êdî nikaribûn pez xwedî bikin. Bi tenê herêmên çiya man ku dikevin bakurê Amedê. Di van 20 salên ku li herêma Amedê bi taybetî li herêmên çiyê şer û pevçûn xurt bû. Gund û xanî hatin şewtandin. Yên mayî jî koçber bûn. Çiya û zozan hatin qedexe kirin. Êdî li herêmê derfetên heywan xwedîkirinê nema. Xelkê gundan koçberê Amedê û bajarên din bûn. Bêkarî zêde bû. Goşt û berhemên ku ji şîr çêdibin gelek kêm bûn û yên ku hene jî têr nakin.

Vêga dewlet dixwaze vê valahiya goşt û berhemên ji şîr li derdora navenda bajêr manderayan çêbike. Bi navê Organîzeya heywan xwedîkirina li Amedê ciyeke mezin li gundê *Elwaniya Jorîn* ku li ser riya Amed û Siwêregê û 20 km ji Amedê dûr avahiyan çêdike. Pêşengiya ve projê borsaya bazirganî ya Amedê dike. Şaredarî, dem û dezgehên din jî piştgirî didinê. Li gor agahdariyên serokê Borsaya Bazirganî ya Amedê ev avahî li ser 2400 berecot eraziyê tê çêkirin. Di nav de108 ciyên kar hebin. Bi qasî 4.000 kesî kar bikin.

Li gor statîstikên sala 2009an li parezgeha Amedê hejmara heywanan:

| babet | hejmar |
|---|---|
| dewar | |
| dewarên binecih | 123.435 |
| melez | 67.088 |
| yên ziretê | 27.023 |
| gamêş | 3.750 |
| pez | |
| mîh | 466.693 |
| bizin | 145.065 |
| balinde | |
| mirîşk | 404.800 |
| elok | 59.603 |
| qaz | 15.536 |
| werdek | 13.730 |
| kewarên mêşan | |
| kewarên nûjen | 64.388 |
| yên berê | 2.866 |

Institut kurde de Paris



Garanek li herêma Amedê

Li Amedê li Çaroxiyê bazara heywanan heye. Di destê şaredariyê de ye. Li wir heywan tên kirîn û firotin. Ji bo serjêkirina heywanan niha du mezbahayên modern hene ya şaredariyê jî li ber qedandinê ye. Ji derî van li Amedê ev fîrmayên jêrîn hene ku kar û xebata wan li ser heywanxwedî kirine ne:

Diyarbakır Besicilik, Diyarbakır Tarım Ilaçları, Diyarbakır Tavukçuluk, Diyarbakır Yem Sanayi, Diyarbakır Organik Tarım, Diyarbakır Tarım Urunleri, Diyarbakır Tohumculuk, Diyarbakır Yumurtacılık, Diyarbakır Tarım Urunleri Ihracatçıları, Diyarbakır Yaş Sebze ve Meyve…

## Serçavî û bîrên petrolê

Di sala 1945an de li herêma Amed û Sêrtê dest bi kolana bîrên petrolê hatiye kirin. Şirketên li petrolgerînê ji berê ve li herêma Amedê li petrolê digerin. Lêbelê wê demê li herêma Têrkan çend bîrên petrolê derxistibûn. Di van salên

Institut kurde de Paris



[illegible]

Institut kurde de Paris

dawî de şirketên cuda cuda xebatên xwe yên sondajî zêde kirin. Li gelek herêm rastî petrolê hatin. Bi taybetî li bakurê navenda Amedê li herêma Têrkan hema hema li her gundî rastî petrolê hatin. Têrkan li Bakurê Amedê herêmeke mezin e. Tê gotin ku navê wê kevn Tîrîkan bûye. Dîroka herêma Têrkan diçe heta Serdema Sûbarî û Hûriyan.

Li herêma Têrkan bi qasî 200 gund û mezre hene.[121] Li herêma Amedê heta niha cihên ku petrol hatine dîtin û tê derxistin ev in:

Li gundên navend û Gêlê li Fidêlan, Axwêrana Biçûk, Axwêrana Mezin, Başil, Beykan, Îsheqan, Kurdikan, Mermera Kevn, Şahaban, Tilêlek, Tilham û Tilharman, Tişo, Bawer, Şelbetîn, Rûtan, Şaweliya, Mûsan; li Karazê li gundê Qetînê; li Farqînê li gundê Taxikê; li gundên Erxeniyê li Akçaqele, Gogicî û Termila Jêrîn, li gundên Bismilê li Girê İzêr, Tepa Baravê û li Yatansogutê birên Petrolê hene.

[121] Terkanlılar Yardımlaşma ve Kültür Dernegi..com

Piraniya petrola ku ji herêma Amedê derdixin bi tankêran dibin Pirinclika Amedê û li wir di sefikxaneyên Şirket a Petrolên Tirkiyê de disefînin û ji vir jî dibin peravê derya Spî.

Heta niha herêmên ku petrol hatiye dîtin rejiya wê weha ye. Ji %36 herêma Batmanê, ji %33 herêma Amedê, ji %18 herêma Mermerê, ji %15 herêma Dîlokê (Entebê) û ji %5 herêma Antakyayê. Di van salên dawî de li herêma Kolikê (Kehtayê) jî petrol hatiye dîtin û derxistin, mixabin berhmên wê herêmê heta niha di statîtîkan de cih negirtine. Wek xuya dike, di warê çavkaniyên petrolê de herêma Êlihê yekem û ya Amedê jî duyem e.

Bîrên petrolê li Karazê
Foto: Hüsamettin Bahçe



Institut kurde de Paris

# Medya

Heta niha rojname û kovarên ku li Amedê hatine weşandin bi gelek zimanan giheştiye xwendevanên xwe. Lêbelê wek tê zanîn ji destpêka Komara Tirkiyê heta van salên dawî ji aliyê dewletê ve qedexe û zilm û zordestiyeke nedîtî û nepayî li ser weşanên kurdî hebû. Têkoşîna Kurdana van 20-30 salên dawî tixûbên qedexe, çewsandin, zilm û zorê çirand. Di van salên dawîn de Amed careke din bû navenda wêje, çand û hunerê kurdî û gelên din. Her çiqas hîn jî qedexe û çewsandin û zilm û zordestî tam ranebe jî êdî Amed, bi kurdî diaxive, dinivîse, distire. Em ê bi awayekî giştî behsa medya Amedê bikin û piştre jî lîsteya nivîskar, hunermend û dengbêjên amedî pêşkêş bikin.

*"Nok çû bajêr bû leblebû!"*

**Diyarbakır gazetesi** (Rojnama Diyarbekirê) li Amedê yekem rojname ye. Di dawiya salên 1860î de ferman hatiye dayîn ku li bajarên Osmaniyan ên mezin çapxane bên avakirin. Di sala 1868an de waliyê Amedê Kurt Îsmail Paşa çapxane aniye Amedê û li parezgehê bi cih kiriye. Di 3ê tebaxa 1869an dest bi weşana Diyarbekir Gazetesi kiriye. Rojnama Diyarbekirê di heftê de carek û her rojên sêşemê derketiye. Piştî Rojnameya Erzeromê, Rojnameya Amedê li Anatoliyê rojnameya yekem e ku dest bi weşanê kiriye. Di destpêkê bi zimanê tirkî, suryanî, ermenî, kurdî û erebî jî nivîs û nûçe hebûne. Bi damezrandina Komara Tirkiyê re êdî ji derî tirkî zimanên din qedexe kirine. Di heman dem û çapxanaya wîlayetê de Diyrabekir Salnameleri (Salnameyên Diyarbekirê) jî hatine çap kirin.

Kurt İsmail Paşa di 28ê gulana 1868an de bûye waliyê Amedê. Wî 7 sal û 9 meh li Amedê walîtî kiriye. Miroveki zilmkar û barbar bûye. Gelek serî firandiye. Cihê artêşa niha kiriye Kelexane. Kesên ku li dij emrê Kurt İsmail Paşa derketine serê wan jêkiriye û avêtiye kelexanê.[122]

Bavê Silêman Nazîf, Seîd Paşa û bavê Ziya Gökalp, Mehmed Tahîr di birêvebiriya rojnamê de cih girtine û nivîs nivîsandine. Piştî wan Silêman Nazîf û Ziya Gökalp jî wek bavên xwe di vê rojnameyê de birêvebirî û rojnamevaniyê kirine. Rojnameya Diyarbekirê heta sala 1931ê ya dewletê bûye. Di sala 1931ê de firotine Tahsin Cahit Çubukçu û Zekayî Arman. Vê care wan bi heman çapxane û rojname heta sala 1963an domandine. Rojname di 94 saliya xwe de hatiye girtin.

[122] Şeyhmus Diken, *Diyarbakir dıyarım, yitirmişem yanarım*, s. 91

Institut kurde de Paris

**Peyman** di 28ê hezîrana 1908an de dest bi weşana xwe dike. Peyman rojnameyeke prîvat e, ne ya dewletê ye. Di rojnameya Peyman de nivîsên bi tirkî, kurdî, ermenî û suryanî hatine weşandin. Di rûpela pêşî de jî nivîseke Ziya Gökalp a bi kurdî heye.

**Dicle** di 13ê adara 1910an de dest bi weşana xwe dike. Rojnameya Dîcle piştî Rojnameya Peyman a duyem e ku ji aliyê şexsan ve hatiye derxistin.[123]

**Medinho** di sala 1910an de ji aliyê Naum Faik ve hatiye derxistin. Naum Faik Suryanî ye û Kevkeb Medinho bi Suryanî tê wateya stêrka welat an jî stêrka Rojhilat. Kovareke pazdeh rojî bûye. Bi zimanê tirkî, suryanî û ermenî derketiye. Ev kovar ji Amedê hata Ewropa û Amerîka hatiye belav kirin. Carinan kovar hatiye rawestandin, lê heta sala 1950î derketiye. Yeka din jî bi navê Şiforo derxistiye.

**Borazan** di 16ê sibata sala1913an de di panzdeh rojan de carek derketiye û xwediyê wê Bişar Hilmî ye.

**Mucahid** di 26ê tîrmeha 1913an de, li Amedê rojnameya Mucahîd dest bi weşana xwe dike. Êdî ji derî dewletê kes jî rojname derdixin. Lê bi tirkî ye.

**Gazi** di sala 1919an de li Amede derketiye. Rojname ji aliyê Cemiyeta Kurdistanê Beşa Amedê ve hatiye derxistin. Ekrem Cemilpaşa bi xwe çapxaneyeke biçûk dikire û li wir çap dikin. Rojnameyeke çar rûpelî ye. Çend nivîskarên rojanameya Gazi ev in. Parêzer Hacî Muhammed Efendî ku ev kes bi navê Bavê Tûjo û Hacî Axtî jî tê nas kirin, Şehîd Cemîlpaşa Cevdet, Pertew Begê Licî, Ali,[124] Mîrkatibîzade Cemil Beg û Xenîzade Reşad.[125]

**Küçük Mecbua** (Kovara Biçûk) di heftê de carek derketiye. Kovareke sîyasî, aborî û wêjeyî ye. Di 18ê tebaxa 1922an derketiye û xwediyê kovarê Ziya Gökalp e.

---

[123] Mehmet Mercan, Diyarbakır basını 140 yaşında, ww.haberdiyarbakir.com

[124] Tê texmîn kirin ku "Alî" navê Fehmiyê Bîlal e. Di gelek cihan de "Aliyê Licî" derbas dibe û yek ji damezrevanê Cemiyeta Kurdistanê Beşa Amedê ye. (nişeya nivîskaran)

[125] Ekrem Cemilpaşa, Muhtasar Hayatım, Bruksel Kurt Enstitusu Yayınları. S.33, Bruksel-1989



Institut kurde de Paris

**Halkın Sesi** (Dengê Gel) di 1ê tebaxa 1927an de li Amedê dest bi weşanê dike. Zimanê wê bi tirkî ye. Ev jî rojnameya taybet e. Yanî ne rojnameya dewletê ye ya şexsî ye.

**Dicle Kaynağı** (Serçaviya Dîclê) kovara dibistana amadeyî ya Amedê ye. Di yekê gula 1934an de derketiye. Berpirsê nivîsan Cemal Gökçe ye.

**Diyarbekir Kliniği** (Klinîka Diyarbekirê) kovareke ku di salê de çar hejmar derketiye. Di sala 1934an de dest bi weşana xwe kiriye. Xwediyê wê Dr. Ibrahim Berkan e.
Di yekê tebaxa 1939an de vê care Neşati Üstler bi navê Yeni Klinik (Klinika Nû) kovareke weşandiye.

**Yeni Yurt Gazetesi** (Welatê Nû) ev rojname di sala 1936an de ji aliyê Tevfîk Tandoğan ve hatiye weşandin. Ev rojname piştre li Wanê çap bûye. Di sala 1953an de ji aliyê Mustafa Evirgen û Yaşar Evirgen ve dîsa li Amedê dest bi weşana xwe kiriye. Berî 1960î bi navê Demokrat Yenî Yurt çap bûye û 1966an demeke navber daye weşana xwe. Piştre dîsa ji aliyê Yaşar Evirgen ve dom kiriye.

**Karacadağ** Mecmuası di 20ê sibata 1938an de dest bi weşana xwe kiriye û heta tebaxa 1950î derketiye.

**Şark Gazetesi** di 1ê nîsana 1951ê de dest bi weşana xwe kiriye. Beriya rojnameya Yenî Şark, wek rojname û kovar 'Halkin Dilli' û 'Dicle Kaynağı' piranî li Stanbul û bajarên din çap bûne, lêbelê ev ne bi awayekî sîstametik dom kirine. Piştî rojnameya Diyarbekir rojnameya Yeni Şark bi temeneke dirêj û bi sîstematîk weşana xwe domandiye.

**Şark Postası** di 7ê tebaxa 1952an de dest bi weşanê kiriye. Xwediyê vê rojnameyê Mutahît Ahmet Ketencigil e û berpirsyarê karê nîvîsan jî parêzer Şevket Beysanoğlu ye. Ev kar salên piştre ji aliyê şaredar Nejat Cemiloğlu ve hatiye meşandin. Di demeke kin de ji aliye Izzet Yıldız ve jî hatiye birêvebirin. Di 16ê nîsana 1957an de rojname bi navê Yeni Şark Postası weşana xwe domandiye.



Institut kurde de Paris

**Güven (Bawerî)** piştî Yeni Şark û dewama wê Yeni Şark, Demokrasiye Güven û pişt re di navê Güven bi panzdeh rojan de careke û wek kovareke derketiye hemberî xwendevanên xwe.

**Şarkspor** rojnameya yekem a spore ye. Li Amedê di sala 1954an de dest bi weşana xwe kiriye, lê tenê 4 hejmar derketiye. Ev rojname ji aliyê wezareta daristanê ve hatiye weşandin û İsa Bingöl jî berpirsê wê bûye.

**Birliğin Sesi** ji aliyê xwendekarên amadeyiya Dîyarbakir 5/B ve di sala 1951êde derketiye. Piştî hejmara yekem êdî derneketiye.

**Demokrasiye Güven** di sala 1951ê de rojnameya Yeni Şark dem dem navê xwe guhertiye. Wek berdewamiya wê ya yekem e. Demokrasiye Güven, Yeni

Liseya Ziya Gökalp
Foto: Nejat Satıcı



Institut kurde de Paris

Şark piştre jî navê Demokrasiye Güven girtiye. Di despêkê de di heftê de carekê û pişt re jî di panzdeh rojan carekê derketiye. Di sala 1965an de bûye kovar.

**İç-Oğuz** di sala 1952an de ji aliyê Celal Dursun ve hatiye derxistin. Tenê hejmareke derketiye.

**Dicle** di sala 1952an de ji aliyê Komeleya Mamosteyan a Dîyarbakirê ve hatiye çapkirin û tenê hejmarekê derketiye.

**Lise-D.L** di sala 1952an de ji aliyê beşa wejeyê ya dibistana amadeyiyan ve hatiye çap kirin.

**Kelek** rojnameya yekem ya qerfî ya Amedê ye. Hejmara wê ya yekem di 11ê rêzbera 1953an de derketiye. Ev rojname tenê çar hejmar derketiye. Karîkaturên rojnamê ji aliyê Mehmet Mercan ve hatine çêkirin.

**Sesleniş** di sala 1953an de dest bi weşana xwe kiriye. Zêde dom nekiriye.

**Ziraat Bilgileri** ji aliyê Muduriyeta Zîraatê ya Teknîk a Dîyarbakirê ve di sala 1953an de dest bi weşanê kiriye. Xwediyê Kovarê Sabahattin Savci ye û kovarê du sal jiyana xwe domandiye.

**Çizgi** ji aliyê Neval Gurmeriç ve di sala 1953an de dest bi weşana xwe kiriye û di heman salê de jî hatiye girtin.

**Kara-Amid** ji aliyê Sabri Şenci ve, di sala 1953an de hatiye çap kirin. Lê kengî hatiye girtin, naye zanîn.

**Fen Dergisi** di sala 1953an de li liseya Ziya Gökalpê hatiye belavkirin. Ev kovar sê hejmar derketiye.

**Ummid** ji aliyê Abdusettar Hayati Avşar ve di sala 1953an de dest bi weşanê kir iye û heta 1964an weşana xwe domandiye. Rojnameyeke du rûpelî ye.

Institut Kurde de Paris

**Yeni Oğrenci ve Kültür** ji aliyê Metin Akkoç û Abdullah Ocak ve di sala 1954an de hatiye derxistin. Ev kovar ji bo xwendekarên dibistana seretayî derketiye.

**Şark Postası** di sala 1954an de li Amedê derketiye. Nejat Cemiloğlu berpirsê nivîsan e. Rojname du rûpel e û her hejmar hezar çap bûye. Mûsa Anter û çend kesên din jî nivîsîne. Li dij zilma CHP piştgiriya DP kirine. Temenê wê saleke ajotiye.[126]

**Gökalp** ji aliyê Nejat Baturay ve di 16ê tebaxa 1954an de dest bi weşana xwe kiriye. Rojname di sala 1961an de hatiye girtin.

**Koza** ji aliyê İhsan Biçici ve di sala 1956an de dest bi weşanê kiriye. Tenê sê hejmar derketiye.

**Kara-Amid** ji aliyê Komeleya Turizim û Nasandina Dîyarbakir ve di sala 1956an de dest bi weşanê kiriye.

**Yudum** ji aliyê Mehmet Mercan ve di sala 1957an de hatiye weşandin. Tenê çar hejmar derkine.

**Gayret** ji aliyê Sait Önen ve cara yekem di 27ê Adara 1957an de dest bi weşana xwe kiriye. Weşana Gayret heta sala 1962an dom kiriye.

**Ziya Gökalp** bi navê Şehrazat Baturay di sala 1957an de rojnameya Ziya Gökalp dest bi weşanê kiriye. Di sala 1967an de jî hatiye girtin.

**İleri Yurt** di sala 1958an de li Amedê derketiye. Xwediyê rojnameyê Abdurrahman Efem Dolak e. Mudûrê kar û barê nivîsan Canip Yıldırım e. Rojname ji derî rojên yekşemê di heftê de şeş roj derketiye. Zimanê rojnameyê bi tirkî bûye, lê carnan nivîsên bi kurdî jî derdiketine. Bi taybetî Mûsa Anter bi kurdî nivîsiye.

Institut kurde de Paris

126 Li Amedê bi heman navî çend rojname an jî kovarên cihê derketine, têkiliyên wan bi hev tune.

**Neşter** ji aliyê Yekîtiya Tabîban ve ev kovar demeke dirêj weşana xwe domandiye.

**Mezopotamya** di sala 1959an de li Amedê ji aliyê Musa Anter û hevalên wî ve bi kurdî hatiye weşandin. Ji ber ku kovar bi kurdî bûye di demeke kurt de hatiye girtin û berpirs û nivîskarên wê girtine kirine girtîgehê.[127]

**Haber bulteni** ji aliyê Yekîtiya Bazirganî û Sanayî ve ev kovar hatiye weşandin. Di sala 1960an de ji aliyê Felat Cemiloğlu ve 12 hejmar derketine.

**Çaba** ji aliyê Cemiyeta Dibistana Mamosteyan ên ku mezûn bûne ve, di sala 1960an de dest bi weşanê kiriye. Ev kovar du hejmar derketiye.

**Mustakil Diyarbakır Sesi** ji aliyê Hikmet Karslıoğlu ve hatiye weşandin. Ev rojname di sala 1960i de derkiye û di sala 1967an de jî hatiye girtin.

**Yeni Diyarbakır Sesi** ji aliyê N. Şendur û Abbas Koyuncu ve hatiye derxistin. Rojnamê di sala 1960î de dest bi weşana xwe kiriye û di sala 1961an de jî hatiye giritin.

**Karacadağ** ji aliyê Sabri Şenci ve di 1962an de hatiye weşandin. Tenê çar hejmar derketiye.

**Mücadele Gazetesi** di sala 1962an de dest bi weşana xwe kiriye. Xwediyê wê Sadik Yılmaz bûye. Di sala 1980an dest guhertiye .
**Guneydoğu** ji aliyê Sabri Aytar ve di sala 1962an de dest bi weşanê kiriye. Rojname di heman salê de jî hatiye girtin.

**Öz Diyarbakır Gazetesi** di sala 1963an de bi girtina rojnameya Dîyarbakır re, bi vî navî gelek rojname derketine. Piştî weşana rojnameya Dîyarbakır Selahattin Eren rojnameya *Öz Diyarbakır* weşandiye. Lê jiyana vê rojnamê jî gelek kurt bûye. Heman rojname ji aliyê Zeki Özoğlu ve di sala 1984an de careke din derketiye.

**Doğuş** ji aliyê xwendevanên Enstîtuya Perwerdehiyê ya Diyarbekirê ve di 1964an de dest bi weşana xwe kiriye.

[127] Malmîsanij & Mahmûd Lewendî, *Rojnmageriya kurdî*-2.r.16


Institut kurde de Paris

**Özgür (Azad)** ji aliyê Yılmaz Çakın ve di sala 1964an de dest bi weşana xwe kiriye.

**Ufuk** ji aliyê M. Ali Özdemir ve di sala 1967ê de dest bi jiyana xwe ya weşanê kiriye.

**Tip Dergisi** di sala 1970î de ji aliyê Xwendekarên Tipê (tenduristiyê) ve ev kovar derketiye.

**Senin Sesin** ji aliyê Haydar Garan ve di 1970î de dest bi weşanê kiriye. Di matbaa Mucadele yê de hatiye çapkirin. Piştî demeke kurt rojname hatiye girtin.

**Milli Hakimyet** ji aliyê Hikmet Hamzaoğlu ve di sala 1970î de dest bi weşanê kiriye. Rojname bi qasî 10 sal jiyana xwe ya weşanî domandiye.

**Sur Kent** ji aliyê beşa kovarê ya liseya Ziya Gökalp ve di sala 1971an de dest bi waşanê kiriye.

**Kastal** di sala 1976an de ji aliyê Komelaya Çandî û Xwendina Bilind ya Diyarbekir ve wek hejmareke taybet hatiye çap kirin.

**Yekbûn** kovareke polîtîk e û weşana Dengê Kawa bûye. Di sala 1979an de li Amedê derketiye. Ziman bi tirkî bûye û çapa wê nîv A5 bûye. Bi awayekî nepenî hatiye belav kirin.[128]

**Hewar** rojnameyake bi kurdî ye. Li bin navê wê "Ji bo Serxwebûn û Azadiya Kurdistan" nivîsiye. Li girtîgeha Amedê li ser pêşniyaziya Mazlûm Doğan di bin berpirsiya Mehmet Hayri Durmuş de hatiye derxistin. Zimanê wê bi tirkiye. Ev rojname di girtîgeha leşkerî ya Amedê de di navbera 19 tebax û 9ê îlona 1980î de, bi destan hatiye amade kirin.[129]

**Yurtan Haberler** (Nûçeyên ji Welat) Bulteneke polîtîk e, behsa nûçê û çalakiyên PKK dike. Di 5ê Tebaxa 1980î de ji alîgirên PKK ên ku li zîndana Amedê bûne, deranîne. Di arşîvan de du hejmar mane, lê çend hejmar derketiye ne diyar e.[130]

[128] Malmîsanij & Mahmûd Lewendî, *Rojnmageriya kurdi*-2.r.30
[129] Malîsanij & Mahmûd Lewendî, *Rojnamegeriya kurdi*-2.r.33
[130] Heman çavkanî. r. 29

Institut kurde de Paris

**Olay** rojnameyeke hefteyî, ji aliyê Mehmet Masum Süer ve di sala 1981ê de dest bi weşana xwe kiriye. Piştre ji ber rewşa awarte rojname hatiye girtin. Dawî rojname wek kovareke bi deh rojan derketiye. Ev jî du hejmar derketiye û piştre hatiye girtin. Ji aliyê Mehmet Masum Süer ve ev kovar di sala 1981an de wek pêveka rojnameya Olay derketiye. Tenê du hejmar derketiye.

**Çandiya Berxwedan** di sala 1984an de girtiyên ku di doza PKKê de li girtîgeha Amedê bûne kovarê derxistine. Ev kovara di nav qawîşên girtîgehê de belav bûye.

**Çirûska Jiyan** jî di sala 1984an de li girtîgeha Amedê ji aliyê alîgirên PKK ve bi awayekî rêk û pêk hatiye derxistin. Di derheqê vê kovarê de zêde agahdarî tune.

**Diyarbakır Eyvan** di sala 1988an de ji aliyê Ali Menteş ve derketiye.

**Yeni çizgi** ji aliyê Ajansa Nûçeyan a Rojhilata Navîn (OR_HA) ve di sala 1988an de dest bi weşanê kiriye.

**Şewqa Berxwedan** di sala 1989an de li girtîgeha Amedê ji aliyê alîgirên PKK ve hatiye derxistin. Mehane bûye, li bin nivîsiye ku "Kovareke mehane ya polîtîk, çand û hunerî ye." Di heqê kovarê de zêde agahdarî tune. Bi tenê hejmara 13an ku di 30ê tebaxa 1990î de derketiye li der heye.

**GAP'ta Diyarbakır** ji aliyê Yekîtiya Bazirganî û Sanayî ve di sala 1989an de dest bi weşanê kiriye. Ev kovar du sal weşana xwe domandiye.

**Söz tv- Gaz- Gazetesi** ji aliyê Mehmet Ali Altındağ ve 1991ê de dest bi weşana xwe kiriye. Rojname hîn weşana xwe didomîne.

**Govend** li Amedê di sala 1991ê de derketiye. Kovareke mehane û bi kurdî û tirkî derketiye. Li bin navê kovarê weha nivîsiye, "Kovara çandî û hunerî/kulturel ve sanatsal dergi." Xwedî Mazhar Kara û Mudurê wê Mukerrem Ayyıldız bûne.

**Diyarbakir Festival** di sala 1995an de ji aliyê Walitiya Amedê, Şaredariya Bajarê Mezin, zanîngeha Dîcle û Mudurîyeta Çandî ve derdiketiye. Lê ev rojname jî piştî demeke kurt hatiye girtin.

**İletişim** ji aliyê Cemiyeta Rojnamevanan ve hatiye weşandin. Yekem hejmara wê di 1ê sermaweza 1996an de derketiye. Pêşî İletişim rojname bû, piştre şiklê wê gûhertine û weke kovar derxistine.

**Amida** 'Komeleya Hunermendên Amedê, wejevanan û hunerhezan' hejmara yekem di 1998an de derxistine. Xwediyê kovarê Ahmet Kaymak, gerînendeyê wê jî İhsan Fikret Biçici ye.

**Gün TV-Radyo** xwediyê weşaneke herêmî ye û bi kurdî û tirkî weşan dike

**Amed TV-Radyo** xwediyê weşaneke herêmî ye û bi kurdî û tirkî weşan dike.

**Can TV-Radyo** xwediyê weşaneke herêmî ye û bi kurdî û tirkî weşan dike.

**Kanal 21** xwediyê weşaneke herêmî ye û bi kurdî û tirkî weşan dike.

**Nur FM** (radio), bi tirkî û kurdî wesan dike. Giraniya wsana wê li ser mijarên olî ne.

**Doğan 21** (radyo) bi tirkî û kurdî wesan dike.

**Çağri FM** (radio) bi tirkî û kurdî wesan dike.

**Değişim** (radio) bi tirkî û kurdî wesan dike.

**Dengê Amedê** kovarek e ku demeke ji aliyê alîgirên PKK ve li herêma Amedê hatiye derxistin. Kengî derketiye, bi çi zimanî bûye, çend hejmar derketiye ne diyar e.[131]

**Kovara Tîgrîs**, di sala 1999an de dest bi weşana xwe kiriye. Kovareke bi kurdî û bi tirkî ye. Xwendekarên zanîngeha Dîclê derdixine. Armanc û helwesta kovarê di nav xwendekarên zanîngeha Dîclê de xurtkirina wêje û zimanê kurdî ye.

**Kulîlka Ciwanan** kovareke mehane ye. Xwedî û berpirsê wê Siraç Aktaş e. Di sala 2003an de li Amedê derketiye. Ew jî weke kovara Kulîlkê bi tenê 3 hejmar derketiye. Ziman bi kurdî ye.

[131] Heman çavkanî. r.108

Institut kurde de Paris

**Bultena Çira** di sala 2008an de dest bi weşana xwe kiriye. Heta niha çar hejmar derketine. Bi kurdî û tirkî ye. Bulten Dengê Ciwanên Kurd ên li dibistana amadeyiyan dixwînin, e. Armanc û daxwaza Çirayê di nav xendekarên amadeyiyê de wêje û çanda kurdî belav bike.

**Kovara "W"** li Amedê dest bi weşana xwe kiriye. Mehane ye û heta niha 30 hejmar derketiye. Xwerû bi kurdî ye. Di alfabeya kurdî de hinek herf li Tirkiyeyê hatine qedexekirin. Ji van herfan yek jî 'W' ye. Loma navê kovarê jî 'W' hatiye dayin. Hîn jî weşana xwe li Amedê didomine.

**Kovara Bîr** xwerû bi kurdî ye. Ji sê mehan carek derdikeve. Heta niha 12 hejmar derketiye.

**Kovara Deng** hem weşanxane ye û hem jî kovar e. Ev 21 sal in ku derdikeve. Pêşî li Stanbulê derketiye. Di sala 2004an de navenda wê hatiye Amedê. Kovareke sê mehî ye. Hinek nivîsên wê bi kurdî û hinek jî bi tirkî ne. Heta niha 85 hejmar derketine. Weşanxaneya Dengê bi sedan pirtûk bi kurdî û tirkî çap kiriye û weşandîye. Gelek sêlikên (CD) muzîkê amade kiriye.

**Dema Nû** berê li Stanbulê derdiketiye. Rojnameyeke hefteyî ye. Heta niha 351 hejmar derketiye. Bi kurdî û tirkî ye. Ji sala 2004an vir ve, li Amedê derdikeve.

**Kovara Mizgîn** bi kurdî û tirkî ye. Mizgin heta niha 67 hejmar derketiye. Piraniya nivîskarên kovarê oldar in û naveroka nivîsan jî, bi perspektîva olî doza Kurd e. Ji ber perspektîvên kurdî kovar gelek caran ji aliyê saziyên fermî ve hatiye girtin, ceza li nivîskaran hatiye birîn û berpirsên kovarê avêtine girtîgehê. Kovara Mizgînê ji aliyê Toplum –Derê ve tê weşandin. Kovar niha dernakeve.

**Kulîlk** kovareke mehane ye. Bi kurdî ye. Şakir Özyadin bi navê Deştî bi tenha serê xwe vê kovarê deraniye. Piştî hejmara sêyem weşana kovarê rawestiyaye.

**PC Kurdî** kovareke teknîki ye û mijarên wê li ser tekîna komputerê ye, ziman bi kurdî ye. Di sala 2006an de dest bi weşana xwe kiriye. Du hejmar derketiye. Ji aliyê Şaredariya Sûrê ve hatiye weşandin.

Institut kurde de Paris

**Rewşen** kovareke bi kurdî ye, pêşî li Stanbulê ji aliyê NÇM ve hatiye derxistin. Niha li ser navê Navenda Dîcle-Ferad li Amedê derdikeve.

**Banga Heq ji Kela Amedê** kovareke Îslamî, çandî û hunerî ye. Hemû bi kurdî ye.

**Azadiya Welat** berdewamiya çend rojnameyan e. Cara yekem di 22ê sibata 1992an de li Stanbulê dest bi weşana xwe ya hefteyî kiriye. Mirov dikare bêje neftname bû. Di bin zext û mercên dijwar de 115 hejmar derketiye. Di sala 1994an ji aliyê dewletê ve hatiye girtin. Piştî girtina wê, rojnemaya Welatê Me di sala 1995an de dest bi weşanê kiriye. Piştî 46 hejmaran ew jî hatiye girtin. Ligel van zixt, sansor û çewsandinên vê carê rojnameya Azadiya Welat di 21ê rêbendana 1996an de dest bi weşana xwe kiriye. Bi *Welat* re kovara mîzahê Pîne jî di cotmeha 1999an de û *Tûrik* jî di qonaxa weşangeriya heftiyê ya Azadiya Welat de derketine.

Azadiya Welat di sala 2003yan de navenda xwe ji Stanbulê anîye Amedê û di 15ê Tebaxa 2006an de dest bi weşana rojane kiriye. Ji wê rojê heta niha rojane




Institut kurde de Paris

derdikeve. *Azadiya Welat* di qonaxa rojanebûnê de di navbera çar sal û nîvan de deh ceran hatiye girtin. Bi sedan sal cezayê girtîgehê li midûrên karên nivîsan ên rojnameyê hatin birîn. Rojname di nav van çar sal û nîvan de ji neçarêbûnê neh midûran guhertiye.

**DÎHA** kurtiya Dicle Haber Ajansı Yayıncılık, Tanıtım, Ticaret AŞ ye. Di sala 2002an de, di heman demê de navend li Stanbul û beşa wê li Amedê hatiye vekirin. Nûçeyên herêm û cîhanê bi kurdî, tirkî û îngilîzî belav dike. Giranî nûçeyan bi kurdî û tirkî ne. Herdu servîs ji hev cihê ne.

## Weşanxane, pirtûkfiroş û pirtûkxane

Li tevahiya parezgeha Amedê 15 pirtûkxane hene. Pirtûkxaneya herî kevn li Mizgefta Mezin aliyê rojhilat li tebeqa duyan e. Bêtir pirtûkên kevn li wir hene. Di sala 2009an de şaredariyê bi navê Mehmed Uzun li Parka Sumerê pirtûkxaneyeke mezin vekiriye. Divê pirtûkxanê de 10.000 pirtûk hene.

Di van salên dawî de gelek weşanxane û pirtûkfiroşan navenda xwe anîne Amedê. Niha ev weşanxane û pirtûkfiroş li Amedê hene:

Avesta, Ansar, Ava, Babil, Deng, Veng, Egitim, Kawa, Lîs, Kafka, Karinca, Kele pîr, Vate, APEC…

Institut kurde de Paris

# Nivîskar û hunermend

Amed bi tenê ne ji aliyê dîrok, jeopolîtîk, stratejîk, axa bi xêr û ber û komunîkasyonê ve, herweha ji aliyê wêje, huner û çandê ve jî navendeke herêma Kurdistanê ya mezin, girîng û dewlemend e. Heta niha gelek zanyar, siyasetmedar, nivîskar, helbestvan, hunermend, muzîkjen û dengbêjên hêja û navdar ji Amedê derketine. Mirov dikare bi hêsanî bêje Amed ji hezar salan ve bûye navenda wêje, çand, hunerê Kurd, Ermenî, Suryanî, Faris, Romî, Ereb, Tirk û gelên din. Amed nimûneyek ji mozayîka çanda gelan e. Li gor lêkolînek ji sedsala 14an heta sala 1995an 421 zanyar, nivîskar, helbestvan û hunermendên ku ji Amedê ne, hatine tespît kirin. Ji wan 174 mirovên zanyar, 228 nivîskar û helbestvan, 5 hattat û 8 jî bestekar in.[132] Lêkolîna duyem jî ya Şevket Beysanoğlu ye. Li gor lêkolîna Şevket Beysanoğlu hejmara wan 668 e.[133] Ji wan 28 helbestvan, 171 nivîskar, 193 zanyar, 46 hattat, bestekar û wênekêş in. Ji wan 62 helbestvan, nivîskar û zanyar ên berî serdema osmanî ne û 246 jî yên serdema osmanî ne. Helbet ev herdu lêkolîn li ser bingeha bîrdoziya (îdeolojiya) fermî ya dewletê hatine kirin. Amediyên ku bi kurdî nivîsîne û bi kurdî berhemên afirandine piraniya wan ne di nav van hejmaran de hene. Dinivîsin ku "Amed ji 33 şaristaniyan re malovaniyê kiriye... Amed mozaîka gelenan e.." Durişmeyên weha sexte û derewîn înkariya hebûna gelê kurd e û veşartina asîmîlasyona civakî î çandiya ku li ser gelê kurd heye, bincil dike. Ji 33 dagîrkeriyan re dibêjin "33 şaristanî." Ev mozaîka ku hûn behsa wê dikin xwediyên wê yên rasteqîn ne di navê de ne? Ma li Amedê bê kurd mozaîka gelan dibe? Li gor derftet û tespîtên me lîsteyên nivîskar, hunermend û dengbêjên amedî li jêr in.

*"Dîyarbekir mala min*
*Têde vedibe gula min*
*Roja tu ji min dûrketî*
*Qîrîn ketiye canê min..."*
(Beytocan)

## Nivîskar

### Îsheq Amedî

Heta îro bi qasî ku hatiye zanîn nivîskarê Amedê yê yekem Îsheq Amedî ye. Ew di serdema bizansiyan de di navbera salên h.363-418an de jiyaye. Bi eslê xwe Suryanî ye. Berhemên wî li gelek zimanan hatine wergerandin.

---

[132] *Tarih boyunca Diyarbakır'ın yetiştirdigi şahsiyetler, 2000 ː Beş Kala*, Diyarbakır Valiliği 1995, s. 201
[133] Şevket Beysanoğlu, *Diyarbakırli Fikir ve Sanat Adamları*

Institut kurde de Paris

**Etyus Amedî**
Di sedsala 6an de jiyaye. Zaneyekî tenduristiyê ye. Navûdengê wî li gelek welatan belav bûye. Tê gotin ku di warê tenduristiyê de 16 berhemên wî hene.[134]

**Baz Ebusûca**
Baz Ebusûca di sala 926an de li Amedê ji dayik bûye. Bavê wî Emîrê Sêrtê bûye. Ew dikeve şûna bavê xwe. Bedlîs, Cîzîre, Amed, Farqîn, Erdîş û Melazgirê jî dide ser welatê xwe. Li ser pereyê xwe navê xwe dinivîsine. Navê wî û Xelîfeyê Abbasî bi hev re di xutbeyê de hatiye xwendin. Demeke piştre bajarê Musilê jî girtiye. Ew li gor serdema xwe wêjebêj bûye.

**Amîdî**
Navê wî yê rastî Ebuqasim e. Ji Diyarbekirî ye lê li Bexdayê ji dayik bûye. Roja dayikbûna wî ne diyar e. Hem rexnegirê helbestê ye û hem jê hattat e. Di sala 981ê de wefat kiriye.

**Seyfuddîn Amîdî**
Di sala 1156an de li Amedê ji dayik bûye. Leqeba wî Ebul-Hesen Seyfuddîn el Amîdî ye. Ew di dema zaroktiya xwe de li Amedê xwendiye û piştre ji bo xwendinê çûye Bexdayê. Alim û xetîbekî mezin bûye. Fikih, hadîs, felsefe û tib xwendiye. Ew di fikih û felsefê de miroveki bi ser xwe re bûye. Zanayê Bexdayê ji ber zanebûna wî jê bûxudî kirine û gotine ji dîn derketiye. Amedî ji wir koçê Şamê kiriye. Nêzîkî 30 berhemên wî hene. Di sala 1233 li Şamê wefat kiriye.[135]

**Emer İbn-Îz**
Emer (Ömer İbn-Îz) (El Cezerî) li Amedê di sala 1206an de cara yekem robot çêkiriye. Niha gora wî li Cizîrê ye. Bi eslê xwe Cizîrî ye. Di wê demê de Cîzîr li ser Amedê bûye. Dema Artûkiyan de Muhendis bûye û li Sereya Amedê bûye. Makineyên ku tembûrê lêdidin, Teyrê Tawiz ku di dev de mey diniqute, fiskiye aletên otomatîk çêkiriye. Îz di sala 1205an de li ser van karê teknîkî agahdarî û zanyarî daye. Navê pirtûka wî Kîtabul-camî beyn-el Îlm vel-amel en naîf-î fî san'at-il hiyel e. Dema ku hîn li Ewropa teknîk tunebûye wî li Seraya Amedê robot çêkiriye. Gora wî niha li Cizîre zîyaretgeh e.

---
[134] Güneş Ekmekçi, *XVI. Yüzyıl Diyarbakır şairleri,* Diyarbakır Valiligi Hizmet Vakfı Başkanı-2009
[135] www.rehberDiyarbakır.com



Institut kurde de Paris

**Kaxtî**

Kahtî li Amedê ji dayik bûye. Bi tirkî nivîsiye. Di sala 1914an de li Îzmîrê bi navê *Aguner* pirtûkeke helbestan hatiye weşandin. Di vê pirtûkê de helbestekê Kaxtî jî heye. Kaxtî di sala 1876an de miriye.

**Nesîmî**

Nesîmî ji Amedê ye, lê sala ji dayîkbûna wî ne diyar e. Navê wî yê rastî Îmadeddîn e. Ji ekola şaîrê dîwanê ye. Di bin bandora Mewlana de maye. Felsefeya Xurûfî parastiye. Ew bûye propagandîstê vê felsefeyê. Bajar bi bajar geriyaye û xwestiye bi helbestên xwe dîtin û felsefeya xwe di nav gel de belav bike. Ji ber felsefe û çalakiyên wî, hukimdarê Kolemenên Misrê El Mueyed, di sala 1417-1418an de Nesîmî li bajarê Şamê dide girtin û piştre bi zindî post dikin. Di nav berhemên Nesîmî de dîwaneke wî ya bi farisî- osmanî ya herî navdar û girîng e. Ew di sala 1417/8an de hatiye kuştin.

**Şêx Mehemed Efendî**

Şêx Mehemed Efendî alimekî mezin e û ji Amedê ye. Ew destnivîsa pirtûka *Nazmul Ehem* ku di sala 1210 ê hicrî de hatiye nivîsîn bi dest xistiye. Ev pirtûk xwendina Quranî fêr dike.[136]

**Cemîlî**

Cemîlî di sala 1465an de ji dayik bûye. Li ser Amedîbûna Cemîl gotûbûj hene. Lêbelê li gor Ali Emirî Cemîl Amedî ye, lê li Tebrîzê jî jîyaye. Hesenê Dirêj ji bo pêşketîn û geşkirina çandê li Amedê Cemîl bi paş ve şandiya Amedê. 1504an de Cemîlî diçe Stanbulê. Dîwaneke Cemîlî li pirtûkxaneya Sereya Topkapiyê ye. Di sala 1543an de li Stanbulê miriye.[137]

**Şex Ahmedê El Bardaxî**

Şex Ahmedê El Bardaxî di sala 1446an de li taxa Bardaxiya Derê Çiyê bûye. Berhemeke wî ye 500 rûpelî heye û ev berhem li Stanbul li Pirtûkxaneya Milletê, beşa lugatê hejmar 39an de qeyd kiriye. Li ser salnameyan zanyarî û agahdariyan dide. Beşeke li ser astronomiyê ye û di derbareyê stêrk û gerekstêrkan zanîn û agahdariyê dide.[138] Tarîxa mirina şêx Ahmedê El Bardaxî ne diyar e.

---

136 Zübeyde Kırmızı, *Amidi-Nur*, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Yayınları. S.201.
137 HB (heman behrem)
138 M. Şefik Korkusuz, ***Diyarbakır velileri.*** **s.57**

Institut kurde de Paris

**Şerîfî**

Sala ji dayikbûna Şerîfî ne diyar e. Ali Emîrî dinivîse ku Şerîfî ji Amedê ye. Şerîfî çûye li Satnbûlê bi cih bûye. Dîwaneke Şerîfî heye û niha li pirtûkxaneya Silêmaniyê ye. Şerîfî di sala 1523an de miriye.

**Xaletî**

Sala ji dayikbûna Xaletî ne diyar e. Neviyê Îbrahîm Gulşenî ye. Kurê Alî Safwetî ye. Diwaneke wî heye. Di sala 1581 de di ciwaniya xwe de miriye.

**Îbrahîn Gulşenî**

Ji Amedê ye û sala ji dayikbûna wî ne dîyar û zelal e. Demeke li Tebrîzê jî jiyaye. Piştre dîsa vegeriye Amedê. Helbestvanekî mezin û bi navûdeng e. Hem helbestvan e û hem jî damezrevanê tarîqata Gulşenî ye. Helbestên xwe bi farisî nivîsîye. Di dema Aqqoyuniyan de jîyaye. Uzun Hasan rûmeteke mezin daye wî. Diwaneke wî heye. Di dîwana wî de 24 hezar beyt hene. Îbrahîm Gulşenî di sala 1533an de wefat kiriye.

**Safwetî**

Safvetî Gulşenî, Neviyê Îbrahîm Gulşenî ye û kurê Ahmed Xeyalî ye. Navê wî yê rastî Elî ye. Di hêla tefsîrê de serkeftî ye. Dîwana wî tune, lê helbestên wî hene.

**Xumarî**

Humarî di sala 1523an de li Amedê bûye. Demeke li Bexdayê maye û piştre vegeriye Amedê. Bi Fizûlî re hevaltî kiriye. Bi farisî helbestê wî hene. Xumarî di sala 1591 de li Amedê wefat kiriye.

**Şihûdî**

Ji Amedê ye û roja ji dayikbûna wî ne diyar e. Li Amedê xwendiye û jê re Ecemzade gotine. Bûye gerok û li gelek bajar û welatan geriye. Piştre hakimî kiriye. Helbestên xwe bi farisî nivîsiye. Di sala 1578an de miriye.

**Xelîfe**

Xelîfe li Amedê hatiye dinê. Roja dayikbûna wî ne diyar e. Tê gotin ku Heskîfê ye. Wê demê Heskîf li ser Amedê bûye. Demeke mamostetî kiriye. Di helbestên xwe de rindên Amedê tasfîr kiriye. Xelîfe di sala 1578an de miriye.

Institut kurde de Paris

**Mehmed Paşa**
Kurê Îskender Paşa yê Sêyem e. Hezkerê helbestvan û hunermendan bûye. Wî bi xwe jî bi farisî helbest nivîsiye, lê ne xwediyê dîwanê ye. Mehmed Paşa di sala 1591 de wefat kiriye.

**Ahmed Paşa**
Kurê Îskender Paşa yê herî mezin e. Perwerdeyeke baş dîtiye. Serleşkerekî jêhatî bûye û ji ber wê yekê payeya mîrêmîran girtiye. Demeke bûye waliyê Rakayê. Ji wêje û hunerê hez kiriye. Bi kurdî, farisî, erebî û osmanî zanibûye. Helbestên wî hene. Ahmed Paşa di sala 1587an de wefat kiriye.

**Bîatî**
Roja ji dayikbûna Bîatî ne diyar e. Ji Amedê ye. Xwedî tarîqat bûye. Gotin û exlaqê wî gelek xweş bûye. Dîwana wî tune, lê li pey xwe gelek helbest hiştine. Ew di sala 1591ê de miriye.

**Çawîşê Îrîncîlî**
Çawîşê Îrîncîlî (Încîlî) di sala 1560î de li gundê Îrîncilê ji dayik bûye. Gundê Îrîncilê niha ketiye nav axa zanîngeha Dîclê û gund nemaye. Navê wî yê rastî Mistefa Çawîş e.[139] Wek tê zanîn ew mîzahvanekî navdar bûye. Di mijara mîzah û hazircewabiyê de ji Xoce Nesredîn ne kêmtir bûye. Ew di sala 1632an miriye. Gora wî li goristana Edirne Kapi ye û li ser kevirê gora wî 1042 nivîsiye." Gelo bi rastî Încîlî Çawîş ji ku ye? Ew di 1632an de miriye, lê li ser gora wî 1042 nivîsiye. Ev çawa dibe? Gelo çend Îrincîli Çawîş hebûne?" Hîn jî mijara gotûbêjan e. Lêbelê di van salên dawî de piraniya lêkolînêran dibêjin ji Amedê ji gundê Îrîncilê ye.

**Mele Çelebî**
Sala ji dayikbûna wî ne diyar e. Siltan Mûradê IVem di vegera xwe ya Bexdayê de tê Amedê û li wir Mele Çelebî nas dike. Mele Çelebî li gel xwe dibe Stanbulê. Li wir pirtûka xwe ya '*Ez û Piştre Red û Qebû, Serhî û Fevîne*' dinivîse. Çelebî di sala 1655an de wefat kiriye.

[139] Z. Abidin Çiçek dibêjin dokument heye ku Încili Çawîs ji vî gundiye.( Z. Abidin Çiçek, Diyarbakırin Fethi, Tarihi ve Kulturu. S. 126-1977)

**Hesen Gulşenî**

Neviyê Îbrahîn Gulşenî û kurê Ahmed Xeyalî ye. Di sala 1552an de bûye. Bi kurdî, osmanî, erebî û farisî zanibûye. Bi tenê şalwar, eba li xwe kiriye û şekal kiriye lingê xwe. Helbestên wî hebûne, lê niha yek di dest de maye. Di ciwaniya xwe de di sala 1615an de miriye.

**Muslihiddîn Larî**

Tê texmîn kirin ku Muslihiddîn Larî li Loristanê ji dayik bûye. ji Loristanê hatiye jê re gotine "Larî". Kurdên Lorî ye. Li Hindistan û Helebê maye. Demeke derbasî Stanbulê bûye û vegeriyaye Amedê. Di dema Îskender Paşa de ji malbata wan re mamostetî kiriye û li Husrev Paşayê bûye Muderîs. Di mijarên hadîs, tefsîr, fikih, kelam, ziman, dîrok, mantiq, û astronomiyê de hûr û kûr bûye û di van mijaran de berhemên wî hene. Du ji wan li ser astronomiyê ne. Berhemên wî yên bi navûdeng *Mîrat-ul Edwar û Mîrat-ul Ahbar* in. Bi giştî 29 berhem li pey xwe hiştiye. Herdu berhemen wî yên li ser astronomiyê li pirtûxana û resatxaneya Kandîllî û Suleymaniyê di bin parastinê de ne. Ewropiyan ji berhemên wî yên astronomî kelk girtine û hîn îro jî payeke mezin didin wan herdu berheman. Ew di sala 1591ê miriye û gora wî li hewşa Mizgefta Parli ye. Piştî mirina wî navê Medresa Muslihiddînê Larî li vir kirine.

**Şohretî**

Ji Amedê ye. Roja ji dayikbûna wî ne diyar e. Navê wî yê rastî Heyder e. Demek li Şamê memûrtî kiriye. Hîcvên wî gelek xurt in. Dîwana wî tune, lê helbestên wî hene. Di sala 1605an de li Şamê miriye.

**Tûfeylî**

Li Amedê ji dayik bûye. Jê re Mele Elî gotine. Demeke li Bexdayê maye. Hem hattad e, hem neqaş e û hem jî helbestvan e. Tûfeylî di sala 1611an de wefat kiriye.

**Mesîhî**

Mesîhî di sedsala XVIan de jiyaye. Ji Amedê ye. Roja ji dayikbûn û mirina wî ne diyar in. Ermenî ye, loma navê Mesîhî li xwe kiriye. Bi ermenî û farisî nivîsiye. Di heman demê de bazirganekî mezin bûye. Bi nivîsandina helbestan re mamostetiya zimanê osmanî û farisî jî kiriye.

**Şêx Ehmedê Murşîdî**

Şêx Ehmedê Murşîdî di sala 1689an de li Amedê ji dayik bûye. Li Amedê xwendiye. Di xortaniya xwe de ketiye tarîqata şêx Evdilbekirê Bêlecûgî. Di sala 1748an de berhema xwe ya bi navê *Ehmediye* nivîsiye. Piştre bi navên *Yûsif û Zelîxa, Mewld-î Nebî û Rîsalê Humayum Vîladedî* ne. Şêx Ehmedê Murşîdî di sala 1761ê de wefat kiriye.[140]

**Gubarî**

Gubarî Amedî ye û roja ji dayîkbûna wî ne diyar e. Navê wî yê rastî Qasim Efendî ye. Hattatekî bi navûdeng e. Li cîhanê hattatên wek Gubarî kêm in. Nivîsên li ser Mizgefta Siltan Ahmed Gubarî nivîsiye. Helbest jî nivîsiye. Gazeleke xwe li ser libên birincan nivîsiye. Gubarî di sala 1624an de miriye.

**Şahî**

Ozanekî Amedî yê kevn e. Di nîvê sedsala 16an de jiya ye. Ji bo ku ji Şah Îsmaîl hez kiriye, li ser şah helbest gotiye û navê Şah lê kirine an wî li xwe kiriye. Vasfi Mahir Kocaturk helbestên wî di antelojiya Tekke de weşandiye.

**Evdilrehman el- Kurdî**

Navê wî yê rastî şêx Evdirahman bîn Îbrahîm el- Kurdî el Saharî ye. Roja ji dayikbûna wî ne dîyar e. Îcazeta xwe ya îlmî ji Mele Çelebî- el Cizîrî el -Kurdî girtiye. Gelek berhemên wî hene. Bi kêmasî 40 rîsalên wî hene. Risaleya wî ya bi navûdeng *Rîsale Fî Suret Yasîn* e. Bi farisî jî qesîdeyekê wî heye. Bi kurdî, erebî, farisî û tirkî dizanibûye. Di sala 1654/1655an de li Amedê wefat kiriye.

**Qasim Amedî**

Qasim Amedî di sedsala 17an de li Amedê ji dayik bûye. Destnivîsa wî ya bi navûdeng heye. Sureya Îhlasê cara yekem wî bi cureyê gubarî nivîsiye. Ji ber vê yekê leqeba Gubarî lê kirine.[141]

**Axû**

Axû di sedsala 17an de jîyaye. Navê wî yê rastî Elî ye. Padîşah Murad-4 ji helbestên wî hez kiriye. Di rêzikeke xwe de gotiye, "Mahlasa min Axû û navê min Elî ye."

[140] *Diyarbakır Yıllgı*.s.173
141 Şemseddîn Samî, *Qamus-ul Alam* c-1, s.3532

**Hesretî**

Hesretî, di sala 1776an de li Amedê ji dayik bûye. Qehwexaneya wî hebûye û ew qehwexane heta îro heye. Xwediyê gelek helbestan e. Di helbestê wî de diyar dibe ku navê wî yê rastî Refîq e. Ew di sala 1817an de miriye.

**Raxib H. Muderîs**

Di sala 1786an de ji dayik bûye. Piştî perwerdeya xwe ya medresê di dem û dezgehan de memûrtî kiriye. Di Medresa Husref Paşa de dest bi mamostetiyê kiriye. Piştre di medresa xwe de mamostetîya xwe domandiye. Di mijarên cuda de bi qasî 30 berhemên wî hene. Ew di sala 1874 miriye.

**Refî**

Refî di sala 1756an de li Amedê ji dayik bûye. Navê wî yê rastî Mehmed e. Ew neviyê Seyyîd Lebîb e. Seyyîd Lebîb hem helbestvan û hem jî muderîs bûye. Refî li cem wî ders dîtiye. Mesnewiya wî ya Can û Canan bi navûdeng e.[142]

**Şaban Kamil Efendîyê Amedî**

Li Amedê bûye, tarîxa bûyîna wî ne diyar e. Mamoste bûye. Ji aliyê muzîkê ve gelek zîrek bûye. Bi erebî du mewlût û li ser Pexember Îsa û hawariyên wî jî pirtûk nivîsîye. Di van pirtûkan de hinek jê pexşan, helbest û qesîde hene. Nusheke ji pirtûka xwe ya *Fatîhî Muşkulat* ji Siltan Abdulezîz re pêşkêş kiriye. Hemû pirtûkên wî di wê dema de ji aliyê wezareta weşanan ve hatine çap kirin û belav kirin. Şaban Kamil Efendî di sala 1883an de wefat kiriye.[143]

**Fatma Baci**

Fatma Baci Amedî ye û sala ji dayik bûyîna wê ne diyar e. Tê gotin ku ji Malbata Dalkabakan e. Di heman demê de sazbend bûye. Destana wê ya *Karakış* (Zivistana Reş) bi navûdeng e. Ew di sala 1895an de miriye.[144]

**Azmî**

Azmî li Amedê ji dayik bûye, sala ji dayikbûnê nediyar e. Navê wî yê rastî Ehmed e. Bi navê *Murettep* dîwaneke wî heye. Ji nusheyeke wê li Kutupxaneya Milletê ya Stanbulê di mit.lm.K-mz, No 294 de qeyitkiriye. Ji derê vê berhema

Institut kurde de Paris

---

142 Dr. Ali. Fuat Balkan, Diyarbakır 2. Uluslar arasi Sempozyumu, bildiri özetleri s.30
[143] Mehmed Emîn Zeki Bey, *Kurd u Kurdistan Unluleri*, s. 204, weşanên Apec, Stockholm
[144] Ş. Beysanoglu, *Diyarbakırim cilt-1*, s.41

wî bi navê *Muftahu ul Mania* berhemeke wî ya helbestan jî heye. Gora Azmî li goristana Derê Mêrdînê ye.[145]

**Sırrı Xanım**

Di sala 1814an de li Amedê hatiye dinê. Navê wê yê rastî Rahile ye. Ji xanedanê Amedê keça Ehmed Begê ye. Bi îhtîmaleke mezin dê xuşka mezin a Îfet Xanim be. Bi çanda dîwanê mezin bûye. Cara yekem bi Tahir Zade Bekir Axa re şû kiriye. Demeke kurt li Bexdayê maye û piştre çûye Stanbulê. Li konaxa Wusuf Kamil Paşa beşdarî sohbetên wêjeyî bûye. Bi xanima Wusuf Kamil Paşa Zeynebê re bûye dost. Tê gotin ku bi Kamil Paşa re jî şû kiriye. Helbestên xwe bi farisî û tirkî nivîsine. Bi kurdî, farisî, erebî û tirkî zanibûye. Gelek menzûmeyên wê hene: *El Durer el-Menşûr Fî Tabakat Ribat el Hudur û Meşahîrûl Nîsa.*[146] Di sala 1877an de miriye. Li Edîrne Kapî li taxa Otakçılar di goristana Dergahê Kadirî de ye. Helbestên wê terî dîwaneke dikin. Lê helbesta wê ya herî bi navûdeng li ser mirina keça xwe mersiyeke hêja ye ku nivîsîye.

**Hatîce Îfet Hanim**

Li Amedê ji dayîk bûye, lê sala bûyîna wê ne diyar e. Keçe Ehmed Begê ye.[147] Xanima Ezmî Zade Mehmed Efendîye. Ezmî Zade Mehmed Efendî ulemayê Amedê ye. Hatîce Îfet Hanim helbest nivîsiye. Mixabin di dest de zêde helbest û berhemên wê nemane. Bi tenê gazeleke wê ya kurt heye. Ew di sala 1860î de li Amedê çûye ser dilovaniya xwe. Gora wê nêzîkî Mizgefta Behram Paşa ye.

**Ali Emirî**

Ali Emîrî di sala 1857an de ji dayik bûye. Lêkolîner e. Pirtûkxaneyeke wî ya dewlemend hebûye. Bi tirkî nivîsiye. Li ser Osamaniyan. *Tezkirei Şuarayi Amid, Osmanli Vilayet-i Şarkiyesi* û Nivîskar û Alimên Amedê lêkolînên wî hene. Di kovar û rojnameyan de nivîsên wî hatine weşandin. Di sala 1924an de wefat kiriye.

**Nîgahî Baba**

Ew di kîjan tarîxe de jiyaye ne diyar e. Tê gotin ku ew li taxa Dabakxanê li nêzîkî mizgefta şêx Wusif jiyaye. Xwendin û nivîsandina wî tune bûye. Wî gotiye û yên derdora wî jî nivîsandine. Piştre kirine dîwan.

---

[145] *Diyarbakır Yıllgı*, 1967, s 275
[146] Mehmet Emin Zekî Bey, Meşahir-i Kurd û Kurdistan (Kürt ve Kürdistan Ünlüleri ), Weşanên Apec, Stockholm-1998
[147] kadimdostlar.com/Divanedebiyati Şairleri Biyografileri f139/Osmanlida Kadin Şairler Sirri Hanım 1814 1877 t24724.html

**Mustafa Akif Tütenk**

Mustafa Akif Tütenk di sala 1875an de li Amedê ji dayik bûye. Mamoste ye. Di 04 03. 1920an de ji Amedê bûye parlamenter. Piştre hatiye bi Ziya Gökalp re di kovarên Dîcle û Peyam de xebitiye. Rojnamevan e. Bi kurdî, tirki, farisî û erebî dizanibûye.

**Seîd Paşa**

Di sala 1832an de ji dayik bûye. Bavê Süleyman Nazif e. Li parezgehê memûrtî kiriye. Bûye mutasarifê Mereş û Mêrdînê. Pirtûkeke bi navê Mîrat-ul Îber 10 cilt nivîsiye. Ji wan heta niha 9 cilt hatine çap kirin cilta dehem di muza Stanbulê de ye. Tarîxa Amedê jî nivîsiye di sala 1884an di Salnameya Diyarbekirê de hatiye çap kirin. Seîd Paşa di sala 1891ê wefat kiriye.

**Naum Faik Palak**

Naum Faik di sala 1868an de li Amedê ji dayik bûye. Suryanî ye. Li Amedê xwendiye û piştre li Amedê û Sêrtê mamostetiya zimanê Suryanî kiriye. Naum Fayik bi suryanî, kurmancî, erebî, tirkî û fransî dizanibûye. Demeke dirêj heta Şam, Lubnan Yafa û Qudûsê çûye u li wan deran lêkolîn kiriye û dîsa vegeriyaye Amedê. Li Amedê kovara *Kavkab Medînho* bi suryanî, kurmancî, tirkî û erebî deraniye. Di sala 1912an de dema ku li ser Ermenî û Suryaniyan de zordariyeke mezin hebûye bi malbata xwe ve bar kiriye û çûye Amerîka bi cih bûye. Li wir jî kovara *Beth Nahrî* derxistiye. Ji derî van herdu kovaran ji 30 bêtir berhem afirandîye. Naum Faik rewşenbîrekî gelê Suryaniyanê polîtîk û çandî bûye. Di sala 1930î de li Amerîka çûye ser dilovaniya xwe.

**Süleyman Nazîf**

Süleyman Nazif di sala 1869an de li Amedê ji dayik bûye. Bi tirkî, kurdî, farisî, erebî û fransî dizanibûye. Serokatiya Rojnameya Diyarbekirê kiriye. Ji ber ku nêzîkî Îttîhatiyan bûye ji ber Evdilhemîd reviyaye Parîsê û li wir rojnameya *Mesveret* derxistiye. Piştî Meşrûtiyetê bûye Waliyê Basra, Kastamonû, Mûsil, Trabzon û Bexdayê. Piştî sala 1915 li Stanbulê di rojmaneyan de nivîsiye. Di navbera salên 1895-1895 di Salnameya Diyarbekirê de xebitiye. Di sala 1927an de miriye.

**Fayik Ali Ozansoy**
Di sala 1875ande li Amedê ji dayîk bûye. Birayê Süleyman Nazif e. Dibistana mulkiyê qedandiye. Musteşarî û qeymeqamî kiriye. Ji helbesta Serwetê Funûn hez kiriye. Gelek helbest nivîsandiye. Sê pirtûkên wî yên helbestan hene. *Fanî Teselliler, Temasîl û Elhamê Vatan*. Di sala 1950 î de miriye.

**Ekrem Çemîl Paşa**
Ekrem Cemîl Paşa di sala 1891ê de li Amedê ji dayik bûye. Di sala 1912an de dema li Stanbulê xwendekar bûye di Rêxistina Xwendekarên Kurd Hêvî de cih girtiye. Piştre çûye li Lozan û Gandê muhendisî xwendiye. Di sala 1918an de vegeriyaye Amedê û bi çend hevalên xwe ve Cemiyeta Kurdistanê ava kirine. Ew wek serok hatiye hilbijartin. Di sala 1920î de hatiye girtin. Di sala 1922an hatiye berdan û carek din vegeriyaye Amedê. Di dema şerê Şêx Seîd de her çiqas beşdarî nav şer nebûye jî dewletê ew girtiye û çar sal avêtiye girtîgehê. Di sala 1929an de derketiye û çûye Sûriyê ku wê demê di bin desthilatdariya Fransizan de bû. Li wir bi Bedirxanî û Kurdên din re rêxistina Hoybûnê ava kirine. Di navbera salên 1940-1946an bûye nimînendeyê Hoybûnê. Di warê ziman û çandê de jî gelek xebatên wî hene. Bi navê *'Dîroka Kurdistan' bi kurtebirî û 'Muhtasar Hayatim'* du pirtûkên wî hene. Di sala 1974an de li Şamê çûye ser dilovaniya xwe. Li wir hatiye veşartin.

**Kadrî Cemîl Paşa**
Kadrî Cemîl Paşa di sala 1891ê de li Amedê ji dayik bûye. Ew û kurê apê xwe Ekrem Cemîl Paşa zarokên salekê ne. Di heman salê de bûne, bi hev re xwendine, bi hev re di nav heman doz û rêxistina kurdî de cih girtine, bi hev re hatine girtin û sirgûn kirin. Heta bi hev re li sirgîniyê mirine. Navê wî yê maxlas Zinar Silopî ye. Li Amedê bi Ekrem Cemîl Paşa re dibistana seretayî û ya ruştiye xwendine. Li Stanbulê lîsê dom kirine. Piştre li Stanbulê dest bi dibistana Ziraetê ya Bilind kiriye. Di Cemiyeta Hêvî de xebitiye. Di sala 1913an de bi kurapê xwe Ekrem Cemîl Paşa re derketine û çûne Lozanê. Li wir şûbeya Cemiyeta Hêvî vekirine. Di şêrê Cîhanê yê Duyem de vedigere û wek serleşker ew dişinin cepheyê Şerqê (rojhilat). Piştre şandina cephê Filistînê. Li Ammanê dîl ketiye destê Îngilîzan. Li Kampa dîlan a Îskenderiyê çend sal maye. Piştî berdanê hatiye Amedê. Di dema şerê Şêx Seîd de her çiqas malbata Cemîl Paşa bêdeng mabe jî, Ekrem, Kadrî û gelekê din ji malbatê girtine û dane mehkmeya Îstîk-

lala Amedê. Cezayê sirgûnê dane Kadrî û Ekrem û şandine Bandirmê. Di sala 1929an ji sirgûnê vegeriyane Amedê û di hema salê de çûne Sûriyê. Bi salan di rêxistina Hoybûne de kar kiriye. Di dema Komara Mahabadê de wek nûnerê rêxistina Demokrata kurdî ya Sûriyê çûye Mahabadê. Di 27.11.1973an de li Şamê çûye ser dilovaniya xwe û gora wî li goristana Ruknedîn e. Li ser dîroka Kurdistanê bi navê *'Doza Kurdistan'* pirtûkeke wî heye.

**Hamid Aytaç**

Di sala 1891ê de ji dayik bûye. Navê wi yê rastî Şeyh Mûsa Azmîr e. Li Stanbûlê dev ji xwendina xwe ya huqûqî berdaye û çûye dersê wêne û xetê. Bûye Xattatekî bi navûdeng. Nivîsên wî yên li ser Mizgefta Sîslî, Soğutluçeşme, qubeya mizgefta Tarabyayê bi navûdeng in. Ew di sala 1982an de miriye.[148]

**Cemal Yeşil**

Cemal Yeşil di sala 1900î de li Amedê ji dayikbûye. Helbestvanê Rubaî ye. Di Edebiyata Rubaî de roleke wî yê mezin heye. Helbestên wî di gelek kovar û rojnameyan de derketine. Cemal Yeşil xwediyê Merşa Mulkiyeyê ye.Ew di sala 1977an de miriye.

**Cahit Sıtkı Tarancı**

Cahit Sıtkı Tarancı di sala 1910an li Amedê ji dayik bûye. Dibistana seretayi li Amedê û yên din li Stanbulê xwendiye. Li dibistana mulkiye û piştre li Parîsê fakulta siyasi xwendiye. Di şerê Cîhanê yê Duyem de vegeriaya welat û bûye esker. Li Ajansa Anadoluyê wergerî kiriye. Di biçûkiya xwe de helbest nivîsiye. Di bin bandora A. Hamdi Tanpınar û Necip Fazıl de maye. Piştre ketiye bin bandora helbesta Baudlaire. Berhemên wî ev in: *Ömrümde Sukut, Otuzbeş Yaş, Düşten Güzel û Sonraki.* Di ciwaniya xwe de nexweş ketiye. Di sala 1956an de li Viyanê miriye.

**Munis Fayik Ozansoy**

Lawê Fayik Ali Ozansoy û birarziyê Süleyman Nazîf e. Di sala 1911an de bûye. Ew jî helbestvan e. Wek pirtûk berhemên wî tune ne lê gelek helbestên wî di kovarên cuda de hatine weşandin. Di kovarên *Şark, Çığır, Millet, Bayrak û Hisar* de gelek helbestên wî hatine weşandin. Di sala 1975an de miriye.

148 Di warê listeya niviskar, hunermend û zanyarên Amedî de me kelkeke mezin ji wergirt. www.mirbotan.com/index.php wergirt.

Institut kurde de Paris

**Fuat Edip Baksi**

1912an de ji dayik bûye. Bi tirkî helbest nivîsiye. Gelek helbestên wê kirine stran. Helbesta wî ya herî bi navûdeng *'Bir Bahar Akşamı'*(Êvareke biharê) ye. Ew di sala 1974an de miriye.

**Abdussettar Hayatî Avşar**

Abdussettar Hayatî Avşar, di 2ê cotmeha 1918ande, li Musilê ji dayik bûye. Kurê Kafîzade Şêxmûs Hayatî Beg e. Ew ji Amedê ji malbateke naskirî ye. Di sala 1935an de li Amedê dibistana amadeyî xwendiye. Di gelek kar û pîşeyî de xebitiye. Li Amedê bi salan dest bi rojnamegeriyê kiriye. Rojnameya Ummîd derxistiye. Birêvebiriye wê kiriye. Bi navê Badî gelek maqale nivîsiye. Ew wek weşanger û xwedî çapxane alîkariya çapkirin û weşandina rojnameyên Îdil, Şark Postası, Miya Farqîn, Kulp, Lice, Hani û Nûr Zülküf jî kiriye. Amedê gelek baş nas dike. Miroveki wek xezîne ye. Li ser jiyana wî Zübeyde Kırmızı bi navê Amid-i Nur pirtûkeke hêja nivîsiye.

**Şevket Beysanoğlu**

Di sala 1920an ji dayikbûye. Ji fakulteya Huqûqê mezûn e. Di gelek rojname û kovaran de nivîs û helbestên wî hatine belav kirin. Li ser bajarê Amedê çend pirtûkên wî hene. Pirtûka wî ya li ser dîroka amedê 3 cîld in. Wek lêkolînên wî yên li ser Amedê ji hêla dîrokî ve hêja ne, lê wek bîrdozî û naverok bi perspektîva dîroka fermî nivîsiye. Kurd û çanda kurdî di pirtûkên wî de tune ne.

**Orhan Asena**

Ji Amedê ye û di sala 1922an de ji dayik bûye. Romannivîs û şanonivîs e. Bi pirtûka xwe ya *Hurrem Sultan* hatiye nas kirin. Heta niha 5-6 berhemên wi yên bi navûdeng hene. Hemû berhemên wî bi tirkî ne.

**Canip Yıldırım**

Canip Yıldırım di sala 1923an de li Amedê ji dayik bûye. Ew ji malbateke arîstrokatê kurdan e. Dibistan seretayî û navîn li Amedê û yên din li Enqerê xwendiye. Di sala 1944an de li Enqerê hûqûk qedandiye. Ji bo îxtîsasê çûye Parîsê. Li wir çepgiran nas kiriye. Ew bi paş ve vegeriye Amedê û dest bi parêzeriyê kiriye. Ji ber helwest û polîtîka CHP demek çûye di nav DP de cih girtiye. Piştre dinêre ku ew jî li doza kurdî xwedîti dernakevin çûye di HP (Hurriyet

Institut kurde de Paris

partisiyê) de kar kiriye. Li Amedê ew û Musa Anter di sala 1958 an de rojnameya İleri Yurtê derxistine. Mudûrê Karûbarê nivîsan Canîp Yıldırım e. Rojnameyeke rojane ye bi piranî bi tirkî bûye, lê carinan nivîsen bi kurdî jî çap kirine. Temenê rojnamê saleke dirêj bûye û dewletê rojnamê girtiye û Canip Yıldırım daye mehkemê. Canip Yıldırım 1965an de li Amedê bûye damezervanê TIPê. Di Inqilaba 12ê edara 1970î de hatiye girtin. Ew heta sala 1974an li Amedê li zîndanê maye. Orhan Mîroğlu bi wî re hevpeyvîneke piralî û dirêj kiriye û bi navê "*Hevsel Behçelerinde bir dut agacı*" kiriye pirtûk.

**Cenap Ozankay**

Cenap Ozankay di sala 1924an de ji dayik bûye. Lêkolînvanekî tirkperest e û hemû lêkolîn û berhemên xwe li ser nijadê tirkitiyê kiriye. *Kuvvay-i Miliye, Türk Milli oyunları* û hwd in.

**Ahmet Arîf**

Ahmet Arif di sala 1927an de li Amedê ji dayîk bûye. Dibistan seretayi û navîn li Amedê xwendiye. Li zanînga Enqerê beşa felsefeyê xwendiye. Di sala 1950î de bi îdeaya ku propagandaya komunîzmê dike hatiye girtin. Piştî salên 1950î di karê rojnamegeriyê yên teknîkî û redakteyî de kar kiriye. Di sala 1968an de pirtûka wî ya "*Hasretinden Prangalar Eskittim*" derketiye. Ev pirtûka helbestan bi tirkî ye. Heta niha çapa 38an hatiye kirin. Ahmet Arif li Tirkiyê bû bavê helbesta tirkî. Ew di 2ê tebaxa 1991ê de li Enqerê çûye ser dilovaniya xwe.

**Esma Ocak**

Esma Ocak di sala 1928an de, li Amedê ji dayik bûye. Xuşka Canip Yıldırım e. Bajarî ye û ji maleke xanedan e. Bi navê Mala Esma Ocak wek muze xaniyekî wê heye. Parkeke wek çayxane jî bi navê Esma Ocak e. Roman û çîrokên wê hene. Pirtûka wê ya çîrokan a herî navdar *Berdel* e.

**Şahverî**

Navê wî yê rastî Şahver Şanlioğlu ye. Di sala 1931ê de ji dayik bûye. Li Stanbulê jiyaye. Heta niha çar pirtûkên wî hatine weşandin.

Institut kurde de Paris

**Mehmet Mercan**

Mehmet Mercan di sala 1933an de li taxa Alipaşayê hatiye dinê. Ew bi eslê xwe ji gundê Pêçara Licê ye. Dibistana seretayî, navîn û amadeyî li Amedê xwendiye. Di dema dibistana amadeyiyê de zewiciye û xwendina xwe ya amadeyiyê nîvco hiştiye. Di sala 1951ê de bi helbest, pêkenok, maqale nivisiye. Mehmet Mercan di sala 1953an de bi awayekî fermî dest bi rojnamegeriye kiriye. Di destpêkê de Yeni Şark-Ummid, Demokrat Şark- û hwd de xebitiye. Bê navber 28 salan di rojnameya Cumhuriyetê de kar kiriye. Di kovarên Kelek û Yudum de nivîsiye û berpirsiya wan girtiye. Li ser Amedê xwedî zanîneke kûr û berfireh e û di vî warî de gelek nivîsên wî hene. Bi navê *Anadolu'da Gazetecilik ve Diyarbakır Basını* du pirtûkên wî çap bûne.

**Adnan Binyazar**

Di sala 1934an de ji dayik bûye. Di kovarên wek *Varlık, Papirus, Türk Dili* û *Milliyet Sanat* de rexneyên edebî nivîsiye. Bi romana xwe ya *Masalini Yitiren Dev* hatiye nas kirin. Çîrokên Dede Korkut, Agit Toplumu, Toplum û Edebiyat berhemên wî ne. Hemû berhemên wî bi tirkî ne.

**Remzi İnanç**

Remzi İnanç di sala 1935an de li Amedê ji dayik bûye. Dibistana seretayi, navîn û lîsê li Amedê xwendiye. Qeyda xwe li Enqerê li Fakulta Huqûqê kiriye lê dewam nekiriye. Remzi İnanç di gelek dem û dezgehên çandî û perwerdê de kar kiriye. Demeke di çapemeniya TİPê de xebitiye. Ji sala 1964 ve weşanxane vekiriye. Ji ber weşandina pirtûkan bi salan di girtîgehê de maye. Gelek pirtûkên wî hatine çap kirin. Hîn îro jî bi !êkolînan ve mijûl e.

**Taner Timur**

Di sala 1935an de ji dayik bûye. Fakulta Siyasî xwendiye. Li ser demokrasî û civakê çar pirtûkên wî hene: *Amerikan Demokrasisi (çeviri),Türk Devrimi- Tarihi, Anlamı ve Felsefi Temeli, Osmanlı Toplum Düzeni.* Hemû berhemên wî bi tirkî ne.

**Tuncer Necmioğlu**

Di sala 1936an de ji dayik bûye. Di fakulta tibê wendiye. Di dema dibistanê de beşdarê xebetên şanogeriyê bûye. Piştre di fîlmên wek *Kızılırmak Karayokun, Kuma, Pîrsultan Abdal* û hinek din de lîstiye.

**Kaya Özsezgin**

Kaya Özsezgîn di sala 1938an de ji dayik bûye. Perwerdeya seretayi û navîn li Amedê xwendiye. Fakulta huner û dîrokê xwendiye. . Resam e. Di rojnameyên Tirkiyê yên mezin de li ser wêne û wênekêşiyê nivîsên wî yên rexneyî hene. Bi navê *Promentheus'un Dönüşü* pirtûkeke wî heye. Hemû berhemên wî bi tirkî ne.

**Fehmi Salık** di sala 1939an de li Qadiyana Mezin hatiye dinê. Dibistana seretayî li gundê xwe xwendiye. Li Erxenıyê dibistana Mamostetiyê qedandıye. Piştre li Bursayê, li fakulteya perwerdê beşa edebiyatê qedandiye. Bi salan mamostetî kiriye. Di gelek kovar û rojnameyan de nivîsên wî hatine belav kirin. Heta niha heft pirtûkên wî derketine. Pirtûka wi ya herî dawî romana wi ya bi navê *Lalo* ye.

**Maharerm Çakar** di sala 1942an de li Qadiyana Mezin ji ayik bûye. Dibistana seretayî li gundê xwe xendiye. Dibistana mamostetiyê li Erxeniyê qedandiye û bi salan mamoteti kiriye. Bi eslê xwe Tirkemê elewî ye. Helbestvan e. Bi navê Cengiz Topel pirtûkeke wî ya helbestan heye. Muharrem Çakar di sala 1996an de miriye.

**M. Şefik Korkusuz**

M. Şefik Korkusuz li Amedê hatiye dinê. Ji dibistana seretayî heta ya amadeyiyê li Amedê xwendiye. Gelek berhêmên wî hene, lê yên ku li ser Amedê nivîsîne ev in: *Eski Diyarbekir'de Gündelik Hayat, Diyarbekir Velileri, Mesayih-i Amid, Diyarbekirli Sırrı Hanım'ın Divanı, Bir zamanlar Diyarbekir* û wergera wî ya bi navê *Seyahatnamelerde Diyarbekir*, hene.

**Mıgırdiç Margosyan**

Mıgırdiç Margosyan di sala 1938an de li Amedê ji dayik bûye. Ji taxa Xançepekê ye. Dibistana sertayî li Amedê û yên din li Stanbulê xwendiye. Ji Fakulta Edebiyatê beşa felsefê mezûn e. Di dibistanên Ermeniyan de mamostetî û rektorî kiriye. Bi ermenî û tirkî dinivîse. Bi tirkî heta niha heft pirtûkên wî derketine. Pirtûkên wî yên herî bi navûdeng *Gavur Mahlesi û Söyle Margos nerelisen?* in.

**Ahmet Tari**

Amet Tari di sala 1941ê de li gundê Şilbê hatiye dinê. Heta amadeyiyê li Amedê xwendiye. Li Istenbûlê Fizîk xwendiye û li wir di beşa denel fizîkê de bûye asistan. Di sala 1968 an de Ahmet Tari ketiye ezmûneke (imtîhaneke) û dewletê ew şandiye Ingiltereyê. Li Londrayê, li Imperial Collegê, dest bi doktorayê kiriye. Di sala 1990î de Ahmet Tari bûye Professorê Fizîkê. Li ser mijarên cuda pirtûkek û gelek meqaleyên wî yên zanistî hene. Ji sala 2003an û vir de wî dest ji fizîkê berdaye. Ew niha li ser zimên, çand û dîroka Kurdan dixebite. Par bi navê 'The Conjugation of Kurdish (Kurmanjî) Verbs' *[Kêşana lêkerên Kurmancî]'* pirtûkeke wî ji aliyê weşanxaneya Apecê ve hati çap kirin. Ew li zanîngeha SOAS'e (School of Oriental and African Studies), îsal heftê carekê, êvarî, dersa Kurmanci dide.

**Recep Acay**

Receb Acay di sala 1946an de li Amedê ji dayik bûye. Dibistana seretayî, navîn û amadeyiyê li Amedê xwendiye. Li Enqerê ji falkulteya iletişimê (Ragihandinê) mezûn e. Di TRT (Türkiye Radyo Tevîzyonê) de kar kiriye. Şanogerî kiriye. Bi tirkî dinivîse. Heta niha bi navê *Ben-û Sen Gülleri* (Gulên Ben û Senê) û *Diyarbekir Dört Kapı* (Diyarbekir Çarderî) du pirtûkên wî hatine çap kirin.

**Kadri Göral**

Kadri Göral di sala 1948an de li Amedê hatiye dinê. Dibistana seretayî, navîn û amadeyiyê li Amedê xwendiye. Li Enqerê Falkuteya Mîmarî û Muhendîsiyê qedandiye. Di gelek kovar û rojnameyan de helbestên wî hatine weşandin. Piraniya helbestên xwe bi tirkiya Amedê nivîsiye. Bi navê *Diyarbekir Kuçeleri* pirtûkeke wî ya helbestan hatiye çap kirin.

**İhsan Işık**

İhsan Işık di 1952an de li Amedê ji dayik bûye. Perwerdeya xwe ya seretayi û û navîn li Amedê kiriye. Li Erzeromê fakultaye edebiyatê qedandiye. Bi mamostetiyê re di gelek cihan de kar kiriye. Helbestên wî cara yekem li Amedê di rojnameya Şark Postasi de hatine weşandin. Bi pirtûkên wî yên helbestan re, yên edebî, siyasî û civakî hene. Heta niha nêzîkî 20 berhememên wî hatine weşandin. Çend pirtûkên wî li ser zimanên din hatine wergerandin. Hemû berhemên İhsan Işık bi tirkî ne.

**İbrahim Halil Taş**

İbrahim Halil Taş, di sala 1953an de li gundê Şilbe ji dayik bûye. Di sala 1978an de Diyarbekir Eğitim Enstîtüsü beşa fransî xwendiye û di sala 1995an de di fransî de lîsans daye. Li herêma Kurdistanê mamostetî kiriye. Li Enstîtuya kurdî ya Amedê bi qasî salek di kursên kurdî de mamostetiya zimanê kurdî kiriye. Endamê Enstîtuya Kurdiya Amedê û TZP-Kurdî ye. Di berhemên xwe de navê Brahîm Xelil Şilbeyî bi kartîne. Di kovara W û Azadiya Welat de gelek nivîs û çîrokên wî hatine weşandin. Bi navê *Kêşana Lêkeran-Bi zaravayê Kurmancî* pirtûkeke wî heye.

**Mahmûd Lewendî**

Mahmûd Lewendî di sala 1954an de li Şêxuliya Jerîn hatiye dinê. Ji dibistana seretayî heta zanîngehê li Amedê xwendiye. Beşa biyolojiyê qedandiye. Piştî sala 1980 ji ber sedemên sîyasî derketiye derî welat. Li Swêdê bi cih bûye. Di kovar û rojnameyên Kurdan ên wek Hêvî, Armanc, Helîn, Berbang, Mîrkut, Çira, Wan, Dîdar Çarçira û Birnebûnê de nivîsên wî hatine weşandin. Mahmûd Lewendî di redaksîyona APECê de heta niha bi qasî 20 pirtûkên zarokan ji Swêdî wergerandiye kurdî. *Computera Ber Dilê Min, Mala Xwedê Ava, Rojnamegeriya Kurdi1-2* (li gel Malmîsanij) amade kirine. Niha di Kurd-1ê de wek radaktor kar dike.

**Şeyhmus Diken**

Şeyhmus Diken1954 li Amedê ji dayik bûye. Dibistana seretayi, navîn û amadeyiyê li Amedê û li Enqereyê fakulta zanîn û siyasî xwendiye. Sê sal qaymeqamî kiriye. Ji sala 1999 vir ve li Şaredariya Mezin a Amedê şêwirmend e. Bi tirkî dinivîse û heta niha 12 pirtûkên wî hatine weşandin. Piraniya pirtûk û nivîsên wî li ser Amedê ne. Di mijara Amedê de nivîskarekî pispor e. Hinek ji wan hatine wergerandin. Bi navê *Kürdilihicazkâr Metinler, Sırrını Surlarına Fısıldayan Şehir: Diyarbekir, Diyarbekir Diyarım Yitirmişem Yanarım, Tango ve Diyarbakır, İsyan Sürgünleri, Türkiye'de Sivil Hayat ve Demokrasi, Amidalılar (Sürgündeki Diyarbekirliler), Taşlar Şahit, Zevalsiz Ömrün Sürgünü Mehmed Uzun, Diyarbekir El Sallıyor. Bir Kürdün AKP Okumaları* pirtûkên wî hatine çap kirin.

**Medenî Marsil**

Medenî Marsil di sala 1956an de li Amedê hatiye dinê. Dibistana seretayî, navîn û amadayî li Amedê xwendiye. Ji ber sedemên polîtîk Enstîtuya Pewrwerdeyê ya Konyayê terk kiriye. Di sala 1981ê de derketiye derî welat û li Swêdê bi cih

bûye. Li Ewropê zanîngeha rojnamegeriyê xwendiye. Di kovar û rojnameyên kurdî de bi maxlesa Lewend Firat û Faris Can nivîsandiye. Bi navê *Cureyên nûçeyên rojnamegeriyê* pirtûkeke nivîsiye.

**Mustafa Gazî**
Mustafa Gazî di sala 1958an de li Şêxuliya Jerîn hatiye dinê. Dibistana, seretayî, navîn û amadeyiyê li Amedê xwendiye. Gelek helbestên wî bûne stran. Heta niha *Dîyarbekir Türkçesi, Pirpirim, Ferheng, Gurzek ji Zargotina Kurdan, Baweriya Batilên Kurdan, Pişo Meheme Diyarbekir Qebedayları, Navên kevnar ên mirov û heywanan* pirtûkên wî hene. Ew Mehmûd Lewendî bira ne.

**Mesut Değer**
Mesut Değer di sala 1959an de li Amedê hatiye dinê. Hemû perwerdeya xwe li Amedê kiriye. Parêzerî kiriye. Demeke berpirsiya rêxistin a CHPê ya Amêdê kiriye. Di sala 2002an de di lîsteya CHPê de ji Amedê wek parlamenter hatiye hilbijartin. Bi navê *Kürt Sorunu mu* pirtûkeke wî heye.

**Suzan Samancı**
Di sala 1962an de li Amedê ji dayik bûye. Heta dibistana amadeyî xwendiye. Bi tirkî dinivîse. Helbestên wê di navbera salên 1985-87an de di kovara *Sanat Olayi* de hatine weşandin. Wê piştre dest bi nivîsandina çîrokan kiriye. Heta niha bi navê *Eriyip Gidiyor Gece, Reçine Kokuyordu Hêlîn, Kiraç Dağları Kar Tuttu, Perili Kent* û *İki Anne* pirtûkên wê hatine çap kirin. Piraniya pirtûkên Suzan Samanci li ser zimanên cuda cuda hatine wergerandin. Çîrok û pirtûkên wê xelat girtine. Di heman demê de ew rojnamenivîs e jî.

**Murad Badgi**
Di sala 1971ê de li Amedê hatiye dinê. Dibistana seretayî, navîn û ya amadeyî li Amedê xwendiye. Li Stanbulê li zanîngeha Mermerê beşa aboriyê qedandiye. Di MKM de dest bi şanogeriyê kiriye. Bi taybetî Stand-up dilîze û bi kurdî pêşkêş dike. Niha di TRT6ê de kar dike. Di kovar û rojnameyan de bi kurdî dinivîse. Bi navê *Şûjin* pirtûkeke wî heye.

Institut kurde de Paris

**Veysi Barak**

Veysi Barak di sala 1964an de li Amedê hatiye dinê. Licî ye. Dibistana seretayî û navîn li Licê û ya amadeyî li Amedê xwendiye. Ji ber sedemên sîyasî li Faransê bi cih bûye û li wir zanîngeh xwendiye. Li ser ziman û wêjeya kurdî xebat û nivîsên wî hene. Weysî Barak û mamosteya xwe Joyce Blau li gel bi navê *Mauel de Kurde: Kurmanjî* pirtûkeke hînkirinê nivîsîne.

**Azad Zal**

Di sala 1972an de li gundê Çavşelqiyan ji dayik bûye. Li gund hem çûye dibistanê û hem jî li cem bavê xwe perwerda erebî dîtiye. Dibistana navîn û amadeyiyê li Amedê xwendiye. Di sala 1992an de dema amadeyî diqedîne ji ber çalakî û sedemên polîtîk tê girtin. 22,5 ceza didinê. Azad 12 sal li bajarên cuda li zîndanên cuda dimîne. Di sala 2004an de tê berdan. Azad di redaksîyona Azadiya Welat de dest bi kar dike. Piştre derbasî Enstîtuya kurdî ya li Amedê dibe û di komîteya wê de kar dike. Berpirsiyariya Kovara W dike. Dersên kurdî dide. Xwedî û berpirsê weşanxaneya J&J ye. Heta niha bi navê *'Teşî', 'Zimanê kurdî'* û *'Sûzê û Hirç'* sê pirtûkên wî hene.

**Murat Özyaşar**

Murat Özyaşar di sala 1979an de li Amedê hatiye dinê. Li Erxeniyê dibistana amadeyî xwendiye. Ji zanîngeha Diclê beşa zimanê tirkî mezûn e. Di gelek kovaran de çîrokên wî hatine weşandin. Bi navê *Ayna çarpması* pirtûkeke wî heye.

**Gulîzer**

Gulîzer di sala 1979an li gundê Elîparê hatiye dinê. Ji destpêkê heta dawî li Amedê xwendiye. Zanîngeha Dîclê beşa mamosteti ya îngilîzî qedandiye û niha mamostetiya îngilîzî dike. Heta niha *Keziyên Jinebîyê* û *Bûka Baranê* du pirtûkên wê hatiye çap kirin.

Institut kurde de Paris

## Dengbêj û muzisyen

**Ulfetî**

Di sala 1523an de li Amedê ji dayik bûye. Helbestvanke gelek bi navûdeng bûye. Di wê demê de helbestavanan weha gotine: Li Romê Baqî, li Îraqê Rûhî û li Amedê jî Ulfetî. Gelek berhemên wî hene. Bi erebî-farisî berhen amade kiriye. Xwediyê dengeke bilind û zelal bûye. Ulfetî di sala 1591 de miriye.

**Ciwan**

Di sala 1747an de li Amedê ji dayik bûye. Li herema Amedê ozanekî bi navûdeng bûye. Di sala 1814an de miriye.

**Aşiq Melû**

Ermenî ye û navê wî yê rastî Levon e. Amedî ye. Bavê wî westayê pûşî û mantînan e. Melû jî li cem bavê xwe di karê pûşî û mantînçêkirine de xebitiye. Ji ber ku di helbestên xwe de dev avêtiye der û dorê di 20 cotmeha 1895an de li Amedê hatiye kuştin. Tirk dibêjin Ermeniyan ew kuştiye û Ermenî jî dibêjin, Tirkan ew kuştiye. Ew di 20 saliya xwe de hatiye kuştin.

**Hacî Ciwan**

Hacî Ciwan, li Amedê ji dayik bûye. Di qehwexaneyê Amedê de keman lêdaye û striye. Çend stranên wî yên destanî hene. Ew di sala 1894an de miriye.

**Cedîdî**

Cedîdî, li Amedê ji dayik bûye. Li qehwexaneyan keman û tembêr lêdaye. Elî Emîrî dibêje ku Cedîdî baş tembûr lêdaye û dengê wî jî gelek zelal û xweş bûye.

**Mahîr**

Mahîr li gundê Şarabiyê ji dayikbûye. Di derbareyê jiyana wî de zêde agahdarî tune. Lêbelê helbestên û stranên wî hene. Mahîr di sala 1898an de miriye.

**Mansûr**

Mansûr di sala 1870 î de li gundê Şukurlî ji dayik bûye. Baş saz lêdaye û dengê wî jî xweş û zelal bûye. Wek tê zanîn Şukurlu gundê Türkmeman e. Ew di sala 1928an de miriye. Helbestên wî hene.

Institut kurde de Paris

**Hadîdî**

Hadîdî, li Amedê hatiye dinyayê, lê sala ji dayîkbûna wî ne diyar e. Tembûr lêdaye û dengê wî jî xweş û zelal bûye. Ew di sala 1814an de miriye.

**Şîrîn**

Şîrîn, li Amedê ji dayik bûye, lê sala dayikbûna wî ne diyar e. Tembûrê baş lêdaye û dengê wî zelal û xweş bûye. Di sala 1834an de miriye.

**Celal Güzelses**

Celal Güzelses di sala 1899an li Amedê hatiye dinê. Navê wi yê rastî Mehmed Celadedîn e. Dibistanê di nîvî de hiştiye. Piştî ku mezin dibe di navbera salên 1913-1921ê de li mizgefta Mezin muezinî dike. Di sala 1931ê de bi devoka Amedê stran dibêje û piştre diçe li Stanbulê sêlik dadigre. Di 1934an de paşnavê Güzelses digre. Di sala 1943an bi çend hevalên xwe ve Cemiyeta Xelkê ya Amedê dadimezrîne. Ew di 2ê sibata 1959an wefat dike. 46 stranê wî hene. Stranên kurdî wergerandiye tirkî. Bi taybetî ji stranên Soranî ji Teyfîq Wehbî girtiye û ji meqamê kurdî re gotinên tirkî çêkiriye.

**Sami Hazinses**

Navê Sami Hazînsesê di nifûsê de Samuel Uluç e. Ew ji Ermeniyê herêma Hênê ye. Samuel di sala 1925an de li Amedê ji dayik bûye. Piştî dibistana seretayi bav û diya wî mala xwe birine Stanbulê. Di sala 1953an de dest pê kiriye wek lîstik van di sînemayê de artîstî kiriye. Di gelek fîlman de rol girtiye. Ew di heman demê de westayê gotin û besteyê staranan e jî. Di 23ê tebaxa 2002an de li Stanbulê çûye ser dilovaniya xwe.

**Aşiq Îhsanî**

Nevê wî yê rastî İhsan Sırlıoğlu ye. Ew di sala 1932an de li Amedê ji dayik bûye. Hîn di zaroktiya xwe de dest bi helbestê kiriye. Wî da ye ser rêça aşiqan û demeke paşê bûye ozanekî navdar. Ozan İhsanî di biçûkiya xwe ve dest bi kar kiriye. Di sala 1957an de li bajarê Uşakê li fabrîka şekir kar kiriye û li wir Gulîşahê (Sevimê) nas kiriye û zewicîne. Cara yekem di sala 1958an de li radyoyê bi tirkî stran gotiye. Wi heta salê 1960î stranên gelêrî strîye û piştre dest bi stanên polîtîk kiriye. Ji ber starnên polîtîk gelek salan di girtîgehan de maye. Li Tirkiye û li derî Tirkiye gelek konser daye. Qiralîçeya Îngîlistan û serokkomarê Fransê

ew wek mêvanê dewletê vexwendiye û çûye li gelek welatan konser daye. Gelek stranên wî yên çîrokî jî hene. Wek Kerem û Asli, İhsani û Gulişah. Aşik Îhsanî di sala 2009an de, li Amedê çûye ser dilovaniya xwe. Gora wî li Amedê ye.

### Ayşe Şan

Ayşe Şan di sala 1938an de li Amedê hatiye dinê. Ji bo stran digotin ji ber malbata xwe mecbûr maye ji welat koçber bûye. Di radyoyan de stran gotiye. Gelek kaset û sêlikên wê hene. Piraniya stranên wê bi kurdî ne. Lê bi kurdî û tirkî jî hene. Ayşe Şan xwediyê dengekî zelal û qedîfe bû. Di dawî de ji Almanyayê vegeriya bajarê Îzmîrê. Bi nexweşiya penceşêrê ketiye. Di sala 1996an de li Îzmîrê çûye ser dilovaniya xwe.

Mala Dengbêjan
Foto: Mehmet Masum Süer



Institut Kurde de Paris

**Bedri Ayseli**

Bedri Ayseli sala 1946an de li Amedê hatiye dinê. Suryanî ye. Dibistana seretayî û navîn li Amedê xwendiye. Li konsertuvara şaredariya Stanbulê du sal muzîk xwendiye. Bi tirkî distire. Di radyoyê de stran gotiye. Ji aliyê din ve xwendina xwe dewam kiriye û bûye hekîmê diranan. Gelek kaset, sêlik û klîpên wî hene. Hîn jî ew li radyoyê wek hunermend kar dike.

**Kenan Temiz**

Kenan Temiz di sala 1946an de li Amedê hatiye dinê. Dibistana seretayî xwendiye. Di karên cihê cihê de xebitiye. Piştre di civat û dawetan de dest bi stranên tirkî kiriye û striye. Derketiye li pavyon, sahne û bexçeyên Amedê stran gotiye. Miroveki dengxweş û gelek kaset, Cd û albûmên wî hene.

**Gani Cansever**

Gani Cansever di sala 1951ê de li gundê Qadiya Mezin hatiye dinê. Tirkê elewî ye. Muzîsyenekî Sosyalîst û bi navûdeng e. Piraniya stranên wî bi tirkî ne, lê bi kurdî jî distre. Li Almanya dijî.

**Coşkun Sabah**

Coşkun Sabah di sala1954an de li Amedê hatiye dinê. Ji malbateke hunermend e. Birayê wi yê mezin Bulend Sabah bestekar û stranbêj e. Birayê wî yê biçûk Taşkin Sabah jî qanûn lê dide û stranbêj e. Coşkun Sabah di sala 1961ê de dest bi muzîkê û di sala 1969an de dest bi konservatûra şaradariya Stanbulê kiriye. Beste ya wî ya yekem di sala 1970î de bi meqama kurdî amade kiriye. Heta niha 45 besteyên wî di kaset û sêlikan de hatine tomar kirin. Hemû beste û stranên wî bi tirkî ne. Besteya wî ya yekem 'Gel kalbime Gir (Were bikeve dilê min) e. Bi eslê xwe Suryaniyê Amedê ye.

**Beşir Kaya**

Beşir Kaya 1955an de li taxa Ali Paşa ji dayik bûye. Ji biçûkiya xwe ve stran gotiye. Heta niha 18 albûmên wî derketine. Ji ber ku Beşir Kaya starnên xwe bi kurdî dibêje bi salan xwediyên şirketên muzîkê sêlik û kasetên wî dernedixistine. Niha dîsa dest pê kiriye bi kurdî kaset û cd yan derdixe.

Institut kurde de Paris

**Bülent Turan**

Bülent Turan bi eslê xwe Çêrmûgî ye. Ew di di sala 1970î li navenda Amedê hatiye dinê. Piştre bi malbatî li Erxeniyê bi cih bûne. Bülent Turan dibistana seretayî, navîn û amadeyî li Erxeniyê xwendiye. Piştre barkirine bajarê Edenê. Di gelek şev û xwepêşandanan de sitraye. Di gelek komên huner û muzîkê de xebitiye. Di sala 1998an de albûma wî derketiye. Gelek klîp û stranên wî yên bi navûdeng hene. Niha li Navenda Dîcle û Ferad a Amedê de wek hunermend kar dike.

**Eliyê Qerejdaxî**

Eliyê Qerejdaxî di sala 1963an de li gundê Şadiyê hatiye dinê. Neçûye dibistanê. Nabîne (haviz) e. Ji dengbêj Ziya û civatan hînî stranbêjiyê bûye. Bi amatorî gelek kaset dagirtiye û kasetên wî di nav gel de peyda dibin. Li ser jiyan û denbêjiya wî belgefîlmeke kurt hatiye çêkirin.

**Husênê Farî**

Husênê Farî (Hüseyn Tutal) di sala 1939an de li gundê Farê hatiye dinê. Dibistana seretayî li gund xwendîye. Heta 23 saliya xwe li gund jiyaye û dûre koçî navenda Amedê kiriye. Di 15 saliya xwe de dest bi stranan kiriye. Di destpêka salên 1970î de sêlikên bi kurdî dagirtiye.. Sêlikên wî bi navê Hüseyin Tutal hatine derxistin. Nêzî 200 stranî wî hene. Di sala 2000î de miriye û gora wî li gundê Farê ye.

**Mehemedê Şilbî**

Mehemedê Şilbî (Mehmet Çalan) di sala 1935an de li gundê Şilbê hatiye dinê. Dibistan nexwendiye, li gund sê salan feqîtiyê kiriye. Ji biçûktiya xwe ve stranan dibêje. Bavê wî jî dengbêj bûye. Hin starnan ku distrê ji bavê xwe hîn bûye. Li gund cotkarî û paytonvaniyê kiriye. Ligel ku ji malbateke kirmanckî ye, ew û zarokên xwe bi kurmancî diaxivin. Heta sala 2002an li Şilbê jiyaye û di 2002an de koçî navenda Amedê kiriye. Kaseteke wî heye.

**Mehmut Kızıl**

Mehmut Kızıl di sala 1939an de li navenda Amedê li taxa Fatihpaşa hatiye dinê. Bi eslê xwe ji navçeya Hezro ji gundê Bolşê ye. Di zaroktiya xwe de neçûye dibistanê, lê dûre ji derve de xwendiye û dîplome stendiye. Di zaroktiya xwe

Institut kurde de Paris

de, li Amedê gelek karên cur bi cur ên wekî avfiroşî, benîştfiroşî, sîmîtfiroşiyê kiriye. Di sala 1962an de wekî karmend li nexweşxaneya Nimûneyê dest bi kar kiriye. Hîn di zaroktiya xwe de dest bi strangotinê kiriye. Ji civatan û ji bavê xwe hînî stranan bûye. Di sala 1965an sêlika (plak) xwe ya yekem derdixe û êdî bi profesyonelî karê xwe yê dengbêjiyê domîne. Navê sêlika wî ya yekem "*Lorî Lorî Cembeliyê Min*" e. Piştî sêlika yekem, di nava demê de bi giştî 53 sêlikan dagirtiye. 250 -300 stranî dizane. Gelek stran jî wî bi xwe çêkirine. "Ax ciwaniyê", "Ezîzoxlû", "Garisê feqîra", "Wekîlê me" û gelek stranên din berhemên wî ne.

**Simaîlê Sêlimî**

Simaîlê Sêlimî (İsmail Tek) di sala 1956an de li gundê Sêlimiyê hatiye dine. Bi eslê xwe Serhedî ye. Malbata wî 80 sal berî niha koçî Amedê kiriye. Dibistan nexwendiye. Ji bilî wî di malabata wî de bavê û pismamê wî Mîrzeyê Macir jî dengbêj in. Ew xwe wek şagirdê Mihemedê Şilbî dibîne.

**Ûsivê Farî**

Ûsivê Farî (Yüsüf Tutal) di sala 1954an de li gundê Farê hatiye dinê. Dibistana seretayî qedandiye. Birayê dengbêj Huseynê Farî ye. Ji bavê xwe Eliyê Pîra Emikê (Kurê Usoyê Fîsî), birayê xwe Huseynê Farî û ji Meheme Salihê Beynatî hînî dengbêjiyê bûye. Heta salên 1985-87an li Farê jiyaye. Dûre ji Farê koçî Herbûtê kiriye. Li Herbûtê çandiniya pembo dike û heywan xwedî dike.

**Ademê Herbecinî**

Ademê Herbecinî (Adem Bayrak), di sala 1944an de li gundê Herbecina Amedê hatiye dinê. Pêşiyê wan ji navçeya Gimgimê, gundê Pîranê hatine Herbecûnê. Ev sê bav in li Herbecinê ne. Dibistan nexwendiye. Cotkariyê dike, heywanan xwedî dike. Li gund wek çîrokbêj tê nasîn.

**Evdilkerîmê Şemo**

Evdilkerîmê Şemo (Abdulkerim Can) di sala 1947an de li gundê Bindanê hatiye dinê. Dibistan nexwendiye. Bavê wî ji navçeya Licê, ji gundê Celikê hatiye Bindanê. Herweha koçî çend gundên din jî kiriye. Di sala 1978an de mala xwe bar kiriye navenda Amedê. Gelek stran dizane.

Institut kurde de Paris

**Mehemedê Kortepî**

Mihemedê Kortepî (Mehmet Kaya), di sala 1950î de li gundê Kortepe ji dayik bûye. Bi eslê xwe ji Wêranşarê ye. Koçeriyê dikin. Di sala 1950î de mala xwe birine gundê Kortepe. Heşt sal dibistan xwendiye. Ji deh saliya xwe de stranan dibêje. Stranên ku dibêje hinek jê yên wî ne. Carinan jî stranên Nûrî Polat dibêje. Evdilhadiyê Arzûlî û Mehme Salihê Beynatî, Reso û Şakirê Qereyaziyê diecibîne.

**Sebriyê Meheme**

Sebriyê Miheme (Sabri Karatepe) di sala 1955an de li gundê Şêxelîlka hatiye dinê. Heta 22 saliya xwe li Şêxelîlka maye. Bi eslê xwe ji gundê Akraga ye. Hemû malbata kalê wî hatine kuştin. Sala 1915an de kalê wî tenê sax maye. Ji Şêxelîlka çûne Çawîşiyê. Sêwî bûye li ber destê ap û amojnê mezin bûye. Tim rêncberî kiriye. Niha şivaniyê dike. Nikare binivsîne û bixwîne. Ji şevbihêrk û kaset û dengbêjan hîn bûye.

Institut kurde de Paris

## Perwerde û hîndekarî

Mixabin li Amedê bi kurdî perwerde û hîndekarî tune, qedexe ye û hemû bi tirkî ye. Asîmîlasyoneke gelek xurt a du alî heye. Ji aliyekî ve dewlet Kurdan asîmîle dike û ji aliyê din ve jî Kurd xwe bi xwe asîmîle dikin. Piraniya amediyên ku li navenda bajar û bajarokan dijîn niha li malên xwe, li cihê karên xwe, li kolan û bazaran bi tirkî dipeyivin. Hema her kes bi zarokên xwe re bi tirkî dipeyive û êdî zarok bi kurdî nizanin. Ecêbeke mezin e, piraniya dê û bavan baş bi tirkî nizanin û zarokên wan jî bi kurdî nizanin. Li herêmê asta xwendin û nivîsînê gelek nizm e. Dewlet bi statîstikên sexte dixwaze rejî û asta xwendinê bilind nîşand bide. Di vî warî de statîstikên dewletên yên herî dawî weha ne:

Ji %18 zarokên pêşdibistanî diçin zarokxane an pêşdibistaniyê. Zarokên ku diçin dibistana seretayi ji %96, dibistana navîn %50, pîşe û teknîkê ji %4 in. Rejiya xwendinê bi giştî 77. 8.[149]

Li gor vê tabloya jêrîn li parezgeha Amedê di nav jin û mêran de asta xwendin û nivîsandinê weha ye.

| rejiya xwendin û nivîsandinê (%) | | | |
|---|---|---|---|
| sal | jin | mêr | giştî |
| 1935 | 2.56 | 13.04 | 7.68 |
| 1955 | 8.34 | 30.54 | 19.72 |
| 1970 | 15.75 | 46.88 | 32.06 |
| 1980 | 21.43 | 59.50 | 41.18 |
| 1990 | 38.82 | 73.04 | 56.26 |
| 2010 | 68.6 | 88 | 77.8 |

Bi taybetî ji bo jinan rewşeke kadastrof e. Li gor vê lêkolînê hîn îro jî jin ji %25.2 nikarin bixwînin û binivîsin. Li 400 gundan dibistan tune ne. Di sala 2010an de ANKAyêjî li 97 gundên Amedê lêkolîne çêkiriye. Li gor vê lêkolînê rewşa perwerde, xwendin û nivîsandina jinan weha ye:

Ji %79,4ên jinan nikarin bixwînin û binivîsin. Ji %15.8ên jinan dibistana seretayi û ji %0.4 dibistana navîn xwendine. Di azmûnên zanîngehê de Amed li Tirkiyê di rêza 55an de ye û ji %5.5 dikarin bi serbikevin û qeyda xwe li dibistaneke bilind çêbikin.

[149] Diyarbakır Ticaret Ve Sanayi Odası, rapor s. 11, Aralık 2009.

Dewlet bi statîstîkan nîşan dide ku ji %67ên jinan xwendina wan heye, lê di lêkolîna ANKA ya jorîn de xuya dike ku ji %79.4 ne xwenda ne. Jin û mêrên ku dibistana seretayî neqedandina ji %40 in. Li Amedê yên ku piştî lîsê diçin zanîngehê an jî dibistaneke bilind hejmara wan ji %10 e.[150] Li gor agahdariyên mamosteyên ku li Amedê kar dikin statîstika dewletê ne rast e û ya ANKAyê nêzîkî rastiyê ye. Ji ber ku dewlet çend hefteyan jinan dişîne kursên xwendin û nivîsandinê û bêyî ku xwendin û nivîsandinê hîn bibin, kaxezeke didin wan û dibêjin "xwendin û nivîsandinê hîn bûne." Lê di rastiyê de piraniya jinan nikarin bixwînin û binivîsin. Bi van kursên sexte dewlet dixwaze li hember raya giştî rejiya xwendin û nivîsandinê bilind nişan bide.

Li Amed û hemû bajarokên Amedê li gor sala 2010an bi giştî hejmara dibistan, dem û dezgehên dewletê yên fermî, hejmara mamoste û şagirdan weha heye:[151]

| hejmara dibistanên seretayî | 1097 |
|---|---|
| hejmara pêşdibistanan | 17 |
| hejmara amadeyiyan (lîseyan) | 41 |
| hejmara dibistanên taybetî | 17 |
| hejmara amadeyiyên pîşeyî | 26 |
| hejmara amadeyiyên ku perwerdeya bi zimanê bîyanî didin | 16 |
| hejmara kursên MTSK | 48 |
| hejmara dersxaneyên taybetî | 53 |
| hejmara perwedeya taybet a navendên rehabîlitasyonê | 43 |
| navenda perwerdeyên etûdê | 1 |
| hejmara kursên taybetî | 17 |
| bi giştî hejmara dibistanan | 1448 |
| hejmara mamosteyên xwedî branş | 9122 |
| hejmara mamosteyên sinifê | 6051 |
| bi giştî hejmara mamosteyan | 15173 |
| hejmara şagirdên law | 216435 |
| hejmara şagirdên keç | 399919 |
| bi tevî | 616354 |

Institut kurde de Paris

150 Prof. Dr. Melih Ersoy, *ODTÜ, Kentsel Alanlarda Yoksul Kesimin Saglık Sorunları*: Ankara ve Diyarbakır Kentlerinde Karşılaştırmalı Bir Araştırmanın Gösterdikleri

151 http://diyarbakir.meb.gov.tr/.

## Saziyên çandî û hunerî

Kurdan bi xwe ji bo parastin, hînkirin û pêşxistina ziman, wêje, çand û hunera kurdî çend dem û dezgeh vekirine.

**Navenda çand a Dîcle û Feradê**

Navenda Çanda Dîcle û Feradê di sala 2003an de wek Navenda Çandê hatiye avakirin. Di sala 2008an jî statûya komeltiyê girtiye. Ne rêxistineke şaredariyê ye, têkiliyên wê bi Navenda Çanda Mezopotamyayê ve (NÇM) heye. Komeleyeke ku ji aliyê gel ve hatiye avakirin. Cihê wê li taxa Melik Ehmedê ye. Xwedî çend salonên mezin û çend polan in ku li wir civîn, kurs û semînerên cuda tên dayîn. Çend beşên wê yên xebatê hene. Wek şano, muzîk, govend, sînema, wêne û Mala Dengbêjan. Avahiya Mala dengbêjan bi serê xwe ye û bi qasî 200 metreyan jê dûr e. Mala Dengbêjan di sala 2007an de bûye beşeke ji navendê. 28 endamên Mala Dengbêjan hene. Di mehê de du bernameyên bi navê dîwan amade dikin.

Her beşeke Navenda Çanda Dîcle û Feradê di nav xwe de kursan dide. Komên navendê jî hene. Koma Nûjiyan, koma Aryen, koma Jinan (koma Star), koma Hemdem, koma Şano (Yekta Hêvî), koma Govendê (Dîcle-Feradê). Ji derî koman Bulend Turan, Burhan (Axîn Welat) û Nihal Ay jî solîstên Navenda Dîcle-Feradê ne.

Kovara Rewşen berê li Stanbulê ji aliyê NÇM ve dihat derxistin, niha li Amedê ji aliyê Navenda Çanda Dîclê û Ferad ve tê derxistın.

**Enstîtuya kurdî ya Amedê**

Enstîtuya kurdî ya Amedê di sala 2004ande hatiye avakirin. Armanca Enstûtiyê parastin û pêşxistina, ziman, wêje û çanda kurdî ye. Di van mijaran de dest bi xebata xwe kiriye. Ew, Kurdî -Der û rojnameya Azadiya welat li Batı Kentê di heman avahî de ne. Enstîtuya Kurdî ya Amedê giranî daye ser berhevkirina berhmên devkî yên ku heta niha nahatine komkirin û çapkirin. Herweha berhemên ku bi kurdî û bi alfabeyên cuda hatine nivisîn Enstîtû tarnskirîbeyê alfabeya latînî ya kurdî dike. Li gel van xebatan di warê ziman, wêje û çanda kurdî de konferans, panel û civînan li dardixe. Enstîtuya kurdî heta niha 32 pirtûk bi kurdî weşandiye. Kovara "W" ji hejmara 14an ve heta niha 36 ji aliyê Enstîtuyê ve hatiye derxistin. Di navbera Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Komela



Zaningeha Diclê

Nivîskarên kurd li Amedê, şaredariyên Amedê û Enstîtuya Kurdî ya Amedê, TZPa Kurdî û şaredariyên Amedê de hevkariyeke xurt heye.

## Zanîngeha Dîcleyê

Di sala 1966an de Fakulteya Tipê ya Diyarbekirê vekirine û bi ya Enqerê ve girê dane. Di sala 1969an de zanîngeha Enqerê hinek xwendekarên xwe ji bo xwendinê şandine Fakulteya Diyarbekîrê û gelek xebatên xwe di vê zanîngehê de didomine. Di 1974an de Fakulteya Fenêvekirine, ev fakult bûye sedema vekirina zanîngeha Diyarbekîrê.

Bi derketina qanûna hindekari ya bilind ya hejmara 2547 zanîngeha Dîclê nav û statuya xwe girtiye. Niha li ser zanîngeha Dîcleyê, 13 fakulte, 11 dibistanên bilind yên pişeyî, 5 dibistanên bilind, konservatûarek, 3 ensîtutu, 8 navendên pêkanîn û lêkolînan û nexweşxaneyeke perwerdehî û lêkolînî hene.

### Navenda çand a Cegerxwîn

Navenda Çend a Cegerxwîn girêdayîyê Şaredariya Peyasê ye. Navend di sala 2009an de hatiye avakirin. Birêvebirî û fînansa wê li ser şaredariyê ye. Avahiyeke nû, mezin û bi nûjenteknîk e. Di navê de gelek salonên konferansan, cihên

kar û polên dersê hene. Navenda Çand a Cegerxwîn ji gelek semîner û konferansan re malovanî dike. Navend xwediyê Konservatuareke kurdî ye. Dema perwedeya konservatuarê du salî ye. Konservatuarê di sala 2010an de dest bi perwerdeyê kiriye. Şeş beşên konservatuarê hene: Sînema, şano, lîstikên gelêrî, wêne, muzîk û wêje. Di beşên sînema û şanoyê de 25 xwendekar, di beşa wêjê de 20 û di her beşa din de jî 50 xwendekar hene.

Konservatuar pirzimanî ye. Lê giranî û piraniya zimanê perwerdê bi kurmancî ye. Xwendekarên ji bo serlêdana destpêkê divê bi kêmasî mezûnê dibistana seretayî bin û ji 16 salî mezintir û ji 30 salî biçûktir bin.

**Komela Çira**

Komela Çira dis ala 2005an de hatiye damezrandin. Di demeke kurt de ji aliyê dewletê ve hatiye girtin. Di sala 2006an de vê carê komel bi navê Diyarbekir Çira vebûye. Navendeke çandê ye. Piraniya birêvebir û endaman xwendekarên dibistanên amadeyî û zanîngehê ne. Lokal her vekiriye. Li lokala komelê kursên kurdî, folklor, muzîk şano û sînemayê tên dayîn.

**Navenda Hunerê ya Diyarbekirê**

Navenda hunerê ya Diyarbekirê (Diyarbakır Sanat Merkezi) di sala 2002an de ji aliyê gelek sazî û kesên cuda yên ku bi hunerê ve mijûl in hatiye damezrandin. Bi kurtî navê wê DSM ye. Armanca rêxistinê ji derê metropolên wek Enqere, Stanbul û Îzmîrê li Anatoliyê û Amedê jî cihên huner û çandê ava bikin. Di bernameya wê ya xebatê de mijarên çandên herêmî, netwewî û cîhanî hene. Di beş û mijarên wêje, wêne, hunera hemdem, şano û sînemayê de xebat dike û alîkarî û piştgiriyê dide kesên ku di van mijaran de dixebitin. Saloneke wê sînemayê ya ji bo 110 kesan heye. Herweha DSM xwediyê pirtûxaneyeke 6.500 pirtûkan e. Di warê çandê de bi şaredariya Bajarê Mezin re hevkarîyê dike.

**Sumerpark**

Sumerpark xwediyê dîrok û pêvajoyeke rengîn û taybetî ye. Cara yekem di navbera salên 1949-1952an de dewletê li herêma Stasyonê avahiyên Sumerbankê çêkiriye. Di sala 1954an de li wir dest bi çêkirina tevneyên hirî û fabrîkaya Şayaxan kirine. Di destpêkê de di fabrîke û dezgehan de qumaşên erzan û bi taybetî ji bo artêşê cilûberg çêkirine. Di sala 1972an de di sîstema wê de guhrankariyeke çêkirine û vê carê kirine fabrîkeya xalî û tevnên hiriya Sumerbankê. Di



Institut kurde de Paris




Institut kurde de Paris



Mala Rojê
Foto: Ji arşîva Şaredariyê

sala 1998an de dewletê Sumerbankê firotiye şaredariya Amedê. Şaderariyê navê Sumerbankê guhertiye û navê Sumerparkê lê kiriye. Parka Sumerparkê (Parka Sumerê) 80 berecot e. Piştî salên 1990î ji ber sedemên şer û pevçûnan, li parezgeha Amedê gelek gund û mezra hatine valakirin û şewitandin, gelê herêmê mecbûr û bêçaremaye û koçberê navenda bajêr kirine. Ji aliyê jiyana civakî ve li navenda bajêr bêmalî, bêkarî, nezanî, birçîbûnî kaoseke mezin çêkiriye. Şaredariyê ji ber van hewcedariyan biryar girtiye ku Sumerparkê ji bo koçberan bike Qada Jîyana Hevpar.

Şaredariya Bajarê Mezin hinek cihên fabrîke yên hundirîn restore kiriye û hinek beşen din li wan zêde kiriye. Lojmanên berê jî kiriye Navenda Pêşvebirina Civata sîvîl û Konseya Bajêrê Amedê. Şaredariyê di vê avahiya nû de ji bo zarok, ciwan, temenmezin, jin û kesên handîkap gelek projeyên berbiçav û jîndar pêk aniye û tîne. Ji bo xelkê bajêr, bi taybetî yên ku ji gund û warên xwe koçber bûne, bêkar û bêperwerde mane derfetan amade dike. Atolyeyên pîşeyî, yên xalî û xalîçe, têlkarî, karên destî, tiştên xeml û xêz, cam û şûşe, kursên li ser kuştûkal (ziret), teknîk, polên perwerdeyê, sînema, şano, wêne kursên zimanên kurdî, îngîlîzî, muzîk, spor, folklor û hwd tên dayîn. Li nav parkê bi navê Kutupxana Mehmed Uzun pirtûkxaneyeke mezin û dewlemend heye. Herweha navenda rojnamevanan û Mala Rojê li nav parkê ne ku

Parka Sumerê
Foto: Ji arşîva Şaredariyê

Institut kurde de Paris

ji aliyê teknîkî ve gelek balkêş e. Ev Mala Rojê li ser sîstema enerjiya rojê hatiye avakirin. Xanî hemû enerjiya xwe ji sîstema rojê digre û hewcedariyên xwe temîn dike. Ji ber vê yeke li herêmê mînakeke balkêş e û gelek demû dezgeh, lêkolîner û şagird tên lêdikolin.

Di aliyê çandî û ramanî de jî li pol û salonên Sumerpark ên nûjen panel, semîner, sempozyum, form û civînên netewî û navnetewî yên curbe cur tên amade kirin. Navenda Çand û Turîzma Şaredariya Mezin li vê parkê ye û karû barên çand û turîzmê ji aliyê Gerînendetiya Çand û Turîzma Bajarê Mezin ve tê birêvebirin.

**Kurdî - Der**

Kurdî Der (Komeleya lêkolîn û pêşvebirina zimanê kurdî) di sala 2006an de li Amedê hatiye damezrandin. Navenda komelê li Amedê ye û komîteya birêvebir ji 14 kesan pêk tê. Heta niha li 15 bajar û bajarokan şaxê wê hatine vekirin.

Armanca Kurdî - Derê li dij pişaftin û xwepişaftina ziman û çanda kurdî ye û ji bo pêşketin û geşkirina ziman û çanda kurdî xebat dike. Kursên kurdî dide.



Institut kurde de Paris

Mamosteyên kurdî perwerde û amade dike. Li ser ziman, wêje û çanda kurdî semîner û panelan li dardixe. Di radyo û TVan de bernameyan amade dike. Meş û mîtîngan organîze dike. Di navbera Kurdî -Der, Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Komela Nivîskarên Kurd li Amedê û şaredariyan de xebatên hevbeş û hevkar hene.



Institut kurde de Paris

**Komela lêkolînên rojhilatî**

Şarkiyat Araştırmaları Derneği (Komela Lêkolînên Rojhilatî) di sala 2005an de ji aliyên komeke akademîsyenên amedî yên bawermend û serbixwe ve hatiye avakirin. Ji roja avakirinê heta niha her rojên înê li navenda komelê semînerên curbe cur tên dayîn. Herweha li herêmê çend sempozyum pêşkêş dikin. Di komelê de kursên erebî, îngîlîzî, osmanî û farisî tên dayîn. Birêvebiriya komelê niha dixwaze û plan dike ku dest bi kursên kurdî jî werin kirin.Pirtûkxaneyeke komeleyê heye ku hejmara pirtûk û berhemên ku heta niha lê hatine komkirin ji 20.000 î derbas kiriye.

## Çûnûhatin

Amed ji berê ve li ciyekî stratejîk e. Ne bi tenê li ser riya hevrîşim, herweha Asya û Ewropay, Ewropa û Afrîkayê bi hev girêdide. Di nav sê parzemînan de weke pirekê ye. Ji ber vê yekê, Amed hata niha bûye belayê serê xwediyê xwe. Her fermandarê ku bi xwe û bi hêza xwe ya leşkerî bawer bûye, xwestiye bavêje ser kela




Otogar
Foto: Kaya Kaymak

Amedê. Hîn îro jî ji aliyê çûnûhatine ve Amed li ciyekî girîng û startejîk e. Bi riyên reşayî, hewayî û hesinî navenda herêmê ye.

### Riya hesin

Yek riyeke trênê heye ku ew jî di sala 1944an de ji Heyder Paşayê tê Meletiyê, Amed û bi ser Êlihê re heta Misircê (Kurtalanê) dom dike. Stasyona dawî Misirc e. Ev rê her roj dixebite. Ji derî vê trenê bar di navbera Amed û Batmanê de diçin û tên.

### Otogar

Riya reş a Amedê, bi Riha, Dîlok, Edena û bi Enqerê ve girê dide. Ber bi bakur ve li ser Erxeniye, Xarpêt, Meletye û piştre dibe du rê, yek Kayserî û Enqera û ya din bi ser Amasyê re diçe Deryaya Reş. Bi rojhilatê bakur ve bi ser Licê ve diçe Çewlik, Mûş û heta Erzeromê. Ji rojhilat ve bi ser Êlih û ji aliyê din ve bi ser Farqîn, Bedlîs, Wan û Qersê de diçe heta Îranê. Ji başûr ve diçe Mêrdînê, ji wir dibe du rê. Yek Îraqê ya din ji bi ser Nisêbînê de diçe Sûriyê.

Otogara Amedê li derî bajêr li ser riya Siwêregê ye. Ji otogarê serî her saetê otobus hene ku diçin her derê. Li Amedê riya herî bikêrhatî û karhatî hem ji bo rêwî û him ji bo bar riya reş e. Cara yekem di navbera salên 1955-1956an de otobusên Gazanfer Bilge di navbera Amed û Stanbulê de dixebitîn, Piştre Kontaş û Kamil Koç dest bi seferan kirine. Di sala 1981ê de şirketa Öz Diyarbakır dest bi rêwitiyê kiriye. Piştre Diyarbakır Sur û Diyarbakır Îtîmadê dest pê kirine. Niha şirketên herî mezin ev in: Öz Diyarbakır, Özlem Diyarbakır, Star Diyarbakır, Yenî Diyarbakır, Has Diyarbakır û Diyarbakır Barış in.

Institut kurde de Paris

**Balafirgeh**

Balafirgeha Amedê di sala 1952an de ketiye xizmetê. Balafirgeheke leşkeriyê ye, lê ji bo rêwiyên sivîl ên nav Tirkiyê jî tê bikaranîn. Balafirgeha Amedê ne balafirgeheke navnetewîye, tenê ji bo nav Tirkiyê tê bikaranîn. Dema balafirgeh nû hatiye avakirin 6 km ji navenda bajêr dûr bûye, lê niha balafirgeh ketiye nav bajêr. Qada ku ji bo rîwiyan bi kar tê 2600 m$^2$ ye. 200 cihê otoparkan hene. Ji sala 2008an ve sîstema ILS bi kar tînin. Rêwî gelek in û kapasîte gelek biçûk e. Pirsgirêkên termînal û apronê yên herî mezin in. Balafirgeh ketiye nav bajêr hema hema her roj balafirên şer li peyî hev bi ser bajêr re gelek nizim difirin û dengekî bilind û xof derdixin. Xelkê bajêr bi awayekî psîkolojîk nerhet dikin. Di sala 2009an de 8.897 balafir rabûne û danîne. 1.060.381 rêwî siwar û 10.856 ton bar barkirine.[152]

# Ameda piştî salên 1990î

Ji sala 1984an vir ve, li herêmê şer, têkoşîn, alozî berz bû. Bi taybetî di salên 1990î parezgeha Amedê bû navenda çalakiyan. Dewletê dest bi şewatandin, wêrankirin û talankirina gund û navçeyên Amedê kir. Di navbera du-sê salan de piraniya gund û bajarokan valakir. Bi hezaran kes bi darê zorê gund, mezra û bajarokê xwe terk kirin. Hinek ji wan koçê metropolên Tirkiyê û hinek jî koçê navenda Amedê kirin. Di navbera 20 salan de nifûsa navenda Amedê ji 270î hezarî derket mîlyonek.[153] Navenda bajêr bi carek re nepixî û mezin bû. Herêmen nû yên wek Peyas, Gaziler, Hamrewat-Gökkuşağı, Diclekent, Batıkent, Şehitlik, Seyrantepe her yek bi serê xwe bû bajarekî mezin. Li nav bajarê kevn di hewşekê de çend malbat dijîn. Amed bû bajarekî metropol. Heta bû nîvbajar û nîvgund. Li aliyek bajareke nûjen, xaniyên 15-20 tebeqeyên bilind, cadeyên fireh, jiyaneke nûjen û modern; ji aliyê din ve xelk bê star û xanî, birçî û tazî mane. Li gor dokumentên komeleya Sarmaşikê heta niha 22.000 malbatî serî li komelê dane ku komele alîkarî û piştgiriya wan a aborî bike. Lê ji ber bêderfetiyan komele nikarê alîkariya her kesê serlêder bike. Bi tenê her meh alikariya 2.300 malbatan dikin.[154]

Di nav vê bajarê modern de mirov rastî keriyên pezan, dadan û dûxana tenûrên gundiyan û sergoyên nava bajêr tê. Di vê mijarê de statîstîk weha di-

[152] Agahdari û statistik ji birêvebiriya balafirgehê hatine girtin.


[153] Yerel Gündem 21 Diyarbakır ve Sarmaşık Yoksullukla Mücadele ve Sürdürebilir Kalkınma Derneği li taxa Gündoğan statistikên koçberiyê

[154] Komela Sarmaşık di nîsana sala 2000an de ji aliyê şaredariya Mezin, Komela Bazirganan û 32 dem û dezgahên sivîl ve hatiye damezrandin. Ji ber ku di van 20 salên dawî ji ber sedemên siyasî, civakî û aborî gelek mirov koçberên navenda Amedê bûne. Koçberiyê pirsgirêkên wek aborî, civakî, bêkarî bi xwe re aniye. Bajar êdi nikarê hewqas mirov ragre. Bajar bûye navenda xizanî û belengaziyê. Armanca sereke ya komela Sarmaşik ji kes û malbatên xizan re alîkariya tiştên xwarinê bikin. Di 15 mayısa 2007an de komelê dest bi alîkariyê kiriye.

Institut kurde de Paris

bêjin: Koçberiya navenda Amedê ji %62,9 e û ya derî Amedê ji %48 e.[155] Li gor statîstîkên dewletê ya sala 2000î li Amedê bêkarî ji %30,2 e û li gor statîstîkên Yekîtiya Sanayî û Bazirganî ya Amedê ji %70 e.

Li taxa Gündoğan li gor salan hejmara koçberên ku hatine Amedê




Ji sala 2008an heta niha ji parezgeha Amedê 57.000 malbat bi awayekî fermî serî li Komîsyona tespîtkirina zerarê ya ku ji aliyê wîlayêtê ve hatiye damezrandin dane. Malbat ji dewletê tazmînat dixwazin ku dewletê gundê wan wêran kiriye, beşek ji mal, eşya û heywanên wan şewitandiye. Wek gund yên ku bi awayekî fermî ji dewletê tazmînat dixwazin û serî li GÖÇ-Derê dane 445 gund in. Hejmara gundiyên ku ser li komîsyona zerar û zîyanê dane li gor bajarokên Amedê weha ne:[156]

| bajarok | hejmara gundan |
|---|---|
| Bismil | 67 |
| Çinar | 20 |
| Çêrmûg | 1 |
| Erxenî | 8 |
| Farqîn | 103 |
| Gêl | 6 |
| Hêne | 16 |
| Hezro | 42 |
| Karaz | 11 |
| Licê | 78 |
| Pasûr | 76 |
| gundên navendê | 17 |
| bi giştî | 445 |

155 *Sayılarla Diyarbakır*, Diyarbakır Ticaret ve Sanayi Odası, sayfa 28
156 Statistikên Göç-Dera Amed

**Komela Mafê Mirovan û Weqfa Mafê Mirovan**

Komela Mafê Mirovan beşa Amedê di sala 1988an de hatiye damezrandin. Saziyeke sivil û îdeal e. Dema ku li herêmê gund ji aliyê leşkeran ve hatine xera kirin, şewitandin, koçberkırin, li gel êşkence û lêdan hatiye kirin û li kolanên bajaran kes hatine kuştin, Komela Mafê mirovan hatiye damezrandin. Armaca Komelê parastina mafê mirovan û di vî warî de berhevkirina dokumentan, ji aliyê huqûqî ve alîkariya mirovên ku neheqî dîtine, mexdûr bûne, êşkence û lêdan dîtine, mal û milkên wan zerar dîtine, dikin. Hejmara endamên Komela Mafê Mirovan a beşa Amedê nêzîkî 900 kesan in. 20 kes jî bi awayekî aktîv û îdeal di komelê de dixebitin.[157]

Li Amedê ji derî Komela Mafê Mirovan, di heman mijarê de beşa Weqfa Mafê Mirovan a Tirkiyê jî heye. Di sala 1990î de Komela Mafê Mirovan û 32 Parezvanê mafê Mirovan li gel vê weqfê damezrandine. Navenda wê li Enqerê ye. Armanc û xebata herdu saziyan nêzîkî hev in û ligel hev hevkarî û tevkariyê dikin.

Institut kurde de Paris

**Yekîtiya Huqûqnas û Yekîtiya Bijîşkan**

Baroya Amedê di sala 1927an de hatiye damezrandin. Niha 520 endamên wê hene. Piraniya endamên Baroya Amedê bi temenê xwe ciwan in.

Herweha Yekîtiya Bijîşkan jî li Amedê bi rêxistinî ye û gelek çalak e. Ev herdu rêxistinên pîşeyî yên sivîl di warê xizmetên civakî, bijûndarî, dadmendî û têkoşîna ji bo demokrasiyê de li Amedê roleke mezin dilîzin.

**Yekîtiya Odeyên Esnaf û Zenatkaran**

Li Amedê li taxa Bağcılar li kolana Amîdê avahiya Yekîtiya (Odalar Birliği) Esnaf û Zenatkarên Amedê heye. Avahiyeke mezin û nûjen e. Yekîtiya Esnaf û Zenatkarên Amedê ji 43 komeleyên (bi tirkî odên) pîşeyî pêk tê. 32.442 kes endamên yekîtiya giştî ne. 43 odeyên ku endamê Yekîtiya Esnaf û Zenatkaran in ev in: 1. Yekîtiya Esnaf û Zenatkaran li Bismilê, 2. Yekîtiya Şofêr û Otomobîlvanan li Bismilê, 3. Yekîtiya Esnaf û Zenatkaran li Çermûgê, 4. Yekîtiya Şofêr û Otomobîlvanan li Çermûgê, 5. Yekîtiya Esnaf û Zenatkaran li Çinarê, 6. Yekîtiya Foşêr û Otomobîlvanan li Çinarê, 7. Yekîtiya Esnaf û Zenatkaran li Çingûşê, 8. Yekîtiya Esnaf û Zenatkaran li Pîranê, 9. Yekîtiya Beqal û Şekirfiroşan li Amedê, 10. Yekîtiya Berber û Kuaforvanan li Amedê, 11. Yekîti-

[157] Dema me pirtûkê amade dikir, ji birêvebiriya Komelê sê kes di girtîgehê de bûn: Serok Av. Muharrem Erbey, Sosyolog Arslan Ozdemir û Sosyolog Roza Erdede.



Dicle Kent
Foto: Melike Dara Günal

ya Esnaf û Zenatkaran li Amedê, 12. Yekîtiya Elekrtîker û Bobîneran li Amedê, 13. Yekîtiya Firinciyên li Amedê, 14. Yekîtiya Wênekêş û Şêwekaran li Amedê, 15. Yekîtiya Xurdekar, Bayîyên Tupan û Tamirkerên Saroncokan li Amedê, 16. Yekîtiya Firoşkerên Malzemeyên Avahiyan û Boyaxkeran li Amedê, 17. Yekîtiya Înternetkafe û Esnafên Çayxaneyan li Amedê, 18. Yekîtiya Qehwexane û Çayxaneyan li Amedê, 19. Yekîtiya Qesaban li Amedê, 20. Yekîtiya Kavaf û Lastikçiyan li Amedê, 21. Yekîtiya Esnafên Kereste û Dîrekxanan li Amedê, 22. Yekîtiya Esnafên Konfeksiyon û Manîtaforeciyan li Amedê, 23. Yekîtiya Solbendan li Amedê, 24. Yekîtiya Zêrker û Sarafan li Amedê, 25. Yekîtiya Aşxane û Şîrînxaneyan li Amedê, 26. Yekîtiya Dartiraş û Mobîlyafiroşan li Amedê, 27. Yekîtiya Tamircî û Otomobîlciyan li Amedê, 28. Yekîtiya Sebze û Mêwefiroşan li Amedê, 29. Yekîtiya Servîsên Erebeyan li Amedê, 30. Yekîtiya Terziyan li Amedê, 31. Yekîtiya Şofêr û Otomobîlvanan li Amedê, 32. Yekîtiya Tuhafiye û Parfumciyan li Amedê, 33. Yekîtiya Firoşên Tiştên Turîstîk li Amedê, 34. Yekîtiya Zexîrefiroşan li Amedê, 35. Yekîtiya Zucaceciyan li Amedê, 36. Yekîtiya Esnaf û Zenatkaran li Erxeniyê, 37. Yekîtiya Şofêr û Otomobîlvanan

li Erxeniyê, 38. Yekîtiya Esnaf û Zenatkaran li Hezroyê, 39. Yekîtiya Şofêr û Otomobîlvanan li Hezroyê, 40. Yekîtiya Esnaf û Zenatkaran li Pasûrê, 41.Yekîtiya Esnaf û Zenatkaran li Licê, 42. Yekîtiya Esnaf û Zenatkaran li Farqînê, 43. Yekîtiya Şofêr û Otomobîlvanan li Farqînê.

### Fabrîke û kargeh

Li Amedê îndustrî û cihên kar û kargeh gelek kêm in. Dewlet bi xwe çênake û ji şexsan re jî baş alîkariyê nake. Amed bi firehiya axa xwe li Tirkiyê bajarê heftem û bi nifûsa xwe bajarê dehem e. Amed ketiye nav sîstema bajarê mezin. Li gel Şaredariya Mezin, Şaredariya Bajarê Kevn (Sûr), Bajarê Nû (Yenişehir), Şaredariya Rezan (Bağlaran) û Şaredariya Peyasê (Kayapinar) hene.

Li seran serê parezgeha Amedê 6 KSS hene û ji wan sê li navendê ne. Di 1200 cihê kar de 10.00 karker dixebitin. Li bajêr sê tamîrxaneyên otoyan hene. Li navenda bajêr û li hemû qezeyan 24 îmaletên makîne çêkirinê hene, lê ji wan çend dikarin tiştên biçûk biafrînin yên mayî dîsa wek tamîrxanan in. Di 350 cihên biçûk de bi qasî 12.000 kes kar dikin. Sektora xwarinê ya herî mezin e û ji %25 e. Maden ji %20 e. Di vê sektorê de ji %90 mermer e. Sektora sêyem ji %18 tekstîl e. Ji %80 vê sektorê fabrîka pembo ye. Ixracat ji %11,8 e û ji nêvî vê diçe îraqê. Ji %53 vê îxrecatê mermer e.



Galeriya

Institut kurde de Paris



kurde de Paris

## Gundên navendê

**Abasî** (Kartaltepe) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 29 km dûr e. Nifûsa gund 200 e. Xerabarî mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Dewletê di sala 1934an de ji bo asîmîlekirina Kurdan ji Bulgaristan û Yugoslavyayê Macîrên Tirk anîne li gund bi cihkirine. Lê, ew di demeke nezîk de ji gund koçî metropolên Tirkiyê kirin. Dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Akinciyan** (Ekinciler) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 37 km dûr e. Nifûsa gund 720 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan û mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Alanqoz** (Yalanköz) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 28 km dûr e. Textê Rûmiyab û Bîrîkzîr mezreyên wê ne. Nifûsa gund 290 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Arepyenice** (Kırmasırt) dikeve başûrê Amedê û ji Amedê 22 km dûr e. Nifûsa gund 1120 e. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund asfalt e.

**Arpedere** (Arpadere) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 35 km dûr e. Nifûsa gund 250 ye. Soxtulu (Söğütlü) mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Arzoxlî** (Kervanpınar) dikeve başûrê rojhilatê Amedê û ji Amedê 26 km dûr e. Riya trêna ku diçe Batmanê di ber gund re derbas dibe. Nifûsa gund ji 500î bêtir e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Asbeka** (Geyiktepe) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 18 km dûr e. Nifûsa gund 800 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Girê gund, gorên kevn û dîrokî hene. Li gund şebekeya av û kanalîsazyone, dibistan, mizgeft, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Axmeşat** (Soğanlı) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 33 km dûr e. Nifûsa gund ji 400î zêdetir e. Gulçayir mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Axwêrana Biçûk** (Küçükakören) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 46 km dûr e. Li herêma Têrkan e. Nifûsa gund 1.790 e. Çarkaniya Mezin (Büyükerkeçli), Çarkaniya Biçûk (Küçükerkeçli), Sûtexan (Sapanca), Sîçanan (Alakarga), Newla Ziwa (Kuruçay, Ziyaret û Kanispî (Sütpinar) mezreyên wê ne. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li herêma gund bîrên petrolê hene. Li gund, mizgeft dibistan, nexweşxane, telefon û elektrîk li hene. Nîvê riya gund qûmkirî ye.

**Axwêrana Mezin** (Büyükakören) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 60 km dûr e. Li herêma Têrkan e. Nifûsa gund ji 1400î derbas dike. Beybûnî (İkikuyu), Xalitan (Alsalkım), Bozpınar û Qehreman Mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li herêma gund bîrên petrolê hene. Li gund dibistan, nexweşxane, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Li ser riya Hêneya kevn e û rê asfalt e.

**Bahçecik** dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 30 km dûr e. Li ber çemê Zeynika ye. Nifûsa gund li derdora150î ye. Bozpınar û Îzedîn mezreya wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Berê gundê êzîdî bûye û niha çend malên êzîdiyan li gund mane. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Balixê** (Cumhuriyet) dikeve rojavayê Amedê. Ji Amedê 27 km dûr e. Nifûsa gund 620 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gor hinek çavkaniyan gundî elewî ne û elewiyên Kurd in. Ji aliyê Xarpêtê hatine û bi cih bûne. Li gund dibistan, nexweşxane, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Baqewsa Xerabe** (Süngüler) dikeve bakurê Amedê. 32 km ji Amedê dûr e. Li devê çemê Dîclê ye. Bi zebeş û petêxên xwe navûdeng e. Nifûsa gund li derdora 300î ye. Rê qûmkirî ye. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene.

**Baroxlî** (Baroğlu) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 51 km dûr e. Nifûsa gund ji 350î derbas dike. Yazlıktepe mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Başîl** (Başil) dikeve bakurê Amedê, ji Amedê 18 km dûr e. Nifûsa gund 750 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li herêma gund bîrên petrolê hene. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Beheka** (Baykara) dikeve bakurê Amedê Ji Amedê 40 km dûr e. Li ber Bendava Fûrtaxşê ye. Nifûsa gund 400 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li herêma gund ji sala 1964an ve bîrên petrolê hene. Di van salên dawî de ji van bîran bi sedhezaran varîl petrol derxistin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Bindana Mezin** (Büyükçelikli) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 54 km dûr e. Nifûsa gund 325 e. Bindana Jêrîn (Küçükçelikli), Şêx Xelîlkan (Konaklar), İslam, Qeredere û Koşk (Çekmar) û Ziyaret mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Bûbya** (Sağdıçlı) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 54 km dûr e. Li ser riya Licê ye. Nifûsa gund 230 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Canqetran** (Cankatran) dikeve bakurê Amedê, li ser riya Erxeniyê li paş fabrîkaya TEMSANê ye. Ji Amedê 20 km dûr e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, mizgeft, telefon û nexweşxane û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Cûcik** (Cücük) dikeve bakurê rojavayê Amedê û ji Amedê 22 km dûr e. Li qeraxê bendava Dengecûgê ye. Nifûsa gund 280 e. Gurzo (Balpınar), Qarinçî (Karınca) mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Cimikan** (Çakmak) dikeve bakurê rojavayê Amedê û ji Amedê 42 km dûr e. Nifûsa gund 1014 e. Kanîmaran (Pınarlık), Geyigan (Geyik), Gezeran (Ulular) û Yeşilköy mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li herêma gund cihên kevn digihên heta serdema neolotîk. Li Cimikan pileya perwerdê bilind e. Li gund dibistan, nexweşxane, mizgeft, sîstema av, telefon û elektrîkê hene. Li ser riya Erxeniyê ye. Ji riya Erxeniyê şûn ve riya gund asfalt e.

**Cirnika Têrkan** (Ağaçlıdere) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 39 km dûr e. Nifûsa gund 510 e. Yağmurlu, Kengerli, Yeniköy (Kartaltepe), Axmeşeta Jorîn, Osman û Koyun mezreyên wê ne. Dewletê di sala 1934an de ji Bulgaristan û Yugoslavyayê macîrên Tirk anine li Yenîköyê bi cih kirine, lê, di demeke nêzîk de ji gund koçî metropolên Tirkiyê kirine. Di şûna wan de Kurd bi cih bûne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Rê asfalt e.

**Cirnik** (Pınardüzü) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 20 km dûr e. Nifûsa gund 200 e. Cirnikgulê mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Comek** (Ilbaş) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 26 km dûr e. Nifûsa gund 225 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Çanaxçiya Garbî** (Batıçanakçı) dikeve başûrê Amedê. Li ser riya Rihayê ya kevn e. Li pişt balafirgeha leşkerî li ber çemê Hewarê ye. Ji Amedê 15 km dûr e. Nifûsa gund 600 e. Îzalî (Dahilî), Tilgaz, Dehlehewar (Yemişalan), Gulî (Karayibik), Qerakilîse (Akçadamar) û Çiftlik mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, nexweşxane, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Çanaxçiya Şerqê** (Doğuçanakçı) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 26 km dûr e. Nifûsa gund 405 e. Tilgaz (Sazlıçörek), Çokek (Arapordu), Serwet û Güldalı mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Çaroxî** (Çarıklı) li ser riya Mêrdînê û dikeve başûrê Amedê. 7 km ji Amedê dûr e. Çemê Hewarê di nêzîkî gund re diçe ser çemê Dîclê. Navên taxan bi tirkî weha ne: Kazıktepe, Kubacık, Ortaşar, Taşhelvası, Toraman û Yeşilvadi. Nifûsa gund 15.000 e. Di sala 1996an de lê şaredarî hatiye damezrandin. Salek berê dewletê bi derxistana qanûna şaredariyan statûya şaredariyê rakir û da ser Şaredariya Sûrê ya Navenda Amedê. Yanî Çaroxî bû taxeke Amedê. Mezatxaneya Amedê ya nû niha li Çaroxiyê ye. Li Çaxorxiyê nexweşxane, dibistan, mizgeft, sîstema av, kanlasazyon, telefon û elektrîkê hene. Li ser riya Mêrdînê ye û rê asfalt e.

**Çavşelqiya** (Kayayolu) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 45 km dûr e. Li ser riya Amed û Farqînê ye. Gund 2 km ji rê dûr e. Çemê Mûsiyan di ber gund re derbas dibe. Li ser şaredariya Sûrê ye. Navê wê yê herî kevn Gulemîran e. Navê niha ji navê Çawîş Elî Keya tê. Loma jê re dibêjin Çawuşelîkeya. Damezrevanê gund Hecî Emer an jî Emer Keya ye. Emer Keya di sala 1793an de li gundê Kerxa Zirkan tê dinê. Di yeksaliya xwe de ew diya xwe tên Çavşelqiyan. Gund heta niha du car ji aliyê dewletê ve hatiye şewtandin. Cara yekem di sala 1932an de ji bo ku Evdirehmanê Benî mahkumê dewletê bûye û gundî lê xwedî derketine, dewletê gund şewitandiye û gundiyan koçber kiriye. Cara duyem jî di sala 1993an de ji bo gundî alîkariya gerîla dikin gund şewitandine. Niha sê malbat li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Çayanan** (Çataksu) dikeve bakurê rojhilat ê Amedê û ji Amedê 32 km dûr e. Nifûsa gund 220 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan û mizgeft hene. telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Çermo** (Kumrucak) dikeve rojhilatê Amedê û li ser riya Licê ye. Ji Amedê 27 km dûr e. Nifûsa gund 250 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Çiftlik** dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 12 km dûr e. Nifûsa gund 300 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Çixsor** (Yaytaş) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 30 km dûr e. Nifûsa gund 1340 e. Karewerî, Ornak (Örnek), Bozek (Boşek), Îgliyan, Eyşik (Ayışık), Al û Dîcle mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Çolû** (Tavşantepe) dikeve başûrê Amedê û ji Amedê 18 km dûr e. Nifûsa gund 325 e. Kayalar û Korpınar mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Girekî dîrokî gund heye. Tê gotin du di serdema asûriyan de navê vir Tûşxana bûye. Li gund dibistan û mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris

**Çîçekî** (Çiçekliyurt) dikeve başûrê rojavayê Amedê û ji Amedê 24 km dûr e. Nifûsa gund 300 e. Li gund koşkeke kevn heye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Daban** (Taban) dikeve bakurê rojava yê Amedê û ji Amedê 44 km dûr e. Nifûsa gund 580 e. Kodiya Jorîn (Yukarıotluk), Yukarıleylekli, Deniz û Tehtebeş mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Dahla Ezîz** (Topyolu) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 18 km dûr e. Nifûsa gund 150 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Dankira** (Akdibek) dikeve rojavayê Amedê. Li ser riya Rihayê ye û 25 km ji Amedê dûr e. Riya gund asfalt e. Nifûsa gund niha 250 e. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene.

**Dengecûk** (Gözegöl) dikeve bakurê rojavayê Amedê û ji Amedê 25 km dûr e. Li qeraxê bendava Fûrtaxşê ye. Nifûsa gund 250 e. Leglega Jêrîn û Çal (Alçak) mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Derbeşûr** (Sarıdallı) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 23 km dûr e. Nifûsa gund 550 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, lê girtiye û şagird diçin gundê nêzîk. Li gund telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Derwêşhesena** (Dervişhasan) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 37 km dûr e. Niha nifûsa gund 750 e. Gund li deştê ye û gundî çandiniyê dikin, heywan xwedî dikin. Doxanlî mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Deweli** (Develi/Sarılar) rojava yê Amedê û ji Amedê 26 km dûr e. Niha gund 75 mal e û nifûsa gund ji 700î zêdetir e. Tirbespî (Avcısuyu), Yaylak, Kurdo, Avcılar û Gulîce (Büyükdere) mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.



Institut kurde de Paris

**Dêmî** (Karpuztepe) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 63 km dûr e. Nifûsa gund ji 150î derbas kiriye. Li gund elektrîk, telefon hene. Dibistan tune û şagird diçin dibistana nêzîk. Riya gund qûmkirî ye.

**Dehla Ezîz**/Dehla Azîzoğlu (Tonoğlu) ji Amedê 16 km dûr e. Nifûsa gund 150î heye . Bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan tune. Zarok sibehan tên li navenda Amedê diçin dibistanê û aliyê êverê diçin gund.

**Dêrimte** (Eser) dikeve bakurê Amedê, ji Amedê 14 km dûr e. Nifûsa gund 350 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye

**Elîbardexan** (Alibardak) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 40 km dûr e. Nifûsa gund 655 e. Pîrhusên mezreya wê ye. Girekî dîrokî li mezreya Pîrhusên heye. Di encama kolanên arkeologan de li ser kevirekî kolandî wêneya Xweda-Qiralê Akadan Naram-Sîn derketiye ku bz 2230-2260 li herême hukim kiriye.[158] Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, nexweşxane, av, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Elwaniya Jorîn** (Övündüler) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 30 km dûr e. Li ser riya Amed û Siwêregê ye. Elwamiya Jêrîn mezreya wê ye. Nifûsa Elwaniya Jorîn nêzîkî 500 û ya Jêrîn jî 600 heye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Engewra Jorîn** (Yukarıkılıçtaşı) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 14 km dûr e. Nifûsa gund 360 e. Engewra Jêrîn (Aşağıkılıçtaşı), Qitirbila xeraba (Karpuzveren), Patrîk (Çayırtarla) û Rencber mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund stabîlîze ye.

**Erebaska** (Gölpinar) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 28 km dûr e. Nifûsa gund 365 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund mizgeft, dibistan, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

[158] Mehmet Mercan. Yahoo Diyarbakır Mail Grubu

Institut kurde de Paris

**Erebşahbana** (Koyungüden) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 38 km dûr e. Nifûsa gund 396 e. Azraîla (İncedal), Yarımca mezreya wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye lê girtiye. Telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Erdalî** (Kumluçat) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 37 km dûr e. Nifûsa gund 300 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Rê şose ye.

**Esentepe** dikeve bakurê rojava yê Amedê û ji Amedê 25 km dûr e. Nifûsa gund 400 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Eyneto Jorîn** (Yüksek) dikeve bakurê Amedê û 13 km ji Amedê dûr e. Nêzîkî gundê Qamîşekê ye. Gundekî nû ye. Di sala 1984an de hatiye avakirin. Nifûsa gund 600 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Niha li ser şaredariya Yenîşehîrê ye. Riya gund asfaltkiri ye. Li gund, dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene.

**Eyneto** (Güvercinlik) dikeve bakurê Amedê. ji Amedê 17 km dûr e. Nifûsa gund 1.250 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Niha li ser şaredariya Yenîşehîrê ye. Gundekî gelek kevn e. Û ev gund li ser wan xerabeyan hatiye avakirin. Xarpêt (Harbut) mezeraya wê ye. Li Xarpêtê bi xwe dibistan heye. Mezreyeke şên e û mezreya wê jî heye. Xelkê mezreya Xarpûtê ji gundê Farê hatine û ev gund avakirine. Li gund mizgehft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Şaredariyê av aniye gund. Riya gund qûmkirî ye.

**Êxiliya** (Sancar) dikeve bakurê Amedê. Ji Amedê 20 km dûr e. Niha nifûsa gund 260 e. Li ser riya Xarpêtê ya kevn e. Riya kevn kevirkiri ye. Li ser riya reş a Xarpêtê pira Reş heye.

**Farê** (Güzelköy) dikeve bakurê Amedê, ji Amedê 15 km dûr e. Nifûsa gund ji 1.600î zêdetir e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, kanalîsazyon, mizgeft, dibistan û nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Fenûs** (Harmanardı), dikeve rojavayê Amedê. Ji Amedê 38 km ji dûr e. Nifûsa gund 225 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Fidêlan** (Alıcık) dikeve bakurê Amedê. Li herêma Têrkan e û 53 km ji Amedê dûr e. Nifûsa gund ji 1.200î derbas kiriye. Herêmê bîrên petrolê heye. 28 bîr li herêma gund in û yên din ên herêmên nêzîk li wir depo dikin û dibin. Ev bîr û depoyên petrolê zerareke mezin didin hawîrdorê û bijûndariya mirov û jîndarên herêmê. Ji bo ku hawîrdor genî dibe û xetere ye, gundî li hember şîrketên petrolê nerazîbûna xwe nîşan didin. Li gund, dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon heye. Riya gund bi qasî 40 km asfalt e û yê mayî jî qûmkirî ye.

**Gêncan** (Gencan) dikeve bakurê Amedê, ji Amedê 29 km dûr e. Li ber çemê Dîclê ye. Nifûsa gund 478 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Girbelek** (Talaytepe) dikeve rojavayê Amedê. Li ser riya Siwêregê ye û ji Amedê 5 km dûr e. Gundekî nû ye û navê xwe ji girê Belek girtiye. Girbelek niha di nav tixûbê Şaredariya Peyasê (Kayapınarê) de ye. Nifûsa gund ji 600 î bêtir e. Li gund dibistan tune. Şagird tên navenda Amedê. Mizgeft, av, kanalîsazyon û telefon hene. Riya gund asfalt e.

**Girê Tahlî** (Karacaören) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 43 km dûr e. Nifûsa gund derketiye ser 300î. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Gozeliya Çolê** (Çölgüzeli) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 15 km dûr e. Nifûsa gund 1.140 e. Serap û Loka mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Gundê Pira Ambarê** (Köprübaşı) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 21 km dûr e. Li ser riya Amed û Farqînê li qeraxê çemê Zeynikan (Ambarê) e. Nifûsa gund 620 e. Qaraqoça Şerqî (Doğukarakoç), Koşk û Gundê Canê mezreyên wê ne. Dewletê di salên 1934-1938an de Tirkên Bulgar anîbû û ji wan re gundekî

Institut kurde de Paris

modern avakiribû. Di van salên dawî de macîrên bulgarî malbat bi malbat ji gund barkirin û çûn metropolan. Kurdan mal û milkên wan kirîn û li gund bi cih bûn. Niha ji wan macîrên Bulgar çend malbat li gund mane. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, av, kanalîsazyon, mizgeft, dibistan, pirtûkxane û nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Gund di nav tixûbê şaredariya Sûrê de ye.

**Gundik** (Yenidoğan) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 33 km dûr e. Nifûsa gund ji 200î zêdetir e. Bi navê Axhusên mezreyek wê heye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin, zarok diçin dibistana nêzîk. Telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Hacîdel** (Dumrul) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 58 km dûr e. Li herêma Têrkan e. Nifûsa gund 650 heye. Pîrekalan (Yalındam), Encilîn (Bozkuş) û Mezin (Serçe) mezreyên wê ne. Li Pîrekalan cihên kevn hene. Nawis û loxît hene. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Hacîosman** dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 24 km dûr e. Nifûsa gund 285 e. Henîfî mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Harbecin** (Tanışık) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 16 km dûr e. Nifûsa gund 1.100 e. Zermemik (Sarılı) û Xerîbpişk mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan kanalîsazyon, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gûd qûmkirî ye.

**Hestiyan** (Hatipoğlu) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 38 km dûr e. Nifûsa gund 260 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Hebeşî** (Oğlaklı) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 28 km dûr e. Nifûsa gund 520 e. Cedelî (Küpbaşı), Heşteqê Cuma (Ağılkaşı) û Hebeşî mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris

**Heftgermê** (Sarıkamış) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 30 km dûr e. Nifûsa gund li derdora 600î ye. Daqews (Dürümlü) û Baqews (Kavşan) mezreyên wê ne. Di şerê Şêx Seîd e Baqewsê şewitandine. Dewletê neviyê Hecî Bekirê Gewrê bi xanî ve şewitandine. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Hestiya** (Beneklitaş) dikeve bakurê rojavayê Amedê û ji Amedê 22 km dûr e. Li ser riya Erxeniyê ye. Nifûsa gund nêzîkî 240 e. Niha taxa Amedê ye. Şaredariyê av biriye gund. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Heşolû** (Karaçimen) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û 55 km ji Amedê dûr e. Nifûsa gund 300 e. Harem (Çıkınlı) û Tembela (Kahyalı) mezreyên wê ne. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Dibistan li gund heye, lê naxebite û şagird diçin dibistana gundê nêzîk. Riya gund qûmkirî ye.

**Heşteka Bahrî** (Topraktaş) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 18 km dûr e. Nifûsa gund 500 e. Behrî mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Hewralî** (Kuşburnu) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 21 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 200î ye. **Yabacı** û Erwanî mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan û mizgef, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Heygecûk** (Büçüktepe) dikeve başûrê Amedê. ji Amedê 22 km dûr e. Nifûsa gund 330 e. Beyana Jorî, Beyana Jêrî û Tiştana (Selamsuyu) mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt û bi qasî 2 km qûmkirî ye.

**Hidirîlyas** (Hızırilyas) dikeve başûrê rojhilatê Amedê û ji Amedê 25 km dûr e. Nifûsa gund li derdora 230î ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, lê girtiye., mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Husênîka Deştê** (Harmanlar) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 45 km dûr e. Nifûsa gund 280 e. Îslam, Qazı, Barış û Axmeşeta Rojhilat mezreyên wê ne.

Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Husênîk** (Kesikağaç) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 11 km dûr e. Nifûsa gund ji 800î derbas kiriye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Îngice** (Yenice) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 30 km dûr e. Kurê û Tekevler mezreyên wê ne. Nifûsa gund li derdora 450-460 e. Berê gundê êzîdiyan bû. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Îsheqan** (Çubuklu) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 37 km dûr e. Nifûsa gund 250 e. Çermo (Kumrulu) mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li herêma gund bîrên petrolê hene. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kahbî** (Bağıvar/ Dîcle Mahlesi) dikeve başûrê Amedê. Ji Amedê 7 km dûr e. Gundekî gelek kevn û dîrokî ye. Berê gundê ermeniyan bûye, niha Ermenî li gund nemane. Bi tenê li hinek derodoran xerabeyên wan mane. Niha nifûsa wê 13.500 e. Di sala 1996an de li Kahbiyê şaredarî hatiye damezrandin. Salek berê dewletê bi derxistina qanûna şaredariyan statûya şaredariyê rakir û da ser şaredariya Sûrê ya navenda Amedê. Niha di resmiyetê de taxeke Amedê ye. Îsal li jêrê pira Dehderî ya kevn nêzîkî gund li ser Dîclê pireyeke nû çêkirine. Bi Çêkirina vê pireyê re li Amedê niha sê pire li ser Dîclê hene. Dibistan, nexweşxane, mizgeft, telefon, av, kanalasazyon û elektrîk li gund hene. Rê asfalt e.

**Kanqird** (Tellikaya) dikeve başûrê Amedê û ji Amedê 24 km dûr e. Li gund 136 mal hene û nifûsa gund 900 e. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund nîv qûmkirî û nîv jî asfalt e.

**Kendeş** (Yazılıpınar) dikeve rojhilatê Amedê. Li ser riya Licê ye. 27 km ji Amedê dûr e. Nifûs 400 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Riya gund bi qasî 3 km yî qûmkirî ye.

**Keklik** dikeve bakurê rojava yê Amedê û ji Amedê 50 km dûr e. Li paş bendava Fûrtexşê ye. Nifûsa gund di navbra 240-250î de ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kengerliya Têrka** dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 27 km dûr e. Nifûsa gund ji 300î bêtir e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kengerlî** dikeve rojhilatê Amedê bi qasî 38 km ji Amedê dûr e. Li ser navenda Amedê du Kengerlî hene. Niha nifûsa gund 150-160 heye. Li gund elektrîk. telefon û mizgeft hene. Riya gund asfalt e.

**Keşîşlik** (Kamışpınar) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 40 km dûr e. Nifûsa gund li derdora 500î ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Sergoya zibla Amedê li nêzîkî vî gundî tê kom kirin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kelek** (Sakkalı) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 37 km dûr e. Nifûsa gund 400 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Dibistan heye, lê girtiye û şagird diçin gundê nêzîk. Mizgeht, telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kevnecar** (Alabal) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 38 km dûr e. Nifûsa gund ji 300î derbas kiriye. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Rê asfalt e.

**Kodê** (Kolludere) dikeve başûrê rojavayê Amedê û ji Amedê 20 km dûr e. Danakiran, Qerqencik, Kaşıkçı, û Taşdîrek mezreyên wê ne. Niha 105 mal li gund hene û nifûsa gund nêzîkî 1.000 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kortepe** (Körtepe) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 21 km dûr e. Nifûsa gund ji 1000î derbas dike. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Koşkê** (Köşk) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 13 km dûr e. Nifûsa gund 210 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kurdîkan** (Tezgeçer) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 33 km dûr e. Nifûsa gund ji 400î bêtir e. Yenidoğan mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li herêma gund bîrên petrolê hene. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Koredere** (Eryolu) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 60 km dûr e. Nifûsa gund ji 300î zêdetir e. Kurdên şexbizinî ne. Ji kevn ve ji başûr hatine û li wir bi cih bûne. Gundekî bi serê xwe ye. Têkiliyên wan û gundiyên derdorê bi hev kêm in. Keç ji gund nadin der û ji der nayînin. Bi zaravayê şêxbizinî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kurdomera** (Bostanpınar) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 32 km dûr e. Nifûsa gund 450î ye. Koçek (Ataşlar) û Ocaklar, Aktaş û Dehlîpınar mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Mermera Fîsê** (Mermer Bucak) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 40 km dûr e. Nifûsa gund 1.082 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund kanalîsazyon, dibistanana seretayi û lîse, mizgeft, nexweşxane û qereqol hene. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Mermera Kevn/Têrkan** dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 35 km dûr e. Xundûsê û Kanîxidirê mezreyên wê ne. Nifûsa gund 700 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li herêma gund bîrên petrolê hene. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Metranî** (Kuşlukbağı) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 21 km dûr e. Nifûsa gund 320 e. Dewletê di sala 1934an de ji Bulgaristan û Yugoslavyayê macîrên Tirk anîn li gund bi cihkirin, lê ew di demeke nêzîk de ji gund koçî metropolên Tirkiyê kirin. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris

**Meyqûnî** (Konacık) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 51 km dûr e. Nifûsa gund 290 e. Mencesar, Cixsê (Malyazı), Konaklar, Şêxmehman (Efendî) mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Mezrê** (Ziyaret) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 43 km dûr e. Nifûsa gund 250 e. Karabey, Aslantepe û Gulxan mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye

**Mila** (Sanyar) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 60 km dûr e. Nifûsa gund 890 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Mîraxuran** (Beybulak) dikeve bakurê rojhilatê Amedê. ji Amedê 46 km dûr e. Nifûsa gund li derdora 800î ye. Rikalan (Sarıkaş), Kaniya Dirik (Kızıltepe), Kaniya Zêran (Altınpınar), Girê Hecîxelîlan/Remla (Yayıntepe), Tapik (Tapik), Akmeşeta Rojhilat (Doğuakmeşat) mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Muderis** (Bozdemir) dikeve başûrê Amedê û ji Amedê 14 km dûr e. Nifûsa gund 230 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Mizah** (Doğanlı) dikeve bakurê rojhilatê Amedê. 60 km ji Amedê dûr e. Li ser riya Hênê ya kevn e. Eşkol mezreya wê ye. Nifûsa gund li derdora 150î e. Li gund, elektrîk, mizgeft û telefon hene. Riya gund asfalt e.

**Muslexîk** (Dönümlü) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 8 km dûr e. Nifûsa gund 700 e. Newabat (Yenîkonak) mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Nasirî/ Nesrîyeylak** (Yukarınasırlar) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 22 km dûr e. Nifûsa gund 230 e. Nasrêulya, Nasriya Jêrîn (Aşağınasırlar) û Koderelya

mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Omerikan** (Yeniözerli) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 40 km dûr e. Li paş bendava Fûrtaxşê ye. Nifûsa gund 400 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, lê zarok diçin gundê nêzîk. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Riclik** (Yiğitçavuş) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 12 km dûr e. Li ser riya Farqînê ye. Berê mezreya Tilelo bî. Cihê firotina êzingên Amedê li vî gundî ye. Nifûsa gund 310 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Qadyana Biçûk** (Küçükkadı) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 15 km dûr e. Jê re Zimmi qadyan jî dibêjin. Ji ber ku di zemanê berê de gundê Ermeniyan bûye, jê re Qadyana Gawir jî dibêjın. Nifûsa gund nêzîkî 500î ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Qadyana Mezin/Qadyana Tirkan** (Büyükkadı) dikeve bakurê Amedê, ji Amedê 21 km dûr e. Jê re Qadyana Musluman jî dibêjin. Nifûsa gund nêzîkî 500î ye. Gundê Tirkmen ên elewî bû. Di serdema osmanî heta hinek dibêjin berî serdema Osmanî ji aliyê Xoresanê hatine û li gund bi cih bûne. Heta çend salan berî niha gundekî mezin û şên bû. Gundiyan ji bo zebeşên devê çem kevok xwedî dikir û li gun qoxîxane hebûn. Rezên gund di dema xwe de bi navûdeng bûn. Li gund rejiya xwendinê gelek bilind bû. Ji gund gelek nivîskar, helbestvan, hunermend û kesên zanyar derketine. Gundî koçberê metroplolên Tirkiye û Ewropayê bûne û çend mal li gund mane.

Du pîrozgehên gund hene. Navê yekê Deveboynû ya din jî Dolu Baba ye. Di van 15-20 salên dawî de Kurd ji gund û bajarokên Amedê hatine û li gund bi cih bûne.

Li navenda Amedê bi navê Büyük Kadı ve Şarabi Köylüleri Kültür ve Dayanışma Dernegi (Komeleya Piştgirî û Çandiya Gundiyên Qadyan û Şarabiyê) komeleyeke wan heye. Ev komele di sala 2007an de hative damezrandin. Komelê wek qehwexane û cihê lîstikê bi kar tînin. Riya gund asfalt e, dibistan nexweşxane, telefon û elektrîk li gund hene.

**Qamîşek** (Güvendere) dikeve bakurê Amedê, ji Amedê 29 km dûr e. Nifûsa gund 498 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Niha statuya gund guhertine taxa navenda Amedê ye. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qarexan** (Karahan) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 30 km dûr e. Nifûsa gund 500 e. Qişla, Kuşdoğan, Sofîxelîl (Sofuhalil) û Havîngê mezreyên wê ne. Li gund dibistan heye, lê girtiye û şagird diçin dibistana nêzîk. Li gund, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qebeseqelî** (Kabasakal) dikeve rojhilatê Amedê. 12 km ji Amedê dûr e. Nifûsa gund 300 heye. Axa tûxleyan ji wir tînin û tûxle çêdikin. Li gund elektrîk, mizgeft û dibistan hene. Riya gund asfalt e.

**Qerebaş (Karabaş)** dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 18 km dûr e. Nifûsa gund 1.100 e. Anşah (Güvercinevleri) û Daraklî (Taraklı) mezreyên wê ne. Dewletê di sala 1934an de ji Bulgaristan û Yugoslavyayê macîrên Tirk anîne li gund bi cihkirine, lê ew di demeke nezîk de ji gund koçî metropolên Tirkiyê kirin. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund bi alikariya şirketeke Fransa û Amediyan rezekî mezin ku 20.000 mêwan pêktê hatiye çandin. Li herêma gund fabrîkaya mey tê çêkirin û dê 300 kes lê kar bikin. Li gund dibistan, nexweşxane, kanalîsazyon, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Qerekilîs**/Kilîsa Reş (Dökmetaş) dikeve bakurê Amedê, ji Amedê 12 km dûr e. Trafoya elektrîkê ya Amedê li vî gundî ye. Nifûsa gund 1.500 e. Bozik û Toprakevler mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, nexweşxane, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Qerenaz** (Kavaklıbağ) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 47 km dûr e. Nifûsa gund 470 e. Basabas (Değirmentepe) mezreya wê ye. Hemû bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qereqoça Rojava**/Xerbî) (Batıkarakoç) dikeve başûrê Amedê û ji Amedê 15 km dûr e. Nifûsa gund 600 e. Sunetî (Yarımtaş) û Îmameqil (Adaklı) mezreyên

Institut Kurde de Paris

wê ne. Îmameqil navê xwe ji pîrozgeha Îmameqil digre. Pîrozgeheke bi navûdeng e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qerewêrî** (Alpu) dikeve bakurê Amedê, ji Amedê 18 km dûr e. Nifûsa gund 350 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qereqûb** (Karayakup) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 39 km dûr e. Li qûntara çiyayê Qerecdaxê ye. Nifûsa gund 375 e. Dibistan, mizgeft, elekrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qirtê** (Ağaçgeçit) dikeve başûrê Amedê û ji Amedê 14 km dûr e. Nifûsa gund 350 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan tune, şagird diçin dibistana nêzîk. Telefon û elektrîk li gund hene. Rê asfalt e.

**Qirxalî** (Pirinçlik-Yolboyu) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 20 km dûr e. Nifûsa gund 2.343 e. Cebarî (Kaynaklar), Xaşta Kebahrî (Topraktaş), Tilolûg (Güldalı), Çayır û Pozluk mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund kanalîsazyon, dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Qizilê** (Sarıyazma) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 38 km dûr e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qozan** (Kozan) dikeve başûrê rojhilatê Amedê û ji Amedê 14 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 1.000 e.. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li nêzîkî gund bendaveke biçûk heye. Li gund sê gir hene. Hersê jî ziyaret in. Tê gotin ku du bira û xuşkek hebûne. Her yek li ser girek şehîd ketiye. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Qubaxidir** (Kabahıdır) dikeve başûrê rojavayê Amedê û ji Amedê jî 20 km dûr e. Berê li ser Çinarê û niha ketiye nav tixûbê şaredariya Amedê. Li gund 65 mal hene û nifûsa gund 500 e. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye

Institut kurde de Paris

**Sadî** (Tanoğlu) dikeve başûrê rojhilatê Amedê û ji Amedê 15 km dûr e. Nifûsa gund 180 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Sencax** (Sancak) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 20 km dûr e. Nifûsa gund 250 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, lê girtiye û şagird diçin gundê nêzîk. Mizgeft, telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Satya** (Satıköy) dikeve başûrê rojhilatê Amedê û ji Amedê 19 km dûr e. Nifûsa gund 1.050 e. Zorova (Atgeçen) mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Berê gundê Ermeniya bûye. Di dema Ermeniyan de derdora gund bexçe û rez bûne. Gund niha zilût û rût e. Li gund av, dibistan, mizgeft, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Serqelî** (Sayarlar) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 40 km dûr e. Nifûsa gund 520 e. Lorikan (Sakızcık), Axtepe, Sokûlû û Kardeşler mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Seqer** (Uyandık) dikeve bakurê rojavayê Amedê û ji Amedê 30 km dûr e. Nifûsa gund 700 e Xirbelik (Yeşilköy), Tehtêrûmiyan û Bêrikzêr (birikız) mezreyên wê ne. Li herêma gund pîrozgehên Hemze Baba û Mezelê Kalo (şêx Mehmedê Şêxmalî) hene. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Sersing** (Yiğityolu) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 30 km dûr e. Nifûsa gund 510 e. Tûlik mezreya wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Simaqî** (Erimli) dikeve bakurê Amedê, ji Amedê 19 km dûr e. Nifûsa gund 1.170 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Petêx, qawund û zebeşên gund bi navûdeng in. Li gund dibistan, nexweşxane, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Siltanxoca** dikeve rojavayê Amedê. Heta van salên dawî mezre bû niha statuya gund girtiye. Bi qasî 32 km ji Amedê dûr e. Nifûsa wê ji 300î bêtir e. Riya gund Qûmkirî ye.

**Sîrîmî** (Gömmetaş) dikeve başûrê rojavayê Amedê û ji Amedê 16 km dûr e. Niha nifûsa gund 1.700 e. Taxa Amedê ye. Alimî (Çakırbağ) mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund bi awayên nûjen mêşên hingiv xwedî dikin. Li gund dibistan, mizgeft, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Sungurlû** (Süngüler) dikeve bakurê Amedê, ji Amedê 32 km dûr e. Nifûsa gund 300 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Şadî** (Kaldırımköy) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 42 km dûr e. Nifûsa gund 1.160 e. Yukarı Akdîbek, Dankiran (Aşağı. Akdibek), Rûmiyan (Gelengöç), Birlik, Kivmiş (Kıvmış), Talî (Tali) û Seyîdxan mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund kanalîsazyon, mizgeft, dibistan, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Şahaban** ( Sivritepe) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 30 km dûr e. Nifûsa gund 540 e. Gir, Terziyan (Yenimahalle) û Şêxosman Mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Ji sala 1964an ve li herêma gund bîrên petrolê hene. Di salê de bi sedhezaran varîl petrol ji vê herêmê tê derxistin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Şemamî** (Yenievler) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 39 km dûr e. Nifûsa gund 720 e. Axhusên mezreya wê ye. Dewletê di sala 1934an Bulgaristan û Yugoslavyayê macîrên anîn li gund bi cihkirin, lê, ew di demeke nezîkde ji gund koçî metropolên Tirkiyê kirin. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Şerabî** (Nahırkıracı) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 12 km dûr e. Nifûsa gund 360 e. Kiracı û Kardeşler mezreyên wê ne. Di dema Osmaniyan de Tirkmenên elewî li gund binecih bûne. Di van 20 salên dawî de hêdî hêdî ji

gund bar kirine û berê xwe dane Ewropa û metropolên Tirkiyê. Li gund bi navê Kuyudamî pîrozgeheke Tirkmenên elewî heye. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin.Di van salên dawî de gundiyan dest bi çandiniya berhemên avî kirine. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Şêxkendikê** (Dokuzçeltik) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 12 km dûr e. Nifûsa gund 2.252 e. Himrê (Dolunay) mezreya wê ye. Li Ximrê pireyeke kevn heye ku bi kevr hatiye çêkirin. Şaredarê Amedê Osman Baydemir ji gundê Şêxkendikê ye. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund çandinıya pembo û sebze tê kirin. Gundî bazirganiya zevê û eresan dikin. Li gund dibistan, nexweşxane, mizgt, telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund asfalt e.

**Şilbê** (Yolaltı) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 7 km dûr e. Li ser riya Amedê û Erxeniyê ye. Niha gund ketiye nav bajêr û taxeke bajêr e. Nifûsa gund 4.500 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund kanalîsazyon, dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Tavuklu** dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 29 km dûr e. Kayalar mezreya wê ye. Nifûsa gund 460 e. Dewletê di sala 1934an de ji Bulgaristan û Yugoslavyayê macîrên Tirk anîn li gund bi cihkirin, lê, ew di demeke nezîk de ji gund koçî metropolên Tirkiyê kirin. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Tilelo** (Karaçalı) dikeve rojhilatê Amedê. Li ser riya Amed û Farqînê ye. Ji Amedê 14 km dûr e. Nifûsê gund 950 e. Gundekî dîrokî ye. Navê gund ê kevn Pîtûra an jî Ratora ye. Di sala 1946an de, li girê Tilelo komek arkeolog di erdkolînên xwe de rastî bivir û gurzeke sifir hatin ku bi hezar salan kevn in. Piştre li gor lêkolînên arkeologan û tabletên ku ji girê Tilelo derxistine, Tilelo 900 sal berî mîladê bajareke mezin bûye û sê qor beden (dîwar) li dora wê hebûne. Asûriyan bajar ji binî ve xera kirine û şewitandine. Li gund girekê mezin û bilind heye, gund navê xwe ji vî girî digire.

Girê Tilelo xwedî efsaneyeke bi navûdeng e. Li gund axayekî bi navê Elî hebûye. Rencberekî wî hêja hebûye. Navê wî jî Elî bû ye. Rencber Elî ji axayê xwe Elî re gelek sadiq bûye. Ne bi tenê ji axayê xwe re, ji her kesî re baş û qenc bûye. Heta ji heywanan re jî gelek bi rehm bûye. Du gayên wî hebûne. Yek kor û

Institut kurde de Paris

yê din jî qol bûye. Ji yê kor re gotiye "Çavzêrîn" û yê qol re jî gotiye "Dûvzîvîn". Dem hatiye, dewran çûye axa çûye hecê. Xanima Hecî Elî rojekê li malê helaw çêkiriye û ji rencberê xwe re gotiye:

"Axa ji helawê pir hez dikir. Xwezî ew jî niha li vir bûya û çend gep helaw bixwarana."

Rencber ji xanima xwe re gotiye:

"Ka hinek bîne ez bibim û bidim axayê xwe û werim."

Xanimê gotiye qey rencber dixwaze helawê bibe malê bide zarokên xwe. Xanim rabûye hinek helaw kiriye teyfikê û daye rencber. Rencber çûye der û bi qasî çend deqîqan bi paş ve hatiye. Ne carek du caran weha helaw birîye. Dema Axa ji hecê vegeriye, gundî çûne Pêşiyê. Axa gotiye "newin tewafiya min herin a rencber Eli, ew ewliya ye. Helawa germ anî li Mekkê li ser nimêjê da ber min û vegerî. Ka binêrin ev jî firaqên ku helawê kiribûnê û anîbû hecê..." û firaqan bi gundiyan nîşan dide.

Gundi dev ji tewafa axê berdidin û ber bi rencber ve diçin. Ew jî ji ber gundiyan direve û naxwaze ew tewaf bikin. Gir diqelişe misas û çaroxên wî li der dimînin û ew di nav qelşa gir de wanda dibe û gir lê tê hev. Ji wê rojê ve ew gir dibe pîrozgeha Tilelo. Hîn îro jî wek sembolîk çarox û misas li ber gir in. Til navê gir e û Elo jî navê Elî ye. Li gund dibistan heye û yên mezin diçin ciyên nêzîk. Elektrîk û telefon li gund hene.

**Tilêlek** (Özekli) li herêma Têrkan e û dikeve bakurê Amedê. Ji Amedê 60 km dûr e. Berê şaredariyeke bi serê xwe bû, piştî guhertina qanûna şaredariyan dan ser şaredariya Surê. Pênc taxên Tilêlek hene. Nifûsa wê ji 3.000 î bêtir e. Gundî bi zaravayê kurmancî dıpeyivin. Di sala 2005an de li herêma gund bîrên petrolê hatin kolandin û petrol derxistin. Abdulkadir Aksu ji vì gundî ye. Li gund dibistan, nexweşxane, mizgeft, av, elektrîk û kanalîzasyonê hene. Riya Tilêlekê asfalt e.

**Tilham** (Hantepe) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 25 km dûr e. Nifûsa gund 1.684 e. Mukelis (Koşarlı), Mukelisa Xerabe, Axpar û Cûmek (Yeşilpınar) mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li herêma gund bîrên petrolê hene. Li gund dibistan, mizgeft, kanalîsazyon, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Tilxarman** (Dikentepe) dikeve bakurê rojavayê Amedê û ji Amedê 39 km dûr e. Nifûsa gund 488 e. Kurdik (Alangören), Qerebekir, Tahltebeşk (Sarıyatak), Gulîcan (Çardakaltı), Alatör, Geyiktepe û Güllü mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li herêma gund bîrên petrolê hene. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Tilik** (Kapaklıpınar) dikeve rojhilatê Amedê û ji Amedê 40 km dûr e. Nifûsa gund 400 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Tirkan** (Güleçoba) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 30 km dûr e. Nifûsa gund 1.095 e. Hatanî (Sakkulak), Kolikan (Durulmuş), Mûsawêran (Boyalıtaş), Omerikan (Gözerli), Tataran (Kazancık), Nogin, Kesko, Ayşat (Avşat) û Musilwêran (Musulveren) mezreyên wê ne. Girê Ayşatê dîrokî ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, av, mizgeft, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Tîşo** (Devedurağı) dikeve bakurê rojava yê Amedê û ji Amedê 40 km dûr e. Tirbespî (Avcısuyu) mezreya wê ye. Nifûsa gund 700 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Ûçqa Kurtêla** (Üçkuyu) dikeve bakurê Amedê. Li ser riya Amed û Erxeniyê ye. Gund niha ketiye nav bajêr, bûye wek taxeke Amedê. TOKİyê di sala 2009an de ji 1024 daîreyan bajarekî ava kir. Niha taxeke şaredariya Amedê ye. Xirbê (Yeşilköy) mezreya wê ye.

**Xashewar** (Yeşildallı) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 11 km dûr e. Nifûsa gund 250 e. Koşk mezreya Hashewarê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Xirbêreş** (Petek) dikeve bakurê rojavayê Amedê û ji Amedê 25 km dûr e. Nifûsa gund 200 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Yarimcê** (Yarımca) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 39 km dûr e. Nifûsa gund 210 e. Fidanlar mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan û mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Yeşilköy** dikeve rojhilatê Amedê, li ser riya Amed û Farqînê ye û ji Amedê 20 km dûr e. Gundekî nû ye. Nifûsa gund 160 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon, elektrik û mizgeft hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Yûcik** (Gözalan) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 25 km dûr e. Nifûsa gund 400 e. Legleg û Çaybaşı mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, kanalîsazyon, mizgeft, dibistan, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Zeynikan** (Esenbağ) dikeve bakurê rojhilatê Amedê û ji Amedê 25 km dûr e. Nifûsa gund 500 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund şose ye.

**Zîmexîk** (Elidolu) dikeve bakurê Amedê û ji Amedê 12 km dûr e. Nifûsa gund 300 e. Adimî (Gülgöze) mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Zinarcank** (Kırkkoyun) dikeve rojavayê Amedê û ji Amedê 36 km dûr e. Nifûsa gund 1.515 e. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Dahlê (Naldöken), Hesen Axa, Hacîkoç (Kösteklî), Îzdî (Bekçidamı), Mezrik (Ekince), Wêrana Navîn (Ortaören), Tenk (Ürkmez), Dûger û Textê Rast û Kaniya Dirikê mezreyên wê ne. Li gund dibistan, nexweşxane, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Zoxê/Zoxa** (Özdemir) dikeve başûrê Amedê û ji Amedê 11 km dûr e. Niha li gund 85 mal hene û nifûsa gund 500 e. Selimî (Gönendi) û Gümüşler mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Zozinca Mezin** (Bağpınar) dikeve bakurê rojhilat ê Amedê û ji Amedê 22 km dûr e. Nifûsa gund 470 e. Zozinca Jêrîn mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, nexweşxane û mizgeft hene. Riya gund asfalt e.

Institut kurde de Paris

# Bajarokên Amedê

Institut kurde de Paris



Çarşiya Bismilê
Foto: Murat Aydın

# Bismil

Bismil dikeve rojhilata Amedê. Ji Amedê 55 km dûr e. Cihê wê deşt e. Li ber çemê Dîclê, li aliyê bakurê çem e. Qada axa wê 1.748 km$^2$ e. Bismil dema hatiye avakirin bîst (20) mal bûye û navê xwe ji bîst malan girtîye.[1] Bismil niha bajaroka herî mezin a Amedê ye. Li gor statîstîkên sala 2010an nifûsa navenda Bismilê 56.333 û nifûsa gundan jî 52.659 e. Nifûsa navendê û gundan bi giştî 108.992 e. 12 taxên navendê hene. 111 gund û 91 mezre li ser Bismilê ne. Li navend, Seleta Jorîn, Tepa Baravan û Ambarê çar şaredarî hene. Ji axa navbera Bismil, Êlih û Stewrê re herêma Baravan dibêjin.

Li Bismilê di sala 1949an de dibistana navîn û di sala 1973an de jî dibistana amadeyî vekirine. Niha li navenda Bismilê 13 dibistanên seretayî û

[1] Li ser navê Bismilê sê riwayetên eqilane hene: Rivayeta yekem: Bi qasî çend sed sal berî hinek malbat ji rojhilat ve hatine û li nêzîkî Bismila iro li qeraxê çemê Dîclê gund avakirine. Piştre lehî rabûye, zerar dîtine, hinek bar kirine, 20 mal li ciyê xwe mane. Ji yên mayî re *Bîstmal* gotine. Bîstmal di nav demeke dûr û dirêj de bûye Bismil. Ya duyem: Evliya Çelebi dinivîse ku li Amedê xanekê hebûye. Dema karwan hatine xanê, ji hev pirsîne ku karwan dema di çemê Dîclê re derbas bûne, li wir mil (alevyona) hebûye, karwan nikaribûne ji wê Mîlê derbas bibin. Yekî ji karwan pirsiye ka ew çawa di *mîla pîs* de derbas bûne? Mîla Pis bûye Bismil. Ya sêyem: Di salên 1700an de eşîretek ji ali Rihayê (hinek dibêjin ji Musilê û hinek jî dibêjin ji aliyê rojhilat) ve hatine li nêziki gundê Ofa iroyên li hember çem bi cih bûne. Navê eşireta wan Basmîlan bûye.

Institut kurde de Paris

li navend, Seleta Jorîn, Tepa Barava û Ambarê heft dibistanên amadeyiyê hene.

Bismil di nav bajarokên Amedê de nû ye. Di demeke gelek kurt de mezin bûye û bi pêşketiye. Berê gund bû. Demeke bû nehiye û Mermer û Çinarê jî dane ser. Piştre navê Şerq lêkirine û dane ser navenda Amedê. Di sala 1926an de vê carê gundê Seyîdhesen kirine navenda Şerqê û Bismil û Çinarê dane ser. Hîn ji dema Osmaniyan ve hinek malbatên Tirkmen anîne li derdora Bismilê bi cih kirine. Tarîxa anîna wan ne diyar e, lê 250-300 sal berî niha ew anîne li navend û çend gundên derdorê bi cih kirine.[2] Di sala 1934an de dewletê dest pêkiriye vê carê jî ji Balkanan û bi taybetî ji Bulgaristanê macîrên Tirk anîne û li taxeke navenda Bismilê û li çend gundan bi cih kirine. Anîna macîrên Balkanî heta sala 1939an dom kiriye. Dewletê destdaye ser gundên Mala Cemîl Paşa û macîran li gundên wan bi cih kirine. Di sala 1936an de dewletê carek din statuya Bismilê guhertiye û bûye bajarok. Niha li navenda Bismilê bi tenê 9-10 malbatên Tirk ên macir mane. Piraniya wan barkirine û çûne li metropolên Tirkiyê bi cih bûne.



Institut kurde de Paris

[2] Dewlet bi ideolojiya xwe ya fermî dîrokê çawa serûbin û berevajî dike. Ji bo van çend malbatên Tirkmenên ku di dema Osmanî û Komarê de anîne Bismilê hemû xelkê Bismilê Tirk nîşan dide. Di malpera qeymeqamiya Bismilê de dinivîse ku " 250-300 sal berî niha Bismil ji aliyê Tirkmenên ku ji herêma Musilê hatine Bismilê avakirine". (Bismilgov.tir) Dîroka Bismilê heta -3000 hezar berî Miladê diçe. Warê Hûrî-Mîtaniyan e û piştre bûye navendeke Asûriyan. Ev jî dîroka fermî ya Tirkiyê ye ku hemû dinya Tirk e.



Dîmenek ji Bismilê
Foto: Murat Aydın

Di van 15-20 salên dawî de, ji derî gundan, ji bajarok û gundên wek Sason, Pasûr, Hezo (Kozluk), Licê û Stewrê jî gelek kes û malbat hatine û li Bismilê bi cih bûne. Piştî salên 1990î ku gund hatin vala kirin gundiyan koçî naven-



da Bismilê kirin û bajar mezin bû. Bismil hem bi riya hesinî û hem jî bi riya reş bajarên Êlih û Amedê bi hevdû ve girê dide. Di van çend salên dawîn de riya Amed, Batman, Bedlîs û Wanê ji ser Farqînê qût bû û bi riyeke nû di ser Bismilê re derbas dibe. Ji bo pêşketina bajêr rê roleke mezin dilîze.

Bismil wek herêm dîrokî ye. Cara yekem di sala 1865an de gerokê Îngilîz Taylor li nêzîkî gundê Tepa Behrava li girê Zîyaretê kolanên arkeolojîk kiriye û kevir û tabletên ku li ser wan nivîsên Asûriyan hebûne, derxistiye û bi xwe re birîye muzeya Îngilîstanê (British Muzeum). Di encama lêkolînên Taylor de dîyar bûye ku girê Zîyaretê 4.000 sal berî niha sereya kralê Asûriyan Banîbal bûye. Ji wê roja heta niha arkeologên ewropî çav berdane girên herêma Bismilê ku hejmara wan gelek in û hema hema li nêzîkî her gundî girek heye û loma navê "tepe" an jî "gir" li wan kirine. Wek: Tepe, Arpatepe, Axtepe, Boztepe, Çayirtepe, Çoltepe, Esentepe, girê Cano, girikê Hecî Fîraz, Goztepe, Sentepe, Seyrantepe. Hinek ji van tepeyan îro pîrozgeh in.



Çemê Diclê û Bismil
[illegible]

Di sala 1989an de arkeologên Tirk û ewropî gelek lêgerîn û kolînên nû li ciyên wek girên Zîyaretê, Seletê, Cano, Matarê, Kenan û girê Kerxa Kîkan (Dîclê) kirin. Ji bin erdê kevirên dîrokî, çek, tablet, cam, kûp û gelek tiştên dîrokî yên giranbiha bi dest xistin. Ya herî girîng li girê Cano kevirekî şeş metreyî derxistin holê û li ser dinivîse ku pêşî herêm di bin destê Hûriyan de bûye. Hûrî ku bavkalên Kurdan in. Asûrî berî zayînî di sala 1050an de erîşên dijwar birine ser Hûriyan, herêma Bismilê ji Hûriyan girtine. Li wir bi navê Tûşpa bajarekî dîrokî avakirine û ji xwe re kirine paytext. Ji wir êrîş birine ser Hûriyan. Kralê Asûriyan Salmanzar li ser tableteke weha nivîsiye:

*"Min fîdan û darên wan ên spehî ji binî ve hilkişand, rezên wan ên bi navûdeng tarûmar kir, bexçe û zeviyên wan ên herî bi ber û berhemdar di bin lingên hespê xwe de repisand û daristanên wan ên gurr hemû şewitand..."*

Asûriyan di navbera Tepe û Ambarê de, li ser çemê Dîclê pireke çêkirine û riya karwanan bi Amedê ve girêdane. Kevirên wê pireya dîrokî di dema

Institut kurde de Paris

rêçêkirina trênê de derxistine û birine di pireyên riya trên de bi kar anîne. Belê, di tablet û dokûmentên dîrokî de dîyar dibe ku wek gelek herêmên me yên din herêma Bismilê jî cara yekem Kurd li ser jiyane û heta îro li ser axa xwe mane. Lêbelê hem di serdema kevn û hem jî di serdema nû de gelek bîyanî hatine herêmê dagîr kirine, bi darê zorê bûne desthilatdar û piştre çûne. Lê Kurd her li ser axa bav û kalên xwe mane.

## Çandinî çem û avdanî

Axa Bismilê ji aliyê çandiniyê ve bi xêr û bêr e. Deşta Bismilê berhemdar e. Çemê Dîclê bi seranser di nav axa Bismilê re derbas dibe. Ji Amedê tê û ji rojava ve ber bi rojhilat ve axa navçeya Bismilê dike du beş. Ji Bismilê re rojbaş dibêje, ser diçimîne û di başûrê wê re derbas dibe. Çemê Batmanê jî ji rojhilat ve tê û di nav axa Bismilê re diçe ser Dîclê. Çemên Reş, Ambarê, Seletê û Mûsiyan (Pamuk) jî ji bakur ve di nav axa Bismilê re derbas dibin û tên ser Dîclê. Ji aliyê başûr ve jî çemê Sewrê heye û ew jî xwe davêje hemêza



Institut kurde de Paris





Dîclê. Ev çem hemû tîhbûna deşta Bismilê dişkînin û têr av didinê. Berê ev çem hemû di nav axa xêr û bêr de diherikîn û bismiliyan bi lêvên terikî, qirika zuwa û zikê birçî ji xwe re li wan temaşe, ax û of dikirin. Tu sûd û kelk ji wan nedigirtin. Lêbelê di van salên dawî de, li pêş van çeman bend û bendav hatin çêkirin, motor avêtine ser û avdaniyê dikin. Deşta Bismilê ya bejî havînan ji tîhbûn û zuwabûnê diterikî û dişeqşeqî, lê îro bi avdaniyê bûye wek bihuşt. Di navbera gundên Çoltepe û Çorepa de goleke biçûk heye. Gundî ji bo avdanê bi kar tînin.

Çandiniya tene (hebûbatê) li deşta Bismilê zêde ye. Ji %25 avî û %75 jî hîn bejî ye. Havînan germahî 40-45 derece ye û av û avdanî têr nake. Her ku bend û bendav tê çêkirin avdanî zêde dibe. Di şûna çandiniya genim, nîsk û ceh de, çandiniya pembo, titun, gilgilê misrî û berhemên avî zêde dibin. Li gor cureyên çandiniyê axa herêmên Bismilê di sala 2003an de weha dabeş bûye:[3] Zeviyên çandiniya bejî : 1.120.000 dekar (genim, ceh, nîsk û nok). Zeviyên avî: 350.000 dekar (pembo, genim, titun, pincarê şekir, zebeş û petêx). Mêrg û cihê çêrê: 94.000 dekar. Beyar : 184.000 dekar e.

[3] http://bismilgenc.blogcu.com/

◄ Zeviyê Bismilê
Foto: Yılmaz Erkek

Li gor statîstikên sala 2003an hatina berhemên çandinî weha ne:

| nav | dakar | berhem ton |
|---|---|---|
| genim | 980.000 | 323.400 |
| ceh | 100.000 | 27.000 |
| nîsk | 134.000 | 17.420 |
| nok | 5.000 | 550 |
| pembo | 236.000 | 92.500 |
| titun | 1.500 | 10.000 |
| zebeş | 4.000 | 16.000 |
| petêx/qawund | 2.500 | 7.500 |
| Pincarê şekir | 1.000 | 6.000 |

Axa Bismilê bi piranî di destên axa, şêx û dewlemendan de ye. Piraniya gundiyan bêax û bêmal in. Wek pale an jî karker dixebitin. Piştî ku makîne û teknîka cot û avdaniyê nûjen bû, êdî karê paletî û renceberiyê jî nema.

## Karxane û dezgehên îndustriyê

Wek tevahiya Amedê li Bismilê ji însdustrî gelek kêm e, lê li gor bajarok û navçeyên din yên Amedê, dîsa li Bismilê çend karxane hene. Yên herî girîng ev in. Fabrîka ard, pembo, plastîk-PAK-PEN, mermer, savar, biskivî, depoya titun û çend karxaneyên biçûk ên tekstîlê hene.

Li Bismilê dezgehên xalî çêkirine hene. Bi alikariya hinek dezgehên şexsî û fermî bi qasî 300 jin û keçên xama di çêkirina van xaliyan de dixebitin.

Piraniya gundiyên Bismilê heywan xwedî dikin û bi çandiniyê ve mijûl in. Mîh, bizin û heywanên serî wek mange, ga û gamêş xwedî dikin. Mast, penîr û rûnê Bismilê bi navûdeng in. Li herêma Bismilê mandra hene. Wek mast û penîrê Bismilê, kerên Bismilê jî meşûr in. Çandinî her ku bi teknîk û metodên nûjen tên kirin, ciyê çêr û xwedîkirina pez û dewaran teng dibe û heywan xwedîkirin her ku diçe kêm dibe.

Institut kurde de Paris



Dimenek ji Bismilê

# Şaredarî

Sîstema şaredariyê li Bismilê di sala 1936an de dest pê kiriye. Li gor salan lîsteya şaredarên Bismilê weha ye:

1936-1940 Muharrem Aksoy (macîrê Bulgar e, tayîn)
1940-1946 Ali Aydın (tayîn)
1946-1951 Şeyhmus Aslan (hilbijartina yekem)
1951-1955 Şeyhmus Karakoç
1955-1960 Feyzi Aslan
1960-1965 Patpat Niyazi (albay)
1965-1968 Cemil Ortaboy
1968-1977 Reşit Aslan (sê dewre)
1977-1980 H. Mecit Çelik
1980-1981 Ayhan Altun (qeymeqam)
1981-1982 Mehmet Özcan (qeymeqam)
1982-1987 H. Mehmet Merdanoglu
1990-1994 Abdurrahman Aslan
1999-2004 M. Salih Yalçınkaya
2004-2009 Şukran Aydın
2009-20011 Cemile Eminoglu[4]

[4] Musa Çelebi, bismilhaber.com

Institut Kurde de Paris

# Niviskar û hunermend

**Mele Evdirrehîm Tangören**

Mele Evdirrehîm Tangören li gundê Qamişlû ji dayik bûye. Ew ji malbateke muderis e. Tê gotin ku heta 17 bavan li medreseyan muderisî kirine. Gelek helbestên wî hene. Bi tenê dîwanekê wî heye. Di sala 1993an de li Amedê wefat kiriye.

**Veysel Öngören**

Veysel Öngören di sala 1931ê de li Bismilê ji dayik bûye. Fakulta Edebiyata Stanbulê di nîvî de hiştiye û vegeriya gundê Hacikan. Carek din çûye li fakulta Felsefê dest bi xwendinê kire. Di gelek kovar û rojnameyan de xebitiye. Helbest nivîsîye. Bi navê Remo ve Salo berhemeke wî bi tirkî heye. Veysel, Ferit û Vasif hersê birayên hev in.

**Ferit Öngören**

Ferit Öngören di sala 1932an de li Amedê ji dayik bûye. Fakulta Huqûqê qedandiye û dest bi parêzgeriyê kiriye. Karîkatorîst e. Di gelek kovaran de nivîsiye. Demeke di sendîqeyan de kar kiriye. Sê berhemên wî hene. Hersê jî bi tirkî ne: *Mizah hikayeleri antolojisi, İstanbuldan cizgiler* û *50 yılın Türk mizahısı.*

**Vasif Öngören**

Vasif Öngören di di sala 1938an de li Tavşanliyê hatiye dinê. Di sala 1937an de dewletê malbata wan ji ber sedemên sîyasî ji Amedê sugunê metropolên Tirkiyê kiriye. Malbat piştî çend salan, carek din vegeriya ye Amedê. Wî piştî xwendina lîsê li zanîngeha Stanbulê dest bi fakulta fîzîkê kiriye. Demek bi şûn ve dest ji zanîngeha Stanbulê berdaye û çûye Almanyayê li Berlînê bi cih bûye. Li Berlînê di şanoya Brecht de kar kiriye. Li Almanyayê cara yekam bi navê Göç (Koç) şanoyeke nivîsiye. Gelek berhemên wî li ser şanoyê hene û hemû bi tirkî ne. Piştre vegeriye Tirkiyê. Di dema 12ê Îlonê de hatiye girtin û çend sal di zîndanê de maye. Piştî derketina ji zîndanê carek din derketiye Ewropayê û di sala 1984an de li Amesterdamê miriye.[5]

---

[5] Şeyhmus Diken, *İsyan sürgünleri*. S. 20

Institut kurde de Paris

**Nedim Dağdeviren**

Nedim Dağdeviren di sala 1953/4an de li Bismilê hatiye dinê. Dibistana seretayî û navîn li Ercişê xwendiye. Lisê di pola duyem de hatiye Amedê û li Amedê qedandiye. Înstîtuye Perwerde xwendiye û bûye mamosteyê zimanê tirkî. Piştî darbeya 12ê îlona 1980î wek penaber li Swêdê bi cih bûye. Li wir Pirtûkxaneya Kurdî damezrandiye. Gelek helbest nivîsiye. Bi navê *Amed im Amed* pirtûkek wî heye. Di sala 2007an li Stockholmê miriye.

**Vedat Aydın**

Vedat Aydın di sala 1953an de li gundê Hacıya Kurdan (Kurdhacî) hatiye dinê. Dibistana seretayî, navîn û amadeyiyê li Bismilê xwendiye. Di sala 1979an de li Amedê li Enstîtûya Perwerdê beşa edebîyatê qedandiye. Di 12ê îlonê de hatiye girtin û çar salan di zîndana Amedê de maye. Piştî derketina ji zîndanê ew bû yek ji damezrevanê Komela Mafê Mirovan û demek paşê jî ew bûye serokê şaxê wê yê Amedê. Di hemû çalakiyan de aktîv cih girtiye. Di sala 1991ê de bûye serokê HEPa Amedê. Di 5ê tîrmeha sala 1991ê polîs Vedat ji mala wî girtine û birine. Du roj paşê laşê wî li ser riya Madenê hatiye dîtin. Di merasima cenazeyê wî de bi hezaran kes beşdar bûn. Hêzên dewletê beşdaran gule baran kirin. Gelek kes hatin kuştin, birîndar bûn û hatin girtin.

**Mamoste Nûjen**

Mamoste Nûjen Di sala 1954an de li Bismilê hatiye dinê. Di sala 1972an de dibistana mamostetiyê qedandiye û dest bi mamostetiyê kiriye. Ji ber karê sîyasî piştî 12ê îlonê ya sala 1980î derketiye derî welat û li Swêdê bi cih bûye. Navê wî yê nifûsê Evdirrehman Gezgin e. Karîkatorîstekî bi navûdeng e. Bi taybetî karîkatorên sîyasî çêdike. Di gelek malper, kovar û rojnameyan de karîkatorîn wî hatine çap kirin. Heta niha du pirtûkên wî yên karîkatoran hatine çap kirin. Ya yekem navê wê *Dengê Xêzikan* û ya duyem jî *Mêr Mêran Nasdikin*, e.

**Mûrad Ciwan**

Mûrad Ciwan di sala 1956an de li Bismilê hatiye dinê. Navê wî yê nifûsê M. Ali Çilgin e. Heta dibistana Mamostetiyê li Amedê xwendiye. Dibistana mamostetiyê li bajarê Kirşehirê qedandiye. Çend sal mamostetî kiriye û pişt-

**re** li Stanbulê dest bi huqûqê kiriye. Ji ber sedemên siyasiyê dev ji zanîngehê berdaye. Piştî 1980î derketiye derveyî welêt û li Swêdê bi cih bûye. Heta 1992 aktîv sîyasî xebitiye. Piştre dest bi karê ziman û çanda kurdî kiriye. Di gelek kovar û rojnameyan de redaktorî kiriye û nivîs nivîsîye. Ew niha şef redaktorê malpera Netkurdê ye. T*urkçe açikmali Kurtçe dilbilgisi, Ahmedê Xanî felsefesî* û ji folklora kurdî ji bo zarokan çend pirtûkên wî jî hatine çap kirin. Herweha ji swêdî û tirkî hejmareke pirtûk wergerandiye kurdî.

**Salih Çelik**

Prof. Dr. M. Salih Çelik di sala 1947an de li Bismilê hatiye dinê. Dibistana seretayî û navîn li Bismilê xwendiye. Dibistana mamostetiyê li Amedê. Piştre li Enqerê dest bi Fakulta Fenê beşa fizîkê kiriye. Di sala 1961ê li Enqerê dest bi asîstaniya fizîkê kiriye. Piştre li Amedê di Zanîngeha Dîcleyê de kar kiriye, doktora daye û bûye profesor e. Gelek berhemên wî hene.

**Hasan Aslan**

Hasan Aslan di sala 1955an de li gundê Fetla Jêrîn hatiye dinê. Dibistana seretayî, navîn û amadeyiyê li Bismilê xwendiye. Li Amedê dest bi dibistana bilind kiriye. Piştre li Enqerê dest bi Fakulta Ekonomiyê kiriye. Di sala 1979an de qedandiye. Li zanîngeha Diclê Doç. Dr e. Li ser ekonomiyê berhemên wî hene.

**Edip Polat**

Edip Polat di sala 1962an de li gundê Zengilo hatiye dinê. Dibistana seretayî li gundê, ya navîn li Batmanê û amadeyiyê li Amedê xwendiye. Li zanîngehê beşa bîyolojiyê qedandiye û dest bi mamostetiyê kiriye. Ji ber xebatên polîtîk çend salan di zîndanê de maye. Di sala 1988an ji kar hatiye derxistin. Di gelek kovar û rojnameyan de nivîsên wî hatine weşandin. Demek e li Amedê serokatiya Komeleya Nîvîskarên Kurd kiriye. Niha di Şaredariya Amedê ya Mezin de wekî karmend dixebite. Bi kurdî û tirkî dinivîse. *Şorbe û Fedî, Xela û Xeyidî (kurdî), Diyarbakır Gerçeği (tirkî), Newrozladık Şafakları (tirkî), Bilim dilinde Kürtler (tirkî), Şopên ji welatê bêdewlet (tirkî), Zinacı (tirkî), Sevgilim Sevgisiz Ölüm (tirkî), Rıstemê Zal* (kurdî-roman), Dûvpişk Bi xwe Venade (kurdî-roman) û çend wergerên wî hene.

Institut kurde de Paris

**Mem Bawer**

Mem Bawer di sala 1973an de li Bismilê hatiye dinê. Ji destpêkê heta dawî li Amedê xwendiye. Ji fakulteya perwerdeya Dîclê mezûn e. Bi kurdî helbest dinvîse û di helbestên xwe termê mîtolojîk ên Mezopotamyayê bi kar tîne. Bi navê *Monologên evînên kedîkirî pirtûkeke* wî heye.

**Özz Nûjen**

Özz Nûjen di sala 1975an de li Bismilê hatiye dinê. Ew kurê karîkatorîstê Mamoste Nûjen e. Mamoste Nûjên ji ber sedemên polîtîk piştî salên 1980î li Swêdê cih bûye. Kurê wî Özz jî hatiye Swêdê û li wir xwendiye. Özz Nûjen li Swêdê di radyo, TV û mediya Swêdî û Kurdan de miroveki nas kiriye.

# Dengbêj

**Resûlê Xanoserî**

Resûlê Xaneserî (Resul Altunakar) di sala 1958an de li gundê Xanoserê hatiye dinê. Bi eslê xwe ji navçeya Pasûrê ye. Ji eşîra Xiyan e. Kurmanc in. Bi qasî 200 sal berê hatine Xanoserê. Dibistana seretayî xwendiye. 15 sal in stranan dibêje. Dengbêj Şakiro, Reso, Zahar, Hecî Evdilkerîm û Mehme Salihê Beynatî diecibîne. Li gund pez û dewaran xwedî dike, cotkariyê dike. Di sala 1994an de mala xwe dibe Edeneyê. Di sala 1995an de carekî din mala xwe bi paş ve dibe Xanoserê.

**Nadirê Seledûnî**

Nadirê Seledûnî (Nadir Kılınç) di sala 1340ê (rûmî) de li gundê Seledûnê hatiye dinê. Bi eslê xwe ji Pasûrê ye. Ji eşîra Hevêdan, ji mala Bokalkî ye. Dibistan nexwendiye. Stranên Serhed û Bişêriyê gotiye. Dengbêj Şakiro, Reso û Mehme Salihê Beynatî diecibîne. 35 salan keyatiya gund kiriye.

**Remezanê Xezalê**

Remezanê Xezalê di sala 1949an de li gundê Heydeliyê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Ramazan Şeker e. Bi eslê xwe ji bajarê Mûşê, ji gundê Mixakomê ye. Malbata wî di sala 1914an de hatiye Heydeliyê. Ji bavê xwe Mihemedê

Evdila hînî stranan bûye. Di sala 2006an de li Amedê bi cih bûye. Pîrozgeh û zîyaretên Bismilê: Pênc zîyaret û cihên pîroz li herêma Bismilê hene. Develî, Kaypî, Karababa û pîrozgeha Elî Sîtî. Elî Sîtî li gundê Demîrxanê ye. Li Seleta Jêrîn gora şêx Evdurehîm (birayê Şêx Seîd) heye. Li gundê Turkmenhacî der û dorê jî bi navê Kabasakal, Sarıkız û Yedikız sê pîrozgehên Tirkmenên elewî hene.

## Gundên Bismilê

**Akûba** (Akuba) dikeve bakurê rojhilat û 45 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 485 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtîye. Bi navê Demirköy mezreyeke wê ye. Li gund elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Alus** (Aluç) dikeve rojhilatê Bismilê. Ji Bismilê 22 km dûr e. Nifûsa gund 125 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Ambarê** dikeve rojavayê Bismilê. Ji Bismilê 12 km û ji Amedê jî 35 km dûr e. Nifûsa Ambarê 5063 e. Mezreyên Dewran û Axtepe li ser Ambarê ne. Pêşî navê Ambarê Ozmen bûye. Dewletê di sala 1937an de Tirkên Bulgaristanê aniye û li wir bi cih kiriye. Peşî 40 malbata anine û peyder pêy anîne bi cih kirine.



Li Bismilê bêri
Foto: Yılmaz Erkek

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Ambar di sala 1994an de statûya şaredariye girtiye. Ambar nêzîkî çemê Dîclê li deştê ye û axa wê ji çandiyê re gelek kêrhatiye. Li Ambarê berê zêde çandiniya ceh, genim, nok, petêx, zebeş û titunê dihatin kirin. Giranî li ser çandiniya zebeşan bû. Niha giranî dane ser çandiniya pembo.

**Aslanoğluya Kurdan** (Yatansoğut/Aslanoğlu) dikeve bakurê rojavayê Bismilê û 19 km ji Bismilê dûr e. Gundê Ermeniya bûye. Niha ji Ermeniyan 13 darên tûyan mane. Li gund bîrên petrolê hene. Nifûsa gund 480 e. Mezreyeke wê heye. Wek gundiyên din heywan xwedî dikin û bi karê kiştûkal ve mijûl in. Dibistan girtiye. Elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Aygeçti** dikeve rojhilatê Bismilê. Ji Bismilê 40 km û ji Amedê jî 95 km dûr e. Nifûsa gund 70 e. Nêzîkî çemê Dîclê ye. Li herêma gund şikeft hene. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin. Telefon, av û elektrîk li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Babaxakiyê** (Babahaki) dikeve rojhilatê Bismilê û 8 km ji Bismilê dûr e. Gund ji aliyê dewletê ve hatiye hilweşandin.

**Baliye** (Baharlı) dikeve bakurê rojavayê Bismilê û 16 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 242 e. Yukarı Gozozlu mezreya wê ye. Dibistan girtiye. Elektrîk û telefon hene. Rê stabîlîze kiriye. Gundî heywan xwedî dikin û çandiniyê dikin.

**Başko** (Başköy) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê û 30 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund ji 300î zêdetir e. Du mezreyên wê ne. Li gund dibistan, elektrîk û telefon hene, lê dibistan girtiye. Riya gund qûmkirî ye.

**Başmelû** (Başören) dikeve başûrê Bismilê û 20 km ji Bismilê dûr e. Beşek ji gundiyan dibêjin ku "em seyid in ." Gundekî kevn e û dîroka wê heta 1700an diçe. Çemê Qoxî û gola Qoxî nêzîkî gund in. Nifûsa gund 210 e. Bi navê Beşçiftçî mezreyek wê heye. Dibistan hatiye girtin. Telefon û elektrîk hene û riya gund qûmkirî ye.

**Belê** (Belli) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê û 20 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 500 e. Gundî bi çandinî û heywan xwedîkirinê ve mijûl in. Li gund dibistan û nexweşxane, elektrîk û telefonê hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Bîrik** (Ağıllı) dikeve başûrê Bismilê û 16 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 450 ye. Aşağı Kilavuztepe mezreya wê ye. Gundî heywanan xwedî dikin û bi kiştûkal ve mijûl in. Dibistan hatiye girtin. Gund vala bûye. Li gund telefon û elektrîkê hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Boçelê** (Bozçalı) dikeve rojhilatê Bismilê û 10 km ji Bismilê dûr e. Beşek ji xelkê gund ji Rihayê hatine û ji eşîreta Dugerîn in. Li gund pîrozgeha Mala Bûbê heye. Tê gotin ku Mala Bûbê ji aliyê Baxdayê hatine. Ji vê malbatê hîn du mal li gund hene. Nifûsa gund 278 e. Girê Cano (Boztepe) û Tehtik (Kayabaşı) mezreyên wê ne. Dibistan girtiye, elektrîk û telefon hatine gund. Rê stabîlîze kiriye. Li girê Cano lêkolînên dîrokî hatine kirin, gelek kevir û dêzikên dîrokî derketine û lêkolîn berdewam e.

**Cadê** (Uğrak) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê û 25 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 66 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtiye. Güçlü mezreya wê ye. Li gund elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Cirêfa Jorîn** dikeve rojhilatê Bismilê û 13 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 510 e. Dibistan girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene. Riya gund stabîlîze kiriye.

**Şamlatez** (Çakallı) dikeve bakurê rojavayê Bismilê û 18 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 238 e. Riya gund qûmkiriye. Dibistan heye, lê girtiye.

**Çetelê** (Çatalköy) dikeve başûrê Bismilê û 30 km ji Bismilê dûr e. Gund li ber çemê Çetelê ye û navê xwe ji çem girtiye. Strana çemê Çetelê di nav Kurdan de bi navûdeng e. Nifûsa gund 200 e. Dibistan girtî ye. Çayirtepe mezreya wê ye. Elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Çawîşiyê** (Çavuşlu) dikeve bakurê rojavayê Bismilê û 10 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 310 e. Elektrîk û telefon li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Çolaxa** (Çolağan) dikeve bakurê rojavayê Bismilê û 22 km ji Bismilê dûr e. Gund nêzîkî riya Farqîn û Amedê ye. Nifûsa gund 174 e. Dibistan hatiye girtin. Elekrtîk û telefon hene. Rê heye lê ya navbera Bismil û gund ne baş e.

**Çorepa** (Gültepe) dikeve rojhilatê Bismilê. Çorapa Kevn jî dibêjin. Gund ji Bismilê 13 km û ji Amed 60 km dûr e. Nifûsa gund 200 e. Girekî dîrokî heye. Li gund gola Keçika û gola Bergund hene. Gola Keçika mezin û kûr e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtiye. Cirif (Çirit) mezreya wê ye. Li gund elektrîk û telefonê hene. Dema li ser çemê Dîclê bendava Germavê (Ilısu) were çêkirin beşek ji zeviyên vî gundî jî di-kevin bin avê. Riya gund qûmkirî ye.

**Çoltepe** (Çöltepe) dikeve rojhilatê Bismilê. Çorepa Nû jî dibêjin. Ji Bismilê 13 km û ji Amedê jî 60 km dûr e. Li ser riya Bismil û Êlihê ye. Stasyona trênê heye. Di navbera Çorepa Kevn û ya Nû de 500 metre mesafe heye. Dewletê di navbera salên 1934-1939an de ji Bulgaristanê Tirkên macîr anî li vir ji wan re 128 xanî gundekî modern ava kiriye. Navê Çöltepe lê kirin, Nifûsa gund 510 e. Di van salên dawî de macîrên Bulgaristanê yek bi yek koçî metropolên Tirkiyê bûn û Kurdan malên wan kirîn û li gund bi cih bûn. Niha li gund macîrên Bulgar nemane. Li gund elektrîk, telefon, dibistan hene. Rê asfalt e.

**Dareqol** (Ataköy) dikeve bakurê rojavayê Bismilê. Ji Bismilê 15 km dûr e. Berê gundê Êzidiyan bûye, lê îro Êzidî li gund nemane. Nifûsa Darakolê 200 e. Dibistan girtiye. Heywanan xwedî dikin û bi karê çandiniyê ve mijûl in. Elektrîk û telefon hene. Rê bi qûm e.

**Darliya Jêrîn** (Aşağı Darlı/Ulutürk) dikeve rojavayê Bismilê û berê 1 km ji Bismilê dûr bû; lê niha bûye taxeke Bismilê. Nifûsa gund 2.460 e. Darliya Jorî (Yukarı Darlı) û Qeya (Kayalar) mezreyên wê ne. Heta çend sal berê hem li gund û hem jî li mezrê Tirkmen dijîyan. Ji dema Osmanî ve dewletê ew ji aliyê Qafqasan ve anîne û li wir bi cih kirine. Beşek ji wan sûnî û beşek jî elewî ne. Niha Tirkmen li Yukarı Darlıyê nemane. Hemûyan barkirine û ber bi metropolên Tirkiyê ve çûne. Kurd hatine li gund bi cih bûne. Bi navê Sulak û Karababa du pîrozgehên elewiyan li Darliya Jêrîn hene. Debara gun-diyan li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Kul Mehmut ji vî gundê bûye. Ew di sedsala 19dan de jiyaye. Bi tenê çarîneke wê li berdest heye. Li gund elektrîk û telefonê hene. Riya gund asfalt e.

**Derbend** (Derbent) dikeve başûrê rojhilat û 34 km ji Bismilê dûr e. Li gund du qebîle hene. Hecî Ereb û Seîd. Malbata Seîd hîn îro jî li herêma Bismilê xurt e. Nifûsa gund 90 e. Mezreyeke wê ye. Dibistan hatiye girtin. Telefon û elektrîk hene. Rê stabîlîze kiriye.

**Derwêşiyê** (Hasanpınar) dikeve bakurê rojhilat û 30 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 280 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Dirikê** (Dikenli) dikeve bakurê rojhilat 30 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 153 e. Dibistan hatiye girtin. Elektrîk û telefon li gund hene. Rê stabîlîze kiriye.

**Elîşêmê** (Alıncak) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê û 42 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 171 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtîye. Bi navê Îbrahîm mezreyeke wê ye. Li gund elektrîk û telefonê hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Elûzê** (Aluç) dikeve rojhilatê Bismilê. Ji Bismilê 20 km dûr e. Nifûsa Alûzê 206 e. A. Karacik mezreya wê ye. Hatina gund li ser çandinî û heywanan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Encolînê** (Ağılköy) dikeve rojhilatê Bismilê û 28 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 200 e. Mezreyeke wê heye. Dibistan hatiye girtin. Riya gund qûmkiriye. Sîstemên telefon û elektirîkê hene. Gundî heywan xwedî dikin û bi kiştûkal (ziretê) ve mijûl in. Dema li ser çemê Dîclê bendava Germavê were çêkirin, zeviyên vî gundî di bin avê de dimînin.

**Elîbociya** (Boyacı) dikeve bakurê rojhilat û 35 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 374 e. Hindirisa (Avşar) mezreya wê ye. Gundî çandinî û heywan xwedî dikin. Dibistan vekiriye. Elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Elodîna** (Alibey) dikeve bakurê Bismilê û 25 km ji Bismile dûr e. Dewletê gund xerab kiriye. Berê gundê Ermeniya bûye. Piştî qirkirin û koçkirina Ermeniyan Kurd hatine li gund bi cih bûne. Mala Aslanan gundiyan ji gund

Institut kurde de Paris

barkirine û gund firotine bêrtiyan. Tepecik mezreya wê ye. Aşê gund di dema xwe de bi navûdeng bû. Riya gund qûmkirî ye.

**Erebkendê** (Bayındır) dikeve başûrê rojhilatê Bismilê û 20 km ji Bismilê dûr e. Malbatên mîr û Seyda li gund hene. Malbata Seydan ji gundê Bagasê ku li ser Midyatê ye hatine. Malbata Mîran jî, ji aliyê Cizîrê ve hatine. Oba Jêrîn û Kopmaz mezreyên wê ne. Nifûsa wê 568 e. Dibistan hatiye girtin. Sîstemên av, telefon û elektrîkê hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Fetla Jêrîn** (Aşağıdolay) dikeve bakurê Bismilê û 9 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 150 e. Dibistan girtiye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund asfalt e. Elektrîk û telefon hene.

**Fetla Jorîn** (Yukarıdolay) dikeve bakurê Bismilê û 20 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 235 e. Mezreyeke wê heye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Girikê İzêr** (Doruk) dikeve başûrê rojhilat û 25 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 640 e. Di nav zeviyên gunde petrol derketiye. Ji vê bîra petrole re bi tirkî "Arpatepe-1" dibêjin. Ev bîr 2.400 metre kûr hatiye kolandin. Petrola wê gelek bi kalite ye. Li gund dibistan, mizgeft, av, elektrîk û telefon hene. Selamet û Goztepe mezreyên wê ne. Riya gund qûmkirî ye.

**Girhebeş** (Karatepe) dikeve başûrê Bismilê. Ji Bismilê 34 km dûr e. Nifûsa gund 325 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Çandinî zêde ye. Dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund qûmkirî ye

**Girikê Hecî Faris** (Tepecik) dikeve başûrê rojhilatê Bismilê û 32 km ji Bismilê dûr e. Çayırlı mezreya wê ye. Nifûsa gund 232 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund asfalt e. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene.

**Goksu** (Göksu) dikeve rojavayê Bismilê û 10 km ji Bismilê dûr e. Li ser riya Bismil û Amedê û li hember Kerxa Kîka ye. Nifûsa gund 659 e. Dewletê di

salên 1950 û 1938an de Bulgaristan û Yugoslavyayê macîrên Tirk aniye li gund bi cih kirine, lê ew di demeke nezîk de ji gund koçî metropolên Tirkiyê kirine. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene. Riya gund asfalt e.

**Gundê Evdî** (Arıkgöl) dikeve rojhilatê Bismilê û 16 km ji Bismilê dûr e. Dawidî mezreya wê ye. Nifûsa gund 500 e. Dibistan girtiye. Tê gotin berê gundê Ermeniyan bûye û niha hemû Kurd in. Xwendin û sewiya perwerdê li gund zêde û bilind e. Gundî heywanan xwedî dikin û bi kiştûkal ve mijûl in. Kooperetîfa heywanxwedîkirinê li gund heye. Li gund elektrîk û telefon hene. Rê stabîlîze kiriye. Gund dikeve nav qada bendava Germikê û divê di demeke nêzîk de ji gund koç bikin.

**Gundê Îso** (İsalı) dikeve rojhilat û 18 km ji Bismilê dûr e. Li ber xeta trêne ye. Bi texmînî gund di sala 1930î de hatiye avakirin. Gundî hemû mirovên hev in. Nifûsa gund 200 e. Bi navê Îbrahîm mezreyek wê ye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtîye. Li gund elektrîk û telefonê hene. Rê stabîlîze kiriye. Riya trên û riya reş di ber gund re derbas dibin. Çemê Dîclê nêzîkî gund e. Ji Dîclê avdanî dikin.

**Haciya Kurda** (Kazancı) dikeve başûrê rojavayê Bismilê û 20 km ji Bismê dûr e. Nifûsa gund 1.200 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund asfalt e. Dibistan heye, lê girtiye. Şerefî û Gundik (Aydınlar) mezreyên wê ne. Vedat Aydın ji mezreya Aydınlarê ye. Paşnavên wan dane mezreyê. Li gund sîstemên elektrîk û telefonê hene.

**Haciya Tirka** (Türkmenhacı) dikeve başûrê rojavayê Bismilê û 6 km ji Bismilê dûr e. Gundê Tirkmen ên elewî ye. Tê gotin ku di dema Aqqoyun û Osmaniyan de ew anîne li Haciya bi cihkirine. Di kîjan tarîxî de, ji ku hatine kes nizane. Hinek dibêjin ji Xorasanê û hinek jî dibêjin ji Qonyayê anîne û li gundê Haciya bi cih kirine. Di van salên dawî de Tirkmenên elewî ji gund koç kirine û çûne metrolpolên Tirkiyê û di şûna wan de Kurd hatine li gundê bi cih bûne. Piştre navê gund guhertine û Turkmenhaci an Turkmenaci lê kirine. Hin çend mal li gund mane. Li gund Kabasakal, Sarisakal û Yedikızlar sê zîyaretên wan hene. Nifûsa gund 930 e. Hatina gund li ser çandinî û hey-

Institut kurde de Paris

wan xwedîkirinê ye. Li gund, dibistan, elektrîk û telefonê hene. Riya gund asfalt e.

**Heyderliyê** (Işıklar) 20 km ji Bismilê dûr e. Heyderî xwediyê dîrokeke dûr û dirêj e. Nifûsa gund 400 e. Koşk, Darliya Kurdan, Îbrahîm û Xanpazarı mezreyên wê ne. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Hilan** (Topraklı) dikeve başûrê rojhilatê Bismilê û 35 km ji Bismilê dûr e. Di sala 1955an de navê gund guhertine û navê Topraklı lê kirine. Nifûsa gund 590 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Li gund dibistan, elektrîk û telefonê hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Hogira** (Yamaçköy) dikeve bakurê Bismilê û 40 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 230 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtîye. Ava gund kêm e. Li gund elektrîk û telefonê hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Holan** (Ulam/Sarıtoprak) dikeve bakurê rojavayê Bismilê. Navê gund Holik e, lê hola dibêjin. Li ber çemê Diclê ye û 25 km ji Bismilê dûr e. Riya trênê di ber re derbas dibe û navê stasyonê wê Ulam e. Nifûsa gund 630 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene. Riya gund asfalt e. Dema li ser çemê Dîclê bendava Germavê were çêkirin zeviyên vî gundî jî dikevin bin avê.

**Îsepar** (İsapınar) dikeve başûrê Bismilê û 25 km ji Bismilê dûr e. Di dema xwe de gundê Ermeniyan bûye û navê gund ê kevn bi Ermenî ye. Di van salên dawî de goristaneke Ermeniyan derketiye. Nifûsa gund 435 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtîye. Li gund elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kamberlî** dikeve rojavayê Bismilê û 10 km û ji Amedê jî 45 km dûr e. Nifûsa gund 144 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene

Institut kurde de Paris

**Kaxitlû** (Kağıtlı) dikeve bakurê rojavayê Bismilê û 26 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 150 e. Kengerlî mezreya wê ye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund asfalt e. Dibistan heye lê girtîye. Li gund elektrîk û telefonê hene.

**Barava** (Keberli) dikeve başûrê rojhilatê Bismilê û ji Bismilê 11 km û ji Amedê jî 65 dûr e. Ji ber ku giyayê bi navê kember li herêma gund zêde ye, gund navê xwe ji wî giyayî girtîye. Nifûsa gund 240 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund asfalt e. Dibistan heye, lê girtîye. Li gund elektrîk û telefon hene.

**Kelemo** (Uyanık) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê. Ji Bismilê 28 km û ji Amedê 75 km dûr e. Berî 1915an gundê Ermeniya bûye. Li gund aşekî dîrokî hebû, niha xera bûye. Nifûsa gund 100 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtîye. Li gund elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kerxa Zirka** (Tatlıçayır) dikeve bakurê Bismilê û 22 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 130 e. Mehmed Şerwar (Eriktepe) û Demirxan mezreyên wê ne. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund qûmkiriye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene.

**Kerxa Kîka** (Üçtepe) dikeve rojavayê Bismilê û 16 km ji Bismilê dûr e. Li ser riya Bismil û Amedê ye. Kerxa Dîclê û Qeraxê Dîclê jî dibêjin. Li hember gundê Goksu ye. Nifûsa gund 1.584 e. Mezreyeke wê heye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Li girê gund ciyên dîrokî hatine kolandin û peyker, kevir, cam û gelek tiştên dîrokî bi dest xistine. Bi navê *"Üçtepe Kazıları"* pirtûkeke li ser arkeolojiya girê gund heye. Ji van tabletan dîyar dibe ku Kerxa Kîkan Paytexta Mîtaniyan bûye. Demeke dûr û dirêj ketiye destê Hûrîyan. Du bavikên cihê ne, lê herdu jî Kurd bûne. Di wê demê de kîjan eşîrê hukimdariyê bigirta destê xwe navê eşîra xwe li desthilatdariya xwe dikirin. Piştre Asûrî erîş birine ser Hûriyan û demeke ji wan girtine û navê Tûşpa lê kirine. Di demeke dirêj de Hûriyan carek din bajêr ji Asûriyan bi paş ve girtiye. Dibistan, mizgeft, elektrîk, telefon li gund hene. Rê asfalt e.

Institut kurde de Paris

**Kapekî** (Eliaçık) dikeve rojavayê Bismilê û 9 km ji Bismilê dûr e.[6] Tê wateya ku ba kayê pekandiye û biriye. Kopekî jî dibêjin. Gundî di navbera sedsalên 11-15an de, ji aliyê Helebê hatine û li gund bi cih bûne. Gotina kopek ne bi tirkî ye, tê maneya sedeqatê, bawerîyê jî. Nifûsa gund 525 e. Du mezreyên wê hene. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Li gund dibistan, elektrîk û telefonê hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Koperî** (Köprüköy) dikeve rojhilatê Bismilê û 32 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 207 e. Bakurê gund Girê Dimsê cihekî dîrokî ye. Di sala 1999an de kolanên arkeolojîk hatine kirin. Gelek berhemên dîrokî derxistine ku ji serdema neolotik dest pê dike û heta serdema navîn dom dike. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund qûmkiriye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefon hene. Dema li ser çemê Dîclê bendava Germavê were çêkirin zeviyên vî gundî dikevin bin avê.

**Koselî** (Köseli) dikeve rojavayê Bismilê û 5 km ji Bismilê dûr e. Nêzîkî çemê Dîclêye, li ser riya Amedê ye. Zeviyên gund li ber çem in. Çem di navbera gund û Bismilê de ye. Berê gundê Ermeniyan bûye. Di dema Osmanî de dewletê ji aliyê Mûsilê, ji eşîreta Beyat Tirkmenan aniye û li gund bi cih kiriye. Di serdema me de hinekan ji gund koçkirine û Kurd hatine şûna wan. Nifûsa gund 930 e. Yeniköy mezreya wê ye. Riya gund asfalt e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Li gund elektrîk û telefonê hene.

**Koxî** (Koğuk) dikeve başûrê Bismilê û 20 km ji Bismilê dûr e. Tê gotin ku berê gundê Ermeniyan bûye. Piştre ji aliyê Pasûrê jinek zarokên xwe girtiye û hatiye gund ava kiriye. Niha gundî ji ber zordestiya dewletê ji gund koçkirine. Nifûsa gund li derdora 100î ye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund qûmkiriye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene. Li gund bi navê Koxî girekî dîrokî heye. Koxî tê maneya gir an jî tepe. Bala arkeologan dikşîne. Riya gund qûmkirî ye.

**Kurudeğirmen** dikeve başûrê Bismilê û 20 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 530 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtiye, şagird diçin gundên nêzîk. Li gund elektrîk û telefon hene. Rê stabîlîze kiriye.

[6] Nisaniyanmap.com, li beşa Bismilê binêrin.

**Lasê** (Sazlı) dikeve bakurê Bismilê û 18 km ji Bismilê dûr e. Bi kurdî tê wateya loda pûş û palax.[7] Heta sala 1942an gundê cuhiyan (yahudîyan) bûye. Piştî vê tarîxê İzettin Güner gund îstîmlak kiriye û malbata wî li gund dijî. Nifûsa gund 110 e. Meksê û Newala Dirêj mezreyên wê ne. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund qûmkiriye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefon hene.

**Lewenda Jorîn /Selebdûn** (Balcılar) dikeve başûrê rojhilatê Bismilê û 28 ji Bismilê û 40 km jî ji Amedê dûr e. Lewenda Jêrin û Alper mezreyên wê ne. Gundî çandiniya ceh û genim dikirin, lê di van salên dawî de bi bendav û sontajan bêtir çadiniya pembo dikin. Li ber çemê Stewrê ku tê ser çemê Dîclê ye. Gund du tax in. Nifûs 320 e. Dibistan, elektrîk û telefon hene. Rê qûmkirî ye.

**Mara** (Bahçe) dikeve bakurê Bismilê û 20 km ji Bismilê dûr e. Berê gundê xirîstiyanan bûye. Niha hemû gundî Kurd in. Nifûsa gund 180 e. Riya gund asfalt e. Dibistan hebûye li gund lê piştre hatiye girtin. Telefon û elektrîk hene.

**Melemûs** (Meydanlık) dikeve başûrê Bismilê û18 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 160 e. Mezreyeke wê heye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund qûmkiriye. Dibistan heye, lê girtiye. Ava gund kêm e. Li gund elektrîk û telefon hene.

**Meterê** (Pınarbaşı) dikeve başûrê rojhilatê Bismilê û 30 km ji Bismilê dûr e. Berê gundê Ermeniyan bûye û navê gund jî bi Ermenî ye. Huseyîn mezreya wê ye. Nifûsa gund 283 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefon hene. Girekî dîrokî li gund heye û niha arkeolog li wir dikolin. Riya gund qûmkirî ye.

**Mezra Ebdilqadir** (Bademli) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê û 30 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 730 e. Du mezreyên wê hene. Dibistan hatiye girtin. Zarok diçin dibistanên gundê nêzîk. Wek hemû gundên din li vî gundî jî elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

[7] Nisanyanmap.com, li beşa Bismilê binêre.

**Mezra Ehmed** (Ahmetli) dikeve rojilatê Bismilê û 30 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 190 e. Li gund dibistan tune. Elektrîk û sîstema telefonê heye. Heywan xwedî dikin û bi ziretê ve mijûl in. Bi navê Celik mezreyek wê heye. Riya gund qûmkirî ye.

**Mezra Kevir** (Harmanlı) dikeve başûrê rojhilatê Bismilê û 27 km ji Bismilê dûr e. Li gor gotinên mezin ên gund berê Çaçan li gund jiyane. Zîyareta Şêx Cafer li gund e. Nifûsa gund 540 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye. Ambarciyan (Ambarcik) mezreya wê ye. Riya gund asfalt e. Li gund elektrîk û telefon hene.

**Mezra Ulya** (Yukarıharım) dikeve bakurê Bismilê û 20 km ji Bismilê dûr e. Qendîlo mezreya wê ye. Nifûsa gund 535 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund mizgeft, elektrîk û telefonê hene. Riya gund asfalt e.

**Mîrqulya** (Çeltikli) dikeve rojhilatê Bismilê û 19 km ji Bismilê dûr e. Berê gundê êzidîyan bûye. Niha êzîdî li gund nemane. Kes nizane ew bûne misilman an jî koçber bûne. Dewletê di van salê dawî de ji bo bêrtiyan gelek xanî çêkirine û nifûsa gund zêde bû. Niha nifûsa gund ji 3000 î zêdetir e. Li gund nexweşxane, dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Rê stabîlîze ye.

**Mirzebega** (Mirzabey) dikeve rojhilatê Bismilê. Nêzîkî riya Batmanê ye. Ji Bismilê û 36 km, ji Batmanê 12 km û ji Amedê jî 98 km dûr e. 700 sal berî niha ji Cizîra Botan hatine û li vir bi cih bûne. Ji eşîra Bedirxaniyan in. Nifûsa gund 1380 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Li gund dibistan, mizgeft û nexweşxane, elektrîk û telefon hene. Rê stabîlîze ye.

**Obalî** (Obalı) dikeve bakurê Bismilê, li ber çemê Dîclê ye û 1 km ji Bismilê dûr e. Tê gotin ku eşîra Obalî di sedsala 16an de ji herêma Mereşê hatine û li gund bi cih bûne. Nifûsa wê nêzîkî 100î ye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya wê asfalt e. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene.

**Ofê** (Ofköy) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê û 10 km ji Bismilê dûr e. Di sala 1950î de 100 mal bûye. Nifûsa gund 138 e. Hatina gund li ser çandinî û

heywan xwedîkirinê ye. Riya gund asfalt e. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene.

**Perîşanê** (Güngeçti) dikeve başûrê rojhilatê Bismilê û ji Bismilê 32 km dûr e. Gund navê xwe ji jineka ku navê wê Perîşan bûye girtiye. Tê gotin ku berê Ermenî jî li vî gundî hebûne. Nifûsa gund 620 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund qûmkiriye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefon hene.

**Qamişlû** (Kamışlı) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê û 18 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 160 e. Gora Şêx Heybet û malbata wî li gund e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qasimî** (Bölümlü) dikeve bakurê Bismilê. Qasimiya Sulfa jî dibêjin. Ji Bismilê 35 û ji Amedê jî 51 km dûr e. Gir û kaniya Qasimiyê bi navûdeng in. Seyran û Qasimiya Jorîn mezreyên wê ne. Nifûsa gund 505 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin. Telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qereçolya** (Karaçölya) dikeve bakurê Bismilê û 20 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund li derdora 130î ye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund qûmkiri ye. Li gund elektrîk û telefonê hene.

**Qerebadira** (Karayiğit) dikeve bakurê Bismilê û 20 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 200î ye. Nivîskar Vasif Öngören, helbestvan Veysel Öngören û karîkatorîst Ferit Öngören ji vî gundî ne. Hersê jî bi tirkî dinivîsin. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye lê girtiye. Li gund elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qerebolkê** (Karabörk) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê û 12 km ji Bismilê dûr e. Di dema xwe de gundê Ermeniyan bûye. Niha gund di deste malbata Aslanan de ye. Nifûsa gund 70 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtîye. Li gund elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qerengoz** (Karagöz) dikeve bakurê rojavê Bismilê û 12 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 400î ye. Zorava mezreya we ye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Li gund dibistan, elektrîk û telefonê hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qerepêçê** (Karapinar) dikeve başûrê rojhilatê Bismilê û 25 km ji Bismilê dûr e. Tê gotin ku di zemanê berê de gundê Ermeniyan bûye. Yenîkoy mezreya wê ye. Nifûsa gund daketiye derdora 100î. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund qûmkirî ye. Dibistan tune. Li gund sîstemên elektrîk û telefonê hene.

**Qerexanê** (Oğuzlar) dikeve bakurê rojavayê Bismilê û 32 km ji Bismilê dûr e. Ji aliyê Siwêrekê ve ji eşîreta Qerekeçiyan hatine û gund avakirine. Nifûsa gund 260 e. Korxelîl û Gundik (Yeniköy) mezreyên wê ne. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qeselê** (Güroluk) dikeve bakurê rojavayê Bismilê û 24 km ji Bismilê dûr e. Gundekî nû ye. Di sala 1984an de ji bo eşîreta Bêrtiyan hatiye çêkirin. Wek tê zBêrtî koçer in di navbera Amed û Çewlikê de diçin û tên. Niha hinek li gund bi cih bune û êdî koçerî nakin. Hinek ji wan jî hîn pezê dibin zozanê Şerefdînê û tînin deşta Amedê. Nifûsa gund 450 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund qûmkiriye. Li gund elektrîk û telefonê hene.

**Qoca** (Kocalar) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê li ber çemê Batmanê ye û 6 km ji Batmanê dûr e, lê li ser Bismilê ye. Qoca 46 km ji Bismilê û 96 km jî ji Amedê dûr e. Ji ber ku gund avzem bû di salên 1950î de gund xerab kirin û li jor gundekî nû avakirine. Nifûsa gund nêzîkî1200î ye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Li gund dibistan, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qopiziyê** (Kopuzlu) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê û 35 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 500 heye. Qosû (Begendi) mezreya wê ye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene. Rê stabîlîzekirî ye.

Institut kurde de Paris

**Qoroxçî** (Korukçu) dikeve rojhilatê Bismilê û 7 km ji Bismilê dûr e. Qorix navê giyayekî ye wek kevzê ye. Piştre ew cureyê giya hişk bûye. Bi kurdî gotine Qorixçî. Dema navê gundan bi tirkî lêkirine wek ku bi tirkî be gotine "Korukçu" Gund li ber çemê Dîclê ye. Gundekî dîrokî ye. Dîroka gund digêhêje berî mîladê. Arkeologan ji binê erdê gelek kûp û tiştên din deranîne û lêkolîna wan dom dike. Li gund Gora Seydayê Mele Mehmed Emîn heye. Seyda alimekî pir mezin bûye. Nifûsa gund li derdora 400î ye. Mezreyeke wê heye. Hatina gund li ser çandiniya titun, pembo û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtî ye. Li gund elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qoyîn** (Koyunlu) dikeve rojhilatê Bismilê û 32 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund li derdora 350î ye. Tirbespî (Başarır) mezreya wê ye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund asfalt e. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund sîstemên elektrîk û telefonê hene.

**Sadiyê** (Kurudere) dikeve başûrê rojhilatê Bismilê û 20 km ji Bismilê dûr e. Nêzîkî çemê Dîclê ye. Berê gundê Ermeniyan bûye. Tê gotin ku 300-400 sal berê niha gund navê xwe ji çawîşekî Ermenî girtiye. Nifûsa gund 535 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund qûmkiriye. Artûx mezreya wê ye. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefonê hene.

**Safya** (Akçay) dikeve bakurê Bismilê û 38 km dûr e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Nifûs 213 e. Mezreyeke wê heye. Riya gund qûmkirî ye. Dibistan, elektrîk û telefon hene.

**Seleta Jorîn** (Yukarısalat) dikeve rojhilatê Bismilê. Ji Bismilê 23 km û ji Amedê jî 78 km dûr e. Li ser riya trênê ya Batman û Amedê ye. Nifûsa Seletê 6.677 e. Seleta Jêrîn (Seleta Sulfa/Asağısalat) û Koyunçiftliği mezreyên wê ne. Di sala 1920an de bûye gund. Di navbera salên 1934-1938an de Tirkên macîr ji Bulgaristanê anîne li wir bi cih kirine. Di van salên dawî de macîrên Bulgaristanê bi riza dilê xwe koçî metropolên Tirkiyê kirine û niha bi tenê sê malbat li Seletê mane. Çemê Seletê di nêzîkî gund de diçe ser Dîclê. Di sala 1966an de, ji ber rabûna ava Dîclê hem Seleta Jorîn û hem jî Seleta Jêrîn zerar dîtine û carek din ji nû ve hatine avakirin. Di navbera salan 1966 û

1990an de bûye nehiye. Di sala 1999an de statûya şaredariyê girtiye. Girê Seletê girekî dîrokî ye û dîroka gir heta 4.000 sal berî zayînî diçe. Gundî çandiniya genim, ceh, nîsk, pembo, zebeş û petêxan dikin. Li gund bi qasî 1000 şargird hene. Di nav gel de sewiya perwerdê bilind e. Li Seletê kanalîzasyon û sîstema avê hene. Dema li ser çemê Dîclê bendava Germavê were çêkirin, beşek zeviyên Seleta Jêrîn jî di bin avê de dimînin. Li Selete Jêrîn girekî dîrokî heye û niha arkeolog le dikolin. Gora şêx Evdirrehîm (birayê Şêx Seîd) li nêzîkî Seleta Jorîn e û niha ew zîyaretgeh e. Şêx Evdirrehîm û 17 hevalên xwe di sala 1937an de, ji Suriye vegerîne. Giliya wan hatiye kirin û hêzên dewletê di nav zeviya genim de dor li wan girtine û agir berdane genim. Hinek ji wan kuştine û hinek jî hatine şewitandin.

**Selmik** (Kayı) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê û 43 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 280î ye. Qişla mezreya wê ye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtiye. Dema li ser çemê Dîclê bendava Germavê were çêkirin mezreya Qişlaxê jî binav dibe. Li gund elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Sergewran** (Akbaş) dikeve bakurê rojhilat û 46 km ji Bismilê dûr e. Ji Elihê 20 km dûr e. Nifûs Sergevranê ji 700î bêtir e. Riya gund qûmkiriye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan, telefon û elektrîk hene.

**Seyîdhesen** (Bakacak) dikeve bakurê rojavayê Bismilê û ji Bismilê 10 km dûr e. Nifûs ji 350î zêdetir e. Koşk mezreya wê ye. Dewletê ta ji dema Osmanî de elewîyen Tirkmen anîne bi cih kirine. Beşek ji gundiyan koçên Almanyayê kiribûn û piştî sala 1989an yên li gund mayî jî ber bi metropolên Tirkiyê ve koçkirin. Niha Kurd li gund bi cih bûne. Li gund bi navê Abbad Dede turbesî pîrozgeheke elewiyan heye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan hatiye girtin. Li gor lêkolînek ji %24 ên gundiyan li Almanyayê dijîn.

**Sînan** dikeve rojhilatê Bismilê û 35 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 1330 e. İstasyon, Lasa Jêrîn û Lasa Jorîn (Yukarısazlik) mezreyên wê ne. Qereqola Sînanê di navbera salên 1925-1945an de bûye cihê lêdan û kuştina Kurdan. Çemê Sînanê di ber gund re derbas dibe û diçe ser Dîclê. Gund di destê

axa de ye û gundî bê xanî, mal û ax in. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Gundekî dîrokî ye û tê gotine ku gundê êzîdîyan bûye. Dibistan, elektrîk û telefon hene. Dema li ser çemê Dîclê bendava Germavê were çêkirin zeviyên mezreya Sazlikê dikevin bin avê.

**Sofya** (Erler) dikeve bakurê Bismilê û 34 km ji Bismilê dûr e. Koka gundiyan ji yek malbatekê ne. Nifûsa gund nêzîkî 300î ye. Mezrê û Mîrwisiva mezreyên wê ne. Lê Mîrwisiva niha vala ye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Gundekî dîrokî ye. Li herêma gund cihên dîrokî hene. Newala Kerxê bi navûdeng e. Girê Şehîn û Girê Xeyber pîrozgeh in. Riya gund qûmkirî ye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefon hene.

**Sunduz** (Güzelköy) dikeve başûrê rojhilatê Bismilê û 30 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 123 e. Batil (Tepekonak) mezreya wê ye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund qûmkirî ye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene.

**Şiîra** (Kılavuztepe) dikeve başûrê rojhilatê Bismilê û 17 km ji Bismilê dûr e. Gund ji aliyê Hecî Salim ve hatiye damezrandin, dîroka avakirina gund ne dîyar e. Salim ji Ciliniyê hatiye û tê gotin macîrê Îranê bûye. Nifûsa gund nêzîkî 100î ye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund qûmkirî ye. Ava gund kêm e. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefon hene.

**Şeqlitîzê** (Çakıllı) dikeve rojhilatê Bismilê û 13 km ji Bismil dûr e. Nifûsa 320 heye. Çorapan û Meredanê mezreya wê ne. Dibistan girtiye. Li gund elektrîk û telefon hene. Gundî heywanan xwedî dikin û bi çandiniyê ve mijûl in.

**Şedada** (Serçeler) dikeve bakurê Bismilê û 10 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 260 e. Huseynê Sor û Mele Feyad mezreyên wê ne. Dewletê di sala 1934an de ji Bulgaristan û Yugoslavyayê macîr anîne li gund bi cihkirine, lê, di demeke nêzîk de ji gund koçî metropolên Tirkiyê kirine. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Riya gund qûmkirî ye. Dibistan heye, lê girtîye. Li gund elektrîk û telefon hene.

**Şerefika** (Uğurlu) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê û 30 km ji Bismilê dûr e. Berê gundê Ermeniyan bûye. Nifûsa gund 350î ye . Dibistan heye, lê girtiye. Ava gund tune. Li gund elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkiriye.

**Şêx Wusuf** (Akköy) dikeve başûrê rojhilatê Bismilê û ji Amedê 150 û ji Bismilê ji 27 km dûr e. Nifûsa nêzîkî 400î ye. Oba û Sêmal mezreyên wê ne. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund telefon û elektrîk hene. Rê stabîlîze kiriye.

**Tepa Berava/ Kortik** (Tepe) dikeve başûrê rojhilatê Bismilê. 13 km ji navenda Bismilê dûr e. Eğitim, Yeşilova ve Bahçeli taxên Tepê ne. Nifûsa wê 1.080 e. Di sala 1992an de şaredariyê hatiye damezrandin. Kortik herêma Bismilê ya kevn û dîrokî ye. Lê di van kolanên van salên dawî de Girê Pîrozgehê ew li pey xwe hişt. Piştre di serdema Hûriyan de cihê şaristaniyê bûye. Di navbera Hûrî û Asûriyan de şerê dijwar pêkhatine. Piştre ketiye destê Asûriyan. Di van salên dawî de li rojhilatê şaredariya îroyîn li Zîyaretê lêkolînên dîrokî hatine kirin û hîn berdewan in. Ji bin axê hinek belge derketine ku Asûriyan li vir bi navê Tuşba peytext an jî navendek ava kirine. Ji derî cihê dîrokî herweha di sala 2008an de li Ertepe petrol hate dîtin. Bi salan Tepe nehiya Bismilê bû û jê re digotin nehiya Behramkî. Tepe di devê çemê Dîclê de bû. Di salên 1960an de her ku ava çem zêde dibû, laser (lehî) radibû û zerareke mezin dida Tepê. Xelk mecbûr ma û bar kir û her ku çû hejmara rûniştvanên Tepê kêm bûn.

**Tezeka** (Aralık) dikeve başûrê Bismilê û 2 km ji Bismile dûr e. Tê gotin ku navê wê yê kevn Zorexan bûye. Pêşî gundekî Tirkmenan bû, niha Tirkmen nemane û koçber bûne. Gund ketiye nav bajêr. Nifûsa gund 1375 e. Bi navê Kooperatîf mezreyek wê heye. Dibistan girtiye. Sistema av û kanlîsazyonê li gund hene. Rê asfalt e. Gundî bi heywan xwedîkirin û kiştûkal ve mijûl in. Elektrîk û telefon hene.

**Tilşamê** (Şahintepe) dikeve rojhilatê Bismilê û 21 km ji Bismilê dûr e. Gundekî dîrokî ye. Bi navê Girê Misilmanan û Girê Fileyan du cihên dîrokî hene. Li gor lêkolînên arkeologan 5.000 sal berî mîladê mirov li vir jiyane. Nifûsa gund 230 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye lê girtiye. Çiftlik mezreya wê ye. Li gund elektrîk û telefon

hene. Rê stabîlîze kiriye. Dema li ser çemê Dîclê bendava Germavê were çêkirin zeviyên vî gundî jî di bin avê de dimînin. Berî ku bendav were çêkrin, pêwîst e ku gundî ji ser axa xwe ya hezar salan bar bikin.

**Tîrikan** (Tirk/Tilkilik) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê û 20 km ji Bismilê dûr e. Navê gund tê wateya 'tîrikan' ku bi tirkî dibêjin 'ok'.[8] Nifûsa gund 280 e. Qeretepe û Misket mezreyên gund in. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ne. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Xanoserê** (Başhan) dikeve başûrê rojhilatê Bismilê û 36 km ji Bismilê dûr e. Navê gundê kevn Xan bûye. Wê demê gundê Ermeniyan bûye. Di dema Osmanî de 'baş' lê zêde kirine û bûye Başxan. Nifûsa gund 608 e. Mala Husên û Çelik mezreyên wê ne. Dibistan hatiye girtin û zarok diçin dibistana gundê nêzîk. Telefon, sistema avê û elektrîkê hene. Rê stabîlîze ye.

**Xincika** (Diktepe) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê û 32 km ji Bismilê dûr e. Ji Batmanê jî 6 km dûr e, lê li ser Bismilê ye. Nifûsa gund 588 e. Mezreyeke wê heye. Dibistan girtiye. Telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund asfalt e.

**Yaplan** (Merdan) dikeve rojhilatê Bismilê û 18 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 153 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene. Rê stabîlîze kiriye.

**Yasinci** dikeve rojavayê Bismilê û 15 km jê dûr e. Nifûsa gund 220 e. Mezreyên wê Hayderkulu, Aktaş, Mele Xalis û Qoçalî ne. Berê gundê êzidiya bûye. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonê hene. Rê stabîlîze kiriye.

**Yengîcî** (Yenîce) dikeve başûrê Bismilê û 15 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 180 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye lê girtiye. Înarlı û Yenîkoy mezreya wê ne. Li gund sîstemên elektrîk û telefonê hene. Rê stabîlîze kiriye.

Institut kurde de Paris

[8] Nisanyanmap.com li beşa Bismilê binêre.

**Zeko** (Seki) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê û 15 km ji Bismilê dûr e. Gundekî dîrokî ye. Li girê gund gelek tiştên kevn ji bin erdê hatine derxistin. Nifûsa gund 270 e. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye lê girtiye. Li gund elektrîk û telefon hene. Rê stabîlîze kiriye.

**Zengilo** (Kumrulu) dikeve bakurê rojhilatê Bismilê. Ji Bismilê 20 km dûr e. Di sala 1996an de dewletê gund ji binî ve hilweşand. Niha tu xanî û kes li gund nemane. Şêx Mîzbehê Mala Bokal û nivîskar Edîp Polat ji vî gundî ne. Rê qûmkirî ye.

**Zerîkena** (Sarıköy) dikeve rojhilatê Bismilê û 16 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund 213 e. Sefalî û Kenan mezreyên wê ne. Li gund zîyareta Şimikan û ya Şehîdê Pelkê hene. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Rê qûmkirî ye. Dibistan heye lê girtiye. Li gund sîstemên elektrîk û telefonê hene. Li girê Kenan lêkolînên arkeologan dom dikin.

**Zevî** (Kavşak) dikeve rojhilatê Bismilê û 32 km ji Bismilê dûr e. Nifûsa gund nêzîkî160î heye. Kinik û Şahin mezreyên wê ne. Hatina gund li ser çandinî û heywan xwedîkirinê ye. Dibistan heye, lê girtiye. Li gund elektrîk û telefonhene. Rê qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris



Dîmenek ji Çêrmûgê
Foto: Müslüm Üzülmez

# Çêrmûg

Germik ji bajarokên Amedê yên dîrokî yek e û dikeve rojavayê Amedê. Heta niha çend nav lê hatine kirin. Germik (Germok), Çêrmûg. Bi tirkî jî Çermîk dibêjin[9]. Navê xwe ji ava germ girtiye ku bi kurdî ji avên germên sirûştî re germik an germav dibêjin. Di nav demeke dûr û dirêj de germik bûye Çêrmûg. Germik ji navenda Amedê 90 km dûr e. Herêmeke çiyayî ye. Li aliyê rojhilat di bin qûntara çiyayê Aşûkar de ye. Mezinahiya qada axa wê: 1.032 $km^2$ ye û ji deryayê 700 m bilintir e. Li ser Germikê 78 gund, 75 mezre û du şaredarî hene. Li gor statîstîkên sala 2010an nifûsa navendê 17.389, gund 32.851 û bi giştî nifûsa Germikê 50.240 e.

Di sala 1518an de, di *Diyarbekir Eyaletî Tahrîr Defteriyê* de "Çêrmûg sencexa Diyarbekirê ye" dinivîse. Di salnameya Diyarbekirê ya sala1879an de jî, li ser Germikê weha dinivîse:

"Çêrmûg bajaroka Diyarbekirê ye. 913 xane, 3 xan, 3 dukan, hemamek, 5 mektebên ruştiye, medreseyek, dêreke Ermeniyan, dêreke protestanan, 3

[9] Mehmet Emin Bozarsalan di jêrenota xwe ya, *Tarihteki ilk Türkçe ansiklopedide Kürdistan ve Kürtler* s. 81, Deng yayınları, İstanbul-2001. Dibêje ku ev bajaroka navê xwe ji germava (hemam-ilica) girtî ye. Di Şerefnameye de jî Çermok derbas dibe. Şerefxanê Bedlîsî, Şerefname (wergera Ziya Avci), Weşanên Apec, r. 215. Şevket Beysanoglu dibêje navê Çêrmûgêyê kevn Aberne ye. Şevket Beysanoglu, *Diyarbekır Tarihi* r. 29. (Ji Germikê re Şamkûş jî dibêjin.)

pire, 4 debaxane, 9 firin, 9 qehwexane, 2 goristanên misilman, goristaneke Ermeniyan, goristaneke cuhiyan û 4 tax hene."

Hemû bajarokên Amedê wek navenda Amedê xwediyê dîrok û şaristaniyeke gelek kevn in. Hîn ji dema neolotîk ve mirov li vir jiyane. Ji bo herêmeke çiyayî ne, ji serdema keviri ve şopen mirovan hene. Mirov hîn îro jî di gelek nawis, sarinc û şikeftên kolandî yên ku ji zemanê wan ve mane, rastî şopên jiyana mirovên wê serdemê tê. Lê di serdema dîrokî de cara yekem Hûrî-Mîtanî li vê herêmê jiyane. Wek dîroknas jî hemfikirin ku Hûrî-Mîtanî bav û kalên Kurdên serdema me bûne. Li herêma Çêrmûgê jî di navbera salên 350-1260an de Hûrî û Mîtaniyan hukim kirine. Ji bo herema Amedê û bi taybetî Mezopotamya di wan serdeman de dergûşa şaristaniyê bûye, her dewlet û komên bi xwedî hêz Mezopotmayê dagîr kirine. Hatine û çûne. Mirov dikare li herêma Çêrmûgê rastî şopên Asûrî (bz 1260-775), Ûrartûyî (bz 775-736), cara duyem dîsa Asûrî hatine herêma Çêrmûgê (pz 736-653), Iskîtî (bz 653-625), Med (bz 625-550), Pers (bz 530-331), Îskender- Seleukos (bz 323-140), Ermenî (bz 85-69), Arsakî (bz 66 û pz 395) tê.

Mövses di pirtûka xwe ya bi navê *"Cografya Ermenistanê"* de dinivîse ku ji Wanê heta Cizîrê di bin fermandariya Arsakiyan de bûye û Çêrmûg jî sencaxa heftem a eyaleta bajarê Alenîk bûye. Arsakî bi xwe Ermenî ne. Herweha Metranê Asûrî Amedî Mar Yeşua di "Wakanameya" xwe de dinivîse ku di sala 498an di meha îlonê de tofaneke mezin li herêma Amedê peyda bûye û erdhejeke mezin çêbûye. Di çemê Ferad û Abernê (Çêrmûg) de bûyer û guhertinên mezin çêbûne û germav çikiyane.

Piştî Arsekiyan Romayî an jî Romî hatine herême û di navbera salên 395-639an de hukim kirine. Di sala 639an de di dema Omer de bi Amedê re Çêrmûg jî ketiye bin desthilatdariya îslamê û heta 661 dom kiriye. Bi dorê Emevî (661-750), Abbasî (750-869), Şeyxanî (869-899), Hamdanî (930-978), Ubeynî (978-984), Mervanî (984-1095), Selçûqî (1085-1095), di navê de Inal û Nîsanî ji hatine û derbas bûne. Artûkî (1185-1232) hatine herême û pireya Xabûrmanê çêkirine û riya Tebrîz Exlatê û Riha û Helebê bi hev ve girê dane. Selçûqîyên Anatoliyê, cara duyem Artûkî, Qaraqoyûnî û Aqqoyûnî li herêmê hukim kirine. Ji sala 1420 heta 1515an herêma Çêrmûgê di destê mîrê Mirdasiyan de bûye. Avakarê mîrîtiya Çêrmûgê Husên kurê Muhemed Emîrê Mirdasî ye. Li gor Şerefnamê mîrên Eglê û yên Çêrmûgê ji heman kokî ne[10].

[10] Şerefxanê Bedlisi, Şerefname (wergera Ziya avci), " di derheqê Fermarewayên Mirdasiyan de, r. 211, Weşanên Apce, Stockholm

Institut kurde de Paris

Li rojavayê Çêrmûga niha keleke dîrokî heye. Li serê çiya li cihekî bilind û asê ye. Di derheqê çêkirina vê keleyê tu agahdariyên dîrokî tune ne. Kele niha xerabe ye. Çend sarinc û bîrên avê ku ji kevir kolane, hene û ew jî bi keviran hatine tije kirin. Nawiseke heye xelkê Çêrmûkê navê dikana Berber lê kiriye. Xerabeyên dêrê jî cih bi cih li ser piyan mane. Tê gotin ku di dema xwe de ji kelê bi riyeke dizî daketiye çemê Sînagê ku 150-160 metre di bin kelê re derbas dibe. Heta sala 1516 kele hebûye û xelkê Çêrmûgê di nav wê kelê de jiyane. Bi desthilatdariya Osmaniyan re kele xerab kirine û xelkê mecbûr kirine û anîna derê kelê li Çêrmûga îroyîn bi cih kirine. Osmaniyan muslimanên ku Qafqasya anîne wek gelek cihên Kurdistanê din çend malbat anîne li navenda Çêrmûga nû bi cih kirine. Li navendê di dema Osmaniyan de Tirkmenên ku ji Qafqasyayê anîne bi cih kirine. Ji derî Tirkmenan li navenda Çêrmûgê Ermenî û cihû jî hebûne. Li gor lêkolînên Halacoğlu di sedsala 16an de taxên Qele û Tepe Ermenî ne, lê bi tirkî dipeyivin û hejmara wan 586 e. Taxa Çiqûr jî cihû ne lê bi erebî dipeyivin. Piraniya xelkê Kurdên kirmanckî ne. Niha ne Ermenî mane û ne jî cihû.

Li navenda Çêrmûgê Mizgefta Mezin (Camî Kebîr) heye. Nivîseke li ser dîwarê mizgeftê hatiye kolan ku di navbera salên 1145 û 1146an de mizgeft ji aliyê Ebû Mensûrê Înalî ve hatiye çêkirin. Di dema êrîşên Moxolan de mizgeftê zerareke mezin dîtiye. Piştre restore kirine û minareya wê lê hatiye zêde kirin. Li navenda Çêrmûgê li taxa Qelê ku dikeve rojavajê Çêrmûgê, mizgefta Siltan Eledîn heye. Çend navên vê mizgeftê hene, jê re Camiya Atîk, Camiya Çêrmûgê, Camiya Şah Alî Beg jî dibêjin. Ev mizgeft bi kevirên spî hatiye avakirin. Niha beşeke din li mizgeftê hatiye zêdekirin. Nivîseke li ser kevirên mizgeftê hatiye kolan û navê Fexredîn Qera Arslan li ser heye. Weha tê texmîn kirin ku di serdema Înaniyan ji aliyê Ebû Mensûr Îlaldi ve hatiye çêkirin.[11]

Medreseya Evdila Paşa li navenda Çêrmûgê li ser riya Mizgefta Mezin e. Li ser dîwarê medreseyê nivîseke heye ku di sala 1756an de ji aliyê Çeteci Evdila Paşa ve hatiye çêkirin. Çetecî Evdila Paşa Çêrmûgî ye. Çend caran bûye waliyê Amedê. Ev medrese îro hîn avahiyeke li ser piyan e.

Du pireyên dîrokî li Çêrmûgê hene. Herdu jî li ser çemê Sînagê ne. Yek li bakur e û ya din li başûr e. Yek pireya Habûrmanê ye. Li ber gundê Habûrmanê loma jê re pireya Habûrmanê dibêjin. Li cihekî stratejîk e. Riya

[11] Ali Melek, Abdullah Demîr, Dînî degerleri ile Diyarbakır, Diyarbakır İl Müftülüğü yayınları, s.133-2009

Institut kurde de Paris



Ji Çiyayê bûkê, Çêrmûg
Foto: Ahmet Dogru

Çêrmûg, Siwêreg û Helebê bi hev ve girê dide. Pireyekî sê çavîye û ji keviran çêkiriye. Dirêjiya wê 108 û firehiya wê jî 5.5 metre ye. Bilindahiya wê jî 11.20 m ye. Ji dema Romayê ve li wir pire hebûye, lê di şer de tim hatiye xera kirin û carek din çêkirine. Ya dawî ku heta niha heye, ji aliyê Zubeyde Xanim keça hukimdarê Artûkiyan Necmedîn Alpî ve di navbera salên 1152-1176an de hatiye restorekirin.

Pireya Duyem jî dîsa li ser çemê Sînagê li bakurê Çêrmûgê ye. Ev pire di sedsala 12an de hatiye çêkirin. Ev pire du çavî ye. 18 metre dirêj e. Pireyê gelek xisar dîtiye. Niha bi qasî 600-700 metreyî dûrê wê pireyeke nû çêkirine û riya Çêrmûg û Çingûşê di ser pireya nû re derbas dibe.

Osmaniya li navenda Çêrmûga nû gelek kanî çêkirine. Di salnameya Diyarbekirê de dinivîse demeke 83 kanî li Çêrmûgê hebûne. Lê niha çend mane û navên çendan tê zanîn. Ji wan yên ku navên wan tên zev in: Kaniya Xanimê, Qirzê, Bandîzade, Elîpîr, Qeyme, Herefene, Yel, Hesen-Huseyin, Çelenga, Eşûr û Izmîra.

Dimenek ji Çêrmûg û Çemê Sinagê →
Foto: Ahmet Dogru

## Germava Belqisê

Germava Çêrmûgê dema mirov ji Erxeniyê diçe Çêrmûgê di destpêka bajarokê de, li aliyê çepê ye. Berê 3 km ji navenda Çêrmûgê dûr bû. Niha bajar ber bi aliyê Germavê ve hatiye çêkirin. Bûye taxeke navendê. Germava Çêrmûgê li herêmê ji aliyê tendurîstiyê û şîfayê ve bi navûdeng e. Di nav xelkê de Hemama Çêrmûgê jî dibêjin, lê navê wê yê orjînal Germav e. Di nav herêmeke dar, ber û bexçeyan de ye. Kes nizane ev Germav ji kengê ve heye. Berê germav servekirî bû. Di sedsala 16an de mîrên Çêrmûgê li gor wê demê kumbeteke li ser çêkiriye. Niha şaredariya bajarokê li ser avahî ava kiriye. Pênc xaniyên cuda çêkirine. Germavên berê du ne. Navê yekê Paşayê Mezin û ya din jî Paşayê Biçûk e. Ji derî van herduyan, ji bo malbatan çend jûrên (odên) malbatî jî çêkirine.

Ava germa Çêrmûgê 47-48 derece germ û rêzberiya wê 7.6 ph ye. Mînarelên wek klor, sodium, sulfat, bîkarbonat, îyot, îyodur û bromur hene ku ji gelek nexweşiyan re derman û şîfa ne.



Institut kurde de Paris

Li derdora germavê gelek hotel û motel hene. Cihên bînvedan, kafeterya û aşxane hene. Germav herdem vekirîne, lê di mehên havînê de gelek qelebalix dibe. Di turîzma Çêrmûgê de germav roleke mezin dilîze. Li ser germavê efsaneke weha heye.

**Efsaneya ava şîfa**

Li gora rivayeteke fermandarê Akkoyûnî xwedî gelek lawan e. Lê keçik wî tune ye. Di xewna xwe de derweşekî dibîne û ev dewreş zerikeke av dide fermandar. Li ser dayîna vê avê keçeke fermandar çêdibe. Keça hikumdar her ku mezin dibe pir xweşik dibe. Navê keça fermandar Belqis e. Destê fermandar nagre ku keça xwe ya xweşik bizewicine. Dilê Belqis jî di lawê xizmetkarê qesrê de ye. Navê lawik Samî ye. Rojeke xanima paşayeke Belqisê ji lawê xwe re dixwaze. Belqis vî tiştî qebûl nake. Xanima Paşê nifireke li Belqis dike. Li ser vê nifirê Belqis nexweş dikeve. Diranên wê diweşin, di laşê wê de birîn vedibin. Birîn her ku diçe mezin dibin. Li ser vê Belqis ji qesrê direve

Institut kurde de Paris





Germava Belqisê
Foto: Baki Kaymak

û berê xwe dide nava daristaneke mezin. Naxwaze kesekî bibine. Dema di nav daristanê de derbas dibe, dibîne ku avake ku hilm û gulm bi ser ketiye, diherike. Ew xwe davêje wê avê. Birînên Belqisê di cih de xweş dibin. Di vê navberê de Samî bi dû Belqis dikeve û wê li ber vê avê dibîne. Fermandar ji bo ku Samî Belqizê dibine, wan her duyan dizewicîne. Li ser vê avê jî fermandar hemameke xweşik çêdike. Dibêjin ku ev hemam hemama Paşê ya Mezin e. Ji ber vê yekê navê germava Çêrmûgê kirine germava Belqisê.

### Efsaneya Çiyayê Bûkê

Rojeke ji rojan berbûrî ji vê çiyayê derbas dibin. Di nav berbûriyan de jineke bi zarok jî hebûye. Gava zarok bin xwe pîs dike ji ber ku av û tişteke din peyda nabe, jinik jî bi nanê sêlê binê zarokê paqij dike. Ew bûyer bê hurmetiyeke li hemberî nimetê tê qebûl kirin û ev berbûrî li wir dibin kevir. Li gor rîwayeteke din jî dibêjin zarok li ser nan pisî kiriye ji ber wê herkes bûye kevir.

Institut kurde de Paris

## Şaredarî

Kes nizane şaredarê yekem kî bûye. Ji derî şaredarê yekem bi dorê van kesan şaredarî kirine.

1930-1931 Zülfukar Orhan (Bandî Zulfukar)
1932-1934 Hacî Yilmaz (Axukarda Hacî Beg)
1934-1939 Rifat (qeymeqam)
1939-1943 Ragip Ekinci (Ragip Efendî)
1944-1949 Muharrem Orhan (Bandî)
1949-1958 Mehmet İzol
1959-1960 Kazim Bey (qeymeqam)
1961-1973 Îbrahîm Dursun
1974-1979 Taşkın Caynak
1980-1982 Ali Cafer Akyüz (qeymeqam)
1983-1984 Dündar Gültekin (qeymeqam)
1984-1989 Ramazan Can
1989-1994 Mehmet Akdağ
1994-2004 Halit Ağaçhanci
2004-2009 Mehmet Akdağ
2009-2011 Mehmet Akdağ

Institut kurde de Paris





Çiyayê Bûkê

# Nivîskar û hunermend

## Cumali Eşsizoglu

Cumali Eşsizoglu di sala 1957an de li gundê Sînagê hatiye dinê. Wî dibistana seretayî li gund, ya navîn li navenda Çêrmûgê û dibistana mamostetiyê jî li Amedê xwendiye. Li herêmê mamostetî kiriye. Bi navê *Cehennem de Üşüyorum* pirtûkeke wî ya helbestan heye.

## İzzet Yıldızhan

İzzet Yıldızhan di sala 1966an de li gundê Sînagê haitiye dine. Dest bi dibistana seretayî kiriye, lê ji ber mercên xizaniyê nikaribûye bixwîne. Piştre ji der ve dîplomayên dibistana seretayî û navîn girtiye. Li gelek cihan di restorandan de xebitiye û bûye westayê kebabê. Li cihê kar stran gotiye. Piştre li pavyo-

← Dimenek ji Çêrmûgê
Foto: Müslüm Üzülmez

nan dest bi stranan kiriye û êdî hatiye nas kirin. Heta niha gelek kaset, Cd û albumên wî derketine. Ew bi xwe Kurd e, lê bi tirkî distire.

**Nurettin Değirmenci**

Nurettin Değirmenci di sala 1950î de li Çêrmûgê hatiye dine. Dibistana seretayî û navîn li Çêrmûgê û amadeyiyê jî li Enqerê xwendiye. Zanîngeha muhendisiyê beşa teknîkî xwendiye. Di TRTê de dest bi kar kiriye. Di 12ê îlonê de ji kar hatiye derxistin. Heta niha bi navê *Çagdaş düşünce ve islam, Çermik* û çend pirtûkên din nivîsiye.

**Kamil Sümbül**

Kamil Sümbül di sala 1956an de li Çêrmûgê hatiye dinê. Dibistana sereyatî û navîn li Çêrmûgê û amadeyiyê jî li Siwêregê xwendiye. Di navbera salên 1974-1976an de li Enqerê li fabrîkeyeke dest bi kar kiriye. Di sala 1976an de li Enqerê dest bi zanîngeha mîmar û muhendisiyê kiriye. Di pola caran



Institut kurde de Paris



Du nifş

de ji ber sedemên polîtîk hatiye girtin û heta sala 1984an li girtîgeha Amedê maye. Piştî derketina ji girtîgehê 2 sal û 8 meh sirgûnê Sêwasê hatiye kirin. Di sala 1988an wek penaberekî polîtîk hatiye Swêdê. Di gelek kovar û malperan de nivîsên wî hatine weşandin. Bi navê *Cezaevî hikayeleri ve Sıvas surgünü* pirtûkeke wî heye.

### Yılmaz Odabaşı

Yılmaz Odabaşı di sala 1962an de li gundê Alosê hatiye dinê. Dibistana seretayî û navîn li Enqere û Dîlokê û amadeyiyê jî li Amedê xwendiye. Li Îzmêrê dest bi xwendina huqûqê kiriye, lê 1980î de ji aliyê cûntayê hatiye girtin û salek di zîndanê de maye. Piştî girtîgehê dest bi rojnamegeriyê kiriye. Bi tirkî dinivîsîne. Helbest nivîsiye û helbestên wî di gelek kovar û rojnameyan derketine. Gelek stranbêj helbestên wî kirine stran. Pirtûka wî ya helbestan a yekem *Siste Kalabalık* e. Heta niha gelek pirtûkên wî yên helbestan derketine antolojiya helbestan amade kiriye. Xelat girtiye û di warê helbest nivîsandina tirkî de gelek bi navûdeng e.

# Gundên Çêrmûgê

**Alos** (Başarı) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 8 û ji Amedê jî 101 km dûr e. 119 xane û nifûsa gund 520 e. Qerataş, Afan mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî û tirkî dipeyivin. Ji bo Ziya Gökalp dest bi tirkî kirine. Li gund dibistan, nexweşxane, mizgeft û qereqol hene. Dibistana pêngava pêşî heye û şagirdên pêngava duyem diçin navenda Germikê. Dîroka gund heta 400 salan berî niha diçe. Gundê Ziya Gökalp e. Ji malbata wan re Mala Mela dibêjin. Tê gotin ku 300 sal berî niha malbata Ziya Gökapl ji aliyê Wêranşehirê ve hatine vir. Riya gund qasfalt e.

**Arpêxe** (Akçörten) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 30 û ji Amedê jî 132 km dûr e. Nifûsa gund 400 e. Xezelan û Sulaf mezreyên gund in. Bi zaravayên kurmancî û kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşî heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Arabok/Erebok** (Arabük) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 36 û ji Amedê jî 129 km dûr e. Nifûsa gund 103 e. Bi zaravayê kurmancî û kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşî heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Axirmat** (Armağantaşı) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 52 û ji Amedê jî 145 km dûr e. Taxa nû (Yenîmahalle) mezreya wê ye. Ji gundê herî dûr yek e û nezîkî Siwêregê ye. Nifûsa gund 410 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşî heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Li gor gotinan gundiyên Axarmatê ji hêla Mûşê hatine û gund avakirine. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Akrag** (Köksalköy) dikeve rojavayê Çêrmûgê. Akrag bi ermenî çiftlik e. Ji Çêrmûgê 9 û ji Amedê jî 110 km dûr e. Nifûsa gund 517 e. Germik mezreya wê ye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li çiyayê pişt gund, ava Bûke heye, bêkirêc e û wek şîfa ye. Li çiyayê Qetra jî şilêra ku li Zagrosan tê, li wir jî heye û ew li deverê gelek bi navûdeng e. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Axaçxan** (Ağaçhan) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji navenda Çêrmûgê 26 û ji Amedê jî 119 km dûr e. Padîşahê Osmanî Mûradê Çarem di sefera xwe ya ber bi Bexdayê de, li vî gundî maye û kaniyeke daye çêkirin. Ji ber vê yekê navê gund Siltan lê kirine. Nifûsa gund 150 e. Dibistan, telefon û elekrtîk hene û riya gund qûmkirî ye.

**Ancoz** (Kayagediği) dikeve rojhilatê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 15 û ji Amedê jî 86 km dûr e. Nifûsa gund 640 e. Demirtaş mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Bîr** (Kuyuköy) dikeve rojavayê Çêrmûgê. Bîra Mewijan jî dibêjin. Di zemanê berê de li jorê gund çend bîrên avê hebûne. Gund navê xwe ji wan bîran girtiye. Bîr ji Çêrmûgê 22 û ji Amedê jî 116 km dûr e. Nifûsa gund 1055 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Berûd** (Değirmenli) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 15 û ji Amedê jî 108 km dûr e. Nifûsa gund 100 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Bawank** (Pınarlı) dikeve rojavayê Çêrmûgê. Navê gund bi ermenî ye. Orjînala wê Vank û tê wateya Manastrirê.[12] Ji Çêrmûgê 22 û ji Amedê jî 115 km dûr e. Nifûsa gund 260 e. Di salên 1700an ji Palo û Vartoyê hatine û gund avakirine. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan heye, hatiye girtin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Bîrik** (Bayırbağı) dikeve başûrê rojhilatê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 6 û ji Amedê jî 99 km dûr e. Nifûsa gund 120 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşî heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Bêsîn** (Yayıklı) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 15 û ji Amedê jî 109 km dûr e. Gund ji çar taxan pek tê. Nifûsa gund 340 e. Bi zaravayê

[12] Nisanyanmap.com, li beşa Çêrmûgê binêre.

kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistana heşt polî heye û ji gundên derdorê jî şagird tên dibistanê. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Bêdwana Jorîn** (Toplu) dikeve rojhilatê Çêrmûgê. Bêdwana Ulya jî dibêjin. Ji Çêrmûgê 8 û ji Amedê jî 101 km dûr e. Nifûsa gund 650 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, hatiye girtin. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Bîstîn** (Aynalı) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 6 û ji Amedê jî 105 km dûr e. Nifûsa gund 1560 e. Çopê, Belwan û Daşkesan mezreyên wê ne. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Tê gotin ku peşî gund 20 mal bûye û loma ev nav lêhatiye kirin. Li gund dibistaneke mezin heye, ji mezre û gundên derdorê jî tên dibistanê. Nexweşxane, mizgeft, av, kanalîzasyon, telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund asfalt e.

**Bîrê Cemal** (Bircemal) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê, 45 û ji Amedê jî 138 km dûr e. Nifûsa gund 100 e. Bi zaravayên kurmancî û kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşî (pol 1,2,3,4 û 5) heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Bîrawêran** (Örenkuyu) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 22 û ji Amedê jî 129 km dûr e. Nifûsa gund 1100 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Bi navê Dola Hemê goleke biçûk heye. Bi heywan xwedîkirin û ziretê re mijûl dibin. Rezên gund jî bi navûdeng in. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Budaran** (Pamuklu) dikeve başurê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 32 û ji Amedê jî 122 km dûr e. Nifûsa gund 410 e. Bağlarbaşı û Üçevler mezreyên wê ne. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Sîstemên av û kanalîzasyonê hene. Li gund çandiniya pembo zêde ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Cular** (Ceylan) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Di sala 1960î de dewletê navê Ceylan lê kiriye. Ji Çêrmûgê 33 û ji Amedê jî 126 km dûr e. Nifûsa

gund 140 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Çolan** (Eskibağ) dikeve rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 7 û ji Amedê jî 99 km dûr e. Nifûsa gund 280 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan û mizgeft hene, dibistana pêngava pêşî ye. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Dîkdol** (Dikyol) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 25 û ji Amedê jî 118 km dûr e. Nifûsa gund 280 e. Dewik (Ağaçdiken), Sumeyik (Eşler), Tirvêrak (İçoba) û Qeremeşe mezreyên wê ne. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene.

**Elkan/Elîfer** (Elifuşağı) dikeve bakurê rojavayê Çêrmûgê. Dîroka gund heta 1700î diçe. Ji Çêrmûgê 15 û ji Amedê jî 108 km dûr e. Nifûsa gund 368 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Fuseynî** (Bayat) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 35 û ji Amedê jî 128 km dûr e. 300 sal berî niha 5 bira ji aliyê Semsûrê hatine û gund avakirine. Nifûsa gund 320 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistana heşt polî heye û ji gundên derdorê jî şagird tên dibistanê. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Gewrek** (Saltepe) dikeve başûre rojavayê Çêrmûgê. Navê gund tê wateya akça. Ji Çêrmûgê 41 û ji Amedê jî 134 km dûr e. Nifûsa gund 180 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Gund du tax e. Gozêr mezreya wê ye. Gozêr Li qeraxê çemê Feradê hatiye avakirin. Niha piraniya kesên Gozerê koçbarî welatên Ewropa kirine û çend mal mane. Dibistan heye, lê hatiye girtin. Telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Girê Qûçî** (Akkoyunlu) dikeve başûrê rojhilatê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 15 û ji Amedê jî 115 km dûr e. Gund du tax e. Nifûsa gund 450 e. Du mezreyên wê hene. Li Girê Qûçî dibistana mezin heye, piştî pênc salan ji mezre û gundên nêzîk şagird diçin wir. Li Yukarıtaşmalı dibistana pêngava pêşî heye. Li

Institut kurde de Paris

başûrê bajarokê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund Mizgeft, telefon û elektrîk hene.

**Guris** (Gürüz) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 22 û ji Amedê jî 99 km dûr e. Nifûsa gund 1.660 e. Benav (Balbudak) mezreya wê ye. Hecî Bab li Gurisê ji dayik bûye. Wî li dergaha Seyîd Evdilhelîm hîlafeta şêxîtiyê girtiye. Di nav xelkê de wek şexsiyetekî rûhanî tê zanîn. Gora wî li gundê Çinanê ye. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Gozerek** (Gözerek) dikeve rojhilatê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 10 û ji Amedê jî 87 km dûr e. Tê wateya ciyê ku darên gûzan li wir hene. Nifûsa gund 60 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşî heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Haçmêrik** (Baykal) dikeve başûrê rojhilatê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 8 û ji Amedê jî 103 km dûr e. Nifûsa gund 350 e. Mêrgîsmail, Leglegî û Şerab mezrên wê hene. Bi zaravayê kurmancî û zimanê tirkî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşîn heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Hesno/Hasîno** (Bademlik) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Navê gund tê wateya hesin. Ji Çêrmûgê 7 û ji Amedê jî 100 km dûr e. Nifûsa gund 462 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Heta sala 1940 Derezeran gund bûye û ji wê salê şûn ve hinek kes ji wir hatine û gundê ku îro heye avakirine. Niha Derezeran mezre ye. Riya gund qûmkirî ye, dibistan, telefon û elektrîk li gund hene. Gund li kêlaka çem e û darên behîvan gelek in.

**Hesod** (Bahçeköy) dikeve rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 7 û ji Amedê jî 99 km dûr e. Nifûsa gund 1870 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Tê gotin ku gora Hz. Eyyup li vî gundî ye.[13] Çiyayê Bûkê, Şikeftên Reş û derbenda Hasko di nav tixûbên gund de ne. Li nav gund xerabayên dêreke heye. Li gund dibistana heşt polî heye û ji gundên derdorê jî şagird tên dibistanê. Li gund mizgeft, telefon û elektrîk hene. Rê qûmkirî ye.

[13] Mehdi İlhan, *Amid (Diyarbakır)*, s.116

Institut kurde de Paris

**Hesto** (Korudağ) dikeve rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 25 û ji Amedê jî 119 km dûr e. Navê xwe ji çiyayê Hesto girtiye. Bi texmînî dîroka gund digêje 400 salan. Nifûsa gund 500 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistana heşt polî heye û ji gundên derdorê jî şagird tên dibistanê. Mizgefta gund heye. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Hogecî** (Malköy) dikeve başûrê rojhilatê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 30 û ji Amedê jî 124 km dûr e. Nifûsa gund 890 e. Çar mezreyên wî hene: Elekviran, Kışlak, Babacan û Birinci Kışlak. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan û mizgeft, telefon û elektrîk hene. Rê qûmkirî ye.

**Kaf/Hoj** (Çukurelma) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Navê gund tê wateya bendavê. Heta beriya Fermana Ermeniyan Kurd û Ermendî li gel hev li gund jiyane. Ji Çêrmûgê 57 û ji Amedê jî 150 km dûr e. Nifûsa gund 187 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşî (pol 1,2,3,4 û 5) heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Kerwançimanî** (Günaşan) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 22 û ji Amedê jî 125 km dûr e. Li ser riya Çêrmûg û Siwêregê ye. Nifûsa gund 270 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Bi navê Benaf mezrayekê wê heye. Li gund dibistan û mizgeft hene, lê dibistana pêngava pêşî ye. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Kewan** (Keklikköy) dikeve rojhilatê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 10 û ji Amedê jî 86 km dûr e. Nifûsa gund 480 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kilan** (Artuk) dikeve rojhilatê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 7 û ji Amedê jî 88 km dûr e. Nifûsa gund 320 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşî heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Kiloya** (Kalaç) dikeve rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 30 û ji Amedê jî 123 km dûr e. Nifûsa gund 240 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris

**Kuştiyan** (Sarıbalta) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 32 û ji Amedê jî 125 km dûr e. Nifûsa gund 230 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan heye, hatiye girtin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Maxmûr** (Balıksırtı) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 13 û ji Amedê jî 106 km dûr e. Nifûsa gund 260 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Bi navê Xilhan (Karatarla) mezreyek wê heye. Li gund dibistana pêngava pêşî (pol 1,2,3,4 û 5) heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Mîyalan/Milan** (Yabanardı) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 28 û ji Amedê jî 121 km dûr e. Nifûsa gund 440 e. Mezreyek wê heye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan heye, hatiye girtin. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Mûrad** (Agaçhan) dikeve başurê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 26 û ji Amedê jî 119 km dûr e. Nifûsa gund 220 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, nexweşxane, telefon û elektrîk hene.

**Mûsayan** (Kartaltaşı) dikeve başûre rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 13 û ji Amedê jî 106 km dûr e. Nifûsa gund 102 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon, elektrîk û mizgeft hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Mûsikan** (Yaylacık) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 35 û ji Amedê jî 128 km dûr e. Nifûsa gund 348 e. Xiraba û Xozkere mezreyên wê ne. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Nişnîg /Nîşînîg** (Petekkaya) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 6 û ji Amedê jî 103 km dûr e. Nişvenig bi ermenî "Behîvan" e. Nifûsa gund 1099 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Delpek û Derezere mezreyên wê ne. Li gund dibistana heşt polî heye û ji gund û mezreyên derdorê jî şagird tên dibistanê. Mizgefteke mezin jî li gund heye. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Pahanî/Panok** (Ikiçeltik) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 15 û ji Amedê jî 108 km dûr e. Nifûsa gund 260 e. Du mezreyên wê hene. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon, elektrîk û mizgeft hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Poxsor** (Asmalık) dikeve rojhilatê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 20 û ji Amedê jî 83 km dûr e. Bi ermenî tê wateya çem. Nifûsa gund 150 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşîn heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Oxin** (Yoğun) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 17 û ji Amedê jî 110 km dûr e. Kela mezreya wê ye. Nifûsa gund 240 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye. Dibistan, telefon û elektrîk li gund hene.

**Qerecek** (Kuşlukçayırı) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 40 û ji Amedê jî 136 km dûr e. Nifûsa gund 369 e. Heft mezreyên wê hene: Engac (Adalar), Eyno (Eşikli), Harûn, Gugeran (Gönveren), Tûtikê Merwene (Gönova), Gözbaşı û Aliyan. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qelecûx** (Kalecik) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 17 û ji Amedê jî 100 km dûr e. Gundekî gelek kevn e. Li jorê gund kela Fîrewn heye û gund navê xwe ji vê qelê digre. Li jêrî qelê Tirba Baba heye û ev zîyatreteke bi navûdeng e. Bi taybetî jinên ku dixwazin ji wan re zarok çêbin tên ser zîyaretê. Nifûsa gund 160 e. Bi navê Paxnîk mezreyek wî heye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qerceweran** (Karacaviran) dikeve başûrê rojhilatê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 25 û ji Amedê jî 116 km dûr e. Nifûsa gund 270 e. Dalbudak mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye

Institut kurde de Paris

**Qerebiran** (Genceli) dikeve rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 6 û ji Amedê jî 100 km dûr e. Nifûsa gund 90 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan heye lê hatiye girtin. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Qeraqayê** (Karakaya) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 19 û ji Amedê jî 112 km dûr e. Bihar û havînan cihê mesîreyê ye. Keleyeke kevn û dîrokî li gund heye. Xan û pireke hene ku tê gotin di serdema Mûradê Çarem de hatine çêkirin. Nifûsa gund 320 e. Bi navê Gölbaşı mezreyek wî heye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan heye, hatiye girtin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Qeremûsa** (Karamusa) dikeve rojhilatê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 4 û ji Amedê jî 93 km dûr e. Nifûsa gund 240 e. Ji eşîra îzoliyan in û ji aliyê Rihayê hatine. Tê gotin ku Qere Mûsa ji mala begê Çêrmûgê re cot kiriye. Qazeneke tijî zêr dîtiye, biriye Helebê hûr kiriye. Hatiye û erdê Ermeniyan kiriye û ji xwe re li ser wê axê gund ava kiriye. Bi kurmancî û tirkî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Qarto** (Alakoç) dikeve rojhilatê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 12 û ji Amedê jî 85 km dûr e. Nifûsa gund 500 e. Akpar mezreya wê ye. Bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşî (pol 1,2,3,4 û 5) heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund ne asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene. Rezên gund gelek in, tirî û berhemên tirî difroşin.

**Qijan** (Yiğitler) dikeve rojhilatê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 9 û ji Amedê jî 102 km dûr e. Gêjo jî dibêjin. Nifûsa gund 750 e. Mala Gedûga (Gedikevler) û Bêdana Jêrîn mezreyên wê ne. Gora Hacî Baba li Çivanê ye. Hacî Baba ji gundê Beravê ye û ew ji aliyê gel ve wek şêx û ewliya tê hesibandin. Gund di sala 1871 de ji aliye jin û mêrekî Ermeni ve hatiye avakirin. Di Fermana Ermeniyan de (1915) gund hatiye vala kirin û Ermenî nemane. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene. Piraniya gundiyan li derveyî gund wek Riha, Çukuroava û herêma Behra Reş, li nav zevî û bexçeyên findiqan dixebitin û zivistanan vedigerin gund.

Institut kurde de Paris

**Qonaxî** (Konaklı) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 35 û ji Amedê jî 135 km dûr e. Nifûsa gund 103 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Receban** (Recep) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 28 û ji Amedê jî 121 km dûr e. Nifûsa gund 115 e. Bi zaravayên kurmancî û kirmanckî dipeyivin. Xezalan û Dewa Hesî mezreyên wê ne. Li gund dibistan heye, hatiye girtin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Rûtan** (Alabuğday) dikeve başûrê Çêrmûgê. Tê wateya rût û tazî. Ji Çêrmûgê 22 û ji Amedê jî 111 km dûr e. Nifûsa gund 650 e. Mala Elîf û Zoncek mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistana heşt polî heye û ji gundên derdorê jî şagird tên dibistana gund. Mizgeft, telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Taşmaliya Jêrîn** (Aşağıtaşmalı) dikeve başûrê rojhilatê Çêrmûgê, ji Çêrmûgê 24 û ji Amedê jî 130 km dûr e. Nifûsa gund 190 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşî heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Sayêrek** (Bayrak) dikeve başurê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 8 û ji Amedê jî 101 km dûr e. Nifûsa gund 230 e. Bi navê Eyûb mezreyek wî heye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşî heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Sarsap** (Dilekpınar) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 49 û ji Amedê jî 142 km dûr e. Nifûsa gund 700 e. Bi navê Komek mezreyek gund heye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistana heşt polî heye û ji gundên derdorê jî şagird tên dibistanê. Li gund mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Sînag** (Sinekköy) dikeve bakurê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 7 û ji Amedê jî 100 km dûr e. Nifûsa gund 440 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund

dibistan heye, hatiye girtin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Sînto** (Göktepe) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 12 û ji Amedê jî 105 km dûr e. Nifûsa gund 350 e. Giregûs (Fıstıklı) mezreya wê ye. Li vê mezreyê jî dibistana pêngava pêşî heye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan û mizgeft hene, lê dibistana pêngava pêşî ye. Telefon û elektrîk li gund hene û riya gund asfalt e.

**Şêxana Jêrîn** (Aşağışeyhler) dikeve bakurê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 8 û ji Amedê jî 101 km dûr e. Çemê Şêxanê di ber re derbas dibe. Berê gundê Ermeniyan bûye. Niha Kurd li gund bi cih bûne. Piştî çûyîna Ermeniyan sê bira hatine û hersê jî şêx bûne loma navê şêx li ser gund maye. Nifûsa gund 300 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşî heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund qûmkirî ye, mizgeft, telefon û elektrîk li gund hene.

**Şêxana Jorîn/Corîn** (Yukarışeyhler) ji Çêrmûgê 18 km û ji Amedê jî 110 kem dûr e. Nifûsa wê 2.836 e. Ji sala 1989an û vir ve li gund sîstema şaredariyê hatiye avakirin. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Mizgeft, dibistan û nexweşxane hene. Rê asfaltkirî ye. Av û kanalîzasyon hene.

**Şêxanê Dedî** (Şeyhandede) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 33 û ji Amedê jî 126 km dûr e. Nifûsa gund 400 e. Mezreyeke wê heye. Dîroka gund heta 1600 sal diyar e. Di sala 1638an de dema Mûradê Çarem çûye sefera xwe ya Bexdayê li vî gundî maye. Wê demê Padîşa li gund bûye mêvanê Babadede. Dedî avakarê gund bûye. Jê re hem Baba Dedî û hem jî Şêxanê Dedî gotine. Gund navê xwe ji vî zatî digre. Dewa Diyarî, Xiraba û Huseynîk mezreyên wê ne. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan heye, hatiye girtin. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Temikan** (Karataş) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 10 û ji Amedê jî 103 km dûr e. Nifûsa gund 300 e. Du mezreyên wê hene. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund zîyareta Hecî Baba heye. Navê wî yê rastî Hecî Mehemed e û gundê Beravê ye. Wî bi salan li dergeha Seyîd Evdulede xiz-

met kiriye û di dawî de jê îcaze girtiye. Piştre bi navûdeng bûye. Gora Hecî Baba li Temikan e. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Terbilê** (Kırmatepe) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 11 û ji Amedê jî 104 km dûr e. Nifûsa gund 280 e. Zoncek û Yengice. mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan ji pola yekê heta pêncan heye û şagirdên mezin bi mînîbûsan dibin ciyên din. Mizgeft heye. Keleyeke dîrokî li jora gund heye.

**Tilinder/Tulindêre** (Bintaş) dikeve rojhilatê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 10 û ji Amedê jî 83 km dûr e. Berê gundê Eremiyan bûye. Nifûsa gund 370 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşî heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund ne asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Tulik** (İncili) dikeve başûrê rojhilatê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 23 û ji Amedê jî 62 km dûr e. Tulik tê wateya kembera bi kevir. Nifûsa gund 370 e. Sê mezreyên wî hene: Tulikbekir (Dallıkaya), Tulikîmelik (Başdönmez) û Tulikhaşir (Bulutlu) Mezreyên wê hene. Bi zaravayê kurmancî û kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan û mizgeft hene. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Tulikê Qember** (Sarıca) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 35 û ji Amedê jî 128 km dûr e. Nifûsa gund 230 e. Mezreyeke wê heye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, hatiye girtin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Vilayêrek** (Güzel) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 45 û ji Amedê jî 139 km dûr e. Gundekî nû ye û di sala 1969an de hatiye avakirin. Nifûsa gund 230 e. Mezreyeke wê heye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Ji eşîreta Qelender in. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Xabûrman** (Karakolan) dikeve rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 6 û ji Amedê jî 99 km dûr e. Nifûsa gund 100 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan heye, hatiye girtin. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Xelîlan** (Konuksever) dikeve başûrê rojhilatê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 9 û ji Amedê jî 100 km dûr e. Nifûsa gund 435 e. Mezreyeke wê heye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Gund navê xwe ji Xelîl Îbrahîm girtiye, tê gotin ku wî 16 sal leşkerî kiriye. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Xeybîyan** (Bulundu) dikeve başûre Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 21 û ji Amedê jî 126 km dûr e. Gund di nav daristaneke gelek mezin û gur de ye. Ji ber vê yêkê navê Xeybîyan lê kirine. Piştre gotine Qeyipxan û paşê jî bi tirkî Bulundu gotine. Nifûsa gund 140 e. Mezreyeke wê heye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşî heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Xirbêlal/Hirbêtalî** (Çalıtepe) dikeve başûrê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 15 û ji Amedê jî 108 km dûr e. Nifûsa gund 196 e. Qûça Xudo û Qûça Xudoyî mezreyên wê ne. Bi zaravayên kurmancî û kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan û mizgeft hene, dibistana pêngava pêşî ye. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Zergûz** (Armutlu) dikeve başûrê rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 25 û ji Amedê jî 116 km dûr e. Navê gund ji gûzên zer tê. Nifûsa gund 150 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşî heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Zeyndelan/Zeynalan** (Kömürcüler) dikeve rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 30 û ji Amedê jî 129 km dûr e. Li qeraxê bendavê ye. Nifûsa gund 250 e. Bistan û Doğan mezreyên gund in. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.



Dimenek ji Çêrmûgê

**Zubeydik** (Akpınar) dikeve rojavayê Çêrmûgê. Ji Çêrmûgê 20 û ji Amedê jî 113 km dûr e. Bi qasî 400 sal berî niha ji Barmaza Elezîzê hatine û gund avakirine. Nifûsa gund 310 e. Çar mezreyên wê hene. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistana pêngava pêşî (pol 1,2,3,4 û 5) heye û şagirdên pêngava duyem diçin cihên navendî. Riya gund qûmkirî ye, li gund telefon û elektrîk hene.

Institut Kurde de Paris



Çarşiya Çinarê
Foto: Sabahat Çelik

# Çinar

Navê Çinarê yê kevn Xana Axparê ye. Xana Axparê dikeve başûrê Amedê. Bajaroka ku herî nêzîkî Amedê ye. Ji Amedê 32 km dûr e. Berfirehiya qada axa wê 1.952 $km^2$ ye. Ruerde wê deşt e. Bilindiya Çinarê ji deryayê 600 m. ye. Niha 92 gund, 47 mezra û 6 tax li ser Çinarê ne. Ji derî navendê li gundê Qubê (Alatosun) jî şaredarî heye. Li gor statîstîkên sala 2010an nifûsa navendê 11.627, ya gundan 55.877 û bi giştî 67.504 e. Çinar wek navenda bajarokê ne pir kevn e. Navê wê yê kevn Melkisî ye û gundekî biçûk bû. Piştre jê re Xana Axparê (bi tirki: Akpınar û Hanakpınar) gotine. Di navbera salên 1939-1950î yan de dewletê ji Bulgaristan û Qudûsê macîr anî li herêma Çinarê bi cih kir.

Bi taybetî Tirkmen li gundên Alataş, Kubeyşî, Büyükhöyük, Melaeliya Jêrîn, Halkpınar, Salyazı, Şenbeko, Kantepe, Kubacık, Beşpınar, Şukurlu, Yuvacikê bi cih kirin. Bi anîna van Tirkmenan re armanceke du alî hebû. Hem navê gund û cografiya Kurdan bikin tirkî û hem jî bi riya ev Tirkmenan Kurdan asîmîle bikin û bi lez û bez bikin Tirk. Lêbelê pêvajo berevajiyê polîtîka dewletê bû. Van Tirkmen û bîyaniyan bere bere bar kirin û ber bi

Dîmenek ji Çinarê →
Foto: Sabahat Çelik

Institut kurde de Paris

navenda Amed û metropolên Tirkiyê ve çûn. Niha li van gundan trikmen û macîr nemane.

Ji wir bi şûn ve Çinar mezin bû. Di sala 1937an de statûya bajarokê danê. Ne wek bajarok, lê wek herêm dîroka Çınar û Amedê hema hema yek e. Herî Zêde şopên Hûriyan li herêma Çinarê hene. Hem bi nav û hem bi nîşan hîn îro jî şopên Hûriya hene. Wek tê zserdema Hûriyan li vê herêma Amedê berê mîladê di navbera salên 1500-3000 hezaran de ne. Ji Hûriyan navê gundê Hûrê, Besta Hûriyan (Newala Hûriyan) mane. Ji serdema wan ve gelek xerabe û girik hene. Piştra Mîtanî ku Mîtanî û Hûrî heman xelk in wek du eşiren cuda ne û bavkalên Kurdan in. Li herêmê bûne xwedî dest-hilatdar. Ji herêma başurê Qerecdaxê re îro jî xelk dibêje Maha Mîtaniyan. Yani welatê Mîtaniyan. Piştre Asûrî hatine bajarê bi navûdeng Toşhan-Toşhana li herêmê avakirine. Piştre Med, Pers, Makedonya, Selevkosan herêmê dagîr kirina. Mîladê Roma herêm dike bin bandora xwe. 639 an artêşa Ereban herêmê didi ber êrîşan. Merwanî, Aqqoyûnî, Eyûbî, Selçûqî, Timûr û 1515an de dikeve bin bandora Osmaniyan û heta îro dom dike. Li herêma başûrê rojhilatê Çinarê wek tê zdeşta Kîkan heye. Tê texmîn kirin ku ev nav jî qiralê Asûriyan Kikia hatiye wergirtin.

Li herêma Çinarê Nawisên (şikeftên) Silêman Axa hene. Li nêzîkê Xanika Jêrîn jî li ber çemê Reş di nav zinaran de neh nawis hene. Tê gotin bi navê Silêman Axa kesekî li wir jiyaye loma vî navî li nawisan kirine.



Institut kurde de Paris

Herweha dîsa li heman ber çemê Reş bi navên Şikeftan gelek nawis hene. Qeleha Zerzewan, li ser riya Amed û Mêrdînê ye. Li serê çiyê, li ciyekî herî bilind hatiye çêkirin. Kela 70 metre bi dîwarê bilind hatiye avakirin. Niha bi tenê dîwarên wê yên xerabe mane.

Li herêma Çinarê gelek girên dîrokî hene. Girên herî bi navûdeng Girê Pornaxê, Qazûxan, Şixre, Dercel, Kela Gozelê, Tilereb û Axtepe ne.

### Ziyareta Pîr Îbrahîm

Ziyareta Pîr Îbrahîm bi qasî 6 km dikeve başûrê rojhilatê Çinarê. Li kêleka çemê Reş di zinareke bilind de şikefteke mezin e. Bi şiveriyeke biçûk û zehmet mirov hildikeşe jor. Gora Pîr Îbrahîm li nav vê şikeftê ye. Piranî ji bo êş û nexweşiyan diçin ser ziyaretê. Ji bo ku rê ne baş e, carinan bi zehmetî derdikevin şikeftê. Di nav şikeftê de axeke kalker heye. Wê axê şil dikin û dilê nexweş e didin. Bi taybetî cihên ku diêşin. Her sal di çarşema sêyam a meha tebaxê de xelk ji der û dorê tên ser zîyaretê. Diçin ziyaretê tewaf dikin û piştre li jêr ber çem geştê dikin. Dibe wek festîvalê.

Institut kurde de Paris






Institut kurde de Paris

Şaredariya Çinarê

## Şaredarî

1937-1952 Sermet Akkaynak (sê dewre)
1952-1968 Vahit Altınakar (sê dewre)
1968-1980 Mehmet Arzu (sê dewre)
1980-1984 Ümit Karahan û Kenan Örten (qeymeqam )
1984-1989 Sebahattin Ekinci
1989-2009 Vecdi Arzu (çar dewre)
2009-20011 Ahmet Cengiz

← Kela Gozelê
Foto: Ji arşiva Şaredariyê



Institut kurde de Paris



Kela Zêrzevan
Foto: Ji arşiva Şaredariyê

# Nivîskar û navdar

**Şêx Evdirrahmanê Axtepî**

Şêx Evdirrahmanê Axtepî di sala 1850an de li Axtepê ji dayik bûye. Ew kurê Şêx Hesenê Nûranî ye. Wî di zaroktiya xwe de li cem bavê xwe xwendiye. Piştre ku mezin bûye li gelek welat û bajaran gerîye û xwendiye. Piştî kûtakirina xwendina xwe vegeriye gundê xwe. Bi kurdî, farisî, tirki û erebî zanibûye. Li medreseya bavê xwe ders daye. Bi dersdayînê re dest bi nivîsîna pirtûkan kiriye. Navê Şemseddîn û Rûhî jî bi kar aniye. Bi kurdî du û bi erebî jî du pirtûkên wî hatine çap kirin. Pirtûka wî ya bi navê Rewdetuneîm ku bi kurdî nivîsiye di wêjeya kurdî de ciheke girîng digre. Helbest e û ji 4531 beytan pêk hatiye. Şêx Evdirrahmanê Axtepî di sala 1905an wefat kiriye. Li gund li cem bavê defin kirine. Her sal roja zîyareta gora wan di 20ê gulanê de ye. Ew roj dibe weke festîvaleke mezin.

**Şêx Mihemed Can**

Şêx Mihemed Can di sala 1858an li Axtepê ji dayik bûye. Birayê Şêx Evdirrehmanê Axtepî ye. Herweha wî jî wek birayê xwe Şêx Evdirrahman li cem bavê xwe li medresê xwendiye. Demek çûye

Institut kurde de Paris

Şamê li cem xelîfeyekî Mewlana Xalidê Kurdî û jê xelîfetiya naxşebendî girtiye. Piştre vegeriye gundê xwe û li medresa bavê xwe muderrisî kiriye. Gelek destnivîsarên wî hene. Lê berhema wî ya herî bi navûdeng Leyla û Mecnûn e. Şêx Mihemed Can di sala 1910an de wefat kiriye. Gora wî jî li cem bav û kekê wî ye.

**Şêx Hesîbê Axtepeyî**

Şêx Hesîbê Axtepeyî di sala 1885/6an de li Axtepê hatiye dine. Kurê şêx Mehmed Can û neviyê şêx Hesenê Nûranî ye. Meleyekî welatparêz bûye. Piştî şerê Şêx Seîd dewletê ew sirgûnê bajarê Uşakê kiriye. Şêx Hesîbê Nûranî bi kurdî sê pirtûk nivîsiye. Hesbî, Simbil û dîwaneke helbestan. Di sala 1971ê de cendirme Simbil û dîwanê birine û şewitandine. Nushayên wan di deste nemane. Ew di sala 1947an de li Axtepê çûye ser dilovaniya xwe.

**Receb Dildar**

Receb Dildar bi eslê xwe ji Karazê ye, lê ew di sala 1958an de gundê Bedûlê ku li ser bajaroka Çinarê ye hatiye dinê. Piştre bi malbatî çûne gundê Elîparê. Li wir dibistana seretayî û navîn xwendiye. Li Kirşehîre dibistan mamostetiyê qedandiye û di sala 1976an de li Amedê dest bi mamostetiyê kiriye. Bi mamostetiyê re bi aktîvî ketiye nav tevgera sîyasî. Di sala 1982an de hatiye girtin û heta sala 1987an li girtîgeha Amedê maye. Piştre dest bi pirtûkfiroşiyê kiriye. Niha malnişîn e. Di gelek kovar û malperên kurdî de nivîsên wî hatine weşandin. Heta niha *Kewê Canê* (helbest), *Dewran* (wergera romana Seyît Alp), *Şikefta xwekuştinê* (çîrok), sê pirtûkên wî hatine weşandin.

**Rêşad Sorgul**

Rêşad Sorgul di sala 1968an de, li Çinarê li gundê Qerqatkê ji dayik bû. Navê wî yê rastî Kutbettin Akgul e. Dibistana seretayî, navîn û amadeyî li Amedê xwendiye. Di sala 1991'ê de çûye paytexta Misrê Qahîrê. Salekê li zanînge ha Bêrûtê şaxê Iskenderiye beşa huqûqê xwendiye. Du salan jî li zanîngeha Ezherê beşa dîrokê xwendiye. Di Îlona sala 1994'a de diçe Almanyayê. Di serê sala 1997'a de li MED-TV'ê dest bi xebatê dike. Niha xebatkarê ROJ TV'ê ye. *Veger, Evdalkovî, Seydayê min û Niqutî Dilêmin* berhemên wî ne. Û gelek wergerên wî jî hene.



Li gundê Axtepê xelk di roja 20ê gulanê de diçe ziyareta gora şêx Hesenê Nûranî, şêx Evdirrahman û şêx Mihemed

Institut kurde de Paris

### Mehmet Yılmaz

Mehmet Yılmaz di sala 1963an de li gundê Golberanê ya Çinarê hatiye dinê. Li zanîngeha Dîclê Beşa fîzîkê xwendiye. Bi zimanê tirkî dinivîse. Heta niha 4 pirtûkên wî derketine. Törede donmuş düşler (helbest), *Silinmiyen Bellek* (öykü), *Çemberdeki Oyun* (roman) û *Doktor Dino.*

### Hayrettin Ekinci

Hayrettin Ekinci di sala 1961ê li Çinarê hatiye dinê. Di sala 1987an de ji doza PKK hatiye girtin. Di sala 1991 derketiye. Di sala 1994an carek din hatiye girtin. Cezayê muebetê girtiye û hîn jî di girtîgehê de ye. Li zîndanê dest bi helbestan kiriye. Gelek helbestên wî di rojmane û kovaran de hatine weşandin. Bi navê *Jin bûne nepenî* pirtûkek wî ya helbestan heye.

# Dengbêj

**Hesenê Omerî**

Hesenê Omerî (Hasan Durar), di sala 1337an (hîcrî) de li gundê Omera ji diya xwe bûye. Kalê wî ji navçeya Karazê çûye gundê Omera. Dibistan nexwendiye. Nêzî 20 salî li Omera maye. Ji gundê Omera diçe gundê Melemûsê ku li ser navçeya Bismilê ye. 12 salan li Melemûsê dimîne. Ji Melemûsê diçe Kerxa Kîka û 23 salan li Kerxa Kîka dimîne. Li wir titunê datîne, rêncberiyê dike. Ji Kerxê Mala xwe dibe Edeneyê. 15 sal in li Edeneyê ye.

**H. Evdoyê Çinarî**

H. Evdoyê Çinarî (Abdurrahman Tari) di sala 1957an de li gundê Gelî hatiye dinê. Dibistan nexwendiye. Bi eslê xwe ji Mêrdînê, ji eşira Surgiçyan, ji gundê Barmanê ye. 65- 70 sal berê hatine gundê Gelî. Heya 1993an li gund maye. Di sala 1993an de mala xwe biriye Amedê. Ji 1993an vir de 16 sal in kamyoncîtiyê dike. Stranên ku dibêje bi piranî ji Fadilê Kufragî hîn bûye.

**Taharê Arzûlî**

Taharê Arzûlî (Mehmet Tahir Özpınar) di sala 1935an de li gundê Hucetiyê hatiye dinê. Bi eslê xwe ji herêma deşta Heranê ye. Hîn ku ew çar-pênc salî bûye malbata wî koçî gundê Arzûliyê kiriye. Li Arzûliyê cotkarî, paletî, şivantî û cenantiyê kiriye. Ji 14-15 saliya xwe ve stranan dibêje. Stranên ku dibêje ji dengbêj Evdilhadî û dengbêjên din hîn bûye.

Institut kurde de Paris

# Gundên Çinarê

**Axtepe** (Aktepe) dikeve rojhilatê Çinarê. Ji Çinarê 19 û ji Amedê jî 50 km dûr e. Nifûsa gund 2010 e. Li gund turbeyên şêx Hesenê Nûranî, şêx Evdirrahman (lawê şêx Hesen e) û şêx Mihemed hene. Xelk her sal di 20ê meha gulanê de diçe ziyaretiya tirbên wan. Şêx Hesenê Nûranî li gundê Koxê ku niha li ser Batmanê ye hatiye dinê. Piştre barkirine Amedê. Şêx Evdirraman di sala 1850an de li Axtepe hatiye dinê. Li gund girekî bilind heye. Gund navê xwe ji wî girî digre. Di nav gir de bîrek heye. Minara gund xwediyê dîrokeke 800 salan e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Altuxêrê** (Altınakar) ji Çinarê 5 km û ji Amedê jî 27 km dûr e. Nifûsa gund 200 e. Mezreyeke wê heye. Li gund Qesir û gora Sêx Qasim hene. Li gund girekî dîrokî heye. Heta niha lêkolînên arkeolojîk nehatine kirin. Dewletê gir girtiye bin parastinê. Dibistan li gund heye lê ji bo ku nêzîkî bajarokê ye, şagird diçin dibistanên navenda Çinarê. Mizgeft, elektrîk, telefon li gund hene. Riya gund asfalt e.

Aywêrî (Ayveri) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 25 û ji Amedê jî 40 km dûr e. Nifûsa gund 246 e. Kurik mezreya wê ye. Xelkê Ayêverîn û Kurikê bi eslê xwe kirmanckî ne û ji qebîla Qalabiyan in. Li gund dibistan tune, lê şagird diçin li der dixwînin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

Baxcax (Bağacık) dikeve başûrê Çinarê. Ji Çinarê 12 û ji Amedê jî 44 km dûr e. Nifûsa gund 630 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

Balûcî (Uzunbahçe) dikeve bakurê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 22 û ji Amedê jî 25 km dûr e. Gund berê li ser Amedê bû, di van salên dawî de dan ser Çinarê. Gundî ji aliyê Wêranşehîrê ji eşîreta Qerekeçiyan hatine û gund avakirine. Nifûsa gund 463 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

Barê (Yaprakbaşı) dikeve başûrê rojhilatê Çinarê. Di navbera tixûbên Bismil û Mêrdînê de ye. Ji Amedê 51 û ji Çinarê jî 19 km dûr e. Nifûsa gund 500 e. Tê gotin ku di bin erdê herêma gund de xezîne (gencîne) hene û wek behrê ye. Barê gundekî gelek kevn e. Li herêma gund sarinc û nawis hene ku dîroka wan digehe berî zayînî. Li gund dibistan, mizgeft û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

Bedûlye (Taşhelvası) dikeve bakurê Çinarê. Ji Çinarê, 21 km û ji Amedê j 24 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 200î ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, elektrîk, mizgeft û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Baxterî** (Ekinveren) dikeve başûrê Çinarê. Ji Çinarê 4 û ji Amedê jî 36 km dûr e. Tê gotin ku ji aliyê Şemrexê hatine û gund avakirine. Nifûsa gund 125 e. Xirbezil (Ikizoluk) mezreya wê ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Berberêy** (Akçomak) dikeve başûrê Çinarê. Ji Çinarê 7 û ji Amedê jî 39 km dûr e. Nifûsa gund 280 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Beşpınar** dikeve bakurê Çinarê. Ji Çinarê 8 û ji Amedê jî 24 km dûr e. Nifûsa gund 750 e. Pornax (Murattaşı) mezreya wê ye. Li Pornaxê girekî dîrokî heye û jê re dibêjin girê Pornaxê. Zêde ne bilind e, lê qada gir gelek berfireh e. Definegeran car caran kolane û zerar dane girê Pornaxê. Niha wek berhemeke arkeolojîk di bin parastinê de ye. Dewletê di sala 1935an de, ji Bulgaristanê macîrên Tirk anîne li gund bi cihkirin, lê ew di demeke nêzîk de ji gund koçî metropolên Tirkiyê kirin. Ji ber vê yekê gundekî nû ye û navê gund jî bi tirkî ye. Di şûna wan de Kurd li gund bi cihbûne. Li gund dibistan heye. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Bekiya Şen** (Buyuransu) dikeve bakurê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 30 û ji Amedê jî 20 km dûr e. Gund berê li ser Amedê bû, lê di van salên dawî de dane ser Çinarê. Nifûsa gund 470 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Bekiya Xerabe** (Boğazören) dikeve bakurê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 40 û ji Amedê jî 20 km dûr e. Şeqşeq mezreya gund e û dibistan li Şeqşeqê ye. Nifûsa gund 270 e. Li gund dibistan heye lê nayê bikaranîn. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Bimbarekî** (Halkapınar) dikeve bakurê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 35 û ji Amedê jî 20 km dûr e. Gund berê li ser Amedê bû, lê di van salên dawî de dane ser Çinarê. Niha nifûsa gund 500 e. Mezreyeke wê heye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.



Bendava Göksuyê

**Binama** (Çataltarla) dikeve rojhilatê Çinarê. Ji Çinarê 30 û ji Amedê jî 60 km dûr e. Nifûsa gund 125 e. Navê gund di rastiya xwe de ne Binama ye, Binava ye. Yanî binî av e. Lêbelê gundiyan di demeke dûr û dirêj de li gor xwe guhertine û îro nav weha maye. Li gund dibistan tune lê şagird diçin dibistanên nêzîk. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Birabazin** (Avdalı) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 28 û ji Amedê jî 58 km dûr e. Nifûsa gund 431 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Bîra Mehmed Axa** (Pirahmetağa) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 110 û ji Amedê jî 100 km dûr e. Gundî bi eslê xwe Dimilî ne. Di zemanê xwe de ji der ve hatine û li gund bi cih bûne. Ji eşîra Şehînan in. Nifûsa gund 345 e. Li gund dibistan heye, nayê bikaranîn. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Botika** (Ağaçsever) dikeve başûrê rojavayê Çinarê ye. Ji Çinarê 17 û ji Amedê jî 49 km dûr e. Nifûsa gund 400 e. Dîroka gund heta 1500 diçe. Tê gotin ku ji sala 1700 vir ve eşîreta Botî hatine û ji nû ve gund avakirine. Mirmilan (Kırkağaç) mezreya wê ye. Dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Celîka** (Sürendal) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê, 40 km û ji Amedê j 49 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 455î ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, elektrîk, mizgeft û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Coferkê** (Kuruyazı) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 7 û ji Amedê jî 30 km dûr e. Nifûsa gund 220 e. Kancuxaz (Yöndemli) mezreya wê ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Cobîn** (Karaçevre) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 60 û ji Amedê jî 40 km dûr e. Gundî bi eslê xwe kirmanckî ne û ji qebîla Qalabiyan in. Nifûsa gund 1010 e. Li gund dibistan û mizgeft hene. Şagirdên gundên nêzîk diçin li Cobînê dixwînin. Dibistan, telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund asfalt e.

**Çepenya** (Leblebîtaş) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 70 km û ji Amedê j 60 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 800î ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, elektrîk, mizgeft û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Çinar** (Çınarköy) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 34 û ji Amedê jî 44 km dûr e. Nifûsa gund 260 e. Bi navê Kufurû (Danışır) mezreyek wê heye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Darbî** (Alatosun) ji Çinarê 70 û ji Amedê jî 32 km dûr e. Li qûntara Qerecdaxê ye. Li ser riya Siwêregê 10 km li aliye başûr e. Li gor hejmartina giştî ya sala 2007an nifûsa Darbî 4.500 e. Gund ji 14 mezreyan pêk tê:1. Pilî (Kutlu), 2. Terxana (Tarhana), 3. Tezxerab(Tezharabe), 4. Bîrîkan (Birkan), 5. Gelt (Dağsuyu), 6. Alçîmen (Alacaçimen), 7. Ziyaret, 8. Bîrgenî (Laçîn), 9. Derbê (Darbî), 10. Kalê (Kale), 11. Tax (Pamukpınar), 12. Keleloşk, 13. Kelek 14. Kindersî (Gönderesi). Di 7ê tebaxa sala 1992an

Institut kurde de Paris

de şaredarî hatiye damezrandin. Di nav tixûbên gund de li sere çiyê xerabe heye; jê re dibêjin cihê Kufarî. Li gund dibistan, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Nexweşxaneya gund di sala 1994an de ji aliyê UNESCO ve hatiye çêkirin. Şaredariyê di sala 2002an de av kişandiye malan. Dibistan gund di sala 1962 de hatiye avakirin. Riya gund asfalt e.

**Darê** (Görece)ikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 36 û ji Amedê jî 43 km dûr e. Nifûsa gund 209 e. Şagird bi mînîbûsan diçin dibistana gundê nêzîk. Riya gund qûmkiri ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Dawudî** (Gürses) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 6 û ji Amedê jî 38 km dûr e. Gund hatiye valakirin. Kurdên êzîdî koçberê Almanyayê û yên misilman jî Çinar, Amed û koçberê derdorên din kirine. Kurdên êzîdî û misilman li gel hev dijîn. Li gund dibistan tune. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Dêlgur** (Çakırkaya) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 30 û ji Amedê jî 35 km dûr e. Nifûsa gund 460 e. Misrik (Cakırtutmaz) û Keysanî mezreyên wê ne. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Dirêjik** (Uzgider) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê, 10 km û ji Amedê j 25 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 300î ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, elektrîk, mizgeft û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Elvendî** (Ortaşar) dikeve bakurê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 35 û ji Amedê jî 25 km dûr e. Nifûsa gund 638 e. Seydek (Ortataş), Şeytanok û Girzebeş mezreyên wê ne. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin û şagirdan bi mînîbusan dibin gundê nêzîk. Riya gund asfalt e, telefon, mizgeft û elektrîk li gund hene.

**Erdê Fatê** (Arafat) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 40 û ji Amedê jî 40 km dûr e. Nifûsa gund 120 e. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

Institut kurde de Paris

**Gelıyê Bûka** (Karasungur) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 50 û ji Amedê jî 55 km dûr e. Nifûsa gund 1380 e. Pîrehmed Axa, Delavgur (Çatmadal), Geliyê Bûka (Nahirtmaç) û girê Reza mezreyên wê ne. Gund bi hemû mezreyên xwe ve, bi eslê xwe dimilî ne. Di zemanê xwe de ji der ve hatine û li herêmê bi cih bûne. Gund navê xwe ji navê eşîra Şehînan girtiye. Ji eşîra Şehînan in. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Gêlî** (Karababa) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 30 û ji Amedê jî 30 km dûr e. Gund di salên 1920an de hatiye avakirin. Li gund zîyareta Babê Reş heye. Gundî û derdor bawer dikin ku ji bo tiştî şîfa ye. Hatin û çûndin gelek e. Nifûsa gund 400 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Gogtepe** (Göktepe) dikeve başûrê Çinarê. Ji Çinarê 5 û ji Amedê jî 35 km dûr e. Nifûsa gund 1000 e. Merpolat mezreya wê ye. Li gund dibistan heye, lê nayê bi karû şagird diçin navenda Çinarê. Li gund telefon mizgeft û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Gulberan** (Bilmece) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 35 û ji Amedê jî 37 km dûr e. Nifûsa gund 137 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Gundik** (Dikmencik) dikeve bakurê Çinarê. Ji Çinarê 30 û ji Amedê jî 62 km dûr e. Nifûsa gund 110 e. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Guxan** (Alancık) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 38 û ji Amedê jî 60 km dûr e. Nifûsa gund 350 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Herberê** (Yazçiçeği) dikeve başûrê Çinarê. Ji Çinarê, 15 km û ji Amedê j 57km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 270î ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, elektrîk, mizgeft û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Hemranî** (Toraman) dikeve bakurê Çinarê û 16 km ji Çinarê û 16 km jî ji Amedê dûr e. Nifûsa gund 370 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Herbelî** (Kuyuluhöyük) dikeve bakurê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 16 û ji Amedê jî 17 km dûr e. Gund berê li ser Amedê bû, lê di van salên dawî de dan ser Çinarê. Nifûsa gund 300 e. Li gund dibistan tune lê şagirdan bi mînîbusan dibin dibistana nêzîk. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Herikê** (Yıllarca) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 50 û ji Amedê jî 30 km dûr e. Nifûsa gund 283 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Herzem** (Filizören) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 19 û ji Amedê jî 46 km dûr e. Nifûsa gund 255 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Hucetî** (Başaklı) dikeve bakurê Çinarê. Ji Çinarê 20 û ji Amedê jî 35 km dûr e. Nifûsa gund 1020 e. Mezreyeke wê heye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Hûrik/Hûrhûrik** (Sırımkesen) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 45 û ji Amedê jî 35 km dûr e. Nifûsa gund 300 e. Gundekî dîrokî ye û navê gund ji serdema Hûriyan ve heta niha maye. Li nezîkê gund gelek ciyen dîrokî hene ku ji wê serdemê ve mane. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Husukan** (Çömçeli) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 50 û ji Amedê jî 60 km dûr e. Nifûsa gund 250 e. Hîcan, Brûsk û Belek mezreyên wê ne. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Îxliya** (Alabaş) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 40 û ji Amedê jî 26 km dûr e. Nifûsa gund 850 e. Gund berê li ser Amedê bû, lê di van salên dawî de dane ser Çinarê. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

Institut Kurde de Paris

**Kanîpanhkê** (Yarımkaş) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 30 û ji Amedê jî 40 km dûr e. Gundî bi eslê xwe kirmanckî ne. Di zemanê xwe de ji der ve hatine û li gund bi cih bûne. Ji eşîra Şehînan in. Nifûsa gund 270 e. Li gund dibistan heye lê girtiye. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Kanîspî** (Kürekli) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 16 û ji Amedê jî 40 km dûr e. Nifûsa gund 216 e. Li gund dibistan û mizgeft hene. . Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene. Gund navê xwe ji kaniya gund girtiye û li herêma gund çend nawis û girikşn dîrokî hene.

**Keldiz** (Beneklitaş) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 65 û ji Amedê jî 25 km dûr e. Nifûsa gund 360 e. Li gund dibistan tune, lê şagird diçin dibistanên nezîk. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Kela Zêrzewan** (Demirölçek) dikeve başûrê Çinarê. Ji Çinarê 16 û ji Amedê jî 50 km dûr e. Nifûsa gund 370 e. Li gund dibistana pêngava yekem û mizgeft hene. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene. Gundê Ermeniyan bûye. Bi qasî kmyeke nêzîkî gund Keleya Zêrzewan e. Di dema xwe de ev kele ji bo parastina riya Hevrîşim hatiye çêkirin. Ev kele li cihê herê bilind hatiye avakirin. Dîwarên kele gelek bilind bûne. Heta dibêjin bilindiya wan digehêştin 65-70 metreyî. Ji bo pêwîstiya avê ji kelê heta çemê jêrin di bin erdê de tunel hebûne. Kele niha xerabe ye. Pêşî gund li cihê kelê bûye, di sala 1870an de gund li jêr avakirine. Tê gotin ku kele girtîgeh bûye. Li gund rejiya xwendinê bilind e. Di van salên dawî de ji derî heywan xwedîkirin û çandiniyê çend kargehên biçûk jî li gund hatine avakirin. Di sala 2007an de ji çemê Reş av anîne gund.

**Kela Mîr Xidir** (Kabahıdır) dikeve bakurê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 60 km û ji Amedê j 20 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 250î ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, elektrîk, mizgeft û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kerelî** (Karalar) dikeve bakurê Çinarê. Ji Çinarê 15 û ji Amedê jî 43 km dûr e. Nifûsa gund 1136 e. Sergeliyan (Basalan) mezreya wê ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kerêcînî** (Gümüştaş) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 70 û ji Amedê jî 68 km dûr e. Nifûsa gund 600 e. Darbeşîn (Yeşil) mezreya wê ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kerik** (Kılıçkaya) dikeve bakurê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 45 û ji Amedê jî 33 km dûr e. Nifûsa gund 200 e. Alawuz û Veynebirik (Yoğunoluk) û mezreyên wê ne. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Korîyê** (Bayırkonağı) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 48 û ji Amedê jî 50 km dûr e. Nifûsa gund 273 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kubeyşî** (Çeltikaltı) dikeve bakurê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 30 û ji Amedê jî 22 km dûr e. Niha nifûsa gund 210 e. Bîra Reş, Harik û Kelik mezreyên wê ne. Hersê mezre bi eslê xwe kirmanckî ne. Di zemanê xwe de ji der ve hatine û li gund bi cih bûne. Ji eşîra Şehînan in. Li gund dibistan tune lê şagird diçin gundên nêzîk. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Kuştiyan** (Soğansuyu) dikeve bakurê rojavayê Çinarê û ji Çinarê 44 km dûr e. Berê mezreya Kerikê bû. Nifûsa wê 150 heye. Elektrîk, telefon li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kufriye** (Inanöz) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 50 km û ji Amedê j 40 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 300î ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, elektrîk, mizgeft û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kuştiya** (Soğansuyu) dikeve bakurê rojavayê Çinarê û 38 km ji Çinarê û 27 km jî ji Amedê dûr e. Nifûsa gund 160 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Lûgus** (Ballıbaba) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Gundekî kevn e û li gor gotinan ji serdema Mîtaniyan ve heye. Piraniya gundiyan ji eşîreta Metînan in. Ji Çinarê 40 û ji Amedê jî 50 km dûr e. A. Ortaviran, Birik (Muratcik) û Mûrad mezreyên wê ne. Ava Çınarê ya vexwarin û karanînê ji çem û gola

gundê Lûgusê tê. Nifûsa gund 420 e. Hem li Lûgus û hem li mezreya Birikê dibistan heye. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Melaeliya Jêrîn** (Aşağımollaali) dikeve bakurê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 30 û ji Amedê jî 20 km dûr e. Gund berê li ser Amedê bû, lê di van salên dawî de dane ser Çinarê. Niha nifûsa gund 260 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Melaeliya Jorîn** (Yukarımollaali) dikeve bakurê rojavayê Çinarê. Herdu Meleeli cîranê hev in. Di navbera wan de çend kîlo metre heye. Nifûsa wê 140 heye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund mizgeft, dibistan, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Melkis** (Höyükdibi) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 40 û ji Amedê jî 27 km dûr e. Nifûsa gund 200 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Meştik** (Selyazı) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 22 û ji Amedê jî 37 km dûr e. Nifûsa gund 230 e. Gund heta çend sal berê li ser Amedê bû, lê niha li ser Çinarê ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Mezrik** (Pınaroglu) dikeve bakurê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê, 37 km û ji Amedê j 25 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 150î ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, elektrîk, mizgeft û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Nedirlû** (Taşhelvası) dikeve bakurê Çinarê. Ji navenda Çinarê 21 û ji Amedê jî 24 km dûr e. Ne gundekî kevn e. Di sala 1965an de ji aliyê Mêrdinê eşîreta Bezare hatine û gund avakirine. Nifûsa gund 210 e. Li gund dibistan tune. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Nîvî** (Solmaz) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 13 û ji Amedê jî 45 km dûr e. Nifûsa gund 205 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

Gurêxekî şivanan li qeracê Çinarê →

**Omeran** (Belenli) dikeve rojhilatê Çinarê. Ji Çinarê 11 û ji Amedê jî 43 km dûr e. Nifûsa gund 212 e. Suweylî (Acıkuyu) û Aktar (Çaybaşı) mezreyên wê ne. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Ortewêran** (Yukarıortaören) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 35 û ji Amedê jî 43 km dûr e. Nifûsa gund 130 e. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qalacûx** (Dişlibaşak) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 60 û ji Amedê jî 45 km dûr e. Nifûsa gund 358 e. Li gund dibistan tune. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

Institut kurde de Paris



**Qazûxan/Qazûxtepe** (Kazıktepe) dikeve bakurê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 21 û ji Amedê jî 27 km dûr e. Nifûsa gund 270 e. Girekî dîrokî li gund heye. Dimîne pîramîdê. Gir ji aliyê Mudûriyeta Parastina Hebûnên Xweza û Çandê ve wek berhemeke arkeolojîk tê parastin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qerhêta** (Düzova) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 27 û ji Amedê jî 59 km dûr e. Nifûsa gund 430 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qitîn** (Kutluk) dikeve rojhilatê Çinarê. Ji Çinarê 16 û ji Amedê jî 45 km dûr e. Nifûsa gund 100 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qûbacik** (Kubacık) dikeve bakurê Çinarê. Ji Çinarê 13 û ji Amedê jî 21 km dûr e. Nifûsa gund 200 e. Mezreyeke wê heye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qubik** (Bulutçeker) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 45 û ji Amedê jî 36 km dûr e. Nifûsa gund 300 e. Bi navê Şaqşeq mezreyek wê heye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qûlya** (Ovabağ) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 45 û ji Amedê jî 37 km dûr e. Pêşî mezreya Hamsê bû û piştre bi serê xwe statûya gund girt. Nifûsa gund 550 e. Çakirca (Carıkça), Hams (Yeşilbağ) û Gurgur mezreyên wê ne. Hem li Kilvan û hem li mezreya Hamsê dibistan heye. Riya gund qûmkirî ye. Mizgeft, telefon û elektrîk li gund hene.

**Rûber** (Çukurbaşı) dikeve başûrê rojhilatê Çinarê. Ji Çinarê 12 û ji Amedê jî 42 km dûr e. Nifûsa gund 170 e. Mezreyeke wê heye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Selman** (Bozçalı) dikeve bakurê Çinarê. Ji Çinarê 10 û ji Amedê jî 25 km dûr e. Nifûsa gund 187 e. Selman mezreya wê ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris

**Sergelya** (Başalan) dikeve bakurê Çinarê û 38 km ji Çinarê dûr e. Nifûsa gund 350 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Sîpyak** (Karabudak) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 21 û ji Amedê jî 40 km dûr e. Nifûsa gund 300 e. Pembewêran mezreya wê ye. Hem li Sîpyak û hem li mezreya Pembewêranê dibistan heye. Riya gund qûmkirî ye, mizgaft, telefon û elektrîk li gund hene.

**Şakirwêr** (Şekerören) dikeve rojhilatê Çinarê. Ji Çinarê 6 û ji Amedê jî 38 km dûr e. Nifûsa gund 150 ye. Dodan, Aborîş û Xanikan mezreyên wê ne. Avakarê gund Hecî Şerîf e. Hecî Şerîf di zemanê şerê Rûs de ji aliyê Erzeromê hatiye û gund ava kiriye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene.

**Şêxçopar** (Şeyhçopan) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê, 21 km û ji Amedê j 28 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 250î ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, elektrîk, mizgeft û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Şorşûp** (Meydanköy) dikeve başûrê rojhilatê Çinarê. Ji Çinarê 30 û ji Amedê jî 62 km dûr e. Nifûsa gund 320 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Şükürlü** dikeve bakurê rojhilatê Çinarê. Li ser riya Amed û Bismilê ye. Ji Çinarê 13 û ji Amedê jî 20 km dûr e. Nifûsa gund 500 e. Bacvan (Kınalıtarla) mezreya wê ye. Di dema Osmaniyan de Tirkmenên elevî li gund hatine bi cih kirin. Piştî sala 1989an Tirkmenên alewî hêdî hedî ji gund ber bi metropolên Tirkiyê ve bar kirin û Kurd li gund bi cih bûn. Niha çend mal elewî mane û yên din Kurd in. Li gund bi navê Kuyudamî zîyareteke Turkmenên alewî hene. Hem li Şükürlü û hem li mezreya Bacevanê dibistan heye. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Tilaraf** (Incirtepe) dikeve başûrê rojhilatê Çinarê. Dikeve deşta Kîkan. Ji Çinarê 13 û ji Amedê jî 44 km dûr e. Nifûsa gund 220 e. Berkevir mezreya wê ye. Li gund dibistan tune, lê şagirdan bi wesayîtan dibin dibistana nêzîk. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

Institut kurde de Paris

**Tilwêr** (Tilver )ikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 23 û ji Amedê jî 33 km dûr e. Nifûsa gund 350 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Tobinî** (Köksalan) Berê mezreya Botika bûye lê niha statûya gund girtîye. Nifûsa gund 300 e. Ji Çinarê 18 km dûr e. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û av hene.

**Xanika Jêrîn** (Aşağıkonak) dikeve başûrê Çinarê û nêzîkî tixûbê Mêrdînê ye. Ji Çinarê 13 û ji Amedê jî 45 km dûr e. Nifûsa gund 1500 e. Li gund dibistan, nexweşxane û mizgeft hene. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene. Gundekî dîrokî ye. Li gor lêkolînan dîroka gund digîhe 3000 sal berî niha. Şikeftên Textê Silêman Axa, Şikeftan û Pîrozgeha Pîr Evdal in. Gundê niha tê gotin ku du malbatên bi navên Şengî û Tema hatine û gund avakirine. Di salên 1935 an macîrên Bulgaristanên anîne bi cih kirine, piştre ew ji gund koçî navenda Çinarê kirine. Gundê herî mezin yê Çinarê ye. Koçberî her berdewam e. Bi qasî nifûsa gund gundiyan barkirine navenda Amedê. Li gund 5 dukan û 5 qehwexane hene. Berê zevî bejî bûn, lê di van salên dawî de bi kolana bîrên artîziyen û bendava Goksuyê zeviyên bûne avî û çandinî zêde bûye.

**Xarewera** (Halıören) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 50 û ji Amedê jî 60 km dûr e. Tê gotin ku di salên 1400an de heft bira ji aliyê

**Çewlikê** (Bingölê) hatine û li vir bi cih bûne. Ji wan birayan yek navê wî Xalid bûye. Loma navê gund Xalid Wêran lê kirine û piştre nav hatiye guhertin û bûye Xarewera. Nifûsa gund 150 e. Sê mezreyên wê hene.Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Xatûnî** (Özyar) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê, 40 km û ji Amedê j 30 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 250î ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, elektrîk, mizgeft û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Xasê** (Hasköy) dikeve rojhilatê Çinarê. Ji Çinarê 18 û ji Amedê jî 50 km dûr e. 150 sal berî niha gund ji aliyê Bedirxan Axa ve hatiye avakirin. Hîn îro jî

gundî ji vê malbatê ne û li gund kesên xerîb tunene. Nifûsa gund 200 e. Li gund dibistan tune lê şagird bi mînîbusan diçin gundên cîran. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Xeçîta** (Sevindik) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê, 50 km û ji Amedê j 40 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 500î ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, elektrîk, mizgeft û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Xerabê** (Harabe) dikeve başûrê rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 50 û ji Amedê jî 60 km dûr e. Çayir mezreya wê ye. Gundî bi eslê xwe dimilî ne. Di zemanê xwe de ji der ve hatine û li gund bi cih bûne. Ji eşîra Şehînan in. Nifûsa gund 210 e. Dibistan, telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris



**Xirbetisîl** (Bellitaş) dikeve rojavayê Çinarê. Ji Çinarê 35 û ji Amedê jî 30 km dûr e. Nifûsa gund 300 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Xitmêran** (Öncülü) dikeve rojhilatê Çinarê. Ji Çinarê 15 û ji Amedê jî 47 km dûr e. Nifûsa gund 175 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Yuvacik** dikeve bakurê rojhilatê Çinarê. Li ser riya Amed û Batmanê ye. Nêzîkî çemê Dîclê ye. Ji Çinarê 20 km û ji Amedê jî 28 km dûr e. Gundê maciran e. Bi navê Tekkaynak mezreyeke wê heye. Li mezreyê gireki dîrokî heye. Jê re dibêjin girê Şixrê. Di derbareyê gir de zêde zû agahdarî tune. Axa gund ji bo çandiniyê hêja ye. Berê genim, ceh nîsk û kizin diçinî. Niha dikin pembo û gilgilê misirê. Mêwe, sebze gelek in. Zebeşên Amedên bi navûdeng li vî gundî jî tên çandin. Ji sala 1952an ve dibistan li gund heye. Niha dibistanên nû, nexweşxane, kanalzasyon û şebekeya avê, mizgeft, elektrîk, telefon li gund hene. Gund li ser riya asfalta Amed û Batmanê ye.

**Ziyaret** ji Çinarê 70 û ji Amedê jî 43 km dûr e. Nifûsa gund 2680 e. Ji bo pêngava peşî dibistan heye û şagirdên pêngava duyenm bi wesîteyan diçin dibistana nîzîk. Li gund sîstema av û kanalîsazyon, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris



Dimenek ji Çingûşê
Foto: Karazi

# Çingûş

Çingûş bajaroka Amedê ye û dikeve bakurê rojavayê Amede. Ji Amedê 117 km dûr e. Bi giştî herêmeke çiyayî û asê ye. Cihê Çingûşê ji sewiya deryayê 1049 metre bilind û firehiya axa wê jî 489 km² ye. Li gor statîstên sala 2010an nifûsa navendê 2.495, ya gundan10.967 û bi giştî nifûsa Çingûşê 13.462 e. Sê tax, 37 gund û 32 mezreyên Çingûşê hene.

Navê Çingûşê yê kevn Çimkuş e.[14] Bi zaravayê kirmanckî "çim" çav e û "gûş" jî şil e. Herdu peyv dibin yek û Çingûş tê wateya çavşil. Di pêvajoya dîrokê de jê re Çangûş û Şankûş jî gotine. Lê rastiyek heye ku di dema Osmaniyan de bajarok ji aliyê Kapıkıran Mehmet Paşa ve hatiye tirkkirin û bi çîrok û çîvakon xemilandine. Yek ji wan çîrokan jî weha ye. Di sala 1601an de Kapıkıran Mehmet Paşa sê taxên bi navê Kale, Pelker û Komcaxaç anîne cem hev û navê Çingûşê lê kiriye. Navê Çingûşê ji du gotinan pêk hatiye: Çin û gûş. Tê wateya nelihev, beredayî. Heta dema Kapıkıran Mehmet Paşa

[14] Şevket Beysanoglu, *Diyarbakır Tarihi cilt-1*, s. 29, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür ve Sanat Yayınları-1997

xelkê navenda Çingûşê piranî Ermenî û yên din Kurd bûne. Ji vê tarîxê bi şûn ve dewletê çend malbatên Tirkmenan ji Qafkasya anîne li navenda Çingûşê bi cihkirine. Di salên 1890 heta 1915 dewletê Ermeniyên Çingûşê koçberê Lubnanê kirine û hinek Tirkmenên din jî li navçê bi cih kirine. Xelkê navênda Çingûşê hemû ne Tirkmen in. Malbatên Kurd di nav wextê de asîmîle bûne. Hinek kes dinvîsin ku navenda Çingûşê hemû Tirk an Tirkmen in ev ne rast e.

Çingûş demekê wek nehiye dane ser Siwêregê û demeke jî dane ser Madenê. Di sala 1934an de bûye nehiya Çêrmûgê û di sala 1953an de jî statûya wê guhertine û kirine bajaroka Amedê.

Bi tenê di nav çiyan de Zozan û çêrgehên Mirgan û Awutê ji xwedîkirina heywanan re baş e. Çemê Çingûşê di nav çiyan de jiyaneke dide herêm û diçe ser çemê Feradê.

Li navenda Çingûşe Tek Qale, xerabeyên du dêran, manastirek û pireyeke dîrokî hene. Pire li Navenda Çingûşê ye. Li ser zinarekî bilind e ku bi qasî 150 metreyî bilind e. Di dema xwe de pire bi qeleyê ve girêdayî bûye.

Beriya ku mirov bikeve nav bajarokê li aliyê rastê avahiyeke dîrokî ya bilind heye ku xerabe bûye. Ev dêr û manstira Ermeniyan a Ortodoksî ye û di sedsala 15an de hatine çêkirin.

Mizgefta Mehmed Elî Begê di sala 1688an de ji aliyê Eli Begê ve hatiye avakirin û minareya wê jî di sala 1757an de ji aliyê lawê wî Elî Paşa ve hatiye çêkirin.[15]

Mizgefta mezin (Camî Kebir) pêşî dêr bûye û piştre veguhestine mizgeftê. Tê gotin ku di dema Artûkiyan de hatiye restorekirin. Kevirê avahiya mizgeftê kevirên spî û birî ne. Avdestxaneya mizgeftê di hundir de ye. Minareya wê bi awayekî hunerî hatiye çêkirin. Tirbeya Hasan Dede pîrozgeh e.

Pireya Çingûşê pireyeke dîrokî ye û xwerû ji kevir hatiye çêkiriye. Di sala 1603an de ji aliyê Kapıkıran Mehmed Elî Paşa ve hatiye çêkirin. 17 metre dirêj û 5 metre jî fireh e. Pire vê herêmê bi riya hevrîşim ve girê dide.

Hemama Çingûşê jî bala mirovan dikşîne.

Niha li navenda Çingûşê amadeyiyek û pênc dibistanên seretayi hene.

[15] Hinek çavkani dinivisin Elî Paşa ku di sala 1095an çêkiriye. Hinek dinivîsin ku minareya wê ji aliyê Kapıkıran Mehmet Paşa ve hatiye çêkirin. Ez bawer dikim ya herî rast ya ku me li jor nivîsiye. Ji ber ku tarîxa bav û lawê hevdu digrin.



Dimenek ji Çingûşê

Institut kurde de Paris

## Şaredarî

1952-1954 Eşref Güldoğan
1954-1956 Zülküf Akmeşe
1956-1958 Asım Doğan
1958-1960 İsmet Akmeşe
1960-1963 Ömer Ihsan Paköz (qeymeqam)
1965-1968 Rakıp Sırrı Özer
1968-1978 İsmet Akmeşe (du dewre)
1978-1980 Latif Ekrem Özer
1980-1984 Halil Yılmaz (qeymeqam) û Mustafa Lalelidag (esker)
19841994 Mehmet Yıldızhan (du dewre)
1994-2004 Ali Suat Akmeşe
2004-2011 Mehmet Geçitli



Pireya Çingûşê
Foto: Melike Dara Günal

# Dengbêj

**İzzet Altınmeşe**

İzzet Altınmeşe di sala 1945an de li gundê Cewderê (Arpaderê) hatiye dinê. Di biçûkiya wî de malbata wan bar kirine Edenê. Wî di biçûkiya xwe de dest bi stranan kiriye. Di 18 saliya xwe li Navenda Perwerdeya Gel dersên muzîkê girtiye. Sêlika xwe cara yekem 1965an de derxistiye. Piştî salên 1970î li radyoya Ankarayê dest bi kar kiriye. Gelek stranê kurdî tomar kiriye û adepteyê tirkî kiriye. Di warê asîmîlasyonê de roleke negatîv lîstiye. Heta niha 25 albûm weşandiye. Di heft fîlmên sînemayê de jî rol girtiye.

# Gundên Çingûşê

**Adiş** (Değirmensuyu) dikeve rojavayê Çingûşê. Ji Çingûşê 4 û ji Amedê jî 125 km dûr e. Heta sala 1800 gundê Ermeniyan bûye. Di komkujiya Ermeniyan de Ermeniyên ku mane jî koç kirine û çûne. Niha Kurd li gund hene. Her ku diçe hejmara gundiyan kêm dibe. Xaniyên kevir ku bi mîmariya Ermeniyan hatine çêkirin hîn xerabe hene. Li nav gund hîn dêra Ermeniyan a sê tebeq li ser piyan e. Gundî niha ka û giyayên xwe dikin dêrê û wê wek kadînê bi kar tînin. Herweha aşekî dîrokî hîn jî heye. Di nav gelî de gundekî gelek bi dar û ber e. Li gund her cureyên mêwan hene. Nêzîkî bendava Qeraqeyayê ye. Nifûsa gund 100 e. Li gund dibistan heye, lê girtiye. Li gund telefon, av û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Akrag** (Yazyağmuru) dikeve bakurê Çingûşê. Bi ermenî tê wateya mêrgemînê (çiftliğê). Ji Çingûşê 35 û ji Amedê jî 155 km dûr e. Nifûsa gund 70 e. Sê mezreyên wê hene. Ji aliyê Xarpêtê ve hatine û gund avakirine lê tarîha avakirina gund ne diyar e. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Ardûwa** (Kaynakköy) dikeve bakurê rojavayê Çingûşê. Ji Çingûşê 20 û ji Amedê jî 140 km dûr e. Nifûsa gund 110 e. Di dawiya salên 1700î de hatiye



Dêra Surp Garabed

Institut kurde de Paris

avakirin. Aboriya gund li ser heywan xwedîkirinê ye. Rûn û penirê gund bi navûdeng e. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin. Riya gund asfalt e, telefon, av û elektrîk li gund hene. Piraniya gundiyan koçberî Bursa û Stanbulê kirine. Di van salên dawî de hinek ji wan bi paş ve vegerîne gund.

**Axdaş** (Aktaş) dikeve bakurê Çingûşê. Ji Çingûşê 13 km û ji Amedê125 km dûr e. Nifûsa gund 240 e. Tirkmen in. Li gund ji 1964an ve dibistan heye. Riya gund asfalt e, av û elektrîk li gund hene. Gundekî çiya ye, piraniya ciwanên gund diçin li aliyê Tirkiye wek karkeren demsalî kar dikin. Malbateke mezin di salên 1800î de ji gundê Salwazê hatine û li wir xanî lêkirine û piştre bûye gund. Li Çinguşê 13 gund Tirkmen in. Ji wan yek jî gundê Axdaşê ye.

**Awut** (Yenice) dikeve bakurê Çingûşê. Ji Çingûşê 20 û ji Amedê jî 140 km dûr e. Nifûsa gund 35 e. Li gund dibistan heye, lê girtiye. Riya gund stabîlîze ye, telefon, av û elektrîk li gund hene. Di salên 1980î de, ji ber mercên aborî koçberên Bursa û Mersînê kirine.

**Bosma** (Koçören) dikeve bakurê Çingûşê. Ji Çingûşê 20 û ji Amedê jî 140 km dûr e. Nifûsa gund 500 e. Antar (Yolaçan), Lal (Sayar), Nûrika Jorîn (Yukarısergenli), Nûrika Jêrîn (Aşağısergenli) û Şaban mezreyên wê ne. Ji herêma Xarpêtê hatine û gund avakirine, lê kes dîroka avakirinê nizane. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Cewdere** (Arpadere) dikeve rojhilatê Çingûşê. Ji Çingûşê15 km û ji Amedê jî 135 km dûr e. Nifûsa gund 135 e. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. İzzet Altinmeşe ji vî gundî ye. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Çîvê** (Türkmen) dikeve rojhilatê Çingûşê. Ji Çingûşê 20 û ji Amedê jî 140 km dûr e. Nifûsa gund 200 e. Li gund dibistan, telefon, av û elektrîk hene û riya gund qûmkirî ye.

**Derdere** (İbikkaya) dikeve başûrê Çingûşê. Ji Çingûşê 12 û ji Amedê jî 132 km dûr e. Nifûsa gund 510 e. Nîvê gundiyan ji aliyê Xarpêtê û nîvê din jî



Dûden

ji aliyê Semsûrê hatine û gund avakirine, lê dîroka avakirinê ne diyar e. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin. Riya gund asfalte, telefon, av û elektrîk li gund hene. Gundiyan di van salên dawî de koçberê Edene, Mersîn û Stanbulê kirine.


**Deştek/Zemo** (Balcılar) dikeve bakurê rojhilatê Çingûşê. Ji Çingûşê 20 û ji Amedê jî 110 km dûr e. Nifusa gund 440 e. Du mezrayên wê hene. Dibistan, telefon, av û elektrîk li gund hene. Riya gund asfalt e.



Gundeki Çingûşê
Foto: Ridvan Turan

Institut kurde de Paris

**Elyos** (Malkaya) dikeve bakurê Çingûşê. Alyos jî dibêjin. Ji Çingûşê 6 û ji Amedê jî 110 km dûr e. Gund navê xwe ji çiyayê Elyosê girtiye . Nifûsa gund 200 e. Ji eşîreta Qerekeçiyan in. Gundekî çiyayî ye, zevîyên çandinê gelek kêm in, loma piraniya gundiyan ji sala 1975an ve ji gund barkirine çûne Stanbul, Îzmîr, Amed û bajarên din. Gundekî weha ye ku xwendin û nivîsandin li gund gelek bilind e. Ji gund gelek parêzer, muhendis, mamoste û memûren din hene. Havînan wek havîngehê dema vedigerin gund nifûsa gund dibe çend qat. Ji bo heywan xwedikirinê kooperetîfek li gund hatiye avakirin. Li gund dibistan heye. Riya gund asfalt e, li gund telefon, av û elektrîk hene.



Gundeki Çingûşê
Foto: Ridvan Turan

**Elyos** (Malkaya) dikeve bakurê Çingûşê. Alyos jî dibêjin. Ji Çingûşê 6 û ji Amedê jî 110 km dûr e. Gund navê xwe ji çiyayê Elyosê girtiye . Nifûsa gund 200 e. Ji eşîreta Qerekeçiyan in. Gundekî çiyayî ye, zevîyên çandinê gelek kêm in, loma piraniya gundiyan ji sala 1975an ve ji gund barkirine çûne Stanbul, Îzmîr, Amed û bajarên din. Gundekî weha ye ku xwendin û nivîsandin li gund gelek bilind e. Ji gund gelek parêzer, muhendis, mamoste û memûren din hene. Havînan wek havîngehê dema vedigerin gund nifûsa gund dibe çend qat. Ji bo heywan xwedikirinê kooperetîfek li gund hatiye avakirin. Li gund dibistan heye. Riya gund asfalt e, li gund telefon, av û elektrîk hene.

Institut kurde de Paris

**Gezo** (Çınarköy) dikeve rojhilatê Çingûşê. Ji Çingûşê 25 û ji Amedê jî 145 km dûr e. Nifûsa gund 290 e. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan heye, lê girtiye. Riya gund asfalt e, li gund telefon, av û elektrîk hene.

**Gundecî** (Güneydere) dikeve bakurê Çingûşê. Ji Çingûşê 7 û ji Amedê jî 127 km dûr e. Nifûsa gund 231 e. Li gund dibistan heye, telefon, av û elektrîk hene. Tiriyê Gundeciyê bi navûdeng e. Piraniya gundiyan ji 1980î ve koçberê Mersin û bi taybetî navçeya Tersûsê kirine. Riya gund asfalt e.

**Hîngîko/Îngîko** (Yeniköy) dikeve rojhilatê Çingûşê. Riya Çêrmûg û Çingûşê di nav gund re derbas dibe. Ji Çingûşê 10 û ji Amedê jî 110 km dûr e. Di salên 1700an de ji aliyê Seyfulah Bey bi malbata xwe ve ji aliyê Paloyê hatiye û gund ava kiriye. Şikefta Dûdenê nêzîkî gund e. Li serê çiyê li cihekê serberjêr e. Di mehên zivistan, bihar û payizande dema berf û baran dibare dikeve şikefta Dûdenê. Bi roj û mehan av wek lehîyê diherê tije nabe. Dibe ku ev av di heremeke dûr de ji bin erdê derkeve. Lê tû îşaret tune ku derdikeve ser erdê. Di dema kuştina Ermeniyan de bi sedan qefle anîne kuştine û avêtina vê şikefta Dûdenê. Dûdenê ji Ermeniyan re kirine bîrên dojehê. Gundiyên niha bi kirmanckî dipeyivin. Nifûsa gund 950 e. Dibistan, telefon, av û elektrîk li gund hene. Riya gund asfalt e.

**Hindîbaba** (Hindibaba) dikeve rojavayê Çingûşê. Ji Çingûşê 10 û ji Amedê 130 km dûr e. Li gor texmînan gund di navbera salên 1518-1526an de hatiye avakirin. Di Tehrîtar defteriya sala 1526an de dinivîse ku "li gundê Hîndî baba çend dewrêş hebûne. Navê wan dewrêşan weha ne: Mehemed, Hesen, Xidir Coxar Baba." Xelk ji Çoxar Baba re Kanhol jî dibêje. Gora wî li ser çiyayê Hîndî Baba ye. Ji aliyê din ve tê gotin ku sê bira ji Hindistanê hatine û gundê Hîndî Baba avakirine ji wan birayan navê yekî Hîndî Baba bû ye navê wî li gund hatiye kirin. Gund çiya û kevir e, ziriat tune. Lêbelê hêjîrên gund bi navûdeng in. Nifûsa gund 750 e. Riya gund asfalt e. Li gund dibistan, telefon, av û elektrîk hene.

**Keleşo** Keleşevleri dikeve rojhilatê Çingûşê. Ji Çingûşê 5 û ji Amedê jî 115 km dûr e. Li ser riya Çêrmûg û Çingûşê ye. Nifûsa gund 175 e. Mezreyeke

wê heye. Li gund dibistan heye. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Kinik** Elmadere dikeve bakurê rojhilatê Çingûşê. Ji Çingûşê 15 û ji Amedê jî 135km dûr e. Nifûsa gund 280 e. Li gund dibistan heye. Riya gund asfalt e, telefon, av û elektrîk li gund hene. Piraniya gundiyan piştî 1990î koçberên bajarê Mersîne kirine.

**Lîdo** (Üçpınar) dikeve bakurê rojavayê Çingûşê. Di destpêka gund de sê kanî hene. Ji Çingûşê 25 û ji Amedê jî 145 km dûr e. Nifûsa gund 40 e. Tilek (Kelekgeçidi) mezreya wê ye. Dibistan, telefon, av û elektrîk hene. Riya gund stabîlîzekirî ye.

**Mehmûdan** (Gökçepelit) dikeve bakurê Çingûşê. Ji Çingûşê 15 û ji Amedê jî 135 km dûr e. Nifûsa gund 111 e. Çalûşê (Karıntaş) mezreya wê ye. Dibistan, telefon, av û elektrîk li gund hene. Riya gund asfalt e. Li ser çemê Mehmûdxanê pirek heye, ev pir Çingûşê bi gundên bakur ve girê dide. Gundî ji sala 1988an ve koçberê Mersîn, Bursa û Stanbul bûne.

**Mensûran** (Yaygınkonak) dikeve bakurê Çingûşê. Ji Çingûşê 35 û ji Amedê jî 155 km dûr e. Nifûsa gund 306 e. Bekozlar (Çeşmederesi), Mezra (Darsu), Tepe, Namet (Seltepe) û Hanto (Tilkitepe) mezreyên wê ne. Ji aliyê Xarpêtê hatine û gund avakirinê lê dîroka wê ne diyar e. Hem li navenda gund û hem jî li Mezreya Darsu dibistan heye. Telefon, av û elektrîk li gund hene. Riya gund asfalt e.

**Medî/Mîdya** (Oyuklu) dikeve rojhilatê Çingûşê. Ji Çingûşê 10 û ji Amedê jî 130 km dûr e. Nifûsa gund 335 e. Li gor gotinan di salên 1700î de gund hatiye avakirin. Li gund dibistan, telefon, av û elektrîk hene. Piraniya gundiyan ji salên 1980î ve koçberên Amed, Edene û Mersînê kirine. Riya gund asfalt e.

**Norla** (Aydınlı) dikeve rojhilatê Çingûşê. Ji Çingûşê 18 û ji Amedê jî 138 km dûr e. Nifûsa gund 400 e. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon, av û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

Institut kurde de Paris

**Norşîn** (Külbastı) dikeve rojhilatê Çingûşê. Ji Çingûşê 25 û ji Amedê jî 145 km dûr e. Nifûsa gund 259 e. Li gund dibistan heye. Riya gund asfalt e, li gund telefon, av û elektrîk hene.

**Pîran** (Atalar) dikeve bakurê Çingûşê. Ji Çingûşê 20 û ji Amedê jî 125 km dûr e. Nifûsa gund 850 e. Bi navê Birimcek (Şalevleri) mezreyek wê heye. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan heye. Riya gund stablîze ye, telefon, av û elektrîk li gund hene. Gundî koçberê Edene, Mersîn û Tersûsê bûne. Yên ku hene jî wek karkerên demsalî diçin dixebitin û bi paş ve tên. Gundekî avî ye û gundî sebze û mêweyên xwe dibin Çingûşê û Çêrmûgê difroşin.

**Polato** (Polatuşağı) dikeve bakurê rojhilatê Çingûşê. Ji Çingûşê 30 û ji Amedê jî 150 km dûr e. Yê ku gund ava kiriye, navê wî polat bûye. Nifûsa gund 280 e. Ziyar (Kömürtepe), Qoruyan û Qoldere mezrayên wê ne. Dibistan, telefon, av û elektrîk li gund hene. Riya gund asfalt e.

**Qerekilîse** (Karakaya) dikeve başûrê Çingûşê. Ji Çingûşê 19 û ji Amedê jî 150 km dûr e. Nifûsa gund 200 e. Mezreyeke wê heye. Guzên gund bi navûdeng in. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Lê çend mal kurmanc in. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Salwaz** (Deveboynu) dikeve bakurê rojhilatê Çingûşê. Ji Çingûşê 7 û ji Amedê jî 125 km dûr e. Di salên 1300an de hatiye avakirin. Nifûsa gund 460 e. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.
**Sarsap** Çataldut) dikeve bakurê Çingûşê. Ji Çingûşê 26 û ji Amedê jî 146 km dûr e. Qırmızı (Alkanat), Mezra (Ekinli) û Xerabe (Yemişliyayla) mezreyên wê ne. Li gor gotinan ji aliyê Xarpêtê hatine û gund avakirine. Nifûsa gund 200 e. Gund bi bîhokên xwe bi navûdeng e. Li gund dibistan, telefon, av û elektrîk hene. Riya gund qûkirî ye.

**Seferan** (Seferuşağı) dikeve rojhilatê Çingûşê. Ji Çingûşê 20 û ji Amedê jî 140 km dûr e. Nifûsa gund 160 e. Weysikan (Tarhana) û Gonduz mezreyên wê hene. Dibistan, telefon, av û elektrîk li gund hene. Riya gund asfalt e.

**Simaqî** (Sağtepe) dikeve bakurê rojhilatê Çingûşê. Ji Çingûşê 15 û ji Amedê jî 135 km dûr e. Li gor gotinan bi qasî 350-400 sal berî niha 4 bira hatine li ciyekî avî dîtine û li wir gund avakirine. Niha gundiyên esil li mezreya Behçe dijîn. Li derdora gund xerabe û keleyeke heye ku navê wê Kela Gawiran e. Weha xuya dike ku berê jî mirov li van deran jiyan e. Herweha ji Pîranê jî çend malbat hatine li gund bi cih bûne. Di dema şerê Cîhanê yê Duyem de çend malbatan ji gund, koçê Elezîzê kirine. Niha jî gelek malbatan barê metropolê Tirkiyê kirine. Gundî bi kirmanckî dipeyivin. Nifûsa gund 400 e. Bi navê Bexçe mezrayeke wî heye. Piraniya gundiyan ji salên 1980î ve koçê Tersûsê kirine. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Şêrwêran** (Çaybaşı) dikeve bakurê rojhilatê Çingûşê. Ev nav ji ber xwşikbûn, şînahî û şîrîniya gund tê warê şîrîn. Ji Çingûşê 40 û ji Amedê jî 160 km dûr e. Nifûsa gund 100 e. Qaçer, Qeremeşe, Alyan (Demîrkale) û Îngêl (Ingildere) mezreyên wê ne. Li mezreya Qarameşe dibistan heye. Riya gund asfalt e, telefon, av û elektrîk li gund hene.



Bendava Karakayayê
Foto: Şemsettin Turga

Institut kurde de Paris


Institut kurde de Paris

**Textemêşat/Kilîse** (Akbaşak) dikeve bakurê Çingûşê. Ji Çingûşê 11 km û ji Amedê 130 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 800î ye. Xelefun, Qolun û Xarjîn mezreyên Kilîsê ne. Gundî bi bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gor gotinan gund di salên 1700î de hatiye avakirin. Wek di navê gund de jî xuya dike, berê gundê Ermeniyan bûye. Gundekî bi bax û bexçe ye. Ji tirî şerebê çêdikin. Gundî heywan xwedî dikin. Dibistan hem li Kilîsê û hem jî li mezreya Bondanê heye. Di sala 1985 ve koçberiye dest pê kiriye û piraniya gundiyan çûne Edene, Mersîn û Bursaye bi cih bûne.

**Tête** (Ormançayı) dikeve rojhilatê Çingûşê. Ji Çingûşê 30 û ji Amedê jî 150 km dûr e. Nifûsa gund 310 e. Dibistan, telefon, av û elektrîk li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Tirk** (Albayrak) dikeve bakurê Çingûşê. Ji Çingûşê 46 km û 160 km ji Amedê dûr e. Nifûsa gund 200 e. Haqiyan (Ağıltepe), Taş û Çelik (Başpınar) mezreyên wê ne. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan heye. Riya gund stabîlîze ye, telefon, av û elektrîk li gund hene. Di salên 1500î de hinek kes ji aliyê Xarpêtê ve hatine û gund avakirine. Piraniya gundiyan ji sala 1987an ve destpêkirine diçin li Stanbulê bi cih dibin.

**Xandere** (Handere) dikeve rojavayê Çingûşê. Ji Çingûşê 20 û ji Amedê 140 km dûr e. Xelkê gund ji aliyê Çêrmûgê hatine û gund avakirine. Dîroka avakirina gund ne diyar e. Nifûsa gund 200 e. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Xoya** (Geçitköy) dikeve başûre Çingûşê. Ji Çingûşê 6 û ji Amedê jî 126 km dûr e. Ji ber ku li herêma ava şor ango bi xwê ye, gund navê xwe ji wir girtiye. Çemê Feradê jî di başûrê gund re derbas dibe. Hinarên gund bi navûdeng in. Nifûsa gund 570 e. Riya gund asfalt e, dibistan, telefon, av û elektrîk li gund hene. Piştî 1990 î piraniya gundiyan koçberê bajarên Edena, Mersîn û Stanbulê kirine.

Institut kurde de Paris




Dîmenek ji çarşiya Erxeniyê
Foto: İnan Kılıç

# Erxenî

Erxenî (Ergani) dikeve bakurê Amedê û 57 km ji Amedê dûr e. Li ser riya Amed û Xarpêtê li pala çiyayê Meryemanê /Maqam (Zulkîf) e. Bakurê wê çiya û başûrê wê jî deştên Êlya (Hoşot) û Gewran in. Mezinahiya axa wê 1.489 $km^2$ ye. Ji deryayê 955 metre bilintir e.

Erxenî li ciyekî stratejîk e. Li ser riya reş a Amed, Maden û Xarpêtê ye. Di heman demê de riya trênê ji Meletiyê tê di binya Erxeniyê re diçe Amedê. Riya Çêrmûg, Çingûşê û Pîranê jî di nav Erxeniyê re derbas dibin. Erxenî bajaroke kevn û mezin e. Niha 12 taxên navenda Erxeniyê hene: Taxa Azîziye, Adnan Menderes, Karxane, Îsmet Paşa, Kemaliye, Saray, Namik Kemal, Sanayî, Kemertaş, Fatîh, Fevzî Çakmak û Şîrînevler.

Li ser Erxeniyê 83 gund û 108 mezre hene. Li navend û li gundê Qileşê şaredarî hene. Nifûsa navendê 63.065, ya gundan 49.802 e û bi giştî nifûsa Erxeniyê 112.867 e. Erxenî di sala 1927an de bûye bajarok û navê Osmaniye lê kirine. Di sala 1938an de carek din navê wê guhetine û vê carê navê Erganî lê kirine.[16]

[16] www.ergani.gov.tr/index.asp-_Ernagi belediyesi)



Ji şikeftên Hilarê Erxen
Foto: Karazî

Institut kurde de Paris

Bi qasî ku tê zheta niha ev nav li bajar hatine kirin: Aqranya, Erqenin, Erqanikana, Yanari, Zulkarneyn, Hana, Ûr, Aşat, Arsania, Osmaniye, Erxenî û Erganî.

Erxeniya niha û ya kevn ne yek e. Berê bajar li bakurê rojavayê Erxenî ya niha bû. Erxeniya kevn li qûntara çiyayê Kolatê bû. Îro bi tenê hinek xerabeyên kela Erxeniya kevn mane. Li bakurê Qereçortan (Bexçeyê Zukar Efendî) bûye.[17] Tê gotin ku li wir keleyeke gelek mezin hebûye, ew kele li dora çiyayê Meryemane wek bazineke bûye. Kes nizane ev kele kengê û ji aliyê kê ve hatiye çêkirin. Lê hezar mixabin îro kele nemaye, li çend cihan xerabeyên wê mane.

Di navbera salên 1874-1914an de waliyê Amedê Kurt Îsmaîl Paşa riya navbera Amed û Xarpêtê çêkiriye ku karwan û bazirgan bi hêsanî herin û

[17] Üzülmez, *Çayönü'nden Ergani'ye uzun bir yürüyüş*, s. 280

werin. Ev rê li herêma Erxeniyê li jêr, di ber gundê Bayguré re derbas bûye. Ji bo xelk nêzîkî riya Amed û Xarpûtê bibe, dest pê kirine hêdî hêdî li derdora Baygurê xanî lê kirine û ji kelê daketine û hatine wir. Di navbera çend salan de bajarê nav kelê vala û bêxwedî maye û xerabe bûye. Herweha Erxeniya niha ava bûye.

Li herêma Erxeniyê cihê herî dîrokî Qotê Berçem û Hîlar in. Li gor lêkolînên van salên dawî li vê herêma Qotê Berçem berî mîladê 7250-6750an de mirov li wir bi cih bûne, xaniyên gilover û kulubeyên prîmîtîv çêkirine. Di wê dema neolotîk de şaristaniyeke mezin û yekem avakirine. Balkêşî û taybetiya Hîlarê yek jê jî ev e ku kevirên ku li wir hatine şehkirin bi qasî 10 metreyî fireh in. Di navbera Qotê, Berçem û Hîlarê de 300 metre mesafe heye.

Şaristaniya Qotê Berçem digihe serdema Sûbariyan. Di dokumentan de zelal e ku civateke agirperst bûne. Agir, roj û hîvê parastine. Ev civat an gel her li cihê xwe maye. Ji derî Qotê Berçem û Hîlarê, şikeftên Hîlarê, Dêra Meryemê, şikeftên Hafseml, çiyayê Meryemane, girikên Bervanê, li gundê Xanê li ser riya Hevrîşm gelek cihên dîrokî hene. Gelek desthilatdariyên ku herêma Amedê dagîr kirine her weha Erxeniyê jî dagîr kirine. Dîroka Erxenî û ya Amedê heman dîrok e. Lêbelê tiştekî zelal heye ku demeke dûr û dirêj Erxenî, Meletiye, Semsûr û herêmên din di bin desthilatdariya împaratoriya



Qonaxek ji Erxeniyê
Foto: Nejat Satıcı

Hatiyan de mane. Bz di sala 1220an de dema Împaratoriya Hatiyan belav dibe, li ser axa împaratoriya Hatiyan desthilatdariyên biçûk û mezin bi serê xwe mane. Desthilatdariya Erxeniyê jî bi serê xwe maye. Dema ku Asûrî hatine herêmê desthilatdariya Erxeniyê bacê daye Asûriyan, lê gel nîv serxwebûna xwe jî parastiye. Di serdemên Romî, Pers, Sefawî, Abasî, Merwanî, Selçûqî, Aqqoyûnî û yên din de jî ew rewş her dom kiriye. Statuya bajarê Erxeniyê di sala 1515an de hatiye guhertin. Di heman salê de Mîremêraniyên Kurdistanê bi daxwaza xwe ji Sefawiyan qetiyane û desthilatdariya Osmaniyan qebûl kirine. Di vê statûya nû de Erxeniyê jî kirine sencex û dane ser Amedê.[18] Di dema Komara Tirkiyê Parlametoya Yekem û Duyem de jî parlamenterên Erxeniyê bi serê xwe hatine hilbijartin û yên Amedê jî bi serê xwe. Wek parlamenterên du bajarên cihê bûne.

Li herêma Erxniyê kanên madenê hene. Ev kanên madenê li cîhanê jî di nav yên herî kevn de ye. Di sala 1870î de jeologê Rûs Pierre De Tcihatchef cara yekem li gundê Xulamê dibîne. Lê heta sala 1915 kes girîngê pê nade. Piştî vê salê lêkolîn dom dikin û di sala 1936an

[18] Ergani belediyesi http://www.facebook.com/


Dimenek ji Çiyayê Zulkif heta Deştên Êlya û Gewran
Foto: Seyah Latif

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

de Xuleman (Alacakaya) avahiyan ava dikin û dest bi derxistina kromê dikin. Xuleman heta sala 1935 li ser Erxeniyê bû. Ji wê salê bi şûn ve dane ser bajaroka Madenê ku li ser Elezîzê ye.

Du (2) km li rojavayê Erxeniyê li ser riya Erxenî û Madenê di sala 1976an de fabrîkayeke çîmento hatiye avakirin. Li herêmê fabrîkaya herî bi kapasîte ye. Di van salên dawî de dewletê firotiye Holdinga LIMAKê. Di sala 2006an de, ji vê fabrîkê 1.120.000 ton çîmento bi dest xistine û firotine. Fabrîke bi dûxan û gemariya xwe bajar qirêj dike û ji bo bijûndariya mirov û hawirdorê talûkeyeke mezin e. Her ku diçê binecihên taxên nêzîk ber bi rojilatê bajêr ve bar dikin û bajar ji herêma fabrîkê bi dûr dikeve. Li ser riya Amed û Pîranê xaniyên nû avakirine.

Heta sala 1925an li Erxeniyê bi tenê dibistaneke hebû. Di sala 1943an de, li biniya Erxeniyê li nêzîkî stasyonê Enstîtûya Gund a Dîclê (Dicle Köy Enstitüsü) hat avakirin. Piştre ev bû Dibistana Mamosteyan a Seretayî ya Dîclê (Dicle İlköğretmen Okulu). Di vê dibistanê de bi tenê ne ji Erxeniyê herweha ji bajarên din jî bi sedan xwendekar hatin li wir xwendin û bûn mamoste. Niha nav û sîstema wê gurhetine û kirine Amadeyiya Mamosteyan a Anadoluyê.

Îro li navenda Erxeniyê 2 pêşdibistan, 13 dibistanên seretayî û 9 amadeyî hene. Li navend û gundên Erxeniyê bi giştî 107 dibistanên seretayî hene. Ji berê ve li herêma Erxeniyê asta xwendin û perwerdê li gor bajarokên din bilind e.

Di dema Osmaniyan de dewletê, ji Qafqasan Tirkmen anîne li navenda Erxeniyê bi cih kiriye. Cara duyem jî di sala 1934an de jî ji Bulgaristan û Yugoslavyayê Tirkên macîr anîne li navenda Erxenî û li gundê Herbetû bi cih kirine. Li tevahiya Erxeniyê nifûsa Kurdan ji %95 e û ya Tirkan ji %5 e. Li Erxeniyê du zaravayên kurdî tên axaftin kurmancî û kirmanckî. Ji %75 kurmancî ji 20 jî kirmanckî dipeyivin.[19] Lê di van salên dawî de li navenda bajarokê bi piranî bi tirkî dipeyivin.

Di zemanê berê de li herêma Erxniyê hejmareke mezin Ermenî hebûne. Niha Ermenî nemane. Îro li navenda Erxeniyê Kurd û Tirkmen hene. Ji Tirkmenên navenda Erxeniyê re bi zimanê xelkê dibêjin 'qaqo." Hejmara Tirkmenan gelek kêm in û ya Kurdan zêde ye. Polîtîka asîmilasyonê li navenda Erxeniyê gelek zêde ye.

[19] www.ergani.net/ergani/ergani-tarihce.html



Erxeniya kevn

# Çandinî û rezvanî

Wek me li jor jî nivîsî, li başûrê Erxeniyê du deştên mezin û bi xêr û bêr hene. Deştên Êlya û Gewran. Herdu jî embara tene ne. Deşta Gewran mezin û ya Êlyê biçûk e. Qada deşta Gewranê 15.000 hektar e. Bi taybetî di van salên dawîn de ku bendavên Diclê û Fûştaxê (Devegeçitiyê) çêkirin, deşta Gewran bû avî. Hilberîn zêde û bi qelîte bû. Herweha deşta Êlyê jî bi ava çemê Boxazê bû avî. Di van salên dawî de axa herêma Erxeniyê ji aliyê çandiniyê ve weha ye: Zeviyên çandiniya bejî : 617080 dekar (genim, ceh, nîsk û nok). Zeviyên avî: 48120 dekar (pembo, genim, titun, pincara şekir, zebeş û petêx). Mêrg û cihê çêrê: 390400 dekar. Beyar : 213400 dekar e.

Li herêma Erxeniyê ji berê e rez û rezvanî bi navûdeng bû. Ev ketiye seyahetnameyên gerokên ewropiyan jî. Gerokê Ermenî Tibir Sîmeon di sala 1612an de, di seyahatnameya xwe dinivîse ku meya (şeraba) Erxeniyê li cîhanê bêhempa ye. Herweha Ewliya Çelebî jî destnîşan dike ku tiriyê Erxeniyê li herêmê gelek çejdar e. Di dema destpêka komarê de meya ku Doşoyê Ermenî çêkiriye navê wê heta Fransê belav bûye. Navê Doşo bi xwe ji şîreya tirî tê. Li hinek herêman Kurd ji dimsê re doşav dibêjin. Niha jî li gelek cihên Erxeniyê xelkê dest bi rezvaniyeke nûjen kirine. Bi taybetî li başûrê Erxeniyê li deşta Êlyas nêzîkî Tilhuzûrê ji bo çêkirina meyê rez xwedî dikin. Ji Erxeniyê heta Çingûşê xebateke weha heye.

**Meqamê Zulkîf Pêxember**

Li serê çiyayê Zulkîf pîrozgeha Zulkîf pêxember heye. Tê gotin ku ev warê (meqamê) wî ye û gora wî jî li Gêlê ye. Hz Zulkîf kurê Hz Eyûb be, navê wi yê rastî Bîşr e. Piştî bavê wî, vê carê pêxemberî ji wî re hatiye.[20] Li gor hinek çavkaniyan Zulkîf pêxember li Anatoliyê û Suriyê jîyaye.

Heta sala 1925 li ser meqamê wî yê Erxeniyê avahiyeke mezin hebû. Piştî şerê Şêx Seîd 30.11. 1925an de hukimetê qanûna qedexekirina zîyaret û medreseyan (677 sayılı Tekke ve Zaviyeler ile Türbelerin Kapatılmasına)derxist û pîrozgeha Zulkîf Pêxember jî xerab kirin. Di sala 1956an de li heman cih xaniyekî bi beton çêkirin. Îro jî hîn ew avahî heye. Li gorê baweriya xelkê herêmê jina ku jê re zarok çênebe dema ku bi çiyê re di herêma bexçeyên Narlikê ve hilkişe jor û here ser zîyareta Zulkîf Pêxember jê re zarok dibe. Loma piraniya navên zarokên herêma Erxeniyê ku keç be Zulfiye ku kur be jî Zulkîf an Zulfiqar e. Biharan zîyareta Zulkîf pêxember wek festîvalê ye.[21]

Dîsa li serê çiyayê Zulkîf manastira Meryema heye. Gelo çiya navê xwe ji manastirê girtiye an manastirê navê xwe ji çiya girtiye? Di nav manastirê de sarinceke mezin heye. Ava vê sarincê hem ji aliyê sarbûn û hem jî ji aliyê vexwarinê ve bêhempa ye. Manastira Meryama xerabe bûye, lê hîn hinek dîwarên wê li ser xwe ne. Di dema xwe de, li herêmê Manastera herî bi navûdeng bûye.

## Ziyareta Enûş Pêxember

Li herêma gundê Qizilê li ser çiyayê Enûş ziyareta Enûş Pêxenber heye. Li ser gora wî kumbeteke hatiye çêkirin. Xelkê herêmê her rojên îniyan diçin ser ziyareta Enûş Pêxember. Li ser Enûş û pêxemberiya wî sê rîwayetên cuda hene. Li gor rîwayeta yekem Enûş pêxember bûye, kurê Şît û kalê Nûh bûye. Li gor rîwayeta duyem Enûş ne pêxember bûye, lê qiral bûye. Li gor rîwayeta sêyem jî Enûş û Abbas heman mirov bûye.

---

[20] Ali Melek, Abdullah Demîr, *Dini degerleri ile Diyarbakır,* Diyarbakır Il Müftülügü yayınları, s.41-2009

[21] Tê gotin ku ev zîyaret di eslê xwe de ne Pîrozgeha Zulkîf Pêxember e, dêreke Ermeniyan bûye. Dema Ermeniyan ji wir barkirine wê dêra wan wergerandine ziyarertê û gotine Zulkif Pêxember. Ji ber mîmariya kevn a zîyaretê baş dide diyar kirin ku dêr bûye. Cavkanî: Muhtar Körükü, *Karacadag dergisi,* Aralık-Ocak 1945-1946 tarihl (Cilt VII/85-86), carek din di 08.12.2006 di *Ergani Haberê* de hatiye weşandin.



Şahiyek li Erxeniyê

# Şaredarî

Şaredariya Erxeniyê di sala 1916an de hatiye damezrandin. Şaredarê yekem Şewqî Beg e û di salên 1920î de serokê şaredariya Erxeniyê bûye. Kesên ku heta niha şaredarî kirine ev in:

Şewqî Beg (Şevki Bey)
Laşo Hanifi (Bayhan)
Osman Yalçın
Salih Akin
Dursun Efendi
Halis Beg (Yüzbaşı)

1950
Neşet Yalçın
Zülküf Yıldırım
Ahmet Yavuz

1960
Muzaffer Noyan (Yarbay)
Ziya Durakoglu (qaymaqam)
Cemal Gulbahar
İhsan Güzel
Emin Karakuş

1980
Ismail Hakkı Ozuz (Yuzbaşı)
Veterîne....?
Nuri Şimşek (qeymeqam)
Osman Aslan
Macit Güney
Zülfükar Karakaş
Zülküf Emirhanoğlu
Nadir Bingöl
Fesih Yalçın

## Parlamentoya Tirkiyê ya yekem: 1920-1923

### Parlamenterên Erxeniyê

**Ali Şefik Bey** berî Mazbaata xwe bigre îstîfa kiriye û Salih Bey di şûna wî de hatiye hilbijartin. Salih Beyê jî îstîfa kiriye û neçûye Meclîsê.

**İbrahim Hakkı Bey** (Akgun) di sala 1889an de li Paloyê hatiye dinê. Malmudurtî kiriye. Ew di sala 1956an de miriye.

**Kadri Bey** ji ber ku ew ji Meclisa Stanbulê hatiye Enqerê, parlamentoya Enqerê Kadri Bey wek parlamenter qebûl nekiriye û wî jî 27.10.1920î de ji parlamenteriyê îstifa kiriye.[22]

[22] Di qeydên meclîsa yekem de "îstifa kir" dinivîse. Ev ne rast e. Îttihatçî piştî hilbijartinê dema agahdar dibin ku ew kesên wek parlamenter hilbijartine ne ji wan in, yani ne Îttihatçi-Terakki ne, parlamenteriya wan qebûl nekirine û di şuna wan de mirovên xwe hilbijartine. Wê demê ji bo parlameteran hilbijartin çênedibû, Mustafa Kemal û Paşayên hevalên xwe parlamenteran hildibjart. Hilbijartin jî bi tenê ne di nav kesên bajêr de dikirin. Dikaribû ew kesên ku hilbibjêrin ne ji wî bajarî bin. Wek nimûne ka li lîsteya parlamenterên wê demê binêrin li ser navê Amedê ji Stanbul, Bosna, Aydin, Trabzon paramenter hilbijartine û ji wan re gotine hûn parlamenterên Amedê ne. Wek walî an jî memûrekî payebilind ku niha çawa dişênin Amedê, wê demê weha li ser navê Amedê û bajarên din bi heman metodê parlamenter birine meclîsa Enqerê.

**Kazim Bey** (Oral) di sala 1892 an de li Madenê hatiye dinê. Piştî hilbijartinê 02.09.1920î de neçuye Enqerê û ji parlemteriyê îstîfa kiriye. Di şûna wî de Ali Şefik Bey hatiye hilbijartin.

**Mahmut Bey** (Sığnak) di sala 1816an de li Secadetê hatiye dinê. Xwedî ax e. Ew di sala 1942an de miriye.

**Memduh Bey** hatiye hilbijartin, lê neçuye meclisê û îstifa kiriye. Di şûna wî de Mehmet Emin Bey hatiye hilbijartin.

**Mehmet Emin Bey** (Giray) di sala 1865an de li Paloyê ji dayîk bûye. Memûrê tapûyê bûye û di sala 1925an de miriye.

**Nushet Bey** (Ahmet Nushet Saracoğlu) di sala 1861ê de li Çemîşkezekê hatiye dinê. Li gelek cihan memûrtî kiriye. Di sala 1942an de miriye.

**Rüştü Bey** (Bulduk) di sala 1874an de li Paloyê hatiye dinê. Hakimî kiriye. Bûye Mebûsê Meclisa Osmanî ya Çarem. Di sala 1924an de miriye.

**Sırrı Bey** (Ali Sırrı Özata) di sala 1884an de li Çemîşkezekê hatiye dinê. Memûrtî kiriye. Di sala 1936an de miriye.

## Parlamentoya Tirkiyê ya duyem: 1923-1927

### Parlamenterên Erxeniyê

**İhsan Bey** (Sağlam) di sala 1877an de li Trabzonê hatiye dinê. Serleşker bûye. Di sala 1949an de miriye.

**İhsan Hamit Bey** (Tigrel) di sala 1890an de li Amedê hatiye dinê, li Mehkemê başkatîb bûye. Ew di sala 1985an de miriye.

## Çapemenî

Li gor bajarokên din ên Amedê Erxenî ji aliyê çapemeniyê ve piçek be jî xurtir û baştir e. Heta niha li Erxeniyê pênc rojname derketine û hnek ji wan hîn jî weşana xwe dom dikin.

Institut kurde de Paris



ERGANİ

HAFTALIK SİYASİ BAĞIMSIZ GAZETE
(CUMA GÜNLERİ ÇIKAR)

1 KASIM 2002
CUMA

Sayı : 2572

YIL: 37

'Okullarda misyonerlik faaliyetleri yapılıyor'

Cumhuriyet Bayramı törenlerle kutlandı

HABER MERKEZİ

## Ergani Gazetesi

Li Erxeniyê rojnameya herî kevn Erganî gazetesi (Rojnameya Erxeniyê) ye. Ji sala 1966an de dest bi weşana xwe kiriye û heta îro dom dike. Rojnameyeke hefteyî ye. Xwedî û gerînendeyê rojnameyê Şerefettin Okumuş û gerînendeyê nûçeyan jî Zülküf Alp e.

## Umut Gazetesi

Umut Gazetesiyê (Rojnameya Hêvî) di salên 1970 de ji aliyê parêzer Turgut Akın ve dest bi weşanê kiriye. Kes nizane heta çend hejmaran derketiye û pişt re hatiye girtin.

## Ergani Haber Gazetesi

Ergani Haber gazetesi (Rojnameya Nûçeyan a Erxniyê) di sala 2000an de dest bi weşana xwe kiriye. Rojnameyeke heftane ye. Birêvbirê weşanê Esat Taştekin, gerînende û berpirsê nivîsan jî Zülküf Taştekin e.

## Ergani Söz Gazetesi

Erxeni Söz Gazetesi (Rojnameya Gotinê ya Erxeniyê) di sala 2004an de dest bi weşana xwe kiriye. Rojnameyeke heftane ye. Xwedî û berpirsê nivîsan Zülküf Aydın gerînendeyê nûçeyan Ekrem Sanver e.

**Arkadaş gazetesi**

Arkadaş Gazetesi (Rojnameya Heval) di 25ê cotmeha 1987an de dest bi waşana xwe kiriye. Gerînendeyê nûçeyan Hikmet Öztürk, xwedî Umit Öztürk û gerînendeyê nivîsan û berpirsê giştî Yaşar Öztürk, şêwirmendê huqûqî Parêzer M. Yaşar Can e. Rojnameya Arkadaş bi giştî 32 hejmar derketiye û piştre hatiye girtin.

# Du siyasetmedar û navdar

**Hesenê Dirêj**

Hesenê Dirêj (Uzun Hasan) di sala 1423an de li gundê Qileş (Şölen) ji dayik bûye. Bavê wî Celaleddîn Elî Beg hukimdarê Akkoyûniyan bûye. Piştî bavê wî birayê wî Cîhangîr dibe hukimdar. Di sala 1452an de birayê wî Cîhangîr di şer de dîl dikeve destê Qaraqoyûniyan. Ew di şûna birayê xwe de dibe hukimdar. Amed paytextê wî bûye. Hesenê Dirêj bi Osmaniyan re şerên dijwar kiriye. Ji Anatoliyê heta Xoresanê hukim kiriye. Di sala 1473an de ew û Fatîh li Otlukbeyliyê şerekî dijwar dikin. Hêzên Hesenê Dirêj têk diçin. Hesenê Dirêj ji wir bi şûn ve dev ji Anatoliyê ber dide û berê xwe bi rojhilat ve dike. Piştî şerê Otlukbeyliyê paytextê xwe ji Amedê dibe Tebrîzê. Di sala 1478an de li Tebrîzê wefat dike.

**Şewqî Beg**

Şewqî Beg ji navenda Erxeniyê ji malbateke xanedan, miroveki hişyar, welatparêz û cesûr bûye. Ew di sala 1920î de bûye serokê şaredariya Erxeniyê. Niha paşnavê malbata wan Yıldırım e.[23] Cegerxwîn di pirtûka Jînenîgariya xwe de dinivîse ku cara yekem ez ji Şewqî Begê Erxeniyî welatparêziyê hîn bûm. Cegerxwîn naskirina xwe û Şewqî Begê weha vedibêje.[24]

Cegerxwîn dinivîse ku "... *Min soz da Şewqî Begê ku ji vir bi şûn ve, ez ê ji bo welatê xwe bixebitim û min weha kir.*"

Salek piştî vê axaftina Şewqî Begê û Seydayê Cegerxwîn şerê Şêx Seîd dest pê dike. Di şerê Şêx Seîd de Şewqî Beg û hevalên xwe jî, di berêyê Erxeniyê de beşdarî dorpêçana Amedê bûne. Wek tê zhêzên Şêx Seîd li ber sûrên Amedê bi ser nakevin û bi paş ve vedikişin. Şewqî Beg jî bi dilxwaz û xwepêgirtiyên xwe bi paş ve vedikişin navçeya Erxeniyê. Rojeke lêşker

[23] Şewqi Beg kalê Aziz Yıldırımê serokê Fenerbeçeyê ye.
[24] Cegerxwîn, *Jînenigariya Min*, Apec, r.125, Stockholm

Şewqî Begê li nav bajêr digrin. Li nav Erxeniyê li ber qoşka Qehreman herdu destên wî dixin darê kelepçan û herdu lingên wî jî bi zencîr girê didin û li ser kursiyek didin rûniştandin. Leşker gaziyê xelkê dikin ku bên îbretê bibînin ku hukimeta Komarê çiqas bi hêz û mezin e. Bi qemçî û kûndarên tifingan li Şewqî Begê didin. Bi lêdanê re çêr, qerf û bi gotinên biçûkxistinî dikin ku dixwazin kesayetiya wî ya pak û bilind rencîde bikin. Xelkê bajarokê di nav tirs, xof, kîn û nefreteke de, li êşkence û lêdana hov temaşe dikin. Ser, dev poz û laşên Şewqî Begê di nav xwînê de dihêlin. Bobelatên nedîtî, mezin û giran bi serî wî de tînin. Weha dikin ku ji halê mirovî derdixin. Lê Şewqî Beg her serê xwe blind digre, paxa wan û lêdana wan nake, serî ji wan re naçimîne. Laş diçe, lê giyan û viyana xwe diparêze, li ber xwe dide. Roj û şeveke weha pê êşkence dikin, dixwazin wî teslîm bigrin, dinêrin ku bêfêde ye. Radibin Şewqî Begê bi perepaşkî li ker siwar dikin û di nav Erxeniyê de digerînin. Piştre dibêjin em Şewqî Begê dibin Xarpêtê dadgehê. Ew derdixin derî Erxeniyê li ser riya Erxenî û Madenê li herêma Pirûtê (niha radar li wir daçikandine) gulebaran dikin û dikujin. Piştre laşê wî bi qasutûre û qûndarên tifingan perçe perçe dikin. Dibêjin 'di rê de xwest ku bireve, me deng lê kir ranewestiye û leşker pêvedane û miriye.[25]

# Nivîskar û hunermend

**Kazım Vehbi Oral**

Kazim Vehbî Oral di sala 1894an de li Erxeniyê ji dayik bûye. Hem mamoste û hem jî şaîr e. Di dema xwe de di Meclisa Duyem a Komara Tirkiyê de bûye parlamenterê Erxeniyê. Helbestên wî yên bijarte di sala 1975an de wek pirtûk hatiye çap kirin. Ew di sala 1985an de miriye.

**Muzaffer Ünal**

Muzaffer Ünal di sala 1924an de li Erxeniyê hatiye dinê. Dibistana navîn neqedandiye û dest bi şoferiyê kiriye. Bi şoferiyê re ji helbestan hez kiriye û piştre destpê kiriye helbest nivîsiye. Du pirtûkên wî yên helbestan hene.

[25] Müslüm Üzülmez, Şevki Bey ve hakkındaki kimi bilgiler, 30 mayıs Ergani Haber gazetesi.

**Şerafettin Güneli**

Şerafettin Güneli di sala 1928an de li gundê Hîlarê hatiye dinê. Dibistana seretayî li gund û navenda Erxeniyê xwendiye. Li Amedê dest bi dibistana navîn û amadehiyê kiriye. Di sala 1940î de amadeyiyê neqedandiye û piştre çûye leşkeriye. Di sala 1951ê de çûye Şerê Korê û di sala 1952an de vegeriyaye. Di Bankaya Ziratê de dest bi kar kiriye. Piştre di gelek bankayan de kar kiriye. Di sala 1966an de bi navê *Bütün Yönleriyle Egani* pirtûkek nivîsiye. Di sala 2006an de miriye.

**Enver Atılgan**

Enver Atılgan di sala 1931ê de li Erxeniyê ji dayik bûye. Di sala 1949an ji dibistana mamosteyan a Dîclê mezûn bûye û mamostetî kiriye. Di komela mamosteyan TÖSê de wek berpirs kar kiriye. Di sendîqeyan de xebitiye. Bi helbestên xwe hatiye nas kirin. Bi navê *Nuhun Adamı û Ekocan* du pirtûkên wî yên helbestan hene.

**Sezai Karakoç**

Sezai Karakoç di sala 1933an de li Erxeniyê hatiye dinê. Dibistana seretayî li Erxeniyê ya navîn li Mereşê û amadeyiyê jî Dîlokê yatili xwendiye. Li Enqerê Fakulta Zanistî ya Polîtîk xwendiye. Diriliş Yayinevî vekiriye û bi heman navî kovar derxistiye. Bi piranî mijarên helbestên wî metafîk in û li ser ruhê berxwedana îslamî ne. Pişt re Partiya Diriliş ava kiriye û serokê wê yê giştî ye. Heta niha14 berhemên wî yên helbestan û 20 ên li ser ramanên îslamî û du pirtûkên wî yên çîrokan jî hene.

**Ali Fuat Uluturk**

Ali Fuat Ulîturk di sala 1933an de li Erxeniyê hatiye dinê. Li Erxeniyê xwendiye û bûye mamoste. Li gelek cihan mamostetî kiriye. Helbestvan e û bi tirkî nivîsiye. Mijarên berhemên wî bi giranî olî ne. Sê berhemên wî hene: *Ulkum, Bir milletin destani û İslam ve însan.*

**Ergün Sönmez**

Ergün Sönmez di sala 1938an de li Erxeniyê hatiye dinê. Dibistana seretayî û navîn li Erxeniyê û liseyê li Amedê xwendiye. Li Stanbulê dibistana rojnamegeriyê qedandiye. Di sala 1971ê de çûye li Almanyayê hem mamostetî kiriye û hem jî mastera xwe daye. Berhemên xwe bi almanî nivîsiye. Çend ji wan ev in: *Tirkiye û Yekitiya Ewropayê, Dîroka karkerên Tirkiyê çil salan, Dîroka sefaleta çil salan a xwendekar û mamosteyên û Tirkiyê.* Di heman demê ew bilûrvan û neygereke pir baş e.

**Şeref Yıldız**

Şeref Yıldız di sala 1942an de li gundê Şêxsiwar hatiye dinê. Dibistana seretayi li gund, navîn û amadeyiyê li Erxeniyê û zanîngehê jî li Stanbulê xwendiye. Li Stanbulê di nav rêxistinên xwendekaran de kar kiriye. Di sendîkeyan de xebitiye. Ji aliyê sîyayî ve ketiye nav TKP û di navenda wê de cih girtiye. Piştî 12ê îlonê derketiye derve û li Swêdê bi cih bûye. Li derve berpisiya TKP kiriye. Bi navê *'1960'lardan 1990'a Fırtınada Yürüyüş'* pirtûkek nivîsiye.

**Vecdi Subaşı**

Vecdi Subaşı di sala 1942an de li navenda Erxeniyê hatiye dinê. Dibistana seretayî û navîn li Erxeniyê û liseyê jî li Amedê xwendiye. Ji Falkulteya Huqûqê ya Enqerê mezûn e. Di gelek karên cihê cihê de xebitiye . Parêzgerî kiriye. Bi navê *Diyarıma Gidecck Zamanlar* pirtûkeke wî ya helbestan hatiye çap kirin.

**Osman Aközel**

Osman Aközel di sala 1943an de li Erxeniyê hatiye dinê. Dibistana seretayî, navîn û mamostetiyê li Erxeniyê xwendiye. Mamosteti kiriye û demeke di birêvebiriye sendîkaya DISKê kar kiriye. Di hema demê de wênekêş e. Heta niha pirtûka wî ya bi navê *Yaşam Korkusuz Olsun* hatiye weşandin. Du pirtûkên wî yên bi navên *Hadeki Dede (şano) û Tuzun Nimetleri* (lêkolîn) li ber çapê ne.

**Enver Yorulmaz**

Enver Yorulmaz di sala 1947an de li Erxeniyê hatiye dinê. Dibistana seretayî û navîn li Erxeniyê û amadeyiyê jî li Amedê xwendiye. Cara yekem li Amedê

di rojnameya Dîclê de nivîsiye. Li Zanîngeha Gazî beşa rojnameygeriyê xwendiye. Di sala 1972an de di nav CHPê kar kiriye. Di gelek rojname û kovaran de nivîsiye. Bi tirkî dinivîse. Li Enqerê dimîne heta niha roman, çîrok helbest û cureyên din nivîsiye. 15 pirtûkên wî hatine çap kirin. Pirtûka wî ya herî balkêş *Merhaba Ey Demokrasi* ye.

**M. Şehmus Güzel**

M. Şehmus Güzel di sala 1947an de li Erxeniyê hatiye dinê. Dibistana seretayî û navîn li Erxeniyê xwendiye. Li Stanbulê Amadeyiya Haydarpaşa xwendiye. Li Enqerê Fakulta Zanistiya Polîtîk qedandiye. Li Fransayê doktoreya xwe daye û di sala 1975an de vegeriye li Tirkiyê di gelek zanîngehan de ders daye. Di sala 1982an de çûye li Fransayê bi cih bûye. Li Fransayê di zanîngehan de mamostetî kiriye û bûye profesor. Bi tirkî û fransî dinivîse. Di gelek rojname û kovaran de nivîsên wî hatine weşandin û beşdarî gelek civîn û panelan bûye. Heta niha 30 bêtir pirtûkên wî hatine çap kiri. Navê çendan jê e v in: *Kurtler kendilerini anlatıyor, Avrupa Birliginde devlet Fransada Korsika, Kadin, aşk ve iktidar, Paris gösteri kenti, Paris Soba.*

**Müslüm Üzülmez**

Müslüm Üzülmez di 1950î de li Erxeniyê ji dayikbûye. Dibistana seretayi, navîn û amadeyiyê li Erxeniyê xwendiye. Li Enqerê Fakulta Muhendis û Mîmariyê qedandiye. Wek muhendis di gelek dem û dezgehan de kar kiriye. Demekê di sendika Baysenê de kar xebitiye. Piştî 12ê îlonê di doza TKP ê hatiye girtin du sal di girtigehê de maye. Di gelek rojname û kovaran de nivîsîye û dinivîse. Li Şaredariya Stanbulê wek muhendîs kar dike. Heta niha 12 pirtûkên wî hatine çep kirin. Ji wan çend ev in: *Makam, makam çiçeği ve bülbül, Uzun yürüyüştür yaşamak, Ben ölmeden geldim komutanım.*

**Hüneyin Kaygusuz**

Huneyin Kaygusuz di sala 1950î de li gundê Hîlarê hatiye dinê. Dibistana seretayî li gundê Tilxuzûrê , dibistan navîn û amadeyiyê li Erxenıyê xwendiye. Piştî eskeriyê li Stanbulê çûye dibistana polîsiyê û bûye polîs. Di sala 1983an de dest ji polîsiyê berdaye û wek karker di gelek karên cihê cihê de xebitiye. Ji karketiye û niha li gundê xwe bi çandinî û heywan xwedîkirinê

Institut kurde de Paris

ve mijûl e. Navê hemû gul, giha û şinahiyên Hîlarê bi kurdî nivîsiye. Bi navê *Hîlar-sosyal, kültürel ve doğal yaşama dair*- pirtûkeke wî heye.

**Naci Gümüş**

Naci Gümüş di sala 1951ê de li Erxeniyê hatiye dinê. Heta dibisata mamostetiyê li Erxeniyê xwendiye. Li gelek cihan mamostetî û mudurtî kiriye. Helbest û lêkolînên wî hene. Bi tirkî dinivîse. Di gelek pêşbirikan de xelat girtiye. Heta niha Pênc pirtûkên wî hatine çap kirin: *Bir Özge Mevsim (helbest), Gul Aydinligi (cerbandin), Bu Aşk Eskimez, Yeni Bu Sevda (helbest), Yeniden Başlamak (çîrok) û Aşk Galerisi.*

**Fevzi Karadeniz**

Fevzi Karadeniz di sala 1952an de gundê Çaqirfeqîr hatiye dinê. Ji dibistana seretayi heta amadeyiyê li Erxeniyê xwendiye. Li Stanbul huqûqê xwendiye. Sendîqawanî kiriye. Di TKPê kar kiriye. Piştî hatina cuntayaya 12ê îlonê derketiye der û li Fransê bi cih bûye. Bi tirkî dinivîse. Heta niha *Lal, Yarali Zamanlar, Eski zamanlar û Baş im Gözum Üstüne* çar pirtûkên wî hatine çap kirin.

**Hesenê Metê**

Hesenê Metê di sala 1957an de li Erxeniyê hatiye dinê. Heta amadeyiyê xwendiye. Piştî cunteya 1980î ji ber sedemên polîtîk derketiye derveyî welêt û li Swêdê bi cih bûye. Li Swêdê li dibistana bilind grafik xwendiye. Weşanxaneya Welat damezrandiye û çend pirtûkên kurdî çap kiriye. Hesenê Metê di kovar û rojnameyan de jî bi kurdî meqale nivîsiye. Heta niha *Smîrnoff* (novel), *Labîrenta cinan* (novel), *Epîlog* (novel), *Ardû* (çîrok), *Tofan* (novel), *Keça Kapîten* (Pûşkîn, werger), *Merivên Reben* (Dostoyevskî, werger), *Jiyana Rastîn* (Göran Tunström, werger), *Ansîklopediya Zarokan* (werger li gel, Alî Çiftçi, Mehmûd Lewendî, Seyîdxan Anter û Amed Tîgrîs), *Gername, Gotinên gunehkar* (novel) û *Li dêrê* (novel).

**Şeyhmus Aslan**

Şeymus Aslan di sala 1957an de li gundê Kolbextê hatiye dinê. Dibistana seretayî li gund û piştre dibistana Mamosteyan a Dîclê (Dicle Öğretmen

Institut kurde de Paris

okulu) xwendiye. Bi salan mamostetî kiriye. Di gelek kovaran de nivîs nivîsiye. *Kuzey Mezopotamya'nın Gani kenti Ergani, Ferhenga Gotinên Pêşiyan û Ferhenga Biwêjan* sê pirtûkên wî hatine çap kirin.

**Resul Üstün**

Resul Üstün di sala 1959an de li Erxeniyê hatiye dinê. Dibistana seretayî, navîn û amadeyiyê li Erxenî û Êlihê xwendiye. Di sala 1979an de, ji Enstîtuya Perwerdê ya Mêrdînê mezûn e. Li Amedê mamostetî dike. Heta niha ev berhemên wî derketine: *İkizleri ayırmayın- Toplumsal Egitimin Temel Kuralları, Zaman Pusuda* (helbest), *Deşifre Etme yalnızlıgımı* (helbest).

**Sedat Yurtdaş**

Sedat Yurtdaş di sala 1961ê de li gundê Cingirşînê hatiye dinê. Heta amadeyiyê li Erxeniyê xwendiye . Li Stanbulê huqûq qedandiye û piştre li Amedê dest bi parêzvaniyê kiriye. Di sala 1991ê bi îtîfaqa HEP û SHPê bûye parlamenterê Amedê. Di sala 1994an de partiya wan hatiye girtin û parlamenteriya wan hatiye iptalkirin û avêtine zîndanê. Piştî derketine ji girtîgehê li Amedê dîsa dest bi parêzgeriyê kiriye. Sedat Yurtdaş di gelek rojname û kovaran de bi kurdî û tirkî nivîsiye. Heta niha pênc pirtûkên wî hatine weşandin: *Orkestra yeni ezgiler çalacak* (helbest), *Bir gensoruda parlamento gerçeği* (ani-bîranîn), *İnsanlar düşünceler kavgalar, Remo-Bitmiyen sorgu* (roman) û *Xelat* (roman).

**Abdurrahman Üzülmez**

Abdurrahman Uzulmez di sala 1965an de li Erxeniyê hatiye dinê. Dibistana seretayî li Erxeniyê, ya navîn û li Elezîzê xwendiye. Li zanîngega Hacettepe beşa edebiyatê mezûn e. Li ser osmanî lîsans kiriye. Gelek salan mamostetî kiriye û wezereta perwerdeyê kar kiriye. Heta niha *Osmanlı Türkçesi (İlk Öğrenme Kitabı), Osmanlı Türkçesi (Metinler), Mahmud Şevket Paşa'dan "Osmanlı Askerlik Teşkilatı ve Kıyafetleri", Atatürk İlkeleri ve İnkılâp Tarihi* pirtûkên wî hatine çap kirin.

Institut kurde de Paris

**Aytekin Yılmaz**

Aytekin Yılmaz di sala 1967an de li gundê Ortayaziyê hatiye dinê. Li Erxeniyê dibistana seretayî û navîn xwendiye. Ketiye nav tevgera şoreşgerî hatiye girtin û di girtîhega Bayrampaşa de 9 sal û 4 meh maye. Di girtîgehê de dest bi nivîsê kiriye. Di sala 1997an de ji Rojnameya Özgur Gündemê xelata Mûsa Anter girtiye. Herweha xelata Navenda Çanda Mezopotamyayê ya filmê jî girtiye. Heta niha *Doğunun Talan ve inkarı, Çokkültürlülükten Tekkültürlülüğe "Anadolu", İçimizdeki Hapishane, Labirentin Sonu pirtûkên wî hatine çap kirin û Anadolu'nun Türkleştirilmesi, Ötekiler ve Kırıklar (cerbandin) û Güney Savaşı* (roman) pirtûkên wî jî li ber çapê ne.

**Vedat Çetin**

Vedat Çetin di sala 1961ê de li Erxeniyê ji dayik bûye. Ji amadeyiya Erxeniyê mezûn e. Nivîskar û rojnamevan e. Bi tirkî dinivîse. Di rojnameyên *Radikal, Demokrasi, Ülkede Gündem, Özgür Bakış, Alternatif, Evrensel û Günlüğün* de makaleyên wî hatine weşandin. Heta niha sê pirtûkên wî hatine çapkirin. *Yakılan ve boşaltılan köyler ve Göç (1999), Yorgun ve uzak* (2004), Bir şair bir şiir tiyatro (2002)

**Mem Mîrxan**

Mem Mîrxan di sala 1968an de li gundê Xidiraniyê hatiye dinê. Dibistana seretayî û navîn li gund û amadeyiyê li Erxeniyê xwendiye. Zanîngeha Dîclê beşa mamostetiyê qedandiye. Demeke mamostetî kiriye. Di Eğitim-Senê de aktîv kar kiriye. Ji ber xebatên xwe hatiye sirgûn kirin. Piştre dev ji mamostetiyê berdaye û hatiye di Şaredariya Mezin a Amedê de dest bi kar kiriye. Bûye berpirsê daîreya karker û karmendan. Niha di beşa turîzmê de berpirs e. Mem Mîrxan di kovarên *Pîne, Welat, Welatê Me, Azdiya Welat, Hîva* de nivîsiye. Demeke bûye berpirsê kovara '*W*' yê. Du pirtûkên wî ji bo çapê amade ne.

**Raif Yaman**

Raif Yaman di 27ê Adara 1968an da li gundê Gomaîgê hatiye dinê. Gomaîg gundekî li ser Erxenî ye. Carinan navê Rojhat Azadî bi kar anîye. Dibistana seretayî li Gomaîgê, a navendî li Erxenî û amadeyiyê jî li Bursayê xwendiye.

Li Zanîngeha Enqerê di Fakulta Ziman Dîrok û Erdnîgariyê, li Fîlolojiya Fransî perwerdehiya lîsansê kiriye. Dawiya sala 1993an li Navenda Çanda Mezopotamyayê dest bi edîtoriya kovara *Rewşenê* kiriye. Di gelek kovar û rojnameyan de nivîs nivîsiye. Di heman demê de wergera fransî kiriye. Navê pirtûka wî ya pêşîn, *Xewna Avê* û ya duyem jî *Şevên Payizê* ye. Niha li şaredariya Nisêbînê kar dike.

**Mehmet Oguz**

Mehmet Oguz di sala 1974an de li Erxeniyê hatiye dinê. Dibistana seretayî, navîn û amadeyiyê li Erxeniyê xwendiye. Li Zanîngeha Wanê beşa dîrokê qedandiye. Di gelek kovar û rojnameyan de nivîs û helbestên wî derketine. Diyarî girtiye. Helbestvan e. Di *Ergani Haber* û *Ergani Postê* de nivîsê wî derketine. Pirtûka wî ya helbestan a yekem *Sus kuyu sus* e.

**Hayri Çakmak**

Hayri Çakmak di sala 1972an de li Erxeniyê hatiye dinê. Ji destpêkê heta zanîngehê li Erxeniyê xwendiye. Ji Falkulteya Perwerdêhiyê ya Zanîngeha Dîclê mezûn e. Mamostetî dike. Helbest û çîrokan dinivîse. Di gelek kovar û malperan de helbest û nivîsên wî hatine weşandin. Bi navê *Lal* pirtûkeke wî ya helbestan hatiye çap kirin.

**Kemal Varol**

Kemal Varal di sala 1977an de li Erxeniyê hatiye dinê. Heta amadeyiyê li Erxeniyê xwendiye. Ji Falkulteya Perwerdehiya Dîclê mezûn e. Li ser zimanê tirkî lîsans daye. Dest bi mamostetiyê kiriye. Di gelek rojname û kovaran de nivîsên rojane û krîtîk dinivîse. Bi tirkî dinivîse. Di radyo û Tv yan de bername pêşkêş kiriye. Sê berhemên wî hene: Y*as Yüzükleri, Kin Divanı û Temmuzzun On Sekizi.*

**Gulistan Çoban**

Gulistan Çoban di sala 1990î de, li gundê Îgirm (Uzunagaç) ji dayik bûye. Wê li gund dibistana seretayî xwendiye. Bi kurdî û tirkî helbest dinivîse. Helbestên wê yên bi kurdî heta niha wek pirtûk nehatine çap kirin. Lêbelê bi

tirkî du pirtûkên wê yên helbestan hatine çap kirin. Navê ya yekem *Asilerin Dönüşü* û ya duyem jî *Elma Kokusu* ye. Romaneke wê jî heye, lê ew hîn nehatiye çap kirin.

**Rewşen Tunc**

Rewşen Tunc, di sala 1984an de li Huddingeyê ku li ser bajarê Stockholmê ye hatiye dinê. Bi eslê xwe ji Erxeniyê ye. Hemû xwendina xwe li wir kiriye. Keça nivîskarê Kurd Hesenê Metê ye. Wê heta niha ji swêdî şeş pirtûkên zarokan wergerandiye kurdî û ev her şeş pirtûk ji aliyê weşanxaneya APECê ve hatine çapkirin: *Rindo û mêvanên xwe, Birayê Emmayê nexweş e, Pîppîya Goredirêj li Humlegordenê, Ture li ber bayî difire, Ture rûdine û mêze dike, Lîsa otobusê dipê.*

## Stranbêj û hunermend

**Zulfikar Yumruk**

Zulfikar Yumruk li Erxeniyê hatiye dinê. Navê wî yê stranbêjî Gulo ye. Dengbêjeke bi navûdengê dema xwe ye. Di salên 1970î xwestiye li Stanbulê sêlika stranê xwe çap bike, lê ji ber qedexebûna kurdî nikaribûye sêlik bide çêkirin. Piştre li Almanya sêlika wî hatiye çap kirin û bi dizî anîne welat. Heta niha 60 kasetên wê hatine tomar kirin.

**Haviz Zilfo**

Haviz Zilfo ji taxa Baygurê bû. Keç an jina wî her roj bi dest digirt û danî stasyona Erxeniyê ku nêzîkî dibistana Mamostayan a Dîclê bû. Her ku tren dihat, wî dest pê dikir û pif dikir bilûrê û bi destî digirtin û li ber vagon vagon digerandin. Rêwiyan pere û tiştên xwarinê dawêtin dawa keç an jina wî ku bi destî digirt. Wî bilûreke weha pif dikir ku kezeba mirov dimihand û dilê mirov diqedand. Tu bilûrvan nikaribû bigeje asta wê hunerî. Bi taybetî dema maqamê Cembelî lêdida, guveguv ji bilûra wî diçû, her deh tiliyên wî li ser kunên bilûrê direqisîn. Vedigerand meqamê ku pez bi tîh dibir ser avê û bi tîh dianî. Meqamê *Pezoguro* şanogeriya klasîk a kurdî ya herî bilind bû.[26]

[26] Me di navbera salên 1963-1969an li dibistan mamosteti dixwend û her berêvarê dema hatina trênê em xwendekar diçûn stasyonê û guhdariya bilûra Xalê Zilfo dikir. (Amed Tigris)



Dimenek ji Meqam
Foto: Ahmet Dogru

**Emin Turgay**

Di sala 1945an de li taxa Bayqurê hatiye dinê. Sêwî maye. Ji ber sedemên aboriyê zor bela dibistana seretayî xwendiye. Di çayxane û xwarinxanan de kar kiriye. Ji ber deng û awazê xweş êvaran jî di pafyon û bexçeyan de stran gotiye. Strana wî ya herî davdar bi nîv kurdî û nîv tirkî ye. *"Yabanci degilim pismamê te me."* Piştî vegera wî ya leşkeriyê di radyoya Amedê de wek stranêjekî Tirk dest bi kar kiriye. Piştre çûye Stanbulê. Gelek sêlik, kaset tomar kiriye û di çend filmên sînemayê de rol girtiye.

**Emrah İpek**

Emrah îpek di sala 1971ê li Erxeniyê hatiye dinê. Wek Emin Turgay ew jî hin biçûk bûye ku bavê wî miriye bi diya xwe re çûye Madenê û li wir dest

bi dibistana seretayî kiriye. Piştre koçê Amedê kirine. Ji ber feqîrî û bêkesiyê nikaribûye bixwîne. Bi tirkî dibêje. Dest bi erebeskên ax û waxê kiriye. Ji bo ku dengê wî xweş bûye di pavyonan de stran gotiye, bi amatorî kaset tomar kiriye. Cara yekem bi awayekî profesyonelî piştî salên 1980î bi navê Küçük Emreh (Emrehê Buçûk) hatiye nas kirin. Gelek kaset, video û fîlmê wî hene.

**Burhan Berken**

Burhan Berken di sala 1969an de li Erxeniyê hatiye dinê. Ji malbateke dengbêjan e. Di sala 1986an de dest bi muzîkê û stranan kiriye. Bi kurdî distre û muzîka wî bi kurdî ye. Li ser bingehê dengbêjî û muzîka kurdî ya klasîk a nûjen ava dike. Di pîşe û hunerê xwe de tim guherbar e. Cd ya wî ya yekem Ba ye. Navê CD ya wî ya duyem jî Jehr û Evîn e.

**Lütfi Çakar**

Lütfi Çakar di sala 1962an de li Erxeniyê hatiye dinê. Heta amadeyiyê li Erxeniyê xwendiye. Karîkatorîstekî bi navûdeng e. Heta niha di kovar û rojnameyên wek *Gicik, Girgir, Yeni Asir, Limon, Çarşaf* û hwd. de karîkatorên wî hatine weşandin. Gelek pêşangeh vekiriye. Di pêşbirikan de xelat girtiye.

**Evdilê Qado**

Evdilê Qado di sala 1934an de, li gundê Koteka ji diya xwe bûye. Dibistan nexwendiye. Bi eslê xwe ji eşîra Cemaldînî ye. Ji Colemêrgê, ji navçeya Geverê ye. Malbata wî bi qasî 150- 160 sal berê hatiye Amedê, gundê Dixanê. Li gund cotkariyê kiriye. Ji zaroktiya xwe ve stranan dibêje. Di sala 1985an de koçî Amedê kiriye. Gelek stranan dizane. Kurê wî Ekrem jî dengbêj e.

**Seyidxanê Boyaxçî**

Seyidxanê Boyaxçî (Seydo Şimşek) di sala 1938an de li Lexeriyê ku mezreya gundê Xençerlî ye, hatiye dinê. Hîn di biçûktiya xwe de dê û bavê xwe winda kiriye û li cem apê xwe mezin bûye. Dibistan nexwendiye. Ji 15 saliya xwe ve stranan dibêje. Ji civat û dawetan hînî stranan bûye. Li gund heta bîst saliya xwe karên wekî cotkarî û şivaniyê kiriye. Piştre koçî navenda Amedê kiriye. Li Amedê 25 salan boyaxcitiya solan kiriye. Demeke dirêj li şaredariye bûye



Institut kurde de Paris

karkerê çop berhevkirinê. Heta salên 1980î her du karan bi hev re domandiye. Di sala 1980î de bûye malnişîn.

**Emînê Bêrtî**

Emînê Bêrtî (Emin Şenol), di sala 1956an de li navçeya Erxenê, li gundê Duxanê hatiye dinê. Dibistan nexwendiye. Ji neh saliya xwe ve heta niha stranan dibêje. Stranên ku dibêje ji dengbêjên ku navê wan nayê bîra wî hîn bûye. Li gund hem erdê xwe ajotiye hem jî heywan xwedî kiriye. Ji Palo ya Xerpûtê hatine gundê Duxanê. Bi eslê xwe kurmanc e. Di 1974an de diçe Çewlikê û 6 salan li navçeya Solxanê dimîne. Li wê derê karê esnafiyê dike. Ji Solaxanê diçe Mêrsînê şeş salan jî li wir dimîne. Li Mêrsînê di karê çêkirina avahiyan de dixebite.. 11 sal in ku li Gebzeyê ye. CD yeke wî heye.

# Gundên Erxeniyê

**Amedî** (Armutova) dikeve rojavayê Erxeniyê û 25 km ji Erxeniyê dûr e. Gund li ser girikê Amedî hatiye avakirin. Gundekî kevn, newal û geliyên wê yên kûr hene. Hinarên gund bi nav û deg in. Nifûsa gund 568 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Aqçaqele** (Akçakale) dikeve başûrê Erxeniyê, ji Erxniyê 18 û ji Amedê jî 80 km dûr e. Li ser girekî hatiye avakirin. Gundê niha di sedsala 17an de ji aliyê Keya Mehmûd ve hatiye avakirin. Bi navê Kaniya Maran kaniyeke dîrokî heye. Tê gotin di zemanê berê di vê kaniyê de mar derdiketin, loma ev nav lê kirine. Ciyê cin û periyan bûye. Nifûsa gund 1667 e. Tirbesipî (Aydogdu), Hesenwêran (Hasanören) di salên 1920î de ji gundên çiya hatine û ev mezre ava kirine. Paşê bi navên Axçê Mirik (Açıkdilek), Ezvalî (Azabadi) di salên 1960î de ji gundê çiya hatine û ev mezre ava kirine. Kuça Kera, Revo, Şêxgur, Xirbereş (Yediören) mezreyên wê ne. Li gund dibistan, mizgeft, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Axuran** (Bahçekaşı) dikeve rojavayê Erxeniyê û 3 km ji Erxeniyê dûr e. Li pişt çiyayê Lifi ye. Niha 10-11 mal li gund mane. Gund nêzîkî fabrîkaya çîmentoyê û toza fabrîkê zerareke mezin daye gund û loma piraniya gundiyan bar kirine navenda Erxeniyê.

**Barbîn** (Çukurdere) dikeve bakurê Erxeniyê û 9 km ji Erxeniyê dûr. Gundekî çiyayî û di nav newalê de ye. Zevî kêm in. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Nifûsa gund 376 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Belaxura Ulya** (Yamaçlar) dikeve başûrê rojava û 14 km ji Erxeniyê dûr e. Di şerê Osmanî û Rûsan de çend malbat Gurciyên ku ji Qafqasyayê hatine anîne li gund bi cih kirine. Nifûsa gund 280 e. Bi navê Dartavî mezreyek wê heye. Mezre navê xwe ji Bîra Dartaviyê girtiye. Bîra Dartaviyê bîreke weha ye ku bihar havîn sewiya ava wê wek xwe ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Bervan** (Üçkardeş) dikeve başûrê Erxeniyê û 15 km ji Erxeniyê dûr e. Xelkê gund di salên 1600î de ji aliyê Wêranşehrê hatine û gund avakirine. Navê mezinê wan yê pêşîn Kadê bûye. Piştî avakirina Bervanê bi salan şûn ve ji Bervanê li derdora xwe çend gundên din jî avakirine. Ji wan gundan Selman, Qeyan, Gulan, Qizwan, Giryan û Zendelan. Ji derî van gundan nîvê gundê Înko jî ji Berwanê çûne. Yani ev gundî hemû mirovên hev in. Mizgefta gund kevn e. Li çiyayê gund goristaneke qedîm heye û li nav vê goristanê zîyareteke bi navûdeng heye ku xelkê ji herêmê tên tewafiya zîaretê. Li çiyayê pişt gund şikeftên Kîkan heye. Nifûsa gund 290 e. Di salên 1990an de gund ji aliyê dewletê ve hat valakirin lê niha beşek ji wan bi paş ve vegerîne û veger berdewam e. Giryan (Güneşalan) mezreya wê ye. Giryan ji du taxan pêk tê. Taxa li ser gir navê wê Girê Hemê Reso ye. Ya din jî Girê Merwan e. Li gund telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Bîrîma** (Yapraklı) dikeve bakurê rojavayê Erxeniyê û 10 km ji Erxeniyê dûr e. Rezên gund hene û heywan xwedî dikin. Çandinî ne zêde ye. Nifûsa gund 400 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Caferan** dikeve başûrê rojhilat Erxeniyên û 18 km ji Erxeniyê dûr e. Berê mezreya gundê Dîvana bû û niha gund e. Gundî di mehên havînê de diçin çiyayê Meryane û heta payîzê li wir dimînin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Cingiş** (Çakartaş) dikeve başûrê Erxeniyê û 24 km ji Erxeniyê dûr e. Li deşta Gewran nêzîkî sînorê Çêrmûgê ye. Gund li ser girek e ku kevirên çaqmaq jê derdixin. Li nav gund gireke mezin heye dibêjin ku di zemanê berê de ev bajarê cinan bûye. Gundî di zamanê berê de ji gundê Bedvana Çêrmûgê hatine û li wir gund avakirine. Sedat Yurtdaş ji vî gundî ye. Nifûsa gund 350 e. Şarig (Sarık), Taviran û Delhêj (Kayışlı) mezreyên wê ne. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Çaqirfeqîr** (Çakırfakir) dikeve başûrê rojavayê Erxeniyê û 20 km ji Erxeniyê dûr e. Li ser girekeî biçûk hatiye avakirin. Kevirên çaqmaq li vî gundî derdixin. Di sala 1939an de li Madenê fabrîka avakirin û ji vir kevirên çaqmaq dibirin fabrîkaya Madenê. Nifûsa gund 150 e. Çakmak mezreya wê ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Çayana Bêdê** (Gülerce) dikeve başûrê Erxeniyê û 7 km ji Erxeniyê dûr e. Li deşta Gewran e. Bi navê Elbasî (Elbasti) û Çayana Ozo (Çayan) du mezreyên wê hene. Nifûsa gund 300 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Devewêran** (Develi) dikeve başûrê Erxeniyê û 30 km ji Erxeniyê dûr e. Li nav deşta Gewran e. Nêzîkî Qerecdaxê ye û dikeve sînorê Amedê. Tirvekî (Karaburcak), Bizmara (Kaymaz), Avrenç, Gola Deve (Devegolu), Sarikaya û Sekûçek mezreyên wê ne. Nifûsa gund 500 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Dimirli** (Dümürlü/Demirli) dikeve başûrê Erxniyê, nêzîkî Qerejdaxê, riya Amed û Siwêregê ye û 45 km ji Erxeniyê dûr. Ji ber ku ji Erxeniyê dûr e, têkiliyên gund zêde bi ser Amed û Siwêregê ye. Gundî Îzolî ne û ji mala Bedirxan Axa ne. Di dema şerê Şêx Seîd de neviyê Bedirxan Axa Temûr Axa bi îdeaya ku alîkariya Şêx Seîd kiriye ji aliyê dewletê ve hatiye bi dar ve kirin. Piştre Îzolî hatine surgûn kirin. Çend sal piştre bi paş ve vegerîne. Birinca gund bi navûdeng e. Zivistanan koçer tên û zevî kirê dikin. Nifûsa gund 385 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris

**Dîwana** (Morkoyun) dikeve başûrê rojhilatê Erxeniyê. Ji Erxeniyê 20 km û ji Amedê jî 40 km dûr e. Tixûbê gund bi bajaroka Gêle ve ye. Gund bi mezreyên xwe ve di nav çiyayê Dîvana de ne. Gund navê xwe ji çiya girtiye. Bejitiya gund li ser ziman bûye destan. Enver Atılgan li ser bejitiya gund gelek tişt nivîsiye. Di van salên dawî de, bi sondajê Dîvanî ji bêaviyê rizgar bûn. Aboriya gundiyan bi xwedîkirina heywanan e. Ji eşîra Pêçarî ne. Nifûsa gund 300 e. Bi navê Hor mezreyek wê heye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Duxan** (Doğan) dikeve başûrê Erxeniyê û 28 km ji Erxeniyê dûr e. Gundekî biçûk e lê çend mezreyên wê hene. Gundî mêrg û merayên xwe bi kirê didin koçeran. Nifûsa gund 1750 e. Elmedîn (Coşkun), Kundir, Xana Gewra (Han), Boç (Buzluca), Qotêpirê (Köprü) mezreyên wê ne. Li mezreya Xanê dibistaneke 8 polî heye û piştî polên pêncan ji mezreyan û gundên derdorê şagird diçin vê dibistanê. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, nexweşxane, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Elîdaş** (Alitaşı) dikeve başûrê Erxeniyê, heta dikeve başûrê riya Amed û Siwêregê û 40 km ji Erxeniyê dûr e. Gundê Erxeniyê herî dûr e û li Qerecdaxê ye. Araziyê gund kevir e. Ciyê çêra pez e. Bêrtî zivistanan pezên xwe dibin vê herêmê û heta biharê li wir dimînin. Nifûsa gund 1359 e. Berdil, Birgenî, Boxazek, Konaxik (Bagtaşi), Çeto (Dagdalik), Kulfeqîr (Erdogan), Çaqçaqî (Görmuşler), Kanî (kavakli), Kanîxurka, Kelabîto, Şengalek, Zeydenîk Toytarlasi), Kûrek (yedikuyu) û Zorava mezreyên gund in. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund asfalt e.

**Eyneto** (Gözekaya) dikeve rojhilatê Erxeniyê û 10 km ji Erxeniyê dûr e. Ji riya Erxenî û Pîranê 2 km dûr e û li bin berpalê çiyê ye. Xwedî rez, pez in û zeviyên gund kêm in. Nifûsa gund ji 1000î bêtir e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Gîsgîs** (Kesentaş) dikeve rojavayê Erxeniyê û15 km ji Erxeniyê dûr e. Li ser riya Erxenî Çêrmûgê ye. Gundekî kevn û dîrokî ye. Bi kêmasî dîroka gund digehe heta 1000 salan. Di dema xwe de li ser riya Hevrîşim bûye. Li herêmê

Institut Kurde de Paris

cihên kevn û dîrokî ev in: Girê Aldînê, Kevirê Gewr, Kevirê Sosina, Mendika, Bihivê û Kelê. Li gor gotinan cara yekem gund ji aliyê Ermeniyan ve hatiye avakirin. Di nav tixûbên gund de çar cihên xerabe yên dîrokî hene. Li qeraxe çemê Sincikê li girê Tendûrekê nawis û şikeftên kolandî hene. Nifûsa gund nêzîkî 300î ye. Ji gund kesên xwenda pir in û bi taybetî jî mamoste ne. Li gund dibistan, mizgeft, nexweşxane û qereqol hene. Riya gund asfalt e.

**Gîsto** (Çayköy) dikeve bakurê Erxeniyê û 15 km ji Erxeniyê dûr. Li bin çiyayê Elî ye û li çemê Madenê dinêre. Beşek ji araziyên gund ketin ber ava bendava Keça Qiral. Nifûsa gund 350 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Gogicî** (Gökiçi) dikeve başûrê Erxeniyê û 32 km ji Erxeniyê dûr e. Zeviyên gund ji bo çandiniyê zêde ne, baş in û heywan xwedî dikin. Di adara 2002an de li herêma gund çend bîrên petrolê hatin kolan û niha ji bîra Gökiçi-1 petrol derdikeve. Nifûsa gund 200 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Gomayêk** (Kortaş) dikeve bakurê rojavayê Erxeniyê. Gomayik tê wateya çal û kortalê û 12 km ji Erxeniyê dûr e. Riya trênê di ber re derbas dibe. Di nav çiyayên Madenê de ye. Rez û bexçe hene. Nifûsa gund nêzîkî 1000î ye. Malê Beroj, Fevkanî, Tehtanî, sê mezreyên wê ne. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Gozlî** (Gözlü) dikeve başûrê Erxeniyê, li deşta Gewran e. Li qûntara girekî mezin hatiye avakirin. 20 km ji Erxeniyê dûr e. Xwediyê gund eşrafên navenda Erxeniyê ne. Nifûsa gund 870 e. Kabasakal, Kertil û Kubik mezreyên wê ne. Di salên 1950î de ji herêma çiyê hatine û Kubikê avakirine. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Hacî Eyûb** (Sabırlı) dikeve bakurê rojhilatê Erxeniyê û 8 km ji Erxeniyê dûr e. Li qûntara çiyayê Saqiz hatiye avakirin. Gundî bi kirmanckî dipeyivin. Çandinî kêm e, heywan xwedî dikin. Nifûsa gund niha nêzîkî 120î ye. Sabirliya Jêrîn û Sabirliya Jorîn du mezreyên wê ne. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Hafselm** (Bademli) dikeve rojhilatê Erxeniyê û 20 km ji Erxeniyê dûr e. Li ser riya Erxenî û Pîranê bi qasî 1.5 km ji rê dûr e. Li qûntara rojhilatê çiyayê Kilesê ye. Şikeftên Hafseml gelek balkêş in. Demek bûye navenda Alayên Hamidiyê. Berê gundê Ermaniyan bûye. Niha li gund hejmara xwendekaran pir e. Nifûsa gund nêzîkî 300î ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Herbeto** (Yeşilköy) dikeve rojavayê Erxeniyê û 6 km ji Erxeniyê dûr e. Li ser riya Erxenî û Çêrmûgê li deşta Êlyayê ye. Zeviyên gund bi ava çemê Boxazê tên avdan. Di salên 1956a de gund ji bo macîrên Bulgaristanê hatiye amade kirin. Macir zêde nemane û gund firotin mala Guldoğanan. Niha gund di destê wan da ye. Nifûsa gund nêzîkî 70î ye. Li gund mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Hîlar** (Sesverenpinar) dikeve başûrê Erxeniyê û 7 km ji Erxeniyê dûr e. Li başûrê deşta Êlyê li qûntara çiyê ye. Wateya navê gund çi ye û bi çi zimanî ye, kes nizane. Lê rastiyeke dîrokî heye di navbera salên 1035-1036an de Ermeniyan gotine 'Alar' û misilmanan jî gotine 'Hîlar.' Ji derveyî vê gelek gotegot hene ku ne rast in. Şiroveyên nivîskarên nîjadperest in. Hîlar gundekî gelek dîrokî ye. Hîlara îroyî li nav kevir û zinarên dîrokî hatiye avakirin. Dîroka Hîlarê dûr û kûr e. Ne bi tenê li Mezopotamya û Kurdistanê herweha li her derê dinê dikeve nav şaristaniya kevn. Ji sala 1963an ve Zanîngeha Chicago li Hîlarê li Qotê Berçem lêkolînan dikin. Arkeologan heta niha gelek dokumentê dîrokî bi dest xistine. Tê texmîn kirin ku li herêmê cara yekem mirovan li wir dest bi şarisatniyê kirine. Mal avakirine û heywan xwedî kirine. Li gor lêkolînên arkeologan 11 hezar sal berî niha li Qotê Berçem mirov jîyane. 7500 sal berî mîladê cot û cebar hatine kirin û hubûbat hatine çandin. Herweha amûrên hilberînê wek gîsin, çakûç, bêr û tevrikan çêkirine. Ji derî Qotê Berçem li Hîlarê gelek şikeft, nawis û sarnic jî hene. Bi tenê hejmara nawisan 23 e. Hîlar ne bi tenê ciheke dîrokî ye herweha ji berê ve gundekî welatparêz e jî. Di sala 1925an de piştî şikestina Şêx Seîd Axayê Hîlarê Hamîd û birayê wî Mecîd sirgûnê Anatoliyê kirine. Piştî vegera sirgûnê di sala 1940î de lawê Hamîd Axa cara yekem traktoreke dikire û tîne Erxeniyê.[27] Dibe ku ev Traktora yekem be ku hatibe wîlayeta Amedê. Hîlar herweha gundê xwenda

[27] Müslüm Üzülmez, *On Bin Yıllık Tarihin Tanığı HİLAR*, Arkeoloji ve Sanat Yayınları-2009

û rewşenbîran e. Ji berê ve gelek xwendekar ji gund derketine. Di sala 1937an de li nêzîkî gund riya trêne ku ji Hayderpaşa-Kurtalan xet çêkirin, stasyona trênê ya Erexeniyê li nêzîkî gunda hat çêkirin. Di sala 1944an de jî di navbera Hîlar û stasyonê de Dibistana Mamostetiyê hat çêkirin. Êdî Hîlar bûye gundekî atraktîv. Piraniya zarokên gundiyan dest bi xwendinê kirine. Gelek kesên navdar ji gund derketine. Îro 27 mal û 280 kes li gund dijîn. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Înko** (Yeniköy) dikeve başûrê Erxeniyê û 14 km ji Erxeniyê dûr e. Li devê çemê Boxazê li ser girekî biçûk hatiye avakirin. Di salên 1960an de cara yekem bi navê Sakîne jineke bûye muxtarê gund. Nifûs gund ji 200î bêtir e. Bi navê Tilkadî (Tümtepe) û Torç du mezreyên wê hene. Li gund telefon û elektrîk hene. Riya qûmkirî ye.

**Încexidir** (İncehıdır) dikeve başûrê rojavayê Erxeniyê li ser riya Çaqmaqê ye û 35 km ji Erxeniyê dûr. Zevî kêm in û arazî bi kevir e. Nifûsa gund li derdora 2600î ye. Gundê Erxeniyê ku herî mezreyên wê zêde ne. 21 Mezreyên gund hene: Alxo, Berba, Bitikcî, Berojek (Asagi Bitikci), Bostanek, Çirik, Gutotik (Bito), Hamok, Momik, Mûrşil, Newala Misk (Sutyuzu), Pembolix (Pamuklu), Pozê Saqizê (Sakizburnu), Kambab, Rezê Mistê (Mustafabagi), Savaş, Sêbirka, Sêguherik (Gecitli), Serçavî (Mazli), Siltantepe û Sêkuçka (Sorik) li ser Încexidirê ne. Li gund nexweşxane, dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Kalemdan** (Değirmendere) dikeve bakurê rojavayê Erxeniyê, li ber ava çemê Madenê ye û 10 km ji Erxeniyê dûr e. Gundekî kevn ê dîrokî ye. Gundî bi zarayên kurmancî û kirmanckî dipeyivin. Nifûsa gund 165 e. Bi navê Pire (Köprüköyü) mezreyeke wê heye. Piştî ku bendava Keça Qral hatiye çêkirin, gund ketiye keviyê avê. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Ken** (Üzümlü) dikeve başûrê rojhilatê Erxeniyê û 22 km ji Erxeniyê dûr e. Heta van salên dawî mezreya Dîwanê bû niha statûya gund girtiye. Havînan diçin zozanên pişt çiyayê Meryeman. Nifûsa gund 250 heye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris

**Kayan** (Kayan) dikeve başûrê Erxeniyê û 15 km ji Erxeniyê dûr e. Li deşta Gewran, dikeve ser riya Çaqmaqê. Nifûsa gund li derdora300î ye. Bi navê Kayiksan mezreyek wê heye. Li mezreyê şikeftên dîrokî hene. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Kilîsa Kira** (Kirklar kilisesi/Kıralan) dikeve rojhilatê Erxeniyê, 2 km ji Erxeniyê dûr e. Nifûsa gund 100 e. Elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kinera Mezin** (Kavurmaküpü) dikeve bakurê Erxeniyê û 5 km ji Erxeniyê dûr e. Li ser riya Erxenî û Madenê li berpalê çiya yê Meryema ye. Li herêma gund cihên kevn hene. Dêreke xerabe heye. Li qûntara çiyê aliyê Madenê şikeft û ji tehtên kolandî yên Çelderence hene. Rez û bexçeyên gund bi navûdeng in. Piştî 1993an gund ji aliyê dewletê ve hatiye vala kirin, lê niha çend mal bi paş ve vegerîne. Elektrîk û telefon hene û riya gund qûmkirî ye.

**Kolbext** (Bozyer) dikeve başûrê Erxeniyê û 11 km ji Erxeniyê dûr. Gund li kêleka çemê Mişan li ser Kendalê Hecî hatiye avakirin. Li gund Dara Camiyê sembola gund e û ji dûr ve wek minareya mizgeftê xuya dike. Araziyên gund dikevin deşta Gewran û axeke bi ber û bereket e. Nifûsa gund 470 e. Du mezreyên wê hene. Ji Yekê re Mala Evdî (Vargiya) û ji ya din re jî dibêjin Keleşa. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Kotekan** (Yakacık) dıkeve bakurê rojhilatê Erxeniyê û 10 km ji Erxeniyê dûr e. Bi gundê Şêxan tê nas kirin. Pîrozgeheke li gund heye her rojê sêşeman xelk diçe tewafê. Li qeraxê çemê Hersinê bi navê Hersinê mezreyekê wê heye. Nifûsa gund 340 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kumçî** (Kumçi) dikeve başûrê Erxeniyê. Ji Erxeniyê 21 km û ji Amedê 100 km ji dûr e. Avakerê gund Gulo ye. Axa ji bo çandiniyê kêm e, erd kevir û gir in. Gundî heywan xwedî dikin. Nifûsa gund 300 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kumdam** (Güzelyurt) dikeve başûrê Erxeniyê û13 km ji Erxeniyê dûr e. Li qeraxê çemê Boxazê û li deşta Gewran e û embara tene ye. Nifûsa gund

Institut kurde de Paris

280 e. Tilxûm (Yüksel) mezreya wê ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Macira/Belaxura Jêrîn** (Ortayazı) dikeve başûrê rojavayê Erxeniyê li deşta Êlyê ye û 7 km ji Erxeniyê dûr e. Nifûsa gund 180 e. Û li ser riya Erxenî û Çêrmûgê ye. Gundekî Gurciyan e. Dema Kurt Îsmaîl Paşa li Amedê bûye, di salên1877-1878an de ji Gurcistanê hatine û li Erxeniyê bi cih bûne. Mîmariya gund ji gundên Kurdan cuda ye. Xaniyên wan bi keviran du qati hatine çekirin baniyen xaniyan jî bi kremît e. Gundî bi tevî hatine asîmile kirin û tu kes bi zimanê gurcî nizane. Lê çanda Gurciyan hîn jî di nav gundiyan de maye. Li gund rejiya xwendin û nivîsandine%100 e û ji %80 î gundiyan perwerdeya bilind kirine. Ji ber xwendine kesên ku dixwinin êdi bi paş ve venagerin gund û her ku diçe hejmara gundiyan kêm dibe. Bi ava çemê Boxazê kanal hene zeviyên gund bi hubûbat re çandiniya pincara şekir û pembo jî tê kirin. Ji sala 1937an ve li gund dibistan heye. Li gund mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Mala Demo** (Ortaağaç) dikeve bakurê rojavayê Erxeniyê û 7 km ji Erxeniyê dûr e. Ji ber ku navê avakarê gund Demo bûye, navê gund jî Mala Demo maye. Gund bi mezreyên xwe ve di nav çiyayê Madenê de ne. Di nav araziyên gund de krom derdikeve û ji ber vê yekê şirketê ji gundiyan re hinek xaniyên nû çêkiriye. Nifûsa gund 630 e. Bi navên Mala Bîlal (Kolbaşi), Mala Pûşiya (Surekli), Bişara û Mala Dîko (Ayrancilar) çar mezreyên wê hene. Mezra pêncan Mezreya Hucum bû. Ji ber bûyerên herêmê gund niha vala ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Mala Salê** (Sallar) dikeve rojavayê Erxeniyê û 9 km ji Erxeniyê dûr e. Deşteke wê ya biçûk heye û navê wê Rastê ye. Nifûsa gund 220 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Malan** (Pınarkaya) dikeve rojavayê Erxeniyê û 7 km ji Erxeniyê dûr e. Li ser riya Erxenî û Çêrmûgê ye. Gundekî biçûk e. Nifûsa gund 150 heye. Keydaliya (Gedikler) mezreya wê ye. Mezre bi qasî 2 km li bakurê gund e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Malikan** (Karpuzlu) dikeve başûrê rojhilatê Erxeniyê û 16 km ji Erxeniyê dûr e. Gund li deşta Gewran li berpalê çiyayê Mil hatiye avakirin. Nifûsa gund nêzîkî 700 e. Mezreya Kulava li ser gund e û Kulava jî du şênî ne. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Malikiya Jêrîn** (Y. Karpuzlu) dikeve başûrê rojhilatê Erxniyê û 13 km ji Erxeniyê dûr e. Ji ber şerê malbatî bejek ji gundên malika barkirine û li wir gundekî biçûk avakirine. Xaniyê gund nûjen hatine çêkirin. Erd û zeviyên gund hem li çiya û hem jî li deşta Gewran hene. Di sala 1997an de ji ser Malikiya cuda bû û bû gundekî bi sere xwe. Nifûsa gund 250 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Migo** (Azıklı) dikeve başûrê Erxeniyê û 25 km ji Erxeniyê dûr e. Li ser girekî biçûk hatiye avakirin. Bi navê Feraş (Otlak) mezreyek wê heye. Nifûsa gund 427 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Mele Ahmeda** (Boncuklu) dikeve başûrê Erxeniyê û 10 km ji Erxeniyê dûr e. Li ber çem e. 3 km dikeve başûrê stasyonê. 300-350 sal berê Mele Ahmed ji gundê Axuran hatiye û gund ava kiriye. Ava Boxazê di wir re derbas dibe. Başûrê wê deşt e. Xerabeyên dîrokî li herêma gund hene. Li ser çiyayê gund gora Sarkîs heye, ji ber wê yekê navê çiya jî çiyayê Serkîs e. Dibistana mamosteyan 2 km dûrê gund e. Ji gund zêde kesen xwendine hene û ji gund derketine û bi paş ve nehatine. Nifûsa gund nêzîkî 120î heye. Li gund mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Memelan** (Özbilek) dikeve başûrê rojhilatê Erxeniyê, 12 km ji Erxeniyê dûr e. Ji riya Pîranê 3,2 km dûr e. Li bin qûntara çiyayê Zîlan e, berê wê bi Erxniyê ve ye. Gundekî gelek kevn e û hîn jî li gund xerabeyên dêr û avahiyan hene. Rezên gund li herêma Amedê navdar in. Nîvê zeviyên gund li herêma çiyê ne û nîv jî li herêma deştê ne. Nifûsa gund 480 e. Hejmar û asta xwendinê li gund zêde ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Meyadûn** (Koyunalan) dikeve başûrê rojhilatê Erxeniyê û 25 km ji Erxeniyê dûr e. Li ser girekî buçûk hatiye avakirin. Nêzîkî stasyona Geyikê ye. Nifûsa gund 550 e. Cedelî (Acar) mezreya wê heye. Mezre bi qasî 1 km li başûrê

gund li ser girekî biçûk hatiye avakirin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Mişan** (Boğaz) dikeve rojavayê Erxeniyê û 8 km ji Erxeniyê dûr. Di salên 1700-1800an de ji aliyê çiyayê Hezar ve hatine li aliyê Kadenê li Mişan bi çîhbûne. Çavike avê mezin ji bin çiya derdikeve. Aş û bostan li ber tên avdan. Derûdor behçe ne. Ava ku heta deşta Gewran diçe, li pêş bendaveke çêkirine. Di heman demê ciyekî mesîreyê ye jî. Diyarê Sirt ciyekî dîrokî ye û mezin e. Nifûsa gund nêzîkî 200î heye. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Pîrehmed** (Ahmetli) dikeve başûrê rojhilatê Erxeniyê û li ser riya Amedê ye. Ji Erxeniyê12 û ji Amedê jî 45 km dûr e. Li gor gotinan di salên 1300î de ji aliyê Yemenê ve sê bira hatine û li wir bi cih bûne. Navê birayê mezin Ahmed bûye. Di dema Şêx Seîd de gelek malbat hatine û li gund bi cih bûne. Niha li gund eşîra herî mezin eşireta Zîgana ye. Nifûsa gund ji 1500î zêdetir e. Berê neheye bû. Li ser riya Erxenî û Amedê li ser girê ku berê li wir qereqol hebû, di salên 1970î û vir ve xanî li wir hatin avakirin û bûye taxeke Pîrehmedî jê re dibêjin Malên Serê Gir. Dibistan heşt polî heye û ji gundên derdorê şagirdên din jî têne li wir dixwînin. Nexweşxane, dibistan, av, elektrîk, telefon hene. Riya gund asfaltkirî ye.

**Qalxana** (Yolköprü) li ser riya Erxenî û Çêrmûgê ye û dikeve rojavayê Erxeniyê. Qalxana ji Erxeniyê 6 km dûr e. Qalxana tê wateya agirê gurr û xurt. Li gor cihên dîrokî gundekî pir kevn e. Tê texmîn kirin ku 7.000-8.000 sal berî niha mirov li herêmê jiyane. Li gund girekî dîrokî heye. Heta berî Şerê Cîhanê ya Yekem li gund Ermenî hebûne. Navê herêmeke gund Biniya Kilîsê ye. Çemê Qalxanayê di rojhilatê gunde derbas dibe. Jorê wê Boxaz cihê mesîreyê ye. Nifûsa gund 250 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Qizilce** (Otluca) dikeve başûrê rojavayê Erxeniyê. Ji Erxeniyê 17 km dûr e. Nifûsa gund 210 e. Li nêzîkî gund çiyayê Enûş heye. Lê li wir zîyareta Enûş Pêxember heye. Li gund elektrîk, telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris



Qileş
Foto: Hüseyin Tunç

**Qileş** (Şölen) dikeve rojhilatê Erxeniyê li ser riya Erxenî û Pîranê ye. 10 km ji Erxeniyê dûr e. Li qûntara çiyayê Qiliç Baba ye. Gundê hukimdarê Aqqoyuniyan Hesenê dirêj e. Hesenê dirêj li vî gundî hatiye dinê. Niha jî li Qilic Baba sê gor hene. Yek gora bavê Hesenê Dirêj û herduyên din jî yek a xuşk û ya din jî gora birayê wî ye.[28] Tê gotin ku Qileş ji aliyê Hesenê Tewîlî ve hatiye avakirin. Tewîl îro li ser Hênê ye. Gora wê li girê Qilîç Baba ye. Li gor gotinên gotinbêjan berê Qileş gundekî gelek mezin bûye.

Di dema erdheja Entaxa Licê de (ev erdhej ne erdeheja Licê ya 1975an e, gelek kevn e û tarîxa wê naye zanîn.- A. Tîgrîs) ew jî cûm bûye. Niha mirov li ser qadeke mezin û berfireh rastî wan xerebeyan tê. Herêma Kapekê ku niha avayiya şaredariyê li wir hatiye avakirin, xerabe gelek in. Di navbera Qileş û Memelan de li herêma Şêxanê Pîrozgehek heye. Rezên gund bi navûdeng in. Di sala 1937an de dibistan lê vebûye. Nivîskar Hesenê Metê ji vî gundî ye.

Qileş di sala 1990î de bi gundê Baxdeştê (Comerd)re bûye yek û şaredarî lê hatiye avakirin. Nifûsa Qileşê 2.331 û hejmara xaneyan jî 326 e. Hejmara kesên xwenda li gund gelek zêde ye. Baxdeşt mezreya wê ye. Li gund, nexweşxane, dibistan, sîstema av, telefon û elektrîkê hene. Riya gund asfalt e.

**Qerecan** (Canveren) dikeve başûrê rojhilatê Erxeniyê û 26 km ji Erxeniyê dûr. 4 Km li başûrê Meyadûn e. Ji xwe heta demeke nêzîk mezreyeke Meyadûnê bû. Nifûsa gund nêzîkî 400î ye. Li gund elektrîk, telefon, dibistana 8 polî û mizgeft hene. Riya gund qûmkirî ye.

---

[28] Yrd.Doc.Dr.M.S. Erpolat, Dunden Bugune Erxenidaki Ziyaret Yerleri- Uluslar arasi Turk Dunyasi Inanc Merkezler Kongresi-Ankara Turksev Yay.2004.s. 524

**Qocelî** (Kocaali) dikeve başûrê Erxeniyê û li ser riya Çaqmaqê û 12 km ji Erxeniyê dûr e. Li deşta Gewran li ser girekî biçûk hatiye avakirin. Nifûsa gund 500 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qûçakera** (Güneştepe) dikeve başûrê Erxeniyê û 27 km ji Erxeniyê û 50 km jî ji Amedê dûr e. Gundî ji gundê Çêrmûgê Encozê hatine û li vir gund avakirine. Di sala 1998an de navê gund guhertine. Nifûsa gund 1736 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Salihî** (Salihli) dikeve rojavayê Erxeniyê û 11 km ji Erxeniyê dûr e. Li ser riya Erxenî û Çêrmûgê ye. Nifûsa gund nêzîkî 800î ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Selman** dikeve başûrê Erxeniyê û 15 km ji Erxeniyê dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 1500î e. Hevalik, Gulan û Mezre sê mezreyên Selmanê ne. Dibistana 8 polî û neweşxaneyeke bi kapasite, mizgeft, telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund asfalt e.

**Sîyahamed** (Olgun) dikeve rojavayê Erxeniyê û 30 km ji Erxeniyê dûr e. Li ber qeraxê çemê Boxazê ye. Gund gelek caran hatiye wêran û avakirin. Heta berî qirkirina Ermeniyan gundê Ermeniyan bûye û piştre Kurd hatine û bi cih bûne. Di salên 1950an de carek din hatiye avakirin. Gundî bi eslê xwe ji eşîreta Milî ne. Nifûsa gund nêzîkî 1000î ye. Çayana Jêrîn, Şêxik, Rihanok, Holo û Tilkî mezreyên wê ne. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Sincik** (Çayırdere) rojavayê Erxeniyê û 15 km ji Erxeniyê dûr e. Li ser sînorê Çêrmûgê ye. Li gor gotinan nêrî tî bûye û li avê geriye. Şivan jî daye pey nêrî. Hew dîtiye ku nêrî çûye nav newaleke kûr û li bin dara sincê kaniyeke dîtiye û av vexwariye. Kanî li bin dara sincê derketiye. Piştre gund li wir çêkirine û ew nav li ser gund maye. Li ber çemê Şêxanê sebze û şînahî tên çandin. Nifûsa gund ji 800 bêtir e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris

**Şêx Ziya** (Söründüzü) dikeve başûrê Erxeniyê û 10 km ji Erxeniyê dûr e. Li başûrê çiyayê Hîlarê, li qûntara girekî bilind e. Şêx hebûye her dem li hespê xwe siwar bûye û geriya ye. Ji ber vê yekê navê gund Şêxsiwar maye. Berê gundekî bejî bûye niha bi saya serê sondajê gund bûye avî. Zeviyê gund li deşta Gewran in û bi xêr û bêr in. Nifûsa gund 200 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Tayan** (Sallıca) dikeve başûrê rojhilatê Erxeniyê û 16 km ji Erxeniyê dûr e. Cihehî bi tat û lat e, şikeft, sarinc û xirabeyên dîrokî lê hene. Nifûsa gund ji 200î bêtir e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene.

**Tilindere** (Devletkuşu) dikeve bakurê Erxeniyê, 12 km ji Erxeniyê dûr e. Li berpalê çiyayê Fulkîs e ku li çemê Madenê dinêre. Piştî 1993an hatiye valakirin. Niha çend mal bi vegerîne gund. Bi navê Mandalî (Camûş/ Ozan) û Kinêra Biçûk (Beşbudak) du mezreyên wê hene. Dema bendava Keça Qiral çêkirin, nivê zeviyên Kinêra Biçûk di bin ava bendavê de man. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Termila Jêrîn** (Asağıkuyulu) dikeve başûrê rojhilat, li ser riya Erxenî û Amedê ye û 19 km ji Erxeniyê dûr e. Nifûsa gund ji 800î zêdetir e. Dibistana 8 polî li gund heye û ji derdorê şagird tê wir. Li gund, stasyona petrol, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Gundî bi awayekî modern mirîşkan xwedî dikin. Riya gund asfalt e.

**Termila Jorîn** (Yukarıkuyulu) dikeve başûrê rojhilat, li ser riya Erxenî û Amedê ye. Ji Erxeniyê 17 km dûr e. Li berpalê bakurê çiyayê Dîvanê hatiye avakirin. Nifûsa gund 800 e. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Tilxezûr** (Yayvantepe) dikeve başûrê Erxeniyê û 6 km ji Erxeniyê dûr e. Kolanên ku li ser girikê Tilxezûrê hatine kirin dide xuya kirin ku 5.800 bz mirov li wir jiyane. Gund nêzikî dibistana Mamosteyan a Dîclê (Diclê İlköğretmen Okulu bû, loma zarokên gund ji zû ve derfetên xwendinê dîtibûn. Nifûsa gund ji 200 bêtir e. Li gund dibistan, mizgeft, av, elektrîk û telefon hene. Riya gund asfalt e.

Institut kurde de Paris

**Tilvakî** (Karaburçak) dikeve başûrê Erxeniyê. Nêzîkî riya Amed û Siwêregê ye û 51 km ji Erxeniyê dûr e. Heta van salên dawî mezreya gundê Devwênê bû û piştre muxtariyet bi destxist. Bizwara (Kaymaz), Avreş, Sêkuçek, Sarikaya û gola Deve mezreyên wê hene. Ji bo çandiniyê arazî zêde ne baş e û ciyê çêrê ye. Nifûsa gund 340 e. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.



Institut kurde de Paris

**Tortanî** (Akçoban) dikeve başûrê Erxeniyê 37 km ji Erxeniyê dûr e. Nêzîkî riya Amed û Siwêregê ye. Nifûsa gund niha ji 250î zêdetir e. Li gund, dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Wanke** (Deringöze) dikeve rojhilatê Erxeniyê û 10 km ji Erxeniyê dûr e. Di navbera gundên Eyneto û Qileşê de ye. Tê gotin ku Vank bi ermenî tê wateya bankê. Hinarên gund bi navûdeng in. Di çiyê de aveke xurt tê xwarê. Havînan gelek sar e. Ev av di heman demê ji bo tawî û bawiyan şîfa tê hesibandin. Tirî, behîvên gund bi navûdeng in. Gund hatiye valakirin. Niha nifûsa gund ji 100î derbas dike. Elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Xeltûşka** (Dereboyu) dikeve başûrê rojhilatê Erxeniyê, li deşta Xana Gewran e û 18 km ji Erxeniyê û 40 km jî ji Amedê dûr e. Gundekî dîrokî ye. Tê texmîn kirin ku gund di dema Hûriyan de hatiye avakirin. Du km li jorê gund xerabeyên kevn û mezin hene. Dibe ku di zemanê berê de gund li wir bûye û piştre hatibin cihê niha. Ji wan xirban re Avanşehîr dibêjin. Niha li gund pênc binemalên mezin hene: Rindiya, Şêxmûsya, Hotoyiya, Qerika û Mexsiya. Li ser kevirên gorên gundiyan wêneyên şûr û mertalan hene. Di zinarên herêma gund de gelek nawis hene ku ji dema Hûriyan ve mane an hatine kolandin. Ji bo tawî û bawiyan şîfa ne. Li wir Tirba Hêvî Şehdel ziyaret in û rojên înê diçin ziyaretê. Sê golên biçûk di nav tixûbên gund de ne: Gola Mezin, gola Dawîn û gola Heftnîskan. Çiyayên gund du ne: çiyayê Dêdwê û Belê. Nifûsa gund 1500 e. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund asfalt e.

**Xençerlî** (Hançerli) dikeve başûrê Erxeniyê li deşta Gewran e û 30 km ji Erxeniyê dûr e. Gundê Eskerî Axa ye. Bi navê Lexerî mezreyeke wê heye. Lexerî li ser girekî dîrokî hatiye avakirin. Dengbêj Seyidxanê Boyaxçî ji vî gundî ye. Li derdora çemê Boxazê çandiniya pembo jî tê kirin. Piraniya gundiyan ji eşîreta Badilî ne. Nifûsa gund li derdora 1000î ye. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Xendeka** (Hendek) dikeve başûrê rojavayê Erxeniyê û 26 dûr e. Di tixûbê Çêrrmûgê de ye. Heta demeke nêzîk li ser Çêrmûgê bû. Niha nifûsa gund li derdora 600î ye. Li gund dibistan. Mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.



Rezeki ji bo şerabê li Tilxezûr

**Xidiran** (Yolbulan) dikeve rojavayê Erxeniyê û 13 km ji Erxeniyê dûr e. Ji riya Erxenî û Çêrmûgê 2 km li bakur dikeve û di nav newaleke bi dar û ber de ye. Gundekî gelek kevn e. Gund li ser girên dîrokî hatiye avakirin. Li ser girê Siyasûrê xerabeyê dêrekê hene. Li girê Korikî jî cihên dîrokî hene. Nifûsa gund teqrîben 800 heye. Li gund dibistan. Mizgeft, telefon û elektrîk hene.

**Xoşan** (Kömürtaş) dikeve başûrê rojhilatê Erxeniyê. Li ser riya Erxenî û Amedê ye. 4 km ji Erxeniyê dûr e. Fabrîkaya Erxeniyê ji çiyayê vî gundî kevir derdixin û dibin fabrîkayê. Gund ji sê şêniyan (taxan) pêk hatiye. Li qeraxê çemê Hersinê ku di nêzîkî gund re derbas dibe, herêmên Çalika Zîyaret û Dahlê gelek şikeft û ciyên dîrokî hene. Herêm ciheke gelek kevn e. Nifûsa gund nêzîkî 900î ye. Bi navê Zîlama Jêrîn (Kırmaçlı) û Îzinob (Uzunoba) du mezreyên wê heye. Xelkê Îzînobê koçî navenda Erxeniyê taxa İsmet Paşa kirine û mezre hema hema vala bûye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Xûniya** (Söğütalan) dikeve bakurê rojhilatê Erxeniyê û 18 km ji Erxeniyê dûr e. Sebze û hişinayên gund zêde ne û tînin bazara Erxeniyê. Nifûsa gund ji 300î zêdetir e. Bi navên Selgeto (Yoncalı), Zeban (Meşedibi) mezreyên wê hene. Hijîrên Zeban bi navûdeng in. Beşeke axa Zibanê ket ber bendava Keça Qiral. Li gund dibistan. Mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Zengetil** (Bereketli) dikeve başûrê Erxeniyê û 17 km ji Erxeniyê dûr e. Araziyên gund gelek û bi xêr û bêr in. Ji derî çandina genim û ceh li ber çemê Mişan pembo jî tê çandin. Piranî û giraniya gund di destê axa daye. Sipîndarên gund bi navûdeng in. Nifûsa gund ji 700î bêtir e. Îgirmî (Uzunağaç), Elavuzik û Ulaş mezreyên wê ne. Li gund nexweşxane, tesîsên çandinî, dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Zendelan** (Usluca) dikeve başûrê Erxeniyê û 17 km ji Erxeniyê dûr e. Gund li deşta Gewran e. Di salên 1600î de ji Rihayê hatine gundê Bervanê. Demek şûn ve vê carê ji wir jî çûne û vî gundî avakirine. Di vê mijarê de ji bo agahdariyeke berfireh li gundê Bervanê binêre. Nifûsa gund li derdora 200î ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Zîlan** (Karşıbağlar) dikeve başûrê rojhilatê Erxeniyê û ji Erxeniyê 7 û ji Amedê ji 66 km dûr e. Pêşî gundê Ermeniyan bûye. Ji ber pevçûnên nav gundiyan niha nîve gund li navenda Erxeniyê dijîn û taxa Zîlan pêkanîne. Rezên gund bi navûdeng in. Nifûsa Zîlanê li derdora 220î ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Zimayik** (Dibektaş) dikeve başûrê rojavayê Erxeniyê û 18 km ji Erxeniyê dûr e. Li ser riya Erxenî û Çêrmûgê ye. Li Başûrê gund şikeftên Kîkan hene. Nifûsa gund 400î derbas kiriye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Zirkan** (Dağarası) dikeve bakurê rojhilatê Erxeniyê û 8 km ji Erxeniyê dûr e. Nêzîkî gundê Kotekan e. Li gund darên behîvan zêde ne. Rezvanî xurt e. Di sala 1950î de gelek malbat ji gund koçberê Mezreyên Xana Gewra, Kotepir û Boçê kirine û gund avakirine. Nifûsa gund li derdora 300î ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûkirî ye.

**Zirkî Keleşîn** (Dallidağ) dikeve rojavayê Erxeniyê û 16 km ji Erxeniyê dûr e. Ji riya Cêrmûgê 2 km dûr e û dikeve aliyê bakurê rê. Rez û behçeyên gund hene. Di salên 1950î de gundiyan li deştê araziyên mezreyên Xana Gewra, Qote Berçem, Kaniya Gund û Boçê kirîne. Nifûsa gund 600î dibine. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Ziyarek** (Tevekli) dikeve başûrê rojhilatê Erxeniyê û 17 km ji Erxeniyê dûr e. Du taxên gund hene. Li bakurê rojhilatê gund li girê Sosinê çend girikên dîrokî hene. Nifûsa gund nêzîkî 300î ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Ziyareta Axa** (Ziyaret) dikeve rojavayê Erxeniyê û 17 km ji Erxeniyê dûr e. Li ser riya Erxenî û Cêrmûgê ye. Dikeve rojhilatê Gîsgîsê. Li bakurê qûntara çiyayê Belaxurê ye. Li jorê gund Pîrozgeh heye û gund navê xwe ji wê zîyaretê girtiye. Li derdora gund xerabeyên kevn hene. Ji bo lêkolîn nehatine kirin kes dîrok û çîroka vê derê nizane. Li herêma gund sê cihên girîng û dîrokî hene ku lê were lêkolîn: Goristana Kaniya Belo, Kevirê Bel û Girê Sor. Ji derî van xerabeyên Pagê Mîran jî cihekî dîrokî ye. Nifûsa gund li derdora 600î ye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris




Dimenek ji Farqînê
Ji arşiva şaredariya Farqînê

Institut kurde de Paris

## Farqîn

Farqîn/Silîvan dikeve rojhilatê Amedê û 82 km ji Amedê dûr e. Di rastiya xwe de Farqîn navê navenda bajêr e û Silîvan jî navê herêmê ye. Lê îro xelk Farqîn û Silîvan wek navenda bajar bi kar tînin. Farqîn li bin pala çiyayê Elbatê ye û başûrê wê deştâ Silîvan e. Ji sala 1873an ve bajaroka Amedê ye. Dewletê navê wê yê fermî jî Silvan lê kiriye.

Hejmara taxên navenda Farqînê 11 ne. Behçelievler, Qulfa (Bilind), Camî, Kevirspî, Kela Mîran, Mescîd, Qonax, Rezan, Selehedîn, Tekel û Yenişehir. Du şaredarî, 79 gund û 85 mezreyên Farqînê hene. Firehiya qada Farqînê 1.378 km$^2$ ye. Li gor statîstîkên sala 2010an nifûsa navendê 41.484, ya gundan 43.323 û bi giştî 84.807 e. Li Farqînê di sala 1873an de sîstema şaredariyê dest pê kiriye.

Farqîn ji serdema Sûbarî, Hûrî-Mîtaniyan ve cihê şaristaniya herî kevn e. Arkeolog di van salên dawî de, nêzîkî pira Mala Badê li devera çemê Halan rastî ciheke dîrokî hatin. Piştî lêkolîn û lêgerînan cihê şaristaniyeke ji bin erdê derxistin ku xwedî dîrokeke bz 11 hezar salan e. Ev li cîhanê ji cihê herî

kevn yek e. Dîsa şikeft û nawisên Hesûn, Boşat û cihên din di vê mijarê de nimûneyên dîrokî yên herî berbiçav in. Dîroka navenda bajêr ne zelal e. Kes nizane navenda bajêr kengî û ji aliyê kê ve hatiye avakirin. Di warê avakirina bajarê Farqînê de çend efsane û angaştên cuda hene. Hinek lêkolîner texmîn dikin û dinivîsin ku di serdema Urartuyan ji aliyê Marsû Layûta ve hatiye avakirin. Hinek çavkanî jî deştnîşan dikin ku bz di salên 77an de ji aliyê Tîgranê Mezin ve hatiye avakirin û navê *Tîgranokarta* lê kirine. Lêbelê ev ji aliyê gelek çavkaniyan ve naye qebûl kirin. Heta li gor gelek çavkaniyan bz Farqîn xwedî nifûseke mezin bûye.

*"Warê bav û kalê me*
*Bajarê Meyyafarqîn*
*Behra îlm û îfanê*
*Textê Merwanê zêrîn!"*

Çavkaniya herî bi bawer û nêzîkî rastiyê ya Ibn-ul Erzaqê e. Li gor ku Îbn- ul Erzaq dinivîse, bz. sala 387an de di şerê navbera Roma û Sasaniyan de gelek kes hatine kuştin. Wê demê metranê herêma Farqînê Mar Marûtxan destûr ji fermandarê Bizansî û Sasaniyan standiye û xirîstiyanên ku li herêmê hatine kuştin binax bike. Daxwaza wî qebûl kirine. Kuştiyan li wir binax kirine. Herêm ketiye bin destê Romiyan. Romiyan li wir bajarekî bi kele avakirine û navê *Martyropolis* (martyropolîs) lê kirine[29]. Bi zimanê latînî "martyr" şehîd û polîs jî bajar e. Ango bajarê şehîdan. Ev bajar bi salan di bin destê Romî, Persî, Sasanî û Bîzansiyan de maye. Piranî bi Amedê re dest guhartiye. Dîroka Farqîn û Amedê hema hema yek e.

Berê jê re Meyyafarqîn gotine û dema Osamanî û komara Tirkiyê de jî navê Silvan lê kirine.

**Kela Farqînê**

Wek Amedê Farqîn bi xwe kele bûye. Farqînî wek amediyan ji dîwarê dora bajêr re nabêjin "beden", dibêjin "kele". Bajarê kevn di nav kelê de bûye. Dîroka Çêkirina kela Farqînê ne diyar e, dîrokeke dîyar heye ku piştî zayînî di sala 532an de kela Farqînê ji aliyê împaratorê Bîzansî Justînianê Yekem ve hatiye restore kirin. Kela Farqînê çargoşe bûye. Ji rojhilat û rojava ve 600 m û ji başûr û bakur ve 500 metre dirêj bûye. Bi giştî 2200 metre bûye. Firahiya dîwarên der 1,93 metre û ya dîwarê hûndir 4,5 metre fireh bûne. Kevirên kelê mezin û spî ne. Dîwarê der nizîm lê dîwarên hundir bilind bûne. 50 birc

[29] Îbnul Erzak, Tarihi Meyyafarkîn ve Amed s. 15-17



Institut kurde de Paris



Krokiya Kela Farqînê
Foto: Albert Gabriel, 1930

di kelê de hebûne, bilindiya bircan 10,5 metre bûne. Di nav wan 50î bircan de niha bi tenê birca Şêr maye. Li ser dîwarê birca şêr li navê gulek û li herdu aliyên gulê wêneyên du şêran hene. Wêneyên van herdu şêran dimînin herdu şêrên ku li Amedê li ser bircên Westa û Şagird in. Dibe ku di heman demê û heman desthilatdarî van wêneyan li ser bircên Farqîn û Amedê çêbikin.

Wek bedena Amedê kela Farqînê jî du kele di nav hev de hatine çêkirin.[30] Di navbera herdu dîwaran de ava kaniya Mezin û kaniya Navîn derbas bûne. Ava van herdu kaniyan wek ava xendeqê bi kar anîne ku dema ji der ve êrîş werin nikaribûn bi hêsanî bikevin hûndir.

Li gor çavkaniyên nivîskî 8 deriyên kelê hebûne. Ji ber ku kele ber bi rojava û rojhilat ve dirêj bûye, li başûr çar û li bakur du derî hebûne. Deriyek li rojhilat û yek jî li rojava bûye. Navê deriyê kelê weha ne. 1. deriyê Amedê (li rojavayê başûr), 2. deriyê Zuxrê (deriyê kela Zembîlfiroş), 3. deriyê Dahlê, 4. deriyê Masê, 5. deriyê Meyxanê (li rojava), 6. Qulfayê/deriyê Boşatê (li bakurê rojava),7. deriyê Taxa Jêrîn (li başûr), 8. deriyê Şah (li başûrê rojhilat). Ji van deriyan bi tenê deriyê Qulfayê li ser piyan maye. Dîwarê derîyê

[30] M. Felat Arda, Diroka Farqînê, urmiye.com

Qulfayê di dema Merwaniyan de hatiye çêkirin. Kîtabeyeke li ser derî heye, ev paşê ji aliyê emîrê Eyyûbiyan Melîk Eşref ve hatiye nivîsandin.

Niha kele nemaye û li çend cihan xerabeyên wê mane.

Di dema xwe de li herêmê Zirkî û Silîvî du eşîrên mezin bûne. Her dem di nav wan de dijberî hebûye. Zirkî bi piranî li herêma Licê û Serhedî Bûne. Ev herdu eşîr di nav rûpelên dîrokê de mane. Êdî kes navên wan jî nizane.

Piştî zayînî di sala 639an de artêşa îslamê di bin serokatiya Xalid bin Welîd û Îlyas bîn Ganem de herêma Amed û Farqînê digrin, navê Meyyafarqînê li Farqîna îroyîn dikin. Li gor agahdariyên Şerefnameyê mîrên Farqîn û yên Pasûrê mirovên hev in.

Piştî ku desthilatdariya Ereban demeke kurt Farqîn dikeve bindestê wek Hemdanî û Bûyiyan (Bûweynîyan) û piştre ji serdema dewleta Kurd a Merwaniyan tê. Bad lawê Dostik li Farqînê desthilatdariya xwe diyar dike. Êdî Farqîn heta salên 1085 dibe paytextê Kurdên Merwanî. Heta Amed û bajarên der û dorê êdî bi Meyyafarqînê ve tên girêdan. Farqîn hem dibe navenda birêvebiriye û hem jî dibe navenda çand û hunera kurdî. Di warê xurtkirin û pêşxistina çand û huner de serdema Nesruddewle pileya herî bilind

Deriyê Qulfayê
Foto: Nejat Satıcı



Institut kurde de Paris



Kela Zembîlfiroş
Foto: Nejat Satıcı

Institut kurde de Paris

e. Padîşahê Kurd Nesruddewle hemû dengbêj, muzîkjen û reqasên Kurd li Meyyafarqînê kom dike û xelat dike. Serdema Merwaniya 102 sal dom dike. Serdema Merwaniyan heta 1085 dom dike û vê carê Meyyafarqîn dikeve bin destê Selçûqiyan. Mirov dikare bêje dewlet a Kurd a herî temendirêj e.

Artûkî herêmê dagîr dikin. Heta sala 1118 di bindestê wan de dimîne û Eyûbî tên. Di sala 1185an de Selahedînê Eyûbî Farqînê digre. Heta sala 1259 Farqîn di bin desthilatdariya Eyyûbiyan de dimîne. Mizgefta Selahedînê ji wê demê ve maye. Dema Eyyûbiyan bi aramî û aştî derbas dibe.

Di salên 1258an de leşkerên Hulago di bin serokatiya lawê Hulago Yeşmûd erîşeke dijwar dibin ser Farqînê û di sala 1259 an bajar wêran dikin. Bi fermandarê Eyyûbiyan re komkujiyeke mezin pêk tîne.

Piştî êrîşên Moxolan çend sal herêm ser bixwe dimîne. Di sala 1515an de bi Amedê ve Farqîn jî wek herêmeke otonom bi Osmaniyan ve tê girêdan.

## Kela Zembîlfiroş

Li kela Farqînê birceke spî û mezin heye. Jê re dibêjin Kela Zembîlfiroş. Kele niha xerab bûye û bi tenê qotê kelê maye. Ji ber vê yekê Farqînî niha jê re dibêjin Qotê Zembîlfiroş. Du keleyên Zembîlfiroş hene. Wek me nivîsî yek li Farqînê ya din jî li Başûr e. Li gel wê çend cure û varyantên çîroka zembîlfiroş jî hene. Em ê bi tenê behsa kela Zembîlfiroşa Farqînê û varyanta wê ya herêma Farqînê bikin. Varyanta herêma Farqînê weha ye:

Di zemanê xwe de lawê mîrekî bi navûdeng hebûye. Ew xwedî kêf û zewqê bûye. Rojeke dema ji nêçîrê vegeriye malê, riya wî di ber goristaneke xerabe re derbas bûye. Di goristana xerabe de serê mirîyeke dîtîye. Ji hespê xwe peya bûye û xwestiye ax bike ser hestiyê serî û veşêre. Kakotika hestî dest bi axaftinê kiriye. Kurê mîr jê pirsiye ku axiret çawa ye. Hestiyê serî dest bi axaftinê kiriye. Jê re behsa dinya û axiretê kiriye. Zewq û sefaya dinyayê pûç û vala ye. Kesên ku li vî dinyayê zilm, tehde, pariya heram bixwin, zîna bikin di dinyaya din de hesap ji wan tê pirsîn. Heta û heta di nav agirê dojehê dimînin. Kesên ku başî, alîkarî, bi ked û xwêdana xwe kar bikin û bi çavê xerab li xelkê nenêrin, diçin bihişta rengîn. Ew jî li wir heta û heta di nav kêf, xweşî û evînê de dijîn....

Xort tê malê û çendek paşê bi awayekî dizî ji mala xwe derdikeve û wenda dibe. Mîr li pey şopa lawê xwe digere, dike nake nabîne. Di dawî de hêvî jê dibirin û destên jê dişon.

Farqîn, 1909



Institut kurde de Paris

Xort dûr diçe. Li devê çemekî rastî hinek koçeran tê ku kon vegirtine û ji qirş û qalan zembîlan çêdikin. Bi xwe bi xwe dibêje "wele ev karekî baş e û keda helal e." Biryara xwe dide ku li cem wan bimîne. Li ba wan dimîne û ew jî dest bi çêkirina zembîlan dike. Dibe westeyekî herî baş. Zembîlên xwe dibe Farqînê difroşe û bi wan aboriya xwe û mala xwe dike. Rojeke dîsa zembîlan dibe Farqînê di kuçe û kolanên Farqînê digerîne. Di ber mala mîr re derbas dibe. Dengê wî diçe xanimê. Qewraşa xanimê gaziyî wî dike ku were hewşa qesrê dê xanima wê li zembîlan binêre.

Dema Zembîlfiroş dikeve nav hewaşa qesrê, xanim bejn û bala Zembîlfiroş dibîne ku çi xortekî xweşik û delal e. Êdî hiş û aqil ji serê xanimê diçe, Zembîlfiroş dibe jor. Xanim li wir li Zembîlfiroş doza têkiliyên cînsî dike. Zembîlfiroş jê lava û tîka dike ji bo ku xanim dev jê berde. Dibêje: *"Xanim ez tobedar, tobedarê Rebê jor im..."* Dike nake nikare xwe ji destê xanimê rizgar bike. Xanim diçe odeya din ku tiştek bîne. Di heman kêliyê de Zembîlfiroş fersendê dibîne û xwe di pencereya kelê de davêje û direve. Xanim heta ji aliyê dinê tê ku Zembîlfiroş revîye. Bi pey dikeve nagire. Ev çirok bi strankî tê gotin.

## Avasaziya bajêr

Avasaziya (mîmariya) bajarê Farqînê gelek balkêş e. Mixabin piraniya avahî û çarşiyên kevn heta îro nemane. Bi zanebûn û nezanî bajarekî hewqas qedîm hatiye wêran û talan kirin. Ji kelê çend dîwar, ji bircan yek du û xaniyan jî bi qasî hejmara tiliyên destekî mane. Li Farqînê çar curesazî hene. Koşk an sera. Ev avahiyên malbatên payebilind û dewlemend in. Cureyê duyem xaniyên bi şaneşîn in. Ev jî yên malbatên halxweş in. Cureyê sêyem xaniyên xelkê ne ku ji kevir, dar û axê çêkirine. Cureya dawîn jî xaniyên ku niha ji wan re apartman dibêjin ji bêtonê ne.

Ji avahiyan jî Qesra Sadiq Begê (Mala Beg), Qonaxa Mala Ezîzan, Qonaxa Bedrî Begê, Koşka Xetîb Begê, Qonaxa Hesen Begê, Koşka Elî Axa, xaniyê ku îro kirine dibistana Gazî û xaniyê niha kirine muzexane mane. Yên din wêran bûne. Li gor gotin û dîtinên mîmar û pisporan mîmariya bajarê Farqîn, Mîdyat û Mêrdînê dişibin hev. Reng û çêkirina kevirên wan jî hema hema wek hev in.

Institut kurde de Paris



Bedena Farqînê û koşk
Foto: Nejat Satıcı

Li bakurê rojavayê bajêr li nêzîkî deriyê Boşatê ye. Li ser du bircên bedenê hatiye çêkirin. Taybetiya Qonaxa Sadiq Begê li ser kevirên koşkê figurên serê mirovan hene. Li ser dîwarê rojavayê vê koşkê jî kîtabeya hukimdarê Eyyûbiyên Meyyafarqînê Melik Qamil heye.

### Kaniya Mezin

Li navenda Farqînê gelek kanî hene, lê ya herî bi navûdeng kaniya Mezin e. Li ser wê stran jî hene. Li Farqîna berê kaniya Mezin diket bakurê rojavayê bajêr, lê niha li wê deverê xaniyan lê kirine û kanî ketiye nav bajêr û heta kanî nemaye. Ji sembolên Farqînê yek jî kaniya Mezin bû. Aveke sar û xurt jê derdiket û li pêş wê du hemze hebûn. Yek ya biçûk û yek jî ya mezin bû. Ava kaniya Mezin ji wir diçûn ser bexçe û zeviyan. Xort û mêran di mehên havînê de di hemza mezin de melevanî dikirin.

Institut kurde de Paris



Mizgefta Selahedinê Eyyû
Foto: Nejat Satıcı

## Mizgefta Selahedinê Eyûbî

Mizgeft di dema Merwaniyan de hatiye çêkirin. Xelk jê re mizgefta Ecem dibêjin. Di dema Eyûbî, Artûkî û Osmaniyan de hatiye restorekirin û hinek beş lê hatine zêdekirin. Necbedînê Alpiyê artûkî di nav salên 1152-1156an de dema mizgeft restore kiriye, nivîseke li ser aqîdeya qubê daye kolandin, ji ber vê yekê hinek kes dibêjin ev mizgeft ji aliyê wî ve hatiye çêkirin, ev ne rast e. Mizgeft bi mîmariya Ecem hatiye çêkirin. Stûnên Bîzansî tê de bi kar anîne. Hinek kes texmîn dikin ku berê dêr bûye û piştre veguhestine mizgeftê. Dîwarên mizgeftê bi kevir û qubeya wê bi tuxlayan hatiye lêkirin. Qube ji aliyê der ve heşt goşe ye. Piştî 1980î jê re ji kevirên birî minareyeke çargoşe çêkirine. Çar deriyên mizgeftê hene.

## Mizgefta Mala Mîran (Camiya Balûl Begê)

Tê gotin ku di sedsala 16an de ev mizgeft ji aliyê Bahlûl Beg ve hatiye çêkirin. Bahlûl Beg wê demê li Farqînê sancaktar bûye. Wek qeymeqamê niha. Minareya wê di sala 1899an de hatiye lêkirin. Dîwarê mizgeftê ji kevirên farqîniyên taybet ku rengê bej in hatiye çêkirin. Medreseyeke wê ya du tebeq heye, tebeqa binî maye, lê ya jor xerab bûye. Kaniyeke wêya hêja heye.

Mizgeft li navenda bajêr li ser heman kolanê ye. Bi goristana Merwaniyan ve ye. Navbera wê û mizgefta Merwaniyan 200-250 metre heye.

### Mizgefta Belediyê

Mizgefta Belediyê, berê dêra keldaiyan bûye. Piştî fermana Ermeniyan bêxwedî maye û xera bûye. Demekê ew der kirine sîneme û piştre kirine mizgeft. Jê re mizgafta Sînemayê jî dibêjin. Şaredariyê ew di sala 1992an de veguhestiye mizgeftê û vê carê jî dibêjin mizgefta Belediyê. Ev mizgeft bêminare ye.

### Minareya Qot

Minareya Qot li navenda Farqînê li başûrê rojavayê bajêr e. Mizgeft xerabe bûye û minare bi serê xwe maye. Li cihekî bilind e. Taybetiya minareya Qot ew e ku çargoşe ye, pênc qat e û serê wê dûz e. Herweha tê gotin ku orjinala wê ji pênc qatan bêtir bûye. Piştî restorekirinê pênc qat maye. Tê gotin ku berê qûleya dêrê bûye û jama wê jî hebûye. Tarîx ne diyar e. Di serdema îslamê de veguhestine û formê minareyê dane wê. Demekê wek rasatxaneyê jî hatiye bikaranîn. Dîsa tê gotin ku di serdema Eyûbiyan de minare ji aliyê sê birayan ve hatiye çêkirin. Navê sê padîşahê Eyyûbiyan li ser dîwarê minarê kolane û ew nivîs hîn jî heye

### Kela Boşatê

Li herêma Farqînê keleya Boşatê jî bi navûdeng û xwediyê dîrokeke dûr û dirêj e. Boşat gundekî Farqînê ye û dikeve bakurê Farqînê. Li herêmê baş lêkolînên arkeolojîk nehatine kirin. Tê gotin ku kela Boşatê ji ya Farqînê kevintir e. Heta dibêjin kevirên kele û bajêr ji Boşatê anîne û Farqînê avakirine. Kela Boşatê li ciyekî gelek stratejîk û asê ye.



Minara Qot
Foto: Nejat Satıcı

Institut kurde de Paris

Taybetiya kela Boşatê li ser zinarekî mezin ê yekperçe hatiye çêkirin. Weha asê ye ku bi hejmareke biçûk dikare were parastin.

Li ser kelê gelek nîgar hene. Yek ji wan nîgaran qiral û xanima xwe li hesp siwar in û xulamên wan jî li duv wan diçin. Li ciyeke din ji serdema Ardîşêr nîgarek heye.[31] Li bakurê kelê zinarekî bilind û binê zinar 40-50 m. kûr e. Tê gotin ku di zemanê xwe de mehkûman bi darve kirinê ji wê avêtine xwarê. Ji kelê ber bi jêr ve ji bin keviran ve qulên hewagirtine hene. Dibêjin dibe ku berê li bin erdê bajareke hebûye û ji wir hewa daye der û girtiye.

Dîsa li gund bi navê Keytûn cihek heye. Di navbera du zinaran de çarşiyeke hatiye çêkirin û li ser dîwarê wê nîgarên pezkûviyan hene.

**Pira Mala Badê**

Pireya Mala Badê li rojhilatê Farqînê di navbera Farqîn û Batmanê li ser çemê Batmanê ye. Bi riya Amed û Batmanê re riya Bedlîs, Wan û heta Îranê jî di ser vê pireyê re derbas dibe. Di heman demê de îro ew tixûbê Amed û Êlihê ye. Pire di serdema dewleta Merwaniyan de, ji aliyê Bad Dostik ve hatiye çêkirin. Navê xwe ji Bad girtiye û loma gotine pira Mala Badê.[32]

Pire li ser tehtekî yekperçe hatiye çêkirin. Taybetiya pireya Mala Badê ev e ku kemberên pireyê bi tevî ji kevir hatine çêkirin. Ji aliyê kembera kevirî de li cîhanê pireya herî dirêj û yekem e. Pênc çaviyên pirê hene. Yek ji wan a here mezin e. Kembera mezin wek helboqa sepeteke nexşîn e. Dirêjiya wê 150 metre û firehiya wê jî 7 metre ye. Bilindiya wê ji sewiya avê heta kevirên kilît 19 metre ye. Pire bi kevirên rengîn hatiye çêkirin. Li aliyê rojhilat û rojavayê pire li ser herdu aliyên kemberan du jûr (ode) di nav pireyê de hene. Ev ji bo zêrevan û rêwiyan hatiye çêkirin. Zêrevan tê de nobet digrin. Rêwî û karwan di demên şilî û şelope de, dikarin li wir bîminin. Li ser kembera mezin xaniyekî ji hişkekeviran heye. Di aliyê çepê de mirov bi derencan dadikeve jêr û li wir çend jûr hene. Taybetiyên van jûran jî dema ku rêwî an karwan nêzîkî li pireyê bikin, dengê wan di van jûran de olan dide wek ku bêje hinek kes tên. Zêrevanan ji hatina wan haydar dikin. Di van 50-60 salên dawî de hema li kêleka wê pireyeke nû çêkirine.

[31] Li vir jî hinek nivîskar dema behsa keleya Boşatê dikin, dibêjin di dema Artûkiyan de hatiye avakirin. Ev bi qasî keleya Boşatê dereweke dirokî û mezin e.

[32] Çend diroknivisên sextekar di vê mijarê de jî dinivisin ku "Pira Mala Badê di sala 1147an de ji aliyê Tîmûrtaşê bîn İlgaz ê Artûki ve hatiye çêkirin. Ev ne rast e. Timûrtaş di wê tarihê de pireyê restore kiriye û navê xwe li ser daye kolandin. Battal Odabaşı, Zagros Uygarlıgı cilt-2, s.119



Pireya Mala Badê
Foto: Nejat Satıcı

Institut kurde de Paris

### Temtembûr

Ji herêma sê şikeftan re dibêjin Temtembûr. Temtembûr li bakurê Farqînê li çiyayê Elbatê, li ser riya Boşatê ye. Li aliyê rast û çepê riya Boşatê sê nawisên balkêş hene. Ji bo ku mirov hilkişe û here wan nawisan di teht de derence çêkirine. Ev hersê nawis di zinaran de wek jûran hatine kolan. Di nav wan de ciyên rûniştin û razanê hene.

### Şikeft û nawisên Hesûnê

Şikeft û nawisên Hesûnê li rojhilatê Farqînê li ser riya Farqîn û Batmanê ne. Dema mirov ji aliyê Farqînê ve here Batmanê dikevin aliyê çepê û bi qasî 7 km ji navenda Farqînê dûr e. Tê texmîn kirin ku ev nawis û şikeft ji serdema Sabûrî û Hûriyan ve mane. Şikeft û nawisên Hesûn û Heskîfê dimînin hev. Bi termînolojiya zanistî ji vê serdema şikeftan re dibêjin serdema mezolotîk. Weha xuya dike ku di heman serdemê de hatine kolan. Mîmariya wan jî wek hev in.



Institut kurde de Paris

Şikeftên Hesûnê
Foto: Nejat Satıcı



Li Hesûnê nêzîkî 300 nawis û şikeft hene. Hesûn li gor serdema xwe bajar bûye. Bajarekî weha mezin û bi heybet ku kevir û zinaran kolane û nawis û şikeft çêkirine. Hinek ji wan çend tebeq in. Di nav hinekan de korîdor hene û çend ji wan bi hev ve girêdayîne. Hundirên wan jûr bi jûr in. Li ser hinek kevirên nawis û şikeftan nivîsên bizmarî, peyker, sembol û nîşan hene. Heta îro ji aliyê arkeologan ve baş nehatine lêkolîn. Lêkolîneke zanistî dê dîroka şaristaniya herêmê ronî bike.

Li herêmê gelek ji kevir kolandî, nawis, cuyên avê û sarinc hene. Di dema xwe de sarinc ji bo avcivandinê kolan e. Ji derî nawis û şikeftan hinek xerabeyên din jî hene ku ev piştî serdema şikeftan hatine avakirin. Li çend cihan wek mîmariyan Romayê stûnên ketî û şikestî hene. Dîsa li heman deverê xerabeyên dêr û goristanan balkêş in.

Institut kurde de Paris

## Şaredarî

Lîsteya kesên ku heta niha li navenda Farqînê bûne şaredar.[33]



Du direhemên Eyubiyên Farqînê ji dema El Eşref Mazaffereddin Mûsa (1210-1220)

1942-1946 Abdulgani Gürbüz
1946-1950 Yusuf Azizoğlu
1950-1957 Yümnü Üstün
1957-1960 Şevki Kızıl
1960-1963 Yümnü Üstün
1963-1968 Mahmut Azizoğlu
1968-1973 Yümnü Üstün
1973-1980 Rauf Azizoğlu
1980-1983 Mehmet Beg (veteriner), Mehmet Ali Beg (maliye) û Timur Metin (qeymeqam)
1984-1989 Hanifi Aktan
1989-1994 Fadıl Erdede
1994-1999 Kemal Geçmez
1999-2003 M. Zeki Çelik
2003-2009 Fikret Kaya
2009-2011 Fadil Erdede

Institut kurde de Paris

## Çapemenî û rojnamegerî

### Meyyafarkin

Li Farqinê rojname ya yekem Meyyafarkin e. Meyyafarkin di sala 1953an de derketiye. Li Amedê çap kirinê û birine Farqînê. Rojnameya Meyyafarkinê li Amedê ji aliyê Abdulsattar ve hatiye derxistin û heta sala 1970 dom kiriye.

### Silvan Sesi

Silvan Sesî (Dengê Farqînê) di sala 1959an de ji aliyê Isa Şans ve hatiye derxistin. Isa Şans di sala 1930î de li navenda Farqînê hatiye dinê. Dibistana seretayî û navîn li Farqînê û amadeyiyê jî li Amedê xwendiye. Piştre bûye mamoste. Dev ji mamostetiyê berdaye û dest bi rojnamevaniyê kiriye. Isa Şans

[33] Beşeke mezin a lîsteya şaredarên Farqînê ji malpera Silivan.comê hatiye girt.

heman salê çapxaneyeke aniye Farqînê dest bi derxistine Silvan Sesi kiriye. İsa Şans di sala 1962an de pirtûkeke biçûk bi navê Dîyar-î Silvan jî çap kiriye. Heta sala 1963an rojnameya Silvan Sesi dom kiriye. Helbestên wî hene. Ew di sala 1986an de çûye ser dilovaniya xwe.

**Silvan Gazetesi**

Silvan Gazetesi (Rojnameya Farqînê) ji aliyê İzzet Yıldız ve hatiye derxistin. Di sala 1963an de İzzet Yıldız çapxaneya Yıldız aniye Farqînê û dest bi Silvan Gazetesi kiriye. Piştre çapxane û rojnameyê dewrê Cemal Özsünmezer kiriye. Ev rojname heta sala 1993an derketiye.

**Silvan Mücadele gazetesi**

Yaşar Parlak di sala 1988an de li Farqînê Serhat Matbaası (Çapxaneya Serhedê) avakiriye. Dest bi derxistina rojnameya Silvan Mücadele Gazetesi (Rojnameya Têkoşer a Farqînê) kiriye. Piştî wefatkirina Yaşar Parlak vê carê Ferhat Parlak kar û barê rojname û rojnamegeriyê heta îro didomîne.

Institut Kurde de Paris

## Nivîskar û hunermend

**Îbn ul-Ezraq**

Di sala 1116/7an de li Farqînê ji dayik bûye. Ew ji malbateke xanedan e û miroveki zanyar e. Kalê wî di dema Merwaniyan de li Farqîn û Heskîfê wezîrtî kiriye. Îbn-ul Ezraq jî wek kalê xwe memûrtî kiriye û hem jî wek seyahan li her derê Kurdistan û Rojhilata Navîn geriyaye. Wek berhem bi tenê Dîroka Meyyafaqînê nivîsiye. Hinek çavkanî dibêjin wî di sala 1176 û hinek jî dibêjin na di sala 1193an de wefat kiriye.[34]

**Sîyapoş**

Sal û Cihê ji dayîkbûna Sîyapoş (Sîyahpûş) ne diyar e. Tê gotin ku ew di sala 1868an de ji aliyê Culemergê hatiye Farqînê. Dema hatiye Farqînê 20-25 salî bûye. Ji ber ku cilûbergên reş li xwe kiriye navê Sîyapoş lê kirine. Di dema wî de li Farqînê çand û wêjeya kurdî gelek pêşketibûye ew hatiye û li gundê Kubeydê demeke dûr û dirêj maye û li wir meletiya gund kiriye. Danû

[34] Bi zanebûn hinek kes Ezraq wekî nivîskarê Ereb didin nasandin. Ev ne rast e û Îbn-ul Ezrek ji Farqînê ye û Kurd e.

standina wî bi Ferhoyê Îzet Axa re hebûye. Helbestên wî bi kurdiyeke zelal û dewlemend hatine nivîsandin. Ji ber ku ew li gelek cih û waran geriye kurdiya wî têkil e û ne ya herêmek e. Felsefeya wî ya îslamî gelek kûr bûye. Destana wî ya bi navê Seyf-ul Mulk bi navûdeng e. Piştre ji Farqînê çûye Bexdayê. Niha destnivîsa vê pirtûka wî bi destketiye û dê di demeke nêzîk de were çap kirin.

**Mahmut Yeşil**

Mahmut Yeşil di sala 1938an de li Garisiya Şêxa hatiye dinê. Medrese xwendiye. Ji ber hest û xebatên welatparêzî di sala 1971ê de hatiye girtin. Ew bûye xebatkar û şahîdê qonaxeke kurdan a girîng. Bi navê "*Desteyek ji çîroka jiyana min*" pirtûkeke wî heye.

**Mehdî Zana**

Mehdî Zana di sala 1940î de li Farqînê hatiye dinê. Li Farqînê dibistana seretayî xwendiye û dest bi terzîtiyê kiriye. Di sala 1963an de bûye endamê TIPê (Partiya Karkerên Tirkiyê). Piştre ji TIPê dest berdaye û bi hinek kesên din re Partiya Sosyalîsta Kurdistana (PSK) avakirine. Gelek caran hatiye girtin. Di sala 1978an de serbixwe bûye namzetê serokatiya şaredariya bajarê Amedê û bi serketiye. Heta sala 1980î wek şaredar kar kiriye. Bi hatina cunyata eskeriya 12ê îlonê hatiye girtin û di girtîgeha Amedê de maye. Di zîndana Amedê de êşkence û lêdanên herî giran dîtiye. Di rojên herî teng û xerab de ji dagîrkeran re serî xwar nekriye. Mehdî Zana ji berxwedêrên zîndana Amedê yek e. Bi giştî 16 sal di zîndanê de maye. Di sala 1991 de ji girtîgehê derketiye. Di dawî de hatiye li Swêdê bi cih bûye. Di sala 2004an de carek din vegeriyaye Amedê. Di demeke kurt de ji ber xebat û ramanên xwe carek din ceza lê birîne. Ew neçar maye û carek din vegeriye Swêdê.

Mehdî Zana ne bi tenê aliyê xwe yê sîyasî ve xurt e, herweha ji aliyê xwe yê çand û wêjeyî jî gelek xurt û berhemdar e. Heta niha gelek berhemên wî bi kurdî û tirkî hatine çap kirin. Berhemên wî yên çapkirinî çend jê ev in: *Bekle Diyarbakır, Vahşetin Günlügü, Evîna dilê min, Sevgili Leyla û Çarşiya Silîva.*

**Rojen Barnas**

Rojên Barnas di sala 1944an de li Farqînê hatiye dinê. Rojen Barnas şanenavê Mehmet Gemici ye. Rojen Barnas mamosteyê edebiyatê ye. Di dawiya salên

heftêyî de bi hin hevalên xwe re kovara *Tîrêj* derxistiye. Pirtûka wî ya yekem *Li Bandava spêde* ye. Heta niha; *Heyv li esmanê Diyarbekirê, Hingê, Milkê Evînê* pirtûkên wî yên helbestan derketine. Bi kurmancî dinivîse. Ji 1980î vir ve ew li Swêdê dijî. Di gelek kovaran de nivîsên wî hatine weşandin.

**Mahmut Yürük**

Mahmut Yürük di sala sala 1945an de li Dikê hatiye dinê. Dik mezreya gundê Xosorê ye. Xosor jî gundê Licê ye. Di biçûktiya wî de bi malbatî barkirine navenda Farqînê. Dibistana seretayî û navîn li Farqînê xwendiye. Li Amedê dibistana mamostetiyê qedandiye. Di destpêkê de li herêma Tirkiyê û piştre li Amedê mamostetî kiriye. Di TÖS û TÖB-DERê de kar kiriye. Di avakirina Eğit-Senê de cih girtiye. Piştî teqawidiyê di HADEPÊ de xebitiye. Demeke dirêj di navenda Kitêb û Çanda Zarokan a Astrid Lindgren de wek berpirs û mamoste xebitiye. Bi zaravayên kurmancî û kirmanckî dinivîse. Bi kirmanckî ji bo zarokan sê pirtûkên biçûk nivîsîye: *Biza Kole Asnawî Kena, Luya Rîsîyaye û Ap Elî û Qehremaniya Vîta Zingure.*

**Süleyman Savcı**

Süleyman Savcı li Amedê ji dayik bûye. Sala ji dayikbûn û mirina wî ne diyar e. Di sala 1956an de Silvan Tarihi Abide ve Kitabeleri bi wêneyên reş û spî çap kiriye. Bi eslê xwe Farqînî ye.

**Kendal Nezan**

Kendal Nezan di sala 1948an de, li Farqînê hatiye dinê. Navê wî yê nifûsê Salim Gemici ye. Heta amadeyiyê li Farqînê xwendiye. Di 19 saliya xwe de derketiye der û li Fransê bi cih bûye. Li Fransê zanîngehê xwendiye û di beşa fizîkê de bûye doktor. Di sala 1974an de Komîta Kurdistan ava kiriye. Di karê dîplomasiye gelek xebat kiriye. Ji roja destpêke heta niha 28 sal dike ku Serokê Enstituya kurdî ya li Parîsê ye. Bi taybetî rojnameya Kurmancî ku ji aliyê Enstîtuya Parîsê tê derxistin heta niha hem di warê civîn û hem jî di warê weşandinê encamên gelek hêje daye. Kendal Nezan niha berpirsê kanala Kurd1 ê ye.

Institut kurde de Paris

**Zana Farqînî**

Zana Farqînî di sala1967an de li gundê Baqûzê hatiye dinê. Dibistana seretayî û ya navîn li Farqînê û amadeyi û zanîngê jî li Stabolê xwendiye. Li zanîngeha Stanbulê beşa civaknasiyê qedandîye. Piştî zanîngehê dest bi mûzîkê kiriye û demek bi şûn ve dev ji muzîkê berdaye û berê xwe daye ser ziman û wêje. Di kovara *Rewşen*, rojnameya *Welat* û di gelek weşanan de nivîsiye. Piştre li Enstitûye Stanbulê dest bi kar kiriye. Heta niha F*erhenga Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî* amade kiriye. Çend wergerên wî jî hene.

**Mehmet Tanrikulu**

Mehmet Tanrıkulu di sala1952an de li Farqînê hatiye dinê. Wî amadeyi û Înstîtuya Perwerdehiyê li Amedê qedandiye. Ji sala1986an şûn ve derkete derveyî welêt û li Almanyayê dijî. M. Tanrikulu di kovara Tîrêj de edîtorî kiriye. Demeke navê Mem Ronga bi kar anîye. *Ferhenga* Tirkî-Kurdî û *Destê min li destê te digere* du berhemên wî hene.

**Aram Gernas**

Aram Gernas di sala 1955an de li Farqînê hatiye dinê. Heta amadeyiyê li Farqînê xwendîye. Li Amedê Fakulteya Perwerdehiyê qedandiye û bûye mamoste. Piştî sala 1983an ji ber sedemên polîtîk çûye li Swêdê. Di kovar û rojnameyên kurdî de xebitîye. Ji swêdî û tirkî çend pirtûk wergerandiye kurdî. Wî bi Farîd Nadhar, Enwer Qeredaxî bi navê *Baxçeyê Zarokan* pirtûkeke muzîkê amade kirine. Bi navê *Toqa lanetê* romaneke wî jî heye.

**Salim Çeliker**

Salim Çeliker di sala 1955an de li Farqînê hatiye dinê. Li Farqînê dibistana seretayi, navîn û amadeyiyê xwendiye. Li Amedê dibistana mamostetiye qedandiye. Gelek salan mamostetî kiriye. Piştî cuntaya 12ê îlonê derketiye derî welat û li Swêdê bi cih bûye. Bi nivîsên xwe de Maxlasa A. Nas bikaraniye. Wî û Sait Aydoğmuş bi hev re bi navê *Kuzey Kurdistan'da sosyo-ekonomik yapının niteliği* pirtûkeke lêkolînî amade kirine.

Maruf Yilmaz

Maruf Yilmaz di sala 1958an de li Farqînê ji dayik bûye. Li welat zêde neçûye dibistanê. Piştî 1980î ji ber sedemên siyasî derketiye derî welat û li Swêdê bi

Institut kurde de Paris



Ji Farqîna îro dîmenek
Foto: Kibar Süvari

cih bûye. Li Stockholmê dibistana amadeyî û piştre dibistana mamostetiyê xwendiye û çend sal in ku mamostetiya kurdî dike. Bi zaravayên kurmancî û kirmanckî dizane. Ahmey Temî (fistanokê zazakî), Bajarê Alim û aqilmendan, Gur û heft karik û Diyaset û wêjeya kurdî de dîtinê monolojîk, otorîter û tenginiyên hizirî nivîsîye.

### Dîlawer Zeraq

Dîlawer Zeraq di sala 1965an de li Farqînê hatiye dinê. Ji dibistana seretayî heta amadeyiyê li Farqînê xwendiye. Li Zanîngeha Dîclê ya li Amedê beşa matematîkê qedandiye. Li Amedê mamostetî dike. Dîlawer Zeraq bi kurdî dinivîse. Di gelek kovar û rojnameyên kurdî de nivîsên wî hatine weşandin. Berhemên wî yên ku heta niha derketine ev in: *Kakil* (çîrok), *Bişîrina Şermînî* (çîrok), *Şevên Winda, Wêneyên Meçhûl* (roman), *Ferhenga Biwêjan, Çilkên Pênûsê, Mirina bêsî* Wergerên wî jî hene.

### Faysal Dağlı

Faysal Dağlı, di sala 1966an li li Farqînê hatiye dinê. Di Zaningeha Diclê beşa wêjeyê xwendiye. Ji sala 1988an vir ve rojnamevaniyê dike. Heta niha heft pirtûken wi hatine weşandin. Dağlı di navbera salên 1996û 2007an de di TV ên kurdî de ji sedî zêdetir belgefîlmên dirokî amade kiriye. Ew niha li Almanya dijî. Faysal Dağlı demeke edîtoriya rojnama siyasî-mehane *Le Monde diplomatique* beşa kurdî kiriye.

**Mahabad Felat Arda**

Mahabad Felat Arda di sala 1966an de li Farqînê hatiye dinê. Dibistana seretayî navîn û amadeyî li Farqînê xwendiye. Di sala 1992an çûye li Stockholmê bi cih bûye. Demeke di Med TV de nûçe pêşkêş kiriye. Di kovar û rojnameyan de nivîsên wî hatine weşandin. Niha edîtoriya malpera Amîda Kurd dike. Bi navê *Zagros û Zerdeşt* romaneke wî heye.

## Hunermend û dengbêj

Li Farqînê gelek hunermend û stranbêj hene, hezar mixwabin derfetên teknîkî dest nedan ku em kurtejiyana hemûyan bi dest bixin û binivîsin. Yên ku me kurtejiyana wan bi alîkariya antolojiya Dengbêjan û hinek derdorên din bi dest xist, me nivîsand û yên ku me bi dest nexist, me li jêrenotê navên wan nivisî.[35]

**Şîyar Farqînî**

Şiyar Farqîni di sala 1953an de li Farqînê hatiye dinê. Navê wî nifûsê Celal Sarikaya ye. Şiyar, dibistana seretayî û navîn li Farqînê xwendiye. Di sala 1973an de dest bi muzîkê kiriye. Stranên gelêrî û şoreşgerî gotiye. Gelek caran ji ber stranên xwe hatiye girtin, êşkence dîtiye. Di sala 1992an de ji ber zilma dewleta çûye li paytextê Swêdê li Stockholmê bi cih bû. Di sala 2001ê de ji ber nexweşiyeke bêçare li wir çûye ser dilovaniya xwe. Li Farqînê li goristana Şêx Xelîlê veşartiye. Gelek kaset CD yên Şiyar hene. Stranên wî yên herî bi navûdeng, *Were Bêmal, Şêrîna Min, Çemê Şikestûnê, Koçerê, Ferzê* ne.

**Beyto Can**

Beyto Can di sala 1955an de li Farqînê hatiye dinê. Navê wî yê li nifûsê Beytullah Güneri ye. Li Farqînê dibistana seretayî xwendiye. Ji malbateke şêx e. Bingehê stranên xwe ji felsefa olî girtiye. Pêşî bi kurdî û tirkî stran gotiye. Gelek stranên tirkî gotinên wan yên Beyto Can in. Piştrê bi tenê kurdî distre. Heta niha pênc albûmên wî derketine. Ji ber stranên xwe hatiye girtin û di girtîhê de maye. Stranên wî yên navdar *Agir kete dilê min û Diyarbekir mala min in.*

[35] Ozan Cano, Salih Dalgın, Pismam Bilbil (Mehmet), Weysiyê Pîrexala, Receb Ciwan, Mûrad Çavşîn, Şerîfê Bayikî, Mistefayê Sextî, Hesen Sîpan, Seyidxan Kurt, Nûriyê Herşenî, Çiyager, Mehemedê Huseynî, Cotkar, Ehmedê Baxçecikî, Mensûr (Maciro), Hecî Hesenê Etşoyê, Emînê Kurbeytî, Koçer, Mehmedê Cûmatî (Aktarlı).

**Farqîn Azad**

Navê Farqîn Azadê nifûsê Yılmaz Dünen e. Ew di sala 1965an de li gundê Pîrexala hatiyê dinê. Albûma wî ya yekem "Roj wê bê" ye. Farqînî heta niha di gelek festîval û şahiyan de derketiye ser dikê. CD û klîpên wî hene. Staranên gelêrî û welatperwerî dibêje.

**Genco**

Genco di sala 1974an de li Amede hatiye dine, lê malbata wî çend sal berê bûyîna wî hatine li Amedê bi cih bûne. Dibistan seretayî û navî li Amedê xwendiye. Di biçûkiya xwe de dest bi stranan kiriye. Ketiye nav hêzên welatparêz. Ji Amedê koçê Antalyayê kiriye û ji wir jî koçê Almanyayê kiriye. Niha li Almanyayê dijî. Klîp û albumen wî hene. Navê albûma wî ya yekem "*Pîroz dikim*" e.

**Qutbedînê Farqînî**

Qutbedînê Farqînî (Kutbettin Kayalp) di sala 1951ê de li gundê Başkoyê hatiye dinê. Ew hîn yek salî bûye malbata wî koçî Tirbespiyê kiriye. Dibistan nexwendiye. Di zaroktiya xwe de dest bi stranbêjiyê kiriye. Stran û çîrokên ku dizane ji civat û şevbihêrkan hîn bûye. Du apên wî jî dengbêj bûne. Stranên Brahîmê Fatimê, Cemîlê Şero û Salihê Beynatî distrê. Piştî 25 salên tirbesipiyê careke din vegerîne Başkoyê. Di sala 1993an de koçî Amedê kiriye. Wekî dergevan di saziyekê de dest bi kar kiriye. Di heman demê de ew westayê siwaxê ye. Ligel kaseteke bi bandrol, gelek kasetên wî di nav gel de hene.

**Cewad Merwanî**

Cewad Merwanî di sala 1964an de li gundê Boşatê hatiye dinê. Li Farqînê dibistana sertayî, navendî û amadeyiyê xwendiye. Piştre li Amedê dest bi zanîneghê kiriye. Ji ber sedemên polîtk dev ji dibistanê berdaye. Ji bo bi muzîkê mijûl bûye neçar maye û derketiye derveyî welat li Almanyayê bi cih bûye. Li Almanyayê di Koma Berxwedan de xebitiye. Heta niha gelek CD û klîp amade kiriye.

Institut kurde de Paris

**Becet Baysal**

Becet Baysal di sala 1955an de li gundê Milûksarê hatiye dinê. Dibistana seretayî xwendiye. Ji 12-13 saliya xwe ve stranan dibêje. Bi eslê xwe, ji Misircê ye. Şoforiya otobosan dike. Ji sala 1980î vir ve li Amedê dijî. Di malbata wî de kal û apê wî jî dengbêj bûne. Stranên dengbêj Teyibo, Mehme Salihê Beynatî, Mehmûd Kizil û Dewrêş Huznî distrê. Bi qasî 40 stranî dizane.

**Hesîbê Koçer**

Hesîbê Koçer (Hasîp Gezîcî) di sala 1949an li gundê Çirikê bûye. Dibistan nexwendiye. Bi eslê xwe ji Cizîrê, ji gundê Qîratê ye. Zivistanan li deştê dimînin. Havînan diçin zozanan. Paşê mala xwe dibin navçeya Bismilê, gundê Melefeyata. 10 sal li Melefeyata dimîne. Ji Melefeyata mala xwe dibe Amedê. 25 sal in li Amedê ye. Pez dikire û difiroşe.

**Seîdê Kelê**

Seîdê Kelê (Saît Dunser) di sala 1900î de li gundê Hecî Çerkez ji diya xwe bûye. Dibistan nexwendiye. Malbata wî ji eşîra Şêxdodiyan e. Ji bavîkê wan re dibêjin Mala Bişêr. Li Hecî Çerkez mezin bûye. Stranên xwe ji Ûsivê Macir hîn bûye. Ji Hecî Çerkez diçe gundê Kelê. Li gundê Kelê ji Mehmed Axayê Kelê û Huseyin Ezizoğlu re dengbêjiyê dike. Hostayê Mehme Salihê Beynatî ye. Di sala 1973an de wefat kiriye.

**Evdilhadiyê Zinzinî**

Evdilhadiyê Zinzinî di sala 1949an de li gundê Zinzinê ji diya xwe bûye. Li gund cotkar kar e. Heywanan xwedî dike. Bi eslê xwe ji Amedê, ji navçeya Pasûrê, ji eşîra Badikan e. Bi qasî 150 sal berê ji Aqika hatine Zinzinê. Dibistan nexwendiye. Di salên 1993an de mala xwe bar kiriye navenda Farqînê.

**Zahiro**

Zahiro di sala 1950î de li gundê Mîreliya hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Zahir Koç e. Dibistan nexwendiye. Bi eslê xwe ji Diyarbekirê ye. Koka wan digihîje Bekiran. Di 7-8 saliya wî de malbata wî ji Mîreliya koçî navçeya Kopê ya bajarê Mûşê kiriye. Di 17 saliya xwe de dest bi dengbêjiyê kiriye. Heya 1993an li Kopê dimîne. Gelek kasetên wî yên ku bi amatorî hatine tomarki-

Institut kurde de Paris

rin li çar hêlên herêmê belav bûne. Dûre di sala 1993an de mala xwe bar kiriye bajarê Aydinê. Dengbêjên wekî Reso, Şakiro, Huseynê Mûşî, Mistefayê Heyran, Ferzê, Siloyê Gulê, Hecî Sîno, Filîtê Axtepê, Hecî Evdilkerîm, Feqiyê Qizqapanî û M. Salihê Beynatî diecibîne. Bi dengbêj Şakiro, Huseynê Mûşî, Mehme Salihê Beynatî re sitriye. Gelek stranên wî bi xwe çêkirine hene.

**Sidîqê Tilmînî**

Sidîqê Tilmînî di sala 1964an de li Tilmînê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Sıddık Eryılmaz e. Dibistana seretayî xwendiye. Ji Culemêrgê hatine Farqînê. Ji diya xwe hînî çîrok û stranan bûye.

**Evdirezaqê Kerxa Kîka**

Evdirezaqê Kerxa Kîka (Abdûrrezak Ekin) di sala 1918an de li gundê Başkoyê ji diya xwe dibe. Hê sê salî bûye barkirine gundê Kerxa Kîka. Dibistan nexwendiye. Bi eslê xwe ji Mûşê, ji gundê Acmenîkê ye. Ji eşîra Elmaniyan e. Di 15 saliya xwe de stran gotiye. Ji birayê xwe Hecî Mihemed hînê stranan bûye.

**Feyziyê Şifqetî**

Feyziyê Şifqetî (M. Fevzî Boyacier) di sala 1923an de li gundê Şifqetê ji diya xwe dibe. Dibistan nexwendiye. Ji xortaniya xwe de stranan dibêje. Gelek stran jî wî bi xwe çêkiriye. Heya sala 1960î li gund maye û bar kirine navenda Farqînê.

**Selehata Şerîf**

Selehata Şerîf (Zelal) (Selahat Mikailoğulları) di sala 1978an de li Farqînê hatiye dinê. Ji sala 1991ê vir de distirê. Di 1993an de koçî Amedê kiriye. Dibistan nexwendiye. Dîploma seretayî ji derve stendiye. Demek di Koroya Şaredariya Mezin a Amedê de stran gotiye. Li Amedê dijî.

**Mistefayê Sextî**

Mistefayê Sextî (Mustafa Güzel), di sala 1965an de li gundê Sextê ji diya xwe bûye. Di salên 1950î de ji Xerzan hatine Farqînê. Pênc sal dibistan xwendiye. Ji gund derneketiye. Ji zaroktiya xwe ve stranan dibêje. Heta sala 1992an tenê dengbêjiyê kiriye û ji sala 1992an vir de diçe dawet û şahiyan jî.

Institut kurde de Paris

**Serwetê Sextî**
Serwetê Sextî (Servet Yatar) di sala 1968an de li gundê Sextê hatiye dinê. Şeş salan dibistan xwendiye. Ji zaroktiya xwe de distirê. Stranên xwe ji M. Salihê Beynatî, Şakirê û Huseyinê Mûşî hîn bûye. Ji eşîra Xilikiyan e.

**Nasirê Resûl**
Nasirê Resûl (Nasır Tutacak) di sala 1940î de li gundê Hêlînê hatiye dinê. Dibistan nexwndiye. Ji eşîra Bekiran, ji Mala Heydo ye. Malbata wî ji gundê Deyikê hatine Farqînê, gundê Kelê. Ji Kelê çûne Hêlînê. Hîn ew du salî bûye mala wan ji Hêlînê çûye gundê Kanîqulê. 15 salan li Kanîqulê dimînin. Ji Kanîqulê çûne Elabengiya, 17 salan li Elabengiya mane. Ji Elabengiya çûne Bameydanê. Li Bameydanê sê salan mane. Piştre bar kirine Başko. Li Başko di sala 1989an de çûye ser dilovaniya xwe. Dengbêjiyê ji dengbêj Cemîlê Şero, Ûsivê Macir û Mihemedê Meyremê hîn bûye.

**Nezîrê Herşenî**
Nezîrê Herşenî (Nezîr Çakmak) di sala 1942an de li gundê Herşenê ji diya xwe bûye. Dibistan nexwendiye. Malbata wî bi qasî 300 sal berê ji Colemêrgê hatine gundê Herşenê. Heta heft saliya xwe li gund maye. Ji 15 saliya xwe de stranan dibêje. Stranên ku dibêje ji dengbêj Mecîdê Feslo, Seîdê Osman (Kelê) hîn bûye. Mala wan ji Herşenê bar dike diçe navçeya Bismilê, gundê Kelemo. 15 salan li Kelemo dimînin. Di sala 1983an de bar kirine Binxetê

**Tacetînê Farqînî**
Tacetînê Farqînê (Tacettin Kıran) di sala 1951ê de li gundê Hacika ji diya xwe bûye. Hê zarok e, mala wan diçe Kinyatê. Piştî Kinyatê mala wan diçe Mîreliya. Ji Mîreliya mala xwe dibin navenda Farqînê. Heft, heşt salan li Farqînê dimînin. Ji Farqînê dîsa mala xwe dibin Mîreliya. Badikî ne. Ji 16-17 saliya xwe de stranan dibêje. Bi piranî stranên evîn û evîndariyê dibêje. Dema li Farqînê bûye Salihê Beynatî, Salihê Qubînî, Zahiro û Şakirê Qereyaziyê dîtiye.

**Şakirê Mezrikî**
Di sala 1961ê de li gundê Mezrika hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Şakir Tutar e. Dibistan nexwendiye. Ji Reşkotiyan e. Malbata wî di salên



Ser Hivdeh
Foto: Nejat Satıcı

1920î de hatiye Mezrikê. Di sala 1993an de mala xwe bar kirine bajarê Êlihê. Li Êlihê dikandariyê kiriye. Di sala 2003an de dîsa vegeriye gundê Mezrikê.

### M. Salihê Beynatî

Ew di sala 1938an de li gundê Beynatê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Salih Baykurt e. Dibistan nexwendiye. Di sala 1970î de koçî navenda Farqînê kiriye. Di sala 1981ê de mala xwe biriye Mala Badê. Herweha stranên Seîdê Osman jî dibêje. Ligel sê kasetên bi bandrol, gelek kasetên wî yên bi awayê amatorî hatine tomarkirin û di nav gel de belavbûne hene. Di sala 1984an de miriye.

### Fesîhê Pasûrî

Fesîhê Pasûrî di sala 1968an de, li Farqînê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Fesih Koç e. Bi eslê xwe ji Helebçeyê ye. Kalên wî ji Helebçeyê hatine li gundekî Pasûrê bi cih bûne. Di salên 1940î de ji Pasûrê koçî Farqînê

Institut kurde de Paris

kirine. Dûre jî hê ku ew heft salî bûye malbata wî koçî navenda Amedê kiriye. Dibistana seretayî xwendiye. Stranên ku dibêje ji Şakiro û Resoyê Macir hîn bûye. Ew bi xwe jî stranan çêdike.

# Çend naskiriyên Farqînî

### Mar Merûsa

Mar Merûsa (Mar Marutha) di serdema Bîzansiyan de li Farqînê Metran bûye. Mar Merûsa ne bi tenê metran herweha rewşenbîr û zanyareyekî serdema xwe bûye. Li ser daxwaz û pêşniyaziya wî qiralê Bîzansî kela Farqînî restore kiriye û navê Martyropolîs li bajarê Farqînê kiriye.

### Badê Dostik

Badê Dostik hîmdarê dewleta Merwaniyan e. Di sala 985an de Mîyyafarqînê ji Hamdaniyan digre. Hamdanî fermandariyeke Ereban bû ku di wê serdemê de Farqîn, Amed û Cizîre di bin fermandariya wan de bû. Dost Badik piştî girtina Farqînî, Amed, Heskîf û Cizîrê jî dide ser fermandariya xwe. Tixûbê dewleta Merwaniyan berfireh dike. Ew zana û fermandarekî kurd û zîrek e. Di sala 991ê de li herêma cizîrê ji aliyê Hamdeniyan ve di şer de tê kuştin.

### Nesr ud-Dewle

Nesr ud-Dewle siyasetmedar û rewşenbîrê serdema Merwaniyan e. Navê wî yê eslî Siltan Ehmed e. Ji Meyyafarqînê re xizmeteke mezin kiriye. Bircên nû, Deriyê Qulfayê, hemam, kanî û bexçe ava kirine. Kela Ferqînê restore kiriye. Dîsa li Farqîn û li Amedê weqifa Pirtûkxaneyan daniye û bi berhevkirina pirtûkan li hejmara yên heyî zêde kiriye. Her rojên îniyan li devê deriyê mizgeftê li feqîr û fiqareyan genim belav kiriye.

### Şahsiwarê Silîvî

Şahsiwarê Silîvî di serdema Osmaniyan de jiyaye. Osmaniyan baceke giran dane ser pişta xelkê. Balûl Beg jî li herêma Farqînê li ser navê Osmaniyan bac berhev kiriye. Şahsiwarê Siklîvî bi hinek eşîrên Silîvî re bac nedane û barkirine Kela Bazîdê. Piştre kel girtiye. Balûl Beg bi eskerên xwe ve heta Bazîdê li pey çûye û di navbera wî û Şahsiwarê Silîvî de şerekî giran pêk hatiye. Di dawî de Şahsiwarê Silîvî bi ser ketiye û Balûl Beg têkçûye.[36]

[36] Rojen Barnas, silivan.com/ku/gotar/bade-dostik



Dîmenek ji Deşta Farqînê
Foto: Nejat Satıcı

## Muhterem Biçimlî

Muterem Biçimli di sala 1944an de li Farqînê hatiye dinê. Bi malbatî ji gundê Kanikê ne. Muhterem Biçimli dibistana seretayî û navîn li Farqînê xwendiye. Di heman demê de li medresê jî xwendiye. Ew di xortaniya xwe de bûye xwediyê raman û hestên netewî. Bûye endamê TIPê (Partiya Karkerên Tirkiyê). Gelek caran hatiye girtin. Bûye endamê partiya Dr. Şivan. Di darbeya leşkeriya 1971î de çûye Başûr û ji wir jî çûye Lubnanê û piştre derketiye çûye Almanyayê. Di efuya sala 1974an de vegeriye welat. Bi hevalên xwe re carek din xwestiye partiya Dr. Şivan vejîne. Di nav xebatên DDKO de cih girtiye. Mirovekî çalak, organîzatorekî bêhempa. Di sala 1978an de li ser riya Amed û Elezîzê li nêzîkî gola Hezarê di qezeyeke trafîkê de çûye ser dilovaniya xwe.

## Niyazî Westa

Niyazî Westa (Niyazi Tatlıcı) li Farqînê hatiye dinê. Li Farqînê dibistana seretayî xwendiye û ji ber rewşa aborî di zaroktiya xwe de li cem cildirûnan (terziyan) dest bi şagirdiyê kiriye. Ew bûye westayekî bi navûdeng. Pêşî li Farqînê û piştre li navenda Amedê bi Mehdî Zana re kar û hevkarî kiriye. Ji her alî ve bûye westayê Mehdî Zana. Mirovekî zîrek, nuktecî û fîlozofekî gelêrî bûye. Her dem xwendiye û ji aliyê bawermendiyê ve mirovekî materyalîst bûye. Dikana wî û Mehdî Zana ji bo mirovên rewşenbîr, xwendekar û welatparêz rola dibistaneke civakî û polîtîk lîstiye. Niyazî

Institut kurde de Paris

Westa di her darbeyî de hatiye girtin. Di 12ê îlone de bi qasî salekê di girtîgeha Amedê de maye. Bi nukteyên xwe dadgeha Amedê sews kiriye. Di sala 1977an de ji ber nexweşiya pencesêre miriye.

**Mele Evdilkerîm Ceylan**

Mele Evdilkerîm Ceylan li Farqînê hatiye dinê. Perwerdeya medresê dîtiye. Di sala1950 çûye li Sûriye li cem Cegerxwîn xwendiye. Li wir di navbera beşên Hoybûnê yên Bakur û Başûr de têkilî daniye. Di dema DDKO û TIPê de li Farqînê bûye damezrewanê herdu rêxistinan û di nav birêvebiriya wan de kar kiriye. Beşdarî gelek meş û mitîngan bûye û axiviye. Di dema cûnteya 1971ê de çûye Başûr û çend sal li wir maye. Piştre vegeriyaye Farqînê. Di doza netewî de rol û kedake wî ya mezin heye. Mele Evdilkerîm di 30 îlona 1976an de di qezayeke trafîkê çûye ser dilovaniya xwe. Gora wî li Farqînê ye.

# Pîrozgehên Farqînê

**Ser Hivdeh**

Li gor gotinên meleyan fermandarê artêşa îslamê Muaz Bîn Cebel ji bo girtitina herêma Farqînê bi leşkerên xwe ve tê bakurê rojhilatê Farqînê. Li herêma gundê Emerika li deşta Miradê artêş dikeve kemînê. Eshebeyekî artêşa îslamê li wir şehîd dikeve. Dayika şehîd di xewa xwe de Hezretî Muhammed dibîne. Hezretî Muhammed nûçeya şehîdbûna lawê jê re dibêje. "Şad bibe ku lawê te gehişte mertebeya şehîdbûnê û dê her sal hefteyek şehîdbûna wî were yad kirin..." Herweha ji sala pz 639an vir ve her sal di 17ê edarê de ev roja şehîdbûnê wek festîvaleke olî û çandî li heman cihê tê pîroz kirin. Ji her derî mirov ref bi ref tên herêma Hivdeh. Bi rokan kon vedigrin. Li derdora gora eshabe find tên pêxistin û due dikin. Derwêş û erebanejend li erebaneyan didin, beyt û stranan dibêjin. Govend digrin, lîstik dilîzin, heta pêşbirikên hespan çêdikin. Jê re Şahiya Miradan jî dibêjin. Ji ber vê yekê bi tirkî Murat Şenlikleri dibêjin.

**Serê Gulanê**

Li Farqînê her sal xelk di roja 14ê gulanê de derdikeve derveyî bajêr kêf û şahiyê dike. Rojeke dîrokî ye û gelek kevn e. Tê gotin ku ev roja Serê Gulan ji dema Merwaniyan ve maye. Xwediyê dîrokeke 1000 salan e. Di heman demê de roja mizginiya biharê ye. Roja şahiya Serê gulanê bajarê Farqînê ji miro-

van xalî dibe. Her malbat, heval û hevalbend çend roj ji berê ve amadekariya vê rojê dikin. Sibehê zû bi amadeyeke mezin derdikevin derveyî bajêr. Bi pirani diçin deverên Kaniya Navîn, Bexçeyên Ziretê, Bezwan, Malabadê, ber ava bendavê, şikeftên Hesûnê, Kulfa, Zeveterk û gelek cihên din. Heta aliyê êvarê li wan deran xwarin dixwin, vedixwin, li ber def û zirnê govend dikşînin.

**Bavodînê**

Bavodînê navê pîrozgehê ye. Tê gotin ku ew kesê li wir hatiye veşartin navê wî Bahudîn e. Li gor gotinên xelkê herêmê, ew ji mala Merwaniyan bûye.[37]

**Dara Hiz[illegible]iyê**

Li rojavayê Farqînê nêzîkî riya Farqîn û Amedê ye. Dareke mezin û bi serê xwe ye. Li bin darê fermandarekî kurd veşartiye. Ji bo dar bi serê xwe ye, gora wî ya pîroz bi navê darê tê nasin. Dar bûye zîyaret. Bi nîyet û nîyaz kincikan lê girê didin.

**Şêx Xelîl**

Pîrozgeha Şêx Xelîl li nav bajar, li nav goristana mezin e. Ji ber vê yekê navê goristanê Mezelên Şêx Xelîl lê kirine.

**Erqenîs**

Erqenîs, li ser gundê Tewerzê ye. Ava wê gelek sar û şîfa ye. Ava wê ya sar laşê mirov dişdîne û wê zîndî digire. Tê gotin ku berê li navenda Farqînê ava kaniya Mezin jî heman wezîfe dîtiye, mixabin niha kaniya Mezin nemaye.

**Zêvetirk**

Li devera Hesûnê, li çiyayê Zerbiya ye. Li hember gundên Tilmîn û Zerbiyayê ye. Devereke dîrokî ye. Lê heta niha li herêmê lêkolîn nehatine kirin ka ew ji kîjan zemanî û ji aliyê kîjan gelî ve mane.

**Girkûvî**

Girkûvî li ser girekî ye û navê xwe ji vî girî girtiye. Ango girê kûviyan e. Di navbera Tîrkevankê û Dêrika Miqûrê de ye.[38] Kesên ku tawî û bawî dibin, diçin ser ziyaretê û pişta xwe di kêleka gorê de didin.

[37] Mahabad Arda, Amidakurd.com, Farqin

[38] Gotina 'dêrik' di kurdî de xwedî du wateyên cuda ne. Yek jê dêr e ku cihê pîrozgeha xiristiyanan e û ya duyem jî tê wateya cihên xerabe, wêran, cûmbûyî...

Institut kurde de Paris

### Qarça Palê

Qarça Palê li herêma gundê Herşenê ye. Zîyaret bi xwe gora Mele Xelîlê Teraşî ye. Xelkê herêmê her sala di roja 1ê gulanê de diçin ser vê pîrozgehê. Pez dikin gorî. Tirş û goşt dixwin. Wek festîvalê dest bi kêf û dîlanê dikin.

### Ziyareta Sine

Zîyareta Sinê li herêma Babîna ku mezreya gundê Dêrûnê ye. Di tixûbê Farqînê de ye. Li Licê bi navê Sinê gundeke mezin heye. Gund li ser Licê ye. Sinî ne kurd in û ne misilman in. Zimanê wan dimîne erebî. Li gundê Sinê bi xwe jî zîyareta Şêx Muhammed heye.

## Çandinî

Farqîn li bin qûntara çiyayê Elbatê ye. Li bakur ango li herêma çiyê zeviyên ji bo çandiniyê kêm in. Başûrê Farqînê deşt e. Ne bi tenê aliyê başûr herweha aliyê rojava û rojhilat jî beşeke mezin deşt e. Deşta Farqînê an Silîvan dibêjinê. Deşteke bi xêr û ber e. Berê bi piranî çandiniya hebûbatan dihat kirin. Giranî li ser çandiniya genim, ceh, nîsk, nok û titunê bû. Lê di van salên dawî de bi çêkirina bendavan re deşta Silîvan bi piranî jî herêma Mala Badê bûye avî. Çandiniyeke modern dest pê kiriye. Li gor statîstîkên sala 2008an çandina genim (35.000 hektar ), ceh (11.000 hektar) û nîsk (19.000 hektar), pembo (4.500 hektar) û titun jî (790 hektar) e. Rewşa zevî û beşa çandiniyê li gor statîstîkên sala 2009an weha ye.[39]

| qada axa Silîvan bi giştî | 1.373.000 da |
|---|---|
| ji bo çandiniyê | 880.000 da |
| daristan | 230.000 da |
| cihê çêrê | 94.000 da |
| zeviyên beyar û qerax | 169.000 da |
| avî û dikare were avdan | 100.000 da |
| çandiniya bejî | 780.000 da |

[39] Diyarbekır Il Tarım Müdürlüğü İstatistiklari

Berê hem li herêmên li çiya hem li deştê heywan wek bizin, mîh, ga, gamêş, mange û herweh yên din jî dihatin xwedî kirin. Niha hem li çiya û hem li deştê xwedîkirina heywanan gelek kêm bûne. Li gundên çiya ji ber zixt û zora dewletê xwedîkirina heywanan hema hema nemaye.

## Gundên Farqînê

**Aslo** (Darköprü) dikeve rojavayê navenda Farqînê. Ji Farqînê 22 û ji Amedê jî 66 km dûr e. Nifûsa gund 290 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Baxçecik mezreya wê ye. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Atşa** (Susuz) dikeve rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 13 û ji Amedê jî 73 km dûr e. Nifûsa gund 510 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Avenek** (Sulak) dikeve başûrê Farqînê. Ji Farqînê 20 û ji Amedê jî 106 km dûr e. Nifûsa gund 900 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Garisiya Dirsê (Düzova), Kanîqulê (Soğukpınar) û Yeşildere mezreyên wê ne. Gundekî kevn e û tê gotin ku di dema xwe de gundê Ermenî û Kurdan bûye. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Babodîn** (Bellibahçe) dikeve başûrê rojhilatê Farqînê. Tê gotin ku navê gund ê herî kevn Xaço bûye. Gundê Ermeniyan bûye. Ji Farqînê 12 û ji Amedê jî 98 km dûr e. Nifûsa gund 120 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Li herêma gund du zîyaret hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Baqûz** (Onbaşılar) dikeve bakurê Farqînê. Tê wateya cihê ba û bahozê. Di zemanê xwe de gund nîve nîv Ermenî û Kurd bûne. Ji Farqînê 12 û ji Amedê jî 94 km dûr e. Dîroka gund 700-800 sal heye. Nifûsa gund 470 e. Kufrî (Dorukardı) mezreya wê ye. Ziyareta Şêx Fatmayê li gund e. Zana Farqînî ji vî gundî ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Başboyik** (Başıbüyük) dikeve rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 12 û ji Amedê jî 74 km dûr e. Nifûsa gund 290 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Azdîn (Ayrancı) û Mala Zorê (Çay) mezreyên wê ne. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Başnîq** (Bağdere) dikeve rojavayê Farqînê û li ser riya Farqîn û Hezroyê ye. Ji Farqînê 28 û ji Amedê jî 62km dûr e. Nifûsa 380 e. Berê nehiye bû û 11 gund li ser bûn. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan û mizgeft, telefon û elektrîk hene. Rê asfalt e.

**Başqa** (Altınkum) dikeve bakurê Farqînê. Ji Farqînê 38 û ji Amedê jî 124 km dûr e. Li ber peravê bendava Batmanê ye. Nifûsa gund 300 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Keleke navdar li herêma gund heye û hîn jî dîwarê kelê li ser xwe ye. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Baxça** (Bahçe) dikeve rojhilatê Farqînê. Ji Farqînê 10 û ji Amedê jî 96 km dûr e. Nifûsa gund 170 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Di demên berê de tê gotin ku gundê Ermeniyan bûye. Piştre şêx Îbrahîm 250 sal berî niha ji herêma Botan ji Bilcûna hatiye û gund ava kiriye. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e. Piraniya gundiyan li Farqîni di karê dewletê de dixebitin. Gund wek hevîngeh tê bi karanîn. Li gund du kaniyên dîrokî hene. Li gund bexçeyên hejîran heye û navê wê Beynatî ye.

**Belawela** (Çiğir) dikeve başûrê rojhilatê Farqînê. Ji Farqînê 20 û ji Amedê jî 104 km dûr e. Nifûsa gund 740 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Helêlî (Gündüzlü), Kelaxa (Üçkardeşler) û Pîlekan (Mülükçayır) mezreyên wê ne. Li mezreya pîlekan zîyareta Şêx Xelîl heye. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Bereket** (Bereketli) dikeve başûrê Farqînê. Ji Farqînê 28 û ji Amedê jî 111 km dûr e. Gundekî nû ye di sala 1980î de hatiye avakirin. Nifûsa gund 200 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Bilbil** (Gündüzköy) dikeve bakurê rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 10 û ji Amedê jî 90 km dûr e. Serebê mezereya wê ye. Nifûsa gund 440 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Dêrika Emerê Reşo** (Düzalan) dikeve başûrê rojhilatê Farqînê. Dêrik li vir tê wateya xerabe. Yanî Xerabeyê Emerê Reşo. Ji Farqînê 18 û ji Amedê jî 104 km dûr e. Nifûsa gund 1370 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Qaramûs û Zorava mezreyên wê ne. Li gund dibistan heye. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Dida** (Yeşilbahçe) dikeve başûrê rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 28 û ji Amedê jî 71 km dûr e. Heta sala 1915 gundê Ermeniyan bûye. Nifûsa gund 275 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Çêkiya (Çukurkaynak) mezreya wê ye. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Boşat** (Boyunlu) dikeve bakurê Farqînê. Ji Farqînê 10 û ji Amedê jî 96 km dûr e. Bi kurdî tê wateya cihê pirav û bexçe. Boşat gundekî pir kevn e. Ji dema neolotîk ve mirov li wir jîyane. Li derdora gund şikeft û nawis hene. Ango ji Farqînê pir kevintir e. Weha xûya dike di gelek serdeman de Boşat ciyekî girîng bûye. Kela Boşatê bi navûdeng e. Kele li ser tehtekî yekperçe û mezin hatiye çêkirin. Li ser kelê figurekî padîşah Erdeşêr heye. Di nav du zinaran de çarşiyeke biçûk heye û navê wê Keytûn e. Kaniya şîfayê li Boşatê heye û navê wê Erqenîs e. Kesên ku bi sorik û zerikê dikevin diçin ava kaniyê ya sar li xwe dikin û rehet dibin. Zîyareta Şêx Zeydîn jî li herêma gundê Boşatê ye. Herweha li Boşatê koşka Sadik Begê jî heye lê niha ev koşk nîv xerabe ye. Nifûsa gund 800 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e. Strana Kemberzêrê ya Boşatê ye:

*Kemberzêrê kember zêr*
*Kemberzêrê Qaş mermer*
*Fîstan sorê kezî zer*
*Kembera xwe dida ser*
*Lawik xemla xwe girêda*

Institut kurde de Paris



Kela Boşatê
Foto: Nejat Satıcı

*Reş rihana xwe dida ser*
*Kemberzêra heldayî*
*Bav delala heldayî*
*Xizêm zêra badayî*
*Feq tu ji lewra axayî*
*Kemberzêra Boşatî*
*Bav delala Boşatî*
*Tu bi xizêma şimşatî*
*Zû çûyî dereng hatî*
*Kemberzêra zin zinî*
*Bavdelala zin zinî*
*Xizêmzêra mezin î*
*Bimrî û bijî a min î!*

Institut kurde de Paris

**Cûmat** (Dağcılar) dikeve bakurê Farqînê, ji navenda Farqînê 50 û ji Amedê jî 136 km dûr e. Tê gotin ku ji civatê bûye Cûmat. Nifûsa gund 100 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Tilbistîn (kayabağı) û Hindêse (Üçdirek) mezreyên wê ne. Li Gaza Êlûnê pîrozgeha Şêx Mehemd heye û di 14ê meha gulanê de xelk diçe tewafiyê. Li gund dibistan tune. Riya gund qûmkiri ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Çîçikan** (Ormandışı) dikeve bakurê Farqînê. Navê xwe ji çûçikan (çûkan) girtiye. Ji Farqînê 23 û ji Amedê jî 120 km dûr e. Nifûsa gund 250 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan , telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Çirik** (Tokluca) dikeve başûrê rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 18 û ji Amedê jî 80 km dûr e. Nifûsa gund 590 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Îslam mezreyên wê ye. Li gund dibistan heye. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Dêrika Mi[illegible]rê** (Demirkuyu) dikeve bakurê rojhilatê Farqînê. Ji Farqînê 23 û ji Amedê jî 109 km dûr e. Nifûsa gund 1600 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Huseynkan (Arıçatak), Malahermo (Darıseven) û Mistikan (Esenyol) mezreyên wê ne. Li mezreya Malahermo aveke pir û xweş heye. Di navbera gund û mezreya Tîrkevankê de zîyareta Girkûvî ye û ji bo tawî û bawiyan şîfa ye. Gundê Kepo ye û dibistan ji aliyê malbata wî ve hatine çêkirin. Dibistana seretayi û nexweşxane hene. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Dêrika Derûnê** (Akçeltik) dikeve rojhilatê Farqînê. Ji Farqînê 18 û ji Amedê jî 104 km dûr e. Nifûsa gund 380 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Soran (Alakumlu) mezreya wê ye. Li gund bi navê Darika Çoçinî ciyek heye. Di demsala havînê xelk li wir dicive û seyran û şahîyê dikin. Li gund dibistan heye. Riya gund qûmkirî ye, av, telefon û elektrîk li gund hene.

**Dêrûn** (Dutveren) dikeve rojhilatê Farqînê. Ji Farqînê 15 û ji Amedê jî 92 km dûr e. Nifûsa gund 520 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Babina (Kaldırımbaşı) mezreya wê ye. Li gund dibistan, telefon, mizgeft û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris

**Emerika** (Kumgölü) dikeve bakurê rojhilatê Farqînê. Ji Farqînê 50 û ji Amedê jî 166 km dûr e. Emerika şaxek ji eşireta Badikan e. Gund navê xwe ji wê girtiye. Gundeke gelek kevn e. Tê gotin ji sala 1185an vir ve mirov li gund bi cih bûne. Elika (Susamış), Kemûk (Köksüren), Remdankan (Dörtçatı), Xidirşah û Ziyaret mezreyên wê ne. Li herêma gund zîyareta Şêx Maezê Cebelî heye. Jêre zîyareta Hivdê Adarê jî dibêjin. Her sal di 17ê Adarê de li wir dibe wek mîhrîcanê. Gund li nêzîkî bendava Batmanê ye. Piraniya gundiyan masîvanî dikin. Li mezreya Elikan her sal festîvala bi nave Miradan li dar dixin. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Di qeraxê bendava Farqîn û Êlihê ye. Nifûsa gund 1000 e. Riya gund qûmkirî ye.

**Fêra** (Beypınar) dikeve başûrê rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 17 û ji Amedê jî 95 km dûr e. Navê xwe ji yekê, tekbûnê digre. Dibe ku cara pêşi bi tenê xaniyekê li wir were avakirin. Nifûsa gund 820 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Ferhend** (Kayadere) dikeve bakurê Farqînê. Ferhend tê wateya rêber. Ji Farqînê 15 û ji Amedê jî 101km dûr e. Nifûsa gund 130 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene. Tarîxa hatina wan ne diyar e, lê Xiyî ne û ji herêma Culemergê hatine û li gund bi cih bûne. Gundê Mala Ezîzane (Ezizoğlu) û li gund koşka Mala Ezîzan heye. Niha ev koşk nîv xerabe ye.

**Fişat** (Çaldere) dikeve bakurê rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 20 û ji Amedê jî 120 km dûr e. Tê gotin ku gund navê xwe ji fişefişa avê girtiye. Nifûsa gund 35 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan tune. Riya gund stabîlîze ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Garisiya Ulya** (Duru) dikeve başûrê Farqînê. Garisiya Ulya jî dibêjin. Ji Farqînê 17 û ji Amedê jî 96 km dûr e. Nifûsa gund 160 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan hatiye girtin. Riya gund qûmkirî ye. Telefon û elektrîk li gund hene.

**Girikê Boto** (Çevriksu) dikeve başûrê rojhilatê Farqînê, li devê çemê Batmanê ye. Ji Farqînê 18 û ji Amedê jî 104 km dûr e. Nifûsa gund 2.888 e.

Institut Kurde de Paris

Li gund dibistan û nexweşxane hene. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Tesîsên avê û kanalîsazyonê, telefon û elektrîk li gund hene.

**Golmez** (Görmez) dikeve rojavayê Farqînê, ji Farqînê 15 û ji Amedê jî 75 km dûr e. Nifûsa gund 240 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye. Riya gund qûmkirî ye. Telefon û elektrîk li gund hene. Tê gotin ku gundê Ermeniyan bûye û di sala 1121 ji aliyê Hecî Cemîl ve hatiye dagîrkirin.

**Gundikê [illegible]qşeref** (Çiftliçevre) dikeve bakurê rojhilatê Farqînê. Ji Farqînê 48 û ji Amedê jî 134 km dûr e. Piraniya axa gund ketiye bin ava bendava Batmanê û gundiyan ji gund bar kirine. Çend mal li derdorê mane.

**Gulemîra** (Doluçanak) dikeve başurê rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 42 û ji Amedê jî 60 km dûr e. Mîrên herêmê dest dane ser gund û navê Gulemîra ji wir tê. Nifûsa gund 556 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye,

**Gundê C[illegible]o** (Yeşerdi) ji Farqînê 6 û ji Amedê jî 102 km dûr e. Berê gundê Ermeniyan bûye. Sembola gund Dara Aplo ye ku di sala 2007an de bayê zerar daye dara dîrokî. Li herêma gund kaniya Tatos, kaniya Kibo û girê Qîro bi navûdeng in. Avî ye. Di qetlîama Ermeniyan de gelek kes li newala nêzîkî gund hatine kuştine û loma ji wê derê re dibêjin Çala Fileyan. Nifûsa gund nêzîkî 800î ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Gundikê Hecî Îbrahîm** (Güzderesi) dikeve rojhilatê Farqînê. Ji Farqînê 14 û ji Amedê jî 100 km dûr e. Berê gundê Ermeniya bûye. Li gund bîra Fileyan û girê Pîrê, ziyareta Şêx Huseyn hene. Nifûsa gund 740 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Dasinan (Sarıkuşak) û Serê Gir (Görenköy) mezreyên wê ne. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Hacîca** (Karacalar) dikeve başûrê Farqînê. Ji Farqînê 16 û ji Amedê jî 104 km dûr e. Gundê Ermeniyan bûye û piştî qetlîma Ermeniyan Kurd lê bi cih bûne. Nifûsa gund 600 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris

**Hacîreşê** (Karahacı) dikeve bakurê rojavayê Farqînê, ji Farqînê 13 û ji Amedê jî 106 km dûr e. Nifûsa gund 579 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Baykê (Yayıklı) mezreya Hecîreşkan e. Li gund dibistan, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Helda** (Görentepe) dikeve bakurê Farqînê. Ji Farqînê 17 û ji Amedê jî 95 km dûr e. Nifûsa gund 150 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund Qonaxa Elî Begê heye. Avahiyeke bi heybet e. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund stabîlîze ye.

**Heşter** (Otluk) dikeve bakurê rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 11 û ji Amedê jî 89 km dûr e. Tê gotin ku navê xwe ji hêştir (qatirê) girtiye. Berê gundê Ermeniyan bûye. Nifûsa gund 280 e. Girbilok (Gördük) mezreya wê ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Herşen** (Arıköy) dikeve bakurê rojhilatê Farqînê. Ji Farqînê 8 û ji Amedê jî 95 km dûr e. Nifûsa gund 420 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Mîrangan mezreya wê ye. Rezên gund bi navûdeng in. Li gund gora Mele Xelîlê Teraşî wek zîyaretê ye. Li gund dibistan, mizgeft, av, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Hesendelya** (Nohuttepe) dikeve rojhilatê Farqînê. Ji Farqînê 12 û ji Amedê jî 93 km dûr e. Nifûsa gund 180 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund stabîlîzekirî ye.

**Hêlîn** (Yuvaköy) dikeve başûrê Farqînê. Ji Farqînê 13 û ji Amedê jî 99 km dûr e. Nifûsa gund 270 e. Berê gundê Ermeniyan bûye. Niha gundê Huseyn Axa ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Sûlan, Elebengîn û Bameydan mezreyên wê ne. Li Bameydanê zîyareta Şêx Mehemed heye. Li gund dibistan, qereqol, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Huseynan** (Sulubağ) dikeve rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 26 û ji Amedê jî 60 km dûr e. Nifûsa gund 570 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Kinyat

Institut Kurde de Paris

(Köprülübağ) û Zorava mezreyên wê ne. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kanîspî** (Gürpınar) dikeve bakurê Farqînê, ji Farqînê 10 û ji Amedê jî 94 km dûr e. Bêzwan, Çelikler û Hokanê mezreyên wê ne. Tê gotin ku ji eşireta Şevlera bi navê Xelo yek pêşî hatiye Qulfayê. Xelo lawekî xwe li Qulfayê hîştiye û çûye (1725) gundê Bêzwanê ava kiriye. Li herêma gund pîrozgeha Cimşa û Şêx Emînê Bêzwanî hene. Nifûsa gund 870 e. Bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Kepo**/Kelê (Başdeğirmen) dikeve rojhilatê Farqînê. Ji Farqînê 17 û ji Amedê jî 103 km dûr e. Nifûsa gund 780 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Berê gundê Ermeniyan bûye. Li gund kele û qoteke dîrokî hene. Aveke pir û gurr li gund heye ku jê re dibêjin ava Bazmarê, ev av li herêmê bi navûdeng e. Li gund dibistan, av, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kilêsiyê** (Akyol) dikeve rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 8 û ji Amedê jî 74 km dûr e. Nifûsa gund 235 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Xincikan û çemê Golê mezreyên wê ne. Li gund av, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Korît** (Umurköy) dikeve başûrê Farqînê. Ji Farqînê 2 û ji Amedê jî 86 km dûr e. Ji ber ku gund di kortê de ye navê Korît lê kirine. Nifûsa gund 515 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Heremşeytan mezreya Korîtê ye. Li gund dibistan , telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye. Gundê Ermeniyan bûye. Piştî fermana Ermeniyan Kurd li gund bi cih bûne.

**Kurbeyt** (Çiğdemli) dikeve bakurê rojhilatê Farqînê. Kurbeyt bi suryanî gundê malê ye.[40] Ji Farqînê 7 û ji Amedê jî 93 km dûr e. Gora helbestvanê bi navûdeng Siyapûş li Kurbeytê ye. Nifûsa gund 340 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kurêşa** (Şanlıköy) dikeve başûrê rojavayê Farqînê. 20 km ji Farqînê dûr e. Gundekî nû ye. Kaniya Gula mezreya wê ye. 200 nifûs li gund hene. Li gund mizgeft, av, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

[40] Nisanyanmap.com, li beşa Silvan binêre.

**Mala Elîkê** (Kazandağı) dikeve bakurê rojhilatê Farqînê, ji Farqînê 24 û ji Amedê jî 11 km dûr e . Nifûsa gund 790 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Xapa (Kalemli) û Siltînî (Tarımova) mezreyên wê ne. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Mala Badê** (Çatakköprü) dikeve rojhilatê Farqînê. Ji navenda Farqînê 20 û ji Amedê jî 106 km dûr e. Di serdema Merwaniyan de gund hatiye avakirin. Pireya Mala Badê jî di serdema Merwaniyan de çêkirine û Artûkiyan jî di sala 1147an restore kirine. Nifûsa gund 2634 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Mêrgewaş** (Akçayır) dikeve başûrê Farqînê. Ji Farqînê 22 û ji Amedê jî 110 km dûr e. Navê orjînal Mêrgewahş e. Navê xwe ji mêrga wahşan digre. Nifûsa gund 500 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Kejikan (Güzelyürt), Gilgilo (Yeşilalan) û Gulîzeran (Sarıgül) û Pîrhesamê mezreyên wê ne. Li gund dibistan, av, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye. Gundî heywan xwedî dikin û bi çandiniyê re mijûl in.

**Mezrika Hêvo** (Kıraçtepe) dikeve başûrê rojhilatê Farqînê. Ji Farqînê 14 û ji Amedê jî 110 km dûr e. Nifûsa gund 1030 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Rê qûmkiri ye.

**Mîreliyan** (Alibey) dikeve rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 23 û ji Amedê jî 65 km dûr e. Nifûsa gund 230 e. Tê gotin ku bi navê Mîr Elî mirovekî dewlemend hebûye. Bi vî gundî re çend gundê wî yên din jî hebûne. Piştî wî zarokên wî mal û milkên bavê firotine û xwarine, nav û desthilatdariya wan nemaye. Nehî (Gündüzler) mezreya wê ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Omera** (Çobantepe) dikeve başûrê rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 50 û ji Amedê jî 87 km dûr e. Nifûsa gund 115 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Bi navê Cengîz mezreyek wê heye. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Pîrema** (Sarıbuğday) dikeve Rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 24 û ji Amedê jî 60 km dûr e. Mîrenga mezreya wê ye. Nifûsa gund 590 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Pîrexala** (Eskiköy) dikeve bakurê Farqînê. Ji du navan pêk hatiye: Kal û xal. Ji Farqînê 12 û ji Amedê jî 98 km dûr e. Nifûsa gund 260 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qazûxan** (Kumluk) dikeve rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 33 û ji Amedê jî 56 km dûr e. Nifûsa gund 375 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Weziyan (Topçay) û Melekan mezreya wê ne. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin. Li gund telefon mizgeft û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.



Institut kurde de Paris

**Qewşan** (Erikyazı) dikeve başûrê Farqînê. Ji erdên vala yên derdora gund re qewşan dibêjin. Gund navê xwe ji wir girtiye. Ji Farqînê 12 û ji Amedê jî 98 km dûr e. Nifûsa gund 260 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qeya** (Aşağıkaya) dikeve rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 35 û ji Amedê jî 50 km dûr e. Nifûsa gund 125 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qeyik** (Heybelikonak) dikeve başûrê rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 37 û ji Amedê jî 63 km dûr e. Nifûsa gund 230 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Heydereka (Bulaklidere), Newalê û Hişkamêrg (Kuruçayır) mezreyên wê ne. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qizlalê** (Kızlar) dikeve bakurê rojhilatê Farqînê. Ji Farqînê 44 û ji Amedê jî 130 km dûr e. Nifûsa gund 1040 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Deyîkan (Kayageçer) û Xweşa (Dilimalan) mezreyên wê ne. Li gund dibistan, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qurtê** (Yolarası) dikeve rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 11 û ji Amedê jî 70 km dûr e. Tê wateya çal, çixûr. Nifûsa gund 386 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Reşikê/Reşka** (Gökçetevek) dikeve rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 39 û ji Amedê jî 50 û ji Hezro jî 15 km e. Nifûsa gund 860 e. Gund ji aliyê neviyên Mîr Badî Malbata Avdesmo ve hatiye avakirin. Di sala 1950î de statûya gund girtiye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistana 8 polî heye. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Sahbê** (Yenidoğan) dikeve başûrê Farqînê. Ji Farqînê 20 û ji Amedê jî 102 km dûr e. Gund di navbera sînorên Farqîn û Êlihê de ye. Peşî 3 km nêzîkî vî gundî bi navê Semrex gundek hebûye û gund şewitiye. Mele Teyfûq û sê birayên xwe piştî şewata gundên hatine li vir gund avakirine. Dibêjin ku li derdorê pîrozgeh û eshabe pir bûne. Mele Teyfûq loma gotiye bila navê

Institut kurde de Paris

gund Sahbê be. Nifûsa gund 100 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Salikan** (Eşme) dikeve başûrê rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 20 û ji Amedê jî 76 km dûr e. Nifûsa gund 875 e. Gund di navbera sînorên Farqîn û Êlihê de ye. Silok (Sağlık) û Kibrıs Mezreyên wê ne. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Sehtê** (Eskiocak) dikeve rojhilatê Farqînê. Ji Farqînê 11 û ji Amedê jî 97 km dûr e. Tê wateya hişk. Nifûsa gund 70 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Hecî Çerkez (Toklar) mezreya wê ye. Li gund dibistan girtî ye, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Sêdeqnê** (Bayrambaşı) dikeve bakurê Farqînê. Ji Farqînê 20 km dûr e. Gundekî pir kevn e. Nifûsa gund nêzîkî 5.000î ye. Çend gomên (mezreyên) wê hene. Di sala 1992an de sîstema şaredariyê hatiye gund. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li Rojavayê wê çemê Hesikan û li bakur jî çiyayê Îlonê heye. Dikeve navbera bajarokên, Licê, Pasûr, Hezro û Farqînê. Bi çêkirina bendavê re, li ser çemê Hesikan herêm dibe wek bihuştê. Li gund, dibistan, nexweşxane, av û telefon hene.

**Sûsa** (Yolaç) dikeve rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 3 û ji Amedê jî 80 km dûr e. Gund navê xwe ji giyayê sûsê girtiye. Giyayê ku jê şerbeta sûsê tê çêkirin. Nifûsa gund 105 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan tune, lê zarok diçin Farqînê dixwînin. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene. Niha Yekîtiya Ewropa li gund çend projeyan daye dest pê kiriye.

**Şêliman** (Dolapdere) dikeve bakurê Farqînê. Ji Farqînê 60 û ji Amedê jî 146 km dûr e. Malê Gir, gundê Şawo, Malê Çalê û Zilek mezreyên wê ne. Niha nifûsa gund bi mezreyan ve 200 heye. Çar nawis li herêma gund hene. Ziyareta Şêx Hesen li gund e û roja 14ê gulanê diçin ser ziayaretê. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan tune. Riya gund qûmkiri ye, telefon û elektrîk li gund hene.

Institut kurde de Paris

**Şewlera** (Babakaya) dikeve bakurê Farqînê. Ji Farqînê 22 û ji Amedê jî 108 km dûr e. Nifûsa gund 170 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Şeblera Jêrîn mezreya wê ye. Tê gotin ku di sedsala 1800an de ji eşîreta Şevlera, Mamo gund ava kiriye. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Şêxdawidan** (Kutlualan) dikeve rojavayê Farqînê û ji Farqînê 35 km dûr e. Hezaza Reştî li gund heye. Cendirmeyên bejî Riştî kuştine û avêtine ve kortalê. Nifûsa gund 735 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Şifqet** (Çardakköy) dikeve bakurê Farqînê. Ji Farqînê 6 û ji Amedê jî 89 km dûr e. Li gor texmînan gund di sala 1910an de hatiye avakirin. Nifûsa gund 650 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Tallihê** (Çakıltaşı) dikeve başûrê rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 49 û ji Amedê jî 97 km dûr e. Li herêma gund goristana Pîthos heye. Ev yên dema berî îslamê ne. Mirî dişewitandine û dikirine kûpan. Kalikî (Dede) û Serikan (Harmancık) mezreyên wê ne. Nifûsa gund 160 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Taxik** (Taşpınar) dikeve bakurê Farqînê. Tax mahele û Taxik mahela biçûk e. Ji Farqînê 6 û ji Amedê jî 91 km dûr e. Nifûsa gund li derdora 700î ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene. Di sala 2009an şirketên petrolê di 700 metreyî de rastî çavkaniyên gazê hatine.

**Tewerz** (Keklikdere) dikeve bakurê Farqînê. Ji Farqînê 16 û ji Amedê jî 104 km dûr e. Nifûsa gund 505 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Kaniya Kewa (Keklikçeşmesi) mezreya wê ye. Gundekî dîrokî, avî û bi dar û ber e. Mêwe û sebzeyên gund bi navûdeng in. Gelek şikeft lê hene. Şikefta herî mezin li serê çiya ye ku her kes nikare derbikeve jorê çiya. Di nav wê şikeftê de ode

hene û li ser kevirên hundirê wê motiv hatine kolandin. Li gund, dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Tilmîn** (İncesu) dikeve başûrê rojhilatê navenda Farqînê. Ji Farqînê 8 û ji Amedê jî 94 km dûr e. Girê gund bi navûdeng e. Gund navê xwe ji wê girî (tilî) girtiye. Nifûsa gund 425 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Tirbespî** (Akdere) dikeve başûrê Farqînê. Ji Farqînê 7 û ji Amedê jî 87 km dûr e. Nifûsa gund 761 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Gundê Reşo (Karaköy) û Qaraelyan (Karaali) mezreyên wê ne. Li gund dibistan, av, telefon û elektrîk hene. Riya gurnd qûmkirî ye.

**Weysikan[illegible]èrîn** (Aşağıveysi) dikeve başûrê Farqînê. Weysika Sufla jî dibêjin. Ji Farqînê 11 û ji Amedê jî 90 km dûr e. Nifûsa gund 435 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Weysikan[illegible]orîn** (Yukariveysi) dikeve rojavayê Farqînê. Weysikana Ulya jî dibêjin. Ji Farqînê 9 û ji Amedê jî 85 km dûr e. Nifûsa gund 515 e. Girkinyat (bayatli) mezreya wê ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Xirba** (Yeniköy) dikeve rojhilatê Farqînê. Ji navenda Farqînê 5 û ji Amedê jî 85 km dûr e. Nifûsa gund 464 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Xerebguryan (Dinlendi), Zerbiyan (Söğüt) û Badikanê Kêşê (Yamaç) mezreyên wê ne. Li Zerbiya zîyareta Zêvetirkê heye. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Zêrê** (Güçlü) dikeve rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 10 û ji Amedê jî 73 km dûr e. Berê gundê Ermeniyan bûye. Di navbera Zêrê û Serebê de hîn jî dîwarên dêrê li ser piyan mane. Kaniyeke kevn a bi navê kaniya Hesen li gund heye. Nifûsa gund 198 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Rê qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris

**Zinzin** (Üçbasamak) dikeve bakurê rojavayê Farqînê. Ji Farqînê 14 û ji Amedê jî 101 km dûr e. Nifûsa gund 230 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gor gotinên gotinbêjan Kalê Zinzin çûye nêçîra kewan û tîh bûye. Mêze kiriye li newalê di bin dirikê de aveke sar heye. Vexwariye û piştre çûye ji malê bêr û tevşo aniye û kolaye û rastî cuyeka avê hatiye. Hema li wir xanî çêkiriye û navê Zinzin lê kiriye. Şêrelî (Daracık) û Heremo (Çiğyatağı) mezreyên wê ne. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Rê qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris



# Gêl

Gêl (Egil) dikeve bakurê Amedê. Ji Amedê 52 km dûr e. Rûerda wê çiya, gelî û newal in. Çemê Dîclê di rojhilatê Gêlê re derbas dibe. Niha li ser çemê Dîclê bendava Keça Qral û bendava Dîclê hatine çêkirin. Her derê Gêlê bûye av û bendav. Gêl tê wateya xelk an gel. Mezinahiya qada Gêlê 450 $km^2$ ye. Çar taxên navenda Gêlê hene. 23 gund û 24 mezre li ser Gêlê ne. Li gor statîstîkên sala 2010an nifûsa navenda Gêlê 5.146, ya gundan 18.093 û bi giştî nifûsa bajarokê 23.239 e.

Gelek desthilatdarên dagîrker hatine navenda Gêlê û herêma wê dagîr kirine, bi salan mane û di dawî de çûne. Her yekê ji wan bi zimanê xwe nav li Gêlê kirine. Navên ku heta niha li Gêlê kirine û hatine tespît kirin ev in. Gêl (bi kurdî), Aşipalis (bi asûrî), Welaraseko (bi ermenî), Encil-Enigelene (bi suryanî), Eagle-Artagigarta (bi romî), Basîlo (bi bîzansî) û Egil (bi tirkî).

Gêl ciyekî dîrokî ye û ji serdema kevirî ve hata niha mirov li wir bi cih bûne û jiyanê. Ji wê serdemê ve ku bi kêmasî 10.000-20.000 sal dike ku

Institut kurde de Paris



Dimenek ji Gêlê
Foto: Aşkın Zaman

mirov li herêmê jiyane, nawis , sarinc û şikeft kolane û ew heta îro mane. Piştî vê dema neolotîk a tarî mirov li herêmê Hûrî-Mîtaniyan dibîne ku êdî ji aliyê gelek dîrokzan, arkeologan ve tê gotin ku gelekî Hînd û Ewropî ne û bav kalên Kurdan in. Hûrî-Mîtanî gelê binecih in. Serdema wan berî mîladê 4000-1200an de ye. Piştre ji der ve hatine û herêmê dagîr kirine. Wek Ûrartû, Med, Pers, Îskenderê Mezin, Asurî, Roma- Bîzans (bz 69- pz 650), Ebasî (750-869), Selçûqî (1085- 1093), Tîmur 1394-1401), Aqqoyunî 1401-1507), Sefafi û Osmanî 1515 û heta niha.

Li gor Şerefnameyê Aşîreta Mirdasiyan di sala 1029an ji aliyê Helebê hatine li Kela Gêlê girtine.[41] Pîr Bedî bi alîkariya eşîreta Mirdasiyan Kela Gêlê digre destê xwe. Piştre sultanên Selçûqiyan erîşê ser Kela Gêlê dikin û Pîr Bedir direve xwe dispêre kela Farqînê.

Li herêmê şopên dîrokî yên herî mayinde yên mayî yek jê yên Asûriyan e. Keleya ku çêkirine hîn îro jî li ser piyan e. Ev kele li ciyekî herî bilind, li ser tehtekî yekperçe hatiye lêkirin. Derdora wê newal û qerqezên kûr in. Aliyek kelê li ser çemê Dîclê ye û Dîcle dikeve rojhilatê wê. Hundirê keleyê vala ye. Çar rêyên avê wek tunelê di bin kelê de diçe çemê Dîclê. Li derdora kelê ji

[41] Şerfexanê Bedlisi, Şerefname (wergera Ziya Avci) Weşanên Apec r. 211, 2004-Stockholm



Institut kurde de Paris



keviran bi qasî 100 sarinc hene ku bi ava baranê tije dibin. Li ser kelê wêneya qiralê Asuriyan heye û bi nivîsên mîxî hatiye nivîsîn. Li bakurê rojhilatê kelê li berava bendava Dîclê goristanên kiral û mezinên Asuriyan hene, lê wek xerabe mane. Li rojhilatê wan tuneleke heye ku dadikeve nav çemê Dîclê. Hezar mixabin niha xitimiye. Dibêjin ku dema Şahpûrê Duyem kelê girtiye van gorên Asuriyan xerab kiriye.

Di nav newala kur de di herêma Dêranê de ji dema kevirî ve gelek nawis hene. Ji wan re dibêjin nawisên Dêranê. Dema bendav hat lêkirin, hinek ji wan ketin bin avê û hinek jî li jorê avê mane.

Sê hamamên dîrokî li Gêlê hene. Yek li herêma Dêran, yek li taxa Teke ya din jî li kela kevn in. Hamamên li Teke û Dêran e ketine bin ava bendava Dîclê.

Li derdora Gêlê gelek cihên dîrokî hene. Bi taybetî ji dema Subarî û Hûrî-Mîtaniyan ve wek herêmên, Çêrmûg, Erxenî, Pîran, Hêne, Licê Pasûr, Hezro û Farqinê nawis û sarinc hene. Nawis, sarinc û şikeftên van herêmên bakurên Amedê hema hema wek hev in.

Li Gêlê du kaniyên dîrokî yên bi kumbet hene. Navê yekê kaniya Ceyno

Institut kurde de Paris



Bendava Diclê
Foto: Ahmet Dogru

(Jinan) û ya din jî kaniya Camêrdo (Ciwanmêran) ango ya Mêran e. Navên herdu kaniyan jî orjînal bi zaravayê kirmanckî ne. Kes nizane ev herdu kanî kengê hatine çêkirin. Kaniya Ceyno bi tenê jin ji wir avê dibin malê. Firaq û alavên xwe, cilûberg, palas, meşref, oberî, kilîm û xaliyên xwe li ber dişon. Kanî sê beş e û li navê du kumbet li kêleka hev in. Hemzeke biçûk li pêş wê heye ku jin di wê de cilûberg û firaq û alavên xwe dişon.

Kaniya Camêran niha xerabe ye. Kemberê wê yên ku mane geometrîk in. Ji kevirên zer ên gewre çêkirine.

Li Gêlê gora Hz Elyesa û gora Zulkîf Pêxember hene. Gorên Nêbî Harûnê Asafî (kes nizane pêxember bûye an na, lê weha hatiye qebûl kirin), Nebî Hallak (di destpêka Gêlê di nav goristanê de ye), Zenûn, Danyal, lawê apê Elyes Hûrmuz, xwarziyê Nebî Harûn û cîgirê wî Ruyem û çendên din hene. Ji ber vê yekê ji Gêle re dibêjin welatê pêxemberan. Li vir girê Aldir jî heye ku bi navê Qelakij xerabe hene. Qelaqij yanî Kela Qijikê. Tê gotin ku berê li wir du peyker hebûne. Serê yekê serê şêr û yê din jî qertelê duserî ye. Ji ber serê qertel ê duserî, xelkê herêmê navê Kelakij li kelê kiriye.

## Gora Elyesa



Hz.Elyesa ku tê gotin ji Îsraîlan re wek Pêxemberî hatiye şandin. Ji pêxemberiya wî bawer nekirine û Îsraîlî lê hatine xezebê. Hz. Elyesa lawê Şafat e ku li Îsraîlê bz di sedsala VIII. de jiyaye. Hinek lêkolîner dibêjin na, gora Hz Elyesa li Samîriyeyê ye û hinek jê dibêjin na, li Rihayê li gundê Eyûb Nebî ye.[42] Ji ber sedemê ku îsraîliyan bi gotina Elyesa nekirine, Xwedê zilm û zordariya Asûriyan bi serê wan re aniye.

Li gor gotinên gotinbêjan Elyesa hatiye herêmên Amed û Gêlê. Ew gora ku di hundirê başurê wê de nivîsa erebî bi stîla kufî heye. Gor ji bo di bin bendavê de nemîne bi destûr û alikariya dewletê ji taxa Tekê birine Qotê Nebî Harun. Gora Hurmuz li wir di bin avê de maye. Tê gotin ku Hurmuz lawê Apê wî bûye.

**Hz Zulkîf** lawê apê Hz. Elyesa bûye û bi hev re hatine herêmê. Wek tê zli çiyayê Erxeniyê jî zîyareta Hz Zulkîf heye. Piştî Hz. Elyesa, Hz. Zulkîf ciyê wî digre. Navê wî yê esasî Buşre ye. Ji 750 vir de gora wî ji aliyê alimên deverê ve li Gêlê hatiye qebûl kirin. Gora wî 3- 4 km li dervayê bajêr li mezra Heciyan e. Ji bo ku gora wî di bin bendavê de nemîne, di sala 1995 de tevî gora Elyasa Pêxember birine Qotê Harûn Nebî.

Li Gêlê mizgefta Taciyan a dîrokî heye. Pîr Bedir di sala 1040î de vê mizgeftê ava kiriye. Pîr Bedir mîrê Gêlê bûye. Ev mizgeft dikeve başûrê kela

[42] Ali Melek & Abdullah demir, Dini degerleriyle Diyarbakır, Diyarbakır Il Müftülügü yayinları-2009

Institut kurde de Paris

Gêlê û niha xerabe ye.

Di nav kela Gêlê de dêrek heye ku jê re dibêjin *Dêra Şikeftê*. Li ser dîwarên dêre sembolên cuda cuda hene. Ji bo mezhebên xirîstiyanan wek dêreke mozayîk be û hemû mezheban bihewîne. Tê gotin ku şagirdê Îsa, Aday di sedsala yekem de hatiye vê herêmê û di nav gelê herêmê de baweriya xirîstaniyê belav kiriye.

Li Gêlê dêra duyem ya Suryaniyan heye. Ev dêr pz di sed sala sêyem de hatiye çêkirin. Li ber dêrê gora pênc azîzan hene. Di nav kelê de bi mîmariyeke akustîkî hatiye avakirin. Gêl di dema desthilatdariya Asûriyan de bûye navendeke xirîstaniyê.

Institut kurde de Paris



# Şaredarî

Li Gêlê ji sala 1965î ve şaredarî heye. Bi rêzê heta niha lîsteya şaredarên Gêlê weha ye:

Osman Eser
Zülküf Karakoç
Mehmet Çapanoğlu
Sabit Selim Karakoç
Mustafa Karakoç
Petek Elyusa Çapanoğlu

# Nivîskar, hunermend û dengbêj

**Lovanna**

Lovanna di navbera salên 507-587an de jiyaye. Bîzansî ye, zanyar û teologekî bi navûdeng e.

**Yuhannayê Gêlî**

Di sala 507an de Bajarokê Gêlê (Egilê) hatiye dinê. Li ser dîroka Dêran sê cîld pirtûkên wî hene. Yuhannayê Gêlî di sala 586an de miriye.

**Mehemedê Tepê**

Mehemedê Tepê di sala 1955an de li gundê Tepê hatiye dinê. Di 15-16 saliya xwe de dest bi stranan kiriye. Dibistan nexwendiye. Ji bavê xwe Huseyn û kalê xwe M. Salihê Heznê, di civat û şevbêrkan de hînî dengbêjiyê bûye. Piştî ku Huseynê Farî dest bi dengbêjiyê dike di bin bandora wî de dimîne û hin stranên wî distrê. Heta 20 saliya xwe li gund dimîne. Li gund şivanî û cotkariyê dike. Ji sala 1975an vir ve li Amedê dijî. Di înşaatan de dixebite.

**Sadiqê Têrkî**

Sadiqê Têrkî (Sadık Çevik) di sala 1971ê de li gundê Eyntirt ji diya xwe bûye. Dibistan nexwendiye. Stranên ku dibêje ji kal, meta xwe û ji civatan hîn bûye. Gelek stran jî wî bi xwe çêkiriye. Bav û kalên wî ji gundê Gozela navçeya Pîranê bar kirine Erûsekê. 50 sal li Erûsekê mane. Ji Erûsekê jî hatine Eyntirtê. 300 sal in li Eyntirtê ne.

◄ …orên qiralên Asûriyan li Gêlê
…oto: Melike Dara Günal

Institut kurde de Paris

# Gundên Gêlê

**Amînî** (Kalecik) dikeve rojhilatê Gêlê, ji Gêlê 42 û ji Amedê jî 93 km dûr e. Nêzîkî Gêlê ye, lê ji ber çêkirina bendavê rê bi dûr ketiye. Nifûsa gund nêzîkî 350î ye. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Basraf** (Sarmaşık) ji Gêlê 48 û ji Amedê jî 98 km dûr e. Nêzîkî Gêlê ye, lê ji ber çêkirina bendavê rê dûr ketiye. Nifûsa gund 730 e. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Bexşiyana Bendan** (Bahşılar) dikeve rojavayê Gêlê, ji Gêlê 9,5 km û ji Amedê jî 54 km dûr e. Bendan tê wateya bendavê. Nifûsa gund nezîkî 1000î ye. Bi navê Bozyan mezreyek wê heye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, hatiye girtin. telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Bîrsin** (Görünlü) dikeve rojavayê Gêlê, ji Gêlê 15,5 km û ji Amedê jî 64 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 600î ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene. Heta sala 1987 gund bi



Xem û hêvî li gundeki Gêlê
Foto: Aşkın Zaman

Institut kurde de Paris



navenda Amedê ve girêdayî bû û piştî sala 1987an dan ser Gêlê. Li gor gotinan heta niha gund heft caran hatiye şewitandin an jî xerabkirin û tim cihê gund hatiye guhertin. Di nav gundên Gêlê de rejiya xwendinê a herî zêde li vir e. Rez û zeviyên gund gelek zêde ne û çandinî gelek e. Heyderana Jorîn (Yukarıheyderan) û Gezeriya Jêrin (Aşağıgezerli) mezreyên wê ne. Gundî bi kurmancî dipeyivin.



Jineke ji Gêlê
Foto: Aşkın Zaman

Institut kurde de Paris

**Çelbîra** (Kırkkuyu) dikeve başûrê rojavayê Gêlê, ji Gêlê 10 km û ji Amedê jî 50 km dûr e. Gundê Ermeniyan bûye. Li herêmê gelek sarinc hene. Hinek dibêjin hejmara van sarincan 40 e. Di bin gund de tunelek heye. Nifûsa gund nêzîkî 200î ye. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Delûcanan** (Tepecik) dikeve rojhilatê Gêlê, ji Gêlê 17 km û ji Amedê jî 35 km dûr e. Gelek nêzîkî Gêlê ye, lê ji bo ku bendav hatiye avakirin, rê dûr ketiye. Nifûsa gund 345 e. Rezê Mistê (Mistikbağı), Berba, Murşil (Alazlı), Tortanî (Akçoban), Komik, Sabriyan û Kambab (Akçakapı) mezreyên wê ne. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Eyntirt** (Kayaköy) dikeve başûrê rojhilatê Gêlê, ji Gêlê 25,5 km û ji Amedê jî 35 km dûr e. Nifûsa gund ji 1500î bêtir e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Ferşikan** (Aşağıdöşemeler) dikeve başûrê Gêlê. Ji Gêlê 8 km û ji Amedê jî 50 km dûr e. Bi navê Ferşikana Jorî (Yukarıdöşemeler) mezreyek wê heye. Nifûsa gund nêzîkî 400î ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Kupiyan** (Düzlük) dikeve başûrê rojhilatê Gêlê. Ji Amedê 37 û ji Gêlê 30 km dûr e. Ji ber ku bendav hatiye çêkirin rê bi dûr ketiye. Nifûsa gund 370 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kurkiyan** (Baysu) dikeve başûrê Gêlê. Ji Gêlê 14 û ji Amedê jî 34 km dûr e. Nifûsa gund 520 e. Sê mezreyên wê hene. Ji wan navê yekê bawer e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li herêma gund bîrên petrolê hene. Li gund dibistan, telefon, mizgeft û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Metînan** (Sağlam) dikeve rojhilatê Gêlê, ji Gêlê 39,5 km û ji Amedê jî 95 km dûr e. Nifûsa gund li derdora 300î ye. Azîmo, Qirikxan û Terman mezreyên wê ne. Gelek nêzîkî Gêlê ye, lê ji bo ku bendav hatiye çêkirin çûndina gund dûr bûye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Rê qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris

**Metmûr** (Balım) dikeve bakurê Gêlê, ji Gêlê 33 km û ji Amedê jî 86 km dûr e. Nifûsa gund ji 300î derbas kiriye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Tê gotin ku li herêma gund gorên 40 eshabeyan hene. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Mûsan** (Taşdam) dikeve başûrê Gêlê, ji Gêlê 16 û ji Amedê jî 32 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 400î ye. Du mezreyên wê hene. Di sala 2010an de, li herêma gund bîrên petrole hatin kolandin. Di 1800 metreyî de petroleke pir û bi kalîte derketiye. Ev li herêma Amedê heta îro rezerva herî mezin e. Tê texmîn kirin ku ji van bîran 16 mîlyon varîn petrol werin derxistin.[43] Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qasan** (Kazanlı) dikeve rojhilatê Gêlê, ji Gêlê 11 û ji Amedê jî 40 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 900î ye. Sê mezreyên wê hene. Navê yekê Kubyat e Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qizilan** (Ilgın) dikeve bakurê Gêlê. Ji ber ku di navbera gund û Gêlê de bendav hatiye çêkirin riya gund dûr bûye. Nifûsa gund li derdora 500î ye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qonax** (Konak) dikeve başûrê Gêlê, ji Gêlê 15 km û ji Amedê jî 40 km dûr e. Mîrê Gêlê Mehmet Beg ji ber nêçîrê ji xwe re xaniyekî li çolê ava kiriye û jêre gotine Qonaxa Mehmed Begê. Piştre bûye gund û herweha navê Qonax lê maye. Nifûsa gund nêzîkî 300î ye. Gerguwa (Işıklı) mezreya wê ye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Li ser riya Amed û Gêlê ye û rê asfalt e.

**Rûtan** (Balaban) dikeve bakurê Gêlê. Ji Gêlê 23 û ji Amedê jî 40 km dûr e. Di sedsala 15an de ji aliyê Helebê hatine û li gund bi cih bûne. Nifûsa gund 880 ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li herêma gund Hezaza Rûtan heye ku jê re dibêjin Hezaza Fileyan. Di dema fermana Ermeniyan de, bi sedan

[43] Hurriyet Gazetesi, 2 Mart 2009

Hezaza Fileyan li gundê Rûtan →



Institut kurde de Paris

Ermenî bi mirî û zîndî avêtine vê hezazê. Hîn jî hestîyên wan li binê hezazê hene û xuya dikin. Li derdora gund gelek bîrên petrolê hene. Li gund dibistan, telefon, mizgeftên bi minare û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Sarîceg** (Sarıca) dikeve başûrê rojavayê Gêlê, ji Gêlê 22,5 km û ji Amedê jî 32 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 1900 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Herêma petrolê ye. Li gund bîr û depoyên petrolê hene. Navenda deverê ye. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund asfalt e.

**Selman** (Salman) dikeve başûrê Gêlê, ji Gêlê 14 û ji Amedê jî 45 km dûr e. Nifûsa gund ji 350î bêtir e. Gundekî dîrokî ye. Ji serdema Paleolitik ciwar hene. Li derdora kela Cibeb gelek nawis û şikeft hene ku di serdema kevirî de mirov di wan de jiyane. Bi zaravayê kurmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.



Institut Kurde de Paris

**Silêmanan** (Akalan) dikeve başûrê rojhilata Gêlê, ji Gêlê 18 û ji Amedê jî 30 km dur e. Nifûsa gund nêzîkî 800î ye. Di demên berê de gundê Ermenyan bûye. Sê mezreyên wê hene. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Riya gund asfalt e, dibistan, telefon û elektrîk li gund hene. Di 12 meha sibata 2010an de ji aliye rêxistina sivîl Yerel Gündem 21 ve, li dibistana gund pirtûkxaneyeke nûjen hatiye avakirin.

**Sofî Umeran/Înciya** (Meşeler) dikeve rojhilatê Gêlê, ji Gêlê 24 km û ji Amedê jî 38 km dûr e. Wek cografya nêzîkî Gêlê ye, lê ji ber ava bendavê rê bi dûr ketiye. Nifûsa gund li derdora 700î ye. Bedika (Aktaş), Paşiya (Ara) û Piçûka (Karataş) mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Şaweliyan** (Yatır) dikeve başûrê Gêlê, ji Gêlê 20 km û ji Amedê jî 30 km dûr e. Li gund gelek pîrozgeh hene, lê ya herî bi navûdeng Şahê Weliyan e. Lêbelê di demeke dûr û dirêj de bûye Şahweliyan. Li gor gundiyan navê ewliya yê rastî Muslum Sahbehesar e, lê jê re gotine Şahweliyan. Nifûsa gund 860 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.



Institut kurde de Paris

**Şelbetîn** (Kalkan) dikeve başûrê Gêlê. Ji Gêlê 12 û ji Amedê jî 38 km dûr e. Nifûsa gund 530 e. Bayindiran mezreya wê ye. Bi qasî 100-150 metreyî li rojhilatê gund li ser gireki biçûk du kumbet hene. Navên wan kumbetên Qasim Begê ne. Herdu jî xerabe bûne, lê hinek cihên wan hîn li ser piyan in. Yek ji wan a Qasim Bîn Şah Mehmed Begê ye. Ev şeş goşe ye. Kumbeta din çend metre ji ya Qasim Begê dûr e. Tê gotin ku ev kumbeta jî ya Mûrad Begê ye. Li gund xaneke dîrokî jî heye. Di sala 1561ê de xan hatiye çêkirin. Mûrad Beg di sala 1561ê de li ser navê kurmamê xwe Qasim Bîn Şah Mehmed Begê daye çêkirin. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund bîrên petrolê, dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Talanbiya** (Oyalı) dikeve başûrê Gêlê. Riya Amed û Gêlê di nav gund re derbas dibe. Satiya jî dibêjin. Ji Gêlê 15 km û ji Amedê jî 34 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 600î ye. Bawer û Ewan (Küçükaman) mezreyên wê ne. Gundekî dîrokî ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Tê goti ku gorên eshebeyan li herêma gund hene. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund asfalt e.

Institut kurde de Paris

◄ êlê dema rezan
şkın Zaman



Dimenek ji Hezroyê
Foto: Hüsamettin Bahçe

# Hezro


Hezro dikeve bakurê rojhilatê Amedê û 86 km ji Amedê dûr e. Navenda bajarokê li qûntara çiyaye Girê Habo ye. Li ser Hezroye 24 gund û 36 mezre hene. Hejmara taxên Hezroyê şeş in. Li gor statîstîkên sala 2010an nifusa navenda Hezroyê 4.554 e û ya gundan 12.947 e. Bi giştî nifus 17.501 e.

Navê wê yê kevn Hataro ye. Îhtîmala herî mezin Hataro bi ermenî ye. Herweha di qeydên Asûriyan de jî Hataro derbas dibe. Lê hinek Kurd jî dinivîsin ku bi kurdî ye û ji gotinên 'Hat' û 'ro' pêk hatiye. Yanî roj hat e. Demên berê li herêma Hezro, Kurd û Ermenî di nav hev de jiyane.

Herêma Hezro ji bo cihbûna mirovan gelek kevn e. Heta serdama kevirî diçe. Li gelek gundan nawisên ji kevir hene. Ji dema noelotîk ve mirov li vê herêmê jiyane. Hîn îro jî şikefta Qablê, gundê Şikeftan û gelek cihên din weke muzeyeke serdema kevirî ne. Wek bajarok û bajarên cîran Hûrî, Medî, Hatî, Pers, Asûrî, Romayî, Merwanî, Eyûbî, Selçûqî û herî dawî jî Osmaniyan herêmê dagîr kirine.

Li herêma Hezroya ciyên dîrokî yek jê jî Tercil e ku 5 km dikeve başurê rojavayê Hezroya îroyîn. Tercil îro gundekî biçûk ê Hezroyê ye û xerabeyên wê demê hîn jî hene. Şerefxanê Bedlîsî di Şerefnamê de dinivîse ku avakarê

Institut kurde de Paris



Dimenek ji Hezroyê
Foto: Hüsamettin Bah

# Hezro

Hezro dikeve bakurê rojhilatê Amedê û 86 km ji Amedê dûr e. Navenda bajarokê li qûntara çiyaye Girê Habo ye. Li ser Hezroye 24 gund û 36 mezre hene. Hejmara taxên Hezroyê şeş in. Li gor statîstîkên sala 2010an nifusa navenda Hezroyê 4.554 e û ya gundan 12.947 e. Bi giştî nifûs 17.501 e.

Navê wê yê kevn Hataro ye. Îhtîmala herî mezin Hataro bi ermenî ye. Herweha di qeydên Asûriyan de jî Hataro derbas dibe. Lê hinek Kurd jî dinivîsin ku bi kurdî ye û ji gotinên 'Hat' û 'ro' pêk hatiye. Yanî roj hat e. Demên berê li herêma Hezro, Kurd û Ermenî di nav hev de jiyane.

Herêma Hezro ji bo cihbûna mirovan gelek kevn e. Heta serdama kevirî diçe. Li gelek gundan nawisên ji kevir hene. Ji dema noelotîk ve mirov li vê herêmê jiyane. Hîn îro jî şikefta Qablê, gundê Şikeftan û gelek cihên din weke muzeyeke serdema kevirî ne. Wek bajarok û bajarên cîran Hûrî, Medî, Hatî, Pers, Asûrî, Romayî, Merwanî, Eyûbî, Selçûqî û herî dawî jî Osmaniyan herêmê dagîr kirine.

Li herêma Hezroya ciyên dîrokî yek jê jî Tercil e ku 5 km dikeve başurê rojavayê Hezroya îroyîn. Tercil îro gundekî biçûk ê Hezroyê ye û xerabeyên wê demê hîn jî hene. Şerefxanê Bedlîsî di Şerefnamê de dinivîse ku avakarê

Institut kurde de Paris

ve mîrîtiyê lawê şêx Hesenê Zirkî Seyîd Husên e. Du kelên wê hene: Kela Tercilê û Kela Daryan. Dêrzinî û Girdikan jî du şaxên Tercil û Entaxê ne. Mirên Entax û Tercilê pismamên hev in û Entaxî û Tercilî jî ji heman eşîretê ne.[44] Zirkî ne.

Li herêma Hezro Ermenî bi hejmar gelek bûne. Di dema Fermada Ermeniyan de ji heft saliyan heta heftê saliyan kuştine. Ya herî balkêş li Hezro, Çêrmûg û Çingûşê di dema Fermana Ermeniyan de hemûyan kuştine. Lêbelê li herêmên din ên Amedê yên ku ji ber kuştine mane koçber kirine. Li herêma Hezro Newala Xaço û Şikefta Dibûrî cihên komkujiya Ermeniyan in.

Herêma Hezro di dema Osmaniyan de, li ser Farqînê bûye. Di sala 1943an de li Hezroyê şaredarî hatiye damezrandin. Heta sala 1954an nehiya Farqînê bûye. Di sala 1954an de bûye bajarok.

Li herêma Hezroyê cihen dîrokî Kela Tercilê, Sahabuddû û Turbeya Şapûr in. Li navenda Hezroyê jî xerabeyên Sereya Mîr heye.

Li herêmê kanên rejî (komrê) û bîrên petrolê, hesin û kukurt hene. Lê hesin û kukurt hîn nehatine deranîn.

Di warê çandiniya nûjen de Hezro ne pêşketiye. Lêbelê aboriya xelkê navenda bajarokê û gundan bi heywan xwedî kirin û çandinî ye. Hinek gundên bajarokê li çiya û hinek jî li deştê ne. Qada axa Hezroyê bi giştî 419.000 dekar e. Ji wê 229.000 dekar ji bo çandiniyê dest dide. Zeviyên bejî 216.500 dekar, avî 12.500 dekar, mêrg û berih 16.500 dekar, daristan 95.000 dekar û li 79.000 dekaran jî çandinî nabe.[45] Li navenda Hezroyê amadeyiyek û çar dibistanên seretayi hene.

## Şaredarî

Mehmet Budak
Seyfi Budak
Muharrem Budak
Refik Okutmuş
Resul Dolan
Fetah Mehmetoğlu
Recep Dolan
Hamit Ergin
Fetah Mehmetoğlu

[44] Şerefxanê Bedlisi, *Şerefname*, ( wergera Ziya Avci), çapa Apecê rupel 273, Stockhol-2004
[45] Hezro Ilçe Tarım Müdürlüğü (Muduriyeta Ziretê ya Hezro)

Institut kurde de Paris

# Cihên dîrokî û pîrozgeh

**Ziyareta Mêraniyê**

Li gund bi navê Mêranî zîyaretek heye û gund navê xwe ji vê zîyaretê digre. Li gor baweriyê ew kesên bi nexweşiya felc dikevin dibin ser vê zîyaretê. Li wir şimikek heye wê di dev û rûyên nexweş de didin ku ew baş bibe.

**Ziyareta Şêx Şabedîn**

Li serê çiyayê Hezroyê ye. Di meha nîsanê de roja ziyaretê ye. Ji Hezro û der dorê gelek kes diçin ser ziyaretê û ew der dibe wek mîhrîcanê.

**Ziyareta Şêx Zeydîn**

Ziyareta Şêx Zeydîn nêzîkî navenda Hezroyê ye.

**Ziyareta Şêx Fexrî**

Ziyareta Şex Fexrî li nav goristana Hezroyê ye. Şêx Fexrî fermandarekî baş ê Şêx Seîd bûye. Piştî şer di navbera Hezro û Pasûrê de di şer de şehîd bûye. Wî bi çend hevalên wî ve kuştine û li ciheke avêtine çalekê. Xelk bi şev û bi dizî çûne cesedên wan anîne, şûştine û li goristana Hezroyê veşartine. Ji wê rojê bi şûn ve gora Şêx Fexrî bûye zîyaret.

**Şikefta Qablê**

Şikefta Qablê li çiyayê Qablê ye. Çiyayê Qablê nêzîkî navenda Hezro ye. Şikefteke gelek balkêş e. Wek tunelê ye û ji aliyê mirovan ve hatiye kolan. Ev şikeft bi qasî 4 kîlometreyan dirêj e. Di nav de gelek, rê, ode û salon ji kevir hatine kolan. Mirov hemû xelkê Hezroyê têde bi cih bike hîn tije nabe.

**Newala Kûrê**

Newala Kûrê bi qasî 2 km li rojhilatê Hezro dikeve. Bi qasî 200-300 salan berî niha Ermeniyan li wir kûre avakirine û dest bi derxistin û çêkirina hesîn kirine. Hesinê ku bi dest xistine, birine li herêma Amedê firotine.

Institut kurde de Paris



Dimenek ji taxa nû ya Hezroyê
Foto: Hüsamettin Bahçe

# Nivîskar û dengbêj

**Hilmi Akyol**

Hilmi Akyol di sala 1960î de li gundê Dêrsilê hatiye dine û salek piştre bi malbatî barkirine navenda Amedê. Dibistana seretayî, navîn û amadeyiyê li Amedê xwendiye. Bi qasî 10 salan şofertî kiriye. Heta niha du pirtûkên helbestan, sê pirtûk bi hevparî bi çend kesên din re amade kiriye. 15 berhevokên folklorik jî bi sere xwe tomar kiriye û wek pirtûk hatine çap kirin. Hemû xebatên wî li ser berhevkirina berhemên folklorik in. Niha li Mala Dengbêja kar dike.

**Muharrem Erbey**

Muharrem Erbey di sala 1969an de li Hezroyê hatiye dinê. Dibistana seretayî û navîn li Hezro û amadeyiyî jî li Amedê xwendiye. Huqûqê qedandiye û li Amedê dest bi parêzgeriyê kiriye. Di Komela Mafê Mirovan a Amedê de

Institut kurde de Paris

xebitiye û demeke bûye serokê wê. Erbey di rojnameyâ Özgur Gündemê de gelek nivîs nivîsiye. Heta niha bi navê *Kayip Secere* pirtûkek wî derketiye. Ji du salan bêtir e ku di girtîgeha Amedê de ye.

**Tewfîq Hêja**

Tewfîq Hêja di sala 1973an de li Hezroyê hatiye dinê. Dibistana seretayî li Hezroyê, ya navîn û amadehiyê jî li Amedê xwendiye. Di sala 1993ande ji ber sedemên polîtîk hatiye girtin. Li gelek girtîgehan maye û niha jî li girtîgehê ye. Li ser klasîkên kurdî lêkolînan dike. Helbestên wî di kovar û rojnameyan de hatine weşandin. Bi navê *Amedê* pirtûkeke wî ya helbestan hatiye çap kirin.

**Mehmet Dîcle**

Mehmet Dîcle di sala 1977an de li Hezroyê hatiye dinê û li wir heta amadehiyê xwendiye. Di sala 2003an de li Stanbulê Zanîngeha Erdnîgariyê qedandiye. Di gelek kovar û rojnameyan de nivîsên wî hatine weşandin. Di dibistana taybetî ya kurdî de mamostetî kiriye. *Asûs* û *Nara* du pirtûkên wî yên çîrokan derketine.

# Dengbêj

Li gor bajarokên din ên Amedê hejmara dengbêjên ji Hezroyê zêde ne. Balkêş e ku piraniya dengbêjên Hezroyî ji herêma Serhedê ji bajarê Çewlikê ne û di zemanê berê de hatine li herêma Hezroyê bi cih bûne. Me piraniya agahdariyên ku di derbareyê dengbêjên Hezro û Amedê de hene, ji Antolojiya Dengbêjan ku ji aliyê Hilmî Akyol ve hatiye amade kirin, wergirt.[46]

**Ehmedê Bêzikê**

Ehmedê Bêzikê di sala 1985an de li Hezroyê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Ahmet Yorulmaz e. Bi eslê xwe ji gundê Deyasê ye. Ji malbateke kirmanckî ye. Dibistan nexwendiye. Ji 20 saliya xwe ve distrê. Ji Mehmûdê Deyasî (Mehmûdê Hecî Hesen) hînî stranan bûye. Ehmedê Bêzikê dengbêjî û rênçberiya mala Sêvdîn Paşa kiriye.

[46] Hilmi Akyon (berhevkar), Antolojiya Dengbêjan, Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê çapa duyem-2011

Institut kurde de Paris

**Huzniyê Hezroyî**

Huzniyê Hezroyî (Hüsnü Ergen), di sala 1936an de li Hezroyê ji diya xwe bûye. Bi eslê xwe ji Çewligê ye. Ji Çewligê bi qasî 100-120 sal berê hatine Hezroyê. Dibistan nexwendiye. Di zarokatiya xwe de stran gotiye. Heya 15 saliya xwe li Hezroyê maye. Di 15 saliya xwe de malê barkirine Amedê. Hem dengbêjî kiriye, hem çûye dawetan stranên govendê gotiye, hem jî hostayê dîwaran e. Di sala 1995an de li Amedê miriye.

**Emînê Hecî Tahar**

Emînê Hecî Tahar di sala 1941ê de li taxa Bexçan a Hezroyê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Emîn Baygutalp e. Dibistan nexwendiye. Ji ber karê xwe pir geriyaye û gelek dengbêjên bi navûdeng nas kiriye. Ji 11 saliya xwe ve stranan dibêje. Ji dengbêjên mîna Ehmedê Bêzikê, Xelîfê Feqî Silêman, Reso, Ehmedê Tûtaxî, Feqî Smeîl û Cebê Hezroyî hînî dengbêjiyê bûye. Niha li Hezroyê dijî. Di nav gel de, gelek kasetên wî hene.

**Mihemedê Şêxanî**

Mehemedê Şêxanî di sala 1962an de li gundê Şêxanê hatiye dinê. Navê wî yê nasnamê Nasip İnci ye. Malbata wî ji Zozincê hatiye Şêxanê. Dibistana seretayî xwendiye. 22 salan li Şêxanê maye. Li Şêxanê cotkarî, rênçberî, paletî û rezvanî kiriye. Di sala 1984an de koçî Amedê kiriye. Li Amedê karê fayansan dike.

**Hesenê Kufercînî**

Hesenê Kufercînî di sala 1966an de li gundê Kufercinê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Hasan Ekinci ye. Heta dibistana navîn xwendiye. Demekê li gund cotkariyê kiriye û dûre koçî Amedê kiriye. Şoferê otobusê ye. Di sala 1989an de bi qasî sal û nîvekê di koroya Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê de cih girtiye.

**Arifê Helhelî**

Arifê Helhelî (Arif Sefer) di sala 1971ê li gundê Helhelê ji diya xwe bûye. Malbata wî nêzîkî 150 salî ye li Hezro ne. Ji Çewlikê hatine Hezroyê. Di 20

saliya xwe de dest bi stranbêjiyê kiriye. Bavê wî jî dengbêj bûye. Birayekî wî jî xweş stran gotiye. Ji Emînê Tahar û Delîl Dîlanar hîn bûye. Stranên Serhedê dibêje. Du sal bi tenê dibistan xwendiye. Di sala 1992an de mala xwe biriye navenda Hezroyê.

**Xagiyê Hezroyî**

Xagiyê Hezroyî (Hagi Söğütlü) di sala 1952an de li navçeya Hezroyê hatiye dinê. Bi eslê xwe ji Çewlikê ye. Bi qasî sed, sed û bîst sal berê hatine Hezroyê. Dibistan nexwendiye. Bi malbatî ji Hezroyê derneketine. Ji 15 saliya xwe ve stranan dibêje. Ji bavê xwe hîn bûye. Stranên Hecî Cemal, Şakiro û Huseyino dibêje. Miroveki xebatkar e.

**Seyfedînê Kufercinî**

Seyfedînê Kufercinî di sala 1951ê de li gundê Kufercinê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Seyfettin Söyler e. Dibistan nexwendiye. Li gund karên wekî şivanî û cotkariyê kiriye. Di sala 1991ê de hatiye girtin û nêzîkî pênc salan di girtîgeha Amedê de maye. Piştî derdikeve sê salan mala xwe biriye bajarê Stenbolê. Li Stanbolê şoferî kiriye. Di sala 1999an de cardin vegeriye Amedê.

**Aşemê Şukrî**

Aşemê Şukrî di sala 1953an de li bajarê Amedê gundê Dersilê ji diya xwe bûye. Dibistan nexwendiye. Navê wî yê nasnameyê Haşim Akyol e. Pêşiyên malbata wî ji Çewligê, ji navçeya Solaxan, ji gundê Şêxanê 150 sal berê hatine Hezroyê. Bi eslê xwe dimilî ne. Lê bi kurmancî dipeyivin. Ji deh saliya xwe de stranan dibêje. Piranî stranên M. Saliyê Beynatî û Emînê Hecî Tahar gotiye. Di sala 1993an de wefat kiriye.

**Cebê Emo**

Cebê Emo (Cabar Aslankılıç) li navçeya Hezroyê hatiye dinê, lê tarîxa bûyîna wî ne diyar e. Dibistan nexwendiye. Bi eslê xwe ji bajarê Çewlikê, ji Gundê Qilîça ne û hatine Hezroyê. Ji zaroktiya xwe de stran gotiye. Bi Feqî Silêman re ji Mala Paşê re dengbêjî kiriye. Di asta Feqî Silêman de bûye. Pez xwedî kiriye, rezvanî û cotkarî kiriye. Gelek stran çêkiriye. Di sala 1954an de li Hezroyê miriye.



Institut kurde de Paris

**Hecî Cemîlê Mala Lalo**

Hecî Cemîlê Mala Lalo (Cemil Yetişir) di sala 1916an de li navçeya Hezroyê ji diya xwe bûye. Bi eslê xwe ji bajarê Çewlikê, ji eşîra Tabsîn e. Ji sê bavan de li Hezroyê ne. Dibistan nexwendiye. Ji zaroktiya xwe de stran gotiye. Şagirdê Feqî Silêmanê Tilşongî ye. Li Hezroyê dikana cawfiroşiyê xebitandiye. Di sala 1988an di 24ê tîrmehê de li Hezroyê miriye.

**Eliyê Emer**

Eliyê Emer (Ali Tekin), di sala 1909an de li gundê Şikeftan hatiye dinê. Dibistan nexwendiye. Ji Civat û şevbêrkan hîn bûye. Stran û çîrokan dizane. Bi eslê xwe ji gundê Şikeftanê, ji Malbata Hecî Mîrza ye. 50 sal berê ji Şikeftanê derketine. Di dawî de li Çawişiyê bi cih bûne û di sala 1987an de li wir miriye.

**Emînê Gomanî**

Emînê Gomanî (Mehmet Emin Güngörüç) di sala 1953an de li gundê Gomê Tetan ji diya xwe bûye. Ew jî bi malbatî ji aliyê Çewlikê hatine Hezro. Niha bi kurmancî dipeyivin. Dibistan nexwendiye. Ji bîst saliya xwe de stranan dibêje. Karê kirîn û firotana heywanan kiriye. Heft salan di karê derxistina komirê de xebitiye. Di sala 1986an de mala xwe biriye Amedê.

**Nayifê Mûnisî**

Nayifê Mûnisî (Naif Subaşı) di sala 1954an li gundê Mûnisê hatiye dinê. Lê ji çiyayê Spî hatine Mûnisê. Bi eslê xwe Badî ne. Ji heft bavan ve ku li Mûnisê ne. Heta 14 saliya xwe li Mûnisê maye. Cotkarî kiriye û pez û dewar xwedî kiriye. Ji sala 1968an û vir de li Amedê ye. Li Amedê di karê betonê de dixebite. Dibistan nexwendiye.

**Hesenê Şilbî**

Hesenê Şilbî di sala 1958an de li gundê Rasileynê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Hasan Bilici ye. Dibistan nexwendiye. Ji sala 1972an ve li Şilbê dijî. Loma jê re Hesenê Şilbî dibêjin. Di karê avahiyan de dixebite. Di 20 saliya xwe de dest bi stranbêjiyê kiriye. Ji M. Salih, Şakirê Mûşî û Sidîqê Bozo hînî stranan bûye.



Dimenek ji Hezroyê
Foto: Hüsamettin Bahçe

# Gundên Hezroyê

**Bahişmê** (Kırkkaşık) dikeve başûrê rojavayê Hezroyê. Ji Hezroyê 21 û ji Amedê jî 64 km dûr e. Nifûsa gund ji 800î bêtir e. Pênc mezreyên wî hene: Feyntera Jêrîn (Aşağıavlak), Feyntera Jorîn (Yukarıavlak), Bahêş (Kartallı), Banaqîr û Malîr. Hemû bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Barbûş** (Yazgı) dikeve başûrê Hezroyê. Ji Hezroyê 7 û ji Amedê jî 72 km dûr e. Nifûsa gund ji 600î zêdetir e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Serêkaniyê (Avcı), Gommerk (Erkonağı) û Kemaliye mezreyên wê ne. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Bazmar** (Bayırdüzü) dikeve başûrê rojhilatê Hezroyê. Ji Hezroyê 10 û ji Amedê jî 80 km dûr e. Gund ji aliyê Mehmed Keya ve hatiye avakirin. Nifûsa gund ji 100î bêtir e. Girsalat (Uzunark) mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund kanên mermerê hene. Li Bazmarê dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Berbûş** (Mutluca) dikeve bakurê rojhilatê Hezroyê. Ji Hezroyê 15 û ji Amedê jî 84 km dûr e. Nifûsa gund ji 400 zêdetir e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gunde qûmkirî ye.

**Cirnoqî** (Ağartı) dikeve başûrê Hezroyê. Ji Hezroyê 22 û ji Amedê jî 80 km dûr e. 75 sal berî niha Sofî Silêman bi çar law û du keçen xwe ve hatine û gund avakirine. Tevahiya zeviyên gund 13000 berecot e û bi qasî 700 be-

Institut kurde de Paris

recotî jî avî ye. Nifûsa gund 100 heye. Panaz (Üçbağ) mezreya wê ye û 5 xane ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund telefon, elektrîk û dibistan hene, lê dibistan girtiye û şagird diçin gundê navendî. Riya gund qûmkirî ye,

**Dedaş** (Dadaş) dikeve bakurê rojava Hezroyê. Ji Hezroyê 6 û ji Amedê jî 80 km dûr e. Du Dedaş hene: Dedaşa Jorîn û Dedaşa Jêrîn (Gomên Dedaşê). Nifûsa gund ji1500 zêdetir e. Ağılı mezreya wê ye û nifûsa mezreyê nêzîkî 600î ye. Gundi bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Eyindar** (Kavaklıboğaz) dikeve bakurê rojavayê Hezroyê. Ji Hezroyê 16 û ji Amedê jî 84 km dûr e. Nifûsa gund 550 e. Tê gotin ku gundî ji aliyê Çewlikê hatine û gund avakirine. Tarîxa hatina wan ne diyar e. Li herêma gund gelek şikeft û nawis hene. Melkisî (Teknebaşı) mezreya wê ye û nifûsa wê 200 e. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Gomên H. Derwêş** (Încekavak) dikeve başûrê rojavayê Hezroyê. Ji Hezroyê 12 û ji Amedê jî 85 km dûr e. Nifûsa gund 250î ye. Sê mezre li ser in: Goma Nêşap (Kuşdamı) 37 xane û nifûsa wê 226 e. Tercil (Yenihisar) 13 xane û nifûs 104 e. Kekan (Gedikalan)19 xane û 115 nifûs e. Li herêma Hezroyê ciyê herî dîrokî Tercil e. Tercil bi salan navenda mîrên Tercilê bûye. Li gor Şerefnameyê mîrên Tercil û yên Entaxê ji heman neslîn e. Entaxî û Tercîlî ji eşîra Zirkiyan in. Niha di şûna Tercilê de navenda Hezroyê û di şûna Entaxê de jî navenda Licê heye. Li Tercilê ziyaret jî heye. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Gomên Eyndarê** (Gözlü) dikeve başûrê rojavayê Hezroyê. Ji Hezroyê 20 û ji Amedê jî 85 km dûr e. Bi qasî 100 sal berê ji Eyndarê hatine gund avakirine. Nifûsa gund 630 e. Belûxan û Bircanan mezreyên wê ne. Nifûsa Belûxan (Biçimli) 395 e û ya Bircanan (Sürenbağ) jî 250î ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan û mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Helhel** (Çitlibahçe) dikeve bakurê rojavayê Hezroyê. Ji Hezroyê 18 û ji Amedê jî 99 km dûr e. Nifûsa gund 390 e. Baytloq (Gözdamı) mezreya wê ye û 13 xane ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan û mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Hondof** (Koçbaba) dikeve rojhilatê Hezroyê. Ji Hezroyê 10 û ji Amedê jî 82 km dûr e. Nifûsa gund 350 e. Bi navê Baterh mezreyek wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kobik** (Bağyurdu) dikeve başûrê Hezroyê. Ji Hezroyê 7 û ji Amedê jî 81 km dûr e. Nifûsa gund 150î ye. Dercel (Tavşantepe) mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kufercin** (Varınca) dikeve başûrê Hezroyê. Ji Hezroyê 9 û ji Amedê jî 64 km dûr e. Gundekî gelek kevn e û li herêma gund ciyên dîrokî hene. Tê gotin kû berê gundê Ermeniyan bûye. Nifûsa gund 300 e. Goma Emo û Goma Eyşo (Evincik) mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Gomê Şikeftan** (Kulaçtepe) dikeve başûrê rojavayê Hezroyê. Ji Hezroyê 10 û ji Amedê jî 82 km dûr e. Nifûsa gund 180 ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Mêranî** (Ülgen) dikeve rojhilatê Hezroyê. Ji Hezroyê 15 û ji Amedê jî 85 km dûr e. Di dema Merwanîyan de cihê seyran û havîngeha mîran bûye. Piraniya mêrên gund ji bo ku bi cesaret bûne, navê gund Mêranî lê kirine. Nifûsa gund nêzîkî 500î ye. Pênc mezreyên Mêranîyê hene: Hodik, Kanîmuşkul, Hinarok, Kaniya Qûca û Qorxan. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li Mêraniyê zîyereta Şêx Hesenê Zeraqî û çendên din hene. Li gor baweriyê ew kesên kû bi nexweşiya felcê dikevin, dibin ser vê zîyaretê. Li wir şimikek heye wê di dev û rûyên nexweşan de didin ku ew baş bibe. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye. Mêranî heta sala 1950 li ser Farqînê bûye.

Dimenek ji bostanekî ⟶
Foto: Hüsamettin Bahçe

**Qenderhel** (Sarıerik) dikeve bakurê rojavayê Hezroyê. Ji Hezroyê 21 û ji Amedê jî 79 km dûr e. Nifûsa gund li derdora 400î ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Rasileyn** (Gözebaşı) dikeve bakurê rojavayê Hezroyê. Ji Hezroyê 24 û ji Amedê jî 96 km dûr e. Nifûsa gund 400 heye. Kaniya Maran (Çamdalı) û Muxbil (Eldeğmez) mezreyên wê ne. Kaniya Maran mezin e. Nifûsa wê li derdora 150 heye. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Şêxan** (Terdöken) dikeve rojavayê Hezroyê. Ji Hezroyê 10 û ji Amedê jî 85 km dûr e. Li gor dokumentên arşîva Weqfan a Osmanî, di sala 1500î de Şêx Şahebedîn di şer de bi serketîye. Dewletê bi zeviyên Şêxanê re zeviyên 11 gundên din jî wek dîyarî daye Şêx Şahebedîn. Du mezreyên wî hene: Mûnis

Institut kurde de Paris





Dimenek ji kela Tercilê
Foto: Hüsamettin Bahçe

(Yerigüzel) û xanik. Mûnis bi qasî gundekî mezin e. Nifûsa wê nêzîkî 400î ye. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Şikefta** (Meşebagları) dikeve rojavayê Hezroyê. Ji Hezroyê 23 û ji Amedê jî 81 km dûr e. Li gor statîstîkên sala 2010an nifûsa gund 790 e. Kaniya Spî mezreya wê ye. Niha Kaniya spî 11 xane û nifûsa wê jî 70 ye. Wek di navê xwe de diyar e, li herêma gund gelek şikeft hene. Ji van şikeftan re dibêjin Şikeftên Cemaledîn. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Şimşim** (Ormakaya) dikeve bakurê Hezroyê. Ji Hezroyê 15 û ji Amedê jî 76 km dûr e. Nifûsa gund 550 heye. Bi navê Şahgeldi mezreyek wî heye, 8 xane û nifûsa wê 80 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Xincîkan** (Sarıçanak) dikeve başûrê Hezroyê. Ji Hezroyê 12 û ji Amedê jî 63 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 300î ye. Mezreyeke wê heye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan û mizgeft hene. Riya gund ne asfalt e, te-

Institut kurde de Paris

lefon û elektrîk li gund hene. Piştî fermana Ermeniyan gund hatiye valakirin û di sala 1925an de di şûna Ermeniyan de Kurd bi cih bûne.

**Zoxbirîn** (Kırmataş) dikeve rojavayê Hezroyê. Ji Hezroyê 20 û ji Amedê jî 70 km dûr e. Tê gotin ku di dema Merwaniyan de, ji eşîreta Badkan bi navê Zor Brahîn (Îbrahîm) fermandarekî gund ava kiriye û ev nav li ser gund maye.

Nifûsa gund nêzîkî 700î ye. Koşk mezreya wê ye û nifûsa Koşkê 280 e. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Şikeftên Zoxbirînê bi navûdeng in. Riya gund qûmkirî ye.

**Zuxreşêr** (Görlek) dikeve başûrê rojavayê Hezroyê. Ji Hezroyê 22 û ji Amedê jî 94 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 300î ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Zuxur** (Uzunargıt) dikeve başûrê Hezroyê. Ji Hezroyê 4 û ji Amedê jî 70 km dûr e. Nifûsa gund 200 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

Institut kurde de Paris

Dimenek ji deşta Hezroyê
Foto: Hüsamettin Bahçe





Dimenek ji çarşiya Hênê

# Hêne

Hêne dikeve bakurê Amedê. Ji riya Licê- Çewlikê ve 97 km û ji riya Têrkanê ve jî 60 km ji Amedê dûr e. Bi tirkî navê "Hani" lê kirine. Hêne di nav zincîreçiyayên Torosan de, di navbera du çiyayên paralel de ye. Ev navrast ji Pasûrê heta Licê, Hêne û Pîranê di nav herdu zîncîreçiyan de dom dike. Heta sala 1958an nehyeya Licê bûye û ji şûn ve statûya bajarokê girtiye. Qada axa bajaroka Hêne 415 km$^2$ ye.

Li navenda Hêne şeş tax hene. Niha du Hêne hene: Hêneya Nû û Hêneya Kevn. Hêneya Nû piştî erdheja 1975an li navbera Hêneya Kevn û Enqerîsê ji bereqan hatiye avakirin. Niha li wir xanî û avahiyan lê zêde kirine û herdu bûne yek. Navbera Hêne û Enqerîsê hemû bexçe û şînahî ne. Xelkê navenda Hêne bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

Li gor statîstîkên sala 2010an nifusa navendê 8.335, ya gundan 23.216 û bi giştî 31.551 e. Hejmara gundê wê 21 û ya mezreyan jî 37 in. Di sala 1873 li Hêne dibistana rûştiye hatiye vekirin û di sala 1878an de jî sîstema şaredariyê hatiye damezrandin.

Çiyayên herî bilind ên herêma Hêne Mem (1507m), Çîmen (1553m) û Dubûrî (1243m) ne.

Hêne wek navend û herêm gelek kevn e û dîroka gundên navçê jî digihe serdema neolotîk. Li herêmê şopên Hûrî-Mîtaniyan pir dîyar û zelal in. Hûrî-Mîtanî berî mîladê (4000-1500) li herêmê karbidest bûne. Gundê Hûrê û Hûrûgê navê xwe ji serdema Hûriyan digrin. Nawis û şikeftên dema Hûriyan niha jî li vê herêmê pir in û berbiçav in. Asûrî, Îskitî, Medî, Persî, Mekedonî, Romayî û Bizansî li herêmê desthilatdar bûne û li ser gelek xerabe û zinaran hîn jî şopên nivîs û wêneyên wan hene.

Herêm demeke dûr û dirêj ketiye destê Nêrbiyan. Herêma Hêne navenda desthilatdariya Nêrbiyan bûye. Kurd ji Nêrbiyan re Nêrbo û bîyanî jî Nayrî (Naîrî) gotine û hîn îro jî dibêjin. Nêrbî ji milekî Hatiyan in û tê gotin ku ji aliyê Dîlok û Rihayê ve hatine derdora çiyayê Kaşyarîyê û ji wir jî çûne bakurê Amedê bi cih bûne.Îro hîn jî li herêmê navê heft gundan bi "Nêrbê" dest pê dike û navê çiya û herêmek jî "Nêrbê" ne. Padîşahê Asûrî Tîglaper herêmên Licê û Hêne dagîr kiriye û dewleta Nêrbiyan hilweşandiye. Tîglaperê Yekem berî mîladê di navbera salên 1114 - 1104an û Salmanasarê Sêyem jî berî mîladê di navbera salên 850-830î de desthilatdar bûne. Du nivîsarên ku ji aliyê Tîglaper ve li ser kevirê şikefta Biriqleynê hatine nivîsîn hîn îro jî hene.

*"Hênekê hêne mên e*
*Xopanê gundekî şên e*
*Hênekê bi vir da, bi wir da*
*Enkebîra pîroz di navê da"*



Dimenek ji taxeke Hênê
Foto: Husamettin Bahçe

Ava ji herêma Licê tê ser çemê Engulê û ew li biniya Serdê bi çemê Serdê re dibe yek û tê ser çemê Gabanê. Ava Enkebîrê û çemê Kokî jî di avtenga Gabanê de digehin hev û hemû diçin ser çemê Ambarê. Li navbera Hêne û Karazê li derdora çemê Zeynika Koşka Xatûnê cihekî dîrokî ye.

Li navenda Hênê kaniyên Enkebîr û Enqerîs pîroz û şîfayî ne. Enkebîr li navenda bajarê kevn di navbera Mizgefta Mezin Medresa Xatûniyê de ye. Ev av ji qûntara çiyayê Hênê tê. Di heft ciyan de ava wê der tê û dibe hemzeke mezin. Ev hemz berî mîladê di 2.000î de di serdema Hûriyan de hatiye çêkirin. Bi vê avê bexçeyên Hênê tên avdan. Enqerîs ava bi şîfa ye. Ava wê ji nexweşiya zerikê re derman e. Di salê de 10.000-15.000 kes diçin ser ava Enqerîsê. Ava wê li xwe dikin û reşika wê di laşê xwe didin.

Wek tê zli herêmê aborî û îndustrî zêde bi pêş neketiye. Xelk bi kiştûkal û ajel (ziret û heywan) xwedîkirinê ve mijûl in. Li herêma Hêne tiştên ku difroşin der, genim, pembo, tutin û mêweyên hişk in. Piştî salên 1990î li herêmên Licê, Hezro û Hênê kanên kevirên mermer derxistin. Mermerên ku li herêma Hênê derdixin dibin palûkeya Licê. Mermerên herî bi kalîte ne û di piyaseya cihanê de tên firotin. Niha gelek însan di van kanên mermeran de dixebitin.

## Şaredarî

Li gor rêza dîrokê lîsteya şaredarên Hênê.[47]

….-… Hamdî Beg
….-… Mehmet Akbaş
….-… Kasim Ünal
….-… Abdulbaki Oktay
….-… Mustafa Çetin
1950-1960 Hasan Bora
1960-1965- Sıddık Berg
1973-1977 Ferit Bora
1980-1984 Qeymeqam
1984-1994 Mahmut Yıldız, du dewre
1994-1999 Celal Kayhan
1999- 2004 Mahmut Yıldız
2004-2009 Celal Kayhan
2009-2001 Abdurrahman Zorlu

[47] Me van agahdariyan ji mudûrê nivîsgeha şaredarî ya Hênê Bedri Durak girt.



Dimenek ji Enkebîr û Mizgefta Mezin

# Nivîskar û navdar

## Salih Begê Hêneyî

Salih Begê Hêneyî bi tenê ne mirovekî esker û cesûr, herweha mirovekî zana û rewşenbîr bûye. Wî di nav Kurd Teavûn Cemiyetiyê de cih girtiye û berpirsê zimanê kurdî bûye. Xebatên wî li ser ziman hebûne. Helbestên wî hene. Di serî de hevaltiya wî û Ziya Gokalp hebûye. Dema ku Ziya Gökalp bûye Îttîhat -Terakî navbera wan xerab bûye. Di şerê Şêx Seîd de endamê konseya şer bûye û roleke mezin lîstiye. Li ser biryara Dadgeha Îstîklalê Salîh Begê di roja 29ê tebaxa sala 1925an de, bi Şêx Seîd re li Amedê bi dar ve kirine.

Dema şerê Şêx Seîd li ber bedena Amedê şikestiye, Salih Beg, Mistefa Beg, Şêx Adem (mirovekî propagandîst bûye), Şêx Emer, Şêx Evdila ku hemû Hêneyî bûne bi paş ve ber bi herêma Hêne ve vekişiyane. Heta dawiyê li ber xwe dane û piraniya wan bi birîndarî hatine girtin û ew anîne Amedê li Mehkemeya Îstîklalê bi dar ve kirine.



Dîmenek ji taxeke Hênê
Foto: Husamettin Bahçe

Institut kurde de Paris

**Hesen Hişyar**

Hesen Hişyarê Serdî di sala 1907an de, li gundê Serdê hatiye dinê. Hesen Hişyar di şerê Şêx Seîd de cezayê bi dardekirinê girtiye, lê bo ku 17 salî bûye, cezayê bi dar ve kirinê vegerandine muebetê. Jê re Mele Hesenê Kurdî jî dibêjin. Hikumet di sala 1928 an de efûyeke giştî derdixe û Hesen Hişyar vedigere Kurdistanê. Çend nivîsên wî di kovarên wek Hawar, Ronahî û Roja Nû de derketine. Pirtûkek wî bi navê *"Dîtin û bîrhatinên min"* çap bûye.

**Prof. Ramazan Demir**

Ramazan di sala 1955an de li gundê Qediştê hatiye dinê. Dibistana seretayî li gund, ya navîn li Hêne û amadeyi û zanîngehê jî li Amedê xwendiye. Bi eslê xwe ji gundê Tûtê ku li ser Licê ye. Bi qasî 100 sal berê bi malbatî ji Tûtê hatine li Qediştê bi cih bûne. Li zanîngeha Dîclê mamostetî dike. Di sala 20006an de bûye profesor.

**Sidkî Zîlan** di sala 1967an de li Nêribê Axan hatiye dinê. Dibistana seretayî li Hêne, ya navîn û lîseya îmamxatîbê li Amedê xwendiye. Ji Fakulta huqûqê ya Amedê mezûn e. Bi parêzvaniyê re îmamtî jî kiriye. Bi zaravayên kirmanckî û kurmancî dizane. Di gelek kovar û rojnameyan de nivîsên wî hatine weşandin. Ji derî navê xwe, carnan bi navê Hesê Belê jî nivîsiye. Bi navê *Sanal Yazılar* pirtûkeke wî heye.

Dîmenek ji Cewzê →


# Gundên Hênê

**Babîx** (Kalaba) dikeve bakurê Hênê, ji Hênê 5 km û ji Amedê 102 km dûr e. Hejmara xaniyan 45 e û nifûs 320 e. Enehîr (Gürbulak) mezreya wê ye. Dibistan xerab bûye. Heywan xwedî dikin û çandiniyê dikin. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Cewzê** (Gürbüz) dikeve başûrê Hênê û 9 km ji Hênê dûr e. Nifûsa gund 6800 e. Şaredarî lê heye. Li gund gelek dukan û cihên karên biçûk hene. Bûye wek navenda gundên derdorê. Cewzê avî ye. Bexçe û rezên wê gelek in. Gundî heywan jî xwedî dikin. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund, mizfegt, dibistan, nexweşxane, elektrîk û telefon hene. Riya gund asfalt e.

**Comayîk** (Okur) dikeve başûrê Hênê. Ji Hênê 8 km ji Amedê 105 km dûr e. Gaban û Barfez mezreyên wê ne. Cihên dîrokî û dêreke kevn li Comayîkê

Institut kurde de Paris



hene. Gundekî kevn û mezin e, di van salên dawîn de vala bûye. Niha nifûsa gund 113 mane. Dibistan girtiye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Çeman** (Çardaklı) dikeve başûrê Hênê, ji Hênê 12 km û ji Amedê 105 km dûr e. Xeybiyan, Hewdiyan û Kanîkewan Mezreyên wê ne. Hejmara xaniyên gund 192 û nifûs jî 1026 e. Li gund dibistan heye. Heywan xwedî dikin û bi çandiniyê re mijûl in. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin.

**Dernan** (Akçayurt) dikeve bakurê Hêne. Ji Hênê 20 km û ji Amedê 117 km dûr e. 15 xanî li gund hene û nifûs 100 e. Li gund dibistan heye. Heywan xwedî dikin, çandiniyê dikin. Rezên gund zêde ne. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.



Kela Qiral û Koşka Xatûnê
Foto: Hüsamettin Bahçe

**Dilbê** (Belen) dikeve rojavayê Hênê, ji Hênê 5 km û ji Amedê 102 km dûr e. Hejmara xaniyan 150 e û nifûs 1045 e. Pûseyil (Burak) mezreya wê ye. Dibistan û nexweşxane hene. Heywan xwedî dikin û giraniya gundiyan li ser çandiniyê ne. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.



**Hûrê** (Gömeç) dikeve başûrê rojhilatê Hênê. Ji Hênê 30 km û ji Amedê 78 km dûr e. Nifûsa gund 150 e. Bateyt (Çağıl), Engul (Pınar) û Gedûk mezreyên wê ne. Gundekî dîrokî ye. Ji dema Hûriyan ve maye. Li nêzîkî gund nawis hene ta ji serdema kevir ve mirov li vir jîyane. Herêma Hênê cihê herî hevn e. Şopên şaristaniya kevn li wir hene û heta îro dom dikin. Bateytî bi kirmanckî û Engulî jî bi kurmancî dipeyivin. Gundî ji ber zordestiya dewletê ji gund koçber bûne û dibistan hatiye girtin. Li Hûrê jî gundî debara xwe bi rez û pez dikin. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin.

**Mukriyan** (Anıl) dikeve rojavayê Hênê. Ji Hênê 8 km û ji Amedê 103 km dûr e. 230 mal in, 1335 nifûs e. Dibistan li gund heye. Heywan xwedî dikin û bi çandiniye re mijûl in. Rezên wan bi navûdeng in. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Nêrba Topalan** (Topçular) dikeve bakurê Hênê. Ji Hênê 13 km, ji Amedê 112 dûr e. Bi navê Laboyn (Damlatepe) û Melayîm (Uysal) du mezreyên Nêrba Topalan hene. Hejmara xaniyan 132 e û ya şêniyan 813 e. Wek me



Ji naverastê ve Hênê

Institut kurde de Paris

di destpêkê de jî destnîşan kiribû gund û herêma Nêrbê navê xwe ji serdema Nayriyan (Naîrî) digrin. Çandiniyê dikin û heywan xwedî dikin. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Nêriba Axan** (Kuyular) dikeve rojavayê Hênê û ji Hênê 13 km dûr e. Li gor statîstîkên sala 2010an nifûsa wê 4.148 e. Li Nêriba Axan ji sala 1994an şaredarî heye. Li gund dibistan, nexweşxane, mizgeft hene. Riya Nêrbê asfalt e. Rezên wê gelek in. Her sal di payiza paşîn de festîvala tirî tê li dar dixın. Zîyareta Pîrezîz li gund heye. Gundî heywan xwedî dikin û bi çandiniyê ve mijûl in. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Nêriba Çulagan** (Abacılar) dikeve bakurê rojavayê Hênê. Ji Hênê 11 km û ji Amedê 107 km dûr e. Hejmara malan 138 û ya şêniyan 897e. Dibistan li gund heye. Av anîne gund û rê asfalt e. Heywan xwedî dikin û çandiniyê dikin. Rezvanî dikin û tirî pir e. Zîyaretên Kewl û Mîntar li gund hene. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Nêriba Yusifan** (Çukur) dikeve bakurê rojhilatê Hênê. Ji Hênê 15 km û ji Amedê 117 km dûr e. Muxtarî li wir e. Nêriba Melikan (Bozak) û Nêriba Aliyan (Atıcı) mezreyen wê ne. Hejmara xaniyan 156 e û ya nifûsa 1039 ye. Dibistan, mizgeft li gund hene. Heywan xwedî dikin, çandiniyê dikin û giraniya wan li ser rez e. Zîyareta Ehmedan li gund heye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Qedişt** (Kırım) dikeve başûrê rojhilatê Hênê. 7 km ji Hênê û 85 km ji Amedê dûr e. Qoqê (Ovabağ), Horîg (Aka), Feynter (Kermen), Goma Hecî Mehemed û Mala Hecî Îbrahîm mezreyên wê ne. Ji serdema Hûriyan ve nawis, kanî û şûnewarên dîrokî hîn îro jî li Qediştê mane. Goristanên dîrokî li gund gelek in. Li ser tehtên hinek goran wêneyên şûr û xenceran hene. Li mezreya Feynterê girekî dîrokî ye. Niha li gund çend kanên kevirên mermer hene. Mermerên ku ji vir derdixin ji aliyê qelîte ve, li cîhanê bi navûdeng in. Nifûsa gund bi mezreyan ve ji 1000î zêdetir e. Li gund dibistana serayî heye. Şagirdên mezin jî diçin dibistan gundê Tewilê. Feynterî bi zaravayê kirmanckî û gund û mezreyên din bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund ziyareteke ji bo tawî û bawiyan heye. Çêrgeha Qediştê bi navûdeng e. Çêrgeheke gelek mezin û berfireh e. Gundî ji vê çêrgehê re Qişa dibêjin. Prof. Ramazan Demîr ji vî gundî ye. Li gund mizgeft, telefon, elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Risnî** (Süslü) dikeve başûrê rojavayê Hênê. Ji Hêne 14 km û ji Amedê 111 km dûr e. Hejmara xaniyên gund 81 û nifûs jî 469 e. Dibistan girtiye. Heywan xwedî dikin û çandiniyê dikin. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Serdê** (Seren) dikeve rojhilatê Hênê. Ji Hênê 10 km û ji Amedê jî 84 km dûr e. Dikeve navbera Hênê û Licê. Wateya Serdê ji serekî tê ango serkeftî. Gundê sereke. Gundekî gelek kevn û dîrokî ye. Berî mîladê navê gund Newzerk bûye û piştre Serder gotine. Di serdema me de jî navê wî Serdê ye. Sê mezreyên serdê hene: Koçeran (Mazili), Goma Hesen Begê û Goma Tahîr Begê. Bi tenê li mezreya Koçeran bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Nifûsa gund 250 e. Ji zû ve li gund dibistan û nexweşxaneyek hebû. Ji ber şerê van 15-20 salên dawî nexweşxane û dibistan herdu jî hatine girtin. Serdê ji dema Şêx Seîd ve heta niha çend car hatiye şewitandin.

Piştî 2009an gelek gundî bi paş ve vegerîne gund û niha dibistana gund



Institut Kurde de Paris



Institut kurde de Paris



Dimenek ji çemê Gabanê
Foto: Hüsamettin Bahçe

vekirî ye. Di 12ê meha sibata 2010an de ji aliye rêxistina sivîl Yerel Gündem 21 ve, li dibistana gund pirtûkxaneyeke nûjen hatiye avakirin. Gundî heywan xwedî dikin, çandiniyê dikin. Ji bin çiyayê Serdê aveke gur û xurt derdikeve. Navê wê jî Enqerîsa Serdê ye. Sê aş li ber vê avê digerin û bexçeyên Serdê bi navûdeng in. Sebze û rez gelek in. Petêx û qawinên Serdê li herêma Amedê bi navûdeng in.

Serdî bi kurmancî dipeyivin û bi kirmanckî jî dizanin. Di dema ferman û kuştina Ermeniyan de, li çiyayê pişt Serdê şikefteke bi navûdeng heye. Ew şikeft wek bîra ji kevir a bêbinî ye. Ermeniyan ji herêmên Licê û Hênê qefle bi qefle birine ser wê şikeftê û kuştine. Laşên wan avêtine bin wê şikefta kûr û qerqez.

**Seyar** (Kaledibi) dikeve bakurê Hênê, ji Hênê 25 km û ji Amedê 120 km dûr e. Nifûsa gund niha nêzîkî 600î ye. Horsel (Başaklı), Hêgamezel (Diktaş), Devexerab (Sarıevler), Alîgor (Güzelce), Binêzixur (Taşburnu) û Gortşêxê mezreyên wê ne. Dibistan hatiye girtin. Heywan xwedî dikin, bazirganiya heywanan û çandiyê dikin. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

Institut kurde de Paris

**Sipir** (Sergen) dikeve başûrê Hênê. Ji Hênê 15 km û ji Amedê 112 km dûr e. Heşt mezreyên Sipir hene: Silêmana, Xeydiya, Kerran, Gomon, Tilan, Goma Salih, Goma Bazîd û Goma Elo. Hejmara xaniyan 192 ye û ya nifûs 1191 e. Dibistan heye. Heywan xwedî dikin. Çandiniya genim û ceh dikin. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin.

**Şelê** (Yukarıturalı) dikeve bakurê rojhilatê Hênê. Ji Hênê 16 km û ji Amedê 114 km dûr e. Cahîd (Çay) û Şelesufla (Aşağıturalı) mezreyên wê hene. Li mezreya Cahîdê çavîyeke mezin heye ku aveke sar û xurt jê derdikeve û aş li ber ava wê digerin. Hejmara xaniyan 59 û nifûs jî 520 e. Ji derî heywan xwedî kirinê, fesûlyê gund bi navûdeng in. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin

**Tewîl** (Uzunlar) dikeve rojhilatê Hênê. Ji Hênê 5 km û ji Amedê jî 94 km dûr e. Goma Hecî Îbrahîm (Gültepe) mezreya Tewîlê ye. Hejmara xaniyan 106 û nifûs 545 e. Dibistan girtî ye. Çandiniyê dikin. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Tiletîn** (Yayvan) dikeve başûrê Hênê. Ji Hênê16 km ji Amedê jî 113 km dûr e. Hejmara xaniyan 119 ye û ya şêniyan 676 e. Zengînalan (Soylu) mezreya wê ye. Gundekî kevn û dîrokî ye. Bi qasî 5 km li rojavayê gund ji dema Hûrî-Mîtaniyan ve nawis, sarinc, şikeft û kevirê qul hene. Herweha Koşka Xatûnê jî li vê herê me ye. Dibistan heye. Nexweşxane girtî ye. Ji derî heywan xwedî kirinê çandiniyê dikin. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Zinkelînî** (Soylu) dikeve bakurê Hênê. Ji Hênê 23 km û ji Amedê jî 120 km dûr e. 56 xanî lê hene û nifûs 320 e. Ji derî heywan xwedî kirinê li vir çandiniya pembo û titunê jî tê kirin. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Rîya gund qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris



Dîmenek ji biniya Karazê

# Karaz

Karaz (Kocaköy) dikeve bakurê rojhilatê Amedê, li ser riya Amed û Çewlikê ye. Karaz 65 km ji Amedê dûr e. Li qûntara çiyê ye. Bakur çiya û başûr jî deşt e. Hinek gundên Karazê li herêmê çiya û hinek jî li herêma deştê ne.

Kes nizane Karaz kengî hatiye avakirin. Li herêmê şûnewarên dîrokî û balkêş hene. Ev ji dema kalkolîtîk (bz.5000-4000) ve heta niha mane. Li herêma Serêkaniyê bi dehan şikeftên xerabkirî hene ku ji wan re dibêjin Şikeftên Karazê. Şikefta Evdiyê Kor li rojavayê Karazê li ser newala Kûr e. Şikefta Dûmana û şikefta Silavan jî li rojavayê Karazê ne. Li nêzîkî Karazê li ber qeraxê çemê Ambarê şikefta Pencere heye. Zuxurê Ambarê jiyan dide derdorê. Cihê av û avdaniyê ye. Herweha li ber çemê Ambarê zîyareta Pîr Bilêç, li jorê Karazê dara Qijikan heye ku ji her alî ve xuya dike. Dara Qijikan sembola Karazê ye.

Li herêmê Kela Kafiran, Ardûç, li gundê Şeqladê nawis, li Qetîn, Tiltapan, Mendan û li çend cihên din jî girên dîrokî hene. Li nêzîkî çemê Zeynika (Ambarê) ji serdema kevirîn ve şikeftên, xerabe û girên ku hene heta îro mane.

Karaz heta sala 1972an gundekî Licê bû ji vê salê şûn ve dan ser navenda Amedê. Di 6ê tebaxa 1976an de li Karazê şaredarî hatiye avakirin. Li gor rêza salan lîsteya şaredarên Karazê weha ye:

## Şaredarî

Hecî Mustefa Kava
Hüseyin Razi Oral
İbrahim Sarı
Aydın Demir
Ahmet Türe
M. Hüseyin Yigit
Hamdullah Kılıç
Mehmet Kaya
Remzi Çallı

Di 7ê Îlona 1982an de taxên wê hatin dîyar kirin. Di 12ê Adara 1983an de kahrîbar dan navenda Karazê. Di 20ê gulana 1990an de jî statûya wê guhartin û Karaz bû bajaroka Amedê.



Dimenek ji navenda Karazê
Foto. Husamettin Bahçe

Institut kurde de Paris



Zivistan li Karazê
Foto: Hüsamettin Bahçe

Qada axa Karazê 264 $km^2$ ye. Ji deryayê bindiya wê nêzîkî 950 metreyî ye. Niha heşt taxen navenda karazê hene û pênc ji wan fermî ne: Taxa Qeya, Yenîşehîr, Şêx Şerefedîn, Kaniya Bîhno, Newala Xerabe, Îba, Cirhî û Şerîfan.12 gund û 15 mezre li ser Karazê ne. Nifûsa navenda Karaze 5.678 e, ya gundan 7431 e û bi giştî 13.109 e. Wek li gelek deverên Kurdistanê li herêma Karazê jî di van 15-20 salên dawî de, ji ber sedemên şer dewletê piraniya gundên stratejîk û yên çiyayî valakiriye an jî şewitandiye.

Li gor statîtîkên sala 2009an li navend û hemû gundên Karazê 22 dibistanên seretayi û amadeyiyek heye.

Hatina Karazê li ser heywan xwedîkirin û çandiniyê ye. Li herêmê helberîna gulêberbero her ku diçe zêde dibe. Di van salên dawî de li Licê fabrîka rûnê gulêberbero ketiye faliyetê. Herweha xelkê herêmê giraniyê da ser çandina gulêberbero. Li herêma Ambarê 7.000 dekar pembo tê çandin. Dîsa li herêma gundên Mehmediyan û Tepecûkê 15.000 dekari de birinc û titun tê çandin. Qada kiştûkal (dexlûdan) ji bo hebûbatên bejî 189.000

dekar e. Ji vê 141.000 hebûbat, 6.000 dekar baqle, 2.000 petêx û zebeş tên çandin û 40.000 hektar şov e.

Di nav tixûbên bajarokê de, bi qasî ku hatiye tespît kirin 8.000 dewar û 15.000 jî pez hene. Ji sedî heftê pez û dewarên binecih in û ji sedî 30 jî yên ziretê ne.

Li herêma Amedê ji mêj ve û herî bêtir petrol di nav tixûbên Gêle û Karazê de hatiye dîtin. Li Qetîne ku çend kîlometre dikeve başûrê Karazê li ser riya Amedê bîrên Petrolê hene. Ew petrol di sîloyan de tên parastin û di boriyên bin erdê re, bi ser Amedê re dişînin İskenderûnê ku li perava deryaya Spî ye. Îsal di meha havînê de dîsa bîrên petrolê hatin dîtin. Li herêma Qetînê di 2325 metre kûrahî de petroleke nû derket. 39 bîr hatin kolandin. Ev li Kurdistan û Tirkiyê petrola herî bi kalîte ye û 32 gravîd e. Di van bîr û avahiyên petrolê de xelkê herêmê wek karker qebûl nakin û kar nadin wan. Bi wan ne bawer in. Karkeran ji hêla Tirkiyê tînin û di van cih û avahiyan de dixebtînin.

## Nivîskar û dengbêj

**Prof. Dr. Abdülbaki Turan** di sala 1937an de li Karazê ji dayîk bûye. Di medreseyên kurdî de xwendiye. Diploma dibistana seretayi û ya îmam xetîbê ji der ve girtiye. Di sala 1969an de Înstîtuya Îslamî qedandiye. Di Fakulteya İlahîyata Konyayê û li Zanîngeha Dîclê mamosteti kiriye. Ji werger û xebatên wî yên olî çend jê ev in: *Aliyyu'l-Karî'nin "Envaru'l-Kur'an û Esrâru'l-Furkan, Envaru't-Tenzil û Asraru't-Te'vil,*



Kevirê mertal li Karazê
Foto: Hüsamettin Bahçe



Institut kurde de Paris

*Tefsîra Baba Ni'metullah Nahcivanî û el-Feratihu'l-İlahiyye û 'l-Mefatihu'l-Xaybiyye, Ayetên Kur'an-ı Kerim'deki İtâb, Asamu'l-Kur'an, Tefsîra Kuşeyrî ve "Letâifu 'İşârât, Asr-ı Saadetteki İslâm Şehitleri (werger), İslâm'ın Işığında Doğu ve Batı (werger)*

**Sait Güven**

Sait Güven di sala 1949ê de li gundê Mehmediyan hatiye dinê. Dibistana seretayî li gundê xwe, dibistana navîn li Licê û Hênê û amadehiyê jî li Amedê xwendiye. Li Stanbulê li Fakulta Bazirganiyê qedandiye. Di sendikayên karkeran de kar kiriye. Piştî cunteya 12ê Îlona 1980î derketiye der û hatiye li Swêdê bi cih bûye. Di kovar û rojnameyan de meqale nivîsiye. Bi navê *Huseynê Kurd* pirtûkeke wî ya folklorîk hatiye çapkirin.

**Selahattin Çam**

Selahattin Çam di sala 1950î de li Karazê hatiye dinê. Dibistana Seretayî li Karazê û dibistana mamostetiyê jî li Erxeniyê xwendiye. Bi salan mamostetî kiriye. Di TOB-Der û Egitim-Senê de aktîv xebitiye. Piştî malnişîni di Komela Mafê Mirovan a Mersînê wek rêveber xebitiye. Çam di kursa kurdî ya Edenê de mamostetiya kurdî kiriye. Tenê bi kurdî nivîsiye. Çîrok û helbestên wî di gelek kovar, rojname û malperên kurdî de hatine weşandin. Bi navê *Rêya Dûr* pirtûkeke wî ya çîrokan heye.

**Kadri Yıldırım**

Kadir Yıldırım di sala 1959an de li Şeqlatê hatiye dinê. Bi xwendina dibistanê re li medresê jî xwendina xwe domandiye. Piştî xwendina xwe ya dibistana seretayî û navîn dest bi mamostetiyê kiriye. Di sala 1996an de li zanîngeha Harranê li fakulta İlahiyetê di beşa ziman û edebiyata erebî de dest bi lîsansa bilind kiriye. Di sala 1998an de doktora xwe daye. Li zanîngeha Dîclê pêşî bûye alîkarê doçent û piştre di sala 2000an de bûye doçent. Di sala 2010an de bûye profesor. Niha li zanîngeha Artûkluya li Mêrdînê alîkarê rektor e. Bi kurdî, tirkî, erebî, farisî û îngilîzî dizane. Berhemên wî yên ku hatine çap kirin: *Mem û Zîn* (kurdî-tirkî), *İnanç Risalesi, Ürdün Kürtleri ve modern Ürdün'ün yapılandırılmasındaki rolleri* (werger), *Kerkuk-1: Tarih, politika ve etnik yapı* (werger), *Ehmedê Xani Külliyetı* (Arapça-Kürtçe-Arapça sözlük, Kültür bakanlığının Mem û Zîn çevrisine eleştirisel bir yaklaşım *Ehmedê Xani ve Mem û Zin*: Bir şair düşünür ve mutasavvuf olarak (werger).



Zuxurê Karazê →
Foto: Hüsamettin Bahçe

# Dengbêj

### Remezanê Ehmed

Remezanê Edmed di sala 1943an de li Akragê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Ramazan Yeşilkaya ye. Dibistan nexwendiye. Li gund karên wekî cotkarî, şivanî, delalî û bazirganiya pez û dewaran kiriye. Ji sala 1960î vir ve distire. Di bin bandora Ehmedê Bêrtî de maye. Herweha stranên Meheme Salihê Beynatî jî distre.

### Evdilayê Tiltepanî

Evdilayê Tiltapanî di sala 1957an de li gundê Tiltepanê hatiye dine. Navê wî yê di nasnameyê de Abdullah İpek e. Pênc salan dibistan xwendiye. 36 salan li gundê Tiltepanê maye. Li gund şivanî û cotkarî kiriye. Ji ber ku di sala 1993an de hêzên dewletê bi hinceta ewlehiyê gundê wan vala kiriye, bi malbatî koçî Amedê kirine.



**Nêrgiza Hemê**

Nêrgiza Hemê di sala 1955an de li gundê Tiltepanê hatiye dinê. Dibistan nexwendiye. Di zarokatiya xwe de dest bi stranbêjiyê kiriye. Li gund karê destarê, cirn û paletiyê kiriye. Heta sala 1976an li Tiltepanê maye. Di sala 1976an de mala xwe bar kiriye Amedê. Bi xwe stranan diafrîne û distre. Herweha çîrokan jî dibêje. Bêtir di şev, şahî, civat û şevbihêrkan de distre.

# Gundên Karazê

**Akrag** (Günalan) dikeve rojhilatê Karazê. Ji Karazê 12 km û ji Amedê jî 55 km dûr e. Nifûsa gund 230 e. Kuçikan mezreyek wê ye. Şagirdê diçin gundên nêzîk. Telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund asfalt e.

**Ambar** dikeve rojavayê Karazê. Ji Karazê 5 km û ji Amedê jî 67 km dûr e. Nifûsa gund li derdora 400î ye. Kanîdizk û Meşkînî mezreyên wê ne. Gundekî dîrokî ye. Ji dema Hûrî, Îskît, Med û Asûriyan ve li dora Ambarê xerabeyên bi navên Kafiran û Ardûciyan cihên dîrokî hene. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Riya gund asfalt e. Li gund telefon û elektrîk hene.

**Benê** (Boyunlu) dikeve bakurê rojhilat û 20 km ji Karazê dûr e. Qirameka mezreya wê ye. Li gund 85 û li Mezreya jî 12 mal hene û bi giştî nifûsa wê 500 e. Li gund mizgeft, dibistan, elektrîk û telefon hene. Riya gund stabîlîze ye.

**Dêrûn** (Gökçe) dive bakurê rojhilatê Karazê. Ji Karazê 5 km û ji Amedê 60 km dûr e. Nifûsa gund ji 700 î bêtir e. Li gund, dibistan, mizgeft, av û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Hewrê** (Yazı) li bakurê Karazê ye. Ji Karazê 3 km û ji Amedê jî 67 km dûr e. Dîroka gund heta serdema Hûriyan diçe. Niha nifûsa gund li derdora 900î ye. Li gund dibistan, av, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund asfalt e.

**Mehmediyan** (Arkbaşı) dikeve rojhilatê Karazê û 9 km ji Karazê û 60 km jî ji Amedê dûr e. Gund li qeraxê çemê Mehmediyan e û gundekî avî ye. Serê Kaniyê hemû bexçe ne. Nifûsa gund nêzîkî 800î ye. Li gund, mizgeft, dibistan, elektrîk û telefon hene. Riya gund asfalt e.

Li Zuxurê Karazê pez →
Foto: Hüsamettin Bahçe



Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

**Qetîn** (Çaytepe) dikeve başûrê Karazê û 11 km ji Karzê û 55 km jî ji Amedê dûr e. Li gund 300 mal û 2500 kes dijîn. Çemê Tolazan di nav gund re derbas dibe. Li gund mêrga Nêrgizan heye. Mala Huseynkan (Huseynik) û Mendikan (Toypınar) mezreyên wê ne. Li herêma gund bîrên petrolê hene. Gundê Karazê yê herî mezin e. Girekî dîrokê nêzîkî gund heye. Dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon li gund hene. Riya gund asfalt e.

**Qûçik** (Bozbağlar) dikeve başûr û 13 km ji Karazê û 73 km ji Amedê dûr e. Li gor texmînan gund di salên 1200î de hatiye avakirin. Nifûsa gund nêzîkî 700î ye. Heydêrkan û Hilêlî (Yılmazlar) mezreyên wê ne. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene.

**Şeqlat** (Şaklat) dikeve bakurê rojavayê Karazê û 6 km ji Karazê dûr e. Gundekî dîrokî ye. Li herêma gund goristanên li teht hene. Hatina gund li ser heywan xwedîkirinê bû. Gund hatiye valakirin, lê niha bi qasî 100 malî bi paş ve vegerine gund. Niha li herêma gund mermeran derdixin. Prof. Kadri Yıldırım ji vî gundî ye. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund asfalt e.

**Şêxomeran** (Bozyar) dikeve başûrê Karazê. Ji Karazê 13 km û ji Amedê jî 55 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 300î ye. Dibistan heye, lê naxebite û şagird diçin gundên nêzîk. Li gund mizgeft, elektrîk û telefon hene û riya gund qûmkirî ye.

**Tepecûk** (Tepecik) dikeve rojhilat karazê. Ji Karazê 10 km û ji Amedê jî 58 dûr e. Nifûsa gund li derdora 400î ye. Gund li qûntara çiyê ye û başûrê wê deşt e. Duwêl (Akdiken), Gomên Began (Işıklar) û Barbeşn (Akçagöz) mezreyên Tepecûkê ne. Li çiyayê Mendan şikeftên bi navûdeng hene. Pîrozgeha Kevirê Sor li Duwêlê ye.

**Tiltapan** (Suçıktı) dikeve başûrê Karazê,16 km ji Karazê û 61 km ji Amedê dûr e. Berî salên 1990î gund 60 xane û 400 nifûs bû, gund hatiye vala kirin. Niha hinek gundî bi paş ve vegerîne gund û cardin nifûsa gund derketiye derdora 200-250. Mitêrî (Geyiksirti) û Sûrikan (Gölarla) mezreyên wê ne. Nifûsa Mitêriyê nêzîkî 360 û ya Sûrkan jî li derdora 250 ye. Gund hatiye valakirin lê herdu mezre her yek bi serê xwe ji gund mezintir bûne. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Mizgeft, dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

Institut kurde de Paris



Dîmenek ji çarşiya Licê
Foto: Hüsamettin Bahçe

# Licê

Licê dikeve bakurê rojhilatê Amedê û 87 km ji navenda Amedê dûr e. Ji rojava ve cîranê Hêne, ji bakur ve Darahênê, ji rojhilat ve Pasûr, ji başûrê rojhilat ve Farqîn, ji başûr ve Hezro û ji başûrê rojava ve jî Karazê ye. Qada axa herêma Licê 1.083 $km^2$ ye. Herêmeke çiyayî ye. Ji deryayê 110-1200 m bilind e. 14 taxên navenda Licê hene. 56 gund û 112 gom (mezre) li ser Licê ne. Nifûsa navendê 11.717, ya gundan 17.076 e û bajarok bi gundan ve, bi giştî 26.793 e.

Bi giştî herêmeke çiyayî û stratejîk e. Ji serdema neolîtîk ve şopên mirovan mane. Li herêmê nawis, şikeft, sarinc û gelek şûnewarên wê serdemê hîn hene. Li herêma Licê desthilatdarên herî kevn ku bi dokumentên li ser keviran hatine kolandin Sûbarî, Hûrî û Nêrbî ne. Li gor analîza Arkeologan Babîliyan ji nawisê re gotine "Hûr". Hûrî jî tê wateya kesê ku di nawisê de dijî. Li gor dîtinên gelek dîroknas û arkeologan ev hersê desthilatdarî jî bav û kalên Kurdan bûne.

Piştî serdema kevirîn li herêma Licê cihwarên xerabeyên Zarga Fîsê, Şikeft û xerabeyên Biriqleynê, li Xana Kelê xerabeyên Zirqleynê hene. Li ser teht û şikeftên Biriqleynê nivîsên ku berî mîladê di navbera salên 930-950î de ji aliyê Tîglatpîleser Duyem ve û di navbera salên 840-860an de ji aliyê Salmazerê Sêyem ve hatine nivîsîn hene.

Wek hemû herêmên Amedê li gor demê, Medî, Persî, İskenderê Mezin, Romî û Bîzansî, Abasî, Merwanî, Tirkên Seçûkî û Osmanî hatine û herêmê dagîr kirine.

Di derheqê Licê ya îroyîn de dokumentên dîrokî tune ne. Bi tenê nivîseke li ser dîwarê mizgefta Mezin a Licê hebû ku ev mizgeft di sala 1845an de şewitiye û ji nû ve hatiye tamîr kirin. Di erdheja 1975an de mizgefta Mezin jî xerab bû. Li gor Şerefname û gelek pirtûkên dirokî li herêma Licê cihê navendiya herêmê Entax (Atak) bûye. Niha Entaxa li başûrê rojhılatê Licê gundekî biçûk e. Entax 20 km ji Licê dûr e. Di dema Merwanî û Osmaniyan de sancax bûye. Entax hîn îro jî ciheke dîrokî ye. Tê gotin ku çend mal ji Entaxê bar kirine û hatine li cihê Licê ya îroyîn danîne û pişt re bajar avakirine. Piştî barkirina van kesên ku ji Entaxê hatine li cihê Licêya îroyên kon vegirtine û piştre xanî avakirine, mirovên wan hatine seridana wan. Carek din dîsa hatine mêze kirine ku li cihê xwe ne. Gotine belê li cih ne. Li cî, bû ye Licê. Licê navê xwe weha girtiye. Li herêma Licê eşîret tune ne, lê tê gotin ku berê du eşîrên mezin hebûne.:*Zeynikî û Zirkî.* Ne dîroka wan heye û ne jî şopên wan ên dîrokî mane.

Berî Osmanî û di dema Osmaniyan de wek li seranserê Kurdistanê li Licê jî sîstema mîrtiyê hebûye. Mîr otonom bûne û bac û leşker danê Osmaniyan. Birêvebirên herêmê ew bûne. Li Licê bi navê Sereya Mehmed



Dîmenek ji Licê ya nû
Foto: Hüsamettin Bahç

Institut Kurde de Paris

Begê serayeke mezin hebû. Di erdjeha 1975an de ew jî cûm bû.

Xelkê Licê yên binecih Kurd û Ermenî ne. Li çend gundan Suryanî jî hebûne. Di qirkirina Ermeniyan de li herêma Licê jî wehşeteke mezin bi kar anine, bi sedan Ermenî kuştine û bi sedan jî bûne koçber. Heta erdheja 1975an çend malbatên Ermeniyan li navenda Licê mabûn û karê hesingeriyê dikirin. Piştî erdhejê yên mayî ji koç kirin. Niha li Licê Ermenî nemane.

Licê her çendî cihekî stratejîk e, ew çendî jî cihekî polîtîk û welatperêziyê ye. Di şerê Şêx Seîd de ji aliyê dewletê ve du caran hatiye şewitandin. Cara yekem di sala 1925an û cara duyem jî di sala 1927an de Licê û gundên wê şewitandine. Cara sêyem di 07.30.1993an de Licê tê şewtandin. Dewletê bi tank, top û helîkopteran Licê şewitand. Di navbera du rojan de 10 hezar Licî bi darê zorê ji Licê sirgûn kirin. Gund û mezre neman, piraniya wan şewitandin, vala kirin û navenda Licê jî bi xwe bû gundekî biçûk.

Licê li herêma erdhejê ye û heta niha gelek caran erd hejiyaye û liciyan zerarên madî û manewî dîtine. Erdheja herî mezin di 06.09. 1975an de bi hejeke 6,9 derceyî çêbû. Navenda Licê bi gelek gundên xwe ve cûm bûn. Licêya kevn namîne. Li gor hejmarên fermî di vê erdhejê de 2.385 kes mirine û 3.339 kes jî birîndar bûne. 8.149 avayî wêran bûne.

Licêya berî erdhejê li qûntara çiyayê Şîro bû. Piştî erdheje, dewletê li binya Licê bi qasi çend km li ciyekî rast ji prefabrîkan 1.568 xanî û 40 dukan çêkir. Ev xaniyên prefabrîk demdemî bûn û ji bo du salan hatibûn çêkirin. Diviya bû dewletê piştî du salan ji Liciyan re xanî çêbikirana. Heta niha jî ne hatine çêkirin.

Licê ciyekî çiyayî ye, ax û erazî kêm in. Li binya Licê deşta Dêrxeydê û deşta Girê Dadimê hene. Ev herdû deşt ji rojhilat ve ji çemê Sarimê heta Binê Dêrqamê dom dike. Zirav û dirêj e. Di navbera çiyayên pişt Licê û Panava Korê de dom dike. Di van herdû deştên biçûk de bi piranî çandiniya genim heye. Di van salên dawî de dest bi çandiniya pembo, titunê jî kirine lê gelek kêm e. Rezên herêma Licê gelek in. Firingiyên Xweylîn û Comelaşê û xiyarên herêma Dibiliyan bi nav ûn deng in.

Di nav tixûbê Licê de cihên dîrokî, turîstîk wek Zarga Fîsê, Xana Kelê, Şikeftên Biriqleynê, Xerabeyên Zurqleynê û ziyareta Sadilkafê ne.

Xawrinên Licê yên herî bi navûdeng kalek (kêlek ku bi tirkî dibêjin kaburga) e. Meşlûlên (beniyên) kefê û tituna Licokê li herêma Amedê bi navûdeng in.

Institut kurde de Paris

Çemê Biriqleynê serçaviya çemê Dîclê ye. Wek tê zçemê Dîclê ji du milan pêk tê. Yek ji Madenê û yek jî Biriqleynê. Çemê Birkleynê diçê Markê û piştre li herêma Gêlê ew û çemê Madê dibin yek û nav dibe Dîcle. Çemê duyemîn çemê Sarimê ye ku li rojhilatê Licê di navbera Licê û Pasûrê de tixûb e. Çemê Gir diçe ser ava Sarimê û çemê Engulê jî heye ku di tixûbê Hênê de diçe ser çemê Celkê û ew jî diçe ser çemê Zeynikan.

Çiyayên li herêma Licê li bakur çiyayê Şiro, Şêxtembûr, çiyayê Zirextê, çiyayê Şaxûrê, çiyayê Korxayê, çiyayê Cibir, çiyayê Koz, Lîs, li rojava Miyakuwan, Sadilkaf, li başûrê rojava Zarga Fîsê, li başûr çiyayê Dêrxustê û Hezanê ne.

Li navenda Licê avahiyên Halis Toprak hene. Toprak li Licê du fabrîka çêkiriye. Yek a rûn e û ya jî ya mermer e. Bi navê *Licê* rûn derdixe û li herêmê difroşe. Mermer jî gelek bi qelîtene û heta difroşin welatên der. Ji derî wan Xalis Toprak sê dibistan û nexweşxaneyek û ciyekî lênêrina kal û pîran çêkiriye.

## Şaredarî

### Di serdema Osmaniyan de

Di Salnameya Diyarbekirê di hejmara sala 1869an de, li ser şaredariya Licê weha dinivîse: *Qeymeqam Alî*



Dimenek ji Licê ya kevn, 1965
Foto: Adil Tekin



Institut kurde de Paris

*Hamîd Efendî, Naîbî Alî Riza Efendî, Muftî Ahmed Efendî, Malmudûrî Derwêş Efendî, Tahrîrat katibî Muhamed Efendî ye.* Berî vî tarîxê ne diyar ku li Licê şaredarî hebûye an na. Ji vê tarîxê bi şûn ve heta serdema Komarê her sal navên endamên heyetê nivîsîne. Di serdema komarê de jî li gor salan bi kêmaniyên xwe ve, ev lîsteya jêrîn tê zanîn.

1937-1939 Alettin Türk
1939-1941 Mele Ali Çelik
1941-1945 Mehemet Yılmaz
1945-1950 Kasım Tekin
1950-1954 Galip Akay
1954-1957 Galip Akay
Di dema Galip Akay de Ahmet Çelik saleke wekîltî kiriye.
1957-1960 Mehemed Dündar
1960-1964 Dema cuntayê
1964-1968 Mahmut Tofan (Ramazan Alacabey di dema Mahmut Tofan de demeke wekîltî kiriye.)
1968-1977 Halil Akgül (Di dema Halil Akgül de Mehmet İlgin û Mucahit Babur wekîltî kirine.)
1977-1980 Halit Nazmî Balkaş
1980-1984 (deme cuntaya)
1984-1989an Behcet Tektaş
1989-1994 Halit Nazmi Balkaş
1984-1999 Behcet Tektaş
1999 Zeynel Bağır (hatiye hilbijartin lê ji wezîfe hatiye girtin, di şûna wî de Fevzî Çelik bûye şaredar)
1999- 2004 Fevzi Çelik
2004-2009 Şeyhmus Bayhan
2009- 2011 Fikriye Aytin

# Çapemenî

Ji ware çapemeniyê ve Licê gelek hatiye îhmal kirin. Dema mirov li dema Osmanî dinêre gelek nivîskar û ramandarên bi navûdeng ji Licê hebûne, lê hezar mixabin li Licê ji derî du rojnameyan tu weşan derneketine. Ev her du jî di van demên dawî de hatine çap kirin. Ji wan yek Lîcenin Sesî ye. Li

Institut kurde de Paris

Amedê hatiye çap kirin û li Licê hatiye belav kirin. Ya din jî *Deprem* e ku di eslê xwe de bulteneke komelaya mamosteyan e.

Deprem

Deprem, Bulteneke mehane bû. Li Licê di sala 1975an de ji aliyê mamosteyên TÖB-DERê ve dihat derxistin. Wek tê zanîn di wê salê de li Licê erdhej çêbûbû, bulten navê xwe ji wê girtiye. Zimanê wê bi tirkî bû. Hejmara rûpelên wê di navbera 40-50î de dihat guhertin. Di redaksiyonê de Meki Dalaba (piştre navê xwe guhert û bû Amed Tîgrîs), Mehmet Çakmak û Mevlut İlgin bûn. Ev bulten bi qasî salekê li Licê bi stensîlê bi awayekî rêk û pêk derket.

## Nivîskar û dengbêj

**Refet Efendî** ji bo padîşah mewlûdekê dinivîsîne û di merasimê de dixwîne. Padîşah ji bo mewlûda wî bîst hezar quriş didê. Ev mewlûd gelek caran tê çapkirin. Ji derî mewlûdê gelek nivîs û helbestên wî jî hene. Piraniya helbestên wî li ser sala nû, wefatkirin, memûriyetî, derketina padîşah a ser text hatine nivîsîn.[48] Refet Efendî di sala 1903an de, li Stanbulê wefat kiriye û gora wî li goristana Karacahmet e. Helbestekê Refet Efendî li Uskudara Stanbulê li ser Dibistana Sibyan (Fatma Hanim Sibyan Mektebî- Uskudar) ku li ser navê Fatma Xanimê hatiye çêkirine, heye.

**Ehmed Ramizê Licî**

Jê re hem Ehmed Ramizê Licî û hem jî Ehmed Ramizê Kurdîzade dibêjin. Roja bûyîn û mirina wî ne dîyar e. Li gor lêkolîna Malmîsanij ew di sala 1904 an de, li Misirê bûye penaber. Piştî ku ew ji Misirê vedigere, li Stanbulê dibe berpirsê "Kurd Teavun ve Terakkî Cemiyetî." Cemiyet rojnameya Kurdistan derdixe, Ramizê Licî di rojnameyê de kar dike û nivîs dinivîse. Piştre Kurdên li Stanbulê "Kurd Neşrî Maarîf Cemiyetî" dadimezrînin. Ev komele li Stanbulê di sala 1909an de dibistaneke kurdî vedike û Ramiz dibe rektorê wê. Ramiz di sala 1912an de, li dij zordestiya Talat Paşa di nav re-

[48] Mehmed Emin Zeki Beg, Kürd ve Kürdistan Ünlüleri, s. 61 binêre. Li heman pirtûkê r. 66an de Refat Muhammed Efendi heye; ev û Refet Efendiyê Licî ne yek kes in. Ji bo Refetê Licî li Salnameyên Diyarbekire hemar ji 9 heta 12an binêre.

Institut kurde de Paris

fên "Partiya Huriyet û Îtilaf" de dixebite. Ji bo çapkirina pirtûka *Dîwançeya Dehrî*, dadgeh Ramiz sirgûnê bajarê Kastamonuyê dike. Li gor agahdariya Zinar Silopî, Ramizê Licî di dawî de, li Şamê li taxa Kurdan çûye ser dilovaniya xwe. Ramizê Licî pênc pirtûk nivîsîne: *1. Xetaya Selef û Xelef 2. Îxtara Dîcle û Firad û Hawara Mabeyna Nehran 3. Paşvemana Kurdan û Kurdistanê 4. Hîmayekirina Maarîf 5. Reşbelek*. Ji derî van berheman di sala 1904an de, li Misrê mewlûda Kurmancî jî çap kiriye û weşandiye.

**Seydayê Licî**

Navê Seydayê Licî Mehemed e û naznavê wî Hadî ye. Ew di sala 1853an de li taxa Mela ji dayik bûye. Bavê wî şêx Sibgatullah ji Hewlêrê ji gundê Ziyaretê hatiye û li Licê bi cih bûye. Di sala 1880î de, li Amedê îmtîhana mamostetiyê qezenc kiriye. Di sala 1886an li Licê dest bi mamostetiyê kiriye. Di sala 1909an de bûye muderesê Licê. Ew di îlmê nahv, mantik, arûz, îstîare û bi taybetî fikihê de jî jêhati bûye. Seyda heta dawiya jiyana xwe li Licê maye. Seydayê Licî di sala 1911an de çûye ser dilovaniya xwe. Gora wî li goristana Mîran e. Seyda Mehemed helbestên xwe bi navê Seydayê Licî nivîsiye. Du berhemên Seyda hene: 1. *Dîwan* (hatiye çapkirin.) 2. *Tecvîd*, helbest e (hatiye çapkirin.)

**Mele Ehmedê Xasî**

Mele Ehmedê Xasî di sala 1863an de, li Hezanê hatiye dinê. Ew meleyekî gelek xurt û zane bûye. Mele Ehmed bi kurdî (kurmancî -kirmanckî), tirkî, farisî û erebî dizanibûye. Piştî perwerdeya xwe ew vegeriya Hezanê û li wir di medresê de dersdarî û piştre li navenda Licê muftîtî kiriye. Dema hîlafet hatiye rakirin û diyanet damezrandine wî ji muftîtiya Licê îstîfa kiriye. Helbestên wî bi zaravayê kurmancî û bi zimanê erebî hene. Mele Ehmedê Xasî ji ber kurdperwerî û dîndariya xwe di dema sultan Evdilhemîd de ji welat hatiye sirgûnkirin û ew birine li girava Rodosê du sal û du meh di bin çavdêriyê de girtine. Meleyê Xasî li dij Îttîhat-Terakkiyan bûye û wî bi taybetî bi Ziya Gokalp re gelek gotûbêjên tûj û dijwar kiriye. Mele Ehmedê Xasî bi Mewlûda xwe tê naskirin. Wî bi navê *Mewlûdê Nebî* bi zaravayê kirmanckî mewlûd nivîsîye. Mewlûda wî ji 18 beş û 378 beytan pêk tê. Mewlûda Xasî cara pêşî li Amedê di 25ê adara 1898an de hatiye çapkirin. Ji derî mewlûdê Meleyê Xasî bi navê *Cengname* pirtûkeke din jî nivîsiye, lê hezar mixabin

heta niha Cengname nehatiye dîtin. Taybetiyeke Melê Xasî hebûye ku ew miroveki gelek zîrek û hazircewab bûye. Seydayê Xasî di sala 1950î de çûye ser dilovaniya xwe û gora wî li Hezanê ye.

**Fehmî Begê Pêçarî**

Fehmî Begê Pêçarî di sala 1910-1911an de, li Pêçarê hatiye dinê. Ew li Licê û Farqînê çûye dibistanê. Di dema têkçûna şerê Şêx Seîd de leşkerên Tirk davêjin ser Pêçarê gund dişewtînin û Ehmed Begê bavê Fehmî Begê bi 45 kesan ve li newala Pêçarê dikujin. Leşker li Fehmî Begê digerin, nabînin. Fehmî Beg di wê demê de li Farqînê dibistana ruştiyê dixwîne. Demek piştre Fehmî Beg li Farqînê tê girtin. Mehkemeya Îstîklalê ya Dîyarbekirê sê car cezayê bi darvekirinê dide Fehmî Begê, lê ji ber ku temenê wî biçûk e, nikaribûne wî bi dar ve bikin. Piştî derketina wî ya ji girtîgehê ew li Amedê dukanekê vedike û dest bi çêkirin û tamîrkirina tifingan dike. Ew heta dawiya jîyana xwe bi hest û xebatên niştîmanperweriyê ve mijûl dibe. Bi navê *Windayiyên Dîwanan* dîwaneke wî ya helbestan heye. Fehmî Begê Pêçarî di sala 1969an de, li Amedê diçe ser dilovaniya Xwedê.

**Mela Ehmedê Meylanî**

Mele Ehmedê Meylanî di sala 1912an de, li taxa Melan hatiye dinê. Ew ji malbateke mela û şêxan e. Malbata wan çend bav berê ji gundê Meylan a Sêrtê bar kirine û hatine li Licê bi cih bûne. Mele Ehmed pêşî li navenda Licê li medresê xwendiye. Di dema xortaniya xwe de wî li Norşînê, Farqîn û Hezro xwendiye. Di sala 1946an de, bûye miftiyê Licê. Mele Meylanî bi qasî 20 salan li Licê xizmet kiriye. Di salên dawî de, li gelek ciyên din jî miftîtî kiriye. Mele Ehmed bi zaravayên kurmancî û kirmanckî û bi zimanên tirkî, erebî û farisî zanîye. Di sala 1977an de karketî bûye û mala xwe bar kiriye navenda Amedê. Mela Ehmed di salên xwe yên dawî de dest bi wergerê kiriye. Wî heta niha ev eserên jêrîn wergerandiye. Yên ku hatine çap kirin:*Tarîh ul Fikih-el Îslam, Bîdayet-ul Muctehdîd, Hayatus Sahabe.Yên ku nehatine çap kirin: El- Minhac, Kisas- ul Enbiye û Ruh ul Beyan.*

**Tarik Ziya Ekinci**

Tarik Zîya Ekincî di sala 1925an de li taxa Qerehesen hatiye dinê. Dibistana seretayi li Licê, ya navîn û lîsê li Amedê û ûnîversîteyê li Stanbulê xwen-

Institut kurde de Paris

diye û bûye doktor. Ekinci îxtîsasa xwe li Fransê kiriye. Di nav refên Partiya Karkerên Tirkiyê (TÎP) de dest bi xebatê kiriye. Ew demekê bûye Sekreterê Giştiyê Partiyê. Tarik Zîya Ekincî, di sala 1965 an de, di lîsteya Partiya Karkerên Tirkiyê (TIP) de wek namzetê parlamenterê Amedê hatiye hatiye hilbijartin. wî di gelek kovar û rojnameyan de nivîs û makaleyên sîyasî û tibî nivîsîye. Ew ji ber nivîs û ramanên xwe gelek carî hatiye girtin, sirgûnkirin, mecbûr maye û derketiye derî welêt. Heta niha pirtûkên wî yên ku hatine çap kirin ev in: *Doğu Dramı* (Dirama Rojhilat.), *Ben ve Devlet* (Ez û Dewlet.), *Demokrasi ve çok kültürlülük* (Demokrasî û Pirkulturî.), *Vatandaşlık Açısından Kürt Sorunu Ve Bir Çözüm Önerisi* (Ji aliyê walatî ve pirsa kurd û pêşnîyazeke çareseriyê), *Türkiyenin Kürt siyasetine eleştirisel yaklaşımlar* (Li ser siyaseta Tirkiyê ya Kurd helwesteke rexneyî), *Mılliyet, milliyetçilik, ve anayasa sorunları* (Pirsyarên netewe, netewetî, dewlet û qanûna bin gehîn) û Lice´den Paris´e (Ji Licê heta Parîsê).

**Sîpan Xizan**

Sîpan Xizan di sala 1928an de li Licê hatiye dinê. Medrese xwendiye. Bi navê *Gulistana Sîpan* û *Jana Sîpan* du pirtûkên wî yên helbestan hene.

**Evdirrehman Uçaman**

Evdirrehman Uçaman di sala 1934an de, li Licê li taxa Qerehesen hatiye dinê. Ew ji malbateke malmele ye. Di dema zaroktiya wî de malbatê koçberê Amedê kiriye. Li medreseyên dînî xwendiye û piştî xwendinê dest bi meletiyê kiriye. Li Amedê dest bi çêkirina saet û radyoyan dike. Xelk wî bi navê *"Evdilrahmanê Radyocî"* nas dike. Ji bo bîr û baweriyên xwe gelek caran hatiye girtin. Berhemên wî yên ku wek kitêb hatine çapkirin ev in: *Ferhenga Kurmancî -Hewremanî - Kirmanckî - Senandejî, Etîmolojiya Zimanê kurdî, 26 Sûreyên Quranê* wergeraniye kurdî. Gelek nivîsên wî hatine weşandin. Ew di sala 1998an de, li Amedê çûye ser dilovaniya xwe.

**M. Emîn Bozarslan**

Mehmed Emîn Bozarslan di sala 1934an de li Eqro hatiye dinê. Di medreseyên dînî de xwendiye û piştî xwendina xwe bûye muftî. Wî ji destpêka salên 1960î ve dest bi nivîsandinê kiriye. Ji ber raman û berhemên xwe ji kar hatiye avêtin û gelek caran hatiye girtin. Bozarsalan bi zimanên kurdî, tirkî,

erebî, farisî, swêdî û bi îngilîzî dizane. Ew bêgav maye û di sala 1978an ve li Swêdê bi cih bûye. Pirtûkên M. Bozarslan ên ku heta niha hatine çap kirin: *Îslamiyet Açısından Şeyhlik-Axalık, Doğu Sorunları, Alfabeya kurdî, Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî, Îçerdekiler ve Dışardekiler, Merwani Kürt Tarihi, Mahabad Kürd Cumhuriyeti, Anarşistler, Kürtçe-Türkçe sözlük, Meyro, Kovara jîn (werger), Mîrzoro, Gurê Bilûrvan, Kêz Xatûn, Serketina Mişkan, Pepûk, Meleyê Meşûr, Masiyên bejî, Ji dînan dîntir, Keçika darîn, Keçika Qirşikfi roş-89, Jîn: kovara kurdî-tirkî, Pêkenokên gelî, Kurdistan: rojnama kurdî ya pêşîn, Ferhenga Kurdî.*

**Mela Mehmedê Hezanî**

Di sala 1938an de li Hezanê ji dayik bûye. Ew kurê mele Mela Ebdulxefûr e. Li cem bavê xwe dest bi xwendina medreseyê kiriye. Pênc salan çûye dibistana tirkî. Li Licê û Amedê medrese xwendiye. Demek eli Bismil û Mêrdînê jî çûye xwendiya medresê. Di sala 1969an de li gundê xwe li Hezanê dest bi meletiyê kiriye. Di heman salê de dest bi nivîsandina helbestan kiriye. Heta niha du pirtûkên wî derketine. *Mecnûn û Leyla* (1979) û *Eqîdetul Îmanî* (1980) in. Piştre Seyda pirtûka xwe ya Eqîdetul Îmanî wergerandiye (1981) ser zaravayê kirmanckî.

**Ali Perişan**

Ali Perişan di sala 1932an de li Licê hatiye dinê. Dibistana seretayiyî xwendiye. Bi kurdî bi awayekî klasîk helbestên wî hene. Li Amedê karkerî kiriye. Li ser xwe û malbata xwe bi navê *Jiyana min* pirtûkeke nivîsiye. Ali Perişan di sala 2009an de miriye.

**Zekî Hocaoğlu**

Zekî Hocaoğlu di sala 1938an de li Licê hatiye dinê. Xelk wî wek Hecî Zekîyê Mala Xoce nas dike. Maxlasa wî ya helbestvaniyê Gelnasê Amed e. Hecî Zekî dibistana seretayî li Licê xwendîye. Di xortaniya xwe de dest bi şoferîyê kiriye. Piştre di gelek karê cuda de kar kiriye. Niha jî muteahîtî dike. Helbestvan e û bi kurdî dinivîse. Bi navê *Ezvan û Gelvanê Kurd* pirtûkeke wî ya helbestan heye û ya duyem jî li ber çapê ye.

Institut kurde de Paris

**Ömer Ağın**

Ömer Ağın di sala 1948an de li Licê hatiye dinê. Li Licê dibistana seretayî û navîn û li Amedê jî dibistana lîsê xwendiye. Li Stanbulê li zanîngehâ Bazirganiyê xwendiye û di komîta navendi ya TKPê de kar kiriye. Niha di BDPê de kar dike. Bi tirkî dinivîse. Di rojname û kovaran de gelek nivîsên wî derketine. Bı navê *Kürtler, Kemalizm* ve *TKP û Alev, Diwar ve TKP* du pirtûkên wî hene.

**B. Welatevîn**

B. Welatevîn di sala 1953an de li gundê Fûmê ku li ser Licê ye hatiya dinê. Navê wî yê nifûsê Mehmet Hakkı Balta ye. Piştî cunta 12ê Îlonê koçberê Swêdê kiriye. Niha li Stockholmê dijî. Nivîskarê pirtûkên dersê bi taybetî yên sinifa 1, 2 û 3 ye. Çend ji wan ev in: *Kurdiya Şirîn -I, Kurdiya Şirîn -II-, Gulbihar, Heywanên Kedî, Heywanên Kovî, Gulistana Çîrokan, Balinde, Pîvok.* Di malpera *www.e-weje. com*ê de jî gotar dinîvîse. Hemû berhemên wî bi kurdî ne.

**Xurşîd Mîrzengî**

Xurşîd Mîrzengî di sala 1954an de li gundê Zengê ji dayik bûye. Navê wî yê nifûsê Abdurrahman Esmer e. Wî heta 14 saliya xwe feqîtî kiriye. Di sala 1982an de mecbûr maye û ji welat derketiye û piştre hatiye Ewropa. Ew bi zaravayên kurmancî û kirmanckî dizane, lê bi kurmancî dinivîse. Heta niha sê romanên wî derketine. *Sînor, Ristemê Zal û Bilqitî.*

**M. Sıddık Bozarslan**

M. Sıddık Bozarslan di sala 1955an de li Licê hatiye dinê. Dibistana seretayî û navîn li Licê û sala dawiya navîn û amadehiyê li Amedê xwendiye. Li Enqerê dibistana rojnamegeriyê qedandiye. Pêşî bi navê Botan Amedê û piştre bi navê Siddiq Bozarslan nivîsiye. Ji ber karê polîtîk hatiye girtin. Piştî 12ê îlonê li Swêdê bi cih bûye. Di kovar û malperan de dinivîse. Du pirtûkên wî hene û herdu jî bi tirkî ne. *Kürtler ve Kürdistan tarihi* (Kurd û Dîroka Kurdistanê) û *Kurdistan'da Bagımsızlık ve Türkiye'de Demokrasi Sorunu* (Pirsa Demokrasîyê li Tirkîyeyê û Serxwebûnê Kurdistanê).

**Lokman Polat**

Lokman Polat di sala 1956an de, li taxa Melan hatiye dinê. Dibistana seretayî û navîn li Licê û lîsê jî li Amedê xwendiye. Lokman Polat di sala 1984an

Institut kurde de Paris

de li Swêdê bûye penaberê sîyasî. Heta niha gelek pirtûkên wî derketine. Ji wan hinek bi tirkî hinek jî bi kurdî ne. Pirtûkên bi kurdî sê roman û şeş pirtûkên kurteçîrokan in. Lokman Polat kovara kulturî û lîteraturî *Helwestê* jî weşandiye. Navên çend pirtûkên wî ev in: Kurteçîrok: *Mêrxas, Evîndar, Xwîn û Hêstirên Çavan, Jin û Zindan, Evîn û Jiyan, Efsaneya Şahmaran, Kewa Marî, Fîlozof, Rojnamevan.*

**Bayram Ayaz**

Bayram Ayaz di sala 1956an de li Licê hatiye dinê. Dibistana seretayî û navîn li Licê û dibistana mamostetiyê li Kirşehirê xwendiye. Li Enqerê Dibistana rojnamevaniyê xwendiye. Di 1976-1980 li Enqerê di serokatiya rêxistina mamosteyan TÖB-DERê de cih girtiye. Di dema cûntaya 12ê Îlonê de derketiye derveyî welêt û li Almanyayê bi cih bûye. Di gelek rojname û kovaran de hîn dinivîse. Carna di nivîsen xwe de navê wek A. Azad, Goran Azad, Cejno Azad jî bi karanîye. Heta niha bi navê *Türkiye'de Insan Hakları ve Kürt Sorunu Örneğinde TÜRK BASINI* û *Li Kuçeya Thomas-Mann Peyama Kurd* du pirtûkên wî hatine çap kirin.

**Serdar Roşan**

Serdar Roşan di sala 1958an de li Hezanê hatiye dinê. Ji dibistana mamostetiyê mezûn e. Di sala 1982an de ji ber sedemên sîyasî derketiye derveyî welêt û li Swêdê bi cih bûye. Bi edebiyatê ve mijûl dibe. Bi zaravayên kurmancî û kirmanckî dinivîse. Heya niha neh pirûkên wî hatine weşandin. Wergerên wî jî hene.

**Zeki Dilek**

Zeki Dilek li Licê hatiye dinê. Dibistana seretayî li Licê xwendiye. Di karê weşanxaneyê de xebitiye. Bi tirkî li ser Licê berhevekeke amade kiriye.

**Zeki Bozarslan**

Zeki Borzaslan di sala 1955an de li Licê hatiye dinê. Dibistana seretayî xwendîye. Di dema xortaniya xwe de dest bi cildirûniyê kiriye. Ketiye nav tevgara azadiya Kurdan û çend car ketiye girtîgehê. Piştî 1980î wek penaber li Swêdê bi cih bûye, piştre li pêşdibistanan dersa zarokên kurdî daye. Bi navê *Nêrînek li ser dîroka Kurdistanê* pirtûkeke wî heye. Ew di sala 2004an de miriye.

Institut kurde de Paris

**Dilo Ferman**

Dilo Ferman di sala 1956an de li Licê hatiye dinê. Navê wî yê nifûsê Halit Balin e. Dibistana seretayi, navîn û amadeyî li navenda Amedê û dibistana mamostetiyê jî li Çewlikê xwendiye. Di biçûktiya xwe de ketiye nav tevgera azadî. Piştî 12ê îlonê derketiye derî welat û di dawî de li Swêdê bi cih bûye. Li Swêdê mamostetiya kurdî dike. Bi navê Keçelok ji Samad Behrengî pirtûkeke çîrokan wergerandiye kurdî.

**Husamettin Aslan**

Husamettin Aslan di sala 1960an de li gundê Cinezûrê hatiye dinê. Dibistana seretayî li gundê xwe, dibistana navîn, amadeyiyê û Fakulteya Perwerdey jî li Amedê xwendiye. Piştî 1980î derketiye derî welat û li Swêdê bûye penaberê sîyasî. Li Swêdî çûye dibistana mamostetiya kurdî û piştî qedandina dibisatanê dest bi mamostetiya kurdî kiriye. Bi navê *Rindo li nav Bexçeyê Kalo* û *Rindê heywanan nas dike* du pirtûk ji bo zarokên biçûk nivîsiye. Pirtûka *Şagird diçin dibistan* wî, Haluk Öztur, Sabiha Otlu û Amed Tîgrîs li gel hev bi hevkarî nivîsîne. Di Weqfa Kurdî ya li Stockholmê de wek rêvebir kar dike.

**Bayram Bozyel**

Bayram Bozyel di sala 1961ê de li Licê ji dayik bûye. Dibistana seretayî û navîn li Licê û amadehiyê jî li Amedê xwendiye. Di sala 1982an de ji ber sedemên polîtîk bi çend hevalên xwe ve hatiye girtin. Di sala 1986an de ji girtîgehê hatiye berdan. Di sala 1988an de li Stanbulê fakulta Îqtîdasî xwendiye. Di sala 1996an de bi hevalên xw re Partiya Aştî û Demokrasiyê damezrandine. Bozbeylî bi xebata xwe ya polîtîk re di gelek rojname û kovarên wek *Azadî, Dengê Azadî, Ronahî, Hêvî, Roja Teze* ûhwd de nivîsiye. Bi tirkî dinvîse. Heta niha *Diyarbakır 5 Nolu* û *Düşlerimi süsleyan şehir* du pirtûkên wî hatine çapkirin.

**Roşan Lezgîn**

Roşan Lezgîn di sala 1964an de li gundê Dingilhewayê ji dayîk bûye. Di kovar û rojnameyan de bi zaravayê dimilkê gelek helbest û meqale nivîsiye. Pirtûka wî ya yekem di sala 2002an di nav weşanên Apec de hatiye weşandin. Navê pirtûka wî *Binê dara valêrê* de ye. Di pirtûkê de bi zaravayê dimbilkî 12 çîrokên kurt hene. Roşan Lezgîn li Amedê dijî. *Dêsan de Sûretê Ma Nimite, Ferhengê Îdyomanê Kurdkî, Halîn* û gelek wergerên wî hene.

Institut kurde de Paris

**Hafiz Akdemîr**

Hafiz Akdemîr di sala 1965an de li gundê Sîsê hatiye dinê. Malbata wî koçê Mersînê kiriye û çend sal piştre ve digerîn Amedê. Li Amedê dibistana serta, navîn û amadeyiyê xwendiye. Ew hîn di Amadeyiyê de ye beşdarî nava têkoşîne netewî bûye. Di nav KUKê de cih girtiye. Hafis di sala 1984 an de hatiye girtin û 3,5 di zîndanê dimîne. Ew di zîndanê de çîrokan dinivîse û di sala 1988an de bi navê *"Heyamola"* rojnameyekê derdixe. Piştre ji bo zarokan bi navê *Kardelen* (Berfin) kovarekê derdixe. Di sala 1991ê de Hafiz serbest tê berdan. Hafiz li Amedê pêşî di rojnameya *Yeni Ülke* û piştre jî di rojnameya *Özgür Gündemê* de dest bi rojnamegeriyê dike. Di 8ê tebaxa 1992an de li Amedê ji aliyê hêzên kontra ve şehîd ketiye. Piştî şehîdkirina Hafis hevalê wî Selahattin Bulut hemû nivîsên wî di du pirtûkan de kom dike. Navên wan: *Gülüşün Özgürlüğümdür, Özlemin Gül Sureti.*

**Robîn Rewşen**

Robîn Rewşên di sala 1965an de li gundê Hinyatê hatiye dinê. Navê wî yê nifûsê Edip Tekin e. Dibistana seretayî li Zengê, navîn û amadehiyê jî li Amedê xwendiye. Li Enqerê fakulteya huqûqê qedandiye. Piştre li Swêdê bi cih bûye. Li Swêdê niha mamostetiya zimanê kurdî dike. Pirtûka Îsmaîl Beşikçiya *Terora Dewletê li Rojhilata Navîn* (Orta Doguda Devlet teroru) û çîrokên *Hans Christian Andersen* wergerandiye kurdî. Di gelek kovar û malperên kurdî de nivîsên wî bi kurmancî û kirmanckî hatine weşandin. Di malpera e-weje.comê de dinivîse.

**Remzî Tanriverdî**

Remzî Tanrîverdî di sala 1965an de li Dêrxustê ji dayîk bûye. Dibistan seretayî li Licê, navîn û amadehi û fakulta edebiyatê jî li Amedê xwendiye. Ew di sala 1987an de çûye li Vîyanê dest bi xwendina zanyariya polîtîk, sosyolojî û felsefê kiriye. Di heman zanîngehê de doktora xwe daye. Li Tirkiyê li ser demokrasî birêvebiriya herêmê tez amade kiriye. Ew li Amedê di Rêxistina Yekîtiya Netewan de di beşa programa pêşketinê de wek koordînator kar dike. Bi navê *"Ketina qonaxa evînê"* pitûkeke wî ya helbestan heye.

Institut kurde de Paris

**Fuat Dündar**

Fuat Dündar di sala 1971ê de li navenda Amedê hatiye dinê li ser nifûsa Licê ye. Dibistana seretayî, navîn û amadehiyê li Amedê xwendiye. Li Stanbulê Zaningeha Teknîk beşa petrolê xwendiye û bûye muhendîs. Master kiriye. Dîsa li Zaningeha Stanbulê beşa têkiliyên navnetewî li Parisê dokrora daye. Li Zaningeha Bostonê wek mamosta kar kiriye. Bi fransî, Ingilîzi û tirkî dinivîse. Heta niha berhemên wî yên ku hatine çap kirin ev in: *1. Crime of Numbers: The Role of Statistics in the Armenian Question, The State University of New, 2. Modern Türkiye'nin şifresi: Ittihat ve Terakki'nin Etnisite Mühendisligi 1913-1918, (Modern Turkey's Cipher : The Ethnicity Engineering of the CUP) 3.Ittihat ve Terakki'nin Müslümanlari Iskan Politikasi 1913-1918, 4.Türkiye Nüfus Sayimlarinda Azinliklar (Minorities in the Turkish Census)*

**Rojbîn Perîşan**

Rojbîn Perîşan di sala 1973an de li Licê hatiye dine. Dibistana seretayî, navîn û amadeyîyê li Amedê xwendiye. Di sala 1991ê de dest bi fakulteya perwerdeya Sêrtê ku li ser zanîngeha Dîcleyê ye kiriye. Di heman salê de beşdarî nav hêzên azadiyê bûye. Salek paşê hatiye girtin û cezayê muebetê girtiye. Di girtîgehê de li ser nivîsandina helbest û çîrokan xebitiye. Di pêşbirikan helbestan a Huseyn Çelebî û İsmet Baycan de bûye yekem. Hîn jî di zîndanê de ye. Bi tirkî dinivîse. Heta niha *Saçlar ve Gölgeler* (Por û Sîh) û Gözyaşımın *Ağıydı Seni beklemek* (Li benda te mayîn rondikên çavên min bû) du romanên Rojbîn Perîşan derketine.

**Rojîn Zarg**

Rojîn Zarg di sala 1973an de li gundê Fîsê hatiye dinê. Rojîn Zarg demeke li Enstîtuya kurdî û li HADEPê kar kiriye. Di sala 1994an de berpirs û xwediye kovara 'W' bûye. Li Amedê di Komela Mafên Mirovan de wek rêveber xebitiye. Niha ew li Şaredariya Mezin a Amedê kar dike û di heman demê de li Zaningeha Anadolû li beşa aboriyê dixwîne. Ji 12 çîkorkên folklorîk berhevoke amade kiriye û li ber çapê ne. Wê û Hîlmî Akyol li gel hev bi navên *Çîrokên Gelêrî û Pêkenok* du pirtûkên folklarîk çap kirine. Bi navê *Fîdo* pirtûkeke wê heye.

Institut kurde de Paris

**Cemîl Oğuz**

Cemîl Oğuz di sala 1975an de li gundê Zengê hatiye dinê. Di *Azadiya Welat* de rojnamevanî kiriye. Di kovar û malperên kurdî de maqeleyên wî hatine weşandin. Edîtorê malpera Diyarnamê ye. Heta niha *Rojnamegerî pîvanên wê yên sereke, Qurtek evin* nivîsiye. *Sako* (werger-Gogol) û pirtûka *Duzimanî* wî û Dawid Rêbiwar li gel hev amade kirine.

**Bahoz Baran**

Bahoz Baran di sala 1982an de li Licê hatiye dinê. Navê wî yê nifûsê Bahattin Taman e. Dibistana seretayî, navîn û amadeyîyê li Licê xwendiye. Li zanîngeha Dîclê beşa perwerdeyê qedandiye. Hîn di dema zanîngehê de demeke berpirsê kovara *Tîgrîs* bûye. Niha mamostetî dike. Heta niha du pirtûkên wî derketine. *Rêzimana Kurmancî* wî û M. Bilbil bi hevkarî nivîsîne. Pirtûka wî ya duyem a çîrokan e û navê wê *A Baş* e.

# Çend eheng

**Mele Mistefayê Licî**

Mele Mistefayê Licî ji mehla Melan e. Ew alimekî mezin, zana û her wisa welatparêzekî baş û mêrxas bûye. Wek tê zŞûreya bilind a Şêx Seîd ji 8 kesan pêk hatiye û Mele Mistefa ji wan 8 kesan yek bûye. Piştî şikestina şer dîl ketiye destê dewletê. Mele Mistefa di 4ê Îlona 1925an de, bi 47 kesan ve ji aliyê Mehkemeya Îstîklal a Amedê ve li Amedê hatiye bi darvekirin.

**Fehmiyê Bîlal**

Fehmiyê Bîlal di sala 1887an de, li Licê ji dayîk bûye û li Licê dibistana seretayi û ruştiye xwendiye. Ji wir bi şûn ve ne diyar e ku çi xwendiye. Fehmiyê Bîlal li gor dema xwe miroveki xwenda, zana û çepgir bûye. Wî bi kurdî, tirkî û fransî dizanibûye. Di şerê Şêx Seîd de Fehmiyê Bîlal ketiye Komîteya Giştî ya Birêvebiriya şer û ew bûye Sekreterê Giştî yê Şêx Seîd. Piştî têkçûna şerê Şêx Seîd, Fehmiyê Bîlal çûye Îraqê. Heta efûya giştî ew û lawê Şêx Seîd Elî Riza û çend hevalên xwe li Îraqê mane. Di damezrandina Hoybûnê de wek nûner beşdar dibe. Fehmiyê Bîlal, Elî Riza û hevalên xwe dev ji Xoybûnê berdidin û di payîza 1932an de ji Îraqê vedigerin Tirkiyê. Dewlet Fehmiyê

Institut kurde de Paris

Bîlal sirgûnê bajarê Ispartayê dike. Piştî sirgûnê ew vedigere Kurdistanê. Fehmiyê Licî di sala 1967an de, li Amedê diçe ser dilovaniya xwe û wî dibin Licê li ba ziyareta Şêx Îsmaîl binax dikin. Fehmiyê Bîlal ji derî sîyasetê, bi karê wêjeyî ve jî mijûl bûye. Çîrokên La Fonten ji zimanê fransî wergerandiye kurdî. 12 çîrokên ku di nav xelkê de bi navê Mamê Hîto tên gotin, berhev kiriye û nivîsandiye. Ji wan yek *Giliya Daran* e.

**Emê Faro**

Emê Faro ji mezreya Kaxkîgê ya ku li ser gundê Botiyan e. Hem navê gund û hem jî navê eşîra wî Botiyan e. Di dema şerê Şêx Seîd de ew serok û mezinê eşîra xwe beşdarê şer bûye. Emê Faro miroveki bi cesaret û qehreman bûye. Lêbelê miroveki nexwenda.

Di şerê Şêx Seîd de Emê Faro qumandarê herî bi hêz û jêhatî bûye. Piştî ku li Amedê şer dişike û leşkerên Şêx Seîd xwe ber bi çiya ve dikşînin, Emê Faro bi hêzên xwe ve vedikişe herêma xwe. Ew li wir xwe diparêze. Xeto ku hem biraz û hem jî bûrahê wî bû û qaşo zêrevaniya wî dike, li ser nimêjê Emê Faro dikuje. Pêşî dibêjin "qeza bû." Piştre dem derbas dibe tê zku Xeto ji aliyê dewletê ve hatiye organizekirin.

**Heqî Beg**

Heqî Beg ji mirê Licê lawê Mehmûd Begê ye. Hevalê Fehmiyê Bîlal e û tê gotin ku herduyan bi hev re demeke di komiteya Partiya Azadî de kar kirine. Di hatina Şex Seîd a gundê Emê Faro de, Heqî Begê û Fehmiyê Bîlal wezîfe girtine. Piştre dema plankirin û bi serdegirtina bajarê Amedê re Heqî Beg dibe serokê eniya (bereyê) Amedê yê rojhilat. Piştî ku di sergirtina Amedê de bi ser nakevin, Heqî Beg jî tê girtin û dibin Elezîzê. Mehkema Îstîqlalê ya Elezîzê cezayê bi darvekirinê dide wî. Li wir înfaz dikin.

**Cemîlê Seyda**

Navê Cemîlê Seyda yê rastî Mehmed Hadîn e. Di şerê Sêx Seîd de şervanekî jêhatiye. Cemîlê Seyda piştî şikestina şerê Şêx Seîd bi gelek kesên din re derbasî Binxetê dibe. Ew di nav rêxistina Xoybûnê de dixebite. Dema Serhildana Dersimê dest pê dike, Xoybûn biryar digire û di bin serokatiya şêx Evdirrehîm de ji 14 kesan komeke çekdarên siwarî di hezîrana 1937an de dişêne bakur ku

ew derbasî Dersimê bibin. Cemîlê Seyda û du kurapên Şêx Seîd jî di nav wê komê de ne. Ew ji sînor derbas dibin û heta nêzîkî bajaroka Bismilê herêma Sînanê tên. Bi şev di nav zeviyeke genim de radizin. Eskerên derdor li wan digirin. Di navbera wan û eskerên de şerekî dijwar derdikeve. Esker dinêrin ku nikarin bi ser bikevin, ji çar aliyan ve agir ber didin zeviyên genim û bi barbariyeke nedîtî piraniya wan di nav zeviyên genim de dişewitînin.

## Dengbêjên Licî

**Teharê Eliyê Medikê**

Teharê Eliyê Medikê (Tahir Ercan) di sala 1914an de li navenda Licê li taxa Kortikê hatiye dinê. Dibistan nexwendiye. Dengbêjekî bi navûdeng e. Stranên mêranî û netewî gotiye. Kasetên wî hene. Teharê Eliyê Medikê di sala 2003an de wefat kiriye.

**Eliyê Licokî**

Eliyê Licokî di sala 1929an de li gundê Licokê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Ali Tugal e. Ji Mala Feqî Bekiran e. Karê etariyê kiriye. Heta sala 1995an li Licokê jiyaye. Malbateke kirmanckî ye, bi kurmancî jî pir baş dizane. Piraniya stranên wî bi kurmancî ne. Di 1995an de hêzên dewletê xaniyê wî bi hemû eşyayên wî ve şewitandine. Ew neçar maye û koçî Amedê kiriye. Ji wir jî barkiriye gundê Akragê. Çend sal piştre carek din vegeriyaye Licokê.

**Ûsivê Goçxarî**

Ûsivê Goçxarî (Yusuf Mizrak) di sala 1961ê de li gundê Goçxarê ji diya xwe re bûye. Heta 17 saliya xwe li Goçxwarê jiyaye. Dibistan nexwendiye. Ji 14 saliya xwe ve stranan dibêje. Bi piranî stranên Sidîqê Bozo û Şakiro dibêje. Paşê hînê xwendin û nivîsandinê bûye. Di sala 1978an de mala xwe bar kiriye Amedê. Li Amedê di karê avahiyan de dixebite.

**Kamilê Mala Şebo**

Kamilê Mala Şebo di sala 1928an de li navenda Licê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Kamil Tektaş e. Ji Suriyê heta Serhedê geriyaye. Di sala

Institut kurde de Paris

1950î de koçî gundê Ezîzan yê navçeya Kanîreşê ya Çewlikê kiriye. Bi salan li gundê Ezîzan dikandariyê kiriye. Ew di sala 1975an de miriye.

**Îbrahîmê Pîrikî**

Îbrahîmê Pîrikî di sala 1958an de li Pîrikê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Îbrahim Almas e. Dibistan nexwendiye. Malbata wî ji bajarê Mûşê hatiye Pîrikê. Heta 17 saliya xwe li Pîrikê maye û şivanî kiriye. Pîrik di sala 1995an de hatiye valakirin. Ji sala 1995an vir ve li Amedê dijî. Stranên ku dibêje ji radyoya Êrîwanê û ji Şakiro hîn bûye. Şagirdiya Sidîqê Bozo kiriye. Çar kasetên wî hene.

**Haviz Meheme**

Haviz Meheme di sala 1929an de li gundê Firdêsê hatiye dine. Navê wî yê di nasnameyê de Mehmet Talas e. Bi eslê xwe ji gundê Hertayê ye. Ji malbata Şêx Mehmûd e. Di sala 1954an de çavên wî kul dibin û bînahiya xwe winda dike. Loma bêtir giraniya xwe daye ser stran û çîrokbêjiyê . Stranên ku distrê hinek yên wî ne, hinek jî yên dengbêj Mistefayê Firdeysî ne.

**Evdirhîmê Fîsî**

Evdirhîmê Fîsî (Abdurrahim Zarg) di sala 1936an de, li gundê Fîsê bûye. Jê re Apê Şêx dibêjin. Dibistan nexwendiye. Di sala 1992an de mala xwe aniye Amedê. Stranên ku dibêje ji Mistefayê Firdeysî hîn bûye.

**Zibeyrê Cinezûrî**

Zibeyrê Cinezûrî di sala 1956an de li gundê Cinezûrê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Zubeyir Çakır e. 21 salan wek karmend xebitiye. Di sala 2005an de malnişîn bûye. Heta 20 saliya xwe li gund jiyaye. Li gund cotkarî û rezvanî kiriye. Ji sala 1997an vir de li Amedê dijî. Çîrok û staran ku dizane, ji civat û şevbihêrkan hîn bûye.

**Mistefayê Firdeysî**

Li Firdeysê hatiye dinê. Dîroka çêbûna wî wekî sal tam nayê zanîn, lê li gora qeydên nifûsê ew di sala 1925an de hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de

Institut kurde de Paris

Mustafa Kalkan e. Li gund cotkarî kiriye, pez û dewar xwedî kiriye. Hostayê dîwaran bûye. Di sala 1973an de mala xwe biriye navenda Amedê. Wî di sala 1979an de wefat kiriye.

**Evdirehîmê Pîrikî**

Evdirehîmê Pîrikî di sala 1932an de li gundê Pîrikê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Abdurrahim Pehlivan e. Dibistan nexwendiye. Malbata wî ji koçerên Ziktê ye. Ji 3 - 4 bavan berê ji herêma Serhedê hatine Pîrikê. Ji 15 - 20 saliya xwe ve dest bi stranan kiriye. Stranên ku dibêje ji Eliyê Hecî Sedûn, Seîdê Macir, Zahadê Serhedî, Şakiro û ji Evdoyê Şeqlatî hîn bûye. 40 sal li Pîrikê maye. Li gund karê cotkariyê kiriye û dewar xwedî kiriye. Di erdheja Licê ya 1976an de mala xwe biriye Amedê.

**Şêrînê Dingilhewayî**

Şêrînê Dingilhewayî (Şirin Çelik) di sala 1973an de li gundê Dingilhewayê hatiye dine. Sê sal dibistan xwendiye. Li mala xwe bi kirmanckî dipeyivin, bi kurmancî jî baş dizane. Malbata wî nêzîkî 100 sal berê ji Çewlikê hatiye gundê Dingilhewa. Di sala 1993an de dema Dingilhewa hatiye şewitandin, mala xwe biriye navenda Amedê. Li Amedê di karê avahiyan de dixebite. Çîrok û stanan ji pîra xwe, ji civat û dengbêjan hîn bûye.

**Şukriyê Entaxî**

Şukriyê Entaxê (Şükrü Yuva) di sala 1939an de li gundê Entaxê hatiye dine. Ji zarokatiya xwe ve stran gotiye. Ji Çewlikê, ji gundê Omeran hatine Entaxê. Kurdên kirmanckî ne. Stranên Hesenê Şêx Xalit jî gotiye. Li gund karê gund kiriye, serbest xebitiye. Di sala 1975an de li ser erdheja Licê strana bi navê "Deprema Licê" afirandiye. Di sala 1994an de mala xwe biriye Xarpêtê. Ew di sala 2001ê de di qezaya trafîqê de miriye.

**Mihemedê Dingilhewayî**

Mihemedê Dingilhewayî di sala 1978an li gundê Sernisê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Mehmet Çelîk e. Bi eslê xwe Çewlikî ne. Di 13 saliya wî de mala wan bar kiriye gundê Kabiyê. Di wan salên dawiyê de cardin ji Kabiyê koçî Dingilhewa kiriye. Ji malbateke dimilî ye, lê bi kurmancî distre.

Institut kurde de Paris

**Seîdê Cofitnî**

Seîdê Cofitnî (Sait Tunca) di sala 1955an de li gundê Cofitnê hatiye dinê. Ji Mûşê ji gundê Xêfika hatine. Kalê wî bi malîtî 60 salan li Farqînê, li gundê Şawo maye. Ji wir hatine Cofitnê. Sê bavên wî li Cofitnê jiyane. Bav û kalên wî jî dengbêj bûne. Lê bi vekirina Navenda Çand û Hunerê ya Dîcle Feradê re dîsa dest bi dengbêjiyê kiriye. Çend stranên evîniyê jî wî bi xwe çêkirine û dibêje. Berê ji bo dengbêjiyê li navçeya Farqînê geriyaye, çûye gundan, stran gotiye.

**Xeniyê Markî**

Xeniyê Markî di sala 1952an de li gundê Markê hatiye dinê. Di hucreyan de, li cem meleyan dersa olî dîtiye. Malbata wî bi kirmanckî dipeyive. Di erdheja 1975an de gundê wan jî xira bûye û ji nû ve avakirine. Heta sala 1982an tenê li mala xwe de stran gotiye. Piştî sala 1982an li civat û şevbihêrkan jî sitriye. Ji Hesenê Şêx Xalit hînî denbêjiyê bûye. Bêtir Huseynê Farî û Şakiro guhdarî kiriye. Di sala 1992an de mala xwe biriye navenda Amedê. Di nav gel de kasetên wî hene. Di şevbihêrk û civatan de distre.

**Helîmê Pêçarî**

Helîmê Pêçarî (Halîm Oruç), di sala 1966an de li gundê Pêçarê hatiye dinê. Malbata wî bi qasî sed sal berê ji Çewlikê hatiye Pêçarê. Kurdên Dimil ne. Bi kirmanckî dipeyivin. Li gund pênc salan dibistanê xwendiye. Di sala 1993an de mala xwe ji gund bar kiriye û çûye Hetayê. Malê çend car biriye Hatayê û piştre cardin bar kiriye Amedê. Li Amedê şofertiya otobusê dike.

**Mehremê Pêçarî**

Mehremê Pêçarî (Muharrem Akgül), di sala 1958an li gundê Pêçarê ji diya xwe bûye. Bi eslê xwe kirmanckî ye. Kalikên wî ji Heşederê hatine Pêçarê. Malbata wî ji aliyê Culemêrgê hatine. 8 salan dibistan xwendiye. Di sala 1979an de li Banka Zîraetê kar dike. Di malê de bi kirmanckî dipeyivin. Qesîdeyên ku dibêje ji bavê xwe Sofî Mihyedîn hîn bûye. Ji dengbêjan Şakiro diecibîne. Stranên ku wî jî çêkirine hene.

Institut kurde de Paris

**Yemlîxanê Pîrikî**

Yemlîxanê Pîrikî (Yemlihan Yüksel) di sala 1954an de li gundê Pîrikê hatiye dinê. Dibistan nexwendiye. Bîst sal li gund maye. Li gund karên wekî cotkarî, êzingvanî û rezvanî kiriye. Bi eslê xwe ji koçerên Ziktê ye. Kirmanckî ye, lê bi kurmancî dipeyive û bi kurmancî distire. Di erdheja Licê de mala xwe bar kiriye navenda Amedê.

**Mehemedê Nenyasî**

Mehemdê Nenyasî di sala 1947an de, li Nenyasê hatiye dinê. Heta 21 saliya xwe li Nenyasê jiyaye. Li gund karên wekî cotkarî, gavanî, çandina titunê, sebze û rezvaniyê kiriye. Di sala 1968an de mala xwe bar kiriye Navenda Amedê. Li Amedê bi karê bazirganiyê re mijûl e. Ew hîn di zarokatiya xwe de ji bavê xwe hînî stranbêjiyê bûye. stranên ku distre bi piranî yên bavê wî ne. Ji dengbêjan Mehme Salihê Beynatî û Hesenê Şêx Xalit hez dike û diecibîne.

**Feyziyê Nenyasî**

Feyziyê Nenyasî (Feyzî Tanrıverdi), Di sala 1930î li gundê Nenyasê ji diya xwe bûye. Dibistan nexwendiye. Li gund cotkarî kiriye, heywan xwedî kiriye û firotiye. 21 salan keyatiya gund kiriye. Ji zarokatiya xwe ve stranan gotiye. Ji dengbêjan, Kamilê Mala Şebo û ji bûrayê xwe Seîd hîn bûye. Di sala 1993an de mala xwe bar kiriye Edeneyê. Di sala 1995an de li Edeneyê miriye.

## Cihên dîrokî

**Xana Kelê**

Ji Licê ve dema mirov di riya papûrê re diçe û Biryasê derbas dike, piştî 3-4 km yan li rojhilatê qûntara çiyayê Miyakuwanê çend xan û avahiyên mezin hene. Navê wê derê Xana Kelê ye. Xana Kelê jî ciyekî dîrokî ye. Xerabeyên wê hîn jî cih bi cih li ser piya in. Li pêş xerabeyan mêrgeke gelek mezin heye. Kaniyeke têrav di nav mêrgê de ye. Ev xerabe di dema berê de xan, seray û hemam bûne. Karwan dema ji Amedê hatine ber bi Erzeromê ve çûne an jî ji Erzeromê hatine û ber bi Amedê ve çûne, li wir şeveder bûne. Mirov dikare bêje otel û motelên dema me bûne. Di sedsala 17an de, ji aliyê sultanê Osmanî Mûradê IV ve hatiye tamîr kirin û hinek beş lê hatine zêdekirin.

Institut kurde de Paris

**Biriqleyn**

Birkleyn li ser riya Licê û Darahênê ye. Ji Licê 25 km û ji Amedê jî 104 km dûr e. Li gor dîrokzanan gotina "Birikley bi zimanê Hûrî ye. Tê wateya kele avê. Li gor lêkolîna jeologan 2.5 mîlyon sal berî niha li geliyê Bermalê kalker hatina xwarê, gelî xitimandine û ava çem di bin kalkeran re ji xwe re tunelekê çêkiriye. Hîn îro jî çemê *Bermalê* 750 metre di tunela xwezayî de derbas dibe. Ji vê tunela xwezayî re *şikefta Mezin* dibêjin. Firehiya wê 5-6 metre û bilindiya wê jî 10-15 metre heye. Wek tê zçemê Bermalê ji aliyê rojhilat ve serçaviya çemê Dîclê ye. Di dema berê de, wek îro li ser çem pire tune bû, karwanên ku di navbera Amed û Erzeromê de çûn û hatine di ser vî şikefta Mezin û dirêj re derbasî aliyê din bûne. Ji ber wê yekê Licî jê re dibêjin *Kevirê Bazdê.* Çiya bilind û teht e. Hema di ciyê ku av tê re derdikeve der mirov bi tehtan ve bi qasî 100 m. hildikişe jor, li wir, li ser çiyê kela Biriqleynê û çend şikeftên din ên bi navûdeng hene. Kele xerabe ye û bi tenê çend dîwarên wê mane. Li ser teht û dîwarên xerabeyên kelê nivîs hene. Li gor arkeologan berî mîladî di sedsala 6 an de, ev kele ji aliyê împaratorê Pers Kuroş ve hatiye çêkirin. Kele û şikeft li ciyekî gelek stratejîk in. Çiya rê nadin, şikeft li serî çiyê berî wan bi aliyê başûr ve ne. Mirov ji wir her derî dibîne û dikare kontrol bike. Dijmin bi hêsanî nikare di wir re derbas bibe. Kele cara pêşî ji aliyê Îskenderê Zulqernî ve hatiye çêkirin. Hinek arkoloj dibêjin ku Biriqleyn ji navê Îskenderê Zulqernî tê. Îskenderê Zulqernî ne Îskenderê Mezin e. Ew padîşahê Persiyan e û navê wî yê rastîn Kuroş e. Mîmariya kelê jî dişibe ya Kurd û Persan. Xelk navê herdu Îskenderan tevlîhev dike. Kuroş yekîtiya dewletên Med û Pers pêk aniye û bûye serokê wan. Ji ber vê yekê di heykelên wî de du qiloç (strû-şax) hene. Ev tê wateya ku nûnertiya du dewletan dike. Zulqernî, tê wateya duqiloçî. Di nav xelkê herêmê de, li ser qiloçên Îskenderê Zulqernî çîrokeke weha heye:

Du qiloç di serê Îskenderê Zulqernî de derdikevin. Yek ji wan zêr e û yê din jî zîv bûye. Her berberê ku Îskenderê Zulqernî traş dike, piştî traşê tê kuştin, ji ber ku ew neçe vê sira han ji xelkê re nebêje. Rojekê berberekî gelek dîlbaz û xweşik porê Îskender jê dike. Îskender jê hez dike û dilê wî pê dişewite. Jê re dibêje "sond bixwe ku tu vê sirê ji tu kesekî re nabêjî, ez ê te nekujim." Ew jî sond û sozê dide ku dê vê sira han ji tukesî re nebêje. Çend roj bi ser bûyerê re derbas dibin, berber ji bo sirê nede der zehmetî dikşîne, nexweş dikeve. Diwerime û dike ku biteqe. Çareyê nabîne û diçe ber çemê

Dîmenek ji Biriqleynê →



Bermalê (Biriqleynê), devê xwe dixe nav avê û heta jê tê diqîre: "Du qiloçên Îskender hene: yek jê zêr û yê din jî zîv e." Bilqik ji avê derdikevin. Di vê mijarê de çend varyantên din jî hene.

Ji derî van efsane û gotinên nav xelkê du nivîsên ku li ser kevirên şikeft û kela Biriqleynê hatine nivîsîn îro di bin destê arkeolagan de ne û ji aliyên wan ve bi awayekî zanyarî hatine xwendin û analîzên wan hatine kirin, hene. Arkeolog hemfikirin ku kelê gelek caran dest guhertiye. Şopên herî kevn yên Hûrîyan in. Piştre, Îskender û paşê jî Asûriyan şopên xwe hiştine. Arkeolog û dîrokzanê Alman C. F. Lehmann Haupt ku di sala 1899an de, li ser van nivîsên bizmarî lêkolîn kiriye; îspat kiriye ku ev herdu nivîs ji aliyê padîşahên Asûr Tîglatpîleser û Salmanasarê Siseyan ve hatine nivîsandin. Tîglatpîleser-l berî mîladî di navbera salên 1114- 1104 û Salmanasar-lll jî berî mîladî di navbera salên 850-830 î de desthilatdar bûne. Du nivîsên ku ji aliyê Tîglatpîleser ve li ser kevirê şikefta Biriqleynê hatine nivîsîn hene.

Devê şikefta Mezin ber bi başûr ve ye û gelek teng e. Mirov her ku diçe fireh dibe û gelek rê jê vediqetin. Tunela hundirê şikeftê carnan teng û carnan jî fireh dibe. Kevirên nav wê dibiriqin. Mirov dibêje qey mûm helandine. Dilopên avê bi wan re diniqutin.

**Bajarê Deqnanos**

Bajarê Deqnanos li ser riya Amed û Licê ye û 18 km ji Licê dûr e. Li bakurê deşta Fîsê ye. Li ser girê Fîsê ku 1110 metre ji deryayê bilind e. Kes nizane bajar kengê hatiye avakirin û kengê ji ber çi sedemî cûm bûye. Stûnên ku di nav xerabeyan de hene, didin xuyakirin ku bajar ji aliyê Romayê ve hatiye avakirin. Dokument tune lê tê gotin ku berî Deqnanos ev bajar di dema Hûriyan de bajarek ji bajarên xweda û padîşahê Hûriyan yê *Bixûd* bûye. Çend hezar sal piştre Deqnanos hatiye bajar dagîr kiriye. Tê texmînkirin ku hukimdarê Romê Dekyanus ku Kurd jê re Deqnanos dibêjin, berî mîladê ew li bajarê Fîsê rûniştiye û hukimdariya xwe li seranserê herêmê domandiye. Deqnanos hukimdarekî xwedannenas û zulimkarekî gelek dijwar bûye. Îro bajar bi kela xwe ve xerabe ye. Di nav bajêr de seraya Deqnanos hebûye. Stûnên serayê ji kevirênbirî hatine çêkirin û niha jî beşek jê li ser xwe ye. Her yek ji 3-4 metreyî bilintir e. Xuya ye ku bajarê Deqnanos bi planeke serûber hatiye avakirin. Cade û kolanên wî hîn jî diyar in. Gundiyên derdorê her çiqas kevirên bajarê Deqnanos biribin û bi wan xaniyê xwe çêkiribin jî, lê hîn



jî hinek licî û stûnên seraya Deqnanos li ciyê xwe mane. Ji aliyê rojhilat ve çiya bi carekê de diqede. Binê wî qerqez û heta newala *Bargan* bi qasî çend sed metreyî serberjêr û kûr e. Ji wê pozê bilind yê çiyê re *Zarga Fîsê* dibêjin. Fîs tê maneya qerqez ku bi tirkî dibêjin uçurum. Li Zarga Fîsê ku li rojhilat mêze dike, gelek nawis û sarinc hene. Ji wan nawisan yek jê navê wê nawisa Keça Deqnanos e. Devê nawisê ber bi rojhilat yanî ber bi Licê ve ye. Dema roj di ser çiyayên Licê û Kevrê Qer re derdikeve, cara pêşî tîrêjên xwe davêje hundirê vê nawisê. Ji wir Licê xuya ye. Dibêjin ku keça Deqnanos her roj bi tîrêjên rojê ji xewa şîrîn hişyar bûye.

### Cenet û cehnema Deqnanos

Li gor gotinên kesên herêma Licê Deqnanos daw û doza xwedatiyê kiriye. Ji bo ku ew xwedatiya xwe îspat bike, li herêmê bihuşt û dojeh (cenet û cehnem) ava kiriye û baran barandiye. Gundê Firdêsê ji xwe re kiriye bihuşt û yê Cinezûrê jî kiriye dojeh. Ew kesên ku bi gotina Deqnanos kirine û jê re xizmet û hurmetên mezin nîşan dane, ew şandine Firdêsê û yên ku bi gotina wî nekirine û li himber qerar û kirinên wî derketine ew jî şandine Cinezûrê. Bi rastî gundê Firdêsê îro jî gundekî gelek xweş e. Firdês pişta xwe daye çiyayê Pêşêkevir û li Licê mêze dike Bajarê Deqnanos û Zarga Fîsê li kêleka

Institut Kurde de Paris

wî ya çepê bi peyatî bi qasî 30-40 deqîqeyî li rojavayê wê dikeve. Gundekî avî, bi rez û bexçe ye. Cinezûr tam li rojhilatê Zarga Fîsê ye û bi peyatî bi qasî saet-saet û nîv ji Zarga Fîsê dûr e. Cinezûr jî, gundekî bejî, bê dar û ber, li ber kelekela rojê ye. Havînan mar û mişk nikarin lê bijîn. 40-50 derece germ e û tav ji sibehê heta êvarê li nav çavên gund û gundiyan dixe. Nav gund gevzik û kulxan e. Kaniyeke gund heye, havînan ava wê dimiçiqe wek derzê jê diniqute. Min ji sala 1969an heta 1973an, 4 sal li dojeha Deqnanos mamostetî kir. Herweha ez jî 4 sal di dojeha Deqnanos de mam. Piştî du hezar salî ez jî bûm cehnemiyê Deqnanos. Di navbera Cinezûr û Dêrxustê de çiyayekî bilind heye û ji wî re *Kevirê Qer* dibêjin. Navbera Kevirê Qer û bajarê Deqnanos naverast e û hemû zevî, rez, dar û ber in. Mirov ji Zarga Fisê, Kevirê Qer dibîne. Bi kêmasî 7- 8 km heye. Deqnanos ji bo ku xwedatiya xwe bi gelê herêmê bide îspat kirin; seriyekî zencîr bi Zarga Fîsê ve girêdaye û yê din jî bi Kevirê Qer ve girêdaye. Bi hezaran meşk tijî av kiriye û yek bi yek bi wê zencîrê navbera Zargê û Kevirê Qer ve girêdaye. Piştre derzî di meşkan re kiriye û wek baranê av ji meşkan barandiye. Deqnanos gotiye: "Ez Xwedê me û baranê dibarînim." Di naverasta Zarga Fîsê û Kevirê Qer de axa gundên Pîrik, Huseynîk, Celik, Firdês, Dêrxust û Cinezûrê hene. Licî ji kesê zalîm re "Deqnanos"dibêjin. Xerabeyên bajarê Deqnanos ji aliyê kesên ku li eserên dîrokî, zêr û emaretan digerin ve hatiye kolandin û tahrîbkirin.

**Biryas**

Kela Biryasê nêzîkî Xana Kelê ye. Ev kele di dema Hûriyan de hatiye çêkirin. Piştre Pers û Romî hatine kel dagîr kirine. Romiyan navê Biryas lê kirine. Biryas bi Yewnaniya kevn navê keçan e. Hîn îro jî li nêzîkî xerabeyên Biryasê gundekî biçûk heye û navê wî Biryas e. Niha bi tenê xerabeyên Biryasa kevn an jî kela Zurqernê mane. Gundiyên derdorê bi salan kevir û stûnên wê birine û bi wan ji xwe re xanî lêkirine.

## Pîrozgeh

**Sadulkaf**

Li herêma Licê zîyareta Eshabê Keyf heye. Bi heman navî ne li herêma Licê bi tenê herweha li Afşîn, Efes, Tersûs, Spanya, Urdun, Sûriye, Misir, Turkistan, Cezayîr û li Afganistanê zîyareta Eshabê Keyf heye. Ziyareta



Zarga Fisê

Institut kurde de Paris

Sadulkafê li rojavayê Licê, di navbera Licê û navçeya Hênê de, li bakurê gundê Dêrqamê, li qûntara çiyayê Reqim e. Li nêzîk zîyaretê dêreke xerabe heye. Tê gotin ku navê vê derê dêra Reqîm bûye. Gund navê xwe ji wê girtiye. Dêra Reqîm bûye Dêrqam. Gotina Eshabul Keyf bi erebî tê maneya hevalên Şikeftê. Li gor hinek çavkaniyan mucîzeya Sadulkafê berî mîladî û li gor hinek çavkaniyan jî piştî mîladê pêk hatiye. Bûyera Sadulkafê di Quranê de jî derbas dibe.

Li gor xelkê herêmê bûyera mûcîzewî ya Sadulkafê weha ye:

Herêm di bin dagîrkeriya Romiyan de bûye. Fermandarê Romî Dekyanus ku Kurd jê re Deqnanos dibêjin, ew li bajarê Fîsê rûniştiye û hukimdariya xwe domandiye.

Deqnanos Xwedênenas û zulimkarekî gelek dijwar bûye. Wezîrên wî Yemlîxan, Mekselîna, Mîslîna, Mermûş, Debermûş û Şazenûş ji ber zordestî û zulma wî reviyane û çûne li çiyayê Reqim a (Sadulkafê) xwe veşartine. Bi navê Kefaştatayûs şivanek jî bi kûçikê xwe ve beşdarê wan bûye û navê kûçikê wî jî Qitmîr bûye. Û li gor Quranê jî weha ye: ew her şeş kes 309 sal ketine xewê, ranabûne û tu kes jî bi wan nahese. Li gor ayeta Quranê ya 17.

Şikeft servekiriye, roj ji aliyê rastê yê şikeftê ve derdikeve, ji bo ku tîrêjên xwe li wan nede, meyîl dide xwe û êvarê jî, ji aliyê çepê ve tîrêjên xwe li wan dide û diçe ava. Piştî 309 salan eshabe ji xew hişyar dibin, di nav xwe de gotûbêj dikin ka çend roj razane. Hinek ji wan dibêjin rojek û hinek jî dibêjin nîv roj em razane. Ji ber tirsa fermandarê zalim kincên şivan li Yemlîxan dikin û ew dişînin bajêr ku ji wan re nan bikire. Yemlîxan dema dadikeve nav bajêr, guhertineke mezin dibîne. Ew diçe firnekê nan dikire û dema pere dide nanpêj, nanpêj dinêre ku wêneya kralekî kevn li ser pere ye û dibêje "ev pere nabûre, pereyê 300 sal berê ye." Yemlîxan dibêje ku du roj berê bi vî pereyî tişt kirine. Nanpêj xeber dide hukimdarê wê demê Eryûs. Yemlîxan dikeve gumanê û bi paş ve berê xwe dide çiyayê Reqim û ber bi hevalên xwe ve direve.

Bajarî bi sivîl û leşkeran ve didin pey Yemlîxan. Yemlîxan bi selametî digihêje ba hevalên xwe û rewşê ji wan re dibêje. Hemû bi hev re dua dikin. Tehtê mezin dibe du cih û di navê de ji wan re riyeke fireh vedibe. Qitmîr jî dixwaze li pey wan here, pêşî nahêlin, piştre ew jî li peyî wan dere. Dema leşker û sivîl nêzîkî li wan dikin, teht û zinar tên girtin û ew wenda dibin. Lê rêçên wan li ser wî kevirê mezin wek ku li ser berfeke hişk bimîne xuya dike û dimîne.

Bi rastî hin îro jî rêçên Qitmîr li ser wî kevirê spî xuya dikin. Mirov dibêje qey kûçikek di ser berfê re derbas bûye, piştre berf bûye qeşa û bûye kevir. Hersal di 15ê meha gulanê de ji herêmê xelk bi kincên xwe yên rengîn diçin ser ziyareta Sadulkafê. Ciyê vê ziyaretê nêzîkî pozê çiya, di berpalê çiyê de ye. Zinar gelek bilind e. Aliyê başûr vekirî ye û meydaneke gelek fireh li pêş wê heye. Tehteke spî yê yekpare û pêş wî bi dîwar hatiye girtin. Du ode di nav hev de ne. Di nav odeya dawî de, di zinarê spî de aveke şor wek xwêdanê tê xwarê û li pêş wê jî cirneke avê heye. Ziyaretvan diçin fatîhe û due dixwînin, radimîsin, xwêdanê bi ser û çavên xwe re didin, secde dibin û bi berepaşkî derdikevin der. Li der cihek heye jê re dibêjin recima şeytan. Herkes diçe wê dere, bi kevirên biçûk şeytan recim dikin. Li wê meydanê dareke daxwazan heye ku herkes daxwaz û niyetên xwe dike û potekê bi dara daxwazê ve girêdide. Herweha dar bi kincên rengîn xemlandî ye.

**Şêx Îsmaîl**

Ziyareta Şêx Îsmaîl li taxa Qerehesen li ser riya Xincisê ye. Li ciyekî bilind, di nav goristana taxê de derûdora wî bi keviran dîwar kirine û li ser jî wek

Sadulkaf ⟶
Foto: Roşan Lezgin



xaniyekî biçûk çêkirine. Yên ku ji Liciya kevn diçûn Xincisê an jî ji Xincisê dihatin navenda Licê di ber şêx Îsmaîl re derbas dibûn û jê re fatîhe dixwendin. Rojên îniyan kesên nexweş dibirin ser ziyareta şêx Îsmaîl ku şîfa bibînin.

Li ser keramet û marîfetên Şêx Îsmaîl çend bûyer di nav xelkê de tên gotin. Dibêjin ku Şêx Îsmaîl qet nezewicî ye û bi ezebî wefat kiriye. Jinebiyeke xwedî du zarok her roj çûye ser ziyareta Şêx Îsmaîl û jê daxwaz kiriye ku ji xwe re mêrekî baş bibîne. Şêx rojekê ji jinika pir sû dibe û ji gora xwe diqîre: "Nebe, nebe tu carek din jî ji bo vê daxwaza xwe werî û min eciz bikî!" Jinik ji tirsan dibizde û ji wir bi dûr dikeve. Dîsa dibêjin ku piştre ew jin çend caran dizewice û tê berdan. Lê ji tu mêrê xwe dilşa û bextewar nabe. Ji bo ku ew ketiye ber xezeba Şêx Îsmaîl. Dîsa dibêjin dema ku Şêx Îsmaîl feqî bûye, xoceyê medresê di nav feqiyên xwe de qîmeteke mezin daye Şêx Îsmaîl. Xoce ji bo ku feqiyên wî sedema vê qîmet û hezkirinê bizanibin, gaziyê Şêx Îsmaîl dike û dibêje here xanî lox (bangeran) bike. Şêx Îsmaîl diçe xanî lox dike. Şêx ji feqiyên xwe re dibêje "bidizî herîn temaşeyî Îsmaîl bikin, ka çi dike?" Feqiyên hevalên wî mêze dikin ku Şêx Îsmaîl li ser xanî li quncekî rûniştiye û lox bixwe diçe vî serî xanî û wî serî xanî.

Keremateke wî yê din: Demsal zivistan bûye. Nexweşeke giran û xedar hebûye. Şêx Îsmaîl çûye serlêdana nexweş, rewşa wî ya ne baş dîtiye û gelek li ber ketiye. Piştre ji nexweş re gotiye "tu tirî dixwazî?" Nexweş gotiye vê zivistanê û tirî?" Şêx Îsmaîl di wê berf û qeşayê de çûye nav rezê xincisiyan û ji bin berfê çend gûşî tirî aniye û daye nexweş. Li ser vê bûyerê xelk dibêje Şêx Îsmaîl ewliyayê Xwedê ye û diçin ziyareta wî. Şêx Îsmaîl ji Xwedê re due dike ku can û giyana wî bistine. Xwedê dueya wî qebûl dike û ew diçe ser dilovaniya Xwedê.

### Şêx Ebdulah

Şêx Ebdulah li pişt Xincisê ye. Di 17ê adarê de diçin ser ziyareta Şêx Ebdulah. Mirov dikare bêje ziyareta şêx Ebdula, ziyareta jin û keçan e. Ew di roja 17ê adarê de xwe dixemlînin, xwarin û vexwarina xwe digirin û diçin ser ziyaretê û heta aliyê êvarê li wir dimînin. Ziyaret dibe wek festîvaleke mezin. Armanca çûndina ser ziyareta Şêx Ebdulah vebûna bext û qismet e. Evîn û evîndarî ye.

**Şêx Tengûr**

Ziyareta Şêx Tengûr li ser pozê çiyayê pişta li Licê ye. Ew li ciyê herî bilind e. Bi roj dema mirov ji wir ber bi başûr ve mêze bike, ji deşta Dêrxeydê, heta Pêşêkevir, ji aliyê rojava ve, ji Serdê û bi ser Zarga Fîsê re heta deşta Amedê wekî nav kefa dest xuya ye. Ji aliyê rojhilat ve jî, ji çemê Sarimê heta çiyayên pişt Farqînê mirov dikare bi çavên serê xwe bibîne. Ji bakur ve jî herêma Dimbilyan Karincag, Çilkanî û heta zîncîra çiyayê Şaxurî xuya dike. Bi şev jî, bi ser Zarga Fîsê û pira Gabanê re ronahiya lembeyên bajarê Amedê ku 90 km ji Licê dûr e, ronî dikin.

Zîyareta Şêx Tengûr li serê çiyayê hember li ciyê herî bilind e. Ji wir mirov bi çav, ji bakur ve Dimbiliyan, ji rojhilat ve deşta Dadimê û herêma Sarimê, ji başûr ve deşta Dêrxeydê, Qoraberber, ji rojava ve jî çiyayê Serdê, Zarga Fîsê dibîne. Heta bi şev ronahiya lambayên Amedê xuya dikin.

Tê gotin ku di rastiya xwe de navê vê ziyaretê Şêx Tembûr e. Lê Licî niha jê re şêx Tengûr dibêjin. Şêx Tengûr miroveki zane û evîndar bûye. Ew hilkişiyaye vî cihê bilind ê seyrangeh. Li wir tembûr lêdaye û striye. Ji wî kesê ewliya re gotine "şêx Tembûr." Piştî mirina wî êdî hersal keç û xort di demsalên bihar û payizan de çûne wir û tembûr lêdane, dîlan û şahiyê kirine, xwarinên xweş çêkirine. Niha jî carnan xelkê herêma Licê di demsalên bihar û payîzan de diçin ser ziyareta şêx Tengûr. Li wir qurbanê ser jê dikin, xwarinê dipêjin û dixwin. Niyetê tînin, ji bo qebûlbûna daxwazên xwe due dikin.

**Şêx Bîlal**

Li gor gotinên gotinbêjan Şêx Bîlal ji bo ku misilmaniyê di nav xelkê de belav bike ji Bexdayê hatiye herêma Licê. Di navbera bajarê Şîro û Dêrcimta kevn de, bi cih bûye. Mala wî tune bûye. Bi roj çûye nav xelkê û bi şev jî di nav qelşa dareke mezin de maye. Di wê demê de çiyayên der û dorê hemû bi dar û ber bûne. Li çiyayê Kerekurê, Kevirê Kelê û Kevirê Teyra pezkûvî gelek bûne. Her êvar pezkûvî ji çiya hatine xwarê nav daristanê cem şêx Bîlal. Şêx Bîlal bi zimanê wan zanibûye û bi wan re peyiviye. Sibê zû dema tîrêjên tavê avêtine pozê Kevirê Teyran pezkûvî jî carek din berê xwe dane çiyê û col bi col bûne û çûne.

Şêx Bîlal dema çûye ser dilovaniya Xwedê, ew li cem dara ku têde maye veşartine. Ji ber vê yekê, ev dar û berên dora ziyareta wî pîroz in. Kes newêre bibire. Mirûdek şêx hebûye û heta dawiya jîyana xwe bi şêx re geriyaye. Jê

re alîkarî û xizmet kiriye. Mirûd dema wefat kiriye, ew li nêzîkî ziyareta şêx Bîlal li bin dara hevirsê veşartine. Dibêjin ku şêx Bîlal wesiyet kiriye û gotiye ku "dema xelk were ser gora min, divê herin ser gora mirûdê min jî." Ew kesên ku neçin ziyareta gora mirûd, daxwazên wan qebûl nabin." Ji ber wê gotina şêx Bîlal, niha dema kesên diçin ser ziyareta şêx Bîlal, piştre diçin cem dara hevirsê jî fatîhe dixwînin û due dikin. Di mehên bihar û payîzan de xelkê Licê, Dêrcimt û derdorê diçin ser ziyareta Şêx Bîlal û qurban serjê dikin. Jinên ku ji wan re zarok nabin, bi darên şêx Bîlal ve *gorgorên* (hêlekan) zarokan çêdikin û dihejînin. Ji şêx Bîlal daxwaz dikin ku zarokên wan çêbin.

**Baba Hecî**

Ziyareta Babe Hecî li navenda Licê ya kevn li Mehela Çarşiyê bû. Li bin qehweya Hemê Kalê û li kêleka aşa Eyo bû. Piştî erdheja 1975an carek din xaniyê wê hatiye çêkirin. Jina ku zaroka wê çêbe û jî şîrê wê kêm be, genim dikelîne û dibe davêje ser xaniyê Babe Hecî. Die dike ku şîrê wê zede bibe û tiştek bi zaroka wê neyê.

**Samparûs**

Ziyareta Samparûsê li jêrê Licê û Fûma kevn bû û niha jî li rojhilatê Licê ya nû dikeve. Meydaneke rast e û kaniyek jî li wir heye, jê re dibêjin kaniya Samparûsê. Tê gotin ku di zemanê berê de keçek di wir re derbas dibe û çend mêrên xerab dixwazin destdirêjiya wê bikin. Keçik ji ber wan direve û ew nêzîkî lê dikin.

Keçik hewar û gazî dike û li nav meydana xwedê erd diqelişe û keçik têde wenda dibe. Ew roj çarşema Sor bûye. Piştre li dor wê ciyê ku keçik têde wenda bûye bi keviran wek libên tesbîhê hewşeke mezin çêkirine.

Êvara Çarşemba Sor liciyên ku halê wan xweş bûn tesediq didan yên ku halnexweş û feqîr bûn. Roja çarşema Sor jin û keçên Licê û Fûmê diçûn li meydana Samparûsê kom dibûn. Stran digot û govend digirtin. Herkesî bi xwe re xwarinên xweş û tamdar dibir û wek rojeke pîknîkî derbas dikirin. Tiştekî gelek ecêb e ku Samparûs ji aliyê Kurd û Ermeniyan ve wek zîyareteke hevbeş tê qebûlkirin, ziyareta herduyan e jî. Çarşemba Sor di eslê xwe de cejna êzîdiyan e. Mirov dikare bêje ku li herêma Licê Samparûs ziyareteke pirdînî ye.

**Kaniya Tan**

Kaniya Tan li nêzîkî gundê Fûma kevn e li qeraxê newala ku di navbera Fûmê û Mala Eko Xanimê de ye. Tawiyan dibin ser kaniya Tan. Pêşî fatîheyê dixwînin û pêştre ava kaniyê li tawiyan dikin. Sê roj li pey hev eynî tiştî dubare dikin. Tê gotin ku piştî çend rojan taya tawî vedibe û nexweş rehet dibe. Heta dema şerê Şêx Seîd kaniya Tan wek xanî ziyareteke sergirtî bûye. Zîyareteke din jî hebûye, lê Piştî şer dewletê xaniyê Kaniya Tan xerab kiriye û kanî servekirî maye. Niha her çiqas tawî tune bin jî xelk wê derê wek zîyaret û mesîre bi kar tîne.

**Hemek**

Kaşê Rêş çiyayekî volkanîk e û li rojavayê Liciya kevn li jorê Qiloçekê ye. Lavên wî sarbûne û axa wî bûye wek rejiyê. Kaşê Reş bê dar û ber e, tu giha û hêşînahî lê şîn nayê. Çend caran muhendîsên dewletê hatine li kaşê Rêş lêkolîn û lêgerîn çêkirine û gotine ku "ji vê axê zêr çêdibe." Lê piştre dibêjin "zêrên ku ji wê axê derbixin gelek kêm e û mesrefa xwe dernaxe." Li aliyekî Kaşê Reş ciyekî avzem heye û axa wê hêşîn û şil e, ecûq e, mîna benîşt e. Ji wê derê re Hemek dibêjin. Xelk bawer dike û ceribandine ku axa Hemekê ya şil ji bo tawî û bawiyan şîfa ye. Di mehên germ de tawî û bawî diçin Hemekê û axa wê ya şil û şîn li laşê xwe didin, xwe disêwînin û didin ber tavê. Piştî çend saetan li ber tavê disekinin ax bi laşê wan ve hişk dibe. Dibêjin wê demê ew êşa laş dikşîne û mirov rehet dibe.

**Şêx Hesenê Erzaqî**

Dibêjin ku şêx Hesen bi esiê xwe ji gundekî Mêrniya Hezroyê ye. Koçberî Şamê bûye û li wir maye. Piştre vegeriye bajarê Mêrdînê. Şêx Hesen xwediyê keramat bûye. Navûdengê wî li her ciyê belav bûye. Hukimdarê Mêrdînê ji hêz û dengê wî gelek tirsaye û ew girtiye avêtiye zîndanekê bêbinî. Dergehvanê zîndanê rojekê dibîne ku şêx li ber kaniya mizgeftê destmêj digire. Matmayî dimîne. Di eynî rojê de hukimdar jî di mizgeftê de dibîne ku şêx Hesen rêzgirtiye û nimêjê dike. Piştî nimêjê dixwaze ku bi şêx re bipeyive lêbelê şêx di cih de, ji navê wenda dibe. Dema diçin zîndanê, dibînin ku şêx li zîndanê ye. Dibêjin ku şêx bi tîrêjên tavê yên ku li zîndanê dixe re çûye der û hatiye hundir. Hukimdar ji ber vê kerametê şêx Hesen ji zîndanê

berdaye. Şêx ji wir çûye gundê Dêrxustê û heta roja mirina xwe li wir maye. Niha gora wî li Dêrxustê ziyaret e. Di bin darên mezin de derdor lê girtine wek xaniyekî servekirî ye. Ji bo ku kesên nexweş rehet bibin, qurbanê dibin ser ziyareta şêx Hesen û dueyan dikin.

**Ziyareta Sinê**

Li gundê Sinê ziyaretek heye û jê re dibêjin zîyareta Şêx Muhamed. Şêx Muhamed kurê Şêx Ridwan e û gora bav û law li cem hev in. Tê gotin ku secera Şêx Ridwan heye û digihe heta Ebûbekir. Turbeya Şêx Muhamed heşt goşe ye û bi mîmariyeke balkêş hatiye avakirin. Li derdora zîyaretê goristanek heye ku dibêjin ew gor, gorên mirovên wî ne. Her der şîn, bi dar û ber e. Der û dor bi dîwar in. Tê bawerkirin ku ev zîyaret ji bo nexweşiyên sara û asabî baş û şîfa ye. Kesê ku problema wî ya wek nexweşiyên sara û asabî hebin, wan dibin ser vê ziyaretê. Kesê nexweş şevekê li ser ziyaretê dimîne û divê li wir raze. Ne bi tenê ji gundên nêzîk, herweha ji gund û navenda Licê, Hezro û Pasûrê jî xelk nexweşên xwe dibin ser ziyareta Sinê ku rehet bibin. Divê mirov bi kêmasî gîsk an jî bizinekê bi xwe re dibe û bike qurban. Ziyaretvan li wir goşt bi savarê re dixwin, didin xelkê hazir, due dikin û diçin. Sinî dibêjin ku ev ziyaret kalê wan e.

# Efsane

**Mozên zêr**

Di demên berê de yekî Cinezûrî di şerê Ûris de dîl dikeve destê leşkerê Ûris. Çend sal li wir di destê wan de dimîne û piştre wek xizmetkarekî ew didine maleke mezin û dewlemend. Kalê malê roja pêşî ji xizmetkarê xwe yê nû dipirse, ka ew ji ku ye. Xizmetkarê nû dibêje, "ez ji Licê me."

Kalo bi heyecan dipirse, "ji ku yê Licê?"

Xizmetkar dibêje "ji gundê Cinezûrê." Kalo di derheqê Licê û Cinezûrê de gelek pirs ji xizmetkarê xwe dike. Piştre kalê malê ji xizmetkarê xwe re dibêje, " kalê min jî ji Cinezûrê hatiye û li Rûsyayê bi cih bûye. Ew filehê wê derê bûye." Kalo jê re dibêje:

"Ez ê tiştekî ji te re bêjim. Lê heger tu soz bidî hem ji kesî re nebêjî û hem jî gotina min bi cih bînî, ez dikarim wê demê te serbest berdim. Tu dê rojeke zûtir herî mal, nav zar û zîçên xwe. Tu dê herî gund, bi biharê re, li ber kaniya

binya gund ku navê wê kaniya *Mesîlê* ye xiyaran bajoyî. Dema gul bifire lemê û bilûz bigire, ya pêşî nîşan bike. Çend roj piştre wê bilûzê (xiyarê biçûk) jêke û here ber wî kevirê mezin yê li bin kaniyê. Wî xiyarî bigire û li wî kevirê mezin xe." Dîl carek din bi Încîl û Quranê sond dixwe ku dê sozê xwe bi cih bîne. Kalo karê wî yê fermî çêdike û ew heta ber sînor dibe û derbasî aliyê din dike. Dîl azad dibe û tê mala xwe. Zarok û mirovên wî dilşa dibin. Bi biharê re ew li ba wê kaniyê xiyar diçîne. Gula yekem nîşan dike. Çend roj piştre wê jê dike û diçe ber wî kevirê mezin yê bin kaniyê. Bi quwet xiyar lê dixe û ew zinarê mezin di navê de dibe du cih. Ji nav, bi hezaran mozên sor û zer derdikevin, vizîn û gumîneke nebihîstî ji wan tê û ber bi jor ve difi rin. Ji bo moz pê ve nedin pêşî herdu destên xwe diweşîne û piştre bi destên xwe ser û çavê xwe dinuxêfe û ji wir direve. Lê di wê demê de destên wî li çend mozan dikevin û çingên ji wan tê û dikevin erdê. Koma mozan bilind dibin û piştre berê xwe bi bakur ve dikin, difirin û diçin. Piştî ku moz namînin ew vedigere ba kevir, çi bibîne baş e? Ew çend mozên ku destê wî li wan ketibûn, çingên ji wan hatibûn û ketibûn erdê zêr in.

**Kevirê Bi :skê**

Kevirê Birûskê li Hemekê li nav newalê ye. Ji ber ku birûskê li kevir xistiye jê re dibêjin kevirê Birûskê. Ji bo ku birûskê lê xistiye, xelkê herêmê kevirê Birûskê pîroz dihesbînin. Tawî û bawî diçin û pişta xwe têde didin. Tê bawerkirin ku êşa ku di pişt an jî di laşê mirov de hebe derdikeve.

**Kevirê Bûkê**

Li herêma Licê sê efsaneyên kevirê Bûkê hene. Yek li navbera gundê Helhel û navçeya Hezro ye, yek li nêzîkî gundê Tewila Hênê ye, yek li Fîsê ye û yek jî di navbera Xincis û goma Eqro de ye. Gundê Helhelê niha li ser navçeya Hezro û gundê Tewîlê jî li ser navçeya Hênê ye. Ji ber van sedeman ez dê bi tenê li ser kevirê bûkê yê ku li navbera Xincis û Eqro ye rawestim.

Kevirê Bûkê li newala Xizêfê ye û newala xizêfê dikeve navbera Xincis û Eqro. Li cihyekî fireh e û bi qasî 3-4 tonî giran e. Ev kevirê mezin bi rastî wek jineke bi çarşev û xêlîkirî ye. Bi destê rastê xêliya ser çavê xwe girtiye û di bin çengê wê yê çepê de jî boxçeyeke mezin heye. Hinek dibêjin ku bûk ji Xincis birine Eqro û hinek jî dibêjin na, ji Eqro birine Xincis. Ji ku dibin bila bibin,

Institut kurde de Paris

ev ne muhîm e ya muhîmtir ew bûye ku zava ne bi dilê bûkê bûye. Dema bûk bi xwendî û berbûran ve hatine nêzîkî newala Xizêfê, bûkê due kiriye ku bibe kevir. Xwedê dueya wê qebûl kiriye û ew li wir bûye kevir. Çend kevirên hûr û biçûk jî li derdora bûka kevir hene ku dibêjin ew jî berbûr û xwendî bûne.

**Kevirê Kun**

Li pişt gundê Fûma kevn kevirekî kun heye û jê re dibêjin kevirê *Kun*. Tê bawerkirin ku kevirê Kun ji bo kuxika dîko şîfa ye. Ji ber wê yekê zarokên ku bi kuxika dîko dikevin, dibin di kula Kevirê Kun re derbas dikin. Zarokên ku hîn bi kuxikê neketinbin jî, ji bo ku pêş li nexweşiya kuxukê bigrin, dibin di qulika kevirê Kun re derbas dikin.

# Gundên Licê

**Balicnê** (Esenler) dikeve başûrê rojavayê Licê. Ji Licê 38 km û ji Amedê 72 km dûr e. Niha Nifûsa gund li derdora 300î heye. Goçxarê mezreya wê ye. Di tixûbê (sînorê) Karaz û Hezroyê de ye û bejî ye. Gundî pez û dewar xwedî dikin. Bi kurmancî dipeyivin.

**Bamitnê** (Kutlu) dikeve başûrê rojhilatê Licê. Ji Licê 24 km û ji Amedê 111 km dûr e. Piraniya gundiyan ji gund bar kirine û nifûsa gund daketiye derdora 200î. Hecî Sefer, Reşan, Salîhe û Textebeş mezreyên Bamitnê ne. Gundekî mezin e. Wek gundên derdorê bi alîkariya teknîkê deşta Bamitnê bûye avî. Çandiniya titun, pembo û bamiyan tê kirin. Bamitnî pez û dewaran jî xwedî dikin. Li Bamitnê darên behîvan jî gelek in. Rezên Bamitniyan bi navûdeng in. Gundî bi kurmancî diaxivin.

**Banadêran** (Sığınak) dikeve başûrê rojhilatê Licê. Ji Licê 12 û ji Amedê 99 km dûr e. Nifûsa Banadêran nêzîkî 300î ye. Sema, H. Husên û Şikaka (Îskender) mezreyên wê ne. Tehtên sêlê yên herî baş li Banadêran hene. Gundî çandiniyê dikin, pez û dewaran jî xwedî dikin. Bi kirmanckî diaxivin.

**Barav** (Baharlar) dikeve bakurê rojhilatê Licê. Ji Licê 29 km û ji Amedê 116 km dûr e. Axtîgan, Dîyarsawe, Hemzê, Kum, Sizêrîn, Sûnzêre û Berxîg mezreyên wê ne. Hemû bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Bawerdê** (Üçdamarlar) dikeve bakurê rojhilatê Licê. Ji Licê 21 km û ji Amedê 108 dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 800î ye. Nêzîkî çemê Sarimê û li sînorê Pasûrê ye. Hodika Jêrîn, Hodika Jorîn, Sêqas, Dalane, Qerac, Qoşk û Qencerê mezreyên wê ne. Hemû bi zaravəyê kirmanckî dipeyivin.

**Bekiran/Zoxesalan** (Kıpçak) dikeve rojhilatê Licê, nêzîkî çemê Sarimê ye û di sînorê Pasûrê de ye. Ji Bekiran re Koçeran jî dibêjin. Ji Licê 18 km û ji Amedê 105 km dûr e. Nifûsa Bekiran li derdora 600î ye. Derederg (Newala Dirêj), Dingilhewa, Hesenan, Qolan û Xodîg mezreyên wê ne. Dingilhewa tê wateya aşê bayê. Di zemanê berê de li piştgund li ser gaza (girê) Erdê Mora aşekî bayê hebûye. Gund bi mezreyên xwe ve kirmanckî dipeyivin. Li gor gotinên kal û pîran xelkê Bekiran û Mêrdîniyan bi hemû gomên xwe ve ji aliyê Murtezan hatine û li van deran bi cih bûne. Murtezan, Mistan û Botiyan li herêma Dimbiliyan nêzîkî Darahênê sê gundên cîranên hev in. Ev hersê gund jî ji bavekî ne.

Çemê Benê ji binya Tûtê dest pê dike û di ber van gund û goman heta binya Hezmazê diçe û li wir dikeve ser çemê Sîran. Erd û zeviyên van deran hemû avîne û bi ber in. Zeviyên vê herêmê û bi taybetî yên ber çemê Benê û deşta Girê Dadimê heta salên 1960 di destê mîr û eşrafên liciyan de bûn û gundiyan bi îcare xwedî dikir. Ev erd û zevî di eslên xwe de malê Ermeniyan bûn. Di sefer û qetlîama Ermeniyan de mîr û eşafên navenda Licê li ser xwe tapû kiribûn. Di salên 1960î de ji ber tirsa reforma erd beşeke mezin jê firotin gundiyên herêmê. Hîn îro jî hinek zevî di destê Mîr û eşrafên navenda Licê de hene.

**Bêşişt** (Türeli) dikeve başûrê rojhilatê Licê û di sînorê Pasûr û Farqînê de ye. Ji Licê 29 km û ji Amedê 116 km dûr e. Nifûsa Bêşiştê li derdora 120 ye. Mezreyên Metmûr, Qiran, Memo, Zara û Dehla Zarê li ser in. Bi nifûsa xwe Zara ji Bêşiştê mezintir e. Zara gundê mîrên Licê ye û çend malbatên wan li wir bi cihbûne. Gundî bi kurmancî diaxivin.

**Celk** (Güçlü) dikeve başûrê rojavayê Licê û li ser riya Amedê ye. Ji Licê18 km û ji Amedê 70 km dûr e. Gund di bin qûntara Zarga Fîsê de ye. Celkê bi temamî hatiye vala kirin. Bi navê goma Şefîq û goma Hecî Qado du mezrayên wê hene. Gundekî avî ye. Firingî û îsotên Celkê bi navûdeng in.

Gundî pez û dewaran xwedî dikin. Bi kurmancî dipeyivin. Ji salên 50yî ve dibistan li gund heye, lêbelê niha wêran bûye.

**Cinezûr** (Çağdaş) dikeve başûrê Licê. Ji Licê 12 km û ji Amedê 94 km dûr e. Gund hatiye valakirin lê bi qasî 10-12 malan bi paş ve vegerîne gund.Gundekî bejî ye, lê dîrokî ye. Di efsaneya Deknanos de Cinezûr dojeha (cehenema) Deqnanos e. Di nav teht û zinarên piştt gund de bi dehan nawis û sarinc hene. Yek ji wan nawisan du tebeq e. Dibe ku ew mala mezinê wê demê be. Efsaneya zêr û mozan jî li wir e. Zêrên ku bûne moz û firîne. (Li beşa efsaneyan binêre). Rezên Cinezûrê bi navûdeng in. Tiriyê Cinezûrê heta zivistanê bi mêwan ve dimîne. Behîvên cinezûriyan pir in. Cinezûr wek birêvebirî li ser nehya Hezanê ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin.

**Cofitnê** (Dallıca) dikeve başûrê rojhilatê Licê. Ji Licê 17 km û ji Amedê 104 dûr e. Nifûsa Cofitnê nêzîkî 300î ye. Barsûm (Alataş), Qablo û Helbeqnê (Bakanlar) mezreyên wê ne. Piraniya deşta Zarê û Gir dikeve nav sînorên Reşan û Cofitnê. Niha di van salên dawî de bi alîkariya teknîkê deşt bûye avî. Bi genim re titun û pembo jî tê çandin. Heywanan



Li Dêzeydê çandiniya titunê



xwedî dikin. Barsûn û Qablo bi zaravayê kirmanckî û Helbeqnî bi kurmancî dipeyivin. Tê gotin ku navê Cofitnê ji fitneyê tê.

**Comelaş** (Daralan) dikeve rojavayê Licê. Ji Licê 17 km û ji Amedê 84 dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 300î ye. Dehlik, û Kendalan mezreyên wê ne. Comelaş di bin qûntara çiyayê Mîyakuwanê de ye. Mîyakuwan çiyayekî gelek bilind û bi dar û ber e. Gundî havînan derdikevin serê çiya û li wir li zozanan waran çêdikin. Heta payîzê li wir dimînin.

Di demên berê de li çiyayê Mîyakuwanê gelek pezkovî hebûne lê niha nemane. Taybetiya çiyayê Mîyakuwanê yek jê jî ew e ku piraniya darên wî asindar in. Comelaş gundekî avî ye û pêşî gundiyan çandiniya genim û garis dikirin. Di van salên dawî de dest bi çandiniya firingîyan kirine û her roj bi kamyonan dibin bazara Amedê. Li Comelaşê meqbera şêx heye. Comelaşî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Dareqol** (Kıyıköy) dikeve başûrê rojhilatê Licê. Ji Licê 21 km û ji Amedê 108 km dûr e. Nifûsa Dareqolê 360 e. Di sînorê Pasûrê de ye. Bamûs, Nazer, Hewsel û Dêrik mezreyên wê ne. Ji nîvî zêdetirî zeviyên gund di destê eşrafên navenda Licê de ne. Gundekî avî ye û bêtir çandiniya titunê lê tê kirin. Gundî çandiniyê bi awayên nîvekarî û îcarê dikin. Bi zaravayên kirmanckî û kurmancî dipeyivin.



Gundê Comelaşê

Institut kurde de Paris

**Dêrqam** (Duru) dikeve rojavayê Licê. Ji Licê 18 km û ji Amedê 80 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 700î ye. Heft mezreyên wê hene: Goma Mala Evdal, goma Ehmedî, goma Musabegê, goma Elîkeya, goma Arif Begê, goma Bekiran û goma Emeran. Dêrqam bi xwe li bin qûntara çiyayê Sadilkeyfê ye. Zîyareta Sadilkeyfê li bakurê gund, li qûntara çiyê ye. Goma Elî Keya û Binê Dêrqamê (Aşağıduru) bi kurmancî, Dêrqam û goma Mala Evdal jî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Dibistan hem li Dêrqamê û hem jî li Binê Dêrqamê heye.

**Dêrxust** (Dibek) dikeve başûrê Licê. Ji Licê 10 km û ji Amedê 95 km dûr e. Piştî salên 1990î gund ji aliyê eskeran hatiye şewitandin û wêrankirin. Meriyan (Çiğdem) mezreya Dêrxustê ye. Li herêma Licê Dêrxustî bi şerûdî û çovên xwe yên taybetî tên naskirin. Gundekî mezin e. Rez û zeviyên Dêrxustiyan gelek in. Gundekî nîv bejî ye. Dêrxust li ser nehya Hezanê ye. Ew jî wek gundê cîranê xwe Sîsê ji salên 50yî ve xwediyê dibistaneke seretayî ye, Lê niha dibistan wêran bûye. Bi kurmancî diaxivin. Ziyareta şêx Hesen li Dêrxustê ye.

**Dizdênî** (Yamaçlı) dikeve rojavayê Licê. Ji Licê 18 km û ji Amedê 95 km dûr e. Li Qora Berber, li qûntara çiyê ye. Havînan riya qûmkiri dixebite, lê di demsalên din de tê girtin. Du mezreyên wê hene. Gund hatiye vala kirin. Gundekî Bi firingiyê xwe navûdeng e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Elikan** (Birlik) dikeve bakurê rojavayê Licê. Ji Licê 23 km û ji Amedê 105 km dûr e. Gund hatiye valakirine û nifûs kêm bûye. Niha nifûsa gund nêzîkî 100î maye. Kelesin, Gezan, Şikan û Sirtêmerîn mezreyên wê ne. Elikan herêmeke kevn û dîrokî ye, herêm ji dema Hûrî û Nêrbiyan ve cihe şaristaniyê bûye. Tê gotin ku gund ji aliyê sê birayan ve hatiye avakirin. Cemîl, Seîd û Îskender in. Li gund telefon û elekrtîk hene, dibistan hatiye girtin. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Entax** (Kabakaya) dikeve başûrê rojhilatê Licê. Ji Licê 20 km û ji Amedê 120 km dûr e. Nifûsa Entaxê 150 maye. Şatih (Çanak), Cemar (Esenli) û Serêpirê (Köprübaşı) mezreyên Entaxê ne. Entaxa kevn xerab bûye. Entax di dîrokê de ciyê şaristaniyeke gelek kevn e. Şopên xirîstiyanan jî li wir hene. Hinek ciyên

dîwarên dêra Spî hîn îro jî li piyan mane. Ev jî dide xuyakirin ku Entax xwediyê dîrokeke dûr û dirêj e.

Entax di serdema Merwaniyan de sencexa Farqînê bûye. Di dema desthilatdariya Merwaniyan de Entax havîngeh û evîngeha padîşahên Merwaniyan bûye. Kela Entaxê îro cih bi cih li ser piyan maye. Pireke gelek kevn li Entaxê heye. Navê wê pira Çilkevir e. Tê gotin ku ji 40 kevirên mezin hatiye çêkirin. Di serdema sultanê Artûkî Melîk Adîl (1312-1365) de, li Entaxê mizgefteke bi minareyeke çargoşe çêkirine û jê re mizgefta Melîk Adil gotine. Ji bo ku minareya mizgeftê bi kevirên spî hatiye çêkirin, navê Minara Spî lê kirine. Li ser minarê bi tîpên erebî nivîsek heye ku ew ji aliyê Melik Adîl ve hatiye çêkirin lê dîroka çêkirina mizgeft û minarê nehatine nivîsandin. Ev minare hin jî heye lê, jora wê ketiye û qot maye, loma îro jê re minara qot dibêjin. Heta sala 1871ê jî Licêya îro bi hemû gundên xwe ve, li ser Entaxê bûne. Gundî bi kurmancî dipeyivin.

**Firdês** (Uçarlı) dikeve başûrê Licê. Ji Licê 22 km û ji Amedê 74 km dûr e. Nifûsa gund 250î ye. Li berpala çiyê ye û berê gund bi bakur ve, ber bi Licê ve ye. Gundekî avî ye, bi dar û ber û bexçe ye. Li herêma Licê bamiyên herî baş li Firdêsê tên çandin. Li ber ava Firdêsê aş hene. Di efsana Deqnanos de buhişta (ceneta) Deqnanos bûye. Gundî bi kurmancî dipeyivin.

**Fîs** (Ziyaret) dikeve başûrê rojavayê Licê. Ji Licê 20 km û ji Amedê 67 km dûr e. Li ser riya Licê û Amedê ye. Fîsa Kevn li başûrê deşta Fîsê hatibû avakirin. Ji bo ku PKK li wir hatibû damezrandin dewletê Fîsê vala û xerab kir. Fîsa nû di van salên dawî de, li rasta Fîsê, li derdora riya Amed û Licê hatiye avakirin. Niha li Fîsa nû bi qasî 100 nifûs mane. Di van salên dawî de çend malbat bi paş ve vegerîne û li Fîsa kevn jî ji nû ve xanî lêkirine. Li Fîsê xerabeyên Deqnanos hene. Ev bajarê xerabe li serê çiyayê bilind e. Heta niha kes nizane ev bajarê Deqnanos kengî, ji aliyê kê ve hatiye avakirin û kengî û ji çima wêran bûye. Lê tiştekî eşkere heye ku mîmariya Romiyan e. Di serdema Romayê de hatiye avakirin. Deqnanos jî ne dîyar e kî ye û li ser wî gelek çîrok hene. Fîsê ciyê rawestin û bîhnvedana rêwiyên ku ji Amedê diçin Licê, Pasûrê, Hêne û Çewlikê an jî ji wir tên Amedê. Xwarinxane, çayxane û otel li wir hene. Gundî bi kurmancî dipeyivin.

Institut Kurde de Paris

**Girê Dadimê** (Tepe) dikeve başûrê Licê. Ji Licê 15 km û ji Amedê 102 km dûr e. Zixur, goma Hecî Cemîl û goma Hecî Îzet mezreyên wê ne. Di dema berê de, li gund Kurd û Ermenî bi hev re jîyane. Piştî komkujiya Ermeniyan êdî Ermenî li gund nemane. Navrasteke mezin, berfireh û avî ye. Axa Gir bi ber û bereket e. Medrebên birîncê lê hene. Mirov dikare bêje li herêma Licê ji gundê herî bi ber û berhemdar yek e. Ji dema mîrîtiya Licê ve gund di destê mîrên Licê de ye û bi îcare didin gundiyan. Li herêma Licê bi tenê li Girê Dadimê gamêş tên xwedîkirin. Di dema şerê Şêx Seîd de dewletê zerareke mezin daye Girê Dadimê. Gund şewitandine û 37 kesî di navbera Gir û Hinyatê de kuştine û kirine çalekê. Ji wê derê re mezelê Kuştiyan dibêjin. Gundî bi kurmancî dipeyivin.

**Hêdîg** (Hedik) dikeve bakurê Licê. Ji Licê 32 km û ji Amedê 110 km dûr e. Sayrek, Manîsor, Sirkito û Bilbilik mezreyên wê ne. Li herêma Dimbiliyan e û herêm çiya û bi dar û ber e. Êzingên Licê piranî ji vê deverê tên. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin, gundî hatine koçberkirin lê niha çend mal bi paş ve vegerîne. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Hendîf** (Yorulmaz) dikeve bakurê rojhilatê Licê. Li herêma Dimiliyan e. Ji Licê 31 km û ji Amedê 118 km dûr e Nifûsa gund daketiye 50-60 kesan. Gund di sala 1993an hatiye valakirin lê niha hinek gundî bi paş ve vegerîne. Gundekî çiyayî ye û zevî kêm û çandinî hema hema tune. Heywanan xwedî dikin. Bi piranî bizin in. Gundî bi demsalî li der dixebitin û zivistanan bi paş ve tên gund. Dibistan hatiye girtin. Ji ber ku herêmeke çiyayî ye, rê ne baş e; bi taybetî zivistanan naxebite. Li gund av, elektrîk û telefon hene. Gundî bi zaravê kirmanckî dipeyivin.

**Herag** (Çıralı) dikeve başûrê rojhilatê Licê. Ji Licê 20 km û ji Amedê 108 km dûr e. Nifûsa Heragê li derdora 200 e. Ji ber koçkirina gundiyan nifûsa gund hindik bûye û dibistan hatiye girtin. Gundî bi çandiniyê ve mijûl in û heywan xwedî dikin.

**Heşedere** (Ulucak) dikeve bakurê Licê. Ji Licê 39 km û ji Amedê 127 km dûr e. Li herêma Dimbiliyan e. Gund hatiye valakirin, lê niha havînan çend mal diçin gund û bi qasî du-sê mehan li gund dimînin. Çiya ye û riya gund

Institut kurde de Paris

tune. Bi kirmanckî Heşdere dibêjin. Di sînorê Darahênê li nav newaleke kûr e. Di zemanê berê de, li derdorê hirç gelek bûne û navê xwe jî ji newala hirçan girtiye. Goma Miho, Eliyan, Evdirrehman û Hêgê Gozêrê li ser e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Hezan** (Savat) dikeve başûrê Licê û li qûntara çiyê Dêrê ye. Ji Licê 24 km û ji Amedê 76 km dûr e. Nifûsa Hezanê nêzîkî 300î ye. Nehya Licê ye. Ji xwe yek nahyeke Licê heye ew jî Hezan e. Ji vê herêmê re Pêşêkevir dibêjin. 13 Berê ev gund gund li ser nehya Hezanê ne: Cinezûr, Dêrxust, Sîsê, Zera, Licok, Fîsê, Firdês, Nenyas, Mişirf, Entax, Sinê, Kerwes û Zengê. Niha statuya nehetiyê nema ye. Qulixa askeriyê li Hezanê heye. Hezan gundê Meleyê Xasê ye.

Li Hezanê mala şêx Selîm heye. Di dema şerê Şêx Seîd de şêx Selîmê Hezanî bi mirûdên xwe ve beşdarî şer nebûne. Loma jî Mistefa Kemal gundê şêx Selîm û yên mirûdên wî neşewitandiye. Rez û hingivê Hezanê gelek bi navûdeng in. Dibistan û nexweşxaneyeke biçûk li Hezanê hene. Dibistan di sala 1949an de hatiye çêkirin û di heman salê de dest bi perwerdê hatiye kirin. Piraniya xelkê nehyê bi kirmanckî dipeyivin lê bi kurmancî jî dizanin.

**Hezmaz** (Budak) dikeve başûrê rojhilatê Licê. Ji Licê 13 km û ji Amedê 100 km dûr e. Nifûsa Hezmazê nêzîkî 300î ye. Bi navê Tepe û Zuxir du mezreyên wê ne. Berê gundekî bejî bû, lê piştî ku bendava Silîvan çêkirin, bû avî. Bêtir çandiniya pembo tê kirin. Bi kamyonan sebze û hêşînahiyan dibin Amedê. Gundî pez û dewar jî xwedî dikin. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Huseynîk** (Arıklı) dikeve başûrê rojavayê Licê. Ji Licê 18 km û ji Amedê 70 dûr e. Berê gundekî mezin û bejî bû, lê niha avî ye. Çelebî mezreya wê ye. Gundî bi paş ve vegerîne û carek din gund şên kirine. Gundî pez û dewar xwedî dikin. Huseynîkî zêde bi çerçîtî û bazirganiyê ve mijûl in. Rezên wan pir in û ziyaretek wan heye. Bi kurmancî diaxifin.

**Karincak** (Bayırlı) dikeve bakurê Licê. Ji Licê 10 km û ji Amedê jî 97 km dûr e. Li herêma Dimbiliyan e. Merk, Kozmarîn, Medrese (Bilgin), Mehmedêl û Tuwerk mezreyên wê ne. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Herêmeke çiyayî ye û zeviyên çandiniyê gelek kêm in. Gundî debara xwe bi xwedîkirina heywanan dikin. Li gund dibistan heye, lê ji ber valakirina gund,

hatiye girtin. Riya gund heye, lê zivistana naxebite. Nivîskar û rewşenbirê Kurd Ehmed Ramizê Licî ji Karincagê ye.

**Kerwes** (Yalaza) dikeve başûrê Licê. Ji Licê 35 km û 78 km dûr e. Nifûsa Kerwesê li derdora 250-300 heye. Li herêma Pêşêkevir e. Gundekî avî ye. Bi bexçe ye û sê aş li ber ava Kerwesê digerin. Bi navê Mehlê mezrayek wê heye. Mehlî bi zaravayê kurmancî û Kerwesî jî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Kerwes bi navê malbata Mehmed Keya tê naskirin. Goma Qoqan ku li ser Kerwesê bû ev çend sal in êdî xerabe bûye. Li Kerwesê çandiniya titunê tê kirin.

**Korxa** (Abalı) dikeve bakurê rojavayê Licê. Ji Licê 26 km û ji Amedê 96 km dûr e. Nifûsa gund kêm bûye, niha li derdorê 150î maye. Gundekî avî ye. Gundî bêtir çandiniya firingî û îsotan dikin. Bi zaravayê kirmanckî diaxivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Li ser riya Amed û Çewlikê ye û rê asfalt e.

**Licok** (Çavundur) dikeve başûrê Licê. Ji Licê 48 km û ji Amedê 80 dûr e. Nifûsa Licokê 50-60 maye. Niha hêdî hêdî gundî bi paş ve vedigerin gund. Li herêma Pêşêkevir di sînorê Licê û Hezro de ye. Ji rêzeçiyayê pişt Licok, Zengê û Helhelê re dibêjin Binê Zinar. Ji çiyayê ser Şimşimê re jî, dibêjin çiyayê Tûkê. Li Licokê çandiniya bamiye û titunê tê kirin. Licok bi titun û bîhokên xwe navûdeng e. Ava Licokê diçe ser zeviyên Kerwesê. Mirov dikare bêje ku Licok gundê dengbêjan e. Gundî bi kirmanckî dipeyivin. Zevî û bexçeyên mîrên Licê li Licokê hene.

**Mala Mihê Biro** (Ecemiş) dikeve bakurê rojavayê Licê. Ji Licê 40 km û ji Amedê 110 km dûr e. Di sînorê Çewlikê de ye. Çend mal li gund mane û hejmara mirovan nêzîkî 90î ye. Neh mezreyên wê hene: Xerabe, Elik, Bermal, Kanîspî, Birmak, Dereşel, Dersal, Reşeçiya û Tût. Li gund dibistan heye û demekê Mala Mihê Biro ji bo mamostan ciyê sirgûnê bû. Gund dûr e û berf pir dibare. Bi qasê çend mehan çûyîn û hatin tune. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Markê** (Ergin) dikeve bakurê rojavayê Licê. Li ser riya Licê û Darahênê ye. Ji Licê 23 km û ji Amedê 90 km dûr e.çend mal mane. Korxa mezreya Markê ye. Gundekî avî ye. Firingî û xiyarên Markê di bazara Amedê de bi navûdeng in. Bi zaravayên kirmanckî û kurmancî dipeyivin.

**Melê** (Yünlüce) dikeve rojhilatê Licê. Li ser riya Licê û Pasûrê ye û rê asfalt e. Ji Licê 8 km û ji Amedê jî 95 km dûr e. Qurmik (Konuklu) û Binê Aşan mezreyên wê ne. Niha Nifûsa Melê ji 1000î zêdetir e. Berî erdhejê Melê li berpalê rêzeçiyayê Xaloziwan bû. Qurmik jî li bakurê çiyê bû. Piştî erdhejê Melêya nû li jêr, li nêzîkî riya Licê û Pasûrê avakirin. Melê gundekî kevn e. Li derdora gundê kevn gelek xerabe hene. Di zemanê berê de gundê Ermeniyan bûye. Suryanî îdea dikin ku melî di wexta xwe de ne Ermenî, lê Suryanî bûne. Ew ji aliyê Liciyan ve wek Ermenî hatine zanîn. Lê ji berê ve li Melê Kurd jî hebûne û bi Fileyan re jiyane. Piştî qetlîama Ermeniyan mîr û eşrafên liciyan malên wan li ser xwe tapû kirine. Li bakurê rojhilatê Melê ya kevn li qûntara çiya çaviyeke mezin heye û jê re Encewzê dibêjin. Di zemanê berê de çar aş li ber geriyan.

Di navbera Melê û Şêxanê de çemê Şorikê heye li derdora vî çemî kanên xwê û cisê hene. Meliyan cis danî li Licê difrotin. Qurmikî bi kirmanckî û Melî û Binêaşan jî bi kurmancî dipeyivin. Ji salên 1960î ve li Melê dibistana seretayi heye, niha şagird diçin li navenda Licê dixwînin. Li gund elektrîk, mizgeft û telefon hene.Dibistan heye girtiye. Zarok diçin dibistanên li navenda Licê.

**Mêrdînan** (Zümrüt) dikeve rojhilatê Licê û nêzîkî çemê Sarimê ye. Ji Licê 20 û ji Amedê jî 107 km dûr e. Nifûsa Merdînan ji 500 zêdetir e. Qûçik (Derya) û Pirpag (Mutlu) mezreyên wê ne. Nifûsa Qûçikê nêzîkîk 300 û ya Pirpagê jî ji 500î zêdetir e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gor gotinên kal û pîran xelkê Bekiran û Mêrdîniyan bi hemû gomên xwe ve ji aliyê Murtezan hatine. Murtezan Mistan û Botiyan li herêma Dimbiliyan nêzîkî Darahênê sê gundên cîranên hev in. Ev hersê gund jî ji bavekî ne.

**Mişirf** (Bağlan) dikeve başûrê Licê. Ji Licê 45 km û ji Amedê 81 km dûr e. Dikeve herêma Pêşêkevir. Nifûsa Mişirfê daketiye derdora 150-160î. Gundekî avî ye û ava Mişirfê ji Helhelê tê. Mişirfî bêtir çandiniya titun,

Institut kurde de Paris

pembo û zebeşên avî dikin. Li binê Beytloqê bi jêr ve li ser çemê Arisê gola Xiraran heye. Gol tijî masî ne. Gundî wan masiyan wek masiyên pîroz dizanin û dest nadin wan. Ev der ciyekî turîstîk û seyrangeh e. Li Mişirfê mehla Jorîn û goma Beytloqê bi kurmancî, taxên din yên Mişirfê jî bi kirmanckî diaxifin.

**Mizag** (Kılıçlı) dikeve bakurê Licê. Ji Licê 32 km û ji Amedê 119 km dûr e. Mizag berê li ser Hendîfê bû, niha statûya gund girtiye. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.
**Nenyas** (Ortaç) dikeve başûrê Licê. Ji Licê 28 km û ji Amedê 80 km dûr e. Li herêma Pêşêkevir e. Avî ye, çandiniya titunê lê tê kirin. Li ser nehya Hezanê ye. Di zemanê berê de nenyasî zêde bi çerçîtiyê ve mijûl dibûn. Bi kurmancî dipeyivin.

**Pêçar** (Güldiken) dikeve bakurê rojhilatê Licê. Ji Licê 35 km û ji Amedê 122 km dûr e. Hesik, Gozerek, Meştax, Gavnor, Neban û Kabana, Şemozî, Bûbik û Hîlboç mezreyên Pêçarê ne. Li herêma Dimbiliyan e. Nifûsa gund daketiye derdora 150. Gundiyan koç kiriye û dibistan hatiye girtin. Di zemanê dewleta Osmanî de demekê nehya Licê bûye. Piştî şikestina şerê Şêx Seîd dewletê gund bi tevî şewitandiye û qetlâmeke mezin kiriye. Mîr li Pêçarê hene û piraniya zevi, mal û milkèn gund di destên mala mîran de ne. Mîrên Pêçarê û yên Licê ji aliyê bavê ve ne mirovên hev in, lê keç dane hev. Pêçarî hem bi kurmancî û hem jî bi kirmanckî dipeyivin.

**Pîrik** (Serince) dikeve başûrê Licê. Ji Licê 19 km û ji Amedê 70 km dûr e. Gundekî biçûk e. Niha kes li gund nemaye û dibistan hatiye girtin. Lêbelê gundî bihar, havîn û pahîzan tên ser zevî û rezên xwe û diçîn. Amadekariya vegera gund dikin. Rezên Pîrikê gelek in û li ber çem çend aşên avê hene. Bi kurmancî dipeyivin.

**Qilêder** (Kıralan) dikeve rojavayê Licê. Ji Licê 20 km û ji Amedê 97 km dûr e. Li Qora Berber gundekî biçûk e. Nifûsa gund nêzîkî 300î ye. Simaqî mezreya wê ye. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye û zivistanan naxebite.

**Şavêrdiyan** (Örtülü) dikeve bakur Licê. Ji Licê 29 km û ji Amedê 106 km dûr e. Gund hatiye valakirin. Vilo, Rasta Xeraban, Rasta Seyarê Şevê û Rasta Gozêrê mezreyên wê ne. Li herêma Dimbiliyan, gundê çiya ye. Li zozanên wê pez tên xwedîkirin. Li sînorê Darahênê, nêzîkî riya Licê û Darahênê ye. Gundî bi zaravayên kirmanckî dipeyivin.

**Şaxûr** (Saydamlı) dikeve bakurê Licê. Ji Licê 21 km û ji Amedê 108 km dûr e. Gund hatiye valakirin. Li herêma Dimbiliyan e û gundê çiya ye. Şêxmîran, Mêrgê, Seyrekê, Serdênî, Xiş û Kortê mezreyên Şaxûrê ne. Zozanê wê têrçêr e û gelek pez lê tên xwedî kirin. Heywanan xwedî dikin û payîzan sebze û hêşinahiyên wê zêde ne û bi taybetî xiyarên herêmê li Amedê bi navûdeng in. Bi zaravayên kirmanckî dipeyivin. Riya wê ne baş e û zivistanan nexebite.

**Sernis** (Damar) dikeve rojhilatê Licê. Li ser riya Licê û Pasûrê ye. Ji Licê 5 km û ji Amedê 92 km dûr e. Sernis gundê Ermeniyan bû. Piştî fermana Ermeniyan hinek ji wan misilmanî qebûl kirine û hinekan jî gund terk kirine û çûne. Di salên 1960î de, ew çend malên mayî jî koç kirin û çûn Amedê. Gund vala û xerabe bû. Di erdheja 1975an de, li bin Sernisê li ser riya Licê û Pasûrê ji bo sernisiyan çend xaniyên prefabrike hatin çêkirin, lê xanî vala man û çend şêxanî çûn li wir bi cih bûn. Sernis niha ji aliyê şêxaniyan ve hatiye şênkirin. Gund li ser riya asfalta Licê û Pasûrê ye.

**Şêxan** (Gürbeyli) dikeve rojhilatê Licê. Li ser riya Licê û Pasûrê ye. Ji Licê 6 km û ji Amedê 93 km dûr e. Demeke gund hatiye vala kirin, lê niha hinek malbat bi paş ve hatine gund. Niha nifûsa gund ji 300î zêdetir e. Pêşî li qûntara çiya bû, piştî erdheja 1975an gund daxistin rasta bin riya Licê û Pasûrê. Pez û dewar xwedî dikin. Piraniya mêrên gund bi demsalî li bajaran di karê înşatan de dixebitin. Bi kurmancî dipeyivin. Ji salên 65an ve li gund dibistana seretayi heye, lê niha dibistan girtiye û şagird diçin li Licê dixwînin. Elektrîk, telefon, av û kanalîzasyon li gund hene. Gund li ser riya asfalta Licê û Pasûrê ye.

**Sinê** (Oyuklu) dikeve başûrê rojhilatê Licê. Ji Licê 40 km û ji Amedê 127 km dûr e. Nifûsa Sinê nêzîkî 700î ye. Li herêma Licê gundê Sinê gundekî taybetî ye. Bi zimanekî din dipeyivin. Zimanê wan nêzîkî zimanê erebî ye



Meşlûlên kefê
Foto: Hacî Celîr

û ew elewî ne. Bi awayekî zanyarî heta niha li ser sinêyan lêkolîneke nehatiye kirin ka ew çi milet in. Ew dibêjin ku ji neslê Ebûbekir in û zarokên şêx Mehemed in. Danûstandinên wan bi gundên derdorê re tune. Hemû gundên derdorê bi çavekî ne baş li siniyan dinêrin. Ji ber ku di herêmê de tecrît in, di dema avakirina sîstema cerdevan (korucitiyê) de dewletê ev dijîtiya salan bi kar anî û siniyan bi çek kirin. Zîyareta şêx Mehemed li gund e. Turbeya wî heşt goşe ye û bi mîmariyeke balkêş hatiye avakirin. Li derdora zîyaretê gotistaneke heye ku dibêjin gorên mirovên şêx in. Her der şîn û bi dar û ber e. Tê bawer kirin ku ev zîyaret ji bo nexweşiyên sara û asabî baş û şîfa ye. Li gund elektrîk û telefon hene û riya gund qûmkirî ye.

**Sîsê** (Yolçatı) dikeve başûrê Licê. Ji Licê 11 km û ji Amedê 102 dûr e. Piştî 1990î Sîsê hatiye rûxandin û şewitandin. Lê dîsa jî di demsalên bihar, havîn û payîzan de gundî diçin ser zevî û rezên xwe û kon vedigrin. Piştî ser rezan bi paş ve vedigerin bajêr. Sîsê û Dêrxust herdu cîranên hev in, li qûntara çiyê ne û berê wan bi Licê ve ne. Mezreyên Hinyat, Eloxişo û Babikê li ser Sîsê ne. Ji salên 1950î ve dibistan li gund heye, lê niha xerab bûye. Sîsiyan bar kiriye Amedê. Gundî bi kurmancî dipeyivin.

**Tilê** (Dernek) dikeve rojavayê Licê. Ji Licê 6 km û ji Amedê 87 km dûr e. Nifûsa Tilê 450 heye. Biryas (Çalıbükü) û Kanîsî (Aciçeşme) mezreyên wê ne. Li herêma Qora Berber e. Ji bo ku gund nêzîkî girekî tûjik hatiye avakirin, jê re dibêjin Tilê. Tilê bi bayê xwe yê sar û dijwar bi navûdeng e. Li gund dibistana seretayi, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye. Biryas bi serê xwe gundek e, lê muxtariya wê li ser Tilê ye. Biryas bi xwe du tax e: taxa Jorîn û Jêrîn. Ji derî resmiyetê tu têkiliyên wê bi Tilê ve tune û ji Tilê jî gelek dûr e. Ji Licê 10 km û ji Amedê jî 80 km dûr e. Piştî koçkirina salên 1990î niha li Biryasê bi qasî 60-70 mal mane. Dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Biryas ciyekî dîrokî ye. Hîn (bz 1600) di serdema kral Kuroş de wek bajar hatiye avakirin. Lê hezar mixabin, bajêr xerabe bûye û kele hema hema tune. Xelk dibeje bajarê Iskenderê Zilqernî, lê ev ne rast e, hem bi dîrokî û hem jî bi mîmariya xwe ya serdema persan e. Ji bo ku Biryas li ser riya Amed û Çewlikê ye, riya wê asfalt e. Xelkê Tilê bi herdu mezreyên xwe ve, bi zaravayê kurmancî dipeyivin.

**Tûtê** (Yaprak) dikeve rojhilatê Licê, li ser riya Licê û Pasûrê ye. Ji Licê 11 km û ji Amedê 99 km dûr e. Demek gund hatibû vala kirin û çend mal li gund mabûn. Niha hinek bi paş ve hatine û hejmara malbatan 80 ye. Nifûsa gund li derdora 450 kesan e. Berî erdheja 1975an wek Fûm, Sernis, Şêxan û Melê, Tûtê jî li jor, li qûntara çiyê bû. Piştî erdhejê Tûtêya nû li başûrê riya Licê û Pasûrê ji aliyê dewleta Lîbyayê ve hat avakirin. Lîbyayê li gundê Tûtê bi kevirên birî û çîmento 124 xanî, 4 dikan, nexweşxanek, dibistan û mizgefteke bi minare da çêkirin. Tûtî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund, av, kanalîsazyon, nexweşxane, Yekitiya Ziretê, elekrtîk û telefon hene. Gund li ser riya asfalta Licê û Pasûrê ye.

**Xana Kelê** (Çeper) dikeve rojavayê Licê. Ji licê 19 km û ji Amedê 90 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 400î ye. Ceber, Pûneyn û Hasbegan mezrayen wê ne. Pûneyn bi kirmanckî û Xana Kelê, Ceber û Hasbegan bi kurmancî dipeyivin. Li meydana derbenda Kelê ye. Ji vî gundî re Kelê û Çeper jî dibêjin. Derbenda Kelê ji zemanê berê ve rê û warê karwan û bazirganên herêmê bûye. Bi taybetî karwanên Amed, Cebexçûr û Erzorumê di wir re derbas bûne. Ji wê demê ve xan û karwanseray li wir hatine çêkirin ku îro bi tenê hinek dîwarên wan li ser piyan mane. Herweha îro jî riya Amed û herêma

Serhedê bi tenê di wir re derbas dibe û rê asfalt e. Ji derî vê derbendê çiyayên bilind, dijwar û rênadin karwan û rêwiyan. Xana Kelê hîn îro jî gundekî stratejîk, dîrokî û mezin e. Li gund nexweşxane, dibistan, elektrîk û telefon hene. Ziyaretekê Xana Kelê bi navûdeng e. Gundiyên Xana Kelê bi kurmancî dipeyivin.

**Xerabe** (Şenlik) Dikeve bakurê rojavayê Licê. Ji Licê 20 km û ji Amedê 97 km dûr e. Li herêma Sîwanê ye. Kes li gund nemaye. 5 gomên li ser hene. Telefon û elektrtîk li gund hene. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Rê qûmkiriye.

**Xosor** (Yalımlı) dikeve bakurê Licê. Ji Licê 31 km û ji Amedê 118 km dûr e.Li herêma Dimbiliyan û gundê çiya ye. Heşt mezreyên wê hene: Lêxosor, Keşkware, Dewaxê, Horsel, Mezra Eliyo, Baxşo, Xaso û Mezra. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Hingivê Mezra Eliyo bi navûdeng e. Pez xwedî dikin. Li serê çiyayê Koz zîyaretek heye û jê re bi kirmanckî dibêjin Ziyareta Koz. Ciyayê Koz 2.283 metre bilind e. Xelkê herêmê rojên înê diçin û ziyaretê tewaf dikin.

**Xweylîn** (Tuzla) dikeve rojavayê Licê. Ji Licê 23 km û ji Amedê 110 km dûr e. Li herêma Qora Berber e. Bi navê Soxa mezreke wê heye. Gund hatiye valakirin û di van çend salên dawî de çend malbat bi paş ve vegerîne gund. Her ku diçe dîsa gund şên dibe. Gund navê xwe ji kanên xwê digire. Li nêzîkî gund kanên xwê hene. Di dema Osmanî de dewletê ji wir xwê derxistiye. Hîn îro jî mişar û kanalên xwê yên kevn û xerabe hene. Piştre ji ber sedema ku ev kanên xwê mesrefa xwe dernaxin, girtine. Dîsa kanên cisê jî li herêma Xweylînê hene. Berê xelkê ji wir kevirên cisê danîn, di kûreyan de dişewitand û cis çêdikir. Gundiyê Xweylînê cis danî li Licê difrotin. Xweylîn gundekî avî ye. Firingî, xiyar û sebzeyên Xweylînê li bazara Amedê bi navûdeng in. Gûzên Xweylînê yên qaşiltenik û kakil spî ne. Ava Licê bi boriyan ji Xweylînê tê. Çend aşên xweylîne hene. Li gund dibistana seretayi heye. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Zengê** (Dolunay) dikeve başûrê Licê. Ji Licê 50 km û ji Amedê 80 km dûr e. Nifûsa Zengê ji 300î zêdetir e. Li herêma Pêşêkevir e. Di sînorê bajarok Hezro de ye. Gundekî avî û xweş e. Çandiniya titun û bamiyan lê tê kirin. Di zemanê berê de tevne, şalê hirî, metaf û necarî li gund zêde bûne û sabûn çêkirine. Zengî bi bazirganî û nêçîrvaniyê tên nasîn. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Zengesor** (Akçabudak) dikeve bakurê Licê. Ji Licê 35 km û ji Amedê 112 km dûr e. Li herêma Dimbiliyan ye. Gund bi mezreyan ve hatine vala kirin, lê niha gundî û gomî hêdî hêdî bi paş ve vedigerin gund û gomên xwe. Pez xwedî dikin. Heft mezrên wê hene: Botiyan, Mehmedo, Selmono, Qasan, Varmono, Helezîn, Hij û Dergî. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin.

**Zera** (Gökçe) dikeve başûrê rojavayê Licê. Ji Licê 28 km û ji Amedê 60 km dûr e. Nifûsa Zerê bi 160-180 maye. Gundekî bejî ye. Gundî pez û dewar xwedî dikin. Rezên gund zêde ne û tiriya wan a şîre bi navûdeng e. Di van salên dawî de bi tahmandina darên benavan, fistixên Entebê ji gundiyan re bûye hatineke baş. Li derdora Zerê gelek nawis hene. Li devera gund nêzîkî ser riya Licê û Amedê newaleke lat heye û axa wê şîn û şil e. Ji zemanê berê ve jinên herêmê bi vê heriya şîn porê xwe dişon. Tê gotin ku ev heriya şîn porê jinan nerm û xweşik dike. Heriya Zerê berê li herêmê wek sabûna Helebê bi navûdeng bû û niha jî wek şampowanê bi navûdeng e. Zera li ser nehya Hezanê ye. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund, dibistan, mizgeft, elektrtîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

Institut kurde de Paris



Dimenek ji Pasûrê
Foto: Mehmet Mirza Çelik

# Pasûr

Pasûr dikeve bakurê rojhilatê Amedê û 127 km ji Amedê dûr e. Riya wê di ser Licê re derbas dibe. Herêm bi tevî çiya ye. Zevî kêm in. Rûerd çiya, girik, naverast û dol in. Mezinahiya axa Pasûrê 1.601 $km^2$ ye. Niha çar taxên Pasûrê hene: Darabiyîn, Şafirnût, Dêlît û Masirto. Nifûsa navendê 9.858, ya gundan 26.557 û bi giştî nifûsa Pasurê 36.415 ye. Xelkê navenda Pasûrê bi zaravayê kurmancî dipeyivin.

Du şaredarî (li navend û Cixsê), 50 gund û 120 mezre li ser Pasûrê ne. Pêşî Pasûr li ser wîlayeta Mûşê bû. Heta sala 1297an nehiya sencexa Licê bû. Di heman salê de statûya bajarokê girtin û dan ser Amedê. Navê wê yê kevn Pasûr e. "Pa" tê wateya serî û "sûr" jî dîwar e. "Pa" û "sûr" dibin yek gotin û tê wateya diwarê sereke ango kela sereke. Navê mîrê kela Kafron Qulpo bûye. Herweha tê gotin ku navçê navê xwe ji navê mîrê kela Kafron Kulpo girtiye. Lê dikare Pasûr gotineke Ermenî be jî. Berê li herêma Pasûrê gelek Ermenî hebûn. Kurd û Ermenî bi hezar salan wek birayan di nav aştî û aramiyê de jiyan.e Lê, ji fermana Ermniyan a sala 1915 şûn ve Ermeniyên ku kuştin û yên ku bar kirin

û terkewelat bûn. Niha li herêma Pasûrê Ermenî nemane. Komkujiya geliyê Taloriyê tu carî naye ji bîr kirin. Bi hezaran Ermenî li geliyê Taloriyê kuştine.

Axa Pasûrê ji pênc herêmên mezin pêk tê. Ji herêma navbera Pasûr, Mûş û Sasonê re *Xiya*, navbera Pasûr, Hezro û Farqînê re *Hevêda*, navbera Pasûr û Mûşê re *Nedera*, navbera Pasûr û Farqîn *Badika* û ji herêma rojhilatê Pasûrê re jî *Qulpî* dibêjin.

Pasûr herêmeke çiyayî ye. Ji bo çandinê zevî kem in û kar tune. Loma xelkê herêmê an dixwînê an jî li derê bajarokê kar dike. Ji ber van sedeman jî her ku diçe nifûsa bajarokê kêm dibe. Xelkê herêmê heywan xwedî dike û di van salên dawî de girani dane ser xwedîkirina mêşên hengivîn.

Çiya rê nadin û ciyekî stratejîk e. Pasûr herêma Amed, Mûş û bi tevahî ya Serhedê bi hev girê dide. Di vî warî de Kendalê Şîn û geliyê Taloriyê bi navûdeng in. Çiyayên herî bilind di navbera Pasûr û Mûşê de çiyayê Andokê ye ku 2830 metre bilind e. Bi navê Şêx Mehemedê Andokê ziyaretek jî heye. Her



sal di 15ê tîrmehê de xelk diçe ser zîyaretê. Ji derî Andokê çiyayên Hopika (Alaca), Gaza Çivê, Sêber (Hasandin), Serê Spî, Koçka (Çevran), Kapan (Hazır Baba), Kasor, Berbihîv, Gohermê û Melûl/Axdat (Dorşin/Eskar) in. Ji çiyayê Lîs jî beşek dikeve nav tixûbê Pasûrê. Çiyayê Lîs di navbera Licê, Pasûr û Darahênê de ye. Li Hopika jî ziyareta Şêz Huseynê Berbihîv heye. Xelk di yekê tîrmehê de diçe ser vê ziyaretê. Li Eskar jî ziyareta Şêx Salih bi navûdeng e. Di zemanê berê de herêm bi dar û daristan bûye, niha her ku diçê rût û zilût dibe. Herî zêde darên mazî, berû û hevris in. Ciyên teht û zinar, bazalt, granît û granolît gelek in.

Li herêma Pasûrê şopên herî kevn yên Hûrî-Mîtanyan in. Demeke kurt Hatî (Hîtît) jî li herêmê bûne desthilatdar. Medî, Asûrî, Pers û piştî zayinî 226an de Romayî hatine herêmê dagîrkirine. Di sala 637an serdarê îslamê piştî Amedê digrin heta herêm Pasûrê diçin û dagîr dikin. Demeke Pasûrê didin ser Cizîrê û piştre didin ser Amedê. Di serdema Merwanîyan de bi qasî 100 salî dikeve bin destê Merwaniyên Kurd. Di sala 1515an de Pasûr bi herêmên din re dikevin bin desthilatdarita Osmaniyan.

Li gor Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî li herêma Pasûrê ev eşîret hebûne: *Silêmanî, Banukî, Hevêdî, Xaldî, Dilhîran, Bociyan, Zilan, Besyan, Zikziyan û Berazan*[49]. Di serdema Sawafiyan de bi yekîtiya van eşîran mîr birêve biriye. Muhemed Xan bi Mîr Diyadîn re dostaniya xwe xurt kiriye û di dawî de keça xwe daye Mîr Diyadîn. Îro li Pasûrê xwedîkirin û berhemdariya qozeyên hevrîşim gelek bi pêşketiye. Di vî warî de Pasûr yekem û bajarê Bursayê duyem e. Di salê de li tevahiya Kurdistan û Tirkiyê 60 ton qozeyê şil bi dest dixin. Ji vî 45 ton li Pasûrê ye.[50] Li Pasûre ji sala 2008an vir ve festîvala Qoze tê li dar xistin.

Ji derî navendê li Cixsê (Ağaçlı) şaredarî heye. Berê Cixsê, Şêxhemza û Mehmedkan nehiye bûn, lê niha sîstema neheyan nema ye. 50 gund û 135 mezreyên Pasûrê hene. Dewlet 46 mezreyan wek fermî napejrîne.

Li herêma Pasûrê Şikeftên Kanikan, Şikeftên Hevîka, Şikeftên Temiran, Şikeftên Barinê, Kela Ulya, Kela Cixsê, Kela Kefrûnê (Kela Mîran), Kevirê Mezin, Geliyê Godernê, Geliyê Aşan, Pireya Kevir cihên dîrokî û turîstîk in. Di sala 1917an de artêşa Ûris heta Kendalê Şîn hatiye. Artêşa Ûris papûr û û pireke bi navûdeng çêkiriye. Jê re dibêjin Pireya Kevir. Pire xerabe bûye

[49] Şerefxanê Bedlîsî, Şerefname (wergera Ziya Avci), rûpei 288, Weşanxaneya APECê , Stockholm-1991
[50] Mustafa Gökmen, Yeni Asya Gazetes 05.06.2008, Osmanlı'dan günümüze tarihi miras "İpek bocekçiliği-1

◄ /ıvistan li Pasûrê
Foto: Mehmet Mirza Çelik

lê hin dîwarên wê hene. Di navbera Pasûr û Mûşê de bi navê dehla Kuling daristaneke gurr û mezin hebûye. Her dareke wê ya mazî 300-400 salî bûne. Lê hezar mixabin niha ew daristan nemaye. Herweha li bakurê Pasûrê di navbera Pasûr, Darahê û Licê de çiyayê Spî heye. Zozanê Speylûg yê herî bi navûdeng e. Şên û Pirik jî li herêma Pasûrê zozanên bi navûdeng in. Nîvê zozanê Qozmê dikeve aliyê Pasûrê û nîvê din jî dikeve aliyê bajarê Mûşê.

Çar çemên mezin li herêma Pasûrê hene. Di tixûbê Pasûr û Licê de çemê Sinda (Sarimê) heye û ev çem ji herdu bajarokan re bûye tixûbekî xwezayî. Di nêzîkî Pasûrê de çemê Hesenka (Pasûrê) derbas dibe. Milekî wî i çiyayê Gohermê tê û milê din jî ji aliyê Mûşê tê û li Kendalê Hêşîn herdu dibin yek. Li rojavayê çemê Pasûrê jî çemê Gisê (Şekiran) heye. Ev çem ji çiyayê Melûl dize. Çemê Pasûrê û çemê Gîsê (Şekiran) li başûrê navenda Pasûrê li herêma Navroyê herdu dibin yek. Li wir jî diçin ser çemê Sorevangê/ Qeyserê . Ji wir bi şûn ve êdî navê wî dibe çemê Êlihê (Batmanê.)

Li herêma gundê Cûmarê bendaveke hatiye çêkirin. Bi tirkî jê re dibêjin beraja Batmanê. Herweha li Şêxbûba jî bendaveke biçûk hatiye çêkirin. Li ber vê bendava biçûk av û avdanî tê kirin. Bendava Hezkan di navbera Pasûr û Farqînê de tê Çêkirin. Ji ber ku li Geliyê Hezkan tê çêkirirn navê wê bendava Hezkan e.

## Şaredarî

Li gor rêza tarîxê lîsteya şaredarên Pasûrê weha ye[51].

Mustafa Körukükçü
Mehmet Tanrıverdi
Suleyman Acar (subay)
Hasan Çelik, ( li Pasûrê 18 sal bê hilbijartin li ser hev bûye şaredar.
Servet Nergiz (1969)
Sıdkı Çelik, (1984)du dewre û nîv
Mehmet Yaşar (1977) 6 meh kiriye
İhsan Ülgen (1989)
Fahri Aydın (1994)
Mahmut Zengin (1999)du dewre
2009-2011 Nesip Şimşek

[51] Heta niha ne li cem şaredariya Pasûrê, ne li cem tu dezgeh û kesi lîsteyeke rast û bi ser û ber a şaredarên Pasûrê tune ye. Ji me re gotin k udi vê mijarê de agahiyên heri baş û rast li cem Selin Yalçınê Pasurî hene û hebe, nebe ew dizane. Em çûn cem Selim Yalçın û me vê lîsteya han ji devê wî girt û nivîsî.

Kela Kaferûn ⟶
Foto: Mehmet Mirza Çelik

# Nivîskar, hunermend û naskiriyên Pasûrê

**Adil Tekin**

Adîl Tekîn, di sala 1910an de li Pasûrê hatiye dinê. Li Pasûrê dibistana seretayî xwendiye. Dest bi wênekêşiyê kiriye. Bi navê Foto Dîcle studiyeke fotoyan li Amedê vekiriye. Dema behsa fotoyên Amedê yên kevn bê kirin, navê Adîl Tekîn tê bîra mirov. Ew di navbera salên 1953-1954an de bûye serokê şaredariyê. Di sala 1970î de bûye Serokê Komeleya Turîzm û Nasandina Diyarbekirê. Gelek caran pêşengahên fotoyan vekiriye. Di sala 1964 û 1971ê de du albûm daye çapê.

**Özer Ozankaya**

Özer Ozankaya, di sala 1937an de li Pasûrê ji dayik bûye. Di sala 1959an de fakulta siyasî ya zanistî qedandiye. Çend pirtûkên wî hene. Ji wan du ev in. Di sala 1971ê de "Li gund rewşa civakî û çanda polîtîk (*Köyde Toplumsal Yapı ve Siyasal Kültür*) û di sala 1970 î de teza xwe ya "*Sosyolojî*" daye.

**Salih Ince**

Salih Ince, 1951ê li Pasûrê hatiye dinê. Dibista seretayî li Hezroyê xelas kirîye. Dibistana navîn li Farqîn û Pîranê xwendîye. 1969 de li Amedê di-



Institut kurde de Paris

bistana mamosteyî xelas kirîye. Li Dîyarbekirê mamosteyî kirîye. 1974an de hatîye Swêdê. Di sala 1989 de bi çend hevalên xwe ve rojnameya Roja Nu derxistîye. Salih Ince avakir û serokê yekemê Ferderasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê ye. Yek ji avakirê Weqfa Kurdî ya Kulturîya li Stockholmê ye. Pirtûkeke wî ya zarokan a Swêdî bi navê Pelle Svanslös bi sernavê *Cergoyê Qol* adapteyî kurdî kir. Bi navê S. Zirav û S. Ferman gelek gotar nivîsîne.

**Cemal Yıldırım**

Camal Yıldırım, di sala 1925an de li Pasûrê ji dayik bûye. Dibistana bilind a mamostetiyê qedandiye. Piştre li Amerîka û li Îngilîstanê perwerdeya pispo-riyê dîtiye. Vegeriye Tirkiye li zanîngehê mamostetî kiriye. Li ser felsefê bi îngîlîzî û tirkî pirtûkên wî hene.

**Mele Yasîn Wusifî**

Mele Yasîn Wusifî li Pasûrê ji dayik bûye û tarîxa bûyîna wî ne diyar e. Pêşî li bajaroka xwe û piştre li Farqînê xwendina xwe domandiye. Li gelek gundên Amedê meletî kiriye, ders daye. Li ser îlmê Ravddul-hayat, Akaîd, Di Fiqiha Şafhiî Menhec berhemên wî hene. Mele Yasîn Wusifî di sala 1992an de wefat kiriye.[52]

**Burhan İşiyok**

Burhan İşiyok di sala 1969an li Geliyê Gomagê ku mezreya Gomagê ye hatiye dinê. Dibistan seretayi û navîn li navenda Pasûrê û ya amadeyîyê jî li Amedê xwendiye. Çûye zanîngehê, lê temam nekiriye. Bi edebiyat û muzîkê ve mijûl bûye. Pirtûkeke wî ya çîrokan û du pirtûkên wî yên helbestan derketine.

**Felat Dilgeş**

Felat Dilgeş di sala 1965an de li gundê Duderiya hatiye dinê. Xwendina xwe ya seretayî û lîsê li Farqînê temam kiriye. Li zanîngeha Stanbulê felsefe û sîyasetzanînê xwendiye. Di gelek rojname û kovaran de nivîsîye. Heta niha *Gula Dêrsimê, Rojnamegeriya Kurdî ya Pêşîn* (lêkolîn) û *Dilşad* (çîrok) sê pirtûkên wî hatine çap kirin.

[52] Z. Abidin Çiçek, Diyarbakır Fethi, tarihi ve kulturu, s. 132

Institut kurde de Paris



Qonaxa Têlî Axa
Foto: Mehmet Mirza Çelik

Institut kurde de P

**Sabahattin Gültekin**
Sabahattin Gültekin di sala 1961an de li gundê Kuyê hatiye dinê. Dibistana sertayî li gundê xwe, navîn li Pasûrê, îmamxetîb li Edîrnê û ya bilind jî li Sêrtê xwendiye. Mamostetî kiriye û niha malnişîn e. Li rêvebiriya Kurdî-Dera Amedê kar dike. Dersên kirmanckî dide. Di rojname û kovaran de bi zaravayê kirmanckî meqaleyên wî hene. Bi navê *Ro ser zarawaya kirmanckî xebata gramerî* pirtûkeke wî heye.

**Zübeyde Fidan Kırmızı**
Zübeyde Fidan Kırmızı di sala 1973an de li Xurûcê hatiye dinê. Ji dibistana destpêkê heta amadeyî li Amedê xwendiye. Sportmen û resam e. Piştre li Zanîngeha Dîclê beşa edebiyata tirkî qedandiye û dest bi mamostetiyê kiriye. Bi navê Amid-i Nur bîyografiya Abdüssettar Hatayi Avşar nivîsiye.

**Azad Ziya Eren**
Azad Ziya Eren di sala 1976an de li Pasûrê hatiye dinê. Di dema 12ê îlonê dê û bavê wî mamoste bûne û sirgûnê Çorumê kirine. Dibistana seretayî li Çorumê, ya navîn li Dîlokê, amadeyî û zanîngeha Diclê beşa bîyoloyîyê jî li Amedê xwendiye. Dest bi mamostetiyê kiriye. Di gelek rojname û kovaran de nivîs û helbestên wî hatine weşandin. Helbestên wî wergerandine kurmancî, ermenî, suryanî, erebî , îngilîzî û almanî.

**Mîrze Mihemed Çelik**
Di sala 1974an de li Pasûrê ji dayik bûye. Amadehi qedandiye. Demek ji Pasûrê derketiye der lê dîsa vegeriya Pasûrê. Mîrze Mehmed Çelik wênekêş (fotografçi) e. Bi navê *Bi wêneyan Pasûr/Kulp* pirtûkeke wî heye. Pirtûk bi kurdî-tirkî ye.

**Barış Seyitvan**
Di sala 1982an de li gundê Cixsê ji dayik bûye. Dibistana seretayî li gund, ya navîn, lîse li Amedê û piştre li zanîngeha Dîcleyê Beşa Mamostetiya Resimê qedandiye. Li Tirkiye, Herêma Kurdistanê ya Iraqê, Ewrupa û Afrîkayê wekî hunermend beşdarî gelek pêşangeh û komxebatên navneteweyî bûye.

# Dengbêj hunermend

**Cotkar**

Cotkar di sala 1959an de li gundê Habîka hatiye dinê. Di biçûktiya xwe de bi malbatî koçî Farqînê kirine. Dibistana seretayî û navîn li Farqînê xwendiye. Hîn di dibistanê de bûye ji ber dengxweşiyê dest bi stranan kiriye. Bi Şiyar re di sala 1975an de Koma Şiyar avakirine. Stranên gelêrî û şoreşgerî sitrane. Cotkar jî wek hevalên xwe yên din gelek caran hatiye girtin û êşkence ditîye. Di sala 1992an de neçar maye derketiye derî welat. Li Almanyayê bi cih bûye. Kaset, Cd û klîpên wî hene.

**Reşatê Mehmikî**

Reşatê Mehmikî (Reşat Deniz) di sala 1964an de li gundê Geliyê Memika hatiye dinê. Dibistan nexwendiye. Stranên Reso, Huseynê Mûşî û Şakiro dibêje. Di sala 1989an de mala xwe biriye Êlihê. Li Êlihê li ser dezgeh firoşkariyê kiriye. Di sala 1997an de mala xwe ji Êlihê biriye Mûşê.

**Adilê Rîza**

Adilê Rîza (Adil Yapsur), di sala 1964an de li gundê Dêlîtê hatiye dinê. Di 20 saliya xwe de di civatan de stran dibêje. Li gund ji radyoya Erîvan, bavê xwe û dengbêjan hîn bûye. Pênc sal dibistan xwendiye. Heta 12 saliya xwe li gund jiyaye. Malbata wî cotkar e. Ji sala 1976an ve li navenda Amedê dijî. Di lêkirina avahiyan de dixebite.

**Tehsînê Pasûrî**

Tehsînê Pasûrî (Tahsîn Türk) di sala 1946an de li gundê Malêhafê hatiye dinê. Neçûye dibistanê, lê ji derve xwendiye û dîplomeya dibistana seretayî stendiye. Li gund heywan xwedî kiriye, cotkartî û rezvanî kiriye. Li mala kalê wî her tim civatên şevbihêrkan lidarxistine. Bi navê Evdilhelîm û Evdilwehab du dengbêjên kalê wî hebûne. Ew jî di wan şevbihêrkan de hînî stranan bûye. Ji sala 1989an vir ve li Amedê dijî.

Institut kurde de Paris

**Silêmanê Pasûrî**

Silêmanê Pasûrî (Süleyman Koç) di sala 1964an de li herêma Badika li gundê Kerrayê hatiye dinê. Dibistana seretayî xwendiye. Ji 17 saliya xwe ve stranan dibêje. Stranên Şakiro û Zahiro distrê. Li gundan geriyaye, çûye dawet, şahî, şînanan. Bi vî rengî debara xwe dike. Di sala 1991ê de mala xwe bar kiriye navenda Farqînê.

**Elîcanê Pasûrî**

Elîcanê Pasûrî (Alican İpek) di sala 1960î de, li gundê Malên Hafê hatiye dinê. Dibistan nexwendiye. Li gund şivanî û cotkarî kiriye. Ji sala 1984an vir ve li navenda Amedê dijî. Li Amedê dergevaniya avahiyan dike. Ji zaroktiya xwe ve distrê. Ji dengbêj Şakiro, Zahiro û apê xwe Evdilwehabê Huseyn hînî stranbêjiyê bûye.

**Sadiqê Pasûrî**

Sadiqê Pasûrî (Sadık Canan) di sala 1941ê de li gundê Cimikan hatiye dinê. Dibistan nexwendiye. Ji Mûşê, ji Gevozan hatine Pasûrê. Heta sala 1969an li gund maye. Li gund şivaniyê kiriye. Stranên ku dibêje ji xalê xwe dengbêj Emînê Eyşê hîn bûye. Di sala 1969an de mala xwe bar kiriye Edenê.

## Gundên Pasûrê

**Aqîka** (Yakıtköy) dikeve başûrê Pasûrê. Ji Pasûrê 25 û ji Amedê jî 157 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 200î ye. Nasirka, Taxa Caniyê, Mala Jorîn, Mala Behnê, Goma û Mala Jorîn mezreyên wê ne. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Araşkan** (Üçkuyu) dikeve başûrê Pasûrê. Di heman demê de mileke ji eşîreta Badkan e. Ji Pasûrê 35 û ji Amedê jî 163 km dûr e. Li gund 40-50 kes mane. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin Li gund dibistan tune. Riya gund asfalt e, li gund telefon û elektrîk hene.

**Arqetîn** (Dolun) dikeve bakurê Pasûrê. Ji Pasûrê 16 û ji Amedê jî 138 km dûr e. Hatiye vala kirin, niha çend mal bi paş ve vegerîne. Li vir kanên mermerê hene. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye.

**Axçesêr** (Akçasır) dikeve rojhilatê Pasûrê. Ji Pasûrê 51 û ji Amedê jî 179 km dûr e. Nifûsa gund Nêzîkî 700î ye. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin, lê Hêlîn ku navenda nehyê ye bi kurmancî dipeyivin. Zerver û Virvat mezreyên wê ne. Li gund dibistan tune. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Bahemdan** (Ayhanköy) dikeve başûrê rojhilatê Pasûrê. Ji Pasûrê 38 û ji Amedê jî 166 km dûr e. Herêmên wek Delaw, Zergûz, Çem, Takore gelek balkêş in. Devê Golê, Şikeftiya, Balkêşîn, û Serê Gir jî mezreyên gund in. Bav û kalê Aram Tîgran ji vî gundî bûne. Di qirkirina Ermeniyan de ew ji wir çûne Binxetê. Li herêma Çem li ser û nav zinarên asê û bilind Pîyê Kêla çiyekî dîrokî ye. Gund hatiye vala kirin, lê niha çend mal bi paş ve vegerîne. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye. Telefon û elektrîk li gund hene.

**Barinê** (Barin) dikeve başûrê Pasûrê. Ji Pasûrê 38 û ji Amedê jî 155 km dûr e. Ji dema kevirî ve mirov li vê herêmê jiyane. Mînaka herî berbiçav nawisên ku ji kevir hatine kolandin hene.Tê gotin ku bi navê Bayram Beg keseki ji aliyê Cizîrê ji ber zilmdarekî barkiriye û hatiye li vir gund ava kiriye. Piştî Bayram Beg 150-200 piştre vê care bi dorê Dawid Beg, Osman Beg û Ahmed Beg hatine gund û bi cih bûne. Nifûsa gund ji 800î bêtir e. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Gundî hatine koçber kirin. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Bênîn** (Karaağaç) dikeve başûrê rojavayê Pasûrê. Ji Pasûrê 23 û ji Amedê jî 127 km dûr e. Bi kurdî tê wateya banî. Nifûsa gund daketiye derdora 200î. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, lê girtiye. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Beyrok** (Ağaçkorur) dikeve bakurê rojhilatê Pasûrê. Di zemanê berê de jê re Bîrik jî gotine. Ji Pasûrê 20 û ji Amedê jî 148 km dûr e. Niha li gund 70-80 mal mane. Kêxirvank (Yüklüce), Koçikan (Kepezkaya) û Panak (Buğulu) mezreyên wê ne. Li gund dibistan tune. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Cixsê** (Ağaçlı) dikeve rojavayê Pasûrê. Li qûntara çiyê ye. Ji Pasûrê 27 km û ji Amedê jî 130 km dûr e. Gund navê xwe ji çalên cisê (kirêcê) girtiye. Berê gundê Ermeniyan bûye. Di sed sala 19an de ji Mûsilê Şêx Şeref û zarokên xwe hatine gund girtine destê xwe. Kela Cixsê dîrokî ye. Li nav gund kevirên Bûk û Zavê hene. Herdu kevir li hember hev in. Tê gotin ku di dema berê de, bûk dirketiye ser kevirê Bûkê û zava jî derketiye ser kevirê Zavê; herdu li hember hev radiwestane û weha mara wan birîne. Wek dezgeheke zewacê bûye. Bûdika mezreya wê ye. Nifûsa gund 3.259 e. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Xwendayên gund gelek in. Ji gund heta niha gelek karmendên payebilind derketine. Ji sala 1996an ve li Cixsê şaredarî heye. Cixsê ya niha ji du taxan pêk tê: Taxa Kelê û Cixsêya Kevn. Li şaredariya Cixsê kursa hevrîşim heye û niha berhemên wê heta Ewropayê tên firotin. Li Cixsê dibistan. Nexweşxane, sîstemên av, elektrîk û telefonê hene. Riya wê asfalt e.

**Cimar** (Uzunova) dikeve başûrê rojhilatê Pasûrê. Ji Pasûrê 24 û ji Amedê jî 146 km dûr e. Nifûsa gund li derdora 1000î ye. Deştik (Bilgili), Fîkî (Salkımlı), Mala Elî (Oymaklı) û Girêmorî (Sivrice) mezreyên wê ne. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin Li gund dibistan, mêvanxane û çayxane hene. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene. Gund di navbera Pasûr û Farqînê de ye. Gund di nav navdeşteke du giran de ye. Di dema Turgut Özal 1986an de bendaveke biçûk li ber çem hatiye çêkirin û zevî bi ava wê tên avdan.

**Çirik** (Çukurca) dikeve başûrê Pasûrê. Ji Pasûrê 19 û ji Amedê jî 138 km dûr e. Nifûsa gund 220 e. Tiltef (Zümrütlü) û Korikan (Mutlu) mezreyên wê ne. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, lê hatiyegirtin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Deyasêya Jêrîn** (Aşağıelmalı) dikeve bakurê rojavayê Pasûrê. Deyasiya Sulfan jî dibêjin. Ji Pasûrê 28 û ji Amedê jî 130 km dûr e. Nifûsa gund 0 e. Simsor (Gümüşsu), Deyasa Jorîn (Yukarıelmalı) û Guner (Güner) mezreyên wê ne. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Gundî hatine koçber kirin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Duderya** (Konuklu) dikeve başûrê rojhilatê Pasûrê. Ji Pasûrê 19 û ji Amedê jî 147 km dûr e. Nifûsa gund 400 e. Gundekî dîrokî ye. Di dema xwe de herême-

Institut kurde de Paris

ke fireh di bin desthilatdariya desthilatdarên kelê de bûye. Tê gotin ku tapûyê Kelê hebûye. Di tapû de tixûbê (sînorê) axa kelê ji rojhilat ve Bedlîs, bakur Darahênê û Başûr ve Gaza Êlûnê bûye. Li gund, şikeft û dêrên xerabe hene. Kefrûm (Kalhe), Şikeftiyan (Çiçekli), Qulpik, Mala Xoce, Goma Îsmaîl, Dikê, karam, Babûcenk (Savaş) û Saqikan (Arık) mezreyên wê ne. Li gund ziyareta Şêx Muhemedê Gazê û Çemcûnî hene. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, lê girtiye. Riya gund qûmkirî ye, lê gund nêzîkî riya asfalt e. Li gund mizgeft, telefon û elektrîk li hene.

**Dumilyan** (Baloğlu) dikve başûrê rojhilatê Pasûrê. Ji Pasûrê 14 û ji Amedê jî 142 km dûr e. Nifûsa gund 400 heye. Goman (Çömlekçi), Saltan (Çiftlik), Balûrkan, Mala Mele, Çayana Mele, Mishewdê, Xaniya Reş, Xeydê, Nehik (Danacık) û Hayta (Çiftlidoruk) û Hesena mezreyên wê ne. Tê gotin ku heta şerê Çeldêranê Ecem li vir desthilatdar bûne, piştre Kurdan gund ji Eceman girtiye. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Eskar** (Yaylak) dikeve bakurê Pasûrê. Ji Pasûrê 22 û ji Amedê jî 150 km dûr e. Şopên serdema Medan li herêmê hene. Çiyayê Dorşînê li herêma gund e. Çemê Eskarê di ber gund re derbas dibe. Berê gundê Ermeniyan bûye. Li herêma gund cihên dêrên xeraba hene. Nifûsa gund daketiye derdora 40-50î. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan tune. Riya gund qûmkirî ye, telefonû elektrîk li gund hene.

**Gavgas** (Akdoruk) dikeve bakurê rojavayê Pasûrê. Ji Pasûrê 15 û ji Amedê jî 143 km dûr e. Tarîxa avakirina gund bi texmînî digehê 1300 î. Berê gundê Ermeniyan bûye. Navê gund û mezreyên wê bi Ermenî ne. Piştî Ermeniyan di vê zemanê dawî de dibejîn sê bira ji Farqînê ji gundê Mîqûrê hatine. Yek li Gavgasê maye, yek çûye gundê Koyu avakiriye û yê din jî çûye Tîyaxsê şên kiriye. Niha Gasto, Ferxala, Xoşê, Oxnik û Arkîn mezreyên wê ne. Hengivê gund bi navûdeng e. Nifûsa gund 0 e. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Gund hatiye vala kirin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Godernê** (Taşköprü) dikeve başûrê Pasûrê. Ji Pasûrê 27 û ji Amedê jî 148 km dûr e. Cêvsê û Mêwik mezreyeke wê ne. Godernê gundekî dîrokî û



Institut Kurde de Paris



Li çiyayê Andokê şilêr
Foto: Mehmet Mirza Çelik

turîstîk e. Geliyê Gohdernê li herêma Amedê geliyê herî mezin û bi heybet e. 200 metre di bilindahiya gelî de gelek nawis û şikeft hene. Ji dema Hûriyan ve mane. Li herêma gund mirov rastî şopên Ermeniyan jî tê. Bi navê Esko gora rahîbeyeke jî li gund heye. Demek dewletê gund vala kiribû lê niha hinek gundî bi paş ve vegeriyane gund. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Gomak** (Agıllı) dikeve bakurê rojavayê Pasûrê. Ji Pasûrê 33 û ji Amedê jî 145 km dûr e. Di dema xwe de gundê Ermeniyan bûye. Bandirgî û Dêrê mezreyên wê ne. Di navbera Pasûr, Darahêne û Licê de ye. Wargeş û Warê Kolî zozanên herî mezin in. Çiyayê Kêl di nav araziyên gund de ye. Li pêş Gawas û li navbera wî û Cixsê çiyayê Kasor heye. Gelê, Dêrê û Bondirgî mezreyên wê ne. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Di sala 1986an de di dema Turgut Özal de bendaveke biçûk çêkirine. Riya gund stabîlîze ye, telefon û elektrîk li gund tune ne.

**Hacana** (Bağcılar) dikeve başûrê Pasûrê. Ji Pasûrê 14 û ji Amedê jî 135 km dûr e. Nifûsa gund 258 e. Eliyan (Dolusalkım), Delkan (Ortakuyu), Mala Pîrê, Hacana Biçûk, Goma Belek, Nevro, Malê Hesê û Koçera (Düzpelit) mezreyên wê ne. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye. Li gund telefon, av û elektrîk hene.

**Havîngê** (Uygur) dikeve başûrê rojavayê Pasûrê. Ji Pasûrê 14 û ji Amedê jî 142 km dûr

Institut kurde de Paris

e. Nifûsa gund 300 e. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin Li gund dibistan heye, lê girtiye. Riya gund qûmkirî ye. Telefon û elektrîk li gund hene.

**Hêlîn** (Yuva) dikeve rojhilatê Pasûrê. Ji Pasûrê 22 û ji Amedê jî 150 km dûr e. Mixursag, Mezre û Taxa Jêrîn mezreyên wê ne. Nifûsa gund 300 e. Li gund dibistan heye, lê girtiye. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Herta** (Karpuzlu) dikeve rojavayê Pasûrê. Ji Pasûrê 23 û ji Amedê jî 123 km dûr e. Nifûsa gund 700 e. Mezra (Soğanlı) û Kiran (Dirlik) û Kafa mezreyên wê ne. Li gund dêrên xerabe hene. Dîsa li gund bi navê Seyid Şêx Mahmûd turbeyek heye. Di sala 1991ê de turbeyê tamîr kirine. Dokumenteyeke nivîskî derketiye ku 480 sal berî niha carek din ev turbe hatiye tamîr kirin. Berê dihat goti ku malbata Seyid Şêx Mahmûd ji Bexdayê hatine li gund bi cih bûne. Niha diyar bûye ku malbata wî ne ji Bexdayê ji Musilê hatine. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Doktorê diranan Ehmed Kiliç ji vî gundî ye. Wî li dibistana gundê xwe pirtûkxaneyeke nûjen avakiriye. Bi sedan pirtûk, kovar û materyalên dersê di pirtûkxanê de hene. Wî bi komputer û alevên teknîka hemdem pirtûkxaneyê dewlemetir kiriye. Bijîşk Ehmed di kovara Mizgînê de, bi zaravayê kurmancî li ser nêrîn û pakkirina dev û diranan meqale nivîsiye û hîn nivîsên wî di kovarê de dom dikin. Herweha di *Söz TV*a Amedê ya herêmî de, li ser nêrîn û pakkirina dev û diranan gelek bername pêşkêş kiriye û dike. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Hewrê/Mala Xerzî** (Yayıkköy) dikeve başûrê Pasûrê. Ji Pasûrê 39 û ji Amedê jî 168 km dûr e. Li herêma Badikan e. Nifûsa gund 871 e. Cimikan (Yarımca), Qûça, Qowê û Malên Şeva mezreyên wê ne. Piraniya zeviyên gund ketine bin ava bendava Batmanê. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin Li gund dibistan heye, lê girtiye. Riya gund qûmkirî ye, telefon, av û elektrîk li gund hene.

**Înika** (Kayacık) dikeve bakurê rojhilatê Pasûrê. Ji Pasûrê 31 û ji Amedê jî 159 km dûr e. Nifûsa gund 210 e. Gûznak (Yucetarla) û Zeviya Sar (Karaburç) mezreyên wê ne. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gun ji serdema Romayan ve xerabe hene. Li gund dibistan tune. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Kanika** (İnkaya) dikeve başûrê Pasûrê. Ji Pasûrê 22 û ji Amedê jî 150 km dûr e. Nifûsa gund 60 maye. Şikeft û nawisên Kanikan yek ji ciyên herî kevn û dîrokî ne. Şikeftkûr, Malê Tehtê, Kewê û Meydan mezreyên wê ne. Ji serdema kevirî (neolotîk) ve mirov li vir jîyane. Gundî bi zaravayê kurmanî dipeyivin. Ji sala 1937an ve li gund dibistan heye, lê hatiye girtin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Kerika** (Kurudere) dikeve başûrê rojavayê Pasûrê. Ji Pasûrê 14 û ji Amedê jî 125 km dûr e. Nifûsa gund di navbera 170-180 de maye. Maden mezreya wê ye. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kerra** (Karaorman) dikeve başûrê Pasûrê. Ji Pasûrê 33 û ji Amedê jî 165 km dûr e. Nifûsa gund 150 e. Mala Başo, Mala Husê, Gerger, Gewra û Mala Hemê mezreya wê ye. Li gund dibistan heye, lê girtiye. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Kuyê** (İslamköy) dikeve bakurê Pasûrê. Ji Pasûrê 30 û ji Amedê jî 141 km dûr e. Tûre, Geliyê Qasa, Exdat, Vank û Xûşê mezreyên wê ne. Nifûsa gund 0 e. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Hatine koçber kirin. Ji bo di dema berê de gundên derdorê hema hema hemû Ermenî bûne û ev gund Kurd û musluman buye, navê îslamê li gund kirine. Zivistanan ji bo ku berf pir dibare elektrîk û telefon naxebitin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Mala Dînarê** (Bayırköy) dikeve başûrê Pasûrê. Ji Pasûrê 20 û ji Amedê jî 145 km dûr e. Dalît Mezreya wê ye. Li gor gotinan bi navê Dînar jinebîyeke tê li vir bi cih dibe. Ew û zarokên xwe gund ava dikin. Navê jina jinebî li gund kirine. Nifûsa gund 80 e. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Mala Melikê** (Saltukköy) dikeve rojhilatê Pasûrê. Ji Pasûrê 50 û ji Amedê jî 178 km dûr e. Nifûsa gund 950 e. Tûtana (Koçkar)Dirbê û Siwêd (Ortaköy) mezreyên wê ne. Gundî bi zaravayê kurmanî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

Institut Kurde de Paris

**Mîlika** (Düzce) dikeve başûrê Pasûrê. Ji Pasûrê 16 û ji Amedê jî 138 km dûr e. Nifûsa gund 120 e. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan û nexweşxane hene. Li herêma gund sê nawisên dîrokî hene. Ji kevir hatine kolan û her yek 10 m2 mezin e. Rezên gund binavûdeng in. Gundî tirî û hermêyan difroşin û pê debara xwe dikin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Mehmedkan** (Aygün) dikeve başûrê rojhilatê Pasûrê. Ji Pasûrê 43 û ji Amedê jî 171 km dûr e. Gundekî ji eşrîreta Xiyan e. Eşîreta Xiyî li Mûşê, Navenda Amedê, li navenda Pasûr, Farqîn, Bismil û Batmanê jî hene. Tê gotin ku hemû ji vî gundî belav bûne. Nifûsa gund 1770 e. Talori (Alaz), Balûrkan (Yumacık), Qayser (Sarıçıban), Navro (Sıgırtaş), Hertka û Hesemka(Sudöndü) mezreyên wê ne. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Nederan** (Alaca) dikeve bakurê rojhilatê Pasûrê. Ji Pasûrê 28 û ji Amedê jî 156 km dûr e. Nifûsa gund 25 maye. Araskan (Taysever), Newala Bilûrê (Bilurderesi), Geliyê Hûnê (Oyukderesi), Kanikan (Yertutan), Kejik (Sivrikaya), Qeynter (Taşdiken), Keranê Hişkê (Dedebagı), Kerengan (Tahildöven), Toqaxil, Badînek (Aktulum), Oberka (Karmataş) û Şên (Şenyaylası) mezreyên wê ne. Çiyayê herêmê yê herî bilind Andok di nav tixûbê Nederan de nêzîkî tixûbê Mûşê



Çiyayê Andokê
Foto: Mirza Mihemed Çelik



Institut kurde de

ye. Andok 2830 metre bilind e. Gund hatiye vala kirin. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. telefon û elektrîk li gund hene. Riya gund asfalt e.

**Nêrçik** (Karabulak) dikeve bakurê rojhilatê Pasûrê. Ji Pasûrê 5 û ji Amedê jî 136 km dûr e. Nifûsa gund li derdora 200-250 heye. Koçka, Xujarde û Xosart Mezreyên wê ne. Ziyareta Hazir Baba li herêma Mezreya Koçkan e. Di meha Temûzê de xelk diçe ser ziyaretê. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Qesra Têlî Axa li gund e. Qesra Têlî Axa di sala 1650an de ji aliyê Têlî Axa û birayê wî Evdil Axa ve hatiye çêkirin. Qesir ji kevirên spî yên nehît hatiye çêkirin. Tê gotin ku di dema xwe de 216 odeyên qesrê hebûne. Qesir li ser du tebeqeyan hatiye avakirin û niha hîn li ser piyan e. Hatiye restorekirin. Qesir li çemê Pasûrê dinêre. Wek tê zdi gelek stranan de navê Têlî Axa derbas dibe. Dibistan heye, lê girtiye. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Qemika** (Akbulak) dikeve başûrê Pasûrê. Ji Pasûrê 20 û ji Amedê jî 148 km dûr e. Nifûsa gund ji 650 zêdetir e. Harûniya Jêrîn, Goma Gocar, Hewrika Çem, Kelek, Goma Silêman Efendî û Goman mezreyên wê ne. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Qoqan** (Güllük) dikeve rojavayê Pasûrê. Ji Pasûrê 13 û ji Amedê jî 117 km dûr e. Nifûsa gund ji 350 e. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, hatiye girtin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Reşika** (Başbuğ) dikeve başûrê rojhilatê Pasûrê. Ji Pasûrê 36 û ji Amedê jî 166 km dûr e. Nifûsa gund 650 heye. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin. Mala Humo û Malên Jêrîn mezreyên wê ne. Riya gund qûmkirî ye e, telefon û elektrîk li gund hene. Li gund pîrozgeha Kurê Silîvan heye. Her rojên pêncşem û înê xelkê herêmê diçin tewafê. Bi qasî 30 km ji gund dûr zozanê Şenê heye. Gundî bi havînê re diçin zozan û payizan jî vedigerin gund. Gund li ser Pasûrê ye, lê nêzîkî Farqînê ye. Çûn û hatina gundiyan li ser Farqînê ye.

Institut kurde de Paris

**Seyrek** (Zeyrek) dikeve rojavayê Pasûrê. Ji Pasûrê 18 û ji Amedê jî 108 km dûr e. Bi kirmanckê navê cureyeke çûkan e. Nifûsa gund nêzîkî 500î ye. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Dibistan heye, lê şagirdên mezin bi mînîbûsan dibin navenda Pasûrê. Riya gund qûmkirî ye. Telefon û elektrîk li gund hene.

**Şawîşa** (Güleç) dikeve başûrê Pasûrê. Ji Pasûrê 25 û ji Amedê jî 147 km dûr e. Mala Evdo, Mala Repîn, Mala Halîmê Mûsa û Mala Besê û Xerzik mezrayên wê ne. Nifûsa gund 120-130 heye. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan tune. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk heye. Li gund Pira Kevirî, Gola Kevirali û şikeftên Qilikî hene.

**Şerefka** (Ünal) dikeve başûrê Pasûrê. Ji Pasûrê 39 û ji Amedê jî 167 km dûr e. Tê gotin kesê ku gund ava kiriye navê wî Şeref bûye. Nifûsa gund 200 heye. Memika mezreyawê ye. Li gund dibistan heye, lê girtiye. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Şêxbûba** (Özbek) dikeve rojavayê Pasûrê. Ji Pasûrê 12 û ji Amedê jî 118 km dûr e. Nifûsa gund nêzîkî 700î ye. Ava Kevn, Zêrûg û Dehlik mezreyên wê ne. Li gund pîrozgeha Şêx Ebûbekir heye. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Dibistan, mizgeft, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Şêxhemza** (Hamzalı) dikeve başûrê rojhilatê Pasûrê. Ji Pasûrê 33 û ji Amedê jî 161 km dûr e. Nifûsa gund 700î derbas dike. Poran (Yolçatı), Pîrebiyan (Derindere), Malê Xero, Mîraciya, Malên Heciya, Malên Mele, Sinda (Sındı) û Mikrasiyan (Akyaprak) mezreyên wê ne. Li gund kanên mermerê hene. Li gund ziyareta Sorikê heye. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan û nexweşxane hene lê herdu jî naxebitin. Şagird diçin dibistana gundê nezîk û li wir dixwînin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Şînas** (Argunköy) dikeve rojhilatê Pasûrê. Ji Pasûrê 10 û ji Amedê jî 138 km dûr e. Nifûsa gund bi mezreyan ve 1.290 e. Dêredûn, Mêrga Zergûz, Sewêda, Taxa Newalê, Rasil, Gaştarûga, Qurqurê, Neva Şemo, Dikarût, Dêredûn, Mîra û Kelê mezreyên wê ne. Kele û xerabeyên Ulya xwediyê dîrokeke me-

zin û qedîm in. Li gund dêreke xerabe heye. Berê gundê Ermeniyan bûye. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund mîr, axa û xelkê normal hene. Li gund dibistan heye. Li gund telefon û elektrîk hene û riya gund qûmkirî ye.

**Temira** (Demirli) dikeve başûrê rojavayê Pasûrê. Temira Kebîr jî dibêjin. Ji Pasûrê 27 û ji Amedê jî 150 km dûr e. Nifûsa gund li derdora 100î ye. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Mêwik mezreya wê ye. Aveke zêde heye û çend aş li ber vê avê digerin. Ji ber ku aş hene navê Gelıyê Aşan e. Li Geliyê Aşan nawis î şikeft hene. Tê gotin ku ev nawis û şikeft ji dema Persan ve mane. Ji derî nawis û şikeftan, sarincên avê, kozikên zêrevanan (notirvanan) hene. Li gund dibistan tune. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Temranê Sexîr** (Temren) dikeve başûrê Pasûrê. Ji Pasûrê 21 û ji Amedê jî 142 km dûr e. Nifûsa gund 250 heye. Malên Hafê, Malên Gazê û Dibûrî mezreyên wê ne. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan heye, lê hatiye girtin. Riya gund qûmkirî ye, telefon û elektrîk li gund hene.

**Tiyaxs** (Narlıca) dikeve bakurê rojavayê Pasûrê. Li naverasta bakurê çemê Geldan hatiye avakirin. Bi kirmanckî jê re Awges jî dibêjin. Berê li gund Ermenî



Geliyê Pasûrê
Foto: Mirza Mihemed Çelik

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

jî hebûne, lê niha nemane. Ji navenda Pasûrê 11 û ji Amedê jî 133 km dûr e. Li gor statîstîkên sala 2010an nifûsa gund 510 e. Geldan û Terkan mezreyên wê ne. Li Newala Sosê kaniyên ku ava wan ji bo şîfayê ne hene. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan û nexweşxane hene. Riya gund asfalt e, telefon, av, elektrîk dezgehên kursên xalîçan li gund hene.

**Xerzikan** (Tuzluköy) dikeve başûrê rojhilatê Pasûrê. Ji Pasûrê 33 û ji Amedê jî 161 km dûr e. Nifûsa gund 280 ye. Balûrkan (Dutlu), Şûvîska Hevo, Elika, Erzik, Karikê, Hesemkan (Olcay), Hêrit (Turcalı) û Mala Şero (Akocak) mezreyên wê ne. Li gund dibistan heye, lê girtiye. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Xurûc** (Kaynakköyü) dikeve bakurê Pasûrê. Ji Pasûrê 13 û ji Amedê jî 134 km dûr e. Nifûsa gund 260 e. Gundî bi kurmancî dipeyivin. Li gund bi navê Zewq kaniyeke têrav heye, gundî qoze xwedî dikin. Li gund mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Xweşikan** (Kayahan) dikeve başûrê Pasûrê. Ji Pasûrê 42 û ji Amedê jî 170 km dûr e. Nifûsa gund 1.050 ye. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Belaş û Hilûfk mezreyên wê ne. Li gund dibistan heye, lê girtiye. Riya gund asfalt e, telefon û elektrîk li gund hene.

**Zera** (Çağlayan) dikeve rojavayê Pasûrê. Ji Pasûrê 29 û ji Amedê jî 128 km dûr e. Navê gund tê wateya axa bi ber. Nifûsa gund 0 e. Ziktê (Derecik), Adrok (Deveboyu) û Xerabên Zera mezreyên wê ne. Di 1994an bi operasyoneke mezin gund bi mezereyan ve hatine şewitandin û gundî koçber bûne. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye. telefon û elektrîk li gund hene.

**Zîlek** (Kamışlı) dikeve başûrê rojavayê Pasûrê. Ji Pasûrê 16 û ji Amedê jî 138 km dûr e. Nifûsa gund 510 e. Hewrik (Yeşilce), Beytulbeyan (Yenidan), Mama Zelo, Text û Zîleka Xerabe (Başçavuş) mezreyên wê ne. Gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan tune. Riya gund asfalt e. Li gund telefon, av û elektrîk hene.

Institut kurde de Paris



Çarşıya Pîranê
Foto: Ji arşiva Şaredariya Mezin a Amedê

# Pîran

Pîran (Dicle) dikeve bakurê navenda Amedê û ji Amedê 92 km dûr e. Piraniya zeviyên Pîranê li herêma çiya ne, lê li başûrê wê naverasteke biçûk heye. Qada axa Pîranê 975 km² ye. Bilindiya ji deryayê 970 metre ye. Li gor gotinên gotinbêjan gotina "Pîran" ji gotina "pîr" hatiye. Di zimanê kurdî de navên gund, bajar an jî herêman gelek caran wek pirhejmar tên gotin. Navê Pîranê jî weha navekî pirhejmar e. Li herêma Pîranê çend navên ku bi "pîr" destpê dikin hene. Yek ji wan Pîr Mensûr e. Li gor agahdariyên Şerefnameyê Pîr Mensûr ji aliyê Culemêrgê hatiye li herêma Gêlê bi cih bûye. Piştî Pîr Mensûr lawê wî Pîr Mûsa û lawê wî (neviyê Pîr Mensûr) Pîr Bedir pîrîtî û desthilatdariyê domandine[53]. Pîrozgeha Pîr Mensûr li gundê Dêranê ye. Ev malbata Pîr ne bi tenê mirovên oldar in, herweha desthilatdarên herêma Gêlê ne ku wê demê Pîran jî li ser Gêlê bûye. Şaxê yekem ê Şerefnamê li ser vê malbatê ye. Herweha eşîreta Merdasî çend şax in, şaxek jê li Gêlê û şaxên din li Çêrmûg, Maden û heta Semsûr û Meletiyê belav bûne.

Li gor statîstîkên sala 2010an nifûsa navenda Pîranê 9.610, ya gundan 31.512 û bi giştî nifûsa Pîranê 40.122 ye. Cellan, Yarelîyan, Mehmuçelebiyan

53 Şerefxanê Bedlisî, Şerefname (wergera Ziya Avci) Weşanên Apec, rûpel 211 binêre

Institut kurde de Paris

(Mehlaya Hokî) û 27 Mayis taxên navenda Pîranê ne. Xelkê navenda Pîranê bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. 38 gund û 65 mezre li ser Pîranê ne. Li navenda Pîranê û Avdelanê şaredarî hene.

Di serdema Osmaniyan de gundekî biçûk bûye jê re gotine Pîran. Di sala 1927an de bûye nehiyeya Madenê. Disa 1938an de nehiya Gêlê anîne Pîranê û navê bajaroka Gêlê li Pîranê kirine. Di sala 1951ê de Pîran bûye bajarok û dewletê navê Dîcle lê kiriye. Di nav girên bajarokê de şikefta Filan, li gundê Dibnê cihên xan, pire, pîrozgeheke şemsiyan, li derûdora Akragê şikeft, pireya Birdincê, Qama Keynaya (Keça) Qiralî, nawis û goristanên ku li tehtan hatine kolan hene. Ev tê wê wateyê ku Pîran cihekî dîrokî ye û ji serdema kevirî ve cihê jiyana mirovan e. Wek herêmên Hêne, Gêl û Amedê cara pêşîn Hûrî-Mîtanî û Naîrî li herêmê jiyane.

Navê Pîranê bi şerê Şêx Seîd re di nav Kurdan belav bûye. Wek tê zanîn, Şêx Seîd di roja 08.02.1925an de bi mirûdên xwe ve çûbûn Pîranê mala birayê xwe. Dewletê provakasyoneke derxistibû û şer li Pîranê dest pê kiribû. Ji ber vê yekê Kurd dibêjin "Şêx Seîdê Pîranî." Ji ber ku axa Pîranê bi piranî çiya ye, zêde çandinî tune, lê heywan xwedîkirin zêde ye û meywe û sebze gelek in. Li herêma Pîranê li ser çemê Dîclê bendava Keça Qiral û bendava Dîclê hatine çêkirin. Her derê Pîranê bûye av. Sirûşt û klîmat hatine guhertin û bergeh û dîmenên xweşik derketine holê. Piştî çêkirina bendavên Keça Qiral û Dîclê Pîran di nav ava herdu bendavan de wek nîv giraveke mezin maye. Li herêma Pîranê rezvanî û masîvanî her ku diçe bi pêş dikeve.

## Şaredarî

Li Pîranê di sala 1938an de sîstema şaredariyê hatiye avakirin. Ji destpêkê heta niha lîsteya şaredaran li jêr e.

1938-1946 qeymeqam
1946-1950 Ali Yılmaz
1950-1957 Zülküf Bilgin
1958-1967 Ali Yılmaz
1967-1980 Husamettin Aygören
1980-84 Halil Çetinkaya (Halil Çetînkaya li Çêrmûgê, memûr bûye. Di dema cuntaya 12ê îlonê de, dewletê ew tayîn kiriye )
1984-1989 Husamettin Aygören

Dimenek ji Pîrana kevn ⟶
Foto: Ji arşîva Şaredariya Mezin a Amedê

1989-1994 Mehmet Göranioglu
1994-2004 Behrun Aygören
2004-2009 Abdullah Akengin
2009- 2011 Mustafa Uyguner

## Nivîskar, hunermend û dengbêj

### Malmîsanij

Malmîsanij di sala 1952an de li Pîranê hatiye dinê. Xwendina xwe ya destpêkê û navîn li Kurdistanê, unîversîte jî li Anqarê xwendiye. Di sala1982an de ji welat derketiye. Li Unîversîteya Sorbonne (Parîs) û ya Uppsalayê (Swêd) beşa zimanê îranî, Unîversîteya Linköpingê beşa perwerdê xwendiye. Li Swêdê, li Unîversîteya Göteborg master kiriye. Di gelek kovar û rojnameyên kurdî de nivîs nivîsiye. Redaktoriya kovara *Vate* dike. Pirtûkên wî yên kurdî ev in: *Ferhengê Kirmanckî* [Zazakî], *Herakleîtos, Folklorê Ma ra Çend Numûney, Ferhengekê Kirdkî-Pehlevkî-Kurmanckî, Pîre û Luye, Rindê Kincan Xo ra Dana, Rindê Heywanan Nas Kena, Gotibûn ku, Mi Şêx Seîd Dî*. Bi tirkî jî heta niha 13 pirtûkên wî hatine çapkirin. Piraniya pirtûkên wî lêkolîn in. Pirtûka wî ya herî dawî *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir´de Kürt Ulusçuluğu* (1900-1920) ye.

Institut kurde de Paris





Kevirê Keça Qiral
Foto: Selahattin Akçay

**J. Îhsan Espar**

J. Îhsan Espar di sala 1956an de li navenda Pîranê hatiye dinê. Dibistana seretayî li Pîranê û yên din li Amedê xwendiye. Li Amedê di sala 1979 Înstituya Perwerdeyê qedandiye û bûye mamosta. Ji ber xebatên siyasî di nîsana 1982an de ji welat derketiye û niha li Swêdê dijî. Li Swêdê dest bi mamostetiya kurdî kiriye. Bi kurmancî û kirmanckî li dibistanên Swêdê dersa zarokên Kurdan dide. Ji aliyê din ve li zanîngeha Stockholmê dîrok û pêşketina zimanê ciwananên duzimanîyan û li Gävleyê jî ilmê civakî xwendiye. Heta niha di gelek kovar û rojnameyên kurdî de nivîsên wî hatine weşandin. Di redaksiyona kovara Vate û weşanxaneya Apecê de kar dike. Heta niha, piraniya wan pirtûkên zarokan, 18 pirtûk wergerandiye kirmanckî û kurmanckî. Ji derî wergerê, ev sê pirtûkên wî hatine weşandin: *Tanî Estanikî û Deyîrê Ma, Beyi Se Bena?* Û *Dilopê Zerrî.* Wî di xe-

Institut kurde de Paris

batên Ferhengê Tirkî-Kirmanckî (Zazakî), Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî, Rastnuştişê Kirmanckî (Zazakî), wekî endam cih girtiye.

**Sait Aydoğmuş**

Sait Aydoğmuş Di sala 1949an de li Pîranê hatiye dinê. Dibistana seretayî û navîn li Pîranê û amadeyiyê li Amedê xwendiye. Di ciwaniya xwe de ketiye nav xebatên welatparêzî. Di sendîkeyan de xebitiye. Di rêvebiriya KİPê de cih girtiye. Piştî darbeya 12ê Îlonê derketiye derî welat û li Swêde wekî penaberekî siyasî maye. Di gelek kovar û rojnameyan de maqale nivîsiye. Wî û A. Nas bi hev re *'Kuzey Kürdistan'da Sosyo-Ekonomik yapının niteliği üzerine'* pirtûkeke amade kirine.

**Abdurrazak Ayata**

Abdurrazak Ayata di sala 1966an de li Pîranê ji dayik bûye. Dibistana seretayî li Pîranê navîn, li Amedê û amadeyiyê li Pîranê xwendiye. Dest bi zanîngehê kiriye lê nexwendiye. Di sala 1989an de çûye Swêdê. Piştî du salan ji wir jî çûye Kanadayê. Niha li Kanadayê dijî. Bi tirkî pirtûkeke wî ya helbestan heye. Navê wê *Piran'da Büyümek* e.

**Eshat Ayata**

Eshat Ayata di sala 1953an de li Pîranê ji dayik bûye. Di sala 1976an çûye li Swêdê bi cih bûye. Heta niha *Nergiz Kokulu Şafak, Bir Zaza destanı, Mavi ve Kırmızı, Kasideyî Zaza* pirtûkên wî hatine çap kirin. Gelek wergerên wî yên ji swêdî û tirkî hene.

**Zulfi Yoldaş**

Zulfi Yoldaş di sala 1950î de li gundê Qelbînê ji dayîk bûye. Zaravayê wî yê dayikê kirmanckî ye, lê bi kurmancî jî dizane. Helbestên xwe bi tirkî nivîsiye. Heta niha 13 pirtûkên biçûk ên bêrîkan wek destanan çap kiriye. Pirtûka wî ya *Çay Önünde Hülleler* a ku herî zêde li ser xebitiye. Dengê wî xweş û zelal e. Ew hem distre û hem jî li sazê dide.

Institut kurde de Paris



Dîmenek ji Pirana nû
Foto: Ji arşîva Şaredariya Amed

## Mehemed Ronahî

Mehemed Ronahî di sala 1979an de li Pîranê hatiye dinê. Li zanîngeha Înönü beşa civaknasiyê xwendiye. Di gelek rojname, kovar û malperan de helbest û nivîsên wî hatine weşandin. Xwediyê weşanxaneya Ronahî ye. Bi navê *Bendewarên Adarê* romanek wî heye.

## Mehmet Akbaş

Mehmet Akbaş di sala 1974an de li Pîranê hatiye dinê. Heta dibistana amadeyî li Pîran û Amedê xwendiye. Li Stanbulê jî konservatuarê qedandiye. Di koma Vengê Sodirî de xebitiye. Derketiye derî welat û li Almanyayê maye û li wir jî bi muzîsyenên alman re li ser muzîkê xebata xwe domandiye. Taybetiya wî enstrumentên rojhilat û yên rojava li gel hev bi kar tîne û diguncîne. Bi kirmanckî distire, lê bi zaravayên kurmancî û soranî jî starnên wî hene.

## Kerem Sevinç

Di sala 1976an de, li Pîranê ji dayik bûye. Li unîversîteya Dîcleyê beşa cografyayê xwendiye û ji sala 2000 û vir de mîna mamoste kar dike. Pazdeh sal berê

Dimenek ji Pira Dibnê →

dest bi xebata muzîkê kiriye. Li Stanbulê, li Akademiya Muzîk ya Galatasarayê û li unîversîteya Dîcleyê jî li Konservatura Dewletê muzîk xwendiye. Bi hevalekî xwe re bi navê "Koma Kulîlkên Medê komeke muzîkê ava kiriye. Di vê komê de çar salan xebitiye. Bi navê "Lome" albumek derxistiye. Di vê albumê de 8 stranên kirmanckî (zazakî) û 3 stranên kurmancî cih digrin.

## Gundên Pîranê

**Akrage** (Biçer) dikeve rojavayê Pîranê. Ji Pîranê 4 km û ji Amedê jî 94 km. dûr e. Berê mezreya Bazbendê bû, niha bûye gund. Li gund mizgeft, elektrîk û telefon hene. Li gund dibistan tune zarok diçin dibistana li navenda Pîranê.

**Avdelan** (Kaygısız) dikeve başûrê rojhilatê Pîranê. Ji 18 mezreyan pêk tê: 1. Cundiya, 2. Cunya, 3. Keçela, 4. Kerra, 5. Kosa, 6. Haciya, 7. Kirkira, 8. Hesya, 9. Malên Şero, 10.Eliya, 11. Tirvangê, 12. Mamya, 13. Hewdiya, 14. Xeybiya, 15. Cerduya, 16. Mala Gêrî, 17. Şenya û 18. Mexsûya. Di sala 1992an

Institut Kurde de Paris





Institut kurde de Paris



Dimenek ji herêma Dibnê

de li mezreya Cundiya şaredarî hatiye damezrendin. Li gor Statîstîkên 2010an nifûsa hemû18 mezreyan bi tevî 3.721 e. Hemû mezra bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Gundî çandiniyê dikin û heywanan xwedî dikin. Ji derî şaredariyê dibistan û nexweşxane, elektrîk û telefon hene. Riya gund qûmkirî ye. Li gund gelek zîyaret hene. Ya herî bi navûdeng ziyareta Şêx Mehemed e.

**Bawkan** (Pekmezciler) dikeve başûrê Pîranê. Ji Pîranê 6 km û ji Amedê 94 km dûr e. Nifûsa gund li derdora 500î ye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Gundekî dîrokî ye. Tê gotin ku berê di vî gundî de Kurd û Ermenî ligel hev jîyane. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Bazbende** (Yeşilsırt) dikeve rojavayê Pîranê. Ji Pîranê 4 km û ji Amedê 94 km dûr e. Nifûsa gund 1500 heye. Gundekî kevn e. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Behro/Boxaz** (Bahroboğaz) dikeve bakurê rojavayê Pîranê. Ji Pîranê 20 km û ji Amedê 110 km dûr e. Nifûsa gund 437 e. Hasenek (Yeşilkavak), Şekgomê (Şenova) û Gomêşek Jêrî

Institut kurde de Paris

(Aşağışenova) mezreyên wê ne. Li herêma gund bi navê Eyni Siyardik aveke sirûştî heye. Di heman demê de gundî bi çavê pîrozgeh û şîfayê jî li vê ava kaniyê dinêrin. Hasenek, Gizro û Deştek jî cihên seyrengeh û xweş in. Di dema şerê Şêx Seîd de jî gund zerareke mezin dîtiye. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye û li gund telefon û elektrîk hene.

**Bîbnoke** (Bahçeköy) ji Amedê 75 km û ji Pîranê jî 20 km dûr e. Dibistan heye. Nifûsa gund ji 200î derbas kiriye. Şêxmedan (Etek) mezreya wê ye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye û li gund telefon û elektrîk hene.

**Banqirse** (Tepe) dikeve rojhilatê Pîranê. Ji Pîranê 15 km û ji Amedê 105 km û dûr e. Nifûsa gund ji 400î bêtir e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye

**Butalbiyan** (Baturköy) dikeve başûrê rojhilatê Pîranê, ji Pîranê 35 km û ji Amedê 65 km dûr e. Dibistan û nexweşxane hene. Sîstema avê heye. Nifûsa gund 1100 e. Kalan (Doğan), Melkortê (Akbulut), Topalan (Çevikbağı) mezreyên wê ne. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye û li gund telefon û elektrîk hene.

**Darat** (Durabeyli) dikeve başûrê rojhilatê Pîranê. Ji Pîranê 30 km û ji Amedê 120 km dûr e. Dibistan heye. Nifûsa gund 1.060 e. Gund ji sê taxan pêk tê: Bazîda, Dermana û Abasa. Li taxa Abasa şikefteke balkêş heye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li herêmê gundekî herî dîrokî û kevn e. Bi navê Şêx Memî Tenik ziyeretek heye. Li gund telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye

**Dêran/Dêrey** (Kocaalan) dikeve başûrê rojhilatê Pîranê. Ji Pîranê 5 km û ji Amedê jî 95 km dûr e. Kalax (Karaca) û Gurzan (Acar) mezreyên wê ne. Nifûsa gund 1.630 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund pîrozgeha Pîr Mensûr heye. Li gor Şerefnameyê ewliya ye û berî hezar salan jiyaye. Li gor agadariyên Şerefnameyê Pîr Mensûr ji aliyê Hekariyê hatiye li herêma Gêlê bi cih bûye. Piştî Pîr Mensûr lawê wî Pîr Mûsa û lawê wî (neviyê Pîr Mensûr) Pîr Bedir pîrîtî û desthilatdariyê domandiye. Ev malbata Pîr ne bi

Institut kurde de Paris

tenê mirovên oldar bûne, herweha desthilatdarên herêma Gêlên bûne. Divê neye ji bîr kirin ku demekê Pîran gundekî Gêlê bûye. Di Şerefnamê li ser malbatê Pûr eşîra Merdasiyan bi awayekî dûr û dirêj dinvîsiye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e

**Dibne/Dimli** (Döger) dikeve rojhilatê Pîranê. Ji Pîranê 14 km û ji Amedê 104 km dûr e. Nifûsa gund 1.680 ye. Kurtuluş mezreya wê ye. Li herêma gund gelek nawis û şikeft hebûn, lê piraniya wan niha ketin bin ava bendavê. Xerabeyên xaneke mezin jî li gund heye. Gundê Ermeniyan bûye û piştî salên fermanê êdî Ermenî li gund nemane. Kurd li ser mal û milkên wan rûniştine. Niha gundî bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Li gund dibistan, nexweşxane, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Gund li ser riya Pîran û Hêneyê ye.

**Erseke** (Gelincik) dikeve rojhilatê Pîranê, ji Pîranê14 û ji Amedê 104 km dûr e. Bexçecik mezreya wê ye. Dibistan hatiye girtin. Nifûsa gund 220 e. Riya gund qûmkirî ye û li gund telefon û elektrîk hene.

**Gozelî/Zixrê Gozelî** (Bogazköy) dikeve bakurê rojhilatê Pîranê. Ji Pîranê 10 km û ji Amedê jî 90 km dûr e. Gundekî bi bax û bexçe ye. Li gund darê gûzan gelek in û gund navê xwe ji van darên gûzan girtiye. Gund li ber çemê Dîclê ye. Havînan ji Pîran, gundên derdorê heta ji Amedê xelk tê li vir pîknîkê. Basiyên vir gelek bi çêj in. Ji Amed û Gund hatiye vala kirin lê niha 30-40 xanî hatine lêkirin. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Qulan** (Bademli) dikeve başûrê rojavayê Pîranê, ji Pîranê jî 21 km û ji Amedê 76 km dûr e. Gundî bi zaravayên kirmanckî û kurmancî dipeyivin. Dibistan heye. Nifûsa gund 500 e. Riya gund qûmkirî ye û li gund telefon û elektrîk hene.

**Hecîyanê Medînan** (Meydanköy) dikeve başûrê rojhilatê Pîranê, ji Pîranê 20 km û ji Amedê 70 km dûr e. Nifûsa gund 1.090 e. Çar mezreyên wê hene: Haciyan (Eceler), Husêynîyan (Kardeşler), Merdikan (Erler), Xanikan (Akbulama). Bi zaravayên kurmancî û kirmanckî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye û li gund dibistan, telefon û elektrîk hene.

**Herîdan** (Kırkpınar) dikeve bakurê Pîranê, ji Pîranê 7 km û ji Amedê 99 km dûr e. Dewletê gund vala kiriye. Piraniya gundiyan barê navenda pîran û Amedê kirine. Niha çend mal bi paş ve vegerîne. Tonekrage (Kayaş) û Culbeynî (Küpetaş) mezreyên wê bûn. Ev her du mezra jî vala kirine. Şaredarê Peyasê Zulkuf Karatekin ji vê mezreyê ye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Berê gundê Ermeniyan bûye. Li herêma gund hîn şopên Ermeniyan hene. Hunermendê Ermenî Sami Hazinses û nivîskarê Ermenî Mıgırdiç Margosyan bi eslê xwe ji vî gundî ne.Li herêma gund ziyareta Warey Loy heye. Riya gund qûmkirî ye. Gund hatiye vala kirin û xelkê gund barkirine navenda Pîran û Amedê. Li navenda Amedê komeleya gund avakirine. Gundî havînan diçin gund û tên.

**Himbêl** (Çavlı) dikeve başûrê rojavayê Pîranê, ji Pîranê 18 û ji Amedê 78 km dûr e. Nifûsa gund 500 heye. Bi zaravayên kurmancî û kirmanckî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye û li gund dibistan, telefon û elektrîk hene.

**Hope** (Altayköy) Ji Amedê 75 û ji Pîranê û Pîranê jî 15 km dûr e. Li gund dibistan heye. Nifûsa gund 380 e. Hedan (İsmaîl Boğazı) mezreya wê ye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye û li gund telefon û elektrîk hene.

**Îbikan** (Üzümlü) dikeve başurê rojhilatê Pîranê. Li herêma Têrkan e. Ji Pîranê 27 km û ji Amedê 117 km dûr e. Göze, Taşlı û Gündüz mezreyên wê ne. Dibistan heye. Nifûsa gund 2.200 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Gundekî dîrokî ye. Li qeraxê çemê Dîclê ye. Gelek şikeft û nawis hene ku ev hîn ji serdema kevirî ve mane. Nawisa Çarderî, Sûneka Mezin û Sûneka Biçûk hene. Ev ne şikeftin, nawis in. Yanî ji aliyê mirovan ve hatine kolan. Ji derî van şikeftan Zinarê Şeref jî heye. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Kelkome/Zixrê Kelkome** (Kelekçi) dikeve bakurê rojhilatê Pîranê. Ji Pîranê 15 km û ji Amedê 125 km dûr e. Ji ber ku gund li ser çemê Dîclê ye û bi kelekan êzign û bar birine Amedê bi kirmanckî gotine Kelkome. Ango gundê kelekvanan. Gund hatibû vala kirin lê niha gundî bi paş ve vedigerin. Nîvê gund ji nû ve şên bûye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye û li gund telefon û elektrîk hene.

Bendava Keça Qiral →
Foto: Aşkın Zaman

**Qocîg** (Kurudere) dikeve rojavayê Pîranê, ji Pîranê 18 km û ji Amedê 108 km dûr e. Dibistan hatiye girtin. Nifûsa gund li derdora 200î ye. Xiraba mezreya wê ye. Berê Hecîsan û Doxan jî mezreyên wê bûn, lê herdu jî ketin bin ava bendavê û niha nemane. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye û li gund telefon û elektrîk hene.

**Kuferbe** (Baltacı) dikeve rojhilatê Pîranê, ji Pîranê 7 km û ji Amedê 94 km dûr e. Nifûsa gund 480 e. Mezreyeke wê heye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Nalwer** (Sergenli) dikeve başûrê rojhilatê Pîranê ji Pîranê 27 km û ji Amedê 117 km dûr e. Dibistan hatiye girtin. Nifûsa gund nêzîkî 800î ye. Girşot (Taştepe) mezreya wê ye. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye û li gund telefon û elektrîk hene.



Institut kurde de Paris

**Omeran** (Ulubaş) dikeve rojavayê Pîranê û li ser riya Pîran û Amedê ye. Ji Pîranê 12 û ji Amedê 80 km dûr e. Nifûsa gund 250 heye. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e

**Pîrhejman** (Kurşunlu) dikeve bakurê Pîranê. Ji Pîranê 25 km û ji Amedê jî 115 km dûr e. Gund hatiye vala kirin. Li herêmê bi navê Pîrhejman çiyayekî mezin û bilind heye. Gund navê xwe ji vî çiyayî girtiye.

**Qelbîn** (Bozaba) dikeve başûrê Pîranê, ji Pîranê 9 km û ji Amedê 99 km dûr e. Dibistan heye. Nifûsa gund 3.500 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Riya gund qûmkiri ye û li gund telefon û elektrîk hene.

**Qortenîta Cêrêne** (Arıköy) dikeve rojhilatê Pîranê, ji Pîranê 20 km û ji Amedê 104 km dûr e. Dibistan heye. Nifûsa gund 1.375 e. Baliyan (Pınar), Esentepe û Pûrleşkiryan (Ordulu) mezreyên wê ne. Bi zaravayê kirmanckî û kurmancî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye û li gund telefon û elektrîk hene.

**Salurî** (Başköy) dikeve rojhilatê Pîranê, ji Pîranê 12 km û ji Amedê 90 km dûr e. Dibistan heye. Nifûsa gund 813 e. Çewlik (Çaydere), Vêrdan (Çayüstü), Elîzulfî (Köprübaşı) û Espene (Beşdanlar) mezreyên wê ne. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye û li gund telefon û elektrîk hene.

**Şêxmalan** (Tepebaşı) dikeve başûrê rojhilatê Pîranê. Ji Pîranê 18 û ji Amedê 108 km dûr e. Nifûsa gund ji 900î derbas kiriye. Qulan (Altıtaş), Geyîgan (Yardımcı) û Tazîr (Nohutlu) mezreyên wê ne. Mala Ensarî şêx in. Mala Ensarî ne tenê li vî gundî herweha li tevahiya herêmê xwedî desthilatdara olî û sîyasî ne. Ebdilletîf Ensarioglu di dema Partiya Adeletê de bûye parlamenter. M. Salih Ensarîoglu jî demeke bûye Wezîrê Dewletê. M. Xalib Ensarîoglu jî niha li Amedê serokê Yekîtiya Bazirganan e. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund pîrozgeheke heye û goristana çend şêxan e. Ev şêx bav kalên mala Ensariyan in. Navê Ziyaretê Bavkal Mûsa ye. Her sal di navbera 15-25 meha gulanê de ji gund û herêmê gelek mirov tên tewafa pîrozgehê. Li gund dibistan, mizgeft, nexweşxane, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Şêxsilametan** (Dedeköy) dikeve başûrê rojhilatê Pîranê, ji Pîranê 30 û ji Amedê 55 km dûr e. Nifûsa gund 1.136 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Bi navê Şêx Selamet pîrozgehek heye û xelk di navbera 20 û 30 meha gulanê de diçe tewaf dike. Gundekî dîrokî ye. Li gund şikeft û nawis serdema kevirîn hene. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye

**Şîngîrînga Cêrîne** (Yokuşlu) dikeve bakurê rojavayê Pîranê. Ji Pîranê 15 km û ji Amedê 105 km dûr e. Nifûsa gund 579 e. Koşkar (Oba) û Xizik mezreyên wê ne. Di erdheja 1975an de vî gundî zerereke mezin dît. Bi qasî kîlometreyekê li rasta binê gund ê kevn xaniyên prefabrîk çêkirine. Tê texmîn kirin ku gundê kevn di salên 1700î de hatiye avakirin. Gundî bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund qûmkirî ye.

**Şîngîrînga Corîne** (Kayıköy) dikeve bakurê Pîranê, ji Pîranê 29 km û ji Amedê 116 dûr e. Dibistan tune. Nifûsa gund 56 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye û li gund telefon û elektrîk hene.

**Şulbetan** (Koruköy) dikeve başûrê rojavayê Pîranê, ji Pîranê 10 km û ji Amedê 82 km dûr e. Sîstema avê heye. Dibistan heye. Nifûsa gund 413 e. Bi zaravayê kurmancî dipeyivin. Riya gund qûmkirî ye û li gund telefon û elektrîk hene.

**Wurê** (Uluçeşme) dikeve rojhilatê Pîranê, ji Pîranê 10 û i Amedê 100 km dûr e. Bi kirmanckî dipeyivin. Dibistan heye. Nifûsa gund 215 e. Riya gund asfalt e û li gund telefon û elektrîk hene.

**Xaçek** (Taşağıl) dikeve bakurê rojavayê Pîranê ye. Gund du beş e: Xaçekê Tilistonî 4 km û Xaçekê Şêxendelo 7 km ji Pîranê dûr in. Xaçek bi ermenî ye. Di sala 1993an de gund hatiye vala kirin. Xaçekçûr (Yukarıtaşağıl) (Min nebihistiye) mezreya wê ye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Tê gotin ku Mirdêsî ne. Li gund nawis, sarinc û şikeft hene ku ji dema Hûrî-Mîtaniyan ve mane. Li gund dibistan heye, lê girtiye. Riya gund qûmkirî ye. Xaçek nuha wekî gund nemaye. Vala kirine. Dewletê, statuya wî betal kiriye.

Institut kurde de Paris

**Xelefan** (Gündoğdu) ji Amedê 125 km û ji Pîranê jî 35 km dûr e. Nifûsa gund li derdora 150î ye. Mala Qaçer ji gundê Aldûna Darahênê hatine û gund avakirine. Di dema şerê Şêx Seîd de mala Qaçer jî bedel dane û hatine surgunkirin. Piştre wegerîne gund. Bi çêkirina bendava Keça Qiral re hinek zevî û riya gund ketine ber avê. Çûyîn û hatina gund zehmetir bûye. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund telefon û elektrîk hene.

**Zeydan** (Uğrak) dikeve başûrê rojhilatê Pîranê. Ji Pîranê 8 km û ji Amedê 98 km dûr e. Gundekî dîrokî ye. Figur û nawisên ku di serdema kevirî de hatine kolan hîn jî li herêmê hene. Ji serdema Mîtaniyan ve heta niha mirov li vir jiyane. Gundê ku niha heye tê gotin ku di sedsala 11 û 12an de di pêşengiya Pîrmensûr ji aliyê Culemêrgê (Hakariyê) hatine û li vir bi cih bûne. Ji eşîreta Zeydan in. Dîsa tê gotin ku hemû gundî ne ji aliyê Culemergê hatine. Beşek ji herêmên din ên Kurdistanê hatine û di nav Zeydanan de bi cih bûne. Li gor statîstîkên sala 2010an nifûsa gund 611 e. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Li gund dibistan, mizgeft, telefon û elektrîk hene. Riya gund asfalt e.

**Zixir** (Değirmenli) dikeve bakurê rojhilatê Pîranê. Ji Pîranê 18 û ji Amedê 119 km dûr e. Ji ber koçkirinê nifûsa gund daketiye derdora 50-60î. Bi zaravayê kirmanckî dipeyivin. Gundekî avî ye. Gelek aş li ber ava gund digerin. Milekî Dîclê di ber gund re derbas dibe. Riya gund qûmkirî ye û li gund telefon û elektrîk hene

Institut kurde de Paris

**Ferhengok**

aborî: ekonomi
agirperest: ateşe tapan
ajel: heywan
ala: bayrak
artêş: ordu
ast: seviye
avasazî: mimari
bac: vergi
bacerê: gümrük
bajarok: ilçe
balafir: uçak
balafirxane: hava alanı
bandor: tesir
bakur: kuzey
başûr: güney
bawerî: inanç
bawermend: inançlı
bazirgan: tüccar
bazirganî: ticaret
bêhempa: eşsis
bendav: baraj
berê zayînî (bz): M.Ö
berecot: dönüm
bergeh: perspektif
berhem: eser, ürün
bihuşt: cennet
bijîşk: doktor
birêvebir: yönetici
biryar: karar
bive: tehlike
cilûberg: giysi
civak: toplum
civakî: toplumsal
cihû: yahudi
cuda: ayrı
cure: çeşit
çalakî: eylem
çand: kültür
çandî: kültürel
çap: baskı
çapemenî: basın-yayın
çarenûs: kader, gelecek
çareserî: çözüm
çavkanî: kaynak
çewsandin: baskı
çêj/tahm: tat
dadger: hakim
dadmendî: adalet
dagîrker: işgalci
dagîrkerî: işgalcılık
damezrandin: kurmak
demdemî: geçici
demsal: mevsim
deng: oy
dengdan: oylama
desthilatdar: hukumdar
desthilatdarî: iktidar
dezgeh: kurum
dibistan: okul
dibistana amadeyî: lise
dibistana navîn: ortaokul
dibistana seretayî: ilkokul
dîrok: tarih
dîroknas: tarihçi
dojeh: cehennem
doz: dava
dozger: savcı
encam: sonuç
endam: üye
enî/bere: cephe
erdhej: deprem
erdnîgarî: coğrafya
ferheng: sözlük

Institut kurde de Paris

ferhengok: sözlükçe
fermî: resmi
gencîne: hazine
girîng: önem
girtîgeh: cezaevi
gom: mezra
havîngeh: yazlık
hejmartina giştî: genel sayım
hêlîlar: meridyen
hêlîpan: paralel
heman: aynı
herêm: bölge
hest: his, duygu
hestyar: duyarlı
hevrîşim: ipek
hevkar: ortak
hilbijartin: seçim
hilbijartina giştî: genel seçim
hilbijêr: seçmen
hîndekarî: öğretim
huner: sanat, kabiliyet
hunermend: sanatçı
hunera ciwan: güzel sanatlar
jam/naqos: çan
jûr: ode
karmend: memûr
karsaz: işveren
Kaşyarî: Karacadağ
kenîşte: havra
kolan: sokak, cadde
komar: cumhuriyet
komele: dernek
komkujî: katliam
koşkar: ayakkabıcı
kovar: dergi
leşker: asker
leşkerî: askerî
lêkolîn: araştırma
lêkolînger: araştırmacı
lênûs: defter
lûtke: zirve
maf: hak
mafdar: haklı
mafdarî: haklılık
mafê mirovan: insan hakları
makîneya genimdirûnê: biçer
malmezin: hanedan
mayînde: kalıcı
mey: şarap
mîr: bey
mîrêmîran: beylerbeyi
mîrîtî: beylik
mizgeft: cami
mûçe: maaş
navend: merkez
name: mektup
nawis: taş mezar
nepenî: illegal, gizli
nijad: ırk
nijadperest: ırkçı
nijadperestî: ırkçılık
nûçe: haber
ol: dîn
olî: dini
oldar: dindar
palkêş: kürekçi
parêzer: avukat
parezgeh: wilayet
pejirandin: onaylamak
pênûs: kalem
perwerde: eğitim
peyker: heykel
pêşdibistanî: anaokulu
pêşeroj: gelecek

Institut kurde de Paris

pêşniyaz: öneri
pêwîst: zorunlu
pirtûk: kitap
pirtûkfiroş: kitapçı
pirtûkxane: kütüphane
piştî zayînî (pz): M.S
pile: derece, seviye
pîrozgeh: ziyaret, kutsal yerler
pîşe: meslek
rektor: müdür
rojava: batı
rojhilat: doğu
Rojhilata Navîn: Orta Doğu
rojname: gazete
salname: takvim
sazi: kurum
sera: sara
serdem: dönem
serokkomar: cumhurbaşkanı
surişt: doğa
şagird: öğrenci
şano: tiyatro
şanoger: tiyatrocu
şaredar: belediye başkanı
şaredarî: belediye
şaristanî: uygarlık
şikeft: mağara
tax: mahalle
taybet: özel
taybetî: özellik
tenduristî: sağlık
têkilî/pêwendî: ilişki
tixûb: sınır
wate: anlam
watedar: anlamlı
weşan: yayın
weşangerî: yayıncılık
wêne: resim
xwarinxane: mutfak
xweza/surişt: doğa
xwedawend: tanrıça
xwendekar: lîse ve üniversite okuyan
xwendevan: okuyucu
zanîngeh: üniversite
zanist: ilm, bilim
zanistî: ilmi, bilimsel
zarava: şive, lehçe
zargotin: folklor

Institut kurde de Paris

**Çavkaniyên nivîskî**

Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname* (kurmancî wergera Ziya Avcı), Apec, Stockholm- 1991

Ekrem Cemîl Paşa, *Dîroka Kurdistan Bi Kurtebirî*, Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Brukselê-1995

Cegerxwîn, *Tarîxa Kurdistan 1-2-3*, Weşanên Roja Nû, 1999-Swêd

*Ebu Bekr-i Tihrani, Kitab-ı Diyarbekiriya*, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Yayınları-1999

*Kronologisk Väldshistoria* av Redaktion

Äldre Kulturer, Natur och Kultur, Finland-1982

*Diyarbakır Salnameleri cilt 1-2-3-4-5*, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Yayınları

Orhan Cezmi Tuncer, *Diyarbakır evleri*, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür Sanat yayınları-1999

Orhan Cezmi Tuncer, *Diyarbakır Camileri*, Kültür ve Sanat yaınları-1996

Malmîsanij, *Kürt Talebe-Hêvî Cemiyetî*, Avesta, Istanbul-2002

Malmîsanij, *Cızira Botanlı Bedirhanlıler ve Bedirhani ailesi Derneğ inin tutanakları*, Apec, Stockhol-1994

Basri Konyar, *Diyarbekır Yıllığı Ankara* 1936, s. 207, 211-212

Doç. Dr Mazhar Bağlı, *Diyarbakır El Sanatları Tarihsel Gelişim ve Tekniği Diyarbakır Özel sayı Kültür ve Sanat* 28, Türkiye İş Bankası-Aralık 1995

M. Şefik Korkusuz, *Seyahatnamelerde Diyarbekır*, Kent yayınları-2003

Şefik Korkusuz, *Eski Diyarbekır'de Gündelik hayat*, Kent yayınları-2007

Ji bo Turîzmê Nexşeya Diyarbekırê ya Bêrîkê

Adnan Çelik ve Vefa Akdoğan, *Sosyo-Kültürel Yönleriyle Kulp*-2006

Amed Tîgrîs, *Licê*, Weşanên Apec, 2008- İstanbul

Rıfat Dağ, *Sayılarla Diyarbakır*, Diyarbakır Ticaret ve Sanayi Odası-1997

Hazırlayan Hasan Özgen, foto Ali İhtiyar, *Taşlar ve Düşler Diyarbakır*, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi yayınları

Birgit Brandau ve Hartmut Schickert, *Hititler, Bilinmiyen Bir Dünya İmparatorluğu*, Arkadaş Yayınları, Ankara-Mayıs 2004)

Mehmed Emin Zeki Bey, *Kürd ve Kürdistan Ünlüleri*, Apec, Stockholm-1998

Şemsedin Sami, *Tarihteki İlk Türkçe Ansiklopedide Kürdistan ve Kürtler* (çeviri: M.E. Bozarslan), Deng Yayınları, İstanbul-2001

Institut kurde de Paris

Ahmet Süreyya Örgeevren, *Şeyh Sait İsyanı ve Şark İstiklal Mehkemesi,* Temel Yayınları, İstanbul-2002
Ali Melek ve Abdullah Demir, *Dini değerleri ile Diyarbakır,* Diyarbakır İl Müftülüğü Yayınları-2009
Mirze Mehmet Çelik, *Fotoğraflarla, Kulp/Pasûr,* Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê-2009
Mehmet Önder, *Anadolu Efsaneleri,* Ankara 1986.
Saim Sakaoğlu, *101 Anadolu Efsaneleri,* İstanbul 1976, Ankara
Saim Sakaoğlu, *Anadolu Türk Efsanelerinde Taş Kesilme Motifi ve Bu Efsanelerin Tip Kataloğu,* Ankara 1980.
Muhsine Helimoğlu Yavuz, *Diyarbakır Efsaneleri* 2. B., Ankara 1993 (1. B.1989, 1990)
Müslüm Üzülmez, *On Bin Yıllık Tarihin Tanığı HİLAR,* Arkeoloji ve Sanat Yayınları-2009
Feqî Huseyin Sağnıc, *Portreler,* Istanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, İstanbul-
Malmîsanij & Mehmûd Lewendî, *Li Kurdistana bakur û li Tirkiyê Rojnamegeriya kurdi,* 1-2, Weşanên Jîna Nû, Uppsala-1989
Güneş Ekmekçi, *xvı.Yüzyıl Diyarbakır Şairleri,* İstanbul-2009
Zübeyde Kırmızı, *Amid-i Nur,* Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi
*Tarih boyunca Diyarbakır'ın yetiştirdiği şahsiyetlere beş kala Diyarbakır,* Diyarbakır Valiliği 1995
Mehmet Sezgîn, *Türkiye'de ve kentimizde siyaset.*
Mehmet Sezgîn, *Resimlerle Diyarbakır*
Güneydoğu Anadolu Belediyeler Birliği Araştırması, *Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da sosyo-ekonomîk sorunlar ve çözüm önerileri-2008*
Diyarbakır Ticaret ve Sanayi Odası, *Sayılarla Diyarbakır-2008*
Diyarbakır Ticaret ve Sanayi Odası, *Grafiklerle Diyarbakır-2009*
Suleyman Savci, *Silvan Tarihi* (Mafarkin Abide ve Kitabeleri, Diyarbakır Matbaasi-1956
Dursun Özdoğan-Ruken Ergüneş, *5233 Sayılı Yasa ve Diyarbakır Ölçeğinde Araştırılması,* Göç-Der-Temmuz 2007
Vedat Çetîn, *Yakılan/ Boşaltılan Köyler ve Göç*-Kasım 1999
Şevket Beysanoğlu, *Kültürümüzde Diyarbakır, Ankara 1992,* 103-106.
Şevket Baysanoğlu, *Diyarbakır Folklorunda Gelenekler-Görenekler-Adetler ve İnanmalar,* Ankara 1995, 163-183.

Institut kurde de Paris

Şevket Baysanoğlu, *Diyarbakırim 1-2 doruk ve Narin* Matbaalari
Şevket Beysanoğlu, *Anıtları ve Kitabeleri ile Diyarbakır Tarihi cilt 1-2- 3,* Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür ve Sanat Yayınları-2003
Şeyhmus Diken, *Diyarbekir diyarım, yitirmişem yanarım,* İletişim-2009
Amed Tîgrîs & Aso Germiyanî, *Ji bo pêngava navîn Dîroka Kurd û Kurdistanê,*Weşanên Apec, Stockhom-1990
Fuat Dündar, *Modern Türkiye'nin Şifresi, Iletişim* yayınları-2008
*Yerel Gündem 21 Diyarbakır-Sarmaşık Yoksullukla Mücadele ve sürdürülebilir Kalkınma Derneği, Diyarbakır Kent Yoksulluk Haritası-Diyarbakır*
Mehmet Mercan, *Anadolu'da Gazetecilik ve Diyarbakır Basını*
Ahmet Ümit, İstanbul Hatırası, Everest Yayınları, İstanbul-2010
Malmîsanij, *Yirminci Yüzyılın Başında DİYARBEKİR'DE KÜRT ULUSÇULUĞU* (1900-1920, Vate yaınları-2010
*Andranîk, Dêrsim Rêwîtî û erdnîgarî* (wergera Têmûrê Xelîl), Weşanên Deng-2009
*Cumhuriyet Senato Uyelerinin özgecmisi,* cilt-D, TBMM Vakfi yayinları
www.yerelnet.org.tr/iller/koy_listesi.php
www.diyarbakir.bel.tr/
www.diyarbakirkulturturizm.gov.tr/
www.diyarbakiryenisehir.bel.tr/
www.kenthaber.com/koy.aspx?KoyKodu
www.gezgeen.com/rehber-23441/Yer-Adi/Yesilkoy/
www.uydu.info/uydu-haberleri/
www.ergani.net/v2/
www.diyarbakirtarim.gov.tr/
www.e-weje.com
tr.wikipedia.org/wiki/Kategori viransehir.meb.gov.tr/1024/viransehir/tarihce.html
www.petrol.itu.edu.tr/documents/turkiyedepetrol.html
www.Kulppasur.com, kültür ve tanıtım sitesi
www.mirbotan.com/index.php
www.togan.net76.net/bismil/koymezrabelde.html
www.netewe.com
*Devlet Su İşleri Genel Müdürlüğü barajlar sayfası*

Institut kurde de Paris

www.ermenisorunu.gentr/turkce/makaleler/makale57.html/
ww.bilinmeyendiyarbekir.com/krallar_kent.html
http://www.os-ar.com/modules.php?name=Encyclopedia&op=content&tid=501394
www.sayhadergidi.com
www.tbmm.gov.tr/TBMM_Album
mww.ergani.net/ergani/ergani-tarihce.html
www.e-tkbm.gov.tr/publisher/tkdurumilce.asp?ilceid=295
www.silvan.com
www.silvanliyiz.biz/
www.cografya.gen.com
www.kobiden.com
www.dunya.com
www.suryaniler.com

Institut kurde de Paris

## Kesên alîkar

Di amadekirina vê pirtûkê de gelek kesan alikariya me kir. Ne munkun e ku em navên hemû kesên alîkar li vir binivîsin. Em ê navên kesên ku herî zêde alîkariyê dane li jêr binivîsin û em ji hemûyan re spas dikin.

Baki Kaymak, Ahmet Kılıç, Haci Cebe, Ahmet Doğru, Selehatin Çam, Omer Güven, Edip Polat, Ali Gökdemir, Ramiz Diken, Beşir Doğan, Pakize Doğan, Maaz Akay, Rojîn Zarg, Mursel Orhan, Rasim Çakar, Mele Mahmûd, Mustafa Şahin, Nejat Satıcı, Cumali Yılmaz, Cumali Eşsizoğlu, Mehmet Emin Alagündüz, Nuri Çiçek, Rifat Türk, Müslüm Üzülmez, Bedri Durak, Selim Yalçın, J. İhsan Espar, Şêxmûs Aslan, Selahattin Korkmaz, Recep Yakut, Mehmet Çeliker, Recep Ölçer, Murat Söner, Pismamê Bilbilê, Mizbah Güvenç, Fadil Biçen, M. Zihni Yavuz, Muhuttin Özbahçivan, Kadri Avcı, Hasan Aslan, Ali Ciftci, Hesenê Metê, Sabedîn Cafrî, Kaya Kaymak, Metin Baran, Melike Dara Güral, Şirin Gencer

Institut kurde de Paris

**Amed Tîgrîs**

Amed Tîgrîs di sala 1948an de li Licê hatiye dinê. Dibistana seretayî li Licê û ya mamostetiyê jî li Erxeniyê xwendiye. Di sala 1980î de li Stockholmê bi cih bûye. Li wir di dibistanên swêdî de bi awayekî fermî bi qasî 25 salan mamostetiya kurdî kiriye. Di nav komîteyên amadekariya pirtûk û materyalên kurdî de kar kiriye. Demekê serokatiya Înstîtuya Kurdî ya li Stockholmê kiriye. Ji bo wergera pirtûkên zarokan ji swêdî bo kurdî bi salan di redaksiyona Weşanxaneya APECê de xebitiye. Di Med TV de bi navê *"Rojbaş mamoste, Dibistana kurdî û Xwendegeha kurdî"* de bernameyên perwerde û hînkirinê amade û pêşkêş kiriye. Bi wergeran ve heta niha nêzîkî 30 pirtûkên wî derketine.

**Yıldız Çakar**

Di sala 1978an de li Amedê hatiye dinê. Dibistana seretayî, navîn û lîse li Amed û Mersinê xwendiye. Li zanîngehê beşa Xizmetgûzariya Tenduristiyê xwend. Pirtûka wê ya yekem *Goristana Stêrkan* di sala 2004an de ji aliyê Weşanên Elmayê ve hatiye çapkirin. Pirtûka wê ya duyem *Ala* jî di sala 2008an de ji aliyê Yekitiya Nivîskarên Kurd a Duhokê ve hatiye çapkirin. Pirtûka wê ya sêyem jî di sala 2012an de ji aliyê Weşanxaneya Avesta ve hatiye çapkirin.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# Amed

Erdnîgarî
Dîrok
Çand



Institut kurde de Paris

ISBN 978-975-94847-8-1